Bi navê Xwedayê Rehma Wî Pir û Berfireh

قَالَ اللهُ تَعَالى:

إِنَّما يُرِيدُ اللَّهُ لِيُذْهِبَ عَنْكُمُ الرِّجْسَ أَهْلَ الْبَيْتِ وَيُطَهِّرَكُمْ تَطْهِيراً.

سورة الأحزاب / الآية 33

Xwedê xwestîye ku pîsatîyê ji hewe Ehl-ê Beytê tinê bibê û hewe pakê pak bikê.

Sûretê Ehzab - Ayeta 33

Nehc-ul Belağe

Resûlê Xuda (s) kerem kir:

إني تاركٌ فيكُمُ الثَقلين: كتاب الله، وعترتي أهلَ بيتي، ما إن تمسكتُم بهما لن تضلوا أبداً وأنَّهُما لَن يَفترِقا حتّى يردا عَليَّ الحوضَ.

Ez du giranbihaya di nav hewe da dihêlim; eger hûn bi wa herduka bigirin qet li rê winda nabin, û bi rasti ew qet ji hev cida nabin heta ku bal hewzê li min bicivin.

Nehc-ul Belağe

Xeberdan, Nivîsok û Axiftinên hekîmane yên
Imam ‘Elî selamên Xuda lê bin

Berhev kirina Seyidê Rezî (359 – 406 Kûçî)

Wergêrana
Seyid ‘Elî Huseynî Bohtî

Edîta Koçerê bê Zozan

Li Bin Çavdêrî ya Seyid Mubarekê Huseynî yê Cûdî

Li Muessesa SEYDA da Hatîye Hazir Kirin

Nîşana Hevpeyvînê:
Seyda_14@hotmail.com

Komgeha cihanîya Ehl-ê Beyt (s)

نهج البلاغة/ كردي لاتين
گردآوری: شريف رضي
مترجم: سيد علي حسيني بوهتي

Nasname

Navê Orjînal: Nehc-ul Belağe
Berhevker: Seyidê Rezî 359-406 h.
Me'na Kûrdî û Binper:
Seyda Seyid 'Elî Huseynî yê Bohtî
Çavdêrî:
Seyda Mubarekê Huseynî yê Cûdî
Serastkirin: Koçerê Bê Zozan
Amade kirin: Arîkarê Ferhengî, idara tercumê
Belavker: Komgeha cihanîya Ehl-ê Beyt (s)
Çapxane: Leyla
Çapa Yêkê 2006 M. Beraberê 1427 H. Heyvî û 1385 H. Rojî
Tîraj: 2000
ISBN:964-529-143-7

Info@ahl-ul-bayt.org
www.ahl-ul-bayt.org

PEYVA KOMGEHÊ

Mîrasa giranbiha ya ku Ehlê Beytê (s) paş xwe ve hiştî û peyrewên wê ew ji xetera ji navçûnê paraztîn nimûneyek kamil e ji mektebekî berfireh ku çiq û bergên muxtelifên me'rifet û zanînên Islamî li ber xwe girtine, evê mîrasê karîye gelek ji kesên xwey qabilîyet û şîyan ji bona têr vexwarina ji vê serkanî ya tejî, perwerde bikê û ewa zanayan berpêşê ummeta Islamî bikê ku li pey dewsa binemala Pêğemberê Xwedê (s) li beraberê ewa şubhan da ku ji navda û ji derveyê komela Islamî tên meydanê baştirîn û binecîtirîn cewab û rêkên çareser kirinê bidin û bêjin.

Komgeha cihanî ya Ehlê Beytê (s) li ser esasê mesûlîyeta xwe, ji herîmê risaletê û bawerî yên wê yên heq berevanî kirîye û her û her di vê rêka muqeddes da xwe ji şagirdên durist yên mekteba Ehlê Beytê hesab kirîye. Her wiha ev komgeh xebitîye ku lêkolîn û nivîsînên bi feyde yên şexsiyet û kesayetî yên borîyî û derbaz bûyî çap û bilav bikê da ku li têhnîyên heqîqetê bigivirê û di çaxa tekamula leza 'eqla û pêwenda bê nimûne ya cana da gohê canê xwe vekin li ber wa heqîqetên ku Ehlê Beyta Risaletê (s) ji hemî cihanîyan ra kirîn xelat û hedîye kirîn.

Hêvî ew e ku xwendayên giranqedr, komgeha cihanî ya Ehlê Beytê ji bîr û hizr û pêşnîyarên bi biha û rexneyê xwe yên duristker bê behr nekin û her wiha em ji bingeh û zana û wergêran daxwaz dikîn ku ji bona bilav kirina Islama xalisa Muhemmedî (s) arîkarîya me bikin.

Em ji Xwedayê Mute'al daxwaz dikîn ku evê xizmetê ji me qebûl bikê û li bin sîbera xelîfê xwe, Hezretê Mehdî (s) da tewfîqa zêde bûna va xizmeta bidê me. Niha jî gelek bi cî ye ku em qedrzanîyê bikîn ji nivîser û wergêr û hemî wa 'ezîzên ku arîkarî kirîn heta ev eser gihayî fêkî danê, nexasma biraderên hêjayî li idara tercumê da.

Komgeha Cihanî ya Ehlê Beyt (s)

Arîkarê Ferhengî

5 Şe'ban 1427

GOTINA WERGÊR

“Pir kes hene ku navê wan mirîye
Pir kes jî hene ku pê eserên xwe sax in
Li bal ‘eqilmenda mirî nayê hesab kirin
Kesê ku eserên wek vê kitêbê hebin”

Baxerzî

Xwendevanên giranbiha ev kitêba li destê hewe da tercuma kitêba “Nehc-ul Belağê”[1] ye. Ev kitêb komek ji axiftin û gotinên mîrê bawerdara, Imam ‘Elî ne, selamên Xwedê lê bin. ’Alimê mezin û pir zana Seyidê Rezî ev axiftinên mîrê bawerdaran li “Receb”a sala 400-ê h. Heyvî, bi vî awayê hûn dibînin li sê pişka da berhev kirîye.

Pêşîya ku em derheq vê kitêbê û merhelên tercume û tehqîq û çap kirina wê da hinek zanîna pêşkêşê hewe ‘ezîza bikîn, ya baş ew e em digel nivîserê wê herçend kurt nas bibîn:

Wiladet: ’Alimê pir mezin “Eb-ul Hesen” Muhemmedê korê Huseyn ku pê naznavê “Seyidê Rezî” hatîye nas kirin, li sala 359-ê h. Li **Bexdayê** hatîye dinyayê. Ev ’alimê giranqedr digel hebûna riĥek mezin û xwe parêzîyê ji zurîyeta Pêğemberê Xwedê (s) bû. Ev zanayê dînî li malbatek pir bi qedr û qîmet da hatîye dinyayê û neseba wî li pênc babka da dighê imamê heft yê Ehlê Beyta Pêğember, yanî Imam Musayê Kazim (selam û selatê Xuda li ser wa bê).

Dayika Seyidê Rezî jî jinekî qabil û ’alime û seyid bûye. Navê wê **Fatime** ye û ji nevîyên **Nasirê Kebîr** e ku li sê babka da dighê imamê çarê yê mala Pêğember (s) yanî Imam Zeynel Abidîn korê Imam Huseyn selamê Xwedê li wa bê. Ji vê binemalê gelek ’alimên mezin yên dî jî rabûne, yêk ji wan birê wî yê mezintir “Seyid Murteza yê ‘Elem ul huda” ye, ewî hemî ‘ilm û zanînên “eqlî” û “neqlî” ku li cihana islamê da hebûn xwendin û piştî “Şêxê Mufîd” rêberî ya ’ilmî ya peyrewên Ehlê Beytê bi hêvîya wî ve bû.

Meqam, Terbiye û Zeka Seyidê Rezî: Seyidê Rezî kesatîyek pir mezin li cihana Islamê da hebûye, binemala wî jî hem ji alîyê bab ve û hem ji alîyê daykê ve pir bi qedr û qîmet bûye. Tarîx dinivîsin ku: **Şêxê Mufîd** ’alimê berketî yê wî zemanî bûye, ew li mehela “**Kerx**” ya Bexdayê da jîyaye û li mizgefta wê mehelê da dersa dînî daye û pir feqîyên wî hebûne. Ew şevekî li xewna xwe da dibînê ku Hezretê Fatima keça Pêğember (s) destê Hesen û Huseyn girtine û hat balê û gotê: “Ey Şêx! Eva herdu korên min bi’elimîne hukmên dînî (fêre fiqhê bike)”.

Ew ji ber vê xewnê şaş dibê û heyrî dimînê, heta sibehî ku diçê mizgeftê, wekî dinêrê Fatima keça Nasir digel çend jina hatin mizgeftê û ewê destê dû korên xwe “**Seyid** ‘**Elîyê Murteza**” û “**Seyid Muhemmedê Rezî**” girtine û hat gotê: Cenabê Şêx! Ez hatime da tu eva herdu korên min bi’elimênî hukmên dînî û şerî’etê nîşa wan bikî.

Seyidê Rezî bin deh salîyê ra des avêtîye xwendinê û pir bi vîyan ders xwendîye heta ku hêca balix nebûyî ’ilmên li wê herêmê da dihatan xwendin hemî xilas kirin. Li deh salîyê da dest avêtîye nivîsîna şi’ran û vê gavê ew şi’rên li deh salîyê da nivîsîyîn li

dîwana wî ya şi'ran da hatine parastin. Li 17 salî ya xwe da des avêtîye ders danê û li 20 salî ya xwe da ji hemî 'ilm û zanînên li zemanê wî da heyîn behremend bûye.

Li 21 salî ya xwe da yanî li sala 380-ê h. Bûye xweyê sê meqamên mezin, yanî: "Neqabet"[2] û "Serpêşîya hecîyên mala Xwedê û berpirsyarî ya Ke'bê" û "Çavdêrî ya li ser dîwana girtina heqê mezlûman" maye bi hêvîya wî ve. Li 29 salîyê da naznavê "Şerîfê Ecel" û li 31 salîyê da "Şerîfê Rezî" jê re hat dayîn û li sala 403 h. Da jî bû "Neqîbun-Nuqeba" .[3]

Seydayên Seyidê Rezî: Nivîseran navê 14 seydayên Seyidê Rezî li kitêbên xwe da nivîsîne, ku li bal her yêkî hinek 'ilm xwendine, hinek ji wan ev in: 1- Seyrafî, ku Seyidê Rezî li 13 salî ya xwe da li balê feqatî kirîye. 2- 'Ebdullahê Merzbanî, wefatkirîyê sala 384 h. 3- Ibn Cinnî yê Musilî, ku Seyidê Rezî li kitêba "El Mecazatu-nnebewîyye" da pir gotin ji wî gêrane. 4- 'Ebdurrehîm ibn Nebate, wefatkirîyê sala 395 h. 5- 'Alimê Malikî mezheb, Ebu Ishaqê Teberî. 6- 'Ebdullah korê Mu'ellim, Şêxê Mufîd, wefatkirîyê sala 413 h.

Hinek ji feqîyên Seyidê Rezî: Seyidê Rezî gelek feqî gihandine derecên bilindê 'ilm û zanînê û mirovên pir bereket li ber destê wî rabûne, hinek ji wan ev in: Şêxê Tûsî, wefat 460 h. Ibn Quddame, wefatkirîyê 486 h. Seyid 'Ebdullahê Curcanî, Ebubekirê Nîşabûrî yê Xuza'î, Seyid Eb-ul Hesen bin Bendar û …

Wefata Seyidê Rezî: Ev Seyid û seydayê giranqedr li 6-ê Muherrema sala 406-ê hicrî yê heyvî di temenê 47 salîyê da li Bexdayê wefat kirîye û bedena wî ya şerîf li mala wî da li mehela Kerx ya Bexdayê hatîye veşartin. Evî seydayî jî pê eser û dewsên

paş xwe ve hiştîn wek bab û kalkên xwe yên qenc û zana navê xwe li tarîxê da hişt, ku çi caran nayê ji bîr kirin.

Eser û şûnewarên Seyidê Rezî: Em dikarîn ji dû alîyan ve li ser eser û şûnewarên vî seydayê giranqedr baxivîn:

1- Eserên nivîsandî. 2- Eserên nehatîn nivîsandin. Ji nav eserên wî yên ne ji qismê nivîsarê, em dikarin behsa medresa wî ya bi navê "Dar-ul 'ilm" bikîn, li vê medresê da gelek 'alim û zana hatine terbiyet kirin û heta bi 150 sala paş wefata wî jî evê medresê dewam kirîye û 'alimên mezin wek "Şêxê Tûsî" ji vê medresê rabûne.

Ema eserên wî yên nivîsarî jî pir in, eva eserên wî yên pir biha, navê wî li nav komgeha 'ilmî da sax hiştîye û herçend bedena wî ne li nav wan da ye lê belê navê wî her li nav nava da heye û wek stêrê dibiriqê. Merhûmê Emînî li kitêba Xedîrê da ji 19 eserên wî yên edebî, tarîxî, riwayî û Qur'anî nav birîye, ku: "Mecazat-u asar in nebewîyye", "Muteşabihat-ut tenzîl", "Me'anî-el Qur'an", "Resail," "Dîwana şi'ran" û ev kitêba giranbiha ya li destê hewe da, yanî "Nehc-ul belaxe" ji eserên qelemî yên wî ne.

Nehc-ul belağe: Ibn ebî Hedîd ku şerhek ji Nehc-ul belaxê ra nivîsîye dibêjê: "Ev kitêb, bin kelamê Xwedê û ser kelamê beşer ra ye". Seyidê Rezî ev kitêba hedîsî, 'eqîdeyî, 'ilmî, exlaqî, ictima'î û edebîyatî li sê qismeta da ji kelamê mîrê bawerdara Imam 'Elî (s) berhevê serhev kirîye.

Qismê ewil: 241 xutbe û axiftinên mîrê bawerdara ne.

Qismê duwê: 79 name û nivîsokên mîrê bawerdara ne ku ewî (s) ji dost û dijmina ra nivîsîne.

Qismê sisîyê: 480 gotinên kurt û bi ĥikmet in ku ji nav axiftinên wî hatine bijartin.

Seyidê Rezî bi xwe dibêjê: Ev axiftinên li vê kitêbê da hatîn kom kirin ne hemî axiftinên Imam ‘Elî (s) in; belkî hinek ji axiftinên wî ne ku ji cihet “fesahet û belaxetê” ve pir hêjayî ne. Ji ber vê yêkê hûn dibînin hinek xutbe ji dû sê rêzka ne zêdetir in, û hemî kes dizanê ku xutbeyek eger bê xwendin, muheqeq ji wî qasê hatî nivîsandin, dirêjtir e. Delîlek dî jî li ser vê gotinê ev e ku navre navre her car dinivîsê: “we min xutbetin lehu ’eleyhi sselam- yanî: Hinek ji axiftina wî ye” evahe jî nîşan didê ku axiftina wî hemî ne nivîsî ye.

Hafizên Nehc-ul belaxê: Ji zemanê cenabê Seyid Rezî (re) heta îro rojê gelek kes hebûne ku Nehc-ul belağe ji ber kirine. Ji xeyrî vê jî çiko bi çavê kitêba “riwayî” li vê kitêbê tê nêrîn ji kevin da heta niha ’alim û zanayan bi hayjêman, ev kitêb nivîsîne û dest û dest gerhaye û heta îro hatîye parastin û gihaye destê me jî. Ser gotina ’alimên lêkol, 167 nusxên pir kevin ji Nehc-ul belaxê li kitêbxanên seraserê dinyayê da hene. Jiber kirina Nehc-ul belaxê ji zemanê saxî ya Seyidê Rezî ve despê kir û heta îro berdewam e û berew zêde bûn e. Qazî Cemaluddîn Muhemmed bin Huseynê Kaşanî yêk ji wan kesa ye ku li zemanê saxî ya Seyidê Rezî da Nehc-ul belağe jiber kirîye, her wiha navê zanayên hêjayî: Muhemmed Farûqî û seydayê pir zana Seyid Muhemmedê Yemanî û tarîxzan û edîbê meşhûr Şêx Muhemmed Hesenî yê Amulî li nav jiberkerên Nehc-ul belaxê da hatine nivîsandin.

Şerhên Nehc-ul belaxe: Ji ber biha dana vê kitêbê, ji alîyê ’alimên zanave wek çawa gelek kesa ev kitêb jiber kirîn, geleka jî şerh û haşî jê re nivîsîne, ser gotina lêkolên Nehc-ul belaxê, heta niha zêdetirê ji 400 şerh û haşî li ser vê kitêbê hatine nivîsîn û bi gelek zimanan hatîye tercume kirin.

Xweyê kitêba Ğedîrê (c 4. r, 192-186) dibêjê: Şerh kirina Nehc-ul belaxê ji çaxê Seyidê Rezî ve despê bûye û hevçaxê wî cenabê Seyid ‘Elî yê Nesr ewilîn kes e ku ev kitêb şerh kirî. Piştre jî evî karî dewam kirîye.

Hinek ji nivîserên van şerha:

Fezlullahê Rawendî, wefatkirîyê 511 h.

Eb ul Hesenê Beyheqî, wefat: 516 h.

Qutboddînê Rawendî, wefat: 573 h.

Muhemmedê korê ‘Omerê **Teberî**, wefatkirîyê sala 606 h.

Ebû Hamid Izzeddîn, meşhûr bûyî bi **ibn Ebî Hedîd**, wefatkirîyê sala 655 h.

Ibn Saî yê **Bexdadî**, wefatkirîyê 674 h.

Ibn Meysemê Behranî (sê şerh nivîsîne, mezin, navincî û biçok) wefatkirîyê 679 h.

Se’dudîn Mesûd bin ‘Omerê Şafiî **Teftazanî** wefatkirîyê sala 791 h.

Seyid ‘Ebdullahê **Şubber** (du şerh nivîsîne) wefatkirîyê sala 1242 h.

Hecî Hebîbûllahê Xûyî (xweyê Minihac ul Bera’ê) wefatkirîyê sala 1356 h.

Şêx Muhemmed ‘Ebduh ê Misrî, wefat kirîyê sala 1323 h.

Kûrdî ya Nehc-ul belaxê: Ev kitêba giranbiha ku bi vî awayê rêk û pêk, ketîye destê hewe ‘ezîzên ferheng dost da, zehmetek pir zêde pêve hatîye kêşan heta bi vî awayî hatî hazir kirin. Min, wergerandîye ser zimanê Kûrdî, pê re komekî ji ehlê qelemê li ser kar kirine, hineka Kûrdî ya wê serast kirine û hineka metin raber kirine digel tercumê û hineka ew pê kampyuterê nivîsîne û xeletên wê girtine û durist kirne. Karên hazir kirnê li muessesa Seyda û li bin çavdêrî ya Seyda Seyid Mubarekê Huseynî da pêk hatîye heta

bi vî şiklî çap bûye û ketîye destê hewe xwendevana da.

Seyda û zanayên ku Nehc-ul belaxe dîtine, dizanin ev kitêb kitêbekî pir giran û çiqa tu bêjî me'na wê zehmet e, pêkve fesahet û belaxet e û kelîmên ku têda bikar hatîn pir xerîb û gohlê nebûyî ne, bo nimûne em dikarin ji pê heshana giranî ya me'na Nehc-ul belaxê ra misalekî bidin: Cenabê **Subhî Salih**, seydayê edebîyat û ilahîyata zanîngeha Lubnanê ji bona wî qasî ku ehlê lêkolînê piçekî rihet bibin bo fêhm kirina vê kitêbê, luxet û bêje yên wê me'ne kirne. Carna li ristkek 6 kelîmeyî da ihtîyac zanîye ku 5 kelîmên wê me'ne bikê **(binêrin: Xutba 165 û 195)**. Carna jî li axiftinek 18 rêzik da lazim zanîye ku 38 kelîman ronahî bikê **(binêrin: x. 91-eşbah)**.

Li tehqîqa wî da ku ev kitêb li 500 ruperên biçûk da hatîye çap kirin, lazim dîtîye ku 5031 kelîme bên me'ne kirin, yanî ji bona mirovên 'Erebî zan û seyda û ehlê 'ilmê jî lazim dîtîye ku li her ruperî da deh kelîman me'ne bikê heta bikarin behrê jê bibin û me'na wê bizanin.

Bîr anîn û xwest:

1. Ewên li ser Nehc-ul belaxê kar kirîn dizanin ku evê kitêbê nusxên zehfî hene, li nav van nusxan da min nusxa cenabê seyda "Subhî Salih" bijart û tercume kir. Helbet li cihên lazim da min jimara nusxa seydayê "Feyzul Islam" jî daye. Her wiha li dûmahîkê da jî me cedwela ixtilafa çar nusxan anîye.

2.Tercume û tehqîq li ser metnê 'Erebî yê kitêbê pêk hatîye.

3. Ez pir xebitîme ku ji alîyekî ve 'eynî me'na 'Erebî bêy kêm û zêde kirin bînim û ji alîyê dî ve jî ji bona rihet fêhm kirnê û rewan bûnê gûrekî edebîyata Kûrdî pêve biçim.

4. Li despêka xutbe û naman da, carna zêdetirê ji qasê li kitêbê da hatî, hinek zanînên lazim min lê zêde kirne, û ji bona tevlîhev nebûnê min ew kirîye di navbeyna heyvokê da.

5. Ne ez û ne hevalên dî ku arîkarî kirine, nabêjin ku ev kar kêmasî têda nîne, û heta em nabêjin jî ku ji vê baştir çênabê. Lê gotina me ev e ku em bi niyetek pak pir xebitîne ku kêmasî yên vî karî kêmtir bin. Û Xwedê kerem dikê: “Kes zêdeyê ji karîna xwe ne berpirsyar e”.

Li vêderê ez ji hemî zana û lêkol û ehlê ’ilmê dixwazim ku eger kêmasîyek ket ber çavê wan ji me ra bêjin da ku bi hez kirina Xwedê em ewê li çapên dî da rast û durist bikîn, Xwedê ji hewe razî bê.

Li ser vê nîşanê bîr û hizrên xwe ji me re bêjin:

seyda_14@hotmail.com

Seyid ‘Elî yê Huseynî yê BOHTÎ

Remezana sala 1425 h. heyvî

Beraberê sala 2005 mîladi

PÊŞGOTINA SEYIDÊ REZÎ

Hemd û sipas ji Xuda ra; ewê, hemd kirî bihayê qencî yên xwe û penahbera ji belayên xwe û wesîla gihana bihişta xwe û hegera zêde kirina qencîya xwe.

Selewat li ser Pêğemberê Wî, nebîyê rehmetê û rêberê Imam û pêşkaran û çira ya ummetê, ewê, ji sirişta keremê hatî çêkirin û esl û neseba wî pir belg û bereket. Û selamên Xuda li ser Ehlê Beyta wî ku çira yên ronahîker in di tarîtîya da û wesîla xilasî ya ummetan û nîşanên ronahî yên dîn û merkezê giranî ya seratî û qencîya ne, selewat û selamên Xuda li ser hemîyan bin. Selamek wereng ku beraber bê digel mezinahî ya wan û bibê kirê û ucreta pakî ya esl û çiqê wan. Selam li ser wan heta wî demê ku şefeq vedê û stêr biçin ava.

Li ewilê ciwanî ya xwe da ku ez xort bûm min dest avêt nivîsîna kitêbekî derheq taybetî yên Imaman da selamên Xuda li ser wa bin, û min axiftinên wan yên xweş û kelamê wan yê berketî li wê kitêbê da anîn, û li pêşekî ya wê da jî min amanc û hedefa xwe ji vî karî dîyar

مقدّمة السيّد الشريف الرّضي

أما بعد حمد الله الذي جعل الحمد ثمناً لنعمائه ، ومَعاذاً من بلائه ، ووسيلاً إلى جنانه، وسبباً لزيادة إحسانه .والصلاة على رسوله نبي الرحمة ، وإمام الائمة ، وسراج الامة المنتخب من طينة الكرم ، وسلالة المجد الاقدم، ومَغرس الفخار المُعْرق، وفرع العَلاء المثمر المورق . وعلى أهل بيته مصابيح الظُّلم ، وعِصَم الامم، ومنارالدين الواضحة ، ومثاقيل الفضل الراجحة . صلى الله عليهم أجمعين ، صلاة تكون إزاءً لفضلهم، ومكافأة لعملهم ، وكفاء لطيب فرعهم وأصلهم ، ما أنار فجر ساطع ، وخوى نجم طالع.

فإني كنت في عنفوان السن، وغضاضة الغصن ابتدأت بتأليف كتاب في خصائص الائمة عليهم السلام : يشتمل على محاسن أخبارهم وجواهر كلامهم ، حداني عليه غرض ذكرته في صدر الكتاب . وجعلته أمام

kir. Piştî berhev kirina taybetên mîrê bawerdaran ‘Elî selamên Xuda li ser bin, gîr û girift û muşkilatên zeman, ez paşve dam ji temam kirina kitêbê. Min ew kitêb li ser esasê babet û vebiran rêk û pêk kir bû, vebira paşîn pêk hatbû ji axiftinên xweş û peyvên kurt û we’z û Ĥikmetên ji Wî hatîn neqil kirin, lê belê axiftinên Wî yên dirêj û nivîsokên Wî yên berfireh têda nehatbûn.

Ev vebira paşîn ya kitêbê li dost û hevalan xweş hat û ji ber tazehî ya wê pir jê man ‘ecêbmayî, û ji min xwestin ku ez kitêbekî binivîsim û bijareyekî ji axiftinên mîrê bawerdaran ji hemî qisman têda kom bikim û axiftinên wî yên muxtelif, xutbe û name û we’z û şîret û adabên ewî jê axiftî têda bênim. Çiko dizanîyan eger kitêbek wiha, bê nivîsîn wê xweş xeberdan û belaxeta ‘ecêb û nimûnên fesahetê û cewhera axiftinên serast û nuktên ronahî ji axiftinên dînî û dinyayî têda bên kom kirin ku li çi kitêb û nivîsoka da bi vî awayî berhev nebûye, ji ber ku mîrê

الكلام . وفرغت من الخصائص التي تخص أمير المؤمنين عَليّاً عليه السلام ، وعاقت عن إتمام بقية الكتاب محاجزاتُ الايام و مماطلات الزمان. وكنت قد بوّبتُ ما خرج من ذلك أبواباً ، وفصّلته فصولاً فجاء في آخرها فصل يتضمن محاسن ما نقل عنه عليه السلام من الكلام القصير في المواعظ والحِكمَ والامثال والاداب ; دون الخطب الطويلة ، والكتب المبسوطة.

فاستحسن جماعة من الاصدقاء ما اشتمل عليه الفصلُ المقدم ذكره معجَبين ببدائعه ومتعجبين من نواصعه وسألوني عند ذلك أن أبتدىء بتأليف كتاب يحتوي على مختار كلام مولانا أمير المؤمنين عليه السلام في جميع فنونه . ومتشعّبات غصونه : من خطب ، وكتب ، ومواعظ ، وأدب . علماً أن ذلك يتضمن من عجائب البلاغة ، وغرائب الفصاحة ، وجواهر العربية ، وثواقب الكلم الدينية والدنيوية ،

bawerdaran despêka fesahet û serkanî ya belaxetê ye, xefên belaxetê bi rêka wî ve eşkere bûne û esl û esasên wê ji wî hatine girtin, hemî xetîb û axiftinkera peyrewî ji wî kirine û we'zkerên xudan belaxet li axiftina xwe da arîkarî ji wî girtine, digel vê hemîyê illeh ew li ser pêşê da ye û yên dî li pey wî, ew li pêş e û yên dî li paş, çiko esera 'ilmê ilahî û gulava axiftinên Pêğember (s) tevlî peyvên wî bûne.

Vêca min daxwaza dostan qebûl kir û des avêt nivîsînê, min dizanîya ev kar pir bi feyde ye û wê zûka li nav alemê da jê bê axiftin û zexîra xêra ye. Mexseda min ev bû ku ji bilî seratî yên wî yên dîtir, ez mezinahî ya qedr û qîmet û kesayetî ya mîrê bawerdaran ji vî cihetî ve ronahî bikim ku ew ji nav hemî wa kesên derbaz bûyîn û gotinek ji wan li cih da mayî veqetîyaye û gihaye dûmahîka fesahet û belaxetê û axiftina wî oqyanûsek bê binî ye û axiftina kesî nagihê ya wî.

ما لا يوجد مجتمعاً في كلام ، ولا مجموعَ الاطراف في كتاب ; إذ كان أمير المؤمنين عليه السلام مشرَعَ الفصاحة وموردها ومنشأ البلاغة ومولدها ; ومنه عليه السلام ظهر مكنونها ، وعنه أخذت قوانينُها ; وعلى أمثلته حذا كل قائل خطيب وبكلامه استعان كل واعظ بليغ . ومع ذلك فقد سبق وقصروا ، وقد تقدم وتأخروا ، لان كلامه عليه السلام الكلامُ الذي عليه مَسْحة من العلم الالهي وفيه عَبْقَة من الكلام النبوي.

فأجبتهم إلى الابتداء بذلك عالماً بما فيه من عظيم النفع ، ومنشور الذكر ومذخور الاجر . واعتمدت به أن أبين عن عظيم قدر أمير المؤمنين عليه السلام في هذه الفضيلة ، مضافةً إلى المحاسن الدّثرَة والفضائل الجمة . وأنه عليه السلام انفرد ببلوغ غايتها عن جميع السلف الاولين الَذين إنما يؤثرُ عنهم منها القليل النادر ، والشاذ والشارد، فأما كلامه فهو البحر الذي لا يُساجَل،

Min vîya ez li iftixar kirina bi Imam ‘Elî (s) da evî gotina “**Ferezdeq**” bînim ku dibêjê: ***Ey Cerîr! Evênhe babkên min in, vêca dema em li civata da berhev bûn, eger te karî, yên wekî wa peyda bike.***

Min lê nêrî axiftinên wî selamên Xuda li ser bin sê binyat jê re hene:

1 – Xutbe û ferman û destûrên wî.

2 – Name û nivîsok.

3 – Ĥikmet, şîret û we’z.

Vêca bi arîkarîya Xwedayê Mezin, min despê kir ewil axiftinên wî yên hêjayî û paşê nivîsokên wî yên berketî û paşê jî peyvên wî yên bi Ĥikmet û derheq edeb û adaban da kom kirin. Û min her yêk kir babetek taybet û ji her yêkî ra min hinek per veqetandin da bibê despêk ji bona destve anîna wa gotinên li dest min da neyî û we hebû ku li dahatê da dest min biketa. Dema gotinek ji Wî, derheq got û bêjekî an cewaba pirsyarekî û an tiştek dî biketa destê min ku neketbûya bin çi yêk ji sê babetên me’lûm kirî da, min ew li munasibtirîn cihî da cî dikira. Eger di nav vê ya min bijartî da vebirên ne rêk û pêk û axiftinên ne serheve hebin, ew ji ber vê yêkê ye ku mexseda min ew

والجم الذي لا يحافَل.

وأردت أن يسوغ لي التمثل في الافتخار به عليه السلام بقول **الفرزدق** : أولئك آبائي فجئني بمثلهم إذا جَمَعْتنا يا جرير المجامعُ

ورأيت كلامه عليه السلام يدور على أقطاب ثلاثة : أولها : الخطب والاوامر ، وثانيها : الكتب والرسائل ، وثالثها : الحكم والمواعظ ; فاجمعتُ بتوفيق الله تعالى على الابتداء باختيار محاسن الخطب ، ثم محاسن الكتب ، ثم محاسن الحِكَمَ والادب . مفرداً لكل صنف من ذلك باباً ، ومفصّلاً فيه أوراقاً ، لتكون مقدمة لاستدراك ما عساه يشذ عني عاجلاً ويقع إليّ آجلاً . وإذا جاء شيء من كلامه ـ عليه السلام ـ الخارج في أثناء حوار ، أو جواب سؤال ، أو غرض آخر من الاغراض ـ في غير الانحاء التي ذكرتها ، وقررت القاعدة عليها ـ نسبته إلى أليق الابواب به ، وأشدها ملامحة لغرضه . وربما

bûye ez nukte û xeberdanên wî yên leylander kom bikim û ez hay ji wî qasî nemame ku ez peywend û girêdanê li nav beyna kelamê wî da çêkim.

Yêk ji wan ‘ecîbên li axiftina wî da heyî (s) ku ew li vê çendê da ji yên dî hatîye veqetandin û kesê jê re bibê heval li vê meselê da nîne, ew axiftina wî ye ya derheq “zuhd” û we’z û şîret kirin û emr û nehya da. Dema kesek li ser va axiftinên wî fikr û hizir bikê û dilê xwe varî bikê û ji mejîyê xwe derênê ku ev axiftina kesek giranqedr û ferman qebûl e û hukûmeta wî berfireh e û xelk jê re teslîm in, wê şubhe nekê ku ev axiftina zahidekî tam zahid e ku çi kar xêncî ji ‘ibadet tinehin, û wê yeqîn bikê ev axiftin ya kesekî ye ku tinê li mala xwe da runiştîye û dûrê ji komelê dijî, an jî li şikeftekî da ye ku xêncî dengê xwe çi dengê dî gohlê nebûye û xêncî xwe kes dî nedîtîye û illeh mijûlê ‘ibadet e, û yêkcar wê nekarê bawer bikê ev axiftina kesekî ye ku li zemanê şer da diketa nav behra ‘eskerê dijmin û pehlewan û şervanên bi hêz li ’erdê didan û li vî halî da jî yêk ji zahid û qenc û saliha ye. We evahe ji seratî yên wî yên ‘ecêb û taybetî yên wî yên hûr in, û pê vê yêkê bûye “**Cami’ul Ezdad- tiştên dijê hev li xwe da kom kirine**”.

جاء فيما أختارُهُ من ذلك فصول غير مُتسِقة، ومحاسن كَلِم غير منتظمة ; لاني أورد النكت واللّمع، ولا أقصد التتالي والنسَق.

ومن عجائبه عليه السلام ، التي انفرد بها ، وأمِنَ المشاركةَ فيها ، أن كلامه الوارد في الزهد والمواعظ ، والتذكر والزواجر ، إذا تأمله المتأمل وفكر فيه المتفكر ، وخلع من قلبه أنه كلام مثله ممن عظم قدره ، ونفذ أمره ، وأحاط بالرقاب ملكه ، لم يعترضه الشك في أنه كلام مَنْ لا حَظّ له في غير الزّهادة ، ولا شغل له بغير العبادة ، قد قبع في كسر بيت أو انقطع إلى سفح جبل، ولا يسمع إلا حسّه ، ولا يرى إلا نفسه ، ولا يكاد يوقن بأنه كلامُ من ينغمس في الحرب مصْلِتاً سيفه، فيقُطّ الرقاب ويُجَدِّل الابطال، يعود به يَنْطُفُ دماً ، ويقطر مُهَجاً، وهو مع تلك الحال زاهد الزهاد ، وبدَلُ الابدال. وهذه من فضائله العجيبة ، وخصائصه اللطيفة ، التي جمع بها

Gelek caran min vê derheqê da digel biraderan axiftîye, we min ew ji vê taybetî ya Imam hiştine li nav ‘ecêban da, heqîqet ev e ku evahe cihê ders wergirtin û hizir kirinê ye.

Eger li nav vê bijareyê da carna peyvek an jî me’nayek ducar bûbê, sebebê wê eve ye ku riwayetên di bara axiftinên Imam ‘Elî da gihayîn me, pir ixtilaf têda hene, vêca carna gotinek ji wî gihaye min, min jî ‘eynî wê gotinê anîye, û paşê jî axiftinek dî li wê behsê da gihaye min ku newek riwayeta pêşda bûye, lê belê ji ber wî qasî ku gotinek zêdetir di wê da hebûye û an lefzek sipehîtir têda bûye ji ber wê lazim bûye ez ewê dîsa binivîsim, çêdibê jî, carnan ji ber pê nehesan û ji bîr kirinê bê, û ne ji qestî carek dî hatbê nivîsîn.

Ez evê de’wayê jî nakim ku ez bi axiftinên wî selamên Xwedê lê bin hemîyan hesame û çi axiftin li min nefewitîne û ez dûr nabînim ku ew qasê min nedîtî pitir bê ji ya min dîtî, we ewa li kîskê min da heyî kêmtir bê ji wê ya des min neketî. Lê belê berpirsyarî ya min xebat û pêketinek berfireh bû. We ez ji Xwedayê Pak û Bilind, ronahî kirina rêkê û rênimûnîyê dixwazim.

بين الاضدادوألف بين الاشتات، وكثيراً ما أُذاكر الاخوان بها، وأستخرج عجبهم منهاوهي موضع للعبرة بها ، والفكرة فيها .

وربما جاء في أثناء هذا الاختيار اللفظُ المردد ، والمعنى المكرر ; والعذر في ذلك أن روايات كلامه تختلف اختلافاً شديداً : فربما اتفق الكلام المختار في رواية فنُقِلَ على وجهه ، ثم وُجد بعد ذلك في رواية أخرى موضوعاً غير موضعه الاول : إما بزيادة مختارة ، أو بلفظ أحسن عبارة ، فتقتضي الحال أن يعاد ، استظهاراً للاختيار ، وغَيْرةً على عقائل الكلام. وربما بَعُدَ العهدُ أيضاً بما اختير أولاً فأُعيدَ بعضُه سهواً أو نسياناً ، لا قصداً واعتماداً .

ولا أدعي ـ مع ذلك ـ أني أحيط بأقطارجميع كلامه عليه السلام حتى لا يشذ عني منه شاذ ، ولا يَندّ نادّ. بل لا أبعد أن يكون القاصر عني فوق الواقع إليّ ، والحاصل في رِبْقي دون الخارج من يديّ ; وما عليّ إلا بذل الجهد ، وبلاغ الوسع ، وعلى الله

Piştî xilas bûna kitêbê, min jê re navê “**Nehc-ul belaxe**” munasib zanî, çiko ev kitêb, dergehên belaxetê li ber bînerê xwe vedikê û vîyanên wî jê re nêzîk dikê, seyda û feqî, herdû muhtacê wê ne, ewa mirovê xudan belaxet û ya mirovê zahid dixwazin, herdû têda hene. Li vê kitêbê da axiftinên ‘ecîb derheq “tewhîd” û “‘edl” û “tenzîha Xwedê ji teşbîhê” hene ku têhnîşka mirovê têhn, ji wan dibê û dermanê hemî derda ye û ronahîkerê hemî şubhan.

Ez ji Xwedayê Pak tewfîq û dûrî ya ji şimitînê dixwazim û ez jê dixwazim ku min li vê rêkê da qewî bikê û arîkarê min bê, ez ji ber xeletî ya bîr û hizrê pêşîya xeletî ya ziman û ji ber xeletî ya axiftinê pêşîya xeletî ya gav avêtinê hawara xwe digihînim Xwedê, we ew bes e ji min ra û baş parêzer e ji bo min.[4]

***

سبحانه وتعالى نهج السبيل، وإرشاد الدليل ، إن شاء الله.

ورأيت من بعدُ تسمية هذا الكتاب بـ «**نهج البلاغة**» إذ كان يفتح للناظر فيه أبوابها ، ويقرّب عليه طِلابها ، فيه حاجة العالم والمتعلم ، وبغية البليغ والزاهد ، ويمضي في أثنائه من عجيب الكلام في التوحيد والعدل ، وتنزيه الله سبحانه وتعالى عن شَبَهِ الخلق ، ما هو بِلال كل غلّة وشفاء كل علة وجِلاء كل شبهة.

ومن الله سبحانه أستمد التوفيق والعصمة ، وأتنجّزُ التسديد والمعونة ، واستعيذه من خطأ الجنان ، قبل خطأ اللسان ، ومن زلة الكَلِم ، قبل زلة القدم، وهو حسبي ونعم الوكيل .

***

PIŞKA EWIL

3

بَابُ المخُتَّارِ مِنْ خُطب

مولانا أميرالمؤُمِنين عليّ بن أبي

طالب عليه السلام



وأوامره ونواهيه

وكلامه الجاري مجرى الخطب

والمواعظ في المقامات

المحضورة والمواقف

المذكورة والخطوب الواردة

Xutbe û Axiftinên Imam ‘Elî

Selamên Xwedê lê bin

AXIFTINA 1 – 241

AXIFTINA 1

Di vê xeberdanê da behsa afirandina esman û ‘erd û xuliqandina Adem (s) dikê, her wiha derheq hecc û afirandina melaîketan û bijartina pêğemberan û hinek ji hukmên şer’î da axiftîye.

Sipas hemî bo Xuda ne, ewê bêjer nikarin pesnê Wî bidin û ehlê êjmarê nikarin ni’metên Wî bêjimêrin û xebatker nikarin heqê Wî pêk bînin. Ewê hizrên bilind ewî derk nakin û tîj fêhm nagihênê. Ewê xilasek ji nîşanên Wî ra neyî û (kelîmeyek layiqê) pesn dana Wî tuneyî, ewê wextek bi êjmar û zemanek dîyarkirî jê ra neyî. Mexlûq bi qudreta Xwe çêkir û, ba bi rehmeta Xwe bilav kir û pê tehtan lerizîna ‘erdê Xwe sekinand.

Despêka dîn, naskirna Wî ye û kemala nasîna Wî durist bawerîya bi Wî ye, û kemala durist bawerîyê tek zanîna Wî ye û kemala tek zanîna Wî xwe xalis kirina ji Wî ra ye û kemala xwe xalis kirnê, jê birina sifeta ye ji Wî, çiko her sifetek nîşan didê ku ew (sifet) ne mewsûf e (xweyê sifet) û her mewsûf jî dixweyhênê ku ne sifet e, vêca ew kesê pê wesfekî (wesfê mexlûqa) ji Xwedayê Pak

[1]

من خطبة له عليه السلام يذكر فيها بتداءَ خلق السماء والاَرض، وخلق آدم عليه السلام وفيها ذكر الحج وخلق الملائكة، واختيار الانبياء والاحكام الشرعية

الحَمْدُ لله الَّذَي لاَ يَبْلُغُ مِدْحَتَهُ القَــائِلُونَ، وَلاِ يُحْصِــي نَعْمَــاءَهُ العَــادُّونَ، ولاَ يُــؤَدِّي حَقَّــهُ الُمجْتَهِدُونَ، الَّذِي لاَ يُدْرِكُــهُ بُعْــدُ الهِمَمِ، وَلاَ يَنَالُــهُ غَــوْصُ الفِطَــنِ، الَّذِي لَيْسَ لِصِفَتِهِ حَدٌّ مَحْدُودٌ، وَلاَ نَعْتٌ مَوْجُودٌ، وَلا وَقْــتٌ مَعْــدُودٌ، وَلا أَجَلٌ مَمْــدُودٌ. فَطَــرَ الخَلاِئــقَ بِقُدْرَتِــهَ، وَنَشَــرَ الرِّيَــاحَ بِرَحْمَتِــهِ، وَوَتَّدَ بِالصُّخُورِ مَيَدَانَ أَرْضِهِ.

أَوَّلُ الــدِّينِ مَعْرِفَتُــهُ، وَكَمَــالُ مَعْرِفَتِــهِ التَّصْــدِيقُ بِــهِ، وَكَمَــالُ التَّصْــدِيقِ بِــهِ تَوْحِيــدُهُ، وَكَمَــالُ تَوْحِيــدِهِ الأَخْــلاصُ لَــهُ، وَكَمَــالُ الأَخْلاصِ لَهُ نَفْيُ الصِّــفَاتِ عَنْــهُ، لِشَــهَادَةِ كُــلِّ صِــفَة أَنَّهــا غَيْــرُ

baxivê, ewî heval jê ra çêkirîye û ewê hevalekî jê ra çêkê Ewî dikê cût û ewê Wî cût bikê ewî Ew qet kirîye û yê ewî qet bikê Ew nas nekirîye û yê Wî nas nekê wê tilîya xwe balê ve bikê. Û ewê tilîya xwe balê ve bikê ewî sînor jê re çêkirîye û ewê sînoran jê re çêkê ewî Ew anîye êjmarê. Ewê bêjê "di çi da ye?" Ew daye rex wê, ewê bêjê "li ser çî ye?" Ewî cihek valeyê ji Wî hiştîye.

Ew heye lê ne bi çêbûn, heyîyeke ku tinehî jê ra tunebûye, digel her tiştî ye lê belê ne li kêleka wa da, xêncî her tiştî ye lê belê ne cidayê ji wa ye, karker e lê ne pê bizav û aletan, bîner e ji hingê ve ku mexlûqê lê tê nêrîn tuneyî, tek bûye ji hingê ve hêca kes neyî ku bêhna mirov pê bê û ji ber tunehîya wan mirov bikevê dehşetê.

Mexlûq bi çêkirinekî çêkir û bi despê kirinekî despê kir bêy wê hindê ku nîyaz bi hevpeyvînê hebê û ji tecrubeyekî istifade bikê û hereketek jê çêbê an dil mijûlahîyek ku Ewî perîşan bikê têda peyda bibê. Her tişt li zemanê wê da deyna û tiştên muxtelif digel hev rêk êxistin û ji her tiştekî ra tebî'etek çêkir û ew da digel wan, Ewî pêşîya despê kirnê da agahî pê hebû û hudûd û xilaseka wan zanîya û himber û vîyana wan (meyl û tişta

المَوْصُوفِ، وَشَهَادَةِ كُلِّ مَوْصُوف أَنَّهُ غَيْرُ الصِّفَةِ، فَمَنْ وَصَفَ اللهَ سُبْحَانَهُ فَقَدْ قَرَنَهُ، وَمَنْ قَرَنَهُ فَقَدْ ثَنَّاهُ،وَمَنْ ثَنَّاهُ فَقَد جَزَّأَهُ، وَمَنْ جَزَّأَهُ فَقَدْ جَهِلَهُ، [وَمَنْ جَهِلَهُ فَقَدْ أَشَارَ إِلَيْهِ،] وَمَنْ أَشَارَ إِلَيْهِ فَقَدْ حَدَّهُ، وَمَنْ حَدَّهُ فَقَدْ عَدَّهُ. وَمَنْ قَالَ: «فِيمَ» فَقَدْ ضَمَّنَهُ، وَمَنْ قَالَ: «عَلاَمَ؟» فَقَدْ أَخْلَى مِنْهُ.

كائِنٌ لاَ عَنْ حَدَث[1]، مَوْجُودٌ لاَ عَنْ عَدَم، مَعَ كُلِّ شَيْء لاَ بِمُقَارَنَة، وَغَيْرُ كُلِّ شيء لا بِمُزَايَلَة[2]، فَاعِلٌ لا بِمَعْنَى الْحَرَكَاتِ وَالْآلَةِ، بَصِيرٌ إِذْ لاَ مَنْظُورَ إِلَيْهِ مِنْ خَلْقِهِ، مُتَوَحِّدٌ إِذْ لاَ سَكَنَ يَسْتَأْنِسُ بِهِ وَلاَ يَسْتَوْحِشُ لِفَقْدِهِ.

أَنْشَأَ الخَلْقَ إِنْشَاءً، وَابْتَدَأَهُ ابْتِدَاءً، بِلاَ رَوِيَّة أَجَالَهَا[3]، وَلاَ تَجْرِبَة اسْتَفَادَهَا، وَلاَ حَرَكَة أَحْدَثَهَا، وَلاَ هَمَامَةِ نَفْس[4] اضْطَرَبَ فِيهَا. أَحَالَ الأَشْيَاءَ لأَوْقَاتِهَا، وَلاَمَ[5] بَيْنَ مُخْتَلِفَاتِهَا، وَغَرَّزَ غَرَائِزَهَا[6]، وَأَلْزَمَهَا أَشْبَاحَهَا، عَالِماً بِهَا قَبْلَ ابْتِدَائِهَا، مُحِيطاً بِحُدُودِها وَانْتِهَائِهَا، عَارِفاً بِقَرَائِنِهَا و أَحْنَائِهَا.

ji bona wan lazim) nas dikira.

Paşê Xwedayê bê kêmasî des kelişandina hewayê kir û kêleka asimanê hewayê şeqitand, vêca avekî bûş û pir pêl û serhevda kom bûyî carî kir û ew danî ser bayekî lez û dijwar û pir lerzan û pir deng, vêca ferman dayê ku ewê bizivirênê û ji bona şidandina wê û gihandina wê bo hed û sînorê wê ew li ser wê xûrt kir, hewa li bin wê bayê ra şeqitî û av jî li ser ra fiştikî û carî bû.

Paşê Xwedayê Pak, bayek dî çêkir, bayek sitewr (bê hasil) ji bona hejandin û anîn-birinê, hinartina wê bayê dewam da; bayek dijwar û ji cihek dûr û nedîyar. Vêca ferman da wê bayê ku li ser wê ava pir pêl da bê û pêlên wê behrê hilêxê, wek çawa meşk tê keyandin ew hejand û wek wê baya pêşîya wê vekirî, bi serda hat û ser û binê wê bi ser hevda anî û hemî tevlîhev kir heta kef serket wek serketina nîvişkê meşikê. Vêca ew bilind kir bi alîyê hewayê şeqitîyî û valehîya berfireh ve, û ji wê, heft ‘esman çêkirin, û ‘esmanê jêrê kir pêlek pêşîgir (ji rijhana esmanên seratir) û seratirê wan jî kir banek bo parastina wan û bilindahîyek xweragir, bêy wê çendê ku

---

1. لا عن إيجاد موجد.2. المزايلة: المفارقة والمباينة. 3. الرّويّة: الفكر، وأجالها: أدارها وَرَدَدَها. 4. هَمَامَة النفس: اهتمامها بالامر. 5. لأمَ: قَرَنَ. 6.: أودع فيها طباعها.

ثُمَّ أَنْشَأَ سُبْحَانَهُ فَتْقَ الأَجْـوَاءِ، وَشَقَّ الأَرْجَاءِ، وَسَكَائِكَ[1] الْهوَاءِ، فَأَجازَ فِيهَا مَاءً مُتَلاطِمـاً تَيَّـارُهُ[2]، مُتَراكِماً زَخَّارُهُ، حَمَلَهُ عَلَـى مَـتْنِ الـرِّيحِ الْعَاصِـفَةِ، وَالزَّعْـزَعِ[3] الْقَاصِفَةِ، فَأَمَرَهـا بـرَدِّهِ، وَسَـلَّطَهَا عَلَى شَدِّهِ، وَقَرَنَهَا إِلَى حَدِّهِ، الْهَوَاءُ مِنْ تَحْتِها فَتِيقٌ، وَالمَاءُ مِنْ فَوْقِهَـا دَفِيقٌ.

ثُمَّ أَنْشَأَ سُبْحَانَهُ رِيحـاً اعْـتَقَمَ مَهَبَّهَـا وَأَدَامَ مُرَبَّهَـا[4]، وَأَعْصَـفَ مَجْرَاها، وَأَبْعَـدَ مَنْشَـاهَا، فَأَمَرَهـا بِتَصْفِيقِ المَاءِ الزَّخَّارِ، وَإِثَارَةِ مَوْجِ البِحَارِ، فَمَخَضَتْهُ مَخْـضَ السِّـقَاءِ، وَعَصَفَتْ بِهِ عَصْفَهَا بِالفَضَاءِ، تَـرُدُّ أَوَّلَهُ عَلَى آخِرِهِ، وَسَاجِيَهُ[5] عَلَـى مَائِرِهِ[6]، حَتَّى عَبَّ عُبَابُـهُ، وَرَمَـى بِالزَّبَدِ رُكَامُهُ[7]، فَرَفَعَهُ فِـي هَـوَاءٍ مُنْفَتِقٍ، وَجَوٍّ مُنْفَهِقٍ[8]، فَسَوَّى مِنْـهُ سَبْعَ سَمواتٍ، جَعَلَ سُفْلاَهُنَّ مَوْجاً مَكْفُوفاً، وَعُلْيَاهُنَّ سَـقْفاً مَحْفُوظـاً، وَسَمْكاً مَرْفُوعاً، بِغَيْرِ عَمَدٍ يَدْعَمُهَا

---

1. جمع سُكاكة وهي الهواء الملاقي عنان السماء.

sitûnek hebê heta li ser bê rawestan û bê bizmar ku qetên wê pêkve deynê.

Paşê pê xemla stêran û ronahî ya wan ew (esman) xemiland û li wê da çirayek ronahîker (roj) û heyvek ronahî, êxist kar ku her yêk felekek zivirok û li bilindahîyekî da wek lewheyekî li halê bizavê da hereket dikin.

Firişte: Paşê jî navbira esmanên bilind, vekir; vêca ew pê cûr bi cûrên melaîketên xwe tejî kir:

Hinek daîm di secdê da ne û naçin rukû'ê, hinek daîm di rukû'ê da ne û xwe rast nakin, û hinek bi rêz sekinîne û xwe tev nadin û hinek jî daîm tesbîhan didin û nawestin.

Êkcar xew nakevê çavê wan û xeletî ji wan çênabê û sistî ya bedenê li wan da nayê dîtin û xefleta ji ber jibîr kirinê li wan da peyda nabê.

Hinek ji wan jî emîndar in li ser wehya Wî û axiftinan bo pêxemberên Wî tînin, û hat û çûnê dikin bo anîna qeza û teqdîra Ilahî.

Hinek ji wan jî parêzerê bendeyên Wî ne û komek jî dergehvanê bihiştên Wî.

Hinek ji wan jî pîyên wan li ser 'erdên jêrê ye û stûwê wan bilind bûye bo esmanê jorî û qetên bedena wan ji

2. التيّار- هنا: الموج. 3. الريح الّتي تزعزع كلّ ثابت. 4. مصدر ميمي من أرَبّ بالمكان: لازمه، فالمُرَبّ: المُلازَمة.5. الساجي: الساكن.
6. المائر: الذي يذهب ويجيء. 7. ما تراكم منه بعضه على بعض. 8. المُنفَهِقُ: المفتوح الواسع.

وَلا دِسَار[1] يَنْظِمُها. ثُمَّ زَيَّنَهَا بِزِينَةِ الكَوَاكِبِ، وَضِياءِ الثَّوَاقِبِ[2]، وَأَجْرَى فِيها سِرَاجاً مُسْتَطِيراً[3]، وَقَمَراً مُنِيراً: في فَلَك دَائِر، وَسَقْف سَائِر، وَرَقِيم[4] مَائِر.

الملائكة: ثُمَّ فَتَقَ مَا بَيْنَ السَّمواتِ العُلاَ، فَمَلاَّهُنَّ أَطْواراً مِنْ مَلاَئِكَتِهِ: مِنْهُمْ سُجُودٌ لاَ يَرْكَعُونَ، وَرُكُوعٌ لاَ يَنْتَصِبُونَ وَ صَافُّونَ[5] لاَ يَتَزَايَلُونَ[6] وَمُسَبِّحُونَ لاَ يَسْأَمُونَ، لاَ يَغْشَاهُمْ نَوْمُ العُيُونِ، وَلاَ سَهْوُ العُقُول، وَلاَ فَتْرَةُ الأَبْدَانِ، ولاَ غَفْلَةُ النِّسْيَانِ. وَمِنْهُمْ أُمَنَاءُ عَلَى وَحْيِهِ، وأَلْسِنَةٌ إِلَى رُسُلِهِ وَمُخْتَلِفُونَ بِقَضَائِهِ وَأَمْرِهِ. وَمِنْهُمُ الحَفَظَةُ لِعِبَادِهِ، وَالسَّدَنَةُ[7] لأَبْوَابِ جِنَانِهِ. وَمِنْهُمُ الثَّابِتَةُ في الأَرَضِينَ السُّفْلَى أَقْدَامُهُمْ، وَالمَارِقَةُ مِنَ السَّماء العُلْيَا أَعْنَاقُهُمْ، والخَارِجَةُ مِنَ الأَقْطَارِ أَرْكَانُهُمْ،

1. الدِّسَار: واحدُ الدّسُر، وهي المسَامير.
2. الثّوَاقب: المنيرة المشرقة.

eqtarê ‘erdê derketîye.

(Hinek ji wan) Milê wan munasibê ragirtina ‘erşê Xuda ye; (li bin ‘erşê ilahî da) çavên wa berjêr e û perên (baskên) xwe kom kirine û li xwe pêçane, navbeyna wan û yên dî da navbirên mezinahîyê û perdên qudretê hatine deynan.

Di fikr/xîyalên xwe da bo xudankerê xwe şiklan çênakin û sifetên mexlûqan pêve nadeynin û Ewî li cihekî da mehdûd nakin û bo Wî himberekî çênakin û tilîya xwe balê ve dirêj nakin.

… *Afirandina Adem:* Paşê Xudayê bê kêmasî ji cihê zivr û nermê ‘erdê û ji ‘erdê şîrîn û şûrezar hinek ax hilanî û pê avê şuşt heta xalis bû û tevlî şilahîyê kir heta pêkve zeliqî û ji wê şiklek çêkir xudanê qet û endam û mefselan, ew ziwa kir heta xwe bi heve girt û hişk kir heta wek qafik req bû, evahe li wextek êjmartî û zemanek dîyarkirî da pêk hat.

Paşê ji rihê xwe pif kirê vêca hema di cî da bû mirovek xudan hizr û fikr, hizra xwe têxê kar û pê fikra xwe ji tişta behrê werdigirê. Û dest û pê û qetên dî yên bedenê danê ku li xizmeta xwe da bikar bigirê û hinek wesîle danê ku istifadê jê bikê û me’rîfet (nas kirin) jê re çêkir ku pê wê heq û batil ji hev veqetênê û tama û bêhna û renga û tişta

3. مُسْتَطِيراً: منتشر الضياء، وهو الشمس.
4. الرَّقِيمُ: اسم من اسماء الفلك: سُمّي به لانه مرقوم بالكواكب.
5.: قائمون صفوفاً .6.: لايتفارقون.
7. السَّدَنَة: جمع سَادِن وهو الخادم.

وَالمُنَاسِبَةُ لِقَوَائِمِ العَرْشِ أَكْتَافُهُمْ، نَاكِسَةٌ دُونَهُ أَبْصارُهُمْ، مُتَلَفِّعُونَ تَحْتَهُ بِأَجْنِحَتِهِمْ، مَضْرُوبَةٌ بَيْنَهُمْ وَبَيْنَ مِنْ دُونَهُمْ حُجُبُ العِزَّةِ، وَأَسْتَارُ القُدْرَةِ،

لاَ يَتَوَهَّمُونَ رَبَّهُمْ بالتَّصْوِيرِ، وَلاَ يُجْرُونَ عَلَيْهِ صِفَاتِ المَصْنُوعِينَ، وَلاَ يَحُدُّونَهُ بِالأَمَاكِنِ، وَلاَ يُشِيرُونَ إِلَيْهِ بِالنَّظَائِرِ.

منها: في صفة خلق آدم عليه السلام

ثُمَّ جَمَعَ سُبْحَانَهُ مِنْ حَزْنِ الأَرْضِ وَسَهْلِهَا، وَعَذْبِهَا وَسَبَخِهَا، تُرْبَةً سَنَّهَا بالمَاءِ حَتَّى خَلَصَتْ، وَلاَطَهَا بِالبَلَّةِ حَتَّى لَزَبَتْ، فَجَبَلَ مِنْها صُورَةً ذَاتَ أَحْنَاء وَوُصُول، وَأَعْضَاء وَفُصُول: أَجْمَدَهَا حَتَّى اسْتَمْسَكَتْ، وَأَصْلَدَهَا حَتَّى صَلْصَلَتْ، لِوَقْت مَعْدُود، وَأَجَل مَعْلُوم.

ثُمَّ نَفَخَ فِيها مِنْ رُوحِهِ فَمَثُلَتْ إِنْساناً ذَا أَذْهَان يُجِيلُهَا، وَفِكَر يَتَصَرَّفُ بِهَا، وَجَوَارِحَ يَخْتَدِمُهَا،

nas bikê.

(Ev mirov çêkir ji) Hevîrek ji sirişta rengên cûr bi cûr, hinek wek yêk in; digel hev rêk ketîne û hinek muxalif û dijê hev in, wek germî û sarî, terî û hişkî, nexweşî û keyfxweşîyê. Xwedayê Subhan emanetê ku sipartbû melaîketa ji wan xwest û vîya ew wê soz û qirara dayîn pêk bênin û li beraberê wî (Adem) da biçin secde û ewî mezin ragrin û li beraberê wî da xwe bişkênin.

Vêca Xwedayê Pak got: ***Ji Adem ra herin secde û hemî ketin secdê, xêncî iblîs.*** Ew ser xwe çûbû û bextreşîyê serî jê sitand, xwe mezin kir çiko ji agir çêbûbû û Adem ku ji herîya hişk çêbûbû kêm û heqîr hesab kir, vêca ji ber ku ew bû musteheqê ‘ezabê Ilahî û ji bona kamil kirina imtihanê û pêk anîna qirara, Xuda muhlet dayê û got: ***“Ji bona te muhlet heye heta roj û wextê hatî dîyar kirin”.***

Paşê Xwedayê bê kêmasî, Adem deyna cihek jîyan xweş û rihet. Û hişêdarî dayê ku hay ji iblîs û dijminîya wî hebê, lê dijminê wî dema ew li cihê xweş û hevaletîya wî digel qencan dît, hesed pê bir. Vêca yeqîna xwe bi şikê û irada qewî bi ya sist firût û keyfxweşî bi tirsê goherand û hay jê nemana wî

وَأَدَوَات يُقَلِّبُهَا، وَمَعْرِفَة يَفْرُقُ بِهَا بَيْنَ الحَقِّ وَالبَاطِلِ، والاَذْوَاقِ والَمشَامِّ، وَالأَلوَانِ وَالأَجْنَاس.

مَعْجُوناً بِطِينَةِ الأَلوَانِ الُمخْتَلِفَةِ، وَالاَشْبَاهِ المُؤْتَلِفَةِ، وَالأَضْدَادِ المُتَعَادِيَةِ، والأَخْلاطِ المُتَبَايِنَةِ، مِنَ الحَرِّ والبَرْدِ، وَالبَلَّةِ وَالْجُمُودِ، وَالْمَساءَةِ وَالسُّرُور.

وَاسْتَأْدَى اللهُ سُبْحَانَهُ المَلائكَةَ وَدِيعَتَهُ لَدَيْهِمْ[1] وَعَهْدَ وَصِيَّتِهِ إِلَيْهِمْ، في الأَذْعَانِ بالسُّجُودِ لَهُ، وَالخُنُوعِ لِتَكْرِمَتِهِ، فَقَالَ عَزَّمِن قائِل: (اسْجُدُوا لادَمَ فَسَجَدُوا إلاَّ إبْلِيسَ) وَقَبِيلَهُ، اعْتَرَتْهُمُ الحَمِيَّةُ، وَغَلَبَتْ عَلَيْهِمُ الشِّقْوَةُ، وَتَعَزَّزُوا بِخِلْقَةِ النَّار، وَ اسْتَوْهَنُوا خَلْقَ الصَّلْصَال، فَأَعْطَاهُ اللهُ تعالَى النَّظِرَةَ اسْتِحْقَاقاً لِلسُّخْطَةِ، وَاسْتِتْماماً لِلْبَلِيَّةِ، وَإِنْجَازاً لِلْعِدَةِ، فَقَالَ: إِنَّكَ مِنَ الُمنْظَرِينَ إِلَى يَوْمِ الْوَقْتِ الْمَعْلُوم. ثُمَّ أَسْكَنَ سُبْحَانَهُ آدَمَ دَاراً أَرْغَدَ فِيهَاعَيْشَهُ، وَآمَنَ فِيهَا مَحَلَّتَهُ، وَحَذَّرَهُ إِبْلِيسَ وَعَدَاوَتَهُ، فَاغْتَرَّهُ عَدُوُّهُ نَفَاسَةً عَلَيْهِ بِدَارِ الْمُقَامِ، وَمُرَافَقَةِ الأَبْرَارِ، فَبَاعَ الْيَقِينَ بِشَكِّهِ، وَالعَزِيمَةَ بِوَهْنِهِ، وَاسْتَبْدَلَ

pûşmanî pêve hat.

Paşê Xuda derîyê tewbê lê vekir, kelîma rehma xwe nîşa wî kir û we'da zivirîna bihiştê dayê, vêca ew ji cihê imtihanê û çêbûna zurîyetê ra hinart xwarê.

Xwedayê Subhan ji nav zarokên wî hinek Pêğember bijartin, û soz ji wan sitand ku wehya Wî raghênin û li ser risaleta Wî emanetdar bin. Dema zêdetirê xelkê soza Xwedê digel wan heyî goherandîn vêca ji naskirina heqê Wî paşve mayîn û himber jê re çêkirîn û xwe bi wan girtîn û şeytanan berê wan ji naskirina Wî zivirandîn û ew ji perestina Wî vekirîn, hingê Pêğemberên xwe hinartin nav wan.

Pêğember pey hev re dihatan da ji xelkê bixwazin ewê qirara sirişta wan li ser hatî ava kirin pêk bînin û ewan ni'metên hatîn jibîr kirin bênin bîra wan. Û pê ragehandinan, delîlê li ser wan temam bikin û xezînên 'eqlan li ber wan vekin û nîşanên qudreta Xwedê bi wan bidin dîtin, wek:

Banê bilindê li raserê wan hatî çêkirin (esman) û ew mehdika li bin wa da hatî deynan ('erd) û ew wesîlên jîyanê ku ewa sax dihêlin û ew wextên dîyarkirî ku dibin sebebê ji beyn çûna wan û ew tengasî û nexweşîyên dibin hegera pîratî ya wan û ew qewimînên

بِالْجَذَلِ وَجَلاً[1]، وَبِالأُغْتِرَارِ نَدَماً.

1. اسْتَأْدَى الله وديعَتَهُ: طالبهم بأدائها.
2. الجَذَل: الفرح. الوَجَل: الخوف.

ثُمَّ بَسَطَ اللهُ سُبْحَانَهُ لَهُ فِي تَوْبَتِهِ، وَلَقَّاهُ كَلِمَةَ رَحْمَتِهِ، وَوَعَدَهُ المَرَدَّ إِلَى جَنَّتِهِ، فَأَهْبَطَهُ إِلَى دَارِ البَلِيَّةِ، وَتَنَاسُلِ الذُّرِّيَّةِ.

وَاصْطَفَى سُبْحَانَهُ مِنْ وَلَدِهِ أَنْبِيَاءَ أَخَذَ عَلَى الْوَحْيِ مِيثَاقَهُمْ وَعَلَى تَبْلِيغِ الرِّسَالَةِ أَمَانَتَهُمْ، لَمَّا بَدَّلَ أَكْثَرُ خَلْقِهِ عَهْدَ الله إِلَيْهِمْ، فَجَهِلُوا حَقَّهُ، واتَّخَذُوا الأَنْدَادَ[1] مَعَهُ، وَاجْتَالَتْهُمُ[2] الشَّيَاطِينُ عَنْ مَعْرِفَتِهِ، وَاقتَطَعَتْهُمْ عَنْ عِبَادَتِهِ.

فَبَعَثَ فِيهِمْ رُسُلَهُ، وَوَاتَرَ إِلَيْهِمْ أَنْبِياءَهُ، لِيَسْتَأْدُوهُمْ[3] مِيثَاقَ فِطْرَتِهِ، وَيُذَكِّرُوهُمْ مَنْسِيَّ نِعْمَتِهِ وَيَحْتَجُّوا عَلَيْهِمْ بَالتَّبْلِيغِ، وَيُثِيرُوا لَهُمْ دَفَائِنَ الْعُقُولِ، وَيُرُوهُمْ آيَاتِ الْمَقْدِرَةِ: مِنْ سَقْف فَوْقَهُمْ مَرْفُوع، وَمِهَاد تَحْتَهُمْ مَوْضُوع، وَمَعَايِشَ تُحْيِيهِمْ، وَآجَال تُفْنِيهِمْ، وَ أَوْصَاب[4] تُهْرِمُهُمْ، وَأَحْدَاث تَتَابَعُ عَلَيْهِمْ.

1. الأنْدَادُ: الامْثَال، وأراد المعبودين من دونه

ku pê hevra li ser wan da tên.

Û Xweda mexlûqê xwe nehiştîye bê Pêğember, an kitêba (ji ‘esmana) hatî xarê, an delîlek birra an rêyek rast.

Pêğemberên wereng ku kêm bûna wan û pir bûna wayên dijatî digel wan dikiran nebû heger ku kêmasîyê bêxin karê xwe. Hinek ji wan, ewên paş wan hatîn ji wan axiftine, û hinek jî yên ku derbaz bûne ewên pêş wan da ew dane nas kirin.

Li ser vê rêbazê sede (qern) û zemanên dirêj derbaz bûn û bab çûn û kor ketin şûna wan da heta ku Xwedayê bê kêmasî “Muhemmed Resûlullah” selat û selam lê bin ji bona pêk anîna we’da xwe û temam kirina pêğemberîyê hinart, ev li wî halî da bû ku ji bona wî ji pêğemberan qirar hatbûn girtin. Nîşanên wî meşhûr bûn û berketî hat dinyayê.

Hingê xelkê li ser rûyê ‘erdê li pey dîn û ayînên cûr bi cûr û xwestên bilave û rêkên ji hev cida bûn. Hineka Xuda wek mexlûqên Wî hesab dikran, hineka berê xwe ji navê Xwedê zivirandibî û hineka jî berê xwe dabî xêncî Xwedê. Vêca pê wî ew ji rê windabûnê derêxistin û ji nezanîyê xilas kirin.

Paşê Xwedayê bê kêmasî ji bona (hz.) Muhemmed selat û selam lê bin nêzîk bûna xwe bijart û ji wî ra bi wê ya li bal xwe razî bû; qedrê wî girt û berê wî ji

سبحانه.

2. اجْتَالَتْهُمْ بالجيم: صرفتهم عن قصدهم.

3. وَاتَرَ إليهم أنبياءهُ: أرسلهم وبين كل نبيّ ومَن بعده فترة، وقوله «لِيَسْتَأدُوهُمْ»: ليطلبوا الاداء.**4**. الاوْصَاب: المتاعب.

وَلَمْ يُخْلِ اللهُ سُبْحَانَهُ خَلْقَهُ مِنْ نَبِيٍّ مُرْسَل أَوْ كِتَاب مُنْزَل أَوْ حُجَّة لاَزِمَة أَوْ مَحَجَّة قَائِمَة.

رُسُلٌ لا تُقَصِّرُ بِهِمْ قِلَّةُ عَدَدِهِمْ، وَلاَ كَثْرَةُ المُكَذِّبِينَ لَهُمْ: مِنْ سَابِق سُمِّيَ لَهُ مَنْ بَعْدَهُ، أَوْ غَابِر عَرَّفَهُ مَنْ قَبْلَهُ.

عَلَى ذَلِكَ نَسَلَتِ القُرُونُ، وَمَضَتِ الدُّهُورُ، وَسَلَفَتِ الأَبَاءُ، وَخَلَفَتِ الأَبْنَاءُ.

إِلَى أَنْ بَعَثَ اللهُ سُبْحَانَهُ مُحَمَّدا صلى الله عليه وآله **لِإِنْجَازِ عِدَتِهِ وَتَمامِ نُبُوَّتِهِ، مَأْخُوذاً عَلَى النَّبِيِّينَ مِيثَاقُهُ، مَشْهُورَةً سِمَاتُهُ، كَرِيماً مِيلادُهُ.**

وَأَهْلُ الأَرْضِ يَوْمَئِذ مِلَلٌ مُتَفَرِّقَةٌ، وَأَهْوَاءٌ مُنْتَشِرَةٌ، وَطَرَائِقُ مُتَشَتِّتَةٌ، بَيْنَ مُشَبِّه لله بِخَلْقِهِ، أَوْ مُلْحِد فِي اسْمِهِ، أَوْ مُشِير إِلَى غَيْرِهِ، فَهَدَاهُمْ بِهِ مِنَ الضَّلاَلَةِ، وَأَنْقَذَهُمْ بِمَكانِهِ مِنَ الجَهَالَةِ.

vê dinyaya têr bela û nexweşî zivirand, vêca bi kerema xwe bir bal xwe û ew tişta pêğembera paş xwe ve li nav ummetên xwe da dihiştan li nav hewe da hişt, çiko çi pêğemberekî ummeta xwe ser beredayî, bê rêkek ronahî û nîşanek vedayî paş xwe ve nehiştine.

Eve kitêba Rebbê hewe li nav hewe da ye, helal û heramê Wî û ferz û sunnet û nasix û mensûx hatine beyan kirin û kifş kirîye kanê çi kar "mubah"in û kîjan lazim e mirov bikê "xas û 'umûm" şîret û misal û hukmên dewam dikin û hukmên bi sînorekî ve girêdayî û muhkem û "muteşabih" hemî têda kifş kirine. Her mucmelek (gotina kurt ku zanîna me'na wê muhtacê tefsîrê bê) şerh kirîye û nedîyarên wê ronahî kirîye.

Hene ku bo zanîna wan soz hatîye girtin û hinek jî ji bona nezanîna wê izn hatîye dayîn, hinek Ĥukum li kitêba Xwedê da hatine wacib kirin û li sunnetê da "nesx" a wê kifş bûye. Hinek Ĥukum li sunnetê da hatine wacib kirin, lê di kitêbê da ji ne kirina wê ra izn hatîye dayîn, her wiha hinek kiryar li zemanê xwe da wacibin û dema wextê wan derbaz bibê wacibî ya wan jî ji nav diçê.

Heramên Wî jî digel hev ferq in, hinek gonehên mezin in ku Xwedê li beraberê kirna wan da we'da agir daye, û hinek jî yên biçok in ku bexşîna xwe li ber vedaye. Hinek jî kêmê wê qebûl dibê û li

ثُمَّ اخْتَارَ سُبْحَانَهُ لِمحَمَّد صلى الله عليه لِقَاءَهُ، وَرَضِيَ لَهُ مَا عِنْدَهُ، فَأَكْرَمَهُ عَنْ دَارِالدُّنْيَا، وَرَغِبَ بِهَ عَنْ مُقَارَنَةِ البَلْوَى،

فَقَبَضَهُ إِلَيْهِ كَرِيماً، وَخَلَّفَ فِيكُمْ مَا خَلَّفَتِ الأَنْبِيَاءُ في أُمَمِهَا، إِذْ لَم يَتْرُكُوهُمْ هَمَلاً، بِغَيْر طَرِيق واضِح، ولاعَلَم قَائِم.

القرآن والاحكام الشرعية

كِتَابَ رَبِّكُمْ [فِيكُمْ:] مُبَيِّناً حَلاَلَهُ وَحَرامَهُ، وَفَرَائِضَهُ وَفَضَائِلَهُ، وَنَاسِخَهُ وَمَنْسُوخَهُ، وَرُخَصَهُ وَعَزَائِمَهُ، وَخَاصَّهُ وَعَامَّهُ، وَعِبَرَهُ وَأَمْثَالَهُ، وَمُرْسَلَهُ وَمَحْدُودَهُ، وَمُحْكَمَهُ وَمُتَشَابِهَهُ، مُفَسِّراً جُمَلَهُ، وَمُبَيِّناً غَوَامِضَهُ.

بَيْنَ مَأْخُوذ مِيثَاقُ عِلْمِهِ، وَمُوَسَّع عَلَى العِبَادِ في جَهْلِهِ، وَبَيْنَ مُثْبَت في الكِتابِ فَرْضُهُ، وَمَعْلُوم في السُّنَّةِ نَسْخُهُ، وَوَاجب في السُّنَّةِ أَخْذُهُ، وَمُرَخَّص في الكِتابِ تَرْكُهُ، وَبَيْنَ وَاجِب بِوَقْتِهِ، وَزَائِل فِي

kirna zehftirê da jî azad in.

… Derheqê hecê da: Zîyareta mala xwe, ewa ji bona xelkê kirî qible, li ser hewe ferz kir, bi vîyan diçnê wek têhnî ya ku diçin ser avê[5] û wek kevokan dema diçin hêlînê. Xweda ew kirye nîşana xwe şikandinê li beraberê meznahî ya xwe da, her wiha wesîleyeke ji bona iqrara bi ‘ezemeta ilahî.

Û ji nav mexlûqê xwe hinek gohdar bijartin ku fermana wî gohlê dibin û gotina wî tesdîq dikin û pîyê xwe datînin cihê pîyê Pêğemberan û xwe wek wa melaîketa lê dikin ewên li dûra ‘erşê wî dizivirin. Li bazara bendeyî yê da feydeyek zehfî bi dest xwe ve tînin û ji bona gehiştina we’dgeha bexşîna ilahî lezê dikin.

Xwedayê pak hec kir nîşana Islamê û cihek emn bo penahberan, zîyareta mala xwe ferz kir û pêk anîna heqê wê wacib kir û çûna wê derê li ser hewe nivîsî, Xwedayê bê kêmasî kerem kirîye:

“Zîyareta wê malê ji bona Xwedê li ser wa kesên bikarin biçin ê lazim e. Û her kesê inkar bikê vêca (bila bizanê) bi rastî Xuda ne muhtacê cihanîya ye”.[6]

مُسْتَقْبِلِهِ، وَمُبَايَنٌ بَيْنَ مَحَارِمِهِ، مِـنْ كَبير أَوْعَدَ عَلَيْهِ نيرَانَـهُ، أَوْ صَـغِير أَرْصَدَ لَهُ غُفْرَانَهُ، وَبَيْنَ مَقْبُول فـي أَدْنَاهُ، ومُوَسَّع في أَقْصَاهُ.

في ذكر الحج: وَفَرَضَ عَلَـيْكُمْ حَجَّ بَيْتِهِ الحَرَامِ، الَّذِي جَعَلَهُ قِبْلَـةً لِلأَنَـام، يَرِدُونَـهُ وُرُودَ الأَنْعَـام، وَيَأْلَهُونَ إِلَيْهِ وُلُوهَ الحَمَام.

جَعَلَهُ سُبْحَانَهُ عَلاَمَةً لِتَوَاضُعِهِمْ لِعَظَمَتِهِ، وَإِذْعَانِهِمْ لِعِزَّتِهِ.

وَاخْتَارَ مِنْ خَلْقِهِ سُمَّاعاً أَجَابُوا إِلَيْـهِ دَعْوَتَـهُ، وَصَـدَّقُوا كَلِمَتَـهُ، وَوَقَفُوا مَوَاقِفَ أَنْبِيَائِـهِ، وَتَشَـبَّهُوا بِمَلاَئِكَتِـهِ المُطِيفِـينَ بِعَرْشِـهِ، يُحْرِزُونَ الأَرْبَاحَ فِي مَتْجَرِ عِبَادَتِهِ، وَيَتَبَادَرُونَ عِنْدَهُ مَوْعِدَ مَغْفِرَتِهِ.

جَعَلَهُ سُبْحَانَهُ لِلاِسْلاَمِ عَلَمـاً، وَلِلْعَائِذِينَ حَرَمـاً، فَـرَضَ حَجَّـهُ، وَأَوْجَـبَ حَقَّـهُ، وَكَتَـبَ عَلَـيْكُمْ وِفَادَتَهُ[1]، فَقَالَ سُبْحَانَهُ: وَلِلّه عَلَـى النَّاسِ حِجُّ الْبَيْتِ مَنِ اسْتَطَاعَ إِلَيْـهِ سَبِيلاً وَمَنْ كَفَرَ فَإِنَّ اللهَ غَنِـيٌّ عَـنِ العَالَمِينَ.

AXIFTINA 2

Paş zivirîna ji Siffînê ev axiftin kirye. Axiftinek ‘eqîdetî, tarîxî û sîyasî ye:

Ez hemdê Wî dikim ji bona temam bona ni’meta Wî û teslîm bona li beraberê mezinahîya Wî da û parastina min ji gonehan. Ez arîkarîyê ji Wî dixwazim ku ihtîyac û nîyaza min hilînit, bi rastî ewê ew wî hidayet bikê ti cara (qet) li rêkê winda nabê û ewê ew dijminîyê digel bikê penah û xilasî jê re tinehin û ewê ew ihtîyacî yên wî pêk bênê ti cara nedar nabê, vêca bi rastî ew (hemdê Xwedê) girantirîn û seratirîn tişt e.

Ez şehde didim (dibêjim û bawer dikim) ku xêncî “Ellah” tu ilah nînin, ew tek e û şirîk jê ra tinehin, ev şehdeyî ya min bi ixilas e ku hatîye imtihan kirin û hevrê ye digel pakîya niyetê. Her û her û heta em hebin emê li ser vê bawerîyê bin û ji bona roja tirsê ewa li berahîya me heyî emê ji xwe ra zexîre bikin. Şehde dana bi vî awayî nîşana bawerîya bi vîyan e û despêka qencîyê û razî bona Xwedê û dûr kirina şeytan e.

Ez şehde didim ku Muhemmed bende û resûlê Wî ye, ku ew digel dînê

---

1. الوِفَادَة: الزيارة.

[2]

ومن خطبة له عليه السلام بعد انصرافه من صفين وفيها حال الناس قبل البعثة وصفة آل النبي ثمّ صفة قوم آخرين

من خطبة له عليه السلام

وهي كلمة جامعة له

وَلَعَمْرِي مَا عَلَيَّ مِنْ قِتَالِ مَنْ خَالَفَ الحَقَّ، وَخَابَطَ الغَيَّ، مِنْ إِدْهَان وَلاَ إِيهَان.

فَاتَّقُوا اللهَ عِبَادَ اللهِ، وَفِرُّوا إِلَى اللهِ مِنَ اللهِ، وَامْضُوا فِي الَّذِي نَهَجَهُ لَكُمْ، وَقُومُوا بِمَا عَصَبَهُ بِكُمْ، فَعَلِيٌّ ضَامِنٌ لِفَلْجِكُمْ آجِلاً، إِنْ لَمْ تُمنَحُوهُ عَاجِلاً.

[25]

ومن خطبة له(عليه السلام)

وقد تواترت عليه الأخبار باستيلاء أصحاب معاوية على البلاد، وقدم عليه عامله على اليمن ـ وهما عبيدالله بن العباس وسعيد بن نمران ـ لمّا غلب عليها بُسْرُ بن أبي أَرْطَاة، فقام(عليه السلام) إلى المنبر ضجراً بتثاقل أَصحابه عن الجهاد، ومخالفتهم له في الرأي، وقال:

مَاهِي إِلاَّ الكُوفَةُ، أَقْبِضُهَا

min da bê, nixwe Xwedê te kirêt bikê! *Vêca ev şi'r xwend: Ez bi canê babê te yê qenc kim ey 'Emr! Xêncî ewa bi binê tasikê ve mayî ji min re nemaye.*

Paşê got: Xeber gihaye min ku "Bosr"[17] hêriş birîye ser Yemenê û girtîye, wellahî ez guman dikim ew millet xalib bibin ser hewe, çiko ewan li ser batilê xwe tifaq kirne û hûn li ser heqî ya xwe bê tifaq in, û hûn ji Imam û pêşkarê xwe yê heq ra negohdar in û ew fermana pêşkarê xwe yê li ser batilî rêve dibin; ewa emanet teslîmê reîsê xwe kirin û hewe xîyanet kir; ewa welatê xwe ava kir û hewe xirab kir, vêca eger ez satilê bispêrim hewe tirsa min ji wê ye ku çenbilê wê ji dest biçê.

Ey Xuda! Bi rastî min dilê wan şikênand (şikand) û ewa jî dilê min şikand, û min ew westandin û ewa jî ez westandim, vêca tu ewan ji min re bigoherîne bi baştirê ji wan û tu min jî ji wan bistîne û xirabtirê bide wan, ya Xuda! Tu dilê wan bihelîne wek çawa xwê li nav avê de dihelihê, xwezka ji xêra Xwedê ra, min şûna hewe (Kûfîya) de hezar mêrbaşên ji "qebîla Benî Ferasê korê Xenem" hebûna.[18] *Eger te gazî bikira wê bilez û bez bihatan bal*

وَأَبْسُطُهَا إِنْ لَمْ تَكُونِي إِلاَّ أَنْتِ، تَهُبُّ أَعَاصِيرُك، فَقَبَّحَكِ اللهُ!

وتمثّل:

لَعَمْرُ أَبِيكَ الخَيْرِ يَا عَمْرُو إِنَّنِي
عَلَى وَضَرٍ ـ مِنْ ذَا الأْنَاءِ ـ قَلِيلِ

ثم قال عليه السلام: أَنْبِئْتُ بُسْراً قَدِ اطَّلَعَ اليَمنَ وَإِنِّي وَاللهِ لاَظُنُّ هؤُلاءِ القَوْمَ سَيُدَالُونَ مِنْكُمْ بِاجْتِماعِهِمْ عَلَى بَاطِلِهِمْ وَتَفَرُّقِكُمْ عَنْ حَقِّكُمْ وَبِمَعْصِيَتِكُمْ إِمَامَكُمْ في الحَقِّ وَطَاعَتِهِمْ إِمَامَهُمْ في البَاطِلِ، وَبِأَدَائِهِمُ الأَمَانَةَ إِلَى صَاحِبِهِمْ وَخِيَانَتِكُمْ، وَبِصَلاَحِهِمْ في بِلاَدِهِمْ وَفَسَادِكُمْ، فَلَو ائْتَمَنْتُ أَحَدَكُمْ عَلَى قَعْبٍ لَخَشِيتُ أَنْ يَذْهَبَ بِعِلاَقَتِهِ.

اللَّهُمَّ إِنِّي قَدْ مَلِلْتُهُمْ وَمَلُّوني، وَسَئِمْتُهُمْ وَسَئِمُوني، فَأَبْدِلني بِهِمْ خَيْراً مِنْهُمْ،وأَبْدِلْهُمْ بِي شَرًّا مِنِّي، اللَّهُمَّ مِثْ قُلُوبَهُمْ كَمَا يُمَاثُ الْمِلْحُ فِي الْمَاءِ، أَمَاوَاللهِ لَوَدِدْتُ أَنَّ لِي بِكُمْ أَلفَ فَارِسٍ مِنْ بَنِي فِرَاسِ بْنِ غَنْمٍ:

هُنَالِكَ، لَوْ دَعَوْتَ، أَتَاكَ مِنْهُمْ
فَوَارِسُ مِثْلُ أَرْمِيَةِ الحَمِيمِ

te ji wan mêr başan, wek ‘ewrê havînan.

Paşê Imam ji ser minberê hat xwarê.

***(Seyidê Rezî** li ser kelîme û me’na şi’rê axiftîye, ji ber ku me ew şi’r wek me’ne kirina wî me’ne kir, êdî tercuma axiftina Seyid Rezî me lazim nezanî)*

۞ AXIFTINA 26 ۞

Li vê axiftinê de behsa ‘Erebên pêş hatina Pêğember (s) û her wiha pêş bey’eta digel xwe dikê (sala 38 h. Paş kuştina Muhemed bin Ebûbekir).

Bi rastî Xwedê hezretê Muhemmed selat û selamên Xwedê li ser bin, pê navê hişyarkerê alemê û emînê li ser wehyê hinart, û li wê halî da hûnên ‘Ereb li ser pîstirîn rêçkê û li pîstirîn avahî ya dabîn, û hûn li nav reqe ber û kûre mara da dijîyan, uhewe ava şêlû vedixara û xarina nexweş dixara, hewe xûna yêkdu dirjanda û heqê mirovanî yê pêk natanîya, pût li nav hewe da vedayî bîn (û pût perêsî li nav hewe da gelek berfireh bî) û goneh pir ji hewe çêdibîyan.

... Behsa pêşîya bey’et kirina digel Imam ‘Elî: Vêca min berê xwe dayê wekî min dît xêncî binemala min kes dî digel min nîne, vêca min nevîya ew bimirin û min çavê xwe nuqand li wî halî da ku qirş têda bû û min av li ser hestî yê mayî gerîyê dakir, û min li ser

ثم نزل(عليه السلام) من المنبر.

قلتُ أنا: والارمية جمع رَمـيٍّ وهـو: السحاب، والحميم في هـذا الموضـع: وقت الصيف، وإنما خصّ الشاعر سحاب الصيف بالذكر لانه أشد جفولاً، وأسـرع خُفوفاً، لانـه لا مـاء فيـه، وإنمـا يكـون السحاب ثقيـل السـير لامتلائـه بالمـاء، وذلـك لا يكـون فـي الاكثـر إلا زمـان الشـتاء، وإنمـا أراد الشـاعر وصـفهم بالسرعة إذا دُعوا، والاغاثة إذا استغيثوا، والدليل على ذلـك قولـه: «هنالـك، لـو دعوت، أتاك منهم...».

[26]

[وفيها يصف العرب قبل البعثة ثم يصف حاله قبل البيعة له]

إِنَّ اللهَ سُـبحانَه بَعَـثَ مُحَمَّـداً نَـذِيراً لِلْعَـالَمِينَ، وَأَمِينـاً عَلَـى التَّنْزِيلِ، وَأَنْتُمْ مَعْشَرَ العَرَبِ عَلَـى شَرِّ دِين، وَفِي شَـرِّ دَار، مُنِيخُـونَ بَيْنَ حِجارَة خُشْن، وَحَيَّات صُـمٍّ، تشْرَبُونَ الكَدِرَ، وَتَأْكُلُونَ الجَشِبَ، وَتَسْـفِكُونَ دِمَـاءَكُمْ، وَتَقْطَعُـونَ أَرْحَامَكُمْ، الأَصْنَامُ فِيكُمْ مَنْصُـوبَةٌ، وَالآثَامُ بِكُمْ مَعْصُوبَةٌ.

منها: نَظَرْتُ فَإِذَا لَيْسَ لِي مُعِـينٌ إِلاَّ أَهْلُ بَيْتِـي، فَضَـنَنْتُ بِهِـمْ عَـنِ المَـوْتِ، وَأَغْضَـيْتُ عَلَـى القَـذَى،

wê xenqînê û li ser wê tehlî ya tehltir ji tama henzel (‘elqem) ê sebir kir.

Hinek dî ji vê axiftinê: (‘Emrê As digel Mu’awîye) Bey’et nekir ne heta li ser şert kir ku li beraberê wêda bihayekî wergirê, ewê firûtî feyde nebir û ewê kiryî jî zelîl bî, vîca hûn hazirê şer bibin bi hazirîyek temam, û baş baş xwe jê re pêk bênin, çiko bi rastî eve agirê şer pê bûye û pêta wî bilind bûye û sebir bikin û xwe ragirin çiko bi rastî sebir û xwe ragirî gazîkerê serketinî ye.

۞ AXIFTINA 27 ۞

Dema leşkerê Mu’awîye, ser bajarê Enbarê da girt (38 h.) û xelkê xwe ji cihadê sist kir.[19]

... Cihad derîyeke ji derîyên bihiştê ku Xuda li ber bendeyên xwe yên xas û taybet vekirîye. Cihad cilkê teqwayê û zirhê qewî û mertalê cihê bawerîyê yê Xudayî ye. Kesê berê xwe jê bizivirênê û ewê terk bikê Xwedê wê cilkê zelîlî yê bikê ber da û wê bela ser da bên û rezîl û kêm bibê û dilê wî bê perde kirin û wê ji ber pêk neanîna cihadê ji heqî yê dûr bikevê û wê bikevê nav zehmetê re û ji ‘idaletê bê dûr kirin.

Şev û roj, xef û eşkere min hûn gazî

وَشَرِبْتُ عَلَى الشَّجَا، وَصَبَرْتُ عَلَى أَخْذِ الكَظَمِ وَعَلَىٰ أَمَرَّ مِنْ طَعْمِ العَلْقَمِ.

ومنها: وَلَمْ يُبَايِعْ حَتَّى شَرَطَ أَنْ يُؤْتِيَهِ عَلَى البَيْعَةِ ثَمَناً، فَلاَ ظَفِرَتْ يَدُ المبايِعِ، وخَزِيَتْ أَمَانَةُ المُبْتَاعِ، فَخُذُوا لِلْحَرْبِ أُهْبَتَهَا، وَأَعِدُّوا لَهَا عُدَّتَهَا، فَقَدْ شَبَّ لَظَاهَا، وَعَلاَ سَنَاهَا، وَاسْتَشْعِرُوا الصَّبْرَ، فَإِنَّهُ أَحْزَمُ لِلنَّصْرِ.

[27]

ومن خطبة له عليه السلام **وقد قالها يستنهض بها الناس حين ورد خبر غزوالانبار بجيش معاوية فلم ينهضوا.**

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنَّ الجِهَادَ بَابٌ مِنْ أَبْوَابِ الجَنَّةِ، فَتَحَهُ اللهُ لِخَاصَّةِ أَوْلِيَائِهِ، وَهُوَ لِباسُ التَّقْوَى، وَدِرْعُ اللهِ الحَصِينَةُ، وَجُنَّتُهُ الوَثِيقَةُ، فَمَنْ تَرَكَهُ رَغْبَةً عَنْهُ أَلْبَسَهُ اللهُ ثَوْبَ الذُّلِّ، وَشَمِلَهُ البَلاَءُ، وَدُيِّثَ بِالصَّغَارِ وَالقَمَاءَةِ، وَضُرِبَ عَلَى قَلْبِهِ بِالاِسْهَابِ، وَأُدِيلَ الحَقُّ مِنْهُ

kirin bo şerê di gel vî qewmî û min got hewe: Hêrişê bibin ser wan pêşîya ku ew hêrişê bînin ser hewe. Sond bi Xwedê, çi millet nîne ku li nîveka mala wan de hêriş bê ser wan û vêca ew zelîl nebin, hewe cihad paşve da û her yêk ji hewe ew hişt hêvîya yê dîve û hewe arîkarî ya hevdû nekir heta ku her tişt ji dest hewe çû û welatê hewe dagîr bû.

Eve zelamê Xamidî gel leşkerê xwe ket "**Enbar**ê" û Hesanê korê Hesanê Bekrî kuşt û parêzerên serhedên hewe paşve dane.

Xeber giha min ku mêrikek ji wan ser jina musliman da çûye û yêk biser jinika "zimmî" de çûye û xelxal û bazin û ristik û goharên wan ji wan vekirine û birine. Wa jî xêncî xwe reben kirin û girînê û gotina ***inna lillah we inna îleyhi raci'un***ê tiştek dî jê nehatîye. Paşê jî ew hemî pêkve û bê kêmbon zivirîne bê wê ku yêk ji wan bê birîndar kirin an dilûpek xwîn ji wan bê rijandin. Vêca bi rastî eger kesek musliman paş vê qewmînê ji kol û mereqan bimirê çi lome lê nayîn kirin û belkî musteheqe ku bimrê.

Ey 'ecêbê ey 'ecêbê! Wellahî, hev girtina wan li ser batil û cidahî ya hewe ji heqîyê dil dimrênê û kul û mereqan ser mirov da dibarênê, piştî ku hûn bûne kêlik ji bû tîr û beran, qedav bi hewe

بِتَضْيِيعِ الجِهَادِ، وَسِيمَ الخَسْفَ، وَمُنِعَ النَّصَفَ.

أَلاَ وَإِنِّي قَدْ دَعَوْتُكُمْ إِلَى قِتَالِ هؤُلاَءِ القَوْمِ لَيْلاً وَنَهَاراً، وَسِرّاً وَإِعْلاَناً، وَقُلْتُ لَكُمُ: اغْزُوهُمْ قَبْلَ أَنْ يَغْزُوكُمْ، فَوَاللهِ مَا غُزِيَ قَوْمٌ قَطُّ فِي عُقْرِ دَارِهِمْ إِلاَّ ذَلُّوا، فَتَوَاكَلْتُمْ وَتَخَاذَلْتُمْ حَتَّى شُنَّتْ عَلَيْكُمُ الغَارَاتُ، وَمُلِكَتْ عَلَيْكُمُ الأَوْطَانُ.

وَهذَا أَخُو غَامِدٍ قَدْ وَرَدَتْ خَيْلُهُ الأَنْبَارَ، وَقَدْ قَتَلَ حَسَّانَ بْنَ حَسَّانَ البَكْرِيَّ، وَأَزَالَ خَيْلَكُمْ عَنْ مَسَالِحِهَا.

وَلَقَدْ بَلَغَنِي أَنَّ الرَّجُلَ مِنْهُمْ كَانَ يَدْخُلُ عَلَى المَرْأَةِ المُسْلِمَةِ، وَالأُخْرَى المُعَاهَدَةِ، فَيَنْتَزِعُ حِجْلَهَا وَقُلْبَهَا وَقَلاَئِدَهَا، وَرِعَاثَهَا، مَا تَمْتَنِعُ مِنْهُ إِلاَّ بِالاسْتِرْجَاعِ وَالاِسْتِرْحَامِ، ثُمَّ انْصَرَفُوا وَافِرِينَ، مَا نَالَ رَجُلاً مِنْهُمْ كَلْمٌ، وَلاَ أُرِيقَ لَهُمْ دَمٌ، فَلَوْ أَنَّ امْرَأً مُسْلِماً مَاتَ مِن بَعْدِ هَذا أَسَفاً مَا كَانَ بِهِ مَلُوماً، بَلْ كَانَ بِهِ عِنْدِي جَدِيراً.

bikevê û kul û mereq ji hewe xilas nebin. Ew hêrişê tînin ser hewe û hûn hêrişê nabin, ew digel hewe şer dikin û hûn şer nakin, ew bê emrîya Xwedê dikin û hûn pê razî dibin! Vêca dema ez li zemanê germayê (havînê) de fermanê didim ku hûn biçin ser wan, hûn dibêjin: Li vê germa dijwar de çi wextê şere, muhletê bide me heta germa hinekî deynê! Û dema li zivistanê da ez dibêjim hewe herin serwan, vêca hûn dibêjin: Niha serma ye, muhletê bide me heta sarî kêm bibê, ev hemî revîna ji germa û sermayê ye, vêca eger hûn wiha ji serma û germayê direvin, ez bi Xwedê kim hûn ji şimşîr pirtir direvin.

Ey zir zelamên ne zelam! Ey mejî zarûkên ser jinik! Xwezka qet min hûn nedîtiban û êkcar min hûn nas nekirban, wellahî! ev nas kirin bû sebebê pûşmanî yê û kol û mereq pêve hat.

Xwedê hewe bikujê ku hewe dilê min tejî xwîn kir û singê min tejî kerb û nerihetî û ah û wah tevlî nefesa min kirin. Hewe pê ne gohdarî û arîkarî ne kirinê bîr û hizra min ji kar êxist, heta qureyşîyan got: Korê Ebû Talib zelamek mêrbaş e lê belê zanîna wî ya şer û herbê tinehin.

فَيَا عَجَباً! عَجَباً ـ وَاللهِ ـ يُمِيتُ القَلْبَ وَيَجْلِبُ الهَمَّ مِنِ اجْتِمَاعِ هؤُلاَءِ القَوْمِ عَلَى بَاطِلِهِمْ، وَتَفَرُّقِكُمْ عَنْ حَقِّكُمْ! فَقُبْحاً لَكُمْ وَتَرَحاً، حِينَ صِرْتُمْ غَرَضاً يُرمَى:

يُغَارُ عَلَيْكُمْ وَلاَ تُغِيرُونَ، وَتُغْزَوْنَ وَلاَ تَغْزُونَ، وَيُعْصَى اللهُ وَتَرْضَوْنَ! فَإِذَا أَمَرْتُكُمْ بِالسَّيْرِ إِلَيْهِم فِي أَيَّامِ الحَرِّ قُلْتُمْ: هذِهِ حَمَارَّةُ القَيْظِ أَمْهِلْنَا يُسَبَّخْ عَنَّا الحَرُّ، وَإِذَا أَمَرْتُكُمْ بِالسَّيْرِ إِلَيْهِمْ فِي الشِّتَاءِ قُلْتُمْ: هذِهِ صَبَارَّةُ القُرِّ، أَمْهِلْنَا يَنْسَلِخْ عَنَّا البَرْدُ، كُلُّ هذا فِراراً مِنَ الحَرِّ وَالقُرِّ; فَإِذَا كُنْتُمْ مِنَ الحَرِّ وَالقُرِّ تَفِرُّونَ فَأَنْتُمْ وَاللهِ مِنَ السَّيْفِ أَفَرُّ!

يَا أَشْبَاهَ الرِّجَالِ وَلاَ رِجَالَ! حُلُومُ الأَطْفَالِ، وَعُقُولُ رَبَّاتِ الحِجَالِ، لَوَدِدْتُ أَنِّي لَمْ أَرَكُمْ وَلَمْ أَعْرِفْكُمْ مَعْرِفَةً ـ وَاللهِ ـ جَرَّتْ نَدَماً، وَأَعقَبَتْ سَدَماً.

قَاتَلَكُمُ اللهُ! لَقَدْ مَلأْتُمْ قَلْبِي قَيْحاً، وَشَحَنْتُمْ صَدْرِي غَيْظاً، وَجَرَّعْتُمُونِي نُغَبَ التَّهْمَامِ أَنْفَاساً، وَأَفْسَدْتُمْ عَلَيَّ رَأْيِي بِالعِصْيَانِ

Rehm-el baba! Ma li nav wan da kî ji min şerzantir û pêşgavtir li şer de heye? Rastî ev e ku hêca bin bîst salîyê ra, ez pê rabûme, û iha eve temenê min ji şêstê derbaz bûye! Lê belê pa kesê gohdar jê ra nebin ewî bîr û hizir jî nîne!

AXIFTINA 28

Evahe vebireke ji wê axiftina ku despêka wê "elhemd-u lillah-i llezî geyr-u meqtû'" ku li 'eydek ya **Fitrê** de axiftîye. Yazde hişyarî di vê axiftinê de hene.

... Vêca bi rastî eve dinyayê pişt daye û xatirê xwe xwestîye û axret jî berew hatine û nişkêda wê peyda bibê, bizanin! Îro roja xwe hazir kirina ji meydanê ra ye û sibe roja jêbirkanê, kesê pêş bikevê bihişt jê re ye û yê paş bikevê agir jê re heye, ma vêca gelo kes nîne ku hêca mirina wî nehatî û ji gonehê xwe tewbe bikê? Ma nîne kesê ku hêca roja bextreşî û ihtîyacî ya wî nehatî karekî ji xwe re bikê? Bizanin hûn îro rojê li nav hêvî û arizûyan da ne ku mirin li pey ra tê, vêca ewê li rujên berhêvî ya xwe de pêşîya mirin bê, kar bikê hingê kar û 'emelê wî wê feydê bighênî yê, û mirin û ecelê wî jî zererê nagihênî yê û ew kesê li van rojan da pêşîya ecel bê, kêmasî yê bikê li kar û

وَالخذْلاَن، حَتَّى قَالَتْ قُـرَيْشٌ: إِنَّ ابْنَ أَبِي طَالِب رَجُلٌ شُجَاعٌ، وَلٰكِنْ لاَ عِلْمَ لَهُ بِالحَرْبِ.

لله أَبُوهُمْ! وَهَلْ أَحدٌ مِنْهُمْ أَشَدُّ لَهَا مِرَاساً، وَأَقْدَمُ فِيهَا مَقَاماً مِنِّي؟! لَقَـدْ نَهَضْـتُ فِيهَـا وَمَـا بَلَغْـتُ العِشْرِينَ، وها أناذا قَدْ ذَرَّفْتُ عَلَى السِّـتِّينَ! وَلٰكِـنْ لا رَأْيَ لَمِـنْ لاَ يُطَاعُ!

[28]

فصل من الخطبة التي أولها: «الحمد لله غير مقنوط من رحمته» وفيه أحد عشر تنبيهاً:

أَمَّـا بَعْـدُ، فَـإِنَّ الـدُّنْيَا قَـدْ أَدْبَـرَتْ، وَآذَنَـتْ بِـوَدَاع، وَإِنَّ الآخِرَةَ قَـدْ أَقْبَلَـتْ، وَأَشْـرَفَتْ بِاطِّلاَع، أَلاَ وَإِنَّ اليَوْمَ المِضْمارَ، وَغَداً السِّبَاقَ، وَالسَّـبَقَةُ الجَنَّـةُ، وَالغَايَةُ النَّارُ;

أَفَلاَ تَائِبٌ مِنْ خَطِيئَتِهِ قَبْـلَ مَنِيَّتِهِ! أَلاَ عَامِلٌ لِنَفْسِهِ قَبْلَ يَـوْمِ بُؤْسِهِ! أَلاَ وَإِنَّكُمْ في أَيَّـامِ أَمَـل مِنْ وَرَائِهِ أَجَلٌ، فَمَنْ عَمِلَ فـي

’emel da, eve karê wî sûd nekir û ecelê wî jî zerer gihandê. Nixwe vêca li zemanê xweşî û rihetî yê da welê ‘emel bikin ku hûn li zemanê tirsê da kar dikin.

Bi rastî min tiştek wek bihiştê nedîtîye ku daxwazkerê wê xew ve biçê, û min tiştek wek agir nedîtîye ku jê revê wê razhê (jê nerevê) bizanin! Ewê ji heqî yê feydê nebê wê batil zererê bighênî yê, û ew kesê li ser hidayetê ne sekinê wê li rê winda bûn ewî li helakê bibê.

Heyhê bizanin! Fermana seferê ji hewe re hatîye û zadê seferê jî hatîye nîşandan ji hewera, û derheq hewe de ji hemî tiştî pitir ez ji dû tişta ditirsim: Pey ketina hewayê nefsê û arizûyên dûr û dirêj, vêca nixwe hêca li dinyayê da rizqê xwe jê hilînin da ku “sibe rujê” hûn pê wê xwe biparêzin.

***Seyidê Rezî** di 18 rêzka da li vê derê behsa fesahet û belaxeta kelamê Imam ‘Elî dikê û hinek kelîma me’ne dikê wek (mizmar)ê ku bi me’na hazir kirina hespaye ji bona jêbirkanê ku çil rojan dewam dikê.*

أَيَّامِ أَمَلِهِ قَبْلَ حُضُورِ أَجَلِهِ فَقَدْ نَفَعَهُ عَمَلُهُ، وَلَمْ يَضُرُّهُ أَجَلُهُ; وَمَنْ قَصَّرَ فِي أَيَّامِ أَمَلِهِ قَبْلَ حُضُورِ أَجَلِهِ، فَقَدْ خَسِرَ عَمَلُهُ، وَضَرَّهُ أَجَلُهُ، أَلاَ فَاعْمَلُوا فِي الرَّغْبَةِ كَمَا تَعْمَلُونَ فِي الرَّهْبَةِ .

أَلاَوَإِنِّي لَمْ أَرَ كَالجَنَّةِ نَامَ طَالِبُهَا، وَلاَ كَالنَّارِ نَامَ هَارِبُهَا، أَلاَ وَإِنَّهُ مَنْ لاَيَنْفَعُهُ الحقُّ يَضُرُّهُ البَاطِلُ، وَمَنْ لا يستقم بِهِ الهُدَى يَجُرُّ بِهِ الضَّلاَلُ إِلَى الرَّدَىْ.

أَلاَ وَإِنَّكُمْ قَد أُمِرْتُمْ بِالظَّعْنِ، وَدُلِلْتُمْ عَلى الزَّادَ. وَإِنَّ أَخْوَفَ مَا أَخافُ عَلَيْكُمُ: اتِّبَاعُ الهَوَى، وَطُولُ الأَمَلِ، تَزَوَّدُوا فِي الدُّنْيَا مِنَ الدُّنْيَا مَا تَحُوزُونَ بِهِ أَنْفُسَكُمْ غَداً.

وأقول: إنّهُ لو كان كلامٌ يأخذ بالاعناق إلى الزهد في الدنيا، ويضطر إلى عمل الاخرة لكان هذا الكلام، وكفى به قاطعاً لعلائق الامال، وقادحاً زناد الاتعاظ والازدجار. ومن أعجبه قوله: «أَلا وَإنّ اليَوْمَ المِضْمارَ وَغَداً السِبَاقَ، وَالسَّبَقَةُ الجَنّة وَالغَايَة النّار» فإن فيه ـ مع فخامة اللفظ، وعظم قدر المعنى، وصادق التمثيل، وواقع التشبيه ـ سرّاً عجيباً. ومعنى لطيفاً، وهو قوله(عليه السلام): «والسَبَقَة الجَنّة، وَالغَايَة النّار»، فخالف بين اللفظين لاختلاف المعنيين، ولم يقل: «والسَبَقَة النّار» كما قال: «والسَبَقَة الجَنّة»، لان الاستباق إنما يكون إلى أمر محبوب، وغرض مطلوب، وهذه صفة الجنة، وليس هذا المعنى موجوداً في النار، نعوذ بالله منها! فلم يجز أن يقول: «والسَبَقَة النّار»، بل قال: «والغَايَة النّار»، لان الغاية قد ينتهي إليها من لا يسرّه الانتهاء إليها ومن يسرّه ذلك، فصلح أن يعبّر بها عن الامرين

AXIFTINA 29

Pişti hekemiyet ê û paş hêriş a zehak – *qumandarek yê Mu'awîye*– bo ser hecî yên mala Xwedê, Imam ev axiftin kirîye (sala 38 h):

Ey ewên hûn kom în pê cismê xwe û bilavene bi vîyan û bîr û hizrên xwe, axiftina hewe tehtên req nerm dikê û kiryarên hewe berhêvîyê li dijmin da çêdikê, li civata da hûn pir daxivin, lê dema wextê şer tê hûn direvin, gazî ya wî kesê gazî hewe dikê ser nakevê, û kesê ji bona rihetîya hewe xwe bêxê zehmetî çi cara nagihê rihetîyê, hûn hinek tiştên pûç bi ser heve datînin da hûn xwe paşda bidin, wek wî deyndarê ku ileh dana deynê xwe paş têxê. Mirovê zelîl nikarê pêşîya zulm û sitemê bigrê, û xêncî pê xebatê heq nayê dest.

Paş mala xwe hûnê ji kîjan malê berevanî yê bikin û paş min hûnê bi serokatî ya kîj rêberî şer bikîn? Ez bi Xwedê kim, hîle lê hatî ew e yê hûn ewî bixapênîn, wellahî, ew kesê bixazê pê hewe ser bikevê wê bê behr bimînê û ew kesê pê hewe şer bikê wek wî ye ewê pê tîrên ser şikestî şer dikê. Wellahî we li min hatîye ku êkcar ez bawerîyê bi axiftina hewe naynim û ez ne ber hêvî yê arîkarîya heweme û ez bê hêvî me ji wê yêkê ku pê hewe dijmin bitirsînim.

Çi bûye ji hewe? Dermanê hewe çiye? Wê çawa 'elac li hewe bê kirin? Dijminê hewe jî mirovên wek hewene, gelo ya hewe gotî bi nezanîn bî? An ji bê teqwayî hûn xafil bûyîn an hewe li neheqî yê da

معاً، فهي في هذا الموضع كالمصير والمآل، قال الله عزّوجلّ: (قُلْ تَمَتَّعُوا فَإِنَّ مَصِيرَكُم إلى النّار)، ولا يجوز في هذا الموضع أن يقال: سبْقَتكم إلى النار، فتأمل ذلك، فباطنه عجيب، وغوره بعيد، وكذلك أكثر كلامه عليه السلام ...

[29]

بعد غارة الضحاك بن قيس

صاحب معاوية على الحاجّ بعد

قصة الحكمين

أَيُّهَا النَّاسُ، الْمُجْتَمِعَةُ أَبْدَانُهُمْ، الْمُخْتَلِفَةُ أَهْوَاؤُهُمْ، كَلامُكُم يُوهِي الصُّمَّ الصِّلابَ، وَفِعْلُكُمْ يُطْمِعُ فِيكُمُ الأَعْدَاءَ! تَقُولُونَ فِي الْمَجَالِسِ: كَيْتَ وَكَيْتَ، فَإِذَا جَاءَ الْقِتَالُ قُلْتُمْ: حِيدِي حَيَادِ! مَا عَزَّتْ دَعْوَةٌ مَنْ دَعَاكُمْ، وَلاَ اسْتَرَاحَ قَلْبُ مَنْ قَاسَاكُمْ، أَعَالِيلُ بِأَضَالِيلَ، دِفَاعَ ذِي الدَّيْنِ الْمَطُولِ، لاَ يَمنَعُ الضَّيْمَ الذَّلِيلُ! وَلاَ يُدْرَكُ الْحَقُّ إِلاَ بِالْجِدِّ!

أَيَّ دَارٍ بَعْدَ دَارِكُمْ تَمْنَعُونَ، وَمَعَ أَيِّ إِمَامٍ بَعْدِي تُقَاتِلُونَ؟ الْمَغْرُورُ وَاللهِ مَنْ غَرَرْتُمُوهُ، وَمَنْ فَازَبِكُمْ فَازَ بَالسَّهْمِ الأَخْيَبِ، وَمَنْ رَمَى بِكُمْ فَقَدْ رَمَى بِأَفْوَقَ نَاصِلٍ.

أَصْبَحْتُ وَاللهِ لا أُصَدِّقُ قَوْلَكُمْ، وَلاَ أَطْمَعُ فِي نَصْرِكُمْ، وَلاَ أُوعِدُ الْعَدُوَّ بِكُم.

timatî kir?

AXIFTINA 30

Li sala 35 h. ku axiftin hat gerandin û gotin ewî ‘Osman kuştîye ev axiftin kir:

Eger min ew ferman daba ezê bibîyam qatil, û eger min nehy jê kiriba ezê bibîyam arîkar. Lê belê niha ewê arîkarî kirî nikarê bêjê: Ez qenctir im ji wî kesê ew tinê hiştî, û ewê arîkarî ya wî nekirî jî nikarê bêjê: Ewê arîkarî ya wî kirî ji min baştir e.

Niha ezê bikurtî sîreta wî li hukumdarî yê da ji hewe re bêjim: Ewî xortî kir vêca xwe li ser xortî yê şidand û hewe jî bê tabî kir û hûn pir zêde bê taqet bûn, û Xuda ji bona xortî yê û bê taqetî û bê tabîyê fermanek heye ku pêk hatina wê hetmî ye.

AXIFTINA 31

Dema ‘Ebdullahê ‘Ebbas rêkirî da digel Zubeyr baxivê ji bona pêşî girtina li şerê “Cemel”ê.

Neçe bal Telhe çiko eger tu digel wî rûbirû bibî tê ewî wek gayê şax badayî bibînî (ku ser xwe çûyî ye) ew li merkeba hêç û şehmûz suwar dibê û guman dikê

مَـا بَـالُكُم؟ مَـا دَوَاؤُكُـمْ؟ مَـا طِبُّكُمْ؟ القَوْمُ رِجَالٌ أَمْثَالُكُمْ، أَقَـوْلاً بَغَيْرِ عِلْـم! وَغَفْلَـةً مِـنْ غَيْـرِ وَرَع! وَطَمَعاً في غَيْرِ حَقٍّ؟!

[30]

ومن كلام له(عليه السلام)

في معنى قتل عثمان

لَوْ أَمَرْتُ بِهِ لَكُنْتُ قَـاتِلاً، أَوْ نَهَيْتُ عَنْهُ لَكُنْتُ نَاصِراً، غَيْـرَ أَنَّ مَنْ نَصَرَهُ لاَ يَسْـتَطِيعُ أَنْ يَقُـولَ: خَذَلَهُ مَنْ أَنَـا خَيْـرٌ مِنْـهُ، وَمَـنْ خَذَلَهُ لاَ يَسْتَطِيعُ أَنْ يَقُولَ: نَصَرَهُ مَنْ هُوَ خَيْرٌ مِنِّي.

وَأَنَا جَامِعٌ لَكُمْ أَمْرَهُ، اسْـتَأْثَرَ فَأَسَاءَ الأَثَرَةَ، وَجَزِعْتُمْ فَأَسَـأْتُمُ الجَـزَعَ، وَلله حُكْـمٌ وَاقِـعٌ فـي المُسْتَأْثِرِ وَالجَازِعِ.

[31]

لمّا أنفذ عبدالله بن العباس رحمه الله إلى الزبيرقبل وقوع الحرب يوم الجمل

teslîm û rihet e.

Lê belê here Zubeyr bibîne, çiko ew exlaq nerm e, vêca bêjê: Kur xalê te dibêjê: Te ez li Hicazê nas kirim û li ‘Iraqê nas nekirim, sebebê derbaz bûna paş nas kirin û eşkere bonê çiye?

Seyidê Rezî dibêjê: *Cumlê “fema ‘eda min ma beda” ewilîn car min ji hezretê ‘Elî seh kirîye.*

ليستفيئه إلى طاعته قال له عليه السلام:

لاتَلْقَيَنَّ طَلْحَةَ، فَإِنَّكَ إِنْ تَلْقَهُ تَجِدْهُ كَالثَّوْرِ عَاقِصاً قَرْنَهُ، يَرْكَبُ الصَّعْبَ وَيَقُولُ: هُوَ الذَّلُولُ، وَلَكِنِ القَ الزُّبَيْرَ، فَإِنَّهُ أَلْيَنُ عَرِيكَةً، فَقُلْ لَهُ: يَقُولُ لَكَ ابْنُ خَالِكَ: عَرَفْتَنِي بَالحِجَازِ وَأَنْكَرْتَنِي بِالعِرَاقِ، فَمَا عَدَا مِمَّا بَدَا.

وهو (عليه السلام) أوّل من سمعت منه هذه الكلمة، أعني: «فَمَا عَدَا مِمَّا بَدَا».

۞ AXIFTINA 32 ۞

Li sala 37-ê h. li mizgefta Kûfayê da derheq naskirna xelkê û zeman da axiftîye.

Gelî xelkîno! Em li zemanekê de dijîn ku tejî rik û nasipasî ye, mirovê qenc li vî zemanî de xirab tê dîtin û mirovê zalim ser zulma xwe ve zêde dikê, em ji wê ya fêr bûyîn (‘elimyîn) feydê nabîn û ewa em nizanîn pirsyar nakîn, û em ji hadise û qewimîna natirsin neheta ser me da bên.

Mirov çar behr in:

Hinek ji wan eger fesad û xirabîyê li ‘erdê de nakin, sebebê wê belengazî û kuhîya şûr û kêmîya malê wa ye.

[32]

وفيها يصف زمانه بالجور، ويقسم الناس فيه خمسة أصناف، ثم يزهد في الدنيا:

أَيُّهَا النَّاسُ، إِنَّا قَدْ أَصْبَحْنَا في دَهْرٍ عَنُود، وَزَمَن كَنُود، يُعَدُّ فِيهِ الْمُحْسِنُ مُسِيئاً، وَيَزْدَادُ الظَّالِمُ فِيهِ عُتُوّاً، لاَ نَنْتَفِعُ بِمَا عَلِمْنَا، وَلاَ نَسْأَلُ عَمَّا جَهِلْنَا، وَلاَ نَتَخَوَّفُ قَارِعَةً حَتَّى تَحُلَّ بِنَا.

Û hinek ji wan jî şûrê xwe ji kalan

فَالنَّاسُ عَلَى أَرْبَعَةِ أَصْنَاف:

deranîne û xirabîya xwe eşkere kirne û ‘eskerê xwe yê suwar û peyar kom kirne û xwe hazir kirne ji bo xirabîyê û dînê xwe ji bona gihana piçek malê dinyayê ji dest dane, çend suwarek divên ku bibê ser pêşê wan; an minberek dvên ku pêlil biçin, û çiqas pîs ticarete ku tû dinyayê (biha û) qîmetê xwe bizanî (xwe bi dinyayê bifrûşî) û ewa li bal Xwedayê te ji tere heyî tu pê vê bigoherînî.

Hinek jî pê karên axretî dikevin pey dinyayê, û pê ‘emel û karê li dinyayê de nakevin pey axretê, (evênhe) xwe biçûk û mutewazi’ nîşan didin û gavên xwe nêzîkê hev tavêjin û cilkên xwe kurt dikin û xwe pê emanetdarîyê dixemilênin û veşartin û sitirandina Xuda ji xwe re dikin wesîla goneh û bê emrî- yan.

Hinek jî ji ber kêmasî ya kesayetî yê (xwe kêm zanînê) û nebûna wesîle û rêkê, xwe nakêşin mezinahî û hukumdarî yê, vêca li ser halê xwe dimînin (pêşketin ji wa ra çênabê) evêhe jî vêca xwe pê navê (qena’etê) dixemilênin û cilkê (zahidîyê) dikin ber xwe, halhale evênhe ne şevekî û ne rojekî ji zahidan nebûne.

Lê belê xêncî ji van hinek kesên dî hene ku bîra cihê lê zivirînê (qîyametê)

مِنْهُمْ مَنْ لاَ يَمْنَعُهُ الفَسَادَ في الأَرْضِ إلاَّ مَهَانَةُ نَفْسِهِ، وَكَلاَلَةُ حَدِّهِ، وَنَضِيضُ وَفْرِهِ.

وَمِنْهُمُ المُصْلِتُ لِسَيْفِهِ، وَالمُعْلِنُ بِشَرِّهِ، وَالْمجْلِبُ بِخَيْلِهِ وَرَجِلِهِ، قَدْ أَشْرَطَ نَفْسَهُ، وَأَوْبَقَ دِينَهُ لِحُطَام يَنْتَهِزُهُ، أَوْ مِقْنَب يَقُودُهُ، أَوْ مِنْبَر يَفْرَعُهُ. وَلَبِئْسَ المَتْجَرُ أَنْ تَرَى الدُّنْيَا لِنَفْسِكَ ثَمَناً، وَمِمَّا لَكَ عِنْدَ الله عِوَضاً!

وَمِنْهُمْ مَنْ يَطلُبُ الدُّنْيَا بِعَمَلِ الأخِرَةِ، وَلاَ يَطْلُبُ الأخِرَةَ بِعَمَلِ الدُّنْيَا، قَدْ طَامَنَ مِنْ شَخْصِهِ، وَقَارَبَ مِنْ خَطْوِهِ، وَشَمَّرَ مِنْ ثَوْبِهِ، وَزَخْرَفَ مِنْ نَفْسِهِ لِلأَمَانَةِ، وَاتَّخَذَ سِتْرَ الله ذَرِيعَةً إِلَى المَعْصِيَةِ.

وَمِنْهُمْ مَنْ أَقْعَدَهُ عَنْ طَلَبِ المُلْكِ ضُؤولَةُ نَفْسِهِ، وَانقِطاعُ

çavê wan nuqandîye û tirsa ji roja mehşerê rûndikên wan rijandine, evênhe carna ji nav komê hatine deranîn û tinê dijîn û carna jî hatine bindest kirin û li tirsêdane, carna bê dengn û dev girêdayî û ji dil gazî Xwedayê xwe dikin, ileh dil şikestî û derdmendin, xwe parastina wan (ji zulm û zaliman) bûye sebeb ku neyên nas kirin.

Ew mirovên gohdar in heçweku li nav behra xwê de bijîn, deng ji wa dernakevê û dilê wan kol û birîne, ewqas we'z û şîret kirne heta westihane û xelebe li wan hatîye kirin heta bin dest bûne û ewqas hatine kuştin heta kêm bûne.

Vêca bila dinya li bal hewe kêmtir bê ji tuşalê "qerez"ê[20] û tûka (mû -hirî) ku di wextê miqes kirina hirîyê de ji ber devê miqesê dikevê: Ji wa yên pêş xwe de şîret û we'zê bigrin hêca ewên paş hewe bi hewe nehatîn şîret kirin, ewê kêm û nebaş bibînin û dev jê berdin, çiko bi rastî evê dinyayê dest ji wa kesa kêşaye û terka wan kirîye ewên pitir ji hewe ew vîyayîn û dilê wan firijîyê.

Seyidê Rezî *dibêjê: Hinek mirovên ji zanînê bê behr gotine ev axiftin ya Mu'awîye ye, halhale bê şik û şubhe evahe axiftina mîrê bawerdaraye, maqey zêr û ax û ava şîrîn û şûr ser heve diçin?*

سَبَبِهِ، فَقَصَرَتْهُ الحالُ عَلَى حَالِـهِ، فَتَحَلَّـى بِاسْـمِ القَنَاعَـةِ، وَتَـزَيَّنَ بِلِبَاسِ أَهْلِ الزَّهَادَةِ، وَلَـيْسَ مِـنْ ذلِكَ في مَرَاح وَلاَ مَغْدىً.

وَبَقِيَ رِجَالٌ غَضَّ أَبْصَـارَهُمْ ذِكْـرُ الْمَرْجِـعِ، وَأَرَاقَ دُمُـوعَهُمْ خَوْفُ الْـمَحْشَرِ، فَهُمْ بَيْنَ شَـرِيد نَادٍّ، وَخَـائِف مَقْمُـوع، وَسَـاكِت مَكْعُوم، وَدَاع مُخْلِـص، وَثَكْـلاَنَ مُوجَـع، قَـدْ أَخْمَلَـتْهُمُ التَّقِيَّـةُ، وَشَمِلَتْهُمُ الذِّلَّةُ، فَهُـمْ فـي بَحْـر أُجَاج، أَفْوَاهُهُمْ ضَامِزَةٌ، وَقُلُـوبُهُمْ قَرِحَةٌ، قَـدْ وَعَظُـوا حَتَّـى مَلُّـوا، وَقُهِرُوا حَتَّى ذَلُّوا، وَقُتِلُـوا حَتَّـى قَلُّوا.

فَلْـتَكُنِ الـدُّنْيَا أَصْـغَرَ فـي أَعْيُنِكُمْ مِنْ حُثَالَةِ الْقَرَظِ، وَقُرَاضَةِ الْجَلَمِ، وَاتّعِظُوا بِمَنْ كَانَ قَـبْلَكُمْ قَبْلَ أَنْ يَتَّعِظَ بِكُـمْ مَـنْ بَعْـدَكُمْ; وَارْفُضُـوهَا ذَمِيمَـةً، فَإِنَّهَـا قَـد رَفَضَتْ مَـنْ كَـانَ أَشْـغَفَ بِهَـا

‘Emrê korê Behr (Cahiz) ku li vê derheqê de rê nasek jêhatî û karnas e, û lêkulek bîna û hişyare li kitêba “el beyan wet tebyîn” de gotîye ku: Kî gotîye ev axiftin ya Mu’awîyeye! Û paşê jî hinek tişt nivîsîne kû kurtê wê ev e: Dibêjê: Ev axiftin tam ser axiftina ‘Elî (s) ve diçê, û derheq nasandina xelkê da bi awayê wî axiftin hatîye kirin, me çi caran nedîtîye ku Mu’awîye li axiftina xwe de mesleka zahidan bidê ber xwe û bi rêka ‘abidanve biçê.

AXIFTINA 33

Dema hezretê ‘Elî diçûwa Besrayê, ibn ‘Ebbas dibêjê: Ez li “Zîqar”ê çûm bal mîrê bawerdaran, wekî min dît wê sûla xwe (pêlav) didirû, got min: Ev sûl bi çendê dihêjê? Min got: Qet bi çi nahêjê, ewî got: Sond bi Xwedê! Ev sûl li bal min şîrîntir e ji hukumdarî ya li ser hewe, eger ne ew bîya ku ez li vê hukumdarî yê de heqekî cih bikim an batil û neheqîyekî paşve bidim.

Paşê derket û ji xelkê re wiha axift: Xwedayê pak li halekî de Muhemmed selewat û selamên Xuda li ser wî û alê wî bin hinart ku çi yêk ji ‘Ereban ne kitêbek dixwenda û ne jî de’wa Pêğemberîyê dikira, vêca Pêğember (s) ew ajûtin û gihandin cihekî ku divîya bighênê, û gihandin xilasîyê û quwet û qudret peyda kirin û karê wan pêşda çû û cihê xwe girtin.

Belê, sond bi Xwedê, ez li nav ‘eskerê wî da ji ser pêşa bûm heta ku dijmin pêkve pişt da; çû û ez ne ze’îf û nekar bûm û ne ez tirsiham. Niha jî ev

مِنْكُمْ.

وهذه الخطبة ربما نسبها من لا علم له بها إلى معاوية،

وهي من كلام أميرالمؤمنين(عليه السلام) الذي لا يشك فيه، وأين الذهب من الرّغام! والعذب من الاجاج! وقد دلّ على ذلك الدليل الخِرِّيت ونقده الناقد البصير عمروبن بحر الجاحظ; فإنه ذكر هذه الخطبة في كتابه «البيان والتبيين» وذكر من نسبها إلى معاوية، ثم تكلم من بعدها بكلام في معناها، جملته أنه قال: وهذا الكلام بكلام علي(عليه السلام)أشبه، وبمذهبه في تصنيف الناس وفي الاخبار عماهم عليه من القهر والاذلال ومن التقية والخوف أليق. قال: ومتى وجدنا معاوية في حال من الاحوال يسلك في كلامه مسلك الزهاد، ومذاهب العُبّاد!

[33]

عند خروجه لقتال أهل البصرة قال عبدالله بن عباس رحمه الله: دخلت على أَميرالمؤمنين صلوات الله عليه بذي قار وهو يخصِف نعله، فقال لي: ما قيمة هذا النعل؟ فقلت: لا قيمةَ لها! قال: والله لَهِيَ أَحَبُّ إِليَّ من إِمرتكم، إِلاّ أَن أُقيم حقّاً، أَوأَدفع باطلاً، ثمّ خرج عليه السلام فخطب الناس فقال:

إنَّ اللهَ سُبحانَه بَعَثَ مُحَمَّداً صلى الله عليه وآله، وَلَيْسَ أَحَدٌ مِنَ الْعَرَبِ يَقْرَأُ كِتَاباً، وَلاَ يَدَّعِي نُبُوَّةً، فَسَاقَ النَّاسَ حَتَّى بَوَّأَهُمْ مَحَلَّتَهُمْ، وَبَلَّغَهُمْ مَنْجَاتَهُمْ، فَاسْتَقَامَتْ

rêka ez pêve diçim wek hingêye. Vêca bi yeqîn, ezê batil biqelêşim heta heqî ji tenişta wê derkevê.

Ma min û Qureyşîya çi li nav hevda heye? Ez bi Xwedê kim, hingê ku kafir bîn, ez ketim şerê wan, niha jî ku ji rê derketine ezê şerê wan bikim, wek çawa duhî ez digel wan îro jî ez ji wan venabim.

Wellahî, kîna Qureyşîya ji me, xêncî ku Xuda em ji nav wan bijartin ne ji ber tiştek dîye, me jî ew êxistin nav xwe re, vêca ew wek gotina şa'îr lê hatin ku dibêjê:

Ez bi canê xwe kim ku her sibeh te ji şîrê safî vexwar û te tûk û xurmên bê sîsk xwarin,

Me ev meqam û mezinahî da te halbokî tu nexweyê vê mezinahî yê bûyî, û me û suwarên xwe heta sibehî li ber te nubet girt û me tu paraztî.

AXIFTINA 34

Ev axiftin piştî şikesta xaricîya kirîye, ji bo kom kirina 'esker ji şerê digel Şamîya ra (sala 38 h.)

Mala hewe xirab bibê! Bi rastî êdî ez ji kar ketim ewqas min lome li hewe kirin, gelo şûna jîyana axretê hûn bi jîyana dinyayê razî bûne? Gelo hûn şûna ser bilindî yê da bi zelîlî yê razî bûne?

Dema ez ji bona cihada di beraberê

قَنَاتُهُمْ، وَاطْمَأَنَّتْ صِفَاتُهُمْ.

أَمَا وَاللهِ إِنْ كُنْتُ لَفِي سَاقَتِهَا حَتَّى تَوَلَّتْ بِحَذَافِيرِهَا، مَا عَجَزْتُ،وَلاَ جَبُنْتُ، وَإِنَّ مَسِيرِي هذَا لِمِثْلِهَا، فَلاَنْقُبَنَّ الْبَاطِلَ حَتَّى يَخْرُجَ الْحَقُّ مِنْ جَنْبِهِ.

مَالِي وَلِقُرَيْش! وَاللهِ لَقَدْ قَاتَلْتُهُمْ كَافِرِينَ وَلاُقَاتِلَنَّهُمْ مَفْتُونِينَ، وَإِنِّي لَصَاحِبُهُمْ بِالأَمْسِ كَمَا أَنَا صَاحِبُهُمُ الْيَوْمَ!

وَاللهِ مَا تَنْقِمُ مِنَّا قُرَيْشٌ إِلاَّ أَنَّ اللهَ اخْتَارَنَا عَلَيْهِمْ فَأَدْخَلْنَاهُمْ فِي حَيِّزِنَا ، فَكَانُوا كَمَا قَالَ الأَوَّلُ :

أَدَمْتَ لَعَمْرِي شُرْبَكَ الْمَحْضَ صَابِحاً وَأَكْلَكَ بِالزُّبْدِ الْمُقَشَّرَةَ الْبُجْرَا

وَنَحْنُ وَهَبْنَاكَ الْعَلاَءَ وَلَمْ تَكُنْ عَلِيّاً وَحُطْنَا حَوْلَكَ الْجُرْدَ وَالسُّمْرَا

[34]

في استنفار الناس إلى الشام

[بعد فراغه من أمر الخوارج]

أُفٍّ لَكُمْ! لَقَدْ سَئِمْتُ عِتَابَكُمْ!

dijminê hewe da gazî hewe dikim çavê hewe dizivirin heçweku hûn li ber nexweşîya mirinê û ji tirsa wê hişê hewe ji serê hewe çûyî. Dergehê peyivîna hewe digel min hatîye girtin vêca hûn şaş û heyrî ne, heçweku dilê hewe ji dest çûbê û hûn li va şevên tarî da hizir nakin. Bawerîya min bi hewe nayê û hûn ne ew esas û binyatin ku mirov pişta xwe bi hewe germ bikê, hûn ne ew arîkarin ku li zemanê ihtîyacî yê da mirov pê hewe qayîm bibê, hûn wek wa devane ku xudanê wan winda bîbê, vêca çiqa ji alîyekîve ser hevda bên ji alîyê dîve bilav dibin. Sond bi ezelî û ebedî bûna Xuda! Hûn pîs kesin ji bona hilkirina agirê şer! Hûn tên xapandin lê xapandin bi hewe çênabê; ‘erdê hewe tê vegirtin û hûn na’enirin (naxeyidin –sil nabin), dijmin çavê xwe ji hewe nagirê lê hûn li xewa xeflet û bê xeberîyê da ne. Sond bi Xwedê, ewên arîkarîya hev nekin ew bin dikevin. Wellahî ez guman dikim eger bi germî despê bikê û kuştin bighê nihayetê hûnê wereng ji korê Ebû Talib vebin (ji dûra wî bilav bibin ku êdî zivirîn ji hewe ra nîne) wek çawa serî ji bedenê vedibê.

Sond bi Xwedê, kesê bihêlê dijmin gûştê li ser hestî yên wî birûtikênê û

أَرَضِيتُمْ بِالْحَيَاةِ الدُّنْيَا مِنَ الْآخِرَةِ عِوَضاً؟ وَبِالذُّلِّ مِنَ الْعِزِّ خَلَفاً؟

إِذَا دَعَوْتُكُمْ إِلَى جِهَادِ عَدُوِّكُمْ دَارَتْ أَعْيُنُكُمْ، كَأَنَّكُمْ مِنَ الْمَوْتِ فِي غَمْرَة، وَمِنَ الذُّهُولِ فِي سَكْرَة، يُرْتَجُ عَلَيْكُمْ حَوَارِي فَتَعْمَهُونَ، فَكَأَنَّ قُلُوبَكُمْ مَأْلُوسَةٌ، فَأَنْتُمْ لاَ تَعْقِلُونَ. مَا أَنْتُمْ لِي بِثِقَة سَجِيسَ اللَّيَالِي، وَمَاأَنْتُمْ بِرُكْن يُمَالُ بِكُمْ، وَلاَ زَوَافِرُ عِزٍّ يُفْتَقَرُ إِلَيْكُمْ. مَا أَنْتُمْ إِلاَّ كَإِبِل ضَلَّ رُعَاتُهَا، فَكُلَّمَا جُمِعَتْ مِنْ جَانِب انْتَشَرَتْ مِن آخَرَ، لَبِئْسَ ـ لَعَمْرُ اللهِ ـ سُعْرُ نَارِ الْحَرْبِ أَنْتُمْ! تُكَادُونَ وَلاَ تَكِيدُونَ، وَتُنْتَقَصُ أَطْرَافُكُمْ فَلاَ تَمْتَعِضُونَ; لاَ يُنَامُ عَنْكُمْ وَأَنْتُمْ فِي غَفْلَة سَاهُونَ، غُلِبَ وَاللهِ الْمُتَخَاذِلُونَ! وَأَيْمُ اللهِ إِنِّي لاَظُنُّ بِكُمْ أَنْ لَوْ حَمِسَ الْوَغَى، وَاسْتَحَرَّ الْمَوْتُ، قَدِ انْفَرَجْتُمْ عَنِ ابْنِ أَبِي طَالِب

hestî yên wî bişkênê û çermê bedena wî biçirênê ew nekar mirove dil biçûk û tirsuneke, eger te divê (dixazî) tu yêkî wiha bî, tu dizanî! Lê belê ez sond dixum bi Xwedê, pêşîya wê çendê da ku ez forsetek wiha bidim dijmin, ezê pê şûrê xweyê "meşrefî"[21] welê lê bidim ku hestî yê serê wî li hewa re bilav bibê û dest û pîyê wî jê vebin. Piştî wê jî ya Xwedê bixazê wê ewê bikê.

Gelî xelkîno! Bi rastî min heqek li ser hewe heye û hewe jî heqek li ser min heye: Hindîke heqê hewe li ser min, ew e ku ez xêrxwaz bim ji bona hewe û xenîmeta hewe bi temamî li nav hewe bilav kim û hewe b'elmînim da hûn cahil nemînin û hewe edeb bidim da hûn hîn bibin.

Û hindîke heqê min li ser hewe, ew e ku: Hûn li ser soz û bey'eta xwe bisekinin û li zemanê hazirî û ne hazirîya min de xêrxwazê min bin, û dema ez gazî hewe bikim hûn cewaba min bidin, û dema ez fermanekî bidim hewe hûn fermana min bi rêve bibin.

AXIFTINA 35

Sala 38-ê h. Paş mesela hekemiyet ê:[22]

Hemd li hemî hala da ji bona Xuda

انْفِرَاجَ الرَّأْسِ.

وَاللهِ إِنَّ امْرَأً يُمَكِّنُ عَدُوَّهُ مِنْ نَفْسِهِ يَعْرُقُ لَحْمَهُ، وَيَهْشِمُ عَظْمَهُ، وَيَفْرِي جِلْدَهُ، لَعَظِيمٌ عَجْزُهُ، ضَعِيفٌ مَا ضُمَّتْ عَلَيْهِ جَوَانِحُ صَدْرِهِ. أَنْتَ فَكُنْ ذَاكَ إِنْ شِئْتَ، فَأَمَّا أَنَا فَوَاللهِ دُونَ أَنْ أُعْطِيَ ذلِكَ ضَرْبٌ بِالْمَشْرَفِيَّةِ تَطِيرُ مِنْهُ فَرَاشُ الْهَامِ، وَتَطِيحُ السَّوَاعِدُ وَالأَقْدَامُ، وَيَفْعَلُ اللهُ بَعْدَ ذلِكَ مَا يَشَاءُ.

أَيُّهَا النَّاسُ! إِنَّ لِي عَلَيْكُمْ حَقّاً، وَلَكُمْ عَلَيَّ حَقٌّ: فَأَمَّا حَقُّكُمْ عَلَيَّ: فَالنَّصِيحَةُ لَكُمْ، وَتَوْفِيرُ فَيْئِكُمْ عَلَيْكُمْ، وَتَعْلِيمُكُمْ كَيْلا تَجْهَلُوا، وَتَأْدِيبُكُمْ كَيْما تَعْلَمُوا.

وَأَمَّا حَقِّي عَلَيْكُمْ: فَالوَفَاءُ بِالبَيْعَةِ، وَالنَّصِيحَةُ فِي الْمَشْهَدِ وَالْمَغِيبِ وَالإِجَابَةُ حِينَ أَدْعُوكُمْ، وَالطَّاعَةُ حِينَ آمُرُكُمْ.

ye, heta li vî halî da jî ku felekê ev waqi'a bi dil êş û ev qewimîna mezin anî pêş. Ez şehadet didim ku Xudayek xêncî "Ellah" nîne û şirîk jê re tinehin, Xudayek dî xêncî Wî digel Wî nîne û Muhemmed bende û hinartî yê wî ye selewat û selamên Xuda li ser bin.

Ema be'd, vêca bi rastî ne gohdarî ya mirovê xêrxwaz û dilovan û zanayê tecrube dîtî dibê sebebê hesret û pûşmanîyê. Min li vê "hekemîyyet"ê de bîr û hizra xwe ji hewera got, û kurteyek ji wê fikra li bal min heyî min ji hewe re da dîyar kirin, lê pa eger goh bidan gotina "Qesîr".[23]

Vêca hewe wek muxalifên zalim û soz şikênên negohdar xwe ji ber gotina min avêt, heta bi wê derecê ku şîretkerê xêrxwaz li xêrxwazî ya xwe de ket şikê û xwe paşda girt. Mesela min û hewe wek wê ye ku şa'irê "Hewazinî" dibêjê:

Min li "Mun'erec" ê bîr û hizra xwe ji hewe ra got, lê belê heta sibeha roja paştir hênûka xêr xwazî ya di wê da heyî ji hewe re ronahî bû.[24]

AXIFTINA 36

Li sefera sala 38-ê h. Ji bona şîret kirina xewaricên **Nehrewanê**[25] axiftîye.

Vêca bi rastî ez hişyarîyê didim

[35]

بعد التحكيم

الْحَمْـدُ للهِ وَإِنْ أَتَـى الـدَّهْرُ بِالْخَطْبِ الْفَادِحِ، وَالْحَدَثِ الْجَلِيلِ، وَأَشْهَدُ أَنْ لاَ إِلهَ إِلاَّ اللهُ، لَيْسَ مَعَـهُ إِلـهٌ غَيْـرُهُ، وَأَنَّ مُحَمَّـداً عَبْـدُهُ وَرَسُولُهُ (صلى الله عليه وآله).

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنَّ مَعْصِـيَةَ النَّاصِـحِ الشَّفِيقِ الْعَالِمِ الْمُجَرِّبِ تُورِثُ الْحَسْرَةَ، وَتُعْقِبُ النَّدَامَةَ، وَقَدْ كُنْتُ أَمَرْتُكُمْ فِي هذِهِ الْحُكُومَـةِ أَمْـرِي، وَنَخَلْتُ لَكُمْ مَخزُونَ رَأْيِي، لَوْ كَانَ يُطَاعُ لِقَصِيرِ أَمْرٌ! فَأَبَيْتُمْ عَلَيَّ إِبَـاءَ الْمُخَـالِفِينَ الْجُفَـاةِ، وَالْمُنَابِـذِينَ الْعُصَـاةِ، حَتَّـى ارْتَـابَ النَّاصِـحُ بِنُصْحِهِ، وَضَنَّ الزَّنْدُ بِقَدْحِهِ، فَكُنْتُ وَإِيَّاكُمْ كَمَا قَالَ أَخُو هَوَازِنَ:

أَمَرْتُكُمُ أَمْرِي بِمُنْعَرَجِ اللِّوَى
فَلَمْ تَسْتَبِينُوا النُّصْحَ إِلاَّ ضُحَى الْغَدِ

[36]

hewe ji ber wê demê ku cendekî (kelaşê) hewe li kêleka vî rûbarî (furat) û çalkên dûruberê wê bikevin ‘erdê û li wî halî da jî hewe delîl û huccetek ronahî ji alî yê Xwedayê xwe ve nebê. Hûn ji malên xwe aware bîne û ketine nav destê qederê. Pa min hûn ji “hekemiyet” ê paşve dan lê belê hewe xwe li min bada û muxalifet kir wek wa kesên soz û hed şikandîn, heta ku ez mecbûr bûm bîr û hizra xwe wek vîyana hewe lê bikim. Bi rastî hûn ji wa mirovên mejî sivik û bê ‘eqlîn, ey bab mirîya! Ew qewmîna mezin û ew xirabî ne min kir û min nevîyaye ez zererê bidim hewe.

AXIFTINA 37

Paş temirandina xewaricên Nehrewanê li sala 38-ê h. li Kûfayê axiftîye:

Wê roja ku xelkê sistî dikira ez ji bona arîkarî ya dîn rabîm û wê rojê ku xelkê xwe xef dikira ez eşkere hatim meydanê û wê roja ku hemî ziman ji kar ketîn ez bûm min diaxifta, û dema xelk sekinî bîn ez pê nûrha Xuda diçûma, ez ji hemîyan deng niviztir bûm (daxwazên min kêmtir bûn) lê belê li kar da ez pêş hemîyade bîm, min karûbar bi dest xwe girtin û ez pêşve diçûma û min bi tinêkî “girû” dibira, wek çîya, ku bayên dijwar ew nabizivanda û tufanan ew ji cih naqeliqanda.

Kesî nikarîya kêmasîyê ji min ra çêkê û kesî nikarîya ‘eybekî li ser min bêjê.

في تخويف أهل النهروان

فَأَنَا نَذِيرٌ لَكُمْ أَنْ تُصْبِحُوا صَرْعَى بِأَثْنَاءِ هذَا النَّهَرِ، وَبِأَهْضَامِ هذَا الْغَائِطِ، عَلَى غَيْرِ بَيِّنَةٍ مِنْ رَبِّكُمْ، وَلاَ سُلْطَانٍ مُبِينٍ مَعَكُمْ، قَدْ طَوَّحَتْ بِكُمُ الدَّارُ، وَاحْتَبَلَكُمُ الْمِقْدَارُ، وَقَدْ كُنْتُ نَهَيْتُكُمْ عَنْ هذِهِ الْحُكُومَةِ فَأَبَيْتُمْ عَلَيَّ إِبَاءَ المخالفين، حَتَّى صَرَفْتُ رَأْيِي إِلَىْ هَوَاكُمْ، وَأَنْتُمْ مَعَاشِرُ أَخِفَّاءُ الْهَامِ، سُفَهَاءُ الأَحْلاَمِ، وَلَمْ آتِ ـ لاَ أَبَا لَكُمْ ـ بُجْراً، وَلاَ أَرَدْتُ لَكُمْ ضُرّاً.

[37]

من كلام له عليه السلام

يجري مجرى الخطبة

فَقُمْتُ بِالأَمْرِ حِينَ فَشِلُوا، وَتَطَلَّعْتُ حِينَ تَعْتَعُوا، وَمَضَيْتُ بِنُورِ اللهِ حِينَ وَقَفُوا، وَكُنْتُ أَخْفَضَهُمْ صَوْتاً، وَأَعْلاَهُمْ فَوْتاً، فَطِرْتُ بِعِنَانِهَا، وَاسْتَبْدَدْتُ بِرِهَانِهَا،

Mirovê şikestî li bal min hêzdar e heta ez heqê wî bistînim, û mirovê bi hêz li bal min ze'îf e heta ez heq jê bistînim.

Em bi qeza û qedera Xwedê razî ne û em teslîmê emr û fermana Wî ne.

Gelo tu guman dikî ez derewa li Pêğemberê Xwedê dikim selat û selam li ser bin?

Sond bi Xwedê! Ez ewilîn kes im ku min ew tesdîq kirîye vêca ez nabim ji ewilîn kesên ku derewan li ser çêkin.

Min berê xwe da hal û karûbarê xwe, wekî min dît ferman birina min (ji Pêğember s) pêşîya bey'eta min da ye, û soz û peymanek ji bona kesekî dî li stowê min da heye.

AXIFTINA 38

Paş şerê Siffînê li sala 37-ê h. Derheq şubhê da axiftîye:

Ji şubhê ra şubhe gotine çiko şebahet heye di gel heqî yê, vêca hindîke welî yên Xwedê ne pê ronahî ya yeqênî berê xwe didin wê û rê nimûnê wan hidayet û durustîye.

Lê belê dijminên Xwedê, zelalet û xeletî gazîkerê wa ye, û rê nimûnê wan jî kûrî ye.

Ne ew kesê ji mirinê ditirsê ji mirinê xilas dibê û ne jî ewê hej jîyana ebedî

كَالْجَبَلِ لاَ تُحَرِّكُهُ الْقَوَاصِفُ، وَلاَ تُزِيلُهُ الْعَوَاصِفُ.

لَمْ يَكُنْ لاِحَد فِـيَّ مَهْمَـزٌ، وَلاَ لِقَائِل فِيَّ مَغْمَزٌ.

الذَّلِيلُ عِنْدِي عَزِيزٌ حَتَّى آخُـذَ الْحَقَّ لَهُ، وَالْقَوِيُّ عِنْـدِي ضَـعِيفٌ حَتَّى آخُذَ الْحَقَّ مِنْهُ.

رَضِينَا عَنِ اللهِ قَضَاءَهُ، وَسَلَّمْنَا لَه أَمْرَهُ. أَتَرَانِي أَكْذِبُ عَلَى رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله؟

وَاللهِ لاَنَا أَوَّلُ مَنْ صَدَّقَهُ فَـلاَ أَكُونُ أَوَّلَ مَنْ كَذَبَ عَلَيْهِ.

فَنَظَـرْتُ فِـي أَمْـرِي، فَـإِذَا طَاعَتِي قَدْ سَـبَقَتْ بَيْعَتِـي، وَإِذَا الميثَاقُ فِي عُنُقِي لِغَيْرِي.

[38]

[وفيها علة تسمية الشبهة شبهة]

وَإِنَّمَا سُمِّيَتِ الشُّـبْهَةُ شُـبْهَةً لاِنَّهَا تُشْبِهُ الْحَقَّ، فَأَمَّا أَوْلِيَاءُ اللهِ فَضِيَاؤُهُمْ فِيهَا الْيَقِينُ، وَدَلِـيلُهُمْ سَمْتُ الْهُدَى،

dikê dibê xweyê wê jîyanê.

AXIFTINA 39

Dema qumandar ê Mu'awîye; Nu'manê Beşîr gel dû hezar kesa hêriş birî ser Eynuttemr ê sala 39 ê h. Ev axiftin kirîye:

Ez ketime şehê (bela) kesên ku dema ez fermanê didim, goh nadin min û dema ez gazî wan dikim cewaba min nadin.

Ey bê baba! Hûn çire arîkarîya dînê Xwedayê xwe nakin? Ma çi dîn û rêçik nînin ku hewe kom bikê? Ma xîret di hewe da nîne ku hewe bênê xezebê?

Eve ez li nav hewe da rabîme û hawar dikim û bo arîkarî yê gazî hewe dikim. Vêca ne hûn dengî min gohlê dibin, û ne çi fermanek ya min pêk tînin, heta ku dumahêka xirab ya kar û 'emelan eşkere dibê.

Pê hewe ne mirov dikarê tûlekî wergirê û ne jî mirov dikarê pê hewe bighê mexsedekî, min hûn ji bona arîkarîya biraderên hewe gazî hewe kir, vêca hewe kir ax û wax û hûn nalîn wek nalêna deva nexweş û êşê girtî û hewe xwe giran kir wek giranîya deva pişt kula bar lê kirî.

Paşîra jî leşkerûkek lerzan û ze'îf ji hewe hatin bal min (welê hereket dikiran) heçweku bal mirinê ve dihatan ajûtin wereng şaqiz bûn.

***Seyidê Rezî** li dûmahîka vê axiftinê da hinek kelîme me'ne kirine ku li tercumê da hatîye.*

وَأَمَّـا أَعْـدَاءُ اللهِ فَـدُعَاؤُهُمْ الضَّلالُ، وَدَلِيلُهُمُ الْعَمَـى، فَمَـا يَنْجُو مِنَ المَوْتِ مَنْ خَافَـهُ، وَلا يُعْطَى الْبَقَاءَ مَنْ أَحَبَّهُ.

[39]

[خطبها عند علمه بغزوة النعمان بن بشير صاحب معاوية لعين التمر]

مُنِيتُ بِمَنْ لاَ يُطِيعُ إِذَا أَمَـرْتُ وَلا يُجِيبُ إِذَا دَعَوْتُ،

لاَ أَبَـا لَكُـمْ! مَـا تَنْتَظِـرُونَ بِنَصْـرِكُمْ رَبَّكُـمْ؟ أَمَـا دِيـنٌ يَجْمَعُكُمْ، وَلاَ حَمِيَّةَ تُحْمِشُـكُمْ؟! أَقُومُ فِيكُمْ مُسْتَصْرِخاً، وَأُنَـادِيكُمْ مُتَغَوِّثاً، فَلاَ تَسْمَعُونَ لي قَوْلاً، وَلاَ تُطِيعُون لِي أَمْراً، حَتَّـى تَكَشَّـفَ الأُمُورُ عَنْ عَوَاقِبِ الْمَساءَةِ،

فَمَا يُدْرَكُ بِكُمْ ثَارٌ، وَلاَ يُبْلَـغُ بِكُمْ مَرَامٌ، دَعَـوْتُكُمْ إِلَـى نَصْـرِ إِخْـوَانِكُمْ فَجَرْجَـرْتُمْ جَرْجَـرَةَ الْجَمَلِ الأَسَـرِّ، وَتَثَـاقَلْتُمْ تَثَاقُـلَ الْنِّضْوِ الأَدْبَرِ، ثُمَّ خَرَجَ إِلَيَّ مِـنْكُمْ

جُنَيْدٌ مُتَذَائِبٌ ضَعِيفٌ (كَأَنَّمَا يُسَاقُونَ إِلَى الْمَوْتِ وَهُمْ يَنْظُرُونَ).

قوله (عليه السلام): «مُتَذَائِبٌ» أي: مضطرب، من قولهم: تذاءبت الريح أي: اضطرب هبوبها، ومنه سمّي الذئب، لاضطراب مشيته.

AXIFTINA 40

Dema gohlê bû ku xewaric dibêjin "la hukme illa lillah – xêncî Ĥukum û fermana Xwedê çi fermanê dî qebûl nine" li sala 38 h. li mizgefta Kûfayê de wiha got:

Ev peyvek heq e lê bi niyetek xirab tê gotin, belê, bi rastî xêncî Ĥukum û fermana Xuda çi Ĥukum nînin, lê belê ew dibêjin: Xêncî Xuda çi hukumdar û serpêş nînin, halhale ji mirovan ra hukumdar û emîrek pêdivê ye, çi qenckar û çi xirabkar. Da ku bawerdar li ber siha (sî -sîber) hukumdarî ya wî karê xwe bikê û kafir jî jîyana xwe derbaz bikê heta ku ecelê wan bighê, û da bi rêka wî ve beytulmala muslimana bê kom kirin û digel dijmin şer bê kirin û rêk û rêbar êmin bibin û bi rêka wî ve heqê yê ze'îf ji yê qewî bê sitandin û mirovê qenckar rihet bibê û ji bela mirovê xirab xilas bibê (bikevê rihetî yê).

Gûrekî riwayetek dî dema ev gotina xewarican seh kir wiha got: Ez hêvîya hukmê Xuda me derheq hewe de.

Her wiha got: Li hukmeta qenca da, mirovê teqwa mijûlê karê xweye, û li hukmeta zalima da jî mirovê xirabkar ji jîyanê behrê werdigrê heta ku temenê wî xilas bibê û mirina wî bighê.

[**40**]

في الخوارج لما سمع قولهم: «لا حكم إلاّ لله» قال عليه السلام :

كَلِمَةُ حَقٍّ يُرَادُ بِهَا بَاطِلٌ! نَعَمْ إِنَّهُ لا حُكْمَ إِلاَّ لله، ولكِنَّ هؤُلاَءِ يَقُولُونَ: لاَ إِمْرَةَ، فَإِنَّهُ لاَبُدَّ لِلنَّاسِ مِنْ أَمِير بَرّ أَوْ فَاجِر، يَعْمَلُ فِي إِمْرَتِهِ الْمُؤْمِنُ، وَيَسْتَمْتِعُ فِيهَا الْكَافِرُ، وَيُبَلِّغُ اللهُ فِيهَا الأَجَلَ، وَيُجْمَعُ بِهِ الْفَيءُ، وَيُقَاتَلُ بِهِ الْعَدُوُّ، وَتَأْمَنُ بِهِ السُّبُلُ، وَيُؤْخَذُ بِهِ لِلضَّعِيفِ مِنَ الْقَوِيِّ، حَتَّى يَسْتَرِيحَ بَرٌّ، وَيُسْتَرَاحَ مِنْ فَاجِر.

وفي رواية أُخرى أنّه (عليه السلام) لمّا سمع تحكيمهم قال: حُكْمَ اللهِ أَنْتَظِرُ فِيكُمْ.

وقال:

AXIFTINA 41

Paş Siffînê sala 37 h. Li Kûfayê axiftîye:

Gelî xelkîno! Wefa, têkel e digel rastî û duristîyê, ez çi mertalan nas nakim ku ji wefayê pitir mirov ji belan biparêzê, û ew kesê bizanê ku paş mirinê wê kûve biçê, yêkcar xîyanet nakê.

Em li zemanekî da dijîn ku pirtirê xelkê wê xapandinê ji xwera zîrekatî hesab dikin, mirovê cahil û nezan jî ewî karzan hesab dikin, çi li wan hatîye! Xwedê wan bikujê! Hene mirovên karzan û zîrek ku rêka hîla dizanin lê belê emr û nehyên Xwedê pêşî yî li wan digrin, ew her çend ku rî û resma hîlebazî û xapandinê dizanin û dikarin bikin jî, lê belê xwe nêzîkê wê nakin. Ew kesên xwe ji gonehan û muxalifeta dîn venadin ewin yên li forsetê digerihên ku xelkê bixapînin û hîlan li wan bikin.

AXIFTINA 42

Qismeteke ji axiftina dazdê receba sala 36 h. Li mizgefta cami' ya Kûfayê da. Piştî ku dû rek'et nimêj kir, rabû û wiha axift:

أَمَّا الأَمْرَةُ الْبَرَّةُ فَيَعْمَلُ فيها التَّقِيُّ، وَأَمَّا الأَمْرَةُ الْفَاجِرَةُ فَيَتَمَتَّعُ فِيهَا الشَّقِيُّ، إلى أَنْ تَنْقَطِعَ مُدَّتُهُ، وَتُدْرِكَهُ مَنِيَّتُهُ.

[41]

[فيها ينهى عن الغدر ويحذر منه]

أَيُّهَا النَّاسُ! إِنَّ الْوَفَاءَ تَوْأَمُ الصِّدْقِ، وَلاَ أَعْلَمُ جُنَّةً أَوْقَى مِنْهُ، وَمَا يَغْدِرُ مَنْ عَلِمَ كَيْفَ الْمَرْجِعُ، وَلَقَدْ أَصْبَحْنا في زَمَان اتَّخَذَ أَكْثَرُ أَهْلِهِ الْغَدْرَ كَيْساً، وَنَسَبَهُمْ أَهْلُ الْجَهْلِ فِيهِ إِلى حُسْنِ الْحِيلَةِ، مَا لَهُمْ! قَاتَلَهُمُ اللهُ! قَدْ يَرَى الْحُوَّلُ الْقُلَّبُ وَجْهَ الْحِيلَةِ وَدُونَهَا مَانِعٌ مِنْ أَمْرِ اللهِ وَنَهْيِهِ، فَيَدَعُهَا رَأْيَ عَيْنٍ بَعْدَ الْقُدْرَةِ عَلَيْهَا، وَيَنْتَهِزُ فُرْصَتَهَا مَنْ لاَ حَرِيجَةَ لَهُ فِي الدِّينِ.

[42]

Mirovno! Zêdetir ji her tiştî ez ji bona dû tiştan ji hewe ditirsim: Pey ketina hewayê nefsê û hêvî yên (arzû) dûr û dirêj. Hindîke hewayê nefsêye, ew pêşî yê li heqî yê digrê, (arzû û) hêvî yên dûr û dirêj jî axretê didin ji bîr kirin.

Agah bin ku dinyayê pişt daye û bi lez û bez diçê, tiştek jê nemaye xêncî qasê mayî bi binê tasikêve ku ava têda rijandibin.

Heyhê bizanin, axret jî berew hatine. Her yêk ji dinya û axretê ewlad hene, vêca hûn bibin ji ewladê axretî û nebin ji ewladê dinyayê, çiko bi rastî her ewladek roja qîyametê wê bighê babê xwe; Îro xebate û hesab, sibehî hesabe û xebat nîne.

(Seyidê Rezî li dûmahîka vê axiftinê da hinek kelîme me'ne kirine ku li tercumê da hatîye)

۞ AXIFTINA 43 ۞

Sala 36-ê h. Ku Cerîrê korê 'Ebdullahê Biclî rêkir bal Mu'awîye, hogirên wî gotinê xwe hazirê şer bike vêca ewî wiha axift:

ومن خطبة له(عليه السلام)

[وفيها يحذر من اتباع الهوى

وطول الامل في الدنيا]

أَيُّهَا النَّـاسُ! إِنَّ أَخْـوَفَ مَـا أَخَافُ عَلَيْكُمُ اثْنَانِ: اتِّبَاعُ الْهَوَى، وَطُولُ الأَمَلِ; فَأَمَّا اتِّبَـاعُ الْهَـوَى فَيَصُدُّ عَنِ الْحَقِّ، وَأَمَّا طُولُ الأَمَلِ فَيُنْسِي الآخِرَةَ.

أَلاَ وَإِنَّ الدُّنْيَا قَدْ وَلَّتْ حَذَّاءَ، فَلَمْ يَبْقَ مِنْهَا إِلاَّ صُـبَابَةٌ كَصُـبَابَةِ الإِنَاءِ اصْطَبَّهَا صَابُّهَا،

أَلاَ وَإِنَّ الآخِـرَةَ قَـدْ أَقْبَلَـتْ، وَلِكُلٍّ مِنْهُمَا بَنُـونَ، فَكُونُـوا مِـنْ أَبْنَاءِ الآخِرَةِ، وَلاَ تَكُونُوا مِنْ أَبْنَاءِ الدُّنْيَا، فَإِنَّ كُلَّ وَلَد سَيُلْحَقُ بِأُمِّـهِ يَوْمَ الْقِيَامَةِ، وَإِنَّ الْيَوْمَ عَمَـلٌ وَلاَ حِسَابَ، وَغَداً حِسَابٌ وَلاَ عَمَلَ.

Bi rastî hazirî ya min bo şerê ehlê Şamê, hêca Cerîr li bal wan, dergeh girtine li ber Şamê, eger şamî bixazin karek qenc bikin, ev kar, pêşî girtina li waye. Lê belê min ji bona Cerîr zemanek deynaye eger neyê xapandin an ne gohdarîyê nekê zêdetir ji wî wextî li wêderê namînê, bîr û hizra min digel xweragirî û sebirdarîyê ye, vêca hûn jî niha biborînin, elbet eger hewe hazirîya şer hebê ez ne muxalif im.

Bi rastî min hemî alîyên vê meselê lê kûlaye û min ew ser û binu kirîye, vêca ji dû rêka pêve li ber min nîne; an şer û an jî inkara wê ya (hezretê) Muhemmed selewat û selamên Xuda li ser bin ji mera anîyî. Bi rastî li ser vê ummetê hukumdarek hebû û hinek kar û ‘emel jê çêbîn ku bû sebebê ne razîbûna xelkê, vêca gotina xwe gotin û paşê jî lê rabîn û ew goherandin.

AXIFTINA 44

Mesqele yê korê Hubeyre yê Şeybanî esîrên benî Nacîye ji fermandarê mîrê bawerdaran kirîn û aza kirin, hezretê ‘Elî bihayê wê xwest, Mesqele revî çû giha Mu’awîye, vê derheqê da Imam li sala 38-ê h. wiha axiftîye:

ومن كلام له عليه السلام وقد أشار عليه أصحابه بالاستعداد لحرب أهل الشام بعد إرساله جرير بن عبدالله البجلي إلى معاوية:

إِنَّ اسْتَعْدَادِي لِحَرْبِ أَهْلِ الشَّامِ وَجِرِيرٌ عِنْدَهُمْ، إِغْلاَقٌ لِلشَّامِ، وَصَرْفٌ لاِهْلِهِ عَنْ خَيْرٍ إِنْ أَرادُوهُ، وَلَكِنْ قَدْ وَقَّتُّ لِجَرِيرٍ وَقْتاً لاَ يُقِيمُ بَعْدَهُ إِلاَّ مَخْدُوعاً أَوْ عَاصِياً، وَالرَّأْيُ مَعَ الأَنَاةِ، فَأَرْوِدُوا، وَلاَ أَكْرَهُ لَكُمُ الأَعْدَادَ.

وَلَقَدْ ضَرَبْتُ أَنْفَ هذَا الأَمْرِ وَعَيْنَهُ وَقَلَّبْتُ ظَهْرَهُ وَبَطنَهُ، فَلَمْ أَرَلِي إِلاَّ الْقِتَالَ أَوِ الْكُفْرَ. إِنَّهُ قَدْ كَانَ عَلَى الأُمَّةِ وَال أَحْدَثَ أَحْدَاثاً، وَأَوْجَدَ النَّاسَ مَقَالاً، فَقَالُوا، ثُمَّ نَقَمُوا فَغَيَّروا.

[**44**]

لمّا هرب مَصْقَلة بنُ هُبيرة

Xwedê Mesqele kirêt (rû reş) bikê, karê wî karê serwera bû û reva wî reva kûleyan, hêca medehkarê wî axiftin despê nekirî, ew bê deng kir û hêca duristîya pesnderê wî kifş nebûyî ew li ‘erdê da.

Eger mabûya (neçûba) ewa jê bihata me wê ewqas jê bigirta û me wê muhlet bidayê heta mal bihata desta.

AXIFTINA 45

Hinek ji axiftina roja ‘eyda Fitrê ku li Kûfayê axiftîye:

Hemd û sipas ji Xwedêra, ewê kes ji rehma wî ne bê hêvî û ji ni’metên wî ne bê behr û ji ‘efwa (bexşîn) wî ne bê umîd û ji ‘ibadetê wîra ne kubar, ew Xweda yê ku rehmeta Wî vebir jê ra nîne û ni’met û qencî yên wî xilas nabin.

Dinya avahîyeke ku wê ji nav biçê; wê xelkê wê jê kûç bikin, ew şîrîn û têr şînkatîye, ewên pey wê bikevin zûka ewa peyda dikê û ewê berê xwe bidîyê (hezkirina wî) dikevê dilê wî. Nixwe sefera xwe ji wê pê wergirtina rizqê çêtir despê bikin, di wê de zêdetirê ji têra xwe nexwazin û nekevin pey qasî zêdeyê ji ihtiyaciya xwe.

الشيباني إلى معاوية، وكان قد ابتاع سَبْيَ بني ناجية من عامل أميرالمؤمنين(ع) وأعتقهم، فلمّا طالبه بالمال خاس به وهرب إلى الشام، فقال:

قَبَّحَ اللهُ مَصْقَلَةَ! فَعَلَ فِعْلَ السَّادَةِ، وَفَرَّ فِرَارَ الْعَبِيدِ! فَمَا أَنْطَقَ مَادِحَهُ حَتَّى أَسْكَتَهُ، وَلاَ صَدَّقَ وَاصِفَهُ حَتَّى بَكَّتَهُ،

=======

========

[45]

بعض خطبة طويلة خطبها يوم الفطر

الْحَمْدُ لله غَيْرَ مَقْنُوط مِنْ رَحْمَتِهِ، وَلاَ مَخْلُوٍّ مِنْ نِعْمَتِهِ، وَلاَ مَأْيُوس مِنْ مَغْفِرَتِهِ، وَلاَ مُسْتَنْكَف عَنْ عِبَادَتِهِ، الَّذِي لاَ تَبْرَحُ مِنْهُ رَحْمَةٌ، وَلاَ تُفْقَدُ لَهُ نِعْمَةٌ.

وَالدُّنْيَا دَارٌ مُنِيَ لَهَا الْفَنَاءُ، وَلاَِهْلِهَا مِنْهَا الْجَلاَءُ، وَهِيَ حُلْوَةٌ خَضِرَةٌ، قَدْ عُجِّلَتْ لِلطَّالِبِ،

۞ AXIFTINA 46 ۞

Dema niyet kirî ku bi alîyê Şamêve biçê li sala 37-ê hicrî, pîyê xwe deyna di rikêbê de û got:

Ya ilahî! Ji ber zehmeta seferê û mereqa zivirînê û dîtina tiştên nehez li nav malê û mal û zaruka de ez hana xwe digihînim te, ey Xuda! Li seferê de tuyî xudanî min, û tuyî yê hay ji ehl û ‘îyalê min bimînî; xêncî te kes nikarê eva herdû kara pêk bênê, çiko ewê şûna mirov de paş mirovve mayî, ew ne digel mirove û ewê digel mirov jî ew şûna mirov de, ne li ser malê ye.

***Seyidê Rezî** dibêjê: Despêka vê axiftinê gotina Pêğembere selat û selamên Xwedê li ser bin, û mîrê bawerdara pê belaxetek temam dewam daye gotina Pêğember (s) ji “xêncî te kes nikarê eva herdû kara pêk bênê” heta axirîka vê gotinê axiftina wî ye.*

۞ AXIFTINA 47 ۞

Derheq Kûfayê da axiftîye:

Ey Kûfe! Heçweku ez dibînim tu dê wek çermê sûka “Ukkaz” ji her alîyî ve bêy kişandin (wek debax kirina çerm) û li ber qewimînan biperçiqî û belayên

وَالْتَبَسَتْ بِقَلْبِ النَّاظِرِ; فَارْتَحِلُوا مِنْهَا بِأَحْسَنِ مَا بِحَضْرَتِكُمْ مِنَ الزَّادِ، وَلاَ تَسْأَلُوا فِيهَا فَوْقَ الْكَفَافِ، وَلاَ تَطْلُبُوا مِنْهَا أَكْثَرَ مِنَ الْبَلاَغِ.

[46]

عند عزمه على المسيرإلى الشام

اللَّهُمَّ إِنِّي أَعُوذُ بِكَ مِن ْوَعْثَاءِ السَّفَرِ وَكَآبَةِ الْمُنْقَلَبِ، وَسُوءِ الْمَنظَرِ فِي الأَهْلِ وَالمَالِ والْوَلَدِ.

اللَّهُمَّ أَنْتَ الصَّاحِبُ في السَّفَرِ، وَأَنْتَ الْخلِيفَةُ فِي الأَهْلِ، وَلاَ يَجْمَعُهُما غَيْرُكَ، لاِنَّ الْمُسْتَخْلَفَ لاَ يَكُونُ مُسْتَصْحَباً، وَالمُسْتَصْحَبُ لاَ يَكُونُ مُسْتَخْلَفاً.

وابتداء هذا الكلام مرويّ عن رسول الله(صلى الله عليه وآله)، وقد قفّاه(عليه السلام) بأبلغ كلام وتمّمه بأحسن تمام; من قوله: «ولا يجْمَعُهُمَا غَيْرُكَ» إلى آخر الفصل.

[47]

mezin ser te de bên. Bi rastî ez baş dizanim, heçî zalimê bi xirabî berê xwe bidê te wê Xwedê belayê ser de rêkê an jî wê bi destê kesekî bidê kuştin.

AXIFTINA 48

Dema ketî rê bo şerê digel şamîya li Nuxeyle ya Kûfayê wiha axiftîye (28-ê Şewal, sala 37-ê h.)

Hemd û sipas bo Xwedê, li wî wextî de dema şev tê û tarî dibê; hemd û sipas bo Xwedê, çiqa stêrek diteyisê û winda dibê; hemd ji Xuda ra ku ni'met û qencî yên wî xilas nabin û kes nikarê şukrê li ser hemî qencî yên wî bikê.

... Min ser pêşa 'eskerê xwe hinartîye û gotîye ku ji etrafê rûbarê foratê dûr nekevin heta ku fermana min bighê. Bîr û hizra min li ser wê sekinî ku ez ji vê avê derbaz bibim û biçim bal wa mirovên ku warê wan rex tenişta "Dicle" û ewa rakim da digel hewe bên bi alîyê dijminê hewe ve û ez ewa bikim arîkar ji bona bi hêz kirina hewe.

***Seyidê Rezî** li dûmahîka vê axiftinê de hinek kelîme û rista me'ne dikê.*

ومن كلام له(عليه السلام)

في ذكر الكوفة

كَأَنِّي بِكِ يَاكُوفَةُ تُمَدِّينَ مَدَّ الأَدِيمِ الْعُكَاظِيِّ، تُعْرَكِينَ بِالنَّوَازِلِ، وَتُرْكَبِينَ بِالزَّلَازِلِ، وَإِنِّي لأَعْلَمُ أَنَّهُ مَاأَرَادَ بِكِ جَبَّارٌ سُوءاً إِلاَّ ابْتَلاَهُ اللهُ بِشَاغِلٍ، وَرَمَاهُ بِقَاتِلٍ!

[48]

ومن خطبة له(عليه السلام) عند المسير إلى الشام [قيل: إنه خطب بها وهو بالنخيلة خارجاً من الكوفة إلى صفين:]

الْحَمْدُ للهِ كُلَّمَا وَقَبَ لَيْلٌ وَغَسَقَ، وَالْحَمْدُ للهِ كُلَّمَا لاَحَ نَجْمٌ وَخَفَقَ، والْحَمْدُ للهِ غَيْرَ مَفْقُودِ الأَنْعَامِ، وَلاَ مُكَافَأَ الأَفْضَالِ.

أَمَّا بَعْدُ، فَقَدْ بَعَثْتُ مُقَدِّمَتِي، وَأَمَرْتُهُمْ بِلُزُومِ هذَا المِلْطَاطِ، حَتَّى يَأْتِيَهُمْ أَمْرِي، وَقَدْ رَأَيْتُ أَنْ أَقْطَعَ هذِهِ النُّطْفَةَ إِلَى شِرْذِمَةٍ مِنْكُمْ، مُوَطِّنِينَ أَكْنَافَ دَجْلَةَ، فَأُنْهِضَهُمْ مَعَكُمْ إِلَى عَدُوِّكُمْ، وَأَجْعَلَهُمْ مِنْ

أَمْدَادِ الْقُوَّةِ لَكُمْ.

يعني عليه السلام بالملطاط هـا هنـا: السّمْتَ الذي أمرهم بلزومه، وهو شاطىء الفرات، ويقال ذلك أيضاً لشاطىء البحر، وأصله مـا اسـتوى مـن الارض. ويعنـي بالنطفة: ماء الفـرات، وهـو مـن غريـب العبارات وعجيبها.

۞ AXIFTINA 49 ۞

Hemd û sipas bo wî Xwedayê ku veşartî yê tişta zanê û hemî nîşanên eşkere, ewî nîşan didin û li wî halî de jî çavên bîna ewî nabînin, vêca ew çavê ewî nebînê, nikarê heyîna wî inkar bikê û kesê bi dil dîtibê nikarê bighê kwîratîya zatê wî, li bilindahî yê de pêşî standî ye vêca tiştek ser wî re nîne, û li nêzîkyê da jî ew qas nêzîke ku tiştek ji wî nêzîktir nîne, vêca ne bilindî ya wî ew ji mexlûqê wî dûr kirîye û ne jî nêzîkî ya wî ew li cih û mekan da digel xêncî wî beraber kirîye. ‘Eql bi çewanîya sifetên xwe nehesandine û ji nas kirina xwe ya qasê lazim re jî pêşî lê negirtîye, vêca ew e yê hemî nîşanên ‘alema heyînê bo wî şahidîyê didin ku dilê mirovê munkir jî ewî bawer dikê. Bilindtir e ji wê ya (Ehlê teşbîh û inkarê) derheq wî de dibêjin û pir bilindtir e.

[49]

الْحَمْدُ لله الَّذِي بَطَنَ خَفِيَّاتِ الأُمُورِ، وَدَلَّتْ عَلَيْهِ أَعْلاَمُ الظُّهُورِ، وَامْتَنَعَ عَلَى عَيْنِ الْبَصِيرِ; فَلاَ عَيْنُ مَنْ لَمْ يَرَهُ تُنْكِرُهُ، وَلاَ قَلْبُ مَنْ أَثْبَتَهُ يُبْصِرُهُ، سَبَقَ فِي الْعُلُوِّ فَلاَ شَيءَ أَعْلَى مِنْهُ، وَقَرُبَ فِي الدُّنُوِّ فَلاَ شَيْءَ أَقْرَبُ مِنْهُ، فَلاَ اسْتِعْلاَؤُهُ بِاعَدَهُ عَنْ شَيْء مِنْ خَلْقِهِ، وَلاَ قُرْبُهُ سَاوَاهُمْ فِي المَكَانِ بِهِ، لَمْ يُطْلِعِ الْعُقُولَ عَلَى تَحْدِيدِ صِفَتِهِ، وَلَمْ يَحْجُبْهَا عَنْ وَاجِبِ مَعْرِفَتِهِ، فَهُوَ الَّذِي تَشْهَدُ لَهُ أَعْلاَمُ الْوُجُودِ، عَلَى إِقْرَارِ قَلْبِ ذِي الْجُحُودِ، تَعَالَى اللهُ عَمَّا يَقولُ الْمُشَبِّهُونَ بِهِ وَالْجَاحِدُونَ لَهُ عُلوّاً كَبِيراً!

۞ AXIFTINA 50 ۞

Ev axiftin li sala 38 ya hicrî da derheq despîka fitnê de hatîye kirin.

Despêka çêbûna fitnê tinê (feqet) pey ketina hewayê nefsê û “bid’e” deynane, ew bid’e yên ku muxalifê kitêba Xwedêne, vêca hinek kes li wa tişta de

[50]

فيها بيان لما يخرب العالم به من الفتن

ku muxalifê dînê Xwedêne arîkarîya hinek dî dikin. Eger batil tevlî heqî yê nebîbîya ji heqxwazanre veşartî nedima û eger heq pê batil nehata nixumandin wê zimanê dijmina jê bihata birîn, lê belê qevdekî ji vê û qevdekî ji wê digrin û tevhev dikin.

Vêca hingê ye ku şeytan ser hevalên xwe zal dibê, û kesên pêşda rehmeta Xwedê gehiştî wan xilas dibin.

إِنَّمَا بَدْءُ وُقُوعِ الْفِتَنِ أَهْوَاءٌ تُتَّبَعُ، وَأَحْكَامٌ تُبْتَدَعُ، يُخَالَفُ فِيهَا كِتابُ الله، وَيَتَوَلَّى عَلَيْهَا رِجَالٌ رِجَالاً، عَلَى غَيْرِ دِينِ الله، فَلَوْ أَنَّ الْبَاطِلَ خَلَصَ مِنْ مِزَاجِ الْحَقِّ لَمْ يَخْفَ عَلَى الْمُرْتَادِينَ، وَلَوْ أَنَّ الْحقَّ خَلَصَ مِنْ لَبْسِ البَاطِلِ انْقَطَعَتْ عَنْهُ أَلْسُنُ الْمُعَانِدِينَ; وَلكِن يُؤْخَذُ مِنْ هذَا ضِغْثٌ، وَمِنْ هذَا ضِغْثٌ، فَيُمْزَجَانِ!

فَهُنَالِكَ يَسْتَوْلِي الشَّيْطَانُ عَلَى أَوْلِيَائِهِ، وَيَنْجُو الَّذِينَ سَبَقَتْ لَهُمْ مِنَ الله الْحُسْنَى.

۞ AXIFTINA 51 ۞

Li şerê Siffînê de sala 37-ê h. dema ‘eskerê Mu’awîye ava Firatê ser ‘eskerê hezretê ‘Elî de girtî wiha axiftîye:

Eve ewa hûn de’wetê şer kirine (û hûn li ser durîyanê ne) an zelîlî û ketina ji wê rutba hûn têda, an jî avdana şûran pê xûnê û têr av vexarina hewe, vêca mirin ew e hûn sax bimînin û bindest, jîyan jî ew e hûn bi serferazî bimirin.

Bizanin ku Mu’awîye pêşkarî kir ji bona komek rê xelet û heqîqeta meselê ji wan veşart, heta ku gerî (qirik–gerden) ya xwe kirin armanc û nîşana tîrên mirinê.

[51]

لمّا غلب أصحاب معاوية أصحابه على شريعة الفرات بصفين ومنعوهم الماء:

قَدِ اسْتَطْعَمُوكُمُ الْقِتَالَ، فَأَقِرُّوا عَلَى مَذَلَّة، وَتَأْخِيرِ مَحَلَّة، أَوْ رَوُّوا السُّيُوفَ مِنَ الدِّمَاء تَرْوَوْا مِنَ الْمَاء، فَالمَوْتُ فِي حَيَاتِكُمْ مَقْهُورِينَ، وَالْحَيَاةُ فِي مَوْتِكُمْ قَاهِرِينَ.

أَلاَ وَإِنَّ مُعَاوِيَةَ قَادَ لُمَةً مِنَ الْغُوَاةِ وَعَمَّسَ عَلَيْهِمُ الْخَبَرَ، حَتَّى جَعَلُوا نُحُورَهُمْ أَغْرَاضَ الْمَنِيَّةِ.

۞ AXIFTINA 52 ۞

Kurteyek ji vê axiftinê pêş de derbaz bî, û li riwayetek dî de wiha hatîye neqil kirin:

[52]

تقدّم مختارها برواية ونذكرها هاهنا برواية أخرى لتغاير الروايتين

أَلاَ وَإِنَّ الـدُّنْيَا قَـدْ تَصَـرَّمَتْ، وَآذَنَتْ بِانْقِضَاء، وَتَنَكَّرَ مَعْرُوفُهـا، وَأَدْبَرَتْ حَذَّاءَ، فَهِيَ تَحْفِزُ بِالْفَنَـاء سُكَّانَهَا، وَتَحْدُو بِالْمَوْتِ جِيرَانَهَـا، وَقَدْ أَمَرَّ مِنْها مَا كَانَ حُلْواً، وَكَـدِرَ مِنْهَا ما كَانَ صَفْواً، فَلَمْ يَبْـقَ مِنْهَـا إِلاَّ سَمَلَةٌ كَسَمَلَةِ الإِدَاوَةِ، أَوْ جُرْعَةٌ كَجُرْعَـةِ الْمُقْلَـةِ، لَـوْ تَمَزَّزَهَـا الصَّدْيَانُ لَمْ يَنْقَعْ، فَأَزْمِعُوا عِبَادَ الله الرَّحِيلَ عَنْ هـذِهِ الـدَّارِ المَقْـدُورِ عَلَى أَهْلِهَـا الـزَّوالُ، وَلاَ يَغْلِبَـنَّكُمْ فِيهَـا الأَمَـلُ، وَلاَ يَطُـولَنَّ عَلَـيْكُمْ الأَمَدُ.

فَوَالله لَوْ حَنَنْتُمْ حَنِـينَ الْوُلَّـهِ الْعِجَالِ وَدَعَوْتُمْ بِهَدِيلِ الْحَمَـامِ، وَجَأَرْتُمْ جُؤَارَ مُتَبَتِّلِـي الرُّهْبَـانِ، وَخَرَجْتُمْ إِلَـى الله مِـنَ الأَمْـوَالِ وَالأَوْلاَدِ، الْتِمَاسَ الْقُرْبَةِ إِلَيْهِ فِـي

Agah bin ku evê dinyayê peywenda xwe birrîye û ber û çûne; gazî kirîye û xatirê xwe xwestî ye. Eve başî yên wê xef mane û bilez û bez diçin û ew kesên têda ewa jî dibê bo alîyê fena bûnê û cîranên xwe dibê dîyarê mirinê. Bi rastî şîrîna wê tehl bûye û ava zelala wê şêlu bûye û tiştek ji wê nemaye xêncî şilatîya binê hewzve mayî an qurtek av ku mêhtina wê têhnîtî ya mirovê têhnî jê nabê. Vêca nixwe ey bendeyên Xuda! Qesta seferê bikin ji vê dinyaya ku ji beyn çûn li ser ehlê wê hatîye nivîsîn û bila hêvî û arizû li vê dinyayê de serî ji hewe nestênê, û guman nekin ku wê jîyana hewe li wê derê dirêj bibê.

Sond bi Xwedê! Eger hûn wek hêştirên zarûk mirî ah û nalên bikîn û wek kevûkên cûta wan ji dest çûyî zarî bikîn û wek rahibên tarikê dinyayê gazî û hawar bikîn û desta ji mal û zaroka bikêşin û berew Xuda biçin da hûn nêzîkê Xwedê bibin û derce û rutba hewe li bal Xuda bilind bibê an gonehek ji wa gonehên li nama ‘emelada hatî nivîsîn û melaîketên wî paraztîn bê ‘efu kirin û bexşîn, hêca jî kême li beraberê wê xêra ez ji hewe re pê dizanim û wî ‘ezabê ku ez ditirsim ser hewe de bê.

Sond bi Xwedê, eger (ji tirs, an ‘eşqa Xwedê) dilên hewe bihelin û ji ber şewq an tirsa hewe ji wî, xwîn ji çavê hewe birijihê û heta dinya hebê hûn li vî halî de bimînin, ev kiryar û xebat û gohdana hewe li beraberê ni’met û qencî yên mezin yên Xwedê dayîn hewe qe, ne tişteke, û digel ni’meta îmanê tinê jî beraberîyê nakê.

AXIFTINA 53

Zehf ji wan kesên Nehc-ul belaxe şerh kirîn, axiftina 53 dewama axiftina 52 zanîne ku li rojek ya ‘eyda Qurbanê da axiftîye.

Şertê kamil bûna qurbanê ew e berê xwe bidin gohê wê ku ne kelaştî an birrîyî bê û kêmasî li çavê wê de tinebê, nixwe vêca eger ‘eyb û kêmasî li goh û çavê wê da nebê (qurbanî) durist e, eger çi şax şikestî an kulek (leng) bê û kulî kulî berew qurbangehê biçê û pîyê wê bi ’erdê ve bixişikin.

Seyidê Rezî: *“mensek” bi me’na “mezbeh”.*

AXIFTINA 54

Behsa bey’et kirnê ye (sal: 37 h.)

Vêca ewa wek wa devên têhnî ku qesta ser avê dikin û xudanê wan ew serberedayî kirîn û çûkbendên wan ji wa vekirîn, hêriş anîn ser min, biawayek welê hatin ku min guman kir, wê min bikujin an li beraberê min wê

ارْتِفَاعِ دَرَجَة عِنْدَهُ، أوغُفْرَانِ سَيِّئَة أَحْصَتْهَا كُتُبُهُ، وَحَفِظَتْهَا رُسُلُهُ، لَكَانَ قَلِيلاً فَيما أَرْجُو لَكُم مِنْ ثَوَابِهِ، وَأَخَافُ عَلَيْكُمْ مِنْ عِقَابِهِ.

وَتَاللهِ لَوِ انْمَاثَتْ قُلُوبُكُمُ انْمِيَاثاً، وَسَالَتْ عُيُونُكُمْ مِنْ رَغْبَة إِلَيْهِ وَرَهْبَة مِنْهُ دَماً، ثُمَّ عُمِّرْتُمْ فِي الدُّنْيَا، مَا الدُّنْيَا بَاقِيَةٌ، مَا جَزَتْ أَعْمَالُكُمْ [عَنْكُمْ] ـ وَلَوْ لَمْ تُبْقُوا شَيْئاً مِنْ جُهْدِكُمْ ـ أَنْعُمَهُ عَلَيْكُمُ الْعِظَامَ، وَهُدَاهُ إِيَّاكُمْ لِلاْيمَانِ.

[53]

ومن خطبة له(عليه السلام)

في ذكر يوم النحر وصفة الاضحية

وَمِنْ تَمَامِ الأُضحِيَةِ اسْتِشْرَافُ أُذُنِهَا، وَسَلاَمَةُ عَيْنِهَا، فَإِذَا سَلِمَتِ الأُذُنُ وَالْعَيْنُ سَلِمَتِ الأُضْحِيةُ وَتَمَّتْ، وَلَوْ كَانَتْ عَضْبَاءَ الْقَرْنِ تَجُرُّ رِجْلَهَا إِلَى المَنْسَكِ.

[54]

hevdû bikujin. Min hemî alî berê xwe da meselê (ez pir li ser fikirîm) heta êdî xew neket çavê min, vêca an divya ez digel wa (Mu'awîye û yên dî) bikevim şer, an jî wê ya (Pêğember) Muhemmed selat û selamên Xuda li ser bin anîyî inkar bikim. Vêca min dît çara şer siviktir e ji çara 'ezabê Xwedê û ji dest dana dinyayê rihet tir e ji dest dana axretê.

AXIFTINA 55

Li şerî Siffînê de hogirên wî digotan: Çire şer paş têxê? Li cewabê da got:

Ema gotina hewe ku hûn dibêjin: Paş êxistina şer ji ber hez ne kirina ji mirinê ye, sond bi Xwedê, ji min ra ferq nakê ku ez ser mirinê de biçim an jî mirin ser min de bê. Ema gotina hewe ku ez derheq şerê digel Şamîyan da ketime şikê!

Sond bi Xwedê, heta bi rojkî jî min şer paş ne êxistîye xêncî ji ber wê hêvî yê ku komek (ji muxalifan) xwe bigihînin min vêca bi rêka minve hidayet bibin û pê çavên tarî yên xwe bi alîyê ronahî ya minve bên, evahe li bal min şîrîntir e ku ez wa li ser xeletî ya wan bikujim, her çend gonehê wa li ser wa bi xwe ye.

AXIFTINA 56

ومن كلام له(عليه السلام)

فَتَدَاكُّوا عَلَيَّ تَدَاكَّ الإِبِلِ الْهِيمِ يَوْمَ وِرْدِهَا، قَدْ أَرْسَلَهَا رَاعِيهَا، وَخُلِعَتْ مَثَانِيهَا، حَتَّى ظَنَنْتُ أَنَّهُمْ قَاتِلِيَّ، أَوْ بَعْضُهُمْ قَاتِلُ بَعْض لَدَيَّ، وَقَدْ قَلَّبْتُ هذَا الأَمْرَ بَطْنَهُ وَظَهْرَهُ حَتَّى مَنَعَنِي النَّوْمَ، فَمَا وَجَدْتُنِي يَسَعْنِي إِلاَّ قِتَالُهُمْ أَوِ الْجُحُودُ بِمَا جَاءَ بِهِ مُحَمَّدٌ(صلى الله عليه وآله)، فَكَانَتْ مُعَالَجَةُ الْقِتَالِ أَهْوَنَ عَلَيَّ مِنْ مُعَالَجَةِ الْعِقَابِ، وَمَوْتَاتُ الدُّنْيَا أَهْوَنَ عَلَيَّ مِنْ مَوْتَاتِ الأُخِرَةِ.

[55]

وقد استبطأ أصحابه إذنه لهم في القتال بصفين

أَمَّا قَوْلُكُمْ: أَكُلَّ ذلِكَ كَرَاهِيَةَ الْمَوْتِ؟ فَوَاللهِ مَا أُبَالِي دَخَلْتُ إِلَى الْمَوْتِ أَوْ خَرَجَ الْمَوْتُ إِلَيَّ. وَأَمَّا قَوْلُكُمْ: شَكّاً فِي أَهْلِ الشَّامِ! فَوَاللهِ مَا دَفَعْتُ الْحَرْبَ يَوْماً إِلاَّ وَأَنَا أَطْمَعُ أَنْ تَلْحَقَ بِي

طَائِفَةٌ فَتَهْتَدِيَ بِي، وَتَعْشُوَ إِلى ضَوْئِي، فَهُوَ أَحَبُّ إِلَيَّ مِنْ أَنْ أَقْتُلَهَا عَلَى ضَلالِهَا، وَإِنْ كَانَتْ تَبُوءُ بِآثَامِهَا.

Behsa sehabên Pêğember (s) dikê:

Em digel resûlê Xuda bîn (s) me digel bab û kur û bira û mamên xwe şer dikira û ev yêk dibîya hegera zêde bûna bawerî û teslîm bûna me (li beraberê Xudê da) em li ser rêka rast û durist diçûna û me li ser dijwarî ya êşê sebir dikira û li cihada digel dijmin de em gelek ji dil bîn, carna zelamek ji me û yêk ji dijmin wek pehlewana hucûm dibiran hev û her yêkî ji wan divîya canê yê dî bigrê, vêca car hebû me, canê dijminê xwe bigirta û car jî hebû ewa ji me digirta, vêca dema Xuda rastî û duristî ya me dît dijminê me zelîl kir û arîkarî ji mera rêkir, heta iselametî yê cih girt û qayîm bû û li ciha bilav bî. Ez bi canê xwe kim, eger em wek hewe bîna, sitûna dîn nedihat vedan û dara îmanê heşîn nedibû, sond bi Xwedê, ji hir pêve hûnê xwînê bidûşîn û di peyda jî puşmanî ji hewe re heye.

[56]

[يصف أصحاب رسول الله]

وَلَقَدْ كُنَّا مَعَ رَسُولِ الله صلى الله عليه وآله، نَقْتُلُ آبَاءَنَا وَأَبْنَاءَنَا وَإِخْوَانَنا وَأَعْمَامَنَا، مَا يَزِيدُنَا ذلِكَ إِلاَّ إِيمَاناً وَتَسْلِيماً، وَمُضِيّاً عَلَى اللَّقَمِ، وَصَبْراً عَلى مَضَضِ الأَلَمِ، وَجِدّاً عَلى جِهَادِ الْعَدُوِّ،

وَلَقَدْ كَانَ الرَّجُلُ مِنَّا وَالآخَرُ مِنْ عَدُوِّنا يَتَصَاوَلانِ تَصَاوُلَ الْفَحْلَيْنِ، يَتَخَالَسَانِ أَنْفُسَهُمَا، أَيُّهُمَا يَسْقِي صَاحِبَهُ كَأْسَ المَنُونِ، فَمَرَّةً لَنَا مِنْ عَدُوِّنَا، ومَرَّةً لِعَدُوِّنا مِنَّا، فَلَمَّا رَأَى اللهُ صِدْقَنَا أَنْزَلَ بِعَدُوِّنَا الْكَبْتَ، وَأَنْزَلَ عَلَيْنَا النَّصرَ، حَتَّى اسْتَقَرَّ الاْسْلاَمُ مُلْقِياً جِرَانَهُ وَمُتَبَوِّئاً أَوْطَانَهُ، وَلَعَمْرِي لَوْ كُنَّا نَأْتِي مَا أَتَيْتُمْ، مَا قَامَ لِلدِّينِ

۞ AXIFTINA 57 ۞

Bizanin, bi rastî paş min kesek gerî fireh û zik mezin (pir xwer) wê li ser hewe xort bibê, çi bibînê wê bixwê û ya

des nekevê wê bikevê pey, vêca ewî bikujin, lê hûn nakujin. Agah bin, wê ew fermanê bidê ku hûn xebera bidin min û xwe ji min berî bikin. Vêca (li demê mecbûrî yê de) xebera bêjin min, çiko ew ji min ra sebebê pakî yê ye û ji bona hewe xilasî têde heye, lê xwe ji min berî nekin çiko ez li ser fitretê welidî me û ji îman û hicretê ra min pêşî sitandîye.

AXIFTINA 58

Derheq xewarican da axiftîye:

Hey bagera xîzê ser hewe de bê û kesî ji hewe nehêlê![26] Gelo piştî ku min bawerî bi Xwedê anîye û cihada min digel Pêğemberê Xwedê selat û selamên Xwedê li ser bin, ez bi kufra xwe iqrar bikim? Eger ez wê bikim, muheqeq ez ji wa me ewên li rê winda û ne li ser hidayetê!

Vêca ji vê pîs rêka hûn li ser, vebin û paş xwe ve bizivirin, bi rastî paş min hûnê zelîl bibin zelîl bûnek hemî alî, wê şûrên bira ser heweda bên û hûnê bibin pê leystika zalim û sitemkaran.

AXIFTINA 59

عَمُودٌ، وَلاَ اخْضَرَّ لِلإِيمَانِ عُـودٌ، وَأَيْمُ اللهِ لَتَحْتَلِبُنَّهَا دَماً، وَلَتَتْبِعُنَّهَـا نَدَماً!

[57]

أما إِنَّهُ سِيَظْهَرُ عَلَيْكُمْ بَعْدِي رَجُلٌ رَحْبُ الْبُلْعُومِ، مُنْدَحِقُ الْبَطْنِ، يَأْكُلُ مَا يَجِدُ، وَيَطْلُبُ مَا لاَ يَجِدُ، فَاقْتُلُوهُ، وَلَنْ تَقْتُلُوهُ! أَلاَ وَإِنَّهُ سَيَأْمُرُكُمْ بِسَبِّي وَالْبَرَاءَةِ مِنِّي; فَأَمَّا السَّبُّ فَسُبُّونِي، فَإِنَّهُ لي زَكَاةٌ،وَلَكُمْ نَجَاةٌ; وَأَمَّا الْبَرَاءَةُ فَلاَ تَتَبَرَّأُوا مِنِّي، فَإِنِّي وَلِدْتُ عَلَى الْفِطْرَةِ، وَسَبَقْتُ إِلَى الإِيمَانِ وَالْهِجْرَةِ.

[58]

كلّم به الخوارج

أَصَابَكُمْ حَاصِبٌ، وَلاَ بَقِيَ مِنْكُمْ آبِرٌ، أَبَعْدَ إِيمَانِي بِاللهِ وَجِهَادِي مَعَ رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله أَشْهَدُ عَلَى نَفْسِي بِالْكُفْرِ! لَقَدْ ضَلَلْتُ إِذاً وَمَا أَنَا مِنَ الْمُهْتَدِينَ!

فَأُوبُوا شَرَّ مَآب، وَارْجِعُوا عَلَى أَثَرِ الأَعْقَابِ، أَمَا إِنَّكُمْ سَتَلْقَوْنَ بَعْدِي ذُلاً شَامِلاً، وَسَيْفاً قَاطِعاً، وَأَثَرَةً يَتَّخِذُهَاالظَّالِمونَ فِيكُمْ سُنَّةً.

Dema qesta şerê xewarica kir û gotinê: Ew ji pira nehrewanê derbaz bîne:

Cihê kuştina wan, vî milê avê ye, sond bi Xwedê, deh kes ji wan xilas nabin û deh kes ji hewe nayên kuştin.

Seyidê Rezî li dumahîka vê axiftinê de kelîma "nutfe" me'ne kirîye ku li tercumê da hatîye.

AXIFTINA 60

Piştî şerê digel xewarican, gotinê: xewaric hemî pêkve hatin kuştin (sala 38 h.) Ewî got:

Ne bi Xwedê ew "nutfe"ne li pişta mêra de û li rehma jina de, çiqas yêk ji wan serî hilênê wê bê kuştin, heta yên dumahîkê bibin diz û rê bir.

AXIFTINA 61

Ev axiftin li sala 38-ê h. Paş şerê Nehrewanê hatîye kirin.

Paş min digel "xewarican" şer nekin, çiko ewê pey heqî yê bikevê lê belê xelet bibê ne wek wî ye ewê ne heqî yê (batilê) bixwazê û vêca bi dest ve bênê.

Şerîfê Rezî: *Mexsed Mu'awîye û*

قوله(عليه السلام): «ولا بقي منك آبر» يُروى على ثلاثة أوجه: أحدها أن يكون كما ذكرناه، بالراء، من قولهم: رجلٌ آبِرٌ: للذي يأبر النخل، أي: يصلحه. يروى: «آثِرٌ»، يُراد به: الذي يأثر الحديث، أي: يحكيه ويرويه، وهو أصح الوجوه عندي، كأنه(عليه السلام)قال: لا بقي منكم مُخبر! ويروى: «آبِز» بالزاي معجمة ـ وهو: الواثب، والهالك أيضاً يقال له: آبِزٌ.

[59]

لمّا عزم على حرب الخوارج وقيل له: إن القوم قد عبروا جسر النهروان

مَصَارِعُهُمْ دُونَ النُّطْفَةِ، وَاللهِ لاَ يُفْلِتُ مِنْهُمْ عَشَرَةٌ، وَلاَ يَهْلِكُ مِنْكُمْ عَشَرَةٌ.

يعني بالنطفة: ماء النهر، وهي أفصح كناية عن الماء وإن كان كثيراً جماً، وقد أشرنا إلى ذلك فيما تقدم عند مضيّ ما أشبهه.

[60]

لمّا قتل الخوارج فقيل له: يا ميرالمؤمنين، هلك القوم بأجمعهم، فقال عليه السلام :

كَلاَّ وَاللهِ، إِنَّهُمْ نُطَفٌ فِي أَصْلاَبِ الرِّجَالِ، وَقَرَارَاتِ النِّسَاءِ، كُلَّمَا نَجَمَ مِنْهُمْ قَرْنٌ قُطِعَ، حَتَّى يَكُونَ آخِرُهُمْ لُصُوصاً سَلاَّبِينَ.

[61]

وقال عليه السلام فيهم

hevalên wî ne.

AXIFTINA 62

Sala 40-ê h. Paş tirsandina ji terûr kirnê:

Xwedê ji bona min parêzerek qewî danîye, vêca dema roja (ecelê) min bê wê ji min vebê û min teslîm (ê melekê mewtê) bikê, vêca hingê tîr xelet naçê û birîn sax nabê.

AXIFTINA 63

Tirsandina ji fitnên dinyayê:

Bizanin, dinya avahîyeke ku xêncî (pê karên Xudayî) di wê da mirov biselamet namînê, upê karê dinyayî serketin ji mirov re nîne, mirov li dinyayê de pê wê tên ceribandin û imtihan kirin, vêca ewên tiştekî li dinyayê de ji bona dinyayê destve bênin wê ew ji wa bê girtin û hesabê jî li ser bidin, û ewa ji wê digrin ji bona xêncî wê (Axretê) ewê pêş xwe de rêdikin û ji wan ra dimînê.

Dinya li bal ‘eqilmenda wek daketina siha (sî -sîber) nîvro ye, ku hêca berfireh nebûyî ser hevda tê û hêj lê zêde nebûyî jê kêm dibê.

AXIFTINA 64

لاَ تَقْتُلُوا الْخَوَارِجَ بَعْدِي، فَلَيْسَ مَنْ طَلَبَ الْحَقَّ فَأَخْطَأَهُ، كَمَنْ طَلَبَ الْبَاطِلَ فَأَدْرَكَهُ.

يعني: معاوية وأصحابه.

[62]

ومن كلام له(عليه السلام)

لمّا خُوِّف من الغيلة

وَإِنَّ عَلَيَّ مِنَ اللهِ جُنَّةً حَصِينَةً، فَإِذَا جَاءَ يَوْمِي انْفَرَجَتْ عَنِّي وَأَسْلَمَتْنِي; فَحِينَئِذٍ لاَ يَطِيشُ السَّهْمُ، وَلاَ يَبْرَأُ الْكَلْمُ.

[63]

ومن خطبة له(عليه السلام)

[يحذر من فتنة الدنيا]

أَلاَ وإِنَّ الدُّنْيَا دَارٌ لاَ يُسْلَمُ مِنْهَا إِلاَّ فِيهَا، وَلاَ يُنْجَى بِشَيْءٍ كَانَ لَهَا، ابْتُلِيَ النَّاسُ بِهَا فِتْنَةً، فَمَا أَخَذُوهُ مِنْهَا لَهَا أُخْرِجُوا مِنْهُ وَحُوسِبُوا عَلَيْهِ، وَمَا أَخَذُوهُ مِنْهَا لِغَيْرِهَا قَدِمُوا عَلَيْهِ وَأَقَامُوا فِيهِ;

فَإِنَّهَا عِنْدَ ذَوِي الْعُقُولِ كَفَيْءِ

Lez kirin ji bona kirina karên qenc:

Vêca hay ji navbeyna xwe û Xwedê hebin, ey bendeyên Xwedê, û pêşîya gihana ecelê xwe des bavêjin karên qenc, û pê wê ya ji dest hewe diçê ewê ya ji hewe re dimînê bikirin. (axretê di dinyayê da des xwe ve bênin) xwe ji seferê ra hazir bikin çiko hûn mecborê seferêne, hazirîya mirinê bikin çiko bi rastî hûn ketine bin sîbera wê de, ji wan kesa bin ewên qêrîn li wan hatî kirin û hişyar bûyîn û zanîyîn dinya ne cihê sekna waye û vêca ew goherandîn (bi axretê) çiko bi rastî Xwedayê pak hûn bêhude çênekirne û ser beredayî nehiştine. Li navbira hewe û bihiştê an jî agir da xêncî mirinê ku ser hewe da bigrê tiştek dî nîne.

Ew jîyan a her bêhnek jê kêm dikê û ecel ewê ji beyn dibê, heqe ku demê wê kurt bê. Ew veşartî yê derbaz bûna şev û rojî ewî dajûn, heqe lez û bez (li cihê xwe) bizivirê. Qasidê ku mizgînî yê an xeberê bext reşî yê tênê heqe ku mirov baştirîn tiştê jê re hazir bikê.

Vêca nixwe ji vê dinyayê rizqek baş hilênin ku sibe rojê hûn pê bên xweykirin. Ew bende ji Xwedayê xwe ditirsihê ewê li çêkirina xwe bixebitê, û zû tewbe bikê û ser şehwet û vîyanên

الظِّلِّ، بِيْنَا تَرَاهُ سَابِغاً حَتَّى قَلَـصَ، وَزَائِداً حَتَّى نَقَصَ.

[64]

[في المبادرة إلى صالح الاعمال]

فَـاتَّقُوا اللهَ عِبَـادَ اللهِ، وَبَـادِرُوا آجَالَكُمْ بِأَعْمَـالِكُمْ، وَابْتَـاعُوا مَـا يَبْقَـى لَكُـمْ بِمَـا يَـزُولُ عَـنْكُمْ، وَتَرَحَّلُوا فَقَدْ جُدَّ بِكُـمْ وَاسْـتَعِدُّوا لِلْمَوْتِ فَقَدْ أَظَلَّكُمْ وَكُونُـوا قَوْمـاً صِـيحَ بِهِـمْ فَـانْتَبَهُوا، وَعَلِمُـوا أَنَّ الدُّنْيَا لَيْسَتْ لَهُمْ بِـدَار فَاسْـتَبْدَلُوا; فَإِنَّ اللهَ لَـمْ يَخْلُقْكُـمْ عَبَثـاً، وَلَـمْ يَتْرُكْكُمْ سُدىً، وَمَا بَـيْنَ أَحَـدِكُمْ وَبَيْنَ الْجَنَّةِ أَوِ النَّارِ إِلاَّ الْمَـوْتُ أَنْ يَنْزِلَ بِهِ.

وَإِنَّ غَايَـةً تَنْقُصُـهَا اللَّحْظَـةُ، وَتَهْـدِمُهَا السَّـاعَةُ، لَجَـدِيرَةٌ بِقِصَـرِالْمُدَّةِ، وَإِنَّ غَائِبـاً يَحْـدُوهُ الْجَدِيدَانِ: اللَّيْلُ وَالنَّهَـارُ، لَحَـرِيٌّ بِسُرْعَةِ الأَوْبَـةِ، وَإِنَّ قَادِمـاً يَقْـدُمُ بِالفَوْزِ أَوالشِّقْوَةِ لَمُسْتَحِقٌّ لِأَفْضَـلِ

xwe bikevê, çiko bi rastî zemanê mirina wî jê xefe, emel û arizûyên wî hîlekerin û şeytan jî di kemînê de hazire heta ku gonehan jê re bixemilênê da gonehan bikê û ewî berhêvî yê tewbê dikê û pê vê weswesê her car tewbê paş têxê, heta nişkêde mirin hêrişê bênê ser, di halekî de ku bê xebere ji bîr û hizra mirinê.

Wey puşmanî ji wî kesî ra ewê bê xeber û xafil ku ‘emrê wî li dijê wî de şahidîyê bidê û rojên jîyana wî ewî bi alîyê bext reşîyêve bibin.

Ez ji Xwedayê pak dixwazim ku me û hewe bikê ji wan kesa ku qe çi ni’met ewa serxweçûyî nakê û çi hedef û xwest, ewa ji gohdana Xweda yê wa paşve nadê û mirin nabê sebebê puşmanî û mereqa wan.

AXIFTINA 65

Axiftineke derheq ‘ilm û zanîna Xwedê de (38 h. li mizgefta Kûfayê).

Hemd û sipas bo wî Xudayî ewê goherîn û zeman jêra tineyî da vêca jêra bê gotin: Pêşîya ku axir bê, ewile û pêşîya ku veşartî bê eşkereye. Xêncî wî her tişta jê re bê gotin “yêk” kême, û xêncî wî hemî xort şikestîne, û xêncî wî

الْعُدَّةِ،

فَتَزَوَّدُوا فِي الدُّنْيَا مِنَ الدُّنْيَا مَا تَحْرُزُونَ بِهِ نُفُوسَكُمْ غَداً. فَاتَّقَىٰ عَبْدٌ رَبَّهُ، نَصَحَ نَفْسَهُ، قَدَّمَ تَوْبَتَهُ، غَلَبَ شَهْوَتَهُ، فَإِنَّ أَجَلَهُ مَسْتُورٌ عَنْهُ، وَأَمَلَهُ خَادِعٌ لَهُ، والشَّيْطَانُ مُوَكَّلٌ بِهِ، يُزَيِّنُ لَهُ الْمَعْصِيَةَ لِيَرْكَبَهَا، وَيُمَنِّيهِ التَّوْبَةَ لِيُسَوِّفَهَا، حتّى تَهْجُمَ مَنِيَّتُهُ عَلَيْهِ أَغْفَلَ مَا يَكُونُ عَنْهَا.

فَيَالَهَا حَسْرَةً عَلَى كُلِّ ذِي غَفْلَةٍ أَنْ يَكُونَ عُمُرُهُ عَلَيْهِ حُجَّةً، وَأَنْ تُؤَدِّيَهُ أَيَّامُهُ إِلَى الشِّقْوَةِ!

نَسْأَلُ اللهَ سُبْحَانَهُ أَنْ يَجْعَلَنَا وَإِيَّاكُمْ مِمَّنْ نَسْأَلُ اللهَ سُبْحَانَهُ أَنْ يَجْعَلَنَا وَإِيَّاكُمْ مِمَّنْ لاَ تُبْطِرُهُ نَعْمَةٌ، وَلاَ تُقَصِّرُ بِهِ عَنْ طَاعَةِ رَبِّهِ غَايَةٌ، وَلاَ تَحُلُّ بِهِ بَعْدَ الْمَوْتِ نَدَامَةٌ وَلاَ كَآبَةٌ.

[65]

ومن خطبة له(عليه السلام)

[وفيها مباحث لطيفة من العلم الالهي]

[الْحَمْدُ للهِ] الَّذِي لَمْ تَسْبِقْ لَهُ

hemî qewî bê hêzin û xêncî wî hemî ewên xweyê tiştekî bendene, û hemî zanayên xêncî wî hînbuyîne, û xêncî wî hemî kara, carna karîna wan heye û carna nekarin, û xêncî wî her seh kerek dengên pir kêm gohlê nabin û dengên pir zêde jî ewa ker dikin û dengên ji wî dûr bin jî gohlê nabin. Xêncî wî rengên veşartî û tiştên pir biçûk nabînin, û hemî eşkere xêncî wî veşartîne û hemî veşartî xêncî ji wî, ne eşkere ne.

Ew mexlûqên Wî çêkirîn ne ji bona qewî kirina hukumdarîya xwe çêkirine û ne ji ber tirsa ji qewmînên zeman û ne ji bona arîkarî girtina li dijê beraberê xwe yê şervan an şirîkê bi dewlemendî ya xwe fexrê dikê an dijê xwe yê serketinê dixwazê. Belkî hemî aferîde (mexlûq) ewî gihandine û xudan kirine û bendeyên wî yên şikestîne. Ne li nav tiştan re ye da bê gotin: Li filan cihî da ye, û ji wan ne cidaye jî da vêca bê gotin: veqetîyaye.

Teybîr dana rêve birina mexlûqan û des pêkirina li çêkirina aferîdeya giranî jê re çênekirîye û ne êxistîye zehmetê, û yêkcar li çêkirinê de jêra nekarîn çênebûye da vêca desta jê bikêşê, qet jê re şik û şubhe çênebûye li wê tiştê da

حَالٌ حـالاً، فَيَكُـونَ أَوَّلاً قَبْـلَ أَنْ يَكُونَ آخِراً، وَيَكُونَ ظَاهِراً قَبْلَ أَنْ يَكُونَ بَاطِناً.كُلُّ مُسَـمّىً بِالْوَحْـدَةِ غَيْرَهُ قَلِيلٌ، وَكُلُّ عَزِيز غَيْرَهُ ذَلِيـلٌ، وَكُلُّ قَوِي غَيْـرَهُ ضَـعِيفٌ، وَكُـلُّ مَالِك غَيْرَهُ مَمْلُـوكٌ، وَكُـلُّ عَـالِم غَيْرَهُ مُتَعَلِّمٌ، وَكُلُّ قَادِر غَيْرَهُ يَقْـدِرُ وَيَعْجَزُ، وَكُلُّ سَمِيع غَيْرَهُ يَصَمُّ عَنْ لَطِيفِ الأَصْوَاتِ، ويُصِمُّهُ كَبِيرُهَـا، وَيَذْهَبُ عَنْهُ مَا بَعُـدَ مِنْهَـا، وَكُـلُّ بَصِير غَيْرَهُ يَعْمَى عَنْ خَفِيِّ الأَلْوَانِ وَلَطِيفِ الأَجْسَامِ، وَكُلُّ ظَاهِر غَيْرَهُ غَيْرُ بَاطِن، وَكُلُّ بَاطِن غَيْـرَهُ غَيْـرُ ظَاهِر.

لَمْ يَخْلُـقْ مَـا خَلَقَـهُ لِتَشْـدِيدِ سُلْطَان، وَلاَ تَخَوُّف مِـنْ عَوَاقِـبِ زَمَان، وَلاَ اسْتِعَانَة عَلَى نِدّ مُثَاوِر، وَلاَ شَرِيك مُكَاثِر، وَلاَ ضِدّ مُنَـافِر; وَلَكِـنْ خَلاَئِـقُ مَرْبُوبُـونَ، وَعِبَـادٌ دَاخِرُونَ، لَمْ يَحْلُلْ فِي الأَشْـيَاءِ فَيُقَالَ: هُوَ فيها كَائِنٌ، وَلَـمْ يَنْـأَ عَنْهَا فَيُقَالَ: هُوَ مِنْهَا بَائِنٌ.

ewa teqdîr kirî û Ĥukum pê dayî. Belkî hukmê wî cih girtî ye û zanîna wî muhkem û fermana wî sabite. Ew e yê digel heyîna ‘ezab berhêvî jê heyî û digel van hemî ni’metan cihê jê tirsînê.

AXIFTINA 66

Li vê axiftinê de hogirên xwe d’elmênê şervanîyê (di despêka şerê Siffînî de sala 37 h. ji heval û hogirên xwe re gotîye).

Ey cima’eta muslimana! Cilkên binve yên hewe bila tirsa ji Xwedê û cilkên hewe yên serve jî bila sekn û sebirdarî bê. Didana ser hevde bişidînin çiko ev kar şimşêr (şûr)a ji serîyan dûr têxî, û zirhê xwe kamil bikin û şûrê xwe li kalanên wan de biqeliqînin pêşîya wê da ku hûn derînin, li ber çavê xwe ra û bi ‘ern binêrin, û riman çep û rast bînin bibin û alîyê tîj yê şûrê xwe bikar bînin, gav û şûrên xwe li hev bînin û pêşve herin, û bizanin hûn li bin çavdêrî ya Xuda dane û gel kurmamê Pêğember in. Pey hevra hêrişê bibin û ji revînê şerm bikin, çiko şerm û ‘ara wê ji zarûkên heweraye û agirê roja qîyametê ye. Bi kar û xebata xwe razî bin û bi rihetî herin berahî ya mirinê, berê xwe bidin vê koma mezin (‘eskerê Mu’awîye) û çadirên wa yên pê werîsa hatîn şidandin û li nîveka wan bidin, çiko şeytan xwe li nav wanda veşartî ye û destê wî li pêşe ji bona bizav û hêrişê û pîyê wî li paşe

لَمْ يَؤُدْهُ خَلْقُ مَا ابْتَدَأَ، وَلاَ تَدْبِيرُ مَا ذَرَأَ، وَلاَ وَقَفَ بِهِ عَجْزٌ عَمَّا خَلَقَ، وَلاَ وَلَجَتْ عَلَيْهِ شُبْهَةٌ فِيمَا قَضَى وَقَدَّرَ، بَلْ قَضَاءٌ مُتْقَنٌ، وَعِلْمٌ مُحْكَمٌ، وَأَمْرٌ مُبْرَمٌ. المَأْمُولُ مَعَ النِّقَمِ، المرهُوبُ مَعَ النِّعَمِ!

[66]

في تعليم الحرب والمقاتلة. في بعض أيام صفين

مَعَاشِرَ الْمُسْلِمِينَ: اسْتَشْعِرُوا الْخَشْيَةَ، وَتَجَلْبَبُوا السَّكِينَةَ، وَعَضُّوا عَلَى النَّوَاجِذِ، فَإِنَّهُ أَنْبَى لِلْسُّيُوفِ عَنِ الْهَامِ، وَأَكْمِلُوا اللاَّمَةَ، وَقَلْقِلُوا السُّيُوفَ فِي أَغْمَادِهَا قَبْلَ سَلِّهَا، وَالْحَظُوا الْخَزْرَ، وَاطْعُنُوا الشَّزْرَ، وَنَافِحُوا بِالظُّبَا، وَصِلُوا السُّيُوفَ بَالْخُطَا، وَاعْلَمُوا أَنَّكُمْ بِعَيْنِ اللهِ، وَمَعَ ابْنِ عَمِّ رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله، فَعَاوِدُوا الْكَرَّ، وَاسْتَحْيُوا مِنَ الْفَرِّ، فَإِنَّهُ عَارٌ فِي الأَعْقَابِ،

da ku li wextê da birevê.

Vêca xweragir bin û li ber xwe bidin heta sitûna heqî yê ji hewe re dîyar bibê ***“û hûn în yên serketî û Xuda digel hewe ye û çi kêmasîyê naêxê di kar û ‘emelê hewe de”***[27]

۞ AXIFTINA 67 ۞

Gotine: Dema xeberê “Seqîfê”[28] paş wefata Pêğember (s) ji hezretê ‘Elî re gêran, ewî got: Ensarîyan çi got? Gotin: Ensarîyan got: Serokek ji me û yêk jî ji hewe. Vêca Imam ‘Elî wiha got:

Çire hewe wesîyeta Pêğember (s) li ser wan nekir delîl ku wesîyet kirîye qencîyê digel qencên wan bikin û li xirabên wan biborin.

Gotinê: *Kûdera vê gotinê li dijê wan de dibê delîl? Vêca kerem kir:*

Eger serokatî li nav wan da hatibîya deynan, derheq wan da ev wesîyet nedikira.

Paşê got: Vêca qureyşî yan çi got? *Gotin ewa jî ev delîl ji xwere anîn ku ew ji dara Pêğemberin (s), vêca ewî got:* Dar ji xwe re kirin delîl, lê fêkîyê wê ji nav birin.

وَنَارٌ يَوْمَ الْحِسَابِ، وَطِيبُوا عَنْ أَنْفُسِكُمْ نَفْساً، وَامْشُوا إِلَى الْمَوْتِ مَشْياً سُجُحاً، وَعَلَيْكُمْ بِهذَا السَّوَادِ الأَعْظَمِ، وَالرِّوَاقِ المُطَنَّبِ، فَاضْرِبُوا ثَبَجَهُ، فَإِنَّ الشَّيْطَانَ كَامِنٌ فِي كِسْرِهِ، قَدْ قَدَّمَ لِلْوَثْبَةِ يَداً، وَأَخَّرَ لِلنُّكُوصِ رِجْلاً; فَصَمْداً صَمْداً! حَتَّى يَنْجَلِيَ لَكُمْ عَمُودُ الْحَقِّ (وَأَنْتُمُ الأَعْلَوْنَ وَاللهُ مَعَكُمْ وَلَنْ يَتِرَكُمْ أَعْمَالَكُمْ)

[67]

في معنى الانصار

قالوا: لمّا انتهت إلى أميرالمؤمنين عليه السلام أنباء السقيفة بعد وفاة رسول الله صلى الله عليه وآله، قال عليه السلام: ما قالت الانصار؟ قالوا: قالت: منا أمير ومنكم أمير. قال عليه السلام: فَهَلاَّ احْتَجَجْتُمْ عَلَيْهِمْ: بِأَنَّ رَسُولَ الله صلى الله عليه وآله وَصَّى بِأَنْ يُحْسَنَ إِلَى مُحْسِنِهِمْ، وَيُتَجَاوَزَ عَنْ مُسِيئِهِمْ؟

قالوا: وما في هذا من الحجّة عليهم؟ فقال:

لَوْ كَانَتِ الامارة فِيهِمْ لَمْ تَكُنِ الْوَصِيَّةُ بِهِمْ.

AXIFTINA 68

Dema Muhemmedê korê Ebûbekir ji bona fermandarî ya Misrê rêkirî vêca hatî bindest kirin û kuştin, axiftîye (38 h.):

Min divîya (dixwesta) ez fermandarî ya Misrê bidim "Haşimê korê 'Utbe" eger min ew rêkirbûya wêderê ewî meydan ji wan re vale nahişta û furset dest wanve bernada, min navê ez loman li Mûhemed bikim, bi rastî min hej wî dikira û ew li ber destê min mezin bibû.

AXIFTINA 69

Paş talan bûna "Eynuttemr" ê lome li hinek hevalên xwe kirin û wiha got:

Çiqas ezê digel hewe biborînim, wek çawa digel deva nû gehiştî ya pişt kol tê borandin û wek cilkê kevin ku çiqas mirov cihek yê wê didrû cihek dî ra dişeqitê. Çiqas ku komek ji 'eskerên Şamîyan ser hewe da bên her yêk ji hewe dergehê xwe bi ser xwe de digrê û wek çawa sûsmar û keftar diçin kuna xwe ve hûn jî xwe li kuna xwe de vedişêrin.

Wellahî, yê şikestî ew kes e ewê hûn arîkarê wî bin, kesê hûn tîr avêjên wî bin tîrên wî bê ser û bê eser in. Sond bi Xudê, jimara hewe li mala da pir û li bin bêreqên şerê de kêm e. Bi rastî ez rêka durist kirina hewe û rastkirna xwehrî ya hewe dizanim, lê belê min

ثم قال: فَمَاذَا قَالَتْ قُرَيْشٌ؟ قالوا: احتجت بأنها شجرة الرسول صلى الله عليه وآله. **فقال** عليه السلام: **احْتَجُّوا بِالشَّجَرَةِ، وَأَضَاعُوا الثَّمَرَةَ.**

[68]

لمّا قلد محمّد بن أبي بكر مصر فملكت عليه وقتل:

وَقَدْ أَرَدْتُ تَوْلِيَةَ مِصْرَ هَاشِمَ بْنَ عُتْبَةَ، وَلَوْ وَلَّيْتُهُ يَّاهَا لَما خَلَّى لَهُمُ الْعَرْصَةَ، وَلاَ أَنْهَزَهُمُ الْفُرْصَةَ، بَلاَ ذَمٍّ لِمحَمَّدِ بْنِ أَبِي بَكْرٍ، فَلَقَدْ كَانَ إِلَيَّ حَبِيباً، وَكَانَ لي رَبِيباً.

[69]

من كلام له عليه السلام

في ذمّ أصحابه

كَمْ أُدَارِيكُمْ كَمَا تُدَارَى الْبِكَارُ الْعَمِدَةُ وَالثِّيَابُ الْمتَدَاعِيَةُ! كُلَّما حِيصَتْ مِنْ جَانب تَهَتَّكَتْ مِنْ آخَرَ، كُلَّما أَطَلَّ عَلَيْكُمْ مَنْسِرٌ مِنْ مَنَاسِرِ أَهْلِ الشَّامِ أَغْلَقَ كُلُّ رَجُل مِنْكُمْ بَابَهُ وَانْجَحَرَ انْجِحَارَ الضَّبَّةِ فِي جُحْرِهَا، وَالضَّبُعِ فِي وِجَارِهَا.

الذَّلِيلُ وَاللهِ مَنْ نَصرْتُمُوهُ! وَمَنْ رُمِيَ بِكُمْ فَقَدْ رُمِيَ بِأَفْوَقَ نَاصِلٍ.

navê ez pê rastkirina hewe xwe xirab bikim, Xwedê li nav (ser û) rûyê hewe bidê û rêkên hewe xirab bikê wek çawa hûn pûçîyê nas dikin hûn ewqas heqîyê nas nakin, û hûn batilê ji beyn nabin wek çawa hûn heqîyê ji nav dibin.

إِنَّكُمْ ـ وَاللهِ ـ لَكَثِيرٌ فِي الْبَاحَاتِ، قَلِيلٌ تَحْتَ الرَّايَاتِ، وَإِنِّي لَعَالِمٌ بِمَا يُصْلِحُكُمْ، وَيُقِيمُ أَوَدَكُمْ، وَلَكِنِّي واللهِ لاَ أَرى إِصْلاَحَكُمْ بِإِفْسَادِ نَفْسِي. أَضْرَعَ اللهُ خُدُودَكُمْ، وَأَتْعَسَ جُدُودَكُمْ! لاَ تَعْرِفُونَ الْحَقَّ كَمَعْرِفَتِكُمُ الْبَاطِلَ،وَلاَ تُبْطِلُونَ الْبَاطِلَ كَإِبطَالِكُمُ الْحَقَّ!

۞ AXIFTINA 70 ۞

Sibeha roja derb lê ketî gotîye (40 h.)

Ez rûnişt̂ı xew ket çavê min, vêca min dît Pêğemberê Xuda (s) di ber min re derbaz bî, min gotê: Ey resûlê Xwedê! Min çiqa ji xwehrî û dijminî ya ummeta te kişand? Vêca got min: “nifrîna li wan bike” vêca min got: Ya Rebbî! Şûna wan de baştira bide min û şûna min de xirabtiran bike behra wan.

Seyidê Rezî *li dumahîka vê axiftinê de hinek kelîme me’ne kirne ku li tercumê de hatîye.*

[70]

في سُحرة اليوم الذي ضرب فيه

مَلَكَتْنِي عَيْنِي وَأَنَا جَالِسٌ، فَسَنَحَ لي رَسُولُ اللهِ صلى الله عليه وآله: يَا رَسُولَ اللهِ، مَاذَا لَقِيتُ مِنْ أُمَّتِكَ مِنَ الأَوَدِ وَاللَّدَدِ؟ فَقَالَ: ادْعُ عَلَيْهِمْ، فَقُلْتُ: أَبْدَلَنِي اللهُ بِهِمْ خَيْراً لي مِنْهُمْ وَأَبْدَلَهُمْ بِي شَرّاً لَهُمْ مِنِّي.

۞ AXIFTINA 71 ۞

Derheq nebaşî ya xelkê ‘Iraqê de (38 h. Piştî li Hekemiyetê de hîle li xelkê Kûfayê hatî kirin)

... Ey gelî xelkê ‘iraqê! Hûn wek wa jinên pê giran în (avis-hamile) ku dema wextê zarûk anînê bê ber bavêjin (zarûka wa mirî bê dinyayê) û malxwê wa bimrê û zemanê jinebî tî ya wê dirêj bibê û ewê ji hemîyan dûrtir mîrasa wê bibê.

Sond bi Xwedê, ez ne bi vîyana xwe hatim cem hewe, belkî ez bi alîyê hewe

يعني عليه السلام بالاود: الاعوجاج و باللدد: الخصام. وهذا من أفصح الكلام.

[71]

وفيها يوبّخ أَهل العراق علىترك القتال والنصر يكاد يتمّ ثم تكذيبهم له:

أَمَّا بَعْدُ يَا أَهْلَ الْعِرَاقِ، فَإِنَّمَا

ve hatim ajûtin. Xeber gehiştîye min ku hûn dibêjin: ‘Elî derewa dikê, Xwedê hewe bikujê, min derew li kî kirne? Gelo li Xwedê ? Eve ez ewilîn kes im ku min bawerî pê anîye, an min li ser Pêğemberê wî derew çêkirine? Eve ez ewilîn kes im ku min ew rast zanîye (arîkarî digel kirîye).

Ne, ez bi Xwedê kim neweye, belkî ewa min digota hûn tê nedigehiştin, çiko hûn ne layiqê fêhm kirina wê bûn. Ey way, dayka wî li ser bigrî! Min pîvek (ya ‘ilm û zanînê) belaş û bê beraber da, eger pîvekek jê re hebê ***“û hûnê paş zemanekî xeberê wê hildin”.***[29]

۞ AXIFTINA 72 ۞

Li vê axiftinê de xelk fêre kirne (‘elimandine) ku çawa selewatan li ser Pêğember bidin, her wiha behsa sifet û nîşanên Xuda û nîşanên Pêğember (s) û di’ayê têde heye.

Sifet ê Xuda: Ey Xudayê berfirehkerê berfirehî yan (ey xaliqê ‘erdê) ey ragirê ‘esmanên bilind, ey xaliqê dilan li sersiruşta wan, çi dilên xirab û çi baş.

Behsa Pêğember: Bi qedrtirîn selamên Xwe û ber zêdahîtirîn bereketên Xwe deyne ser bende û hinartî yê Xwe yê paşîn, Muhemmed (s) ewê dergehên girtî vekirîn û pê heqîyê heq eşkere kirî û ‘eskerên batil dûr kirîn û hêrişa li rê xeletan ser hevde şikandî. Ewê barê

أَنْتُمْ كَالْمَرْأَةِ الْحَامِلِ، حَمَلَتْ فَلَمَّا أَتَمَّتْ أَمْلَصَتْ، وَمَاتَ قَيِّمُهَا، وَطَالَ تَأَيُّمُهَا، وَوَرِثَهَا أَبْعَدُهَا.

أَمَا وَاللهِ مَا أَتَيْتُكُمُ اخْتِيَاراً، وَلَكِنْ جِئْتُ إِلَيْكُمْ سَوْقاً، وَ لَقَدْ بَلَغَنِي أَنَّكُمْ تَقُولُونَ: [عَلِيٌّ يَكْذِبُ، قَاتَلَكُمُ اللهُ! فَعَلَى مَنْ أَكْذِبُ؟ أَعَلَى اللهِ؟ فَأَنَا أَوَّلُ مَنْ آمَنَ بِهِ! أَمْ عَلَى نَبِيِّهِ؟ فَأَنَا أَوَّلُ مَنْ صَدَّقَهُ!

كَلاَّ وَاللهِ، ولكِنَّهَا لَهْجَةٌ غِبْتُمْ عَنْهَا، وَلَمْ تَكُونُوا مِنْ أَهْلِهَا، وَيْلُ امِّهِ، كَيْلاً بِغَيْرِ ثَمَن! لَوْ كَانَ لَهُ وِعَاءٌ، (وَ لَتَعْلَمُنَّ نَبَأَهُ بَعْدَ حِين).

[72]

علّم فيها الناس الصلاة على رسول الله صلى الله عليه وآله وفيها بيان صفات الله سبحانه وصفة النبي والدعاء له

اللَّهُمَّ دَاحِيَ الْمَدْحُوَّاتِ، وَدَاعِمَ الْمَسْمُوكَاتِ، وَجَابِلَ الْقُلُوبِعَلَى فِطْرَتِهَا: شَقِيِّهَا وَسَعِيدِهَا.

صفة النبي

giranê Pêğemberî yê hilgirtî û bi emrê te rabûyî û ji bona razî bûna te ya hemî alî ketî lezê û li çi bizava de tirs û paş êxistin û sistî ya li vîyanê de jê nexweyhayî, ewî wehya te baş girt û soza digel te dayî parast û ji bona pêk anîna fermanên te hereket dikir, heta ku ji bona ronahî xwazan, agir hilkir û rêka yê rê xelet ronahî kir, û pê wî ew dilên mayîn nav fitne û gonehan ra hidayet bûn. Ewî bêreqên rê nîşander vedan û ĥukmên ronahî anîn, vêca (ey Xuda!) Pêğember (s) ew emînê cihê bawerîya te ye, û xeznedarê xezîna'ilmê te ye, û roja qîyametê şahid e li bal te, hinartî yê te ye ji bona anîna heqîyê û Pêğemberê te ye ji bona 'alemê.

Ey Xuda! Cihê wî li bin sîbera xwe da berfireh bike, û ji qencî ya xwe xêra wî çend beraber bidîyê. Ya Xuda! Avahîyê wî ser avahîyê yên dî bêxî û qedr û qîmetê wî li bal xwe mezin ragirî û ronahî ya wî jê re temam bikî, û ji ber ku te ew kirîye Pêğemberê xwe, tu şahidî ya wî meqbûl bikî û razî bûnê bi gotina wî çêkî, (çiko) axiftina wî 'adilane bû û heq û batil ji yêk vediqetanda.

Ey Xuda! Me û wî li hev kom bike li wî cihê xweş; ni'metên wê daîmî, cihê pêk hatina arizûyan û keyf û lezzet û êmnahî ya berfireh û rihetîya dilan û

اجْعَلْ شَرَائِفَ صَلَوَاتِكَ، وَنَوَامِيَ بَرَكَاتِكَ، عَلَى مُحَمَّد عَبْدِكَ وَرَسُولِكَ، الْخَاتِمِ لِمَا سَبَقَ، وَالْفَاتِحِ لِمَا انْغَلَقَ، وَالْمُعْلِنِ الْحَقَّ بِالْحَقِّ، وَالدَّافِعِ جَيْشَاتِ الأَبَاطِيلِ، وَالدَّامِغِ صَوْلاَتِ الأَضَالِيلِ، كَمَا حُمِّلَ فَاضْطَلَعَ، قَائِماً بِأَمْرِكَ، مُسْتَوْفِزاً فِي مَرْضَاتِكَ، غَيْرَ نَاكِلٍ عَنْ قُدُم، وَلاَ وَاه فِي عَزْمٍ، وَاعِياً لِوَحْيِكَ، حَافِظاً لِعَهْدِكَ، مَاضِياً عَلَى نَفَاذِ أَمْرِكَ; حَتَّى أَوْرَى قَبَسَ الْقَابِسِ، وَأَضَاءَ الطَّرِيقَ لِلْخَابِطِ، وَهُدِيَتْ بِهِ الْقُلُوبُ بَعْدَ خَوْضَاتِ الْفِتَنِ، وَأَقَامَ مُوضِحاتِ الأَعْلاَمِ، وَنَيِّرَاتِ الأَحْكَامِ، فَهُوَ أَمِينُكَ الْمَأْمُونُ، وَخَازِنُ عِلْمِكَ الْمَخْزُونِ، وَشَهِيدُكَ يَوْمَ الدِّينِ، وَبَعِيثُكَ بِالْحَقِّ، وَرَسُولُكَ إِلَى الْخَلْقِ.

اللَّهُمَّ افْسَحْ لَهُ مَفْسَحاً فِي ظِلِّكَ، وَاجْزِهِ مُضَاعَفَاتِ الْخَيْرِ مِنْ فَضْلِكَ. اللَّهُمَّ أَعْلِ عَلَى بِنَاءِ الْبَانِينَ بِنَاءَهُ، وَأَكْرِمْ لَدَيْكَ مَنْزِلَتَهُ، وَأَتْمِمْ لَهُ نُورَهُ، وَاجْزِهِ مِنَ ابْتِعَاثِكَ لَهُ مَقْبُولَ الشَّهَادَةِ، مَرْضِيَّ المَقَالَةِ، ذا مَنْطِق عَدْل، وخُطّة فَصْل.

cihê xelatên bi qîmet.

AXIFTINA 73

Roja şerê **Cemel**ê Merwanê korê Hekem hat girtin û êsîr bû, vêca Hesen û Huseyn selam li ser wa bin li bal Imam ‘Elî (s) mehdera wî kirin, Imam ‘Elî jî ew aza kir. Vêca herdûka gotinê: gelo wê gel te bey’et bikê? Imam wiha got:

Ma piştî kuştina ‘Osman gel min bey’et nekir? Min ihtîyac bi bey’eta wî nîne, ew ji xîyanetê re wek cihûya ye, eger bi destê xwe bey’et bikê wê pê paşîya xwe xiyanetê bikê (ji xef ve wê bey’etê bişkênê).

Bizanin, wê hukumdarî bikevê dest wî, lê belê ew qas kurte herwekû se (kûçik-seg) pê zimanê xwe pûzê xwe bialîsê. Ew babê çar hukumdara ye, û ummet wê rojek sor (û xwînî) ji destê wî û kurên wî bibînê.

AXIFTINA 74

Dema xelkê niyet kir digel ‘Osman bey’etê bikin, ev axiftin kirîye:

Bi rastî hewe zanî ku ez ji yên dî layiqtirê wê me, û ez bi Xwedê sond dixum, çiqa ku karûbarê muslimana bi başî rêve biçê û xêncî li ser min, zulm û neheqî li kesî neyê kirin ezê muxalifet nekim û bê deng bim, û li beraberê vî karê xwe da jî ez xêr û xweşîyê ji Xuda

اللَّهُمَّ اجْمَعْ بَيْنَنَا وَبَيْنَهُ فِي بَرْدِ الْعَيْشِ، وَقَرَارِ النِّعْمَةِ، وَمُنَى الشَّهَوَاتِ، وَأَهْوَاءِ اللَّذَّاتِ، وَرَخَاءِ الدَّعَةِ وَمُنْتَهَى الْطُمَأْنِينَةِ، وَتُحَفِ الْكَرَامَةِ.

[73]

قاله لمروان بن الحكم بالبصرة:

قالوا: أُخِذَ مروان بن الحكم أَسيراً يوم الجمل، فاستشفع الحسن والحسين عليهما السلام إلى أَميرالمؤمنين عليه السلام فكلّماه فيه، فخلّى سبيله، فقالا له: يبايعك يا أميرالمؤمنين؟ فقال:

أَفَلَمْ يُبَايِعْنِي بَعْدَ قَتْلِ عُثْمانَ؟ لاَ حَاجَةَ لِي فِي بَيْعَتِهِ! إِنَّهَا كَفٌّ يَهُودِيَّةٌ، لَوْ بَايَعَنِي بِيَدِهِ لَغَدَرَ بِسُبَّتِهِ.

أَمَا إِنَّ لَهُ إِمْرَةً كَلَعْقَةِ الْكَلْبِ أَنْفَهُ، وَهُوَ أَبُو الأَكْبُشِ الأَرْبَعَةِ، وَسَتَلْقَى الأُمَّة مِنْهُ وَمِنْ وَلَدِهِ يَوْماً أَحْمَرَ!

[74]

لمّا عزموا على بيعة عثمان

لَقَدْ عَلِمْتُمْ أَنِّي أَحَقُّ بِهَا مِنْ

dixwazim, û ez xwe paşve didim ji wê ya ku hûn ji ber xeml û zîneta wê hevrêkîyê digel hev dikin.

غَيْـرِي، وَوَاللهِ لأُسْـلِمَنَّ مَاسَـلِمَتْ أُمُورُ الْمُسْلِمِينَ، وَلَـمْ يَكُـنْ فِيهـا جَوْرٌ إِلاَّ عَلَيَّ خَاصَّةً، الْتِمَاساً لأَجْرِ ذلِـكَ وَفَضْـلِهِ، وَزُهْـداً فِيمَـا تَنافَسْتُمُوهُ مِنْ زُخْرُفِهِ وَزِبْرِجِهِ.

۞ AXIFTINA 75 ۞

Dema xeber gêrana “Benî Umeyye” derheq şirîkatî ya wî li rijandina xûna ‘Osman da gohlê bû:

Ma ev nasî bûna min li bal Benî Umeyye, ew ji kêmasî çêkirinê bo min nedane paş? Ma rojên min yên bûrîyî, boxtana cahil û nezana ji min venekir? Bi rastî ew şîret û we’za Xwedê li wan kirî ji gotina min kartêkertir e.

Ez im yê li beraberê (Mariqîn) ji dîn derketîya da delîlê tînim, û ez dujminê (Nakisîn) soz şikênên şik di dil da me, divê şubhe pê kitêba Xuda bên hel kirin û Xuda beraberê wê ya li dilê benda da didê wan.

[75]

لمّا بلغه اتهام بني أُميّة له بالمشاركة في دم عثمان:

أَوَلَمْ يَنْهَ بَنِي أُمَيَّةَ عِلْمُهَـا بِـي عَنْ قَرْفِـي؟ أَوَمَـا وَزَعَ الْجُهَّـالُ سَـابِقَتِي عَـنْ تُهَمَتِـي؟! وَلَمَـا وَعَظَهُمُ اللهُ بِهِ أَبْلَغُ مِنْ لِسَانِي.

أَنَا حَجِيجُ الْمَارِقِينَ، وَخَصِيمُ الْمُرْتَابِينَ، عَلَى كِتَابِ اللهِ تُعْرَضُ الأَمْثالُ، وَبِمَا فِي الصُّدُورِ تُجَازَى الْعِبَادُ!

۞ AXIFTINA 76 ۞

Xelk hay dane ji karên qenc ra:

Xwedê rehmetê li wî kesî bikê ewê gotinek hekîmane seh bikê, vêca ewê bigrê, û dema hat gazî kirin bo rêka rast, nêzîk bibê, û xwe bi dawa kesekî hidayetkerve bigrê û xilas bibî; Ewê hay ji navbeyna xwe û Xwedayê xwe heyî û ji gonehê xwe bitirsê û ‘emelê xalis pîş xwe

[76]

ومن خطبة له(عليه السلام)

[في الحث على العمل الصالح]

رَحِمَ اللهُ عَبْـداً سَـمِعَ حُكْمـاً

de rêkê, û karê qenc bikê û zexîra axretê (xêran) bi dest xwe ve bênê û xwe ji tişta nehî jê hatî kirin (heramî) vedê û hedefa wî gihana heqî yê bê û bi alîyê wêve biçê, dûra vîyan û arizûyên xwe bigrê û digel hewayê nefsê bikevê şer û arizûyên xwe derew bizanê; Ewê sebir (xwe ragirî) kirî merkeb ji bona xilasî ya xwe û teqwatî kirî rizqê sefera mirina xwe, û li ser rêka ronahî gava xwe bavêjê û ji wê rêka ronahî vene bê; forsetan ji dest nedê û pêşîya gihana ecel xwe hazir bikê û karên xwe yên qenc bikê zadê xwe yê axretê.

AXIFTINA 77

Dema Se'îdê As berahî li heqê wî girt. 33 h.

Bi rastî Benî Umeyye ji piçekî pêve mîrasa Pêğember selat û selamên Xuda li ser wî û binemala wî bin nadin min, wellahî eger ez bimînim ezê wan dûrî bikim wek dûrî kirina 'owîr û rûvî yên ketîn ser 'erdê û tûzê girtîn.

Seyidê Rezî *hinek kelîmên li vê axiftinê de hatîn, şirûve dikê ku li Kûrdîyê da me ew me'ne anîye.*

AXIFTINA 78

Carna bi vî awayî di'a dikira.

Ya ilahî! Tu wa tişta li min biborî,

فَوَعَى، وَدُعِيَ إِلَى رَشَاد فَدَنَا، وَأَخَذَ بِحُجْزَةِ هَاد فَنَجَا، رَاقَبَ رَبَّهُ، وَخَافَ ذَنْبَهُ، قَدَّمَ خَالِصاً، وَعَمِلَ صَالِحاً، اكْتَسَبَ مَذْخُوراً، وَاجْتَنَبَ مَحْذُوراً، رَمَى غَرَضاً، وَأَحْرَزَ عِوَضاً، كَابَرَ هَوَاهُ، وَكَذَّبَ مُنَاهُ، جَعَلَ الصَّبْرَ مَطِيَّةَ نَجَاتِهِ، والتَّقْوَى عُدَّةَ وَفَاتِهِ، رَكِبَ الطَّرِيقَةَ الْغَرَّاءَ، وَلَزِمَ الْمحَجَّةَ الْبَيْضَاءَ، اغْتَنَمَ الْمَهَلَ، وَبَادَرَ الأَجَلَ، وَتَزَوَّدَ مِنَ الْعَمَلِ.

[77]

[حين منعه سعيد بن العاص حقه]

إِنَّ بَنِي أُمَيَّةَ لَيُفَوَّقُونَني تُرَاثَ مُحَمَّد تَفْوِيقاً، وَاللهِ لَئِنْ بَقِيتُ لَهُمْ لأَنْفُضَنَّهُمْ نَفْضَ اللَّحَّام الْوِذَامَ التَّرِبَةَ!

ويروى: «التراب الوَذَمَة»، وهو على القلب. قوله: لَيُفَوّقونَني أي: يعطونني من المال قليلاً قليلاً كفُواق الناقة، وهو الحلبة الواحدة من لبنها. والوِذَامُ: جمع وَذَمة، وهي: الحُزّة من الكرش أوالكبد تقع في التراب فتنفض.

ewên tu ji min agahtirî bi wan, vêca eger ez lê zivirîm, tujî dîsa li min bibore. Ya ilahî! Eger min soz û we'de da, lê belê te pêk anîna wê ji min nedît, tu li min bibûre û bibexşe. Ey Xuda! Eger bi ziman, min xwe nêzîkê te kir, lê dilê min bervajîyê wê bî, tu bibexşe. Ya Xuda! Tu ewa işarên bi çavan û pûç axiftinan û vîyanên dil û şimitînên zimanê min, li min bibûre û bibexşe.

AXIFTINA 79

Dema qesta şerê xewarican kir, yêkî ji hogirên wî gotê: Ey mîrê bawerdran! Gûrekî zanîna min ji 'ilmê stêrnasînê heyî, eger tu vê gavê bikevî rê, ez ditirsim tu negihêy mirada xwe. Hezretê 'Elî di cewaba wî de wiha got:

Ma gelo tu guman dikî te, zemanek dîtîye ku ew kesê li wî wextî de bo alîyê mexseda xwe rê bikevê xirabî jê re nayên pêş? Û tu ji wextekî ditirsînî ku ew kesê li wî wextî da biçê, wê zerer bighêtê? Kesê vê gotina te rast bizanê ewî Qur'an qebûl nekirîye, û ji bona gihana xweşdivê ya xwe û dûr kirina tişta jê nehez, xwe ji Xuda bê nîyaz zanîye. Û te vîyaye ew kesê bi gotina te rabê şûna Xwedayê xwe de sipasîya te bikê, çiko li ser gumana te, te ew

[78]

ومن كلمات له كان يدعو بها

اللَّهُمَّ اغْفِرْ لِي مَا أَنْتَ أَعْلَمُ بِهِ مِنِّي، فَإِنْ عُدْتُ فَعُدْ لي بِالْمَغْفِرَةِ. اللَّهُمَّ اغْفِرْ لِي مَا وَأَيْتُ مِنْ نَفْسِي، وَلَمْ تَجِدْ لَهُ وَفَاءً عِنْدي. اللَّهُمَّ اغْفِرْ لِي مَا تَقَرَّبْتُ بِهِ إِلَيْكَ [بِلِسَانِي]، ثُمَّ خَالَفَهُ قَلْبِي. اللَّهُمَّ اغْفِرْ لِي رَمَزَاتِ الأَلْحَاظِ وَ سَقَطَاتِ الأَلْفَاظِ ، وَشَهَوَاتِ الْجَنَانِ وَهَفَوَاتِ اللِّسَانِ.

[79]

ومن كلام له(عليه السلام) لبعض أصحابه لمّا عزم على المسير إلى الخوارج، فقال له: يا أميرالمؤمنين إن سرت في هذا الوقت، خشيتُ ألاَّ تظفر بمرادك، من طريق علم النجوم، فقال(عليه السلام):

أَتَزْعَمُ أَنَّكَ تَهْدِي إِلَى السَّاعَةِ الَّتِي مَنْ سَارَ فِيهَا صُرِفَ عَنْهُ السُّوءُ؟ وَتُخَوِّفُ مِنَ السَّاعَةِ الَّتِي مَنْ سَارَ فِيهَا حَاقَ بِهِ الضُّرُّ؟ فَمَنْ صَدَّقَكَ بِهذَا فَقَدْ كَذَّبَ الْقُرْآنَ، وَاسْتَغْنَى عَنِ الاِسْتِعَانَةِ بِاللهِ

rênimûn kirîye bû wextekî ku feyda wî têda ye û ji zererê hatîye parastin.

Paşê berê xwe da xelkê û got:

Gelî xelkîno! Newebê hûn xwe fêre tencîmê (zanîna stêr nasî yê û se'd û nehsî yê) bikin, xêncî wî qasê hewe rînimûnî bikê li bej û behrê da, çiko 'ilmê stêrnasî yê mirov dikişênê bal "kihanet"ê ve û muneccim wek "kahine" û kahin wek "sahire" û sahir wek "kafire" û kafir di agir de ye. Pê navê Xuda bikevin rê.

AXIFTINA 80

Paş şerê **Cemel**ê axiftîye (sala 36 h.)

Gelî xelkîno! Bi rastî jin (li ber hev girtina digel mêran) ji nezer bawerî û behra mal û 'eql ji hev ferq in.[30] Vêca ferqa bawerî ya wan eve ye ku li zemanê heyzade ji kirina nimêjê û girtina rojî yê me'zurin û ferqa 'eqlê wan di wêdaye ku şehdebînî ya dû jina ji ber ya mêrekîve ye, û ferqa behra wan di vê daye ku mîrat birina jina nîvê ya mêraye. Vêca xwe ji jinên pîs biparêzin û li beraberê başê wan da hay ji xwe hebin; li qencî yê da bindestî ya wa nekin daku ji bona kirina karê pîs ji hewe berhêvî nebin.

AXIFTINA 81

عزّوجلّ فِي نَيْلِ الْمحْبُـوبِ وَدَفْـعِ الْمَكْرُوهِ، وَتَبْتَغِي في قوْلِكَ لِلْعَامِلِ بِأَمْرِكَ أَنْ يُولِيَكَ الْحَمْدَ دُونَ رَبِّـهِ، لِأَنَّكَ ـ بِزَعْمِكَ ـ أَنْتَ هَدَيْتَهُ إِلَى السَّاعَةِ الَّتِي نَالَ فِيهَا النَّفْعَ، وَأَمِـنَ الضُّرَّ!!

ثم أقبل عليه السلام على الناس فقال:

أَيُّهَـا النَّـاسُ، إِيَّـاكُمْ وَتَعَلُّـمَ النُّجُومِ، إِلاَّ مَا يُهْتَدَى بِهِ فـي بَـرٍّ أَوْ بَحْـرٍ، فَإِنَّهَـا تَـدْعُو إِلَـى الْكَهَانَـةِ، والمُـنَجِّمُ كَالْكَـاهِنِ وَالْكَـاهِنُ كَالسَّاحِرِ وَالسَّاحِرُ كَالْكَافِرِ! وَالْكَافِرُ في النَّارِ! سِيرُوا عَلَى اسْمِ اللهِ.

[80]

بعد فراغه من حرب الجمل

مَعَاشِرَ النَّاسِ، إِنَّ النِّسَاءَ نَوَاقِصُ الأيمَانِ، نَوَاقِصُ الْحُظُوظِ، نَـوَاقِصُ الْعُقُـولِ: فَأَمَّـا نُقْصَـانُ إِيمَـانِهِنَّ فَقُعُودُهُنَّ عَنِ الصَّلاةِ وَالصِّـيَامِ فِـي أَيَّامِ حَيْضِهِنَّ، وَأَمَّا نُقْصَانُ عُقُـولِهِنَّ فَشَـهَادَةُ امْـرَأَتَيْنِ مِـنْهُنَّ كَشَـهَادَةِ الرَّجُـلِ الْوَاحِـدِ، وَأَمَّـا نُقْصَـانُ حُظُوظِهِنَّ فَمَوَارِيثُهُنَّ عَلَى الأَنْصَافِ مِنْ مَوَارِيثِ الرِّجَالِ; فَـاتَّقُوا شِـرَارَ النِّسَاءِ، وَكُونُوا مِنْ خِيَـارِهِنَّ عَلَـى

Derheq zuhdê da ye:

Xelkîno! Zuhd, kurt kirina (emel û) arizûya ye û şukir kirina li bal qencîya û hay ji xwe mana li bal herametîyê ye. Vêca eger ew des hewe neket, nixwe bila herametî serî ji sebirdarî ya hewe nestênê û dema qencî li hewe hat kirin bila şukir kirin ji bîra hewe neçê, çiko Xuda pê anîna delîlên ronahîker û eşkere û kitêbên xwey delîl rêka ‘ozr anînê li ber hewe girtîye.

AXIFTINA 82

Axiftin derheq dinyayê da ye:

Ma ez çi bêjim derheq wî cihî da ku ewilê wê te’b û zehmet û dumahîka wî ji nav çûne! Li helalê wê da hesab heye û li heramê wê da ‘ezab. Kesê bênîyaz bibê bela serda tên û yê nedar jî dikevê kol û mereqa, ewê ji destve anîna wê ra bixebitê ji desta diçê û ewê ji xebatê bisekinê dinya ber didîyê, û kesê bi çavê ‘ibretê lê binêrê ewî bîna dikê û kesê berê xwe bidîyê ewî kûr dikê.

Seyidê Rezî *li dewama vê xutbê da behsa belaxeta va dû cumlên paşî dikê ku kerem kir: “We men ebsere biha besserethu we men ebsere ileyha e’methu” dibêjê: Me’neyek têda ye ku mirov dihêlê ‘ecêbmayî û mexsedek pir bilind têda ye ku mirov naghê xilaseka wê.*

AXIFTINA 83

حَذَر، وَلاَتُطِيعُوهُنَّ فِـي المَعْـرُوفِ حَتَّى لاَ يَطْمَعْنَ فِي المُنكَرِ.

[81]

[في الزهد]

أَيُّهَا النَّـاسُ، الزَّهَـادَةُ قِصَـرُ الأَمَـلِ، وَالشُّـكْرُ عِنْـدَ الـنِّعَمِ، والورعُ عِنْـدَ الْـمَحَارِمِ، فَـإِنْ عَزَبَ ذلِكَ عَـنْكُمْ فَـلاَ يَغْلِـبِ الْحَرَامُ صَبْرَكُمْ، وَلاَ تَنْسَوْا عِنْـدَ النِّعَمِ شُـكْرَكُمْ، فَقَـدْ أَعْـذَرَ اللهُ إِلَيْكُمْ بِحُجَـجٍ مُسْـفِرَةٍ ظَـاهِرَةٍ، وَكُتُبٍ بَارِزَةِ الْعُذْرِ وَاضِحَةٍ.

[82]

في صفة الدنيا

مَا أَصِفُ مِنْ دَارٍ أَوَّلُهَـا عَنَـاءٌ! وَآخِرُهَا فَنَاءٌ! فِي حَلاَلِهَا حِسَـابٌ، وَفِي حَرَامِهَا عِقَابٌ. مَـنِ اسْـتَغْنَى فِيهَا فُتِنَ، وَمَنِ افْتَقَرَ فِيهَـا حَـزِنَ، وَمَنْ سَاعَاهَافَاتَتْهُ، وَمَنْ قَعَدَ عَنْهَـا وَاتَتْهُ، وَمَنْ أَبْصَرَ بِهَا بَصَّرَتْهُ، وَمَنْ أَبْصَرَ إِلَيْهَا أَعْمَتْهُ.

وإذا تأمل المتأمل قوله(عليه السلام): «وَمَنْ أَبْصَرَبِهَا بصّرَتْهُ» وجد تحته من المعنى العجيب، والغرض البعيد، ما لا تُبلغ غايته ولا

Ev axiftinek pir ‘ecêb e û hatîye nav kirin bi xutba “**Ğerra**”.

Hinek ji sifetên Xuda: Hemd û sipas bo wî Xwedayê ku bi quweta Xwe ser ketî û nêzîk bûyî bi dana Xwe, hedyekerê hemî feyde û qencîya û dûrkerê hemî bela û tengasîya;

أَنْتَ الأَبَـدُ فَـلاَ أَمَـدَ لَـكَ، وَأَنْـتَ الْمُنْتَهَـى فَـلاَ مَحِـيصَ عَنْكَ، وَأَنْتَ الْمَوْعِدُ فَلاَ مَنْجَـى مِنْكَ إِلاَّ إِلَيْكَ، بِيَدِكَ نَاصِيَةُ كُلِّ دَابَّة، وَإِلَيْكَ مَصِيرُ كُـلِّ نَسَـمَة. سُـبْحَانَكَ مَـا أَعْظَـمَ شَـأْنَكَ! سُبْحَانَكَ مَا أَعْظَمَ مَا نَـرَى مِـنْ خَلْقِكَ! وَمَا أَصْغَرَ كُـلَّ عَظِيمَـة فِي جَنْبِ قُدْرَتِكَ! وَمَا أَهْوَلَ مَـا نَرَى مِنْ مَلَكُوتِـكَ! وَمَـا أَحْقَـرَ ذلِـكَ فِيمَـا غَـابَ عَنَّـا مِـنْ

nehatine çêkirin û derbaz bûna zeman ew ji hev venekirne. Digel wî meqamê ewa li bal te heyî û ew mertebe û dereca te dayî wan û digel wê çendê ku xwest û vîyana wan hemî bal te ve ye û gohdarîya wan ji te ra wereng e heta zerreyekî ji emr û fermana te xafil nabin, dîsa jî eger ewqas ‘ezemet û mezinahîya te ya ew pê nizanin bi şiklek eşkere bibînin wê ‘emelên xwe kêm û biçûk hesab bikin û wê i’tirafê bikin bi kêmasî ya ‘ibadetê xwe û loman li xwe bikin û bizanin wek çawa layiqê te ‘ibadet ji te re nekirine, û bi awayekî ku layiqê te ye ferman ji te nebirine.

Negohdarî ya xelkê: Ey Xaliqê Me’bûd, Tu Pak û Munezzeh î ji kêmasîyan. Da ku tu mexlûqê xwe baş imtihan bikî, te xanîyek çêkir û sifreyek (xwan) ji vexwarina û xarina û jina û xizmetkara û qesran û rûbaran û çandinahî û fêkîyan têda deyna.

Paşê te gazîkerek şand ku bal wêve gazî bikê, vêca ne cewaba gazîker dan nejî bi alîyê wêya te ji wanre çêkirîve hatin, ne jî teşwîq bûn bal wê ve ewa te ew teşwîq kirîn ku balêve biçin. Belkê ewa berê xwe da mirarekî û pê xarina wê hetka xwe birin (şermezar bûn) û li ser

سُلْطَانِكَ! وَمَا أَسْبَغَ نِعَمَكَ فِي الدُّنْيَا، وَمَا أَصْغَرَهَا فِي نِعَمِ الْآخِرَةِ!

منها في الملائكة الكرام:

مِنْ مَلَائِكَةٍ أَسْكَنْتَهُمْ سَمَاوَاتِكَ وَرَفَعْتَهُمْ عَنْ أَرْضِكَ; هُمْ أَعْلَمُ خَلْقِكَ بِكَ، وَأَخْوَفُهُمْ لَكَ، وَأَقْرَبُهُمْ مِنْكَ; لَمْ يَسْكُنُوا الْأَصْلَابَ، وَلَمْ يُضَمَّنُوا الْأَرْحَامَ، وَلَمْ يُخْلَقُوا (مِنْ مَاء مَهين)، وَلَمْ يَتَشَعَّبْهُمْ (رَيْبَ الْمَنُونِ); وَإِنَّهُمْ عَلَى مَكَانِهِمْ مِنْكَ، وَمَنْزِلَتِهِمْ عِنْدَكَ، وَاسْتِجْمَاعِ أَهْوَائِهِمْ فِيكَ، وَكَثْرَةِ طَاعَتِهِمْ لَكَ، وَقِلَّةِ غَفْلَتِهِمْ عَنْ أَمْرِكَ، لَوْ عَايَنُوا كُنْهَ مَا خَفِيَ عَلَيْهِمْ مِنْكَ لَحَقَّرُوا أَعْمَالَهُمْ، وَلَزَرَوْا عَلَى أَنْفُسِهِمْ، وَلَعَرَفُوا أَنَّهُمْ لَمْ يَعْبُدُوكَ حَقَّ عِبَادَتِكَ، وَلَمْ يُطِيعُوكَ حَقَّ طَاعَتِكَ.

[عصيان الخلق]:

سُبْحَانَكَ خَالِقاً وَمَعْبُوداً! بِحُسْنِ بَلَائِكَ عِنْدَ خَلْقِكَ، خَلَقْتَ

dustînî ya wê tifaq kirin.

Kesê evîndarê tiştekî bibê ew evîndarî çavê wî kûr û dilê wî nexweş dikê, vêca ew pê çavê ne salim dinêrê û pê gohê seh nakê goh didê. Şehwet (vîyan) ‘eqlê wî xirab dikin û dinya dilê wî dimrênê û meyla wî bal xwe ve dikişênê; vêca dibê bendeyê dinyayê û bendeyê kesekî ku hinek ji mal û meqamê dinyayê hene. Dinya kûve bizivirê ew jî wêve dizivirê û berê xwe bidê kîderê ew jî berê xwe wî alîyîve dikê.

Gohê xwe nadê gotina çi nehykerekî ku ji alîyê Xuda ve hatbê û şîreta çi şîretkeran seh nakê; halhale dibînê kanê çawa yên dî ji nişkêve û bê xeber, mirin ser wan da tê; ne rêka xilasîyê ji wan ra heye û ne paşve çûnê. Çawa ew tişta ku jê bê xeber bûn nişkêda ser wan da hat, di wî halî da ku bi fikrek rihet jîyana xwe dibûrandin. Mirinê gerîya wan girt û ew çûn xanîyê dî ku soza wê ji wan ra hatibî dayîn.

Ewa biserê wan da hatî wesfê wê nayê dayîn; sekerata mirinê ji alîyekî ve û hesret û xema ji dest dana furset û derfetan ji alîyê dîve dest û pîyê wan sist dikê û rengê wan digoherênê; ew

دَاراً، وَجَعَلْتَ فِيهَا مَأْدُبَةً: مَشْرَباً وَمَطْعَماً، وَأَزْوَاجاً وَخَدَماً، وَقُصُوراً، وَأَنْهَاراً، وَزُرُوعاً، وَثِمَاراً.

ثمّ أَرْسَلْتَ دَاعِياً يَدْعُو إِلَيْهَا، فَلاَ الدَّاعِيَ أَجَابُوا، وَلاَ فِيمَا رَغَّبْتَ رَغِبُوا، وَلاَ إِلَى مَا شَوَّقْتَ إِلَيْهِ اشْتَاقُوا. أَقْبَلُوا عَلَى جِيفَةٍ قَدْ افْتَضَحُوا بِأَكْلِهَا، وَاصْطَلَحُوا عَلَى حُبِّهَا.

وَمَنْ عَشِقَ شَيْئاً أَعْشَى بَصَرَهُ، وَأَمْرَضَ قَلْبَهُ، فَهُوَ يَنْظُرُ بِعَيْنٍ غَيْرِ صَحِيحَةٍ، وَيَسْمَعُ بِأُذُنٍ غَيْرِ سَمِيعَةٍ، قَدْ خَرَقَتِ الشَّهَوَاتُ عَقْلَهُ، وَأَمَاتَتِ الدُّنْيَا قَلْبَهُ، وَوَلِهَتْ عَلَيْهَا نَفْسُهُ، فَهُوَ عَبْدٌ لَهَا، وَلِمَنْ فِي يَدَيْهِ شَيْءٌ مِنْهَا، حَيْثُمَا زَالَتْ زَالَ إِلَيْهَا، وَحَيْثُمَا أَقْبَلَتْ أَقْبَلَ عَلَيْهَا.

لاَ يَنْزَجِرُ مِنَ اللهِ بِزَاجِرٍ، وَلاَ يَتَّعِظُ مِنْهُ بِوَاعِظٍ، وَهُوَ يَرَى الْمَأْخُوذِينَ عَلَى الْغِرَّةِ، حَيْثُ لاَ

dinav jin û zarûkê xwe da ye û mirin her di bedena wî da pêşve diçê heta zimanê wî ji kar têxê lê belê hêca çavê wî dibînê û gohê wî seh dikê û ‘eqlê wî salime û fêhma wî li ser cihê xwe ye; fikir dikê û didê bîra xwe ku ‘emrê xwe di çi da xilas kirîye û zemanê xwe li çi da derbaz kirîye? Dikevê bîra wî malê kom kirî ku ji bona destve anîna wê çavê xwe nuqandî (girtî) ku helal û heram ji hev neqetênê û ew ji cihekî bi destve anîyî ku helal û heramî ya hineka eşkere û ya hineka jî li şikê da, vêca ezyet û zehmeta kom kirina wê ji wîra ye û eve wê jê cida dibê û diqethê, û ew mal dimînê ji wayên paş wî ra û ewin yên keyf û xweşî yê jê dibînin û behre û feydê ji wê werdgrin. Vêca xweşî ya wê ya bi destve anîyî ji xêncî wî ra ye û barê giranê wê li ser pişta wî ye û ew li girûwa wê da ye.

Vêca di wextê mirinê da, ji ber wê heqîqeta ku jê re eşkere bûyî pûşman dibê û destê xwe didê ber gezan û bê meyl dibê nisbet bi wê ya li zemanê jîyana xwe da jê hez dikira û di dilê xwede dibêjê: Xwezka ew kes xweyê mal û meqamê min bîya ewê hesed pê dibira, ne ez. Vêca mirin her wiha li bedena wî da pêşve diçê heta gohê wî jî wek zimanê wî ji kar dikevê.

إِقَالَةَ وَلاَ رَجْعَةَ، كَيْفَ نَزَلَ بِهِمْ مَا كَانُوا يَجْهَلُونَ، وَجَاءَهُمْ مِنْ فِرَاقِ الدُّنْيَا مَا كَانُوا يَأْمَنُونَ، وَقَدِمُوا مِنَ الأْخِرَةِ عَلَى مَا كَانُوا يُوعَدُونَ.

فَغَيْرُ مَوْصُوف مَا نَزَلَ بِهِمْ: اجْتَمَعَتْ عَلَيْهِمْ سَكْرَةُ الْمَوْتِ وَحَسْرَةُ الْفَوْتِ، فَفَتَرَتْ لَهَا أَطْرَافُهُمْ، وَتَغَيَّرَتْ لَهَا أَلْوَانُهُمْ. ثُمَّ ازْدَادَ الْمَوْتُ فِيهِمْ وُلُوجاً، فَحِيلَ بَيْنَ أَحَدِهِمْ وَبَيْنَ مَنْطِقِهِ، وَإِنَّهُ لَبَيْنَ أَهْلِهِ يَنْظُرُ بِبَصَرِهِ، وَيَسْمَعُ بِأُذُنِهِ، عَلَى صِحَّة مِنْ عَقْلِهِ، وَبَقَاء مِنْ لُبِّهِ، يُفَكِّرُ فِيمَ أَفْنَى عُمْرَهُ، وَفِيمَ أَذْهَبَ دَهْرَهُ! وَيَتَذَكَّرُ أَمْوَالاً جَمَعَهَا، أَغْمَضَ فِي مَطَالِبِهَا، وَأَخَذَهَا مِنْ مُصَرَّحَاتِهَا وَمُشْتَبِهَاتِهَا، قَدْ لَزِمَتْهُ تَبِعَاتُ جَمْعِهَا، وَأَشْرَفَ عَلَى فِرَاقِهَا، تَبْقَى لِمَنْ وَرَاءَهُ يَنْعَمُونَ فِيهَا، وَيَتَمَتَّعُونَ بِهَا، فَيَكُونُ الْمَهْنَأُ

لِغَيْرِهِ، وَالْعِبءُ عَلَى ظَهْرِهِ.

وَالْمَرْءُ قَدْ غَلِقَتْ رُهُونُهُ بِهَا، فَهُوَ يَعَضُّ يَدَهُ نَدَامَةً عَلَى مَا أَصْحَرَ لَهُ عِنْدَ الْمَوْتِ مِنْ أَمْرِهِ، وَيَزْهَدُ فِيما كَانَ يَرْغَبُ فِيهِ أَيَّامَ عُمُرِهِ، وَيَتَمَنَّى أَنَّ الَّذِي كَانَ يَغْبِطُهُ بِهَا وَيَحْسُدُهُ عَلَيْهَا قَدْ حَازَهَا دُونَهُ!

فَلَمْ يَزَلِ الْمَوْتُ يُبَالِغُ فِي جَسَدِهِ حَتَّى خَالَطَ [لِسَانُهُ]سَمْعَهُ، فَصَارَ بَيْنَ أَهْلِهِ لاَ يَنْطِقُ بِلِسَانِهِ، وَلاَ يَسْمَعُ بِسَمْعِهِ: يُرَدِّدُ طَرْفَهُ بِالنَّظَرِ فِي وجُوهِهِمْ، يَرَى حَرَكَاتِ أَلْسِنَتِهِمْ، وَلاَ يَسْمَعُ رَجْعَ كَلاَمِهِمْ. ثُمَّ ازْدَادَ الْمَوْتُ الْتِيَاطاً بِهِ، فَقُبِضَ بَصَرُهُ كَمَا قُبِضَ سَمْعُهُ، وَخَرَجَتِ الرُّوحُ مِنْ جَسَدِهِ، فَصَارَ جِيفَةً بَيْنَ أَهْلِهِ، قَدْ أَوْحَشُوا مِنْ جَانِبِهِ، وَتَبَاعَدُوا مِنْ قُرْبِهِ. لاَ يُسْعِدُ بَاكِياً، وَلاَ يُجِيبُ دَاعِياً. ثُمَّ حَمَلُوهُ إِلَى مَخَطٍّ فِي الأَرْضِ، فَأَسْلَمُوهُ فِيهِ إِلَى عَمَلِهِ،

Hema her li nav jin û zarûkê xwe da li ‘erdê ye, halhale ne zimanê wî dişixulê û ne gohê wî seh dikê. Berê xwe didê rûyê wan, dibînê zimanê wan diqeliqê û ew qe gohlê nabê. Mirin, her wiha têkel bedena wî dibê heta çavê wî jî, jê digrê, wek çawa ziman û gohê wî girtîn, paşî ra can ji bedena wî derdikevê û ew wek mirarekî ketîye nav jin û zarûkên xwe da. Li wî halî da hemî ji ber wî dikevin dehşetê, ji kêleka wî paşde diçin. Ew ne dikarê digel ewên digirîn hevrê bibê û ne dikarê cewaba yên dibêjin û dixûnin bidê. Paşê ji ‘erdê radikin û dibin ‘erdekî û dikin gorê da û ewî û ‘emelê wî digel hev dihêlin û êdî ji dîtina wî tên birîn (hev nabînin).

Behsa qîyametê: Heta ku ‘emrê dinyayê yê hatî nivîsîn xilas bibê, û kar bighê dûmahîkê û ewil û axrîka xilqetê bighên hev û fermana nû kirina xilqetê ji alîyê Xudave bê, wê ‘esmana bilerzênê û şeq bikê û ‘erdê birecfênê û ser û binu bikê û çîyayên wê ji cih hilkê û bilav bikê. Ji ber heybeta celal û ‘ezemeta wî û tirsa ji xelebe û hucûma

wî, wê ew çîya li hev bikevin û ser hevda biçin, heçî di wan da wê derînê, vêca piştî kevin bûna wan wê ewan nû bikê û piştî bilav bûna wan wê ewan berhev bikê; piştî hingê ji bona wî karê qirar dayî wê ewan ji hev veqetênê da ku derheq ‘emel û kiryarên veşartî yê (xef) wan da pirsyarê ji wan bikê. Ewa dikê dû kom: Ni’metê ser komekî da dirêjînê û komekî ‘ezab didê.

Vêca hindîke ehlê ta’et û ‘ibadet in, wê ewa deynê bal xwe û xêrê bidê wan û li mala xwe de (bihişt) ji her û her re bihêlê; ew cihê ku yên biçin wêderê êdî jê kûç nakin û rewş û halê wan nayê goherîn û tirs ser wan da nayê û nexweş nabin û tehlûkeyek (xeter) ji wan ra nîne û nakevin nav zehmeta seferê ra.

Ema gonehkaran li xirabtirîn xanî yan da datênê û destên wan pê zincîran bi stowê wanve girêdidin û ehnî ya wan dimînê bi pîyê wanve û cilkên ji qetranê û qetên agir dikin ber wan da û dikevin ‘ezabekî ku germî ya wê pir dijware û dergehê wê li ber wan girtîye (nikarin birevin); dikevin nav wî agirê gurr û geş ku qêr û hawara wê bilinde û pêta wê hucûmkere û dengê wê yê bilind dehşet

وَانْقَطَعُوا عَنْ زَوْرَتِهِ.

[القيامة]: حَتَّى إِذَا بَلَغَ الْكِتَابُ أَجَلَهُ، وَالأَمْرُ مَقَادِيرَهُ، وَأُلْحِقَ آخِرُ الْخَلْقِ بِأَوَّلِهِ، وَجَاءَ مِنْ أَمْرِ اللهِ مَا يُرِيدُهُ مِنْ تَجْدِيدِ خَلْقِهِ، أَمَادَ السَّمَاءَ وَفَطَرَهَا، وَأَرَجَّ الأَرْضَ وَأَرْجَفَهَا، وَقَلَعَ جِبَالَهَا وَنَسَفَهَا، وَدَكَّ بَعْضُهَا بَعْضاً مِنْ هَيْبَةِ جَلاَلَتِهِ وَمَخُوفِ سَطْوَتِهِ، وَأَخْرَجَ مَنْ فِيهَا، فَجَدَّدَهُمْ بَعْدَ إِخْلاَقِهِمْ، وَجَمَعَهُمْ بَعْدَ تَفْرِيقِهِم، ثُمَّ مَيَّزَهُمْ لِمَا يُرِيدُهُ مَنْ مَسْأَلَتِهِمْ عَنْ[خَفَايَا]الأَعْمَالِ وَخَبَايَا الأَفْعَالِ، وَجَعَلَهُمْ فَرِيقَيْنِ: أَنْعَمَ عَلَى هؤُلاَءِ وَانْتَقَمَ مِنْ هؤُلاَءِ.

فَأَمَّا أَهْلُ الطَّاعَةِ فَأَثَابَهُمْ بِجِوَارِهِ، وَخَلَّدَهُمْ فِي دَارِهِ، حَيْثُ لاَ يَظْعَنُ النُّزَّالُ، وَلاَ تَتَغَيَّرُ بِهِمُ الْحَالُ، وَلاَ تَنُوبُهُمُ الأَفْزَاعُ، وَلاَ تَنَالُهُمُ الأَسْقَامُ، وَلاَتَعْرِضُ لَهُمُ

îner. Ewê ketîyê êdî jê kûç nakê û fidya azad kirinê ji ber êsîrên wêve nayê dayîn û zincîrên wê yên pê hatîn girêdan nayên qetandin. Ne muddetek ji wê malê ra heye ku bighê dûmahîkê û ne wextek me'lûm kirî ji wê komê ra heye da ku xilas bibê.

Ji vê axiftinê ye derheq zahidî ya Pêğember da (s) : Dinya kêm û biçok û bê biha hesab kir û ew hêsan û rihet girt. Zanî ku Xwedê ji ber kêm bûna dinyayê, dinya ji wî girt û li ber yên dî vekir, vêca berê dilê xwe jê zivirand û behsa wê li dilê xwe da mirand. Hez dikira xemla dinyayê ji ber çavê wî biçê da ku newebê libasê faxir jê wergirê, an berhêvî yê mana di wê da bibê. Ji alîyê Xwedayê xwe ve bi awayek bihanebir ragihand û inzar da û şîret li ummetê kirin, pê gazî kirina bal bihiştêve mizgînî da û pê tirsandina ji agir hişêdarî da.

Derheq Ehlê Beytê da: Em dara Pêğemberîyê û cihê hatina peyxamê, û cihê hatin û çûna melaîketan û me'denên 'ilmê û serçavkên Ĥikmetê ne. Arîkar û hejêkerên me berhêvî yê

الأَخْطَارُ، وَلاَ تُشْخِصُهُمُ الأَسْفَارُ.

وَأَمَّا أَهْلُ الْمَعْصِيَةِ فَأَنْزَلَهُمْ شَرَّ دَار، وَغَلَّ الأَيْدِيَ إِلَى الأَعْنَاقِ، وَقَرَنَ النَّوَاصِيَ بِالأَقْدَامِ، وَ أَلْبَسَهُمْ سَرَابِيلَ الْقَطِرَانِ، وَمُقَطَّعَاتِ النِّيرَانِ، فِي عَذَاب قَدِ اشْتَدَّ حَرُّهُ، وَبَاب قَدْ أُطْبِقَ عَلَى أَهْلِهِ، فِي نَار لَهَا كَلَبٌ وَلَجَبٌ، وَلَهَبٌ سَاطِعٌ، وَقَصِيفٌ هَائِلٌ، لاَ يَظْعَنُ مُقِيمُهَا، وَلاَ يُفَادَى أَسِيرُهَا، وَلاَ تُفْصَمُ كُبُولُهَا. لاَ مُدَّةَ لِلدَّارِ فَتَفْنَى، وَلاَ أَجَلَ لِلْقَوْمِ فَيُقْضَى.

في ذكر النبي صلى الله عليه وآله:

قَدْ حَقَّرَ الدُّنْيَا وَصَغَّرَهَا، وَأَهْوَنَ بهَا وَهَوَّنَهَا، وَعَلِمَ أَنَّ اللهَ تعالى زَوَاهَا عَنْهُ اخْتِيَاراً، وَبَسَطَهَا لِغَيْرِهِ احْتِقَاراً، فَأَعْرَضَ عَنِ الدُّنْيَا بِقَلْبِهِ، وَأَمَاتَ ذِكْرَهَا عَنْنَفْسِهِ، وَأَحَبَّ أَنْ تَغِيبَ زِينَتُهَا عَنْ عَيْنِهِ، لِكَيْلاَ يَتَّخِذَ مِنْهَا رِيَاشاً، أَوْ

rehmetê ne û dijmin û kîndarên me jî hêvîya qehra Xwedê ne.

AXIFTINA 110

Pêşîya Seyidê Rezî da ev xutbe bi navê "dîbac" li nav 'alima da meşhûr bû.

Bi rastî baştirîn wesîla xwe pê girtinê ji bona gihana Xwedê îmana bi wî û Pêğemberên wî û cihada di rêka wî da ye; çiko cihad, bilindahî ya Islamê ye; her wiha kelîma ixilasê (tewhîd) ku li fitreta mirov da heye; û pêk anîna nimêjê ku dîn bi xwe ye; û dana zekatê ku lazimîyek ferz e; û rojîya meha Remezanê ku mertaleke li beraberê 'ezab da; û zîyareta mala Xwedê û cî anîna 'umrê ku herdu feqîretîyê ji nav dibin û gonehan dişûn; û pêk anîna heqê mirovatîyê ku mal zêde dikê û paşvederê ecel e; û sedeqa xef ku goneh ji nav dibê; û ya eşkere ku pêşîyê li mirina xirab digrê; û kirna karê qenc ku ji zelîlîyê diparêzê.

Xwe di bîr anîna Xwedê da berdin, çiko ew baştirîn zikr e û bila hewe ew bivê ewa we'da wê ji ehlê teqwayê ra hatî dayîn, çiko bi rastî we'de û soza Wî durist tirîn we'de û soz e. Bikevin

يَرْجُوَفِيهَا مَقَاماً. بَلَّغَ عَنْ رَبِّهِ مُعْذِراً، وَنَصَحَ لِاُمَّتِهِ مُنْذِراً، وَدَعَا إِلَى الْجَنَّةِ مُبَشِّراً، وَخَوَّفَ مِنَ النَّارِ مُحَذِّراً.

أهل البيت عليه السلام :

نَحْنُ شَجَرَةُ النُّبُوَّةِ، وَمَحَطُّ الرِّسَالَةِ، وَمُخْتَلَفُ الْمَلاَئِكَةِ، وَمَعَادِنُ الْعِلْمِ، وَيَنَابِيعُ الْحُكْمِ، نَاصِرُنا وَمُحِبُّنَا يَنْتَظِرُ الرَّحْمَةَ، وَعَدُوُّنا وَمُبْغِضُنَا يَنْتَظِرُ السَّطْوَةَ.

[**110**]

[في أركان الدين]

إِنَّ أَفْضَلَ مَا تَوَسَّلَ بِهِ الْمُتَوَسِّلُونَ إِلَى الله سُبْحَانَهُ: الأِيمَانُ بِهِ وَبِرَسُولِهِ، وَالْجِهادُ فِي سَبِيلِهِ فَإِنَّهُ ذِرْوَةُ الأِسْلاَمِ، وَكَلِمَةُ الأِخْلاَصِ فَإِنَّهَا الْفِطْرَةُ، وَإِقَامُ الْصَّلاَةِ فَإِنَّهَا الْمِلَّةُ، وَإِيتَاهُ الزَّكَاةِ فَإِنَّهَا فَرِيضَةٌ وَاجِبَةٌ، وَصَوْمُ شَهْرِ رَمَضَانَ فَإِنَّهُ جُنَّةٌ مِنَ الْعِقَابِ، وَحَجُّ الْبَيْتِ وَاعْتِمَارُهُ فَإِنَّهُمَا يَنْفِيَانِ الْفَقْرَ وَيَرْحَضَانِ الذَّنْبَ،

pey hidayeta Pêğemberê xwe çiko bi rastî ew baştirîn hidayet e; û bi sunneta wî ‘emel bikin -bikevin pey rêka wî- çiko bi rastî rêçk û sunneta wî serast tirîn rêçk û sunnet e.

Seratî ya Qur’anê: Xwe hînî Qur’anê bikin çiko ew baştirîn axiftin e û ewê baş fêhm bikin çiko ew bihara dila ye û pê ronahî ya wê xwe derman bikin çiko bi rastî ew şifa û dermanê singa ye û baş bixûnin çiko ew rind tirîn gotar û qiset e.

Rastî ev e ku ’alimê bi xêncî ’ilmê xwe ‘emel bikê, wek wî nezanê şaş e ewê ji cehl û nezanî ya xwe xilas nabê; belkî, hucceta li ser wî mezintir e û ji kol û xeman ra musteheqtir e, û li bal Xwedê jî pitir lome lê tê kirin.

AXIFTINA 111

Hişyar kirin derheq dinyayê da:

(Paş hemd û selewatan) Ez hewe ji dinyayê ditirsênim çiko ew şîrîn û kesk e (xweş û xweş dîtine) ku di nav vîyanên nefsanî da hatîye pêçan û pê xweşî yên xwe yên hazir û neberdewam dostînîyê çêdikê û pê tiştên xwe yên kêm xwe sipehî nîşan didê û li nav cilkên arizûyan da xwe dixweyhênê û pê

وَصِلَةُ الـرَّحِمِ فَإِنَّهَـا مَثْـرَاةٌ فِـي الْمَالِ وَمَنْسَأَةٌ فِي الأَجَلِ، وَصَدَقَةُ السِّرِّ فَإِنَّهَا تُكَفِّرُ الْخَطِيئَةَ، وَصَدَقَةُ الْعَلاَنِيَةِ فَإِنَّهَا تَدْفَعُ مِيتَـةَ السُّـوءِ، وَصَـنَائِعُ الْمَعْـرُوفِ فَإِنَّهَـا تَقِـي مَصَارِعَ الْهَوَانِ.

أَفِيضُوا فِـي ذِكْـرِ اللهِ فَأَنَّـهُ أَحْسَنُ الذِّكْرِ، وَارْغَبُوا فِيمَا وَعَدَ الْمُتَّقِـينَ فَـإِنَّ وَعْـدَهُ أَصْـدَقُ الْوَعْدِ، وَاقْتَدُوا بِهَدْيِ نَبِيِّكُمْ فَإِنَّهُ أَفْضَلُالْهَدْيِ، وَاسْتَنُّوا بِسُنَّتِهِ فَإِنَّهَا أَهْدَى السُّنَنِ.

[فضل القرآن]

وَتَعَلَّمُوا الْقرْآن [فَإِنَّهُ أَحْسَنُ الْحَدِيثِ، وَتَفَقَّهُوا فِيهِ] فَإِنَّهُ رَبِيعُ الْقُلُوبِ، وَاسْتَشْفُوا بِنُـورِهِ فَإِنَّـهُ شِفَاءُ الصُّدُورِ، وَأَحْسِنُوا تِلاَوَتَهُ فَإِنَّهُ أَنْفَعُ الْقَصَصِ.

وَإِنَّ الْعَالِمَ الْعَامِلَ بِغَيْرِ عِلْمِهِ كَالْجَاهِلِالْحَائِرِ الَّذِي لاَ يَسْـتَفِيقُ مِنْ جَهْلِـهِ، بَـلِ الْحُجَّـةُ عَلَيْـهِ أَعْظَمُ، وَالْحَسْرَةُ لَهُ أَلْـزَمُ، وَهُـوَ

xapandinê, xwe xemilandîye; keyf û ni'meta wê dewam nakê û êmnahî ji kol û derdên wê nîne. Pir xapandinker û zehf zererder e; goherîn dikevîyê û ji nav diçê û xilas dibê û li helakê diçê; pir xwer û pir ji navber e.

Meylderên wê dema di wê da bighên mexsedên xwe û bi wê razî dibin, ne zêdetirê ji vê ye ku Xwedayê bilind û pak kerem dikê: ***"... Wek avekî ye ku ji 'esmana bibarê û pê wê gîyayên reng reng bi zêdahî ve şîn bibin, vêca ji nişkê da ew hişk bibin û ba, ewê bilav bikê. Xuda ji kirina hemî karî ra karîn heye".***[35]

Xweşîyek ya wê ser kesî da nehat, xêncî ku di pey wê da rûndikek (hêstira çavan) hebê û çi keyf ji wê ser mirov da nayê illa ku pê zererekî ji wê (xweşî) pişt didê; barana nerm û riheta wê ser kesî da nebarî ku paş wê bela di pey hev ser da nehatîn, eger danê sibehî arîkarî ya wî bikê, êvarî rûyê xwe jê digrê (nenas nîşan didê) eger ji alîyekî ve şerbeta şîrîn û xweş li gerîyê da bikê ji alîyê dî ve lê tehl dikê û musîbetan biser da tênê.

Eger ni'metekî li ser dilê kesekî bidîyê di pey ra zehmetekî giran jê re çêdikê, kesê li êmnahî ya wê da rojekî bikê şev, muheqeq şevê wê heta berê sibehî bi tirs û wehşet derbaz bikê. Pir

عَنْدَ اللهِ أَلْوَمُ.

[111]

[في ذم الدنيا]

أَمَّا بَعْدُ فَإِنِّي أُحَذِّرُكُمُ الدُّنْيَا، فَإِنَّهَا حُلْوَةٌ خَضِرَةٌ، حُفَّتْ بِالشَّهَوَاتِ، وَتَحَبَّبَتْ بِالْعَاجِلَةِ، وَرَاقَتْ بِالْقَلِيلِ، وَتَحَلَّتْ بِالْأَمَالِ، وَتَزَيَّنَتْ بِالْغُرُورِ، لاَ تَدُومُ حَبْرَتُهَا، وَلاَ تُؤْمَنُ فَجْعَتُهَا، غَرَّارَةٌ ضَرَّارَةٌ، حَائِلَةٌ زَائِلَةٌ، نَافِدَةٌ بَائِدَةٌ، أَكَّالَةٌ غَوَّالَةٌ،

لاَ تَعْدُو إِذَا تَنَاهَتْ إِلَى أُمْنِيَّةِ أَهْلِ الرَّغْبَةِ فِيهَا والرضى بِهَا ـ أَنْ تَكُونَ كَمَا قَالَ اللهُ سُبْحَانَهُ وتعالى: (كَمَاء أَنْزَلْنَاهُ مِنَ السَّمَاءِفَاخْتَلَطَ بِهِ نَبَاتُ الأَرْضِ فَأَصْبَحَ هَشِيماً تَذْرُوهُ الرِّيَاحُ وَكَانَ اللهُ عَلَى كُلِّ شَيْءٍ مُقْتَدِراً).

لَمْ يَكُنِ امْرُؤٌ مِنْهَا فِي حَبْرَةٍ إِلاَّ أَعْقَبَتْهُ بَعْدَهَا عَبْرَةً، وَلَمْ يَلْقَ مِنْ سَرَّائِهَا بَطْناً إِلاَّ مَنَحَتْهُ مِنْ

dixapênê û tiştên têda jî hîleker in. Ew fanî ye û kesên di wê da jî paşî ra wê ji nav biçin. Di çi qûtek (rizq) yê wê da xêr nîne xêncî ji teqwatîyê.

Heçî ji qûtê dinyayê behrek kêmtir heyî ewî ji wê ya dibê sebebê êmnahîyê behrek pitir bi dest ve anîye û, heçî behrek pitir ji dinyayê heyî behrek pitir hildaye ji wê ya dibê sebebê helaketa wî û piştî zemanek kêm wê ji dest biçê.

Çiqas hebûne ewên pişta xwe bi dinyayê girêdayîn û ewê ew derdmend kirîn, çiqas hebûne yên dilê xwe bi wê xweş kirîn û ewê ew li ‘erdê dayîn, ewê çiqas kesên bi heybet kêm kirne û çiqas mirovên qude zelîl kirne! Padişahî ya wê dest bi dest digerê, jîyan û xweşîya wê tarî û şêlû ye, zelala wê şûr e û şîrîna wê tevlî tehlîyê ye, xarina wê jehrî ya kujinde ye û wesîlên xwe pê girtina wê werîsên rizî ne.

Saxê wê li ber mirnê ye û salimê wê li ber nexweşîyê, hukmeta wê ji dest çûyî ye û serketî yê wê şikestî ye û maldarê wê bela lê ketîye û cîranê wê talan bûyî ye.

Ma gelo newereng e ku hûn li ser warê yên pêş xwe da ne ku ‘emrê wan ji yê hewe dirêjtir û eserên wa pirtir û hêvî û arizûya wan zehftir û jimara wan gelektir û leşkerê wan bûştir bû? Ewa

ضَرَّائِهَا ظَهْراً، وَلَمْ تَطُلَّهُ فِيهَا دِيمَةُ رَخَاء إِلاَّ هَتَنَتْ عَلَيهِ مُزْنَةُ بَلاَء! وَحَرِيٌّ إِذَا أَصْبَحَتْ لَهُ مُنْتَصِرَةً أَنْ تُمْسِيَ لَهُ مُتَنَكِّرَةً، وَإِنْجَانَبٌ مِنْهَا اعْذَوْذَبَ وَاحْلَوْلَى، أَمَرَّ مِنْهَا جَانِبٌ فَأَوْبَى! لاَ يَنَالُ امْرُؤٌ مِنْ غَضَارَتِهَا رَغَباً، إِلاَّ أَرْهَقَتْهُ مِنْ نَوَائِبِهَا تَعَباً! وَلاَ يُمْسِي مِنْهَا فِي جَنَاحِ أَمْن، إِلاَّ أَصْبَحَ عَلَى قَوَادِمِ خَوْف! غَرَّارَةٌ، غُرُورٌ مَا فِيهَا، فَانِيَةٌ، فَان مَنْ عَلَيْهَا، لاَ خَيْرَ فِي شَيْء مِنْ أَزْوَادِهَا إِلاَّ التَّقْوَى.

مَنْ أَقَلَّ مِنْهَا اسْتَكْثَرَ مِمَّا يُؤْمِنُهُ! وَمَنِ اسْتَكْثَرَ مِنْهَا اسْتَكْثَرَ مِمَّا يُوبِقُهُ، وَزَالَ عَمَّا قَلِيل عَنْهُ. كَمْ مِنْ وَاثِق بِهَا قَدْ فَجَعَتْهُ، وَذِي طُمَأْنِينَة إِلَيْهَا قَدْ صَرَعَتْهُ، وَذِي أُبَّهَة قَدْ جَعَلَتْهُ حَقِيراً، وَذِي نَخْوَة قَدْ رَدَّتْهُ ذَلِيلاً! سُلْطَانُهَا دُوَلٌ، وَعَيْشُهَا رَنَقٌ، وَعَذْبُهَا أُجَاجٌ، وَحُلْوُهَا صَبِرٌ،

bendetî ya dinyayê kir, çi bendetîyek! Ew ser her tiştî ragirtin, çi sere girtinek! Vêca paşê ji dinyayê bar kirin bêy qûtek ku ewa bighênê mexsedê û bêy merkebekî ku ewa (ji dijwarîya) derbaz bikê.

Gelo hewe gohlê bûye ku dinyayê ji bona aza kirina esîrekî fidyeyek dabê? An bi awayekî arîkarî ya wan kiribê? An ji wan re hevaletîyek qenc kiribê? Ne! Belkî ewê (wek kirimê didana) ew xwarin, û qewmîna xîmê wan sist kir û pê dijwarî yên xwe ew zelîl kirin û pûzê wan bi axê ve malî û ew pê sima perçiqandin û qewmînên nexweşên zeman ser wan da anî. Vêca muheqeq hewe kerb hatina wê (nenas nîşan dana wê) digel wan kesan dîtîye ewên xwe nêzîkê wê kirîn û ew bijartîn û pişta xwe pê girêdayîn; dema jê bar kirîn û ji bona her û her jê vebûyîn. Ma gelo xêncî birçîtîyê (birsîtî) qûtek da wan? An xêncî tengasîyê danîn cihek dî? An xêncî tarîtîyê ronahîyek ji wan ra anî? An xêncî pûşmanîyê tiştek di pey wan da şand û rêkir?

Gelo ev e ya hewe ji xwe ra bijartî? Gelo ev e ya hewe pişta xwe pê girê dayî û dilê hewe difirijîyê û hûn kulbû ne ji dest ve anîna wê ra? Çi pîs war e ji wan kesan ra ewên gumana wan derheq wê da nexirab û jê natirsin.

Vêca bizanin! Elbet, hûn dizanin jî,

وَغِذَاؤُهَا سِمَامٌ، وَأَسْبَابُهَا رِمَامٌ!

حَيُّهَا بِعَرَضِ مَوْت، وَصَحِيحُهَا بَعَرَضِ سُقْم! مُلْكُهَا مَسْلُوبٌ، وَعَزِيزُهَا مَغْلُوبٌ، وَمَوْفُورُهَا مَنْكُوبٌ، وَجَارُهَا مَحْرُوبٌ.

أَلَسْتُمْ فِي مَسَاكِنِ مَنْ كَانَ قَبْلَكُمْ أَطْوَلَ أَعْمَاراً، وَأَبْقَى آثَاراً، وَأَبْعَدَ آمَالاً، وَأَعَدَّ عَدِيداً، وَأَكْثَفَ جُنُوداً! تَعَبَّدُوا لِلدُّنْيَا أَيَّ تَعَبُّد، وَآثَرُوهَا أَيَّ إِيثَار، ثُمَّ ظَعَنوا عنْهَا بَغَيْرِ زَاد مُبَلِّغ وَلاَ ظَهْر قَاطِع.

فَهَلْ بَلَغَكُمْ أَنَّ الدُّنْيَا سَخَتْ لَهُمْ نَفْساً بِفِدْيَة؟ أَوْ أَعَانَتْهُمْ بِمَعُونَة؟ أَوْ أَحْسَنَتْلَهُمْ صُحْبَةً؟ بَلْ أَرْهَقَتْهُمْ بِالْفَوَادِحِ، وَأَوْهَنَتْهُمْ بِالْقَوَارِعِ، وَضَعْضَعَتْهُمْ بِالنَّوَائِب، وَعَفَّرَتْهُمْ لِلْمَنَاخِرِ، وَوَطِئَتْهُمْ بِالْمَنَاسِمِ، وَأَعَانَتْ عَلَيْهِمْ (رَيْبَ الْمَنُونِ)، فَقَدْ رَأَيْتُمْ تَنَكُّرَهَا لِمَنْ دَانَ لَهَا، وَآثَرَهَا وَأَخْلَدَ إِلَيْهَا، حِينَ ظَعَنُوا عَنْهَا لَفِرَاقِ الأَبَدِ.

ku hûnê terka wê bikin û jê bar bikin, we’z û şîretê bigrin ji wan kesên digotan: “Kî ji me qewîtir e?” Ku ew hilgirtin û bi alîyê gora wan ve birin, vêca ji wan ra nehat gotin: Suwar! (çiko ne bi vîyan û ixtîyara wî ew li ser milan hilgirtin) û ew kirin di qebran da û ji wan ra nehat gotin: Mêhvan! Ji wan ra li ser ‘erdê, gor, û ji axê kefen çêkirin û hestî yên rizî kirin cîranê wan; ew cîranên ku cewaba gazî ya cîranên xwe nadin û zulmekî ji wan nadin paş û iltifatê bi girî û şînê nakin. Eger baran li ser wan bibarê keyfxweş nabin û eger xela rabê bê hêvî nabin, hem komin û hem kitkit (tek tek), cîranin û ji hev dûr, nêzîkê hevin lê naçin zîyareta hevdu, mirovê hevin lê nêzîkê hev nabin. Nerm û helîmin û kîna wan ji nav çûye, nezanin lê belê dil reşî û heseda wan mirî ye, êdî ne tirsa ji ezyet û azar dana wan heye, ne jî berhêvî li arîkarî ya wan da. Ew şûna jîyana li ser ‘erdê ketine nav ‘erdê da û şûna di firehî yê da bin ketine tengî yê û şûna jîyana li nav binemalê da ketine xerîbî yê; û şûna ronahî yê ji tarîtî yê nesîb û behreyek birine. Li wêderê pêxas û tazî ne (rût -rûs) wek çawa hatîn dinyayê, ewa bi ‘emel û kiryarên xwe ve ji dinyayê kûç kirin bo alîyê jîyana her û her û warê her bimînê

هَلْ زَوَّدَتْهُمْ إِلاَّ السَّغَبَ؟ أَوْ أَحَلَّتْهُمْ إِلاَّ الضَّنْكَ؟ أَوْ نَوَّرَتْ لَهُمْ إِلاَّ الظُّلْمَةَ؟ أَوْ أَعْقَبَتْهُمْ إِلاَّ النَّدَامَةَ؟

أَفَهذِهِ تُؤْثِرُونَ؟ أَمْ إِلَيْهَا تَطْمَئِنُّونَ؟ أَمْ عَلَيْهَا تَحْرِصُونَ؟ فَبِئْسَتِ الدَّارُ لَمَنْ لَمْ يَتَّهِمْهَا، وَلَمْ يَكُنْ فِيهَا عَلَى وَجَل مِنْهَا!

فَاعْلَمُوا ـ وَأَنْتُمْ تَعْلَمُونَ ـ بِأَنَّكُمْ تَارِكُوهَا وَظَاعِنُونَ عَنْهَا، وَاتَّعِظُوا فِيهَا بِالَّذِينَ (قَالُوا مَنْ أَشَدُّ مِنَّا قُوَّةً): حُمِلُوا إِلَى قُبُورِهِمْ فَلاَ يُدْعَوْنَ رُكْبَاناً، وَأُنْزِلُوا [الأَجْدَاثَ] فَلاَ يُدْعَوْنَ ضِيفَاناً، وَجُعِلَ لَهُمْ مِنَ الصَّفِيحِ أَجْنَانٌ، وَمِنَ التُّرَابِ أَكْفَانٌ، وَمِنَ الرُّفَاتِ جِيرَانٌ، فَهُمْ جِيرَةٌ لاَ يُجِيبُونَ دَاعِياً، وَلاَ يَمْنَعُونَ ضَيْماً، وَلاَ يُبَالُونَ مَنْدَبَةً، إِنْ جِيدُوا لَمْ يَفْرَحُوا، وَإِنْ قُحِطُوا لَمْ يَقْنَطُوا، جَمِيعٌوَهُمْ آحَادٌ، وَجِيرَةٌ وَهُمْ أَبْعَادٌ، مُتَدَانُونَ لاَ يَتَزَاوَرُونَ، وَقَرِيبُونَ لاَ يَتَقَارَبُونَ، حُلَمَاءُ قَدْ

(baqî) ketin rê, wek çawa Xwedayê bilind û subhan dibêjê: ***"Wek çawa me, ewil xuliqandîn emê bizivirînin, evahe soz û qirareke, ku bi cî anîna wê hêvîya me ve ye û muheqeq emê bikîn"***[36]

AXIFTINA 112

Di vê axiftinê de behsa Melekê Mewtê (s) û girtina rih û cana kirîye.

Gelo dema biçê malekî da tu pê dihesî? An dema canê kesekî digrê, tu ewî dibînî? Ew çawa zaroka li zikê daykê da dimrênê? Gelo li hinek ji endamên daykê ra xwe dighênê zarok? An rih (can) bi izna Xwedayê xwe cewaba wî didê? An digel zarok li zikê daykê da cî girtîye?

Kesê ku nekarbê sifetê mexlûqek wek xwe bidê wê çawa wesfê Xwedayê xwe bidê?!

AXIFTINA 113

Derheq xirabî ya dinya perêsîyê da ye.

Ez hewe ji dinyayê ditirsînim çiko ew warê jê barkirin û jê derketinê ye; ne mala dil germî û gihana hêvî û arizûyan; bi hîlên xwe hatîye xemilandin û pê wê xemla hîlekar xelkê dixapênê.

Ew mal (dinya) li bal Xwedayê wê bê qîmete, vêca ji ber wê, helalê wê digel heramê wê û başî ya wê digel pîsatî ya

ذَهَبَتْ أَضْغَانُهُمْ، وَجُهَلاءُ قَدْ مَاتَتْ أَحْقَادُهُمْ لاَ يُخْشَى فَجْعُهُمْ وَلاَ يُرْجَى دَفْعُهُمْ، اسْتَبْدَلُوا بِظَهْرِ الأَرْضِ بَطْناً، وَبِالسَّعَةِ ضِيقاً، وَبِالأَهْلِ غُرْبَةً، وَبِالنُّورِ ظُلْمَةً، فَجَاؤُوهَا كَمَا فَارَقُوهَا، حُفَاةً عُرَاةً، قَدْ ظَعَنُوا عَنْهَا بِأَعْمَالِهِمْ إِلَى الْحَيَاةِ الدَّائِمَةِ وَالدَّارِ الْبَاقِيَةِ، كَمَا قَالَ اللهُ سُبْحَانَهُ:

(كَمَا بَدَأْنَا أَوَّلَ خَلْقٍ نُعِيدُهُ وَعْداً عَلَيْنَا إِنَّا كُنَّا فَاعِلِينَ).

[**112**]

ومن خطبة له عليه السلام ذكر فيها ملك الموت وتوفية الانفس

هَلْ تُحِسُّ بِهِ إِذَا دَخَلَ مَنْزِلاً؟ أَمْ هَلْ تَرَاهُ إِذَا تَوَفَّى أَحَداً؟ بَلْ كَيْفَ يَتَوَفَّى الْجَنِينَ فِي بَطْنِ أُمِّهِ؟! أَيَلِجُ عَلَيْهِ مِنْ بَعْضِ جَوَارِحِهَا؟ أَمِ الرُّوحُ أَجَابَتْهُ بِإِذْنِ رَبِّهَا؟ أَمْ هُوَ سَاكِنٌ مَعَهُ فِي

wê û jîyana wê digel mirina wê û şîrînî ya wê digel tehlî ya wê tevhev kir. Ew li dostên xwe xweş neanî û li dana wê da ji bona dijminên xwe jî bexîletî nekir. Xêra wê kêm û xirabî ya wê hazire, berhev bûyîya wê xilas dibê û hukmet û milkê wê fena dibê û di pey avakirina wê da xirab bûn heye. Vêca warê wek rijyana avahîyekî serhevda dirijihê û ‘emrî wek qûtê xilasî jê re heyî û zemanî wek pêveçûna rêkekî axrîk heyî çi xêr û xweşî di wê da heye?

Bikevin pey wê ya Xwedê li ser hewe ferz kirî û ji wî bixwazin heta ji bona pêk anîna ewê ya li ser hewe ferz kirî karînê bidê hewe, hêca hûn nehatîn gazî kirin, û mirin ser hew da nehatî gohê xwe bidin gazî ya mirinê. Bi rastî zahid, di dinyayê da dilê wan digirî (dil bi kol in) her çend bikenin, xema wan dijware her çend bi keyf bên dîtin, pir ji xwe nerihetin herçend ji ber wî rizqê ji wan ra hatî dayîn, hesed bi wan tê birin.

Bê şik bîr hatina mirinê ji dilê hewe dûr ketîye û arizûyên derewîn hûn kirne nav xwe ra, vêca dinyayê pitir ji axretê hûn bi xwe ve girêdane û ev a zû derbaz dibê, axret ji dest hewe deranî ye. Hûn biraderên dînî ne, xêncî nepakî ya dilan û pîsatî ya batin tiştek dî hûn ji hev

أَحْشَائِهَا؟كَيْفَ يَصِفُ إِلهَهُ مَنْ يَعْجَزُ عَنْ صِفَةِ مَخْلُوق مِثْلِهِ؟!

[**113**]

[في ذم الدنيا]: وَأُحَذِّرُكُمُ الدُّنْيَا، فَإِنَّهَا مَنْزِلُ قُلْعَة، وَلَيْسَتْ بِدَار نُجْعَة، قَدْ تَزَيَّنَتْ بِغُرُورِهَا، وَغَرَّتْ بِزِينَتِهَا، دَارُهَا هَانَتْ عَلَى رَبِّهَا، فَخَلَطَ حَلاَلَهَا بِحَرَامِهَا، وَخَيْرَهَا بِشَرِّهَا، وَحَيَاتَهَا بِمَوتِهَا، وَحُلْوَهَا بِمُرِّهَا، لَمْ يُصْفِهَا اللهُ لاَوْلِيَائِهِ، وَلَمْ يَضِنَّ بِهَا عَلَى أَعْدَائِهِ، خَيْرُهَا زَهِيدٌ، وَشَرُّهَا عَتِيدٌ، وَجَمْعُهَا يَنْفَدُ، وَمُلْكُهَا يُسْلَبُ، وَعَامِرُهَا يَخْرَبُ. فَمَا خَيْرُ دَار تُنْقَضُ نَقْضَ الْبِنَاءِ، وَعُمُر يَفْنَى فَنَاءَ الزَّادِ، وَمُدَّة تَنْقَطِعُ انْقِطَاعَ السَّيْرِ!

فاجْعَلُوا مَا افْتَرَضَ اللهُ عَلَيْكُمْ مِنْ طَلَبَتِكُمْ، وَاسْأَلُوهُ مِنْ أَدَاءِ حَقِّهِ مَا سَأَلَكُمْ، وَأَسْمِعُوا دَعْوَةَ الْمَوْتِ آذَانَكُمْ قَبْلَ أَنْ يُدْعَى بِكُمْ.

إِنَّ الزَّاهِدِينَ فِي الدُّنْيَا تَبْكِي

bilav ne kirine, vêca êdî hûn arîkarî ya hev nakin û ji hevra ne xêrxwazin û danê digel hev nakin û dostînî yê digel hev nakin. Çi ji hewe hatîye! Piçekî kêm ji dinyayê ku bi destve tênîn hûn pir keyfxweş dibin, lê bê behrîya zehfî ji axretê hewe dil kol (xemgîr) nakê! Pê ji dest çûna piçekî ji dinyayê hûn bê tebat dibin û bê tebatî li rûyê we ra dixweyihê; û ji ber ji dest dana kêmê dinyayê hûn bê taqet dibin, heçweku dinya warê hewe yê hûn ileh têda bijîn û mal û heyî ya wê her û her ji hewe re bimînê!

Çi tişt hewe natirsênê û paşve nadê ji gotina kêmasî ya biraderê xwe li wextê rast hev ketinê da, xêncî tirsa ji wê yêkê ku ew jî kêmasîyek wek wê bidê rûyê wî. Di terka axretê û hez kirina dinyayê da hûn yêkdil bûne. Dîndarîya hewe jî bi zimane, wek wî yê karê xwe xilas kirî û razî bûna mezinê xwe bi destve anîyî.

AXIFTINA 114

Hemd ji Xuda re, ewê ẽhemd û ni'met, we ni'met û sipas, bi heve girê dayî, em, hemdê wî dikin li ser ni'metên wî, wek çawa em li ser bela (imtihana) wî jî hemdê wî dikîn. Em arîkarîyê ji wî dixwazîn ji bona durist kirina nefsên bê xêr û sist li beraberê pêk anîna karên ku emr pê hatî kirin; ew nefsên bi lez ketî jibo wa

قُلُوبُهُمْ وَإِنْ ضَحِكُوا، وَيَشْتَدُّ حُزْنُهُمْ وَإِنْ فَرِحُوا، وَيَكْثُرُ مَقْتُهُمْ أَنْفُسَهُمْ وَإِنِ اغْتَبَطُوا بِمَا رُزِقُوا.

قَدْ غَابَ عَنْ قُلُوبِكُمْ ذِكْرُ الأَجَالِ، وَحَضَرَتْكُمْ كَوَاذِبُ الأَمَالِ، فَصَارَتِ الدُّنْيَا أَمْلَكَ بِكُمْ مِنَ الأُخْرَةِ، وَالْعَاجِلَةُ أَذْهَبَ بِكُمْ مِنَ الآجِلَةِ، وَإِنَّمَا أَنْتُمْ إِخْوَانٌ عَلَى دِينِ اللهِ، مَا فَرَّقَ بَيْنَكُمْ إِلاَّ خُبْثُ السَّرَائِرِ، وَسُوءُ الضَّمَائِرِ، فَلاَ تَوَازَرُونَ، وَلاَ تَنَاصَحُونَ، وَلاَ تَبَاذَلُونَ، وَلاَ تَوَادُّونَ. مَا بَالُكُمْ تَفْرَحُونَ بِالْيَسِيرِ مِنَ الدُّنْيَا تُدْرِكُونَهُ وَلاَ يَحْزُنُكُمُ الْكَثِيرُ مِنَ الاخِرَةِ تُحْرَمُونَهُ! وَيُقْلِقُكُمُ الْيَسِيرُ مِنَ الدُّنْيَا يَفُوتُكُمْ، حَتَّى يَتَبَيَّنَ ذلِكَ فِي وُجُوهِكُمْ، وَقَلَّةِ صَبْرِكُمْ عَمَّا زُوِيَ مِنْهَا عَنْكُمْ! كَأَنَّهَا دَارُ مُقَامِكُمْ، وَكَأَنَّ مَتَاعَهَا بَاق عَلَيْكُمْ.

وَمَا يَمْنَعُ أَحَدَكُمْ أَنْ يَسْتَقْبِلَ أَخَاهُ بِمَا يَخَافُ مِنْ عَيْبِهِ، إِلاَّ مَخَافَةُ أَنْ يَسْتَقْبِلَهُ بِمِثْلِهِ، قَدْ تَصَافَيْتُمْ عَلَى رَفْضِ الأَجِلِ وَحُبِّ الْعَاجِلِ، وَصَارَ دِينُ

karên nehî jê hatî kirin. Em lê bûrînê jê dixwazîn ji ber hemî wa tiştên ‘ilm û zanîna wî pê heyî û li kitêba wî da hatî êjmar û qeyd kirin; ew ’ilmê ku kêmasî têda nîne û ew kitêba çi tişt paşve nehiştî û bernedayî. Em bawerî yê pê tînin bawerîyek wek ya wa kesên veşartî dîtîn û li qirargehê rawestayî; bawerîyek ku ixilasa wê şirkê û yeqîna wê şikê ji nav dibê. Û em şehde didîn ku çi Xuda xêncî ji “ellah” nînin; teke û bê şirîk; em şehde didîn ku Muhemmed selat û selamên Xwedê li ser wî û binemala wî bin bendeyê wî û hinartî yê wî ye, dû şehdeyên ku gotinê jûrve (jêlil) dibin û ‘emel û kiryarê bilind dikin; Mîzana ku ew herdû têda bên deynan sivik nabê û ewa herdu jê bên deranîn giran nabê.

Ey bendeyên Xwedê! Ez wesîyeta teqwatî yê li hewe dikim ku hem rizqe (qût) hem cihê xwe pê girtinê ye; qûteke ku mirov dighênê mexsedê û xwe pêgirek xilaskere; baştirînê gazîkera ew da seh kirin û baştirîn gohlê dera jî ew seh kir, vêca gazîker ew da bihîstin û gohlêder jî bi wê xilas bû.

Ey bendeyên Xwedê! Teqwatî ya ilahî, dostên Xwedê ji kirina karên heram parastine; tirsa ji Xwedê bi dilê wanve danîye, heta ku şevan, xew nakevê çavê wan (‘ibadet dikin) û di rojên

أَحَدِكُمْ لُعْقَةً عَلَى لِسَانِهِ، صَنِيعَ مَنْ قَدْ فَرَغَ مِنْ عَمَلِهِ، وَأَحْرَزَ رِضَى سَيِّدِهِ.

[**114**]

[مواعظ للناس]

الْحَمْدُ لله الْوَاصِلِ الْحَمْدَ بِالنِّعَمِ وَالنِّعَمَ بِالشُّكْرِ، نَحْمَدُهُ عَلَى آلاَئِهِ كَمَا نَحْمَدُهُ عَلَى بَلاَئِهِ، وَنَسْتَعِينُهُ عَلَى هذِهِ النُّفُوسِ الْبِطَاءِ عَمَّا أُمِرَتْ بِهِ، السِّرَاعِ إِلَى مَا نُهِيَتْ عَنْهُ، وَنَسْتَغْفِرُهُمِمَّا أَحَاطَ بِهِ عِلْمُهُ، وَأَحْصَاهُ كِتَابُهُ: عِلْمٌ غَيْرُ قَاصِرٍ، وَكِتَابٌ غَيْرُ مُغَادِرٍ، وَنُؤْمِنُ بِهِ إِيمَانَ مَنْ عَايَنَ الْغُيُوبَ، وَوَقَفَ عَلَى الْمَوْعُودِ، إِيمَاناً نَفَى إِخْلاَصُهُ الشِّرْكَ، وَيَقِينُهُ الشَّكَ، وَنَشْهَدُ أَنْ لاَ إِلهَ إِلاَّ اللهُ وَحْدَهُ لاَ شَرِيكَ لَهُ، وَأَنَّ مُحَمَّداً عَبْدُهُ وَرَسُولُهُ، شَهَادَتَيْنِ تُصْعِدَانِ الْقَوْلَ، وَتَرْفَعَانِ الْعَمَلَ، لاَيَخِفُّ مِيزَانٌ تُوضَعَانِ فِيهِ، وَلاَ يَثْقُلُ مِيزَانٌ تُرْفَعَانِ مِنْهُ.

germ da jî têhn dimînin (bi rojî ne) vêca ewa rihetî pê zehmetê û têr av bûn pê têhnîtî yê destve anîn (rihetî ya axretê\ zehmetê dinyayê). Mirin nêzîk dîtin û des avêtin kar û ‘emelê qenc; arizû, biderew êxistin û ecelê xwe berçav kirin.

Evê jî bizanin! Dinya warê ji nav çûn û zehmet û goherîn û ‘ibretê ye; warê ji nav çûnê ye çiko ileh tîra wê li kevanê da ye û tîrên wê xelet naçin û birîna wê sax nabê û yê sax, didê ber tîra mirinê û yê salim didê ber tîra nexweşîyê û ewê xilas bûyî didê ber tîrên bextreşî û ji kar êxistinê. Xwerayeke ku têr nabê û vexwereke ku têhnîşka wê naşikê.

Ji nexweşîya wê ew e ku; mirov malekî kom dikê û jê naxwê û avahîyekî çêdikê û têda nasekinê, paşê jî bi alîyê Xwedêve diçê ku ne malek hilgirtîye û ne avahîyek digel xwe birîye.

Ji goherîna wê ew e ku; tu dibînî, kesek, rojekî hesed pê dihata birin û Îro dil pê dişewitin û yêk, rojekî merhemet lê dibûya û Îro hesed pê tê birin; belê, ev dil pêve hiştin xêncî ji ber ji dest çûna ni’metekî û serda hatina jarîyekî tiştek dî nîne; ‘ibret danek dî ya wê ev e ku mirov digel xwestekî raber dibê û arizûyek jê re çêdibê, vêca ji nişkêve mirin dighê ku êdî ne xwest û vîyana wî tê cî û ne jî mirin desta jê dikêşê.

أُوصِيكُمْ، عِبَادَ الله، بِتَقْوَى الله الَّتي هِيَ الزَّادُ وَبِهَا الْمَعَاذُ: زَادٌ مُبْلِغٌ وَمَعَاذٌ مُنْجِحٌ، دَعَا إِلَيْهَا أَسْمَعُ دَاعٍ، وَوَعَاهَا خَيْرُ وَاعٍ، فَأَسْمَعَ دَاعِيهَا، وَفَازَ وَاعِيهَا.

عِبَادَ الله، إِنَّ تَقْوَى الله حَمَتْ أَوْلِيَاءَ الله مَحَارِمَهُ، وَأَلْزَمَتْ قُلُوبَهُمْ مَخَافَتَهُ، حَتَّى أَسْهَرَتْ لَيَالِيَهُمْ، وَأَظْمَأَتْ هَوَاجِرَهُمْ; فَأَخَذُوا الرَّاحَةَ بِالنَّصَبِ، وَالرِّيَّ بِالظَّمَإِ، وَاسْتَقْرَبُوا الأَجَلَ فَبَادَرُوا الْعَمَلَ، وَكَذَّبُوا الأَمَلَ فَلاَحَظُوا الأَجَلَ.

ثُمَّ إِنَّ الدُّنْيَا دَارُ فَنَاء، وَعَنَاء، وَغِيَر، وَعِبَر: فَمِنَ الْفَنَاء أَنَّ الدَّهْرَ مُوتِرٌ قَوْسَهُ، لاَتُخْطِيءُ سِهَامُهُ، وَلاَ تُؤْسَى جِرَاحُهُ، يَرْمِي الْحَيَّ بِالْمَوْتِ، وَالصَّحِيحَ بِالسَّقَمِ، وَالنَّاجِيَ بِالْعَطَبِ، آكِلٌ لاَ يَشْبَعُ، وَشَارِبٌ لاَ يَنْقَعُ.

وَمِنَ الْعَنَاء أَنَّ الْمَرْءَ يَجْمَعُ مَا لاَ يَأْكُلُ، وَيَبْنِي مَا لاَ يَسْكُنُ، ثُمَّ يَخْرُجُ إِلَى الله، لاَ مَالاً حَمَلَ، وَلاَ

Subhan-ellah, çiqa xapandinkere keyfa wê! Çiqa têhnîşikê zêde dikê vexwarina ji wê! Sîbera wê çiqa bi şewate! Ne ya hatî (mirin. An: zeman) tê zivirandin û ne ya çûyî (mirî, an: demê derbaz bûyî) pêşve tê anîn.

Subhan-ellah, çiqa sax nêzîkê mirî ye, ji bona gihana wî; û çiqa mirî ji yê sax dûr e çiko jê hatîye birrîn.

Rastî ev e ku çi tişt ji pîsatî yê pîstir nînin xêncî ji cezayê wê, û çi tişt ji başî yê baştir nînin xêncî xêr û kirha wê. Heçî tişta dinyayî, gohlê bîna wê mezintir e ji dîtina wê û heçî ya axretî dîtina wê mezintir e ji seh kirina wê, vêca ji nav dîtinîyan gohlê bûn û ji nav veşartîyan xeber dan ji hewe re bese.

Bizanin! Ewa ji dinyayê kêm bibê û li axretê zêde bibê, baştir e ji wê ya ji axretê kêm bibê û ser dinyayêve zêde bibê. Vêca hene yên ji wan kêm bûyî û feyde kirîn û yên li wan zêde bûyî û zerer kirîn!

Ewa hûn pê hatîn emir kirin berfireh-tir e ji wê ya nehya hewe jê hatî kirin û ewa ji hewe re hatî helal kirin pitir e ji wê ya ji hewe re heram bûyî. Vêca ji ber ya zehf desta ji ya kêm bikêşin û ji ber ya berfireh, ya teng berdin. Xwedê rizqê hewe li xwe girtîye û destûra kar û ‘emel daye hewe, vêca bila peyketina

بِنَاءً نَقَلَ!

وَمِـنْ غِيَرِهَـا أَنَّـكَ تَـرَى الْمَرْحُـومَ مَغْبُوطـاً، والْمَغْبُـوطَ مَرْحُوماً، لَيْسَ ذلِكَ إِلاَّ نَعِيماً زَلَّ، وَبُؤْساً نَزَلَ.

وَمِنْ عِبَرِهَا أَنَّ المَرْءَ يُشْـرِفُ عَلَى أَمَلِهِ فَيَقْتَطِعُهُ حُضُورُ أَجَلِـهِ، فَلاَ أَمَلٌ يُدْرَكُ، وَلاَ مُؤَمَّلٌ يُتْرَكُ.

فَسُبْحَانَ الله، مَا أَعَزَّ سُرُورَهَا! وَأَظْمَأَ رِيَّهَـا! وَأَضْـحَى فَيْئَهَـا! لاَ جَاء يُرَدُّ، وَلاَ مَاض يَرْتَدُّ.

فَسُبْحَانَ الله، مَا أَقْرَبَ الْحَـيَّ مِنَ المَيِّـتِ لِلَحَاقِـهِ بِـهِ، وَأَبْعَـدَ الْمَيِّتَ مِنَ الْحَيِّ لِانْقِطَاعِـهِ عَنْـهُ!

إِنَّهُ لَيْسَ شَيْءٌ بِشَرٍّ مِنَ الشَّـرِّ إِلاَّ عِقَابُهُ، وَلَيْسَ شَيْءٌ بِخَيْر مِـنَ الْخَيْرِ إِلاَّ ثَوَابُهُ، وَكُلُّ شَـيْء مِـنَ الدُّنْيَا سَمَاعُهُ أَعْظَـمُ مِـنْ عِيَانِـهِ، وَكُلُّ شَـيْء مِـنَ الآخِـرَةِ عِيَانُـهُ أَعْظَمُ مِنْ سَمَاعِهِ، فَلْـيَكْفِكُمْ مِـنَ الْعِيَانِ السَّمَاعُ، وَمِنَ الْغَيْبِ الْخَبَرُ.

وَاعْلَمُـوا أَنَّ مَـا نَقَـصَ مِـنَ الدُّنْيَا وَزَادَ فِـيالآخِرَةِ خَيْـرٌ مِمَّـا

ewê ya Wî ji bona hewe li xwe girtî seretir neyê girtin ji wî ‘emelê kirina wê li ser hewe ferz kirî. Digel vê yêkê sond bi Xwedê! Şikê ber, daye (hatiye) û şubhe tevlî yeqînê bûye, heta bi wê derecê ku hûn guman dikin destve anîna rizqê hatî we’de kirin li ser hewe ferze û pêk anîna ferz û waciban ji ser hewe hatîye avêtin.

Des bavêjin ‘emel û ji gihana nişkêve ya mirinê bitirsin, çiko hêvî ji bona zivirîna ‘emrê derbaz bûyî nîne, halhale ew rizqê ji dest çûyî dizivirê. Çiqa ji rizqê hewe Îro bifewitê (ji dest biçê) hêvî ew e ku sibehî bi zêdahîve bê, lê belê ‘emrê ku duhî ji dest çûyî, êdî Îro nazivirê. Nixwe hêvî digel wê ye ewa hêj bê, û bê hêvî bûn digel wê ye ewa derbaz bûyî. Vêca: “***Ji Xwedê bitirsin, bi tirsînekî ku layiqê tirsa ji Wî bê; û xêncî li ser dînê Islamê, nemirin***”[37]

نَقَصَ مِنَ الْآخِرَةِ وَزَادَ فِي الدُّنْيَا: فَكَمْ مِنْ مَنْقُوص رَابِح وَمَزِيد خَاسِر!

إِنَّ الَّذي أُمِرْتُمْ بِهِ أَوْسَعُ مِنَ الَّذِي نُهِيتُمْ عَنْهُ، وَمَا أُحِلَّ لَكُمْ أَكْثَرُ مِمَّا حُرِّمَ عَلَيْكُمْ، فَذَرُوا مَا قَلَّ لِمَا كَثُرَ، وَمَا ضَاقَ لِمَا اتَّسَعَ. قَدْ تُكُفِّلَ لَكُمْ بِالرِّزْقِ، وَأُمِرْتُمْ بِالْعَمَلِ، فَلاَ يَكُونَنَّ الْمَضْمُونُ لَكُمْ طَلَبُهُ أَوْلَى بِكُمْ مِنَ الْمَفْرُوضِ عَلَيْكُمْ عَمَلُهُ، مَعَ أَنَّهُ والله لَقَدِ اعْتَرَضَ الشَّكُّ، وَدَخَلَ الْيَقِينُ، حَتَّى كَأَنَّ الَّذِي ضُمِنَ لَكُمْ قَدْ فُرِضَ عَلَيْكُمْ، وَكَأَنَّ الَّذِي قَدْ فُرِضَ عَلَيْكُمْ قَدْ وُضِعَ عَنْكُمْ.

فَبَادِرُوا الْعَمَلَ، وَخَافُوا بَغْتَةَ الأَجَلِ، فَإِنَّهُ لاَ يُرْجَى مِنْ رَجْعَةِ الْعُمُرِ مَا يُرْجَى مِنْ رَجْعَةِ الرِّزْقِ، مَا فَاتَ الْيَوْمَ مِنَ الرِّزْقِ رُجِيَ غَداً زِيَادَتُهُ، وَمَا فَاتَ أَمْسِ مِنَ الْعُمُرِ لَمْ يُرْجَ الْيَوْمَ رَجْعَتُهُ. الرَّجَاءُ مَعَ الْجَائِي،

۞ AXIFTINA 115 ۞

Ji bona xwestina baranê wiha gotîye:

Ey ilahî! Çîyayên me ji ber hişkî yê şeqitîne û ‘erdê me tûzê girtîye û heywanên me têhnî ne û li cihê xwe da şaş û heyrî mane û wek daykên zarûk mirî dinalin. Ji hatin çûna bê hûde bo

cihê çêrînê westihane û ji şewqa çûna bo ser avê bê taqet bûne.

Ey ilahî! Tu bi nalîna mihan û ahêna devên mê, rehmê bibe. Ey Xuda! Rehmê bibe bi heyrî bûna wan li demê rê ve çûnê da û bi ah û nalîna wan demê diçin ser cihê xwe; Ey Xuda! Em derketine û bal te ve hatine, li wextekî da ku hişksalî wek deva ze'êf (lawaz) ser me da hatîye û 'ewrên baran jê der ne bi wî awayî ne ku xwe nîşan didin; ilahî! Tûyî hêvîya derdmendan û çare peydakerê daxwazkeran;

Li wextekî ku xelk bê hêvî bûne û pêşî li 'ewr hatîye girtin û heywanat ji nav çûne, em gazî te dikîn ku tu ji ber kiryarên me ve li me neşidînî û ji ber gonehê me li me negirî; Rehmeta xwe pê 'ewrê pirbaran û biharek pir av û şînkatîyek xweşî îner ser me da birijîne; baranek lib mezin û pir bar ser me da bîne da ewê ya mirî tu pê wê sax bikî û ewa ji dest çûyî tu paşve bizivirînî.

Ey Xuda! Baranekî bide saxker û têr avker ku hemîyan li ber xwe bigirê û bighê hemî cihî. Baranek pak, bi bereket, zehf xweş û pir ni'met; ku

وَالْيَأْسُ مَعَ الْمَاضِي، فَـ (اتَّقُوا اللهَ حَقَّ تُقَاتِهِ وَلاَ تَمُوتُنَّ إِلاَّ وَأَنْتُمْ مُسْلِمُونَ).

[**115**]

في الاستسقاء

اللَّهُمَّ قَدِ انْصَاحَتْ جِبَالُنَا، وَاغْبَرَّتْ أَرْضُنَا، وَهَامَتْ دَوَابُّنَا، وَتَحَيَّرَتْ فِي مَرَابِضِهَا، وَعَجَّتْ عَجِيجَ الثَّكَالَى عَلَى أَوْلاَدِهَا، وَمَلَّتِ التَّرَدُّدَ فِي مَرَاتِعِهَا، وَالحَنِينَ إِلَى مَوَارِدِهَا.

اللَّهُمَّ فَارْحَمْ أَنِينَ الأَنَّةِ، وَحَنِينَ الْحَانَّةِ! اللَّهُمَّ فَارْحَمْ حَيْرَتَهَا فِيمَذَاهِبِهَا، وَأَنِينَهَا فِي مَوَالِجِهَا! اللَّهُمَّ خَرَجْنَا إِلَيْكَ حِينَ اعْتَكَرَتْ عَلَيْنَا حَدَابِيرُ السِّنِينَ، وَأَخْلَفَتْنَا مَخَايِلُ الْجُودِ; فَكُنْتَ الرَّجَاءَ لِلْمُبْتَئِسِ، وَالْبَلاَغَ لِلْمُلْتَمِسِ.

نَدْعُوكَ حِينَ قَنَطَ الأَنَامُ، وَمُنِعَ الْغَمَامُ، وَهَلَكَ السَّوَامُ، أَلاَّ تُؤَاخِذَنَا بِأَعْمَالِنَا، وَلاَ تَأْخُذَنَا

gîyayê wê zehf û çiqên wê bi bereket û bergên wî ter û taze bibê; da pê wê tu bendeyê xwe yê ze'êf bi hêz bêxî û pê wê tu 'erdê xwe yê mirî sax bikî.

Ey xweda! Em avê dixwazîn, da ku cihên bilind têr gîya bibin û cihên niviz av têda biherikê û dûr û berê me kesk û şîn bibê û fêkî yê me zehf bibê û çarpî yên me (heywanat) bighên rihetîyê û xelkê dûr ji me jî behre û feydê jê bibin û çûl û zevîyên li ber tavê zowa bûyî feydê jê bibin. Ji xêr û xweşî ya xwe ya berfireh û dana xwe ya berketî bide 'evdên xwe yên bê çare û ewa heywanên li çûlê hatîn beredayî kirin;

Baranekî bibarîne ku 'erdê têr bikê û li pey hev û bûş bibarê; bi awayek wereng ku libên wê serhev da bên û neyê birîn;

Ewî 'ewrî bide ku di pey re'd û berqa wê da baran hebê, ne ew 'ewrê bê baran ku ufuqê xefkê û ne 'ewerê spî yê kêm baran û hevrê digel bayên sar, da ku xela dîtî pê gîyayê wê yê zehfî pir ni'met bibin û bi bereketa wê ewên zehmet dîtî bighên rihetî yê.

Vêca bi rastî ***"piştî bêhêvî bûnê tu***

بِذُنُوبِنَا، وَانْشُرْ عَلَيْنَا رَحْمَتَكَ بِالسَّحَابِ الْمُنْبَعِقِ، وَالرَّبِيعِ الْمُغْدِقِ، وَالنَّبَاتِ الْمُونِقِ، سَحّاً وَابِلاً تُحْيِي بِهِ مَا قَدْ مَاتَ، وَتَرُدُّ بِهِ مَا قَدْ فَاتَ.

اللَّهُمَّ سُقْيَا مِنْكَ مُحْيِيَةً مُرْوِيَةً ، تَامَّةً عَامَّةً ، طَيِّبَةً مُبَارَكَةً ، هَنِيئَةً مَرِيعَةً زَاكِياً نَبْتُهَا ، ثَامِراً فَرْعُهَا نَاضِراً وَرَقُهَا ، تُنْعِشُ بِهَا الضَّعِيفَ مِنْ عِبَادِكَ ، وَتُحْيِي بِهَا الْمَيِّتَ مِنْ بِلاَدِكَ ! اللَّهُمَّ سُقْيَا مِنْكَ تُعْشِبُ بِهَا نِجَادُنَا وَتَجْرِي بِهَا وِهَادُنَا وَيُخْصِبُ بِهَا جَنَابُنَا وَتُقْبِلُ بِهَا ثِمَارُنَا وَتَعِيشُ بِهَا مَوَاشِينَا ، وَتَنْدَى بِهَا أَقَاصِينَا وَتَسْتَعِينُ بِهَا ضَوَاحِينَا ، مِنْ بَرَكَاتِكَ الْوَاسِعَةِ ، وَعَطَايَاكَ الْجَزِيلَةِ ، عَلَى بَرِيَّتِكَ الْمُرْمِلَةِ وَوَحْشِكَ الْمُهْمَلَةِ . وَأَنْزِلْ عَلَيْنَا سَمَاءً مُخْضِلَةً مِدْرَاراً هَاطِلَةً ، يُدَافِعُ الْوَدْقُ مِنْهَا الْوَدْقَ ، وَيَحْفِزُ الْقَطْرُ مِنْهَا الْقَطْرَ ، غَيْرَ خُلَّب

baranê dibarînî û rehmeta xwe bilav dikî û tûyî xudanê me yê xudan medeh”.

(Li dûmahîka vê xutbê da Seyidê Rezî hinek kelîmên hişk û pir me’ne yên Imam ‘Elî me’ne kirine, lê çiko ew me’ne, me li tercumê da anî, êdî me anîna vî qismî lazim nezanî)

AXIFTINA 116

Ev axiftin ji hogirên xwe ra li Kûfayê kirîye (sala 38 h.)

Behsa Pêğember(s) : Ew rêkir ji bona gazî kirinê bo rêka heq û şahidî ya li ser xelkê. Vêca peyama Xwedayê xwe ragihand û di wê da ne sistî kir û ne jî kêmasî êxistê. Di rêka Xwedê da digel dijminên Xwedê ket cihadê, bêy wê çendê ku sistî yê bikê an ‘ozr û bihana ji xwere bênê. Ew Imamê ehlê teqwayê û çavê hidayet bûyî ya ye.

… Şîret kirina hevalan: Eger ji wê veşartî ya li ber hewe hatî pêçan wek çawa ez zanim hewe bizanîya, hingê hûnê li çûlan biketan û ji ber karên xwe bigirîyan û hewe wê wek wan jinên li şînê (‘eza) da li ser û rûyê xwe bida û malê xwe bêy nûbedar û bêy çavdêr terk bida û hûnê biçûna; wê her kes biketa fikra xwe û jixwel kesî nedima. Lê hewe hemî ew şîretên hatîn kirin ji bîra xwe birin û xwe li beraberê wê ya

بَرْقُهَا وَلاَ جَهَام عَارِضُهَا ، وَلاَ قَزَع رَبَابُهَا وَلاَ شَفَّان ذِهَابُهَا ، حَتَّى يُخْصِبَ لِإِمْرَاعِهَا الْمُجْدِبُونَ وَيَحْيَا بِبَرَكَتِهَا الْمُسْنِتُونَ فَإِنَّكَ تُنْزِلُ الْغَيْثَ مِنْ بَعْدِ مَا قَنَطُوا ، وَتَنْشُرُ رَحْمَتَكَ وَأَنْتَ الْوَلِيُّ الْحَمِيدُ .

تفسير ما في هذه الخطبة من الغريب : قوله: (انْصَاحَتْ جِبَالُنَا) أي: تَشَقَّقَتْ مِنَ المُحُول، يُقَالُ: انْصَاحَ الثَّوْبُ: إِذَا انْشَقّ، وَيُقَالُ أَيْضاً: انْصَاحَ النَّبْتُ وَصَاح وَصَوَّح: إِذَا جَفَّ وَيَبِس. وَقَوْلُهُ: (وَهَامَتْ دَوَابُنَا) أَيْ: عَطِشَتْ، وَالْهُيَام: الْعَطَش. وَقَوْلُهُ: (حَدَابِيرُ السِّنِينَ) جمع حِدبار، وهي: الناقة التي أنضاها السَّيْرُ، فشبّه بها السنة التي فشا فِيهَا الجَدْبُ، قَالَ ذوالرّمّة: حَدَابِيرُ مَا تَنْفَكُّ إِلاَّ مُنَاخَةً عَلَى الْخَسْفِ أَوْ نَرْمِي بِهَا بَلَداً قَفْرَا وَقَوْلُهُ: (وَلاَ قَزَع رَبَابُهَا)، الْقَزَعُ: الْقِطَعُ الصِّغَارُ الْمُتَفَرِّقَةُ مِنَ السَّحَابِ. وَقَوْلُهُ: (وَلاَ شَفَّان ذِهَابُهَا) فَإِنْ تَقْدِيرَهُ: وَلاَ ذَاتَ شَفَّان ذِهَابُهَا. وَالشَّفَّانُ: الرِّيحُ البَارِدَةُ. وَالذِّهَابُ: الامْطَارُ اللَّيِّنَةُ، فَحَذَفَ (ذَاتَ) لِعِلْمِ السَّامِعِ بِهِ.

[116]

ومن خطبة له(عليه السلام)

أَرْسَلَهُ دَاعِياً إِلَى الْحَقِّ، وَشَاهِداً عَلَى الْخَلْقِ، فَبَلَّغَ رِسَالاَتِ رَبِّهِ غَيْرَ وَانٍ وَلاَ مُقَصِّرٍ وَجَاهَدَ فِي اللهِ أَعْدَاءَهُ غَيْرَ وَاهِنٍ

hûn jê hatîn tirsandin di êmnahî yê da dît, vêca bîr û hizra hewe şaş û ‘emel û karê hewe perîşan bî.

Ez sond dixum, min dixwesta Xwedê cidahî yê bêxê navbeyna min û hewe; û min bighênê wan kesan ewên ji hewe pitir ser minvene; sond bi Xwedê ew, komek xweş fikr, pir nerm, heq go û dûrketî yê ji zulmê bûn; di rêka rast de diçûna û ji rêka ronahî venedibûn, vêca gihan wê cihana her bimînê û ni’metên Xwedê bi destve anîn.

Agah bin! Wellahî, wê xortkî qebîla “Seqîf” li ser hewe zal (musellet) bibê, ewê dawa wî bi ’erdêve dixişikê (qode) ku berê xwe (ji heqî yê) zivirandî ye, wê wek heywanê şînkatî yê dixwê heyî ya hewe bixwê û bezê hewe bihelênê. Dê zûr a xwe zêde bike (*an:* bes e) ey Ebû Wezehe.[38]

***Seyidê Rezî** dibêjê: Mexsed ji “Ebû Wezehe” yê, kêzka gugerênî ye, ev işareye bal hatina Heccac ve, Heccac digel “Wezehe” yê çêrokek heye ku vêderê ne cihê gotina wê ye.*

AXIFTINA 117

Vêca hewe ne malek daye ji bona wî yê ew mal dayî, û ne jî rih û can ji bona wî yê ew xulqandî êxistîye xeterê, hûn ji ber xatirê Xwedê li nav ‘evdên wî da bi qedr û qîmet ketine, lê belê li nav ‘evdên Xwedê da hûn qîmet nadin wî. Vêca ji wa cihên mirovên pêşîya hewe da çûyîn têda (gor) û ji cida bûna xwe ji

وَلاَ مُعَذِّر، إِمَامُ مَنِ اتَّقَى، وَبَصَرُ مَنِ اهْتَدَى.

[ينصح أصحابه]: وَلَوْ تَعْلَمُونَ مَا أَعْلَمُ مِمَّا طُوِيَ عَنْكُمْ غَيْبُهُ، إِذاً لَخَرَجْتُمْ إِلَى الصُّعُدَاتِ، تَبْكُونَ عَلَى أَعْمَالِكُمْ، وَتَلْتَدِمُونَ عَلَى أَنْفُسِكُمْ،وَلَتَرَكْتُمْ أَمْوَالَكُمْ لاَ حَارِسَ لهَا وَلاَ خَالِفَ عَلَيْهَا، وَلَهَمَّتْ كُلَّ امْرِىء مِنْكُمْ نَفْسُهُ، لاَ يَلْتَفِتُ إِلَى غَيْرِهَا; وَلَكِنَّكُمْ نَسِيتُمْ مَا ذُكِّرْتُمْ، وَأَمِنْتُمْ مَا حُذِّرْتُمْ، فَتَاهَ عَنْكُمْ رَأْيُكُمْ، وَتَشَتَّتَ عَلَيْكُمْ أَمْرُكُمْ.

وَلَوَدِدْتُ أَنَّ اللهَ فَرَّقَ بَيْنِي وَبَيْنَكُمْ، وَأَلْحَقَنِي بِمَنْ هُوَ أَحَقُّ بِي مِنْكُمْ، قَوْمٌ واللهِ مَيَامِينُ الرَّأْيِ، مَرَاجِيحُ الْحِلْمِ، مَقَاوِيلُ بِالْحَقِّ، مَتَارِيكُ لِلْبَغْيِ. مَضَوْا قُدُماً عَلَى الطَّرِيقَةِ وَأَوْجَفُوا عَلَى الْمَحَجَّةِ، فَظَفِرُوا بَالْعُقْبَى الدَّائِمَةِ وَالْكَرَامَةِ الْبَارِدَةِ. أَمَا وَاللهِ، لَيُسَلَّطَنَّ عَلَيْكُمْ غُلاَمُ ثَقِيف الذَّيَّالُ الْمَيَّالُ، يَأْكُلُ خَضِرَتَكُمْ، وَيُذِيبُ شَحْمَتَكُمْ، إِيه

nêzîktirîn dost û biraderan ‘ibret bigrin û şîret wergirin.

AXIFTINA 118

Pişti **Cemel**ê derheq hogirên xwe yên qenc da axiftîye (36 h.)

Hûn in, arîkarê li ser heqîyê û biraderên dînî û mertalên (siper) parêzer li rojên şer û tengavî yê da, hûn in şervanên min, ne yên dî; ez bi (arîkarîya) hewe li wa yên pişt dayî, didim û bi hewe ez berhêvîyê gohdana berdera (ewên berê xwe dayîn) me. Nixwe pê şîretek (xêr xwazî) xalis û bêy hîle û bêy şik û şubhe arîkarî ya min bikin.

Vêca ez sond dixûm bi Xwedê, ku ez nisbet bi xelkê, ji wan ewlatir im.

AXIFTINA 119

Ewî (s) xelk kom kir bû û hazirîya wan ji cihadê ra çêdikira, xelk jî bê deng bûn, vêca kerem kir: Çi bûye ji hewe, ma, hûn lal in? Komek ji wan gotin: Ey mîrê bawerdaran! Eger tu rê bikevî, emê jî digel te bikevin rê. Vêca hingê bû ku wiha got:

Çi ji hewe hatîye? Hûn neketine ser rêka pêşketinê û ne jî rêka durist (bi

أَبَا وَذَحَةَ!

قال السيّد: الْوَذَحَةُ: الخُنْفُسَاءُ. وهـذا القول يومىءُ به إلى الحجـاج، ولـه مـع الوذحة حديث ليس هذا موضع ذكره.

[**117**]

[يوبخ البخلاء بالمال والنفس]

فَـلاَ أَمْوَالَ بَذَلْتموهَا لِلَّـذِي رَزَقَهَا، وَلاَ أَنْفُسَ خَـاطَرْتُمْ بِهَـا لِلَّذِي خَلَقَهَا، تَكْرُمُونَ بِالله عَلَـى عِبَـادِهِ، وَلاَ تُكْرِمُـونَ الله فِـي عِبَادِهِ! فَاعْتَبِرُوا بِنُزُولِكُمْ مَنَـازِلَ مَنْ كَانَ قَبْلَكُمْ، وَانْقِطَاعِكُمْ عَنْ أَصْلِ إِخْوَانِكُمْ!

[**118**]

[في الصالحين من أصحابه]

أَنْتُمُ الأَنْصَارُ عَلَى الْحَقِّ وَ الإِخْوَانُ في الدِّينِ، وَالْجُنَنُ يَوْمَ الْبَأْسِ، وَالْبِطَانَةُ دُونَ النَّاسِ، بِكُمْ أَضْرِبُ الْمُدْبِرَ، وَأَرْجُو طَاعَةَ الْمُقْبِلِ فَأَعِينُوني بِمُنَاصَحَةٍ خَلِيَّةٍ مِنَ الْغِشِّ سَلِيمَةٍ مِنَ

‘edalet). Gelo durist e ku ez li wextek wiha de bikevim rê? Resm ew e ku yêk ji mêrbaş û şervanên hewe ku ez pê razîbim (ji şer ra) derkevê; ne layiq e ku ez leşker û bajar û beytulmalê û komkirina xeracê û ĥukum dana li nav muslimana da û nêrîn û berçav girtina heq huqûqê şikayetker û heqxwazan berdim û digel komekî ji leşker derkevim û bikevim pey komek dî ji leşker û hirve wêve biçim, wek tîra bê serî li sindûqê da. Ez şûna darê li nav ber’aş da me ku li cihê xwe da sabit e û naqeliqê û ber’aş li dûrê dizivirê û eger ji cî yê xwe hilbê (rabê) wê ew bilerizê û yê binî wê ji cî biçê. Sond bi Xwedê ku evahe bîr û hizirek xirab e û nedurist. Sond bi Xwedê, eger ez ne berhêvî yê rojekî bûma ku li wextê rûbirû bûna digel dijmin ez şehîd bibim -Xwedê bikê ew şehadet ji min re teqdîr bibê- minê merkeba xwe banîya pêş û ezê lê suwar bibîyam û ji nav hewe derketam û, heta ku bayê başûr û bakûrê (cinûb û şimal) bihata êdî ez naketam bîra hewe da û min hûn naxwestan; hûn mirovên pîjik têraker û ‘eyb û kêmasî çêker în û pir ji heqî yê dûr û hîlebaz în.

الأَحَـدُ لاَ بِتَأْوِيـلِ عَـدَد، وَالْخَـالِقُ لاَ بِمَعْنَـى حَرَكَـة وَنَصَـب، وَالسَّـمِيعُ لاَ بِـأَدَاة، وَالْبَصِيرُ لاَ بِتَفْرِيقِ آلَة، وَالشَّاهِدُ لاَبِمُمَاسَّـه، وَالْبَـائِنُ لاَبِتَرَاخِـي مَسَـافَة، وَالظَّـاهِرُ لاَبِرُؤْيَـة،

tiştek neyî.

…Beĥsa pêşkarên dînî: Roj derket û leylanderekî leylan da û eşkere bûyek eşkere bû û ewa xwehr bûyî rast bo, Xwedê komek digel komekî û rojek bi roja dî goherand. Wek çawa xela dîtî hêvîya baranê, em jî wereng hêvîya vî zemanî bûn.

Imam, danerên Xwedêne li ser mexlûqê wî û ji ber wîve karûbarê bendeyên wî rêve dibin. Naçê bihiştê xêncî wî yê ew nas kirîn û ewan jî ew nas kirîn û naçê cehnemê xêncî wî yê inkara wan kirî û ewan jî inkara wî kirîn.

Xwedê Te'ala Islam kir behra hewe û hûn ji wê ra xalis kirîn, çiko islam nîşaneke ji selametî yê û berhevboyeke ji tiştên berketî û hêjayî. Xwedayê Te'ala rêk û rêçika Islamê bijart û delîlên wê ronahî kirin pê 'ilmê eşkere û şehrezayî ya veşartî. 'Ecêbên wê xilas nabin û ji nav naçin, baranên pir ni'metên biharî û çirayên laberên tarîtî yan di wê da ye. Derîyên xezînên qencî û xêran xêncî bi kilîda wê nayê vekirin; û tarîtî xêncî pê pêta çirayên wî ronahî nabê. Sînorên wê xudankirîye û ew bi xwe çêrîngehên wê diparêzê. Heçî şifayê bixwazê şifayê didîyê û kesê bixwazê ihtîyacî ya xwe rakê ew ji wî

وَالْبَـاطِنُ لاَ بِلَطَافَـةٍ. بَـانَ مِـنَ الأَشْـيَاءِ بَـالْقَهْرِ لَهَـا، وَالْقُـدْرَةِ عَلَيْهَـا، وَبَانَـتِ الأَشْـيَاءُ مِنْـهُ بَالْخُضُوعِ لَهُ، وَالرُّجُوعِ إِلَيْهِ. مَنْ وَصَفَهُ فَقَدْ حَدَّهُ، وَمَنْ حَدَّهُ فَقَدْ عَدَّهُ، وَمَنْ عَدَّهُ فَقَدْ أَبْطَلَ أَزَلَـهُ، وَمَنْ قَالَ: كَيْفَ، فَقَدِ اسْتَوْصَفَهُ، وَمَنْ قَالَ: أَيْنَ، فَقَدْ حَيَّزَهُ. عَـالِمٌ إِذْ لاَ مَعْلُومٌ وَرَبٌّ إِذْ لاَ مَرْبُوبٌ، وَقَادِرٌ إِذْ لاَ مَقْدُورٌ.

منها في أئمّة الدين: فَقَدْ طَلَـعَ طَالِعٌ، وَلَمَـعَ لاَ مِـعٌ، وَلاَحَ لاَئِـحٌ، وَاعْتَدَلَ مَائِلٌ، وَاسْـتَبْدَلَ اللهُ بِقَـوْمٍ قَوْماً، وَبِيَوم يَوْماً، وَانْتَظَرْنَـا الْغِيَـرَ انْتِظَارَ الْـمُجْدِبِ الْمَطَرَ.

وَإِنَّمَا الاَئِمَّـةُ قُـوَّامُ اللهِ عَلَـى خَلْقِهِ، وَعُرَفَـاؤُهُ عَلَـى عِبَـادِهِ، لاَ يَـدْخُلُ الْجَنَّـةَ إِلاَّ مَـنْ عَـرَفَهُمْ وَعَرَفُوهُ، وَلاَ يَدْخُلُ النَّارَ إِلاَّ مَـنْ أَنْكَرَهُمْ وَأَنْكَرُوهُ.

إِنَّ اللهَ خَصَّـكُمْ بَالاْسْـلاَمِ و اسْتَخْلَصَكُمْ لَهُ، وَذَلِكَ لاِنَّهُ اسْمُ

ra bes e.

۞ AXIFTINA 153 ۞

Li Medînayê axiftîye (sala 36 h.)

Behsa li rê windabîyan: Xwedê muhlet dayê da di gel koma xafil û bê xeberan li pey hewayê nefsa xwe bê û digel gonehkaran bikê êvar, bêy wê hindê ku biniyeta amancekî li rêyekî biçê an Imamek pêşkarî yê jê re bikê.

…Xeflet: Heta ku cezayê bê emrî yên wan ji wan ra eşkere kir û ew ji nav perdên bê xeberî yê deranîn, hingê berê xwe dan ewê ya pişt dayînê (axret) û pişt dan wê ya berê wan lê, vêca ne ji wê ya ketîn pey feyde birin û ne jî wê ya ihtîyacî ya xwe birîn balê feyde da wan. Ez hewe û xwe ji vî haletî ditirsînim.

Dermanê Xefletê: Vêca her kes gereke ji karê xwe feydê bibê; ehlê besîretê ew e yê gohlê bibê vêca fikir bikê û binêrê vêca bibînê û ji ‘ibretan feydê bigirê, paşê li rêka ronahî da gava xwe bavêjê û hay ji xwe bimînê ku nekevê di kendala de û di nav kûrerêkan da winda nebê; û jrêdera li beraberê xwede ranekê (neşarênê) pê: Dijwariya zêde li ser heqîyekî an gohorîna axiftinekî an tirsandina ji

سَلاَمَة، وَجِمَاعُ كَرَامَة، اصْطَفَى اللهُ تَعَالَى مَنْهَجَهُ، وَبَيَّنَ حُجَجَهُ، مِنْ ظَاهِرِ عِلْم، وَبَاطِنِ حِكَم، لاَ تَفْنَى غَرَائِبُهُ، وَلاَ تَنْقَضِي عَجَائِبُهُ، فِيهِ مَرَابِيعُ النِّعَمِ، وَمَصَابِيحُ الظُّلَمِ، لاَ تُفْتَحُ الْخَيْرَاتُ إِلاَّ بِمَفَاتِحِهِ، وَلاَ تُكْشَفُ الظُّلُمَاتُ إِلاَّ بِمَصَابِحِهِ، قَدْ أَحْمَى حِمَاهُ، وَأَرْعَى مَرْعَاهُ، فِيهِ شِفَاءُ الْمُسْتَشْفِي، وَكِفَايَةُ الْمُكْتَفِي.

[153]

ومن خطبه له عليه السلام

صفة الضال: وَهُوَ فِي مُهْلَة مِنَ اللهِ يَهْوِي مَعَ الْغَافِلِينَ، وَيَغْدُومَعَ الْمُذْنِبِينَ، بِلاَ سَبِيل قَاصِد، وَلاَ إِمَام قَائِد.

منها في صفات الغافلين: حَتَّى إِذَا كَشَفَ لَهُمْ عَنْ جَزَاء مَعْصِيَتِهِمْ، وَاسْتَخْرَجَهُمْ مِنْ جَلاَبِيبِ غَفْلَتِهِمْ، اسْتَقْبَلُوا مُدْبِراً، وَاسْتَدْبَرُوا مُقْبِلاً، فَلَمْ يَنْتَفِعُوا بِمَا

doristiyeki.

We'z û şîret : Vêca ey gohder! Ji serxweşî ya xwe derkeve û ji bê xeberî ya xwe hişîyar bibe û ji lezî ya xwe kêm bike û baş hizir bike di wê ya ji devê Pêğemberê ummî selewat ser wî û alê wî bin gihayî te; ewa ku çi çare xêncî wê nîne û revîna ji wê ne mumkine. Xwe dûr bike ji wî kesê digel axiftina Pêğember (s) muxalifet dikê û gohê xwe didê axiftina yên dî; desta ji wî û wê ya ew ji xwe re pê razî, bikêşe. Fexr û xwe mezin kirinê berde û tekebborê ji xwe bavêje û qebra xwe bîne bîra xwe, çiko bi rastî wêderê cihê derbaz bûna te ye; te çi kirbê tu dê wê bibînî û te çi çandibê tu dê wê hilînî û bidrûy, heçî ya îro tu pêş xwe da rêkî wê sibehî ewê deynin ber te; cihê pîyê xwe qayîm bike û ji wê rojê ra qût û rizqekî rêke.

Vêca ey gohdêr! Hay ji xwe hebe, hay ji xwe hebe û ey bê xeber, xebat û xebat! Kes wek Xweda te pê nahesênê.

Yêk ji hukmên Xwedê li Qur'ana hekîm da ku pêk anîna wê xêr pêve tê û terk dana wê dibê sebebê cezadanê û ji ber wê Xwedê razî dibê û tê xezebê, ev e ku bende feydê nabê herçend xwe li 'ibadet da reht bikê û li karan da niyeta xwe xalis bikê, eger ku ji dinyayê

أَدْرَكُوا منْ طَلِبَتِهِمْ، وَلاَ بِمَا قَضَوْا مِنْ وَطَرِهِمْ.

إِنِّي أُحَذِّرُكُمْ، وَنَفْسِي، هـذِهِ الْمَنْزِلَةَ، فَلْيَنْتَفِعِ امْرُؤٌ بِنَفْسِهِ، فَإِنَّمَا الْبَصِيرُ مَنْ سَـمِعَ فَتَفَكَّـرَ، وَنَظَـرَ فَأَبْصَرَ، وَانْتَفَعَ بِالْعِبَرِ، ثُـمَّ سَـلَكَ جَدَداً وَاضِحاً يَتَجَنَّبُ فِيهِ الصَّرْعَةَ فِـي الْمَهَـاوِي، وَالضَّـلاَلَ فـي الْمَغَاوِي، وَلاَ يُعِـينُ عَلَـى نَفْسِـهِ الْغُـوَاةَ بِتَعَسُّـف فِـي حَـقٍّ، أَوْ تَحْرِيف في نُطْق، أَوْ تَخَوُّف مِـنْ صِدْق.

عظة الناس: فَأَفِقْ أَيُّهَا السَّامِعُ مِـنْ سَـكْرَتِكَ، وَاسْـتَيْقِظْ مَـنْ غَفْلَتِكَ، وَاخْتَصِرْ مِـنْ عَجَلَتِـكَ، وَأَنْعِمِ الْفِكْرَ فِيمَـا جَـاءَكَ عَلَـى لِسَانِ النَّبِيِّ الأُمِّيِّ صـلى الله عليـه وآلـه مِمَّا لاَ بُدَّ مِنْهُ وَلاَ مَحِـيصَ عَنْـهُ، وَخَالِفْ مَنْ خَـالَفَ ذلِـكَ إِلَـى غَيْرِهِ، وَدَعْهُ وَمَـا رَضِـيَ لِنَفْسِـهِ، وَضَعْ فَخْـرَكَ، وَاحْطُـطْ كِبْـرَكَ، وَاذكُرْ قَبْرَكَ، فَإِنَّ عَلَيْـهِ مَمَـرَّكَ، وَكَمَا تَدِينُ تُـدَانُ، وَكَمَـا تَـزْرَعُ

derkevê û bikevê li beraberê Xwedayê xwe da û li wî halî da yêk ji van gonehan li ser wî hebê û tewbe nekiribê (ew jî ev in):

Li ‘ibadetekî da ku Xwedê li ser wî ferz kirî şirîka ji Xwedê ra çêkê, an xezeba xwe pê kuştina yêk dî bitefênê; an karê pîs ku kesek dî kirî ye bênê ser ziman; an ihtîyacîya xwe pê çêkirina bid’etekî li dîn da pêk bênê; an durû bê digel xelkê; an dû ziman bê digel wan. Li vê ya min gotî da fikir bike, ku her yêkî ji van nimûnên zehfî hene.

Heçî heywanin xema wan zikê wa ye; hem û xema dirindan jî hêriş birin û zêdegavî ya li ser yên dî ye; xema jina jî xemla dinyayê û têkdana wê ye; mu’min jî şikestî ne; mu’min dilovanin; mu’min ji Xudatirs in.

AXIFTINA 154

Hinek ji nivîseran gotine ev xutbe li medînayê hatîye xwendin.

‘Eqilmend pê çavê dil, berê xwe didê dûmahîka karê xwe û bi nizmî û bilindî ya wê dihêshê. Gazîkerekî -Pêğember- gazî kir û pêşkarekî kar bi dest xwe girt,

تَحْصُدُ، وَمَا قَدَّمْتَ الْيَوْمَ تَقْدَمُ عَلَيْهِ غَداً، فَامْهَدْ لِقَدَمِكَ، وَقَدِّمْ لِيَوْمِكَ.

فَالْحَذَرَ الْحَذَرَ أَيُّهَا الْمُسْتَمِعُ! وَالْجِدَّ الْجِدَّ أَيُّهَا الْغَافِلُ! (وَلاَ يُنَبِّئُكَ مِثْلُ خَبِير).

إِنَّ مِنْ عَزَائِمِ اللهِ فِي الذِّكْرِ الْحَكِيمِ، الَّتِي عَلَيْهَا يُثِيبُ وَيُعَاقِبُ، وَلَهَا يَرْضَى وَيَسْخَطُ، أَنَّهُ لاَ يَنْفَعُ عَبْداً ـ وَإِنْ أَجْهَدَ نَفْسَهُ، وَأَخْلَصَ فِعْلَهُ ـ أَنْ يَخْرُجَ مِنَ الدُّنْيَا، لاَقِياً رَبَّهُ بِخَصْلَةٍ مِنْ هذِهِ الْخِصَالِ لَمْ يَتُبْ مِنْهَا:

أَنْ يُشْرِكَ بِاللهِ فِيمَا افْتَرَضَ عَلَيْهِ مِنْ عِبَادَتِهِ، أَوْ يَشْفِيَ غَيْظَهُ بِهَلاَكِ نَفْسِهِ، أَوْ يُقِرَّ بِأَمْرٍ فَعَلَهُ غَيْرُهُ، أَوْ يَسْتَنْجِحَ حَاجَةً إِلَى النَّاسِ بِإِظْهَارِ بِدْعَةٍ فِي دِينِهِ، أَوْ يَلْقَى النَّاسَ بِوَجْهَيْنِ، أَوْ يَمْشِيَ فِيهِمْ بِلِسَانَيْنِ. اعْقِلْ ذلِكَ فَإِنَّ الْمِثْلَ دَلِيلٌ عَلَى شِبْهِهِ.

إِنَّ الْبَهَائِمَ هَمُّهَا بُطُونُهَا، وَإِنَّ السِّبَاعَ هَمُّهَا الْعُدْوَانُ عَلَى غَيْرِهَا،

vêca nixwe cewaba gazîker bidin û bikevin pey pêşkar.

Di nav beĥrên fitna da nûqî bûn û bid'e girtin, ne sunnet. Bawerdaran xwe êxistin di malan da û li rê winda boyên derewker des axiftinê kirin.

Emîn cilkên binve (yên nubuwwetê) emîn eshab û xeznedar û dergeh (ji Pêğember ra) û çûna di mala da xêncî li dergehan ra çênabê, vêca kesê ne li dergehan ra biçê malan da, dibêjin wan, diz.

...Ayetên berketî yên Qur'anê derheq wan da ne û ew xeznên Xwedayê rehmanin, eger biaxivin rast dibêjin û eger bê deng bibin pêşî ji wan nayê standin (li neaxiftinê de).

Vêca pêşkar lazime digel xelkê xwe rast û durist bê û hişê xwe bênê serê xwe û lazime (pêşkar) ji ewlad û ehlê axretê bê, çiko bi rastî ji wêderê hatîye û wê bi wêderêve bê birin.

Vêca ewê ku pê çavê dil dinêrê û pê besîretê kar dikê, li despêkê da lazime bizanê kanê ya ew dikê feyda wî têda ye an zerera wî? Da vêca eger feyda wî têda hebû dewamê bidîyê û eger bi zerera wî bê desta jê bikêşê, çiko ew kesê bêy zanîn dest bavêjê karekî wek wî ye ewê ne li ser rêkê diçê, vêca çiqa pitir ji rêka ronahî dûr bikevê ji mexsedê dûrtir dibê. Û ewê bi zanîn des

وَإِنَّ النِّسَاءَ هَمُّهُنَّ زِينَةُ الْحَيَاةِ الدُّنْيَا وَالْفَسَادُ فِيهَا; إِنَّ الْمُؤْمِنِينَ مُسْتَكِينُونَ، إِنَّ الْمُؤْمِنِينَ مُشْفِقُونَ، إِنَّ الْمُؤْمِنِينَ خَائِفُونَ.

[**154**]

يذكر فيها فضائل أهل البيت عليهم السلام

وَنَاظِرُ قَلْبِ اللَّبِيبِ بِهِ يُبْصِرُ أَمَدَهُ، وَيَعْرِفُ غَوْرَهُ وَنَجْدَهُ. دَاعٍ دَعَا، وَرَاعٍ رَعَى، فَاسْتَجِيبُوا لِلدَّاعِي، وَاتَّبِعُوا الرَّاعِيَ.

قَدْ خَاضُوا بِحَارَ الْفِتَنِ، وَأَخَذُوا بِالْبِدَعِ دُونَ السُّنَنِ، وَأَرَزَ الْمُؤْمِنُونَ، وَنَطَقَ الضَّالُّونَ الْمُكَذِّبُونَ.

نَحْنُ الشِّعَارُ وَالأَصْحَابُ، وَالْخَزَنَةُ وَالأَبْوَابُ، [وَلاَ] تُؤْتَى الْبُيُوتُ إِلاَّ مِنْ أَبْوَابِهَا، فَمَنْ أَتَاهَا مِنْ غَيْرِ أَبْوَابِهَا سُمِّيَ سَارِقاً.

منها: فِيهِمْ كَرَائِمُ الْقُرْآنِ، وَهُمْ كُنُوزُ الرَّحْمنِ، إِنْ نَطَقُوا صَدَقُوا، وَإِنْ صَمَتُوا لَمْ يُسْبَقُوا.

bavêjê karekî wek wî ye ewê li ser rêka ronahî û eşkere diçê, vêca bila mirov binêrê kanê gelo pêşve diçê an paş ve?.

Evê bizane ku: Her zahirekî (eşkere) batinek (navdeyîyek) wek wê jê re heye, ewa eşkere yê wê pak û temîz bê navdeyê wê jî pak û temîze û ewa eşkere yê wê pîs bê navdeyê wê jî pîse. Pêğemberê rastgû selewat ser wî û alê wî gotîye: "Çêdibê ku Xwedê carna hej bende ('ebd) bikê û ji karê wî nexweş bê; carna jî hej 'emelê wî bikê û ji bedena wî nexweş bê".

Evê jî bizane ku: Her 'emelekî şînkatîyek heye, û çi şînkatî nînin ku ihtîyacî bi avê nebin. Av jî newek yêkin, vêca ewa avdana wê baş bê çandinahî û li xwe dana wî jî baş dibê û fêkî yê wê şîrîn dibê û ewa avdana wê pîs û nebaş bê şînkatî ya wê jî pîs û nebaş dibê û fêkî yê wê tehl dibê.

فَلْيَصْدُقْ رَائِدٌ أَهْلَهُ، وَلْيُحْضِرْ عَقْلَهُ، وَلْيَكُنْ مِنْ أَبْنَاءِ الْآخِرَةِ، فَإِنَّهُ مِنْهَا قَدِمَ، وَإِلَيْهَا يَنْقَلِبُ.

وَالنَّاظِرُ بِالْقَلْبِ، الْعَامِلُ بِالْبَصَرِ، يَكُونُ مُبْتَدَأُ عَمَلِهِ أَنْ يَعْلَمَ: أَعَمَلُهُ عَلَيْهِ أَمْ لَهُ؟! فَإِنْ كَانَ لَهُ مَضَى فِيهِ، وَإِنْ كَانَ عَلَيْهِ وَقَفَ عِنْدَهُ. فَإِنَّ الْعَامِلَ بِغَيْرِ عِلْمٍ كَالسَّائِرِ عَلَى غَيْرِ طَرِيقٍ، فَلاَ يَزِيدُهُ بُعْدُهُ عَنِ الطَّرِيقِ الْوَاضِحِ إِلاَّ بُعْداً مِنْ حَاجَتِهِ، وَالْعَامِلُ بِالْعِلْمِ كَالسَّائِرِ عَلَى الطَّرِيقِ الْوَاضِحِ، فَلْيَنْظُرْ نَاظِرٌ: أَسَائِرٌ هُوَ أَمْ رَاجِعٌ؟!

وَاعْلَمْ أَنَّ لِكُلِّ ظَاهِرٍ بَاطِناً عَلَى مِثَالِهِ، فَمَا طَابَ ظَاهِرُهُ طَابَ بَاطِنُهُ، وَمَا خَبُثَ ظَاهِرُهُ خَبُثَ بَاطِنُهُ، وَقَدْ قَالَ الرَّسُولُ الصَّادِقُ صلى الله عليه وآله: «إِنَّ اللهَ يُحِبُّ الْعَبْدَ وَيُبْغِضُ عَمَلَهُ، وَيُحِبُّ الْعَمَلَ وَيُبْغِضُ بَدَنَهُ».

فَاعْلَمْ أَنَّ كُلَّ عَمَلٍ نَبَاتٌ، وَكُلَّ نَبَاتٍ لاَ غِنَى بِهِ عَنِ الْمَاءِ، وَالْمِيَاهُ مُخْتَلِفَةٌ، فَمَا طَابَ سَقْيُهُ

۞ AXIFTINA 155 ۞

Behsa afirandin û xulqandina 'ecêb a şevperê (şevşevuk-çilêçilê) dikê.

Ĥemd ji Xwedê ra, ewê çi wesf nikarin bighên heqîqeta nas kirina wî û 'ezemeta wî 'eql paşve zivirandine; vêca ji bona gihana xilaseka melekûta wî rêkek peyda nekirin.

Ewe Xwedayê heqê eşkere. Eşkeretir ji hemî wa tiştên çav dikarin bibînin. ‘Eql nikarin hed û sînorekî jê re deynin da vêca himber û şebîhek jê re hebê û wehm û xîyal nikarin ewî dixwe da bigrin da vêca tiştek wek wî xîyal bikin. Mexlûq afirand, bê nimûne û bê meşweret kirina digel kesekî û bê arîkarî ya arîkarekî. Vêca afirandina wî bi emrê wî xilas bî û ferman jê bir û cewab da û paşve neda û teslîm bû û neket cirrekêşê.

Afirandina Şevperê: Ji sen’etê wî yê hûr û ji afirandina wî ya ‘ecêb, ew e ku em li afirandina bi hustahî û şarezayî ya li xulqandina şevperê da dibînin; ku ronahî ya rojê hemî tiştî têxê (bizav û) hereketê lê; şevpereyan ji bizavê didê sekinandin û tarîtîya şevê ewê têxê hereketê, halhale candarên dî ji bizav û hereketê têxê; çawa çavên wê ewqas ze’êfe ku nikarê ji roja ronahî arîkarîyê bigirê û li ber ronahî ya wê rêka xwe bibînê û bigihê wî cihê ku divê biçî yê! Çawa ew nikarê biçê wî cihê tava rojê didîyê û li xefgehên tarî da dimînê! Û bê ihtîyace ji firîna li ber tava rojê! Şevpere, li rojê da plkên xwe li ser çavên xwe da digrê û dema şev tê,

طَابَ غَرْسُهُ وَحَلَتْ ثَمَرَتُهُ، وَمَا خَبُثَ سَقْيُهُ خَبُثَ غَرْسُهُ وَأَمَرَّتْ ثَمَرَتُهُ.

[**155**]

يذكر فيها بديع خلقة الخفاش

الْحَمْدُ لله الَّذِي انْحَسَرَتِ الاَوْصَافُ عَنْ كُنْهِ مَعْرِفَتِهِ، وَرَدَعَتْ عَظَمَتُهُ الْعُقُولَ، فَلَمْ تَجِدْ مَسَاغاً إِلَى بُلُوغِ غَايَةِ مَلَكُوتِهِ!

هَوَ اللهُ الْحَقُّ الْمُبِينُ، أَحَقُّ وَأَبْيَنُ مِمَّا تَرَى الْعُيُونُ، لَمْ تَبْلُغْهُ الْعُقُولُ بِتَحْدِيد فَيَكُونَ مُشَبَّهاً، وَلَمْ تَقَعْ عَلَيْهِ الأَوْهَامُ بِتَقْدِير فَيَكُونَ مُمَثَّلاً. خَلَقَ الْخَلْقَ عَلَى غَيْرِ تَمْثِيل، وَلاَ مَشُورَةِ مُشِير، وَلاَ مَعُونَةِ مُعِين، فَتَمَّ خَلْقُهُ بِأَمْرِهِ، وَأَذْعَنَ لِطَاعَتِهِ، فَأَجَابَ وَلَمْ يُدَافِعْ، وَانْقَادَ وَلَمْ يُنَازِعْ.

خلقة الخفاش: وَمِنْ لَطَائِفِ صَنْعَتِهِ، وَعَجَائِبِ خِلْقَتِهِ، مَا أَرَانَا مِنْ غَوَامِضِ الْحِكْمَةِ فِي هذِهِ الْخَفَافِيشِ الَّتِي يَقْبِضُهَا الضِّيَاءُ

tarîtî ewê wek çirayekî ji bona peyda kirina rizqê wê têxê kar; tarîtî pêşîya dîtina wê nagirê û ewê ji firînê li nav tarîtî yê da paşve nadê; dema roj perdê ji ser xwe hilênê û spîtahî ya rojê (sipêde) xuya bikê û derkevê û cihê tengê sûsmaran ronahî bikê, carek dî dîsa çavê xwe datînê serhev û bi heçî ya li tarîtî ya şevê da dayî hev bes dikê. Pak û munezzeh e Xwedayê ku şev kir roja wê da ku ji bona peyda kirina rizqê xwe bikevê bizav û hereketê û roj kir demê rihetî û sekinîna wê; û per danê ku ji goşt in, da li demê ihtîyac û nîyazê da pê wan bifirê; perên wek nermikê goh ku ne pirtik pêve heye û ne jî hestî têda ye, lê belê tu cihê reyan li nav wan da bibaşî dibînî; şevperê dû per hene ku ne ewqas tenik in (nazik -zirav) ku biçirihên û ne jî ewqas stûrin ku giranî yê çêkin. Difirê, li halekî da ku zarûka wê pêve ye, tu dibêjî qey penah jê re birîye, dema dayk rodinê ew jî rodinê û dema radibê ew jî radibê, ji zarûka xwe venabê heta endamên wê qewî bibin û perên wê bikarin ewê bifirînin û rêkên jîyanê û mesleheta xwe hîn bibin û bi'elimin.

الْبَاسِطُ لِكُلِّ شَيْءٍ، وَبَسْطُهَا الظَّلاَمُ الْقَابِضُ لِكُلِّ حَيٍّ، وَكَيْفَ عَشِيَتْ أَعْيُنُهَا عَنْ أَنْ تَسْتَمِدَّ مِنَ الشَّمْسِ الْمُضِيئَةِ نقُوراً تَهْتَدِي بِهِ فِي مَذَاهِبِهَا، وَتَتَّصِلُ بِعَلاَنِيَةِ بُرْهَانِ الشَّمْسِ إِلَى مَعَارِفِهَا. وَرَدَعَهَا بِتَلاَلُؤِ ضِيَائِهَا عَنِ الْمُضِيِّ فِي سُبُحَاتِ إِشْرَاقِهَا، وَأَكَنَّهَا فِي مَكَامِنِهَا عَنِ الذَّهَابِ فِي بُلَجِ ائْتِلاَقِهَا، فَهِيَ مُسْدَلَةُ الْجُفُونِ بِالنَّهَارِ عَلَى حِدَاقِهَا، وَجَاعِلَةُ اللَّيْلِ سِرَاجاً تَسْتَدِلُّ بِهِ فِي الْتِمَاسِ أَرْزَاقِهَا; فَلاَ يَرُدُّ أَبْصَارَهَا إِسْدَافُ ظُلْمَتِهِ وَلاَ تَمْتَنِعُ مِنَ الْمُضِيِّ فِيهِ لِغَسَقِ دُجُنَّتِهِ. فَإِذَا أَلْقَتِ الشَّمْسُ قِنَاعَهَا، وَبَدَتْ أَوْضَاحُ نَهَارِهَا، وَدَخَلَ مِنْ إِشْرَاقِ نُورِهَا عَلَى الضِّبَابِ فِي وِجَارِهَا أَطْبَقَتِ الأَجْفَانَ عَلَى مَآقِيهَا وَتَبَلَّغَتْ بِمَا اكْتَسَبَتْهُ مِنَ الْمَعَاشِ فِي ظُلَمِ لَيَالِيهَا. فَسُبْحَانَ مَنْ جَعَلَ اللَّيْلَ لَهَا نَهَاراً وَمَعَاشاً، وَجَعَلَ النَّهَارَ لَهَا سَكَناً وَقَرَاراً!

Vêca pak û munezzeh e Xaliqê hemî tiştî; ewê tişt xuliqandîn bêy hebûna nimûneyekî li pêşîyê da.

AXIFTINA 156

Ji ehlê Besrayê axiftîye. Behsa qewimînên dijwarên nehatî de ye:

Vêca hingê (wextê fitnê da) heçî kesê bikarê xwe bi ta'etê Xwedêve mijûl bikê bila ewê bikê. Bi hezkirina Xwedê, eger hûn gohdarê min bin, ezê hewe li rêka bihiştê da bibim herçend bi zehmet û dijwar û tehl bê.

Lê hindîke filankes e, hizra jinane pêra ye û kîn li singê wê da dikelê wek qazana hêsinkeran. Eger jê bixwestan ku ewa digel min kirî digel kesek dî bikê, qebûl nedikira. Li her halî da ew hurmeta wê ya ewil li ser cihê xwe ye û hesab hêvîya Xwedayê mezinve ye.

...Behsa îmanê: Ew rêkek zehf eşkere ye û çiraya wê pir ronahî. Vêca bi îmanê ye ku mirov dikarê bighê karên qenc û pê karên qence ku mirov bal îmanêve rê rast dibê. Bi îmanê zanîn avedan dibê û bi zanînê ji mirinê tê tirsandin û bi mirinê jîyana dinyayê dighê xilasekê û bi dinyayê axret destve tê û bi qîyametê bihişt nêzîk dibê (ji qencan ra) û cehnem geş dibê ji yên hatîn xapandin ra û çi cî nînin ku xelkê

وَجَعَلَ لَهَا أَجْنِحَةً مِنْ لَحْمِهَا تَعْرُجُ بِهَا عِنْدَ الْحَاجَةِ إِلَى الطَّيَرَانِ، كَأَنَّهَا شَظَايَا الأَذَانِ غَيْرَ ذَوَاتِ رِيش وَلاَ قَصَب إِلاَّ أَنَّكَ تَرَى مَوَاضِعَ الْعُرُوقِ بَيِّنَةً أَعْلاَماً لَهَا جَنَاحَانِ لَمَّا يَرِقَّا فَيَنْشَقَّا، وَلَمْ يَغْلُظَا فَيَثْقُلاَ. تَطِيرُ وَوَلَدُهَا لاَصِقٌ بِهَا لاَجِيٌ إِلَيْهَا، يَقَعُ إِذَا وَقَعَتْ، وَيَرْتَفِعُ إِذَا ارْتَفَعَتْ، لاَيُفَارِقُهَا حَتَّى تَشْتَدَّ أَرْكَانُهُ، وَيَحْمِلَهُ لِلنُّهُوضِ جَنَاحُهُ، وَيَعْرِفَ مَذَاهِبَ عَيْشِهِ، وَمَصَالِحَ نَفْسِهِ.

فَسُبْحَانَ الْبَارِىءِ لِكُلِّ شَيْءٍ، عَلَى غَيْرِ مِثَال خَلاَ مِنْ غَيْرِهِ!

[156]

خاطب به أهل البصرة على جهة اقتصاص الملاحم

فَمَنِ اسْتَطَاعَ عِنْدَ ذلِكَ أَنْ يَعْتَقِلَ نَفْسَهُ عَلَى الله، فَلْيَفْعَلْ، فَإِنْ أَطَعْتُمُوني فَإِنِّي حَامِلُكُمْ إِنْ شَاءَ اللهُ عَلَى سَبِيلِ الْجَنَّةِ، وَإِنْ كَانَ ذَا مَشَقَّة شَدِيدَة وَمَذَاقَة مَرِيرَة.

وَأَمَّا فُلاَنَةُ، فَأَدْرَكَهَا رَأْيُ النِّسَاءِ، وَضِغْنٌ غَلاَ فِي صَدْرِهَا

ji qîyametê paşve bidin; xelk li meydana jêbirkana qîyametê da (dinya) lez dikevin heta bighên mexseda axir.

***... Goristanî di qîyametê da*:** Ew wê ji goran (qebra) derkevin û bikevin rê bo gihana mexseda xwe ya axir, her avahîyekî (bihişt – cehnem) ehlê xwe hene ku ewê nagoherînin û jê nayên gohaztin.

Emrê bi qencî yê û nehya ji kirêtê (nebaşî yê) dû sifetên Xwedayê (pak û) subhanin, rastî ev e ku ew herdu ne mirinê nêzîk dikin û ne jî kêmasî yê têxin rizq (qût).

Muheqeq xwe bi kitêba Xwedê bigrin, çiko bi rastî ew werîsê qewî û ronahî ya eşkere ye; ew dermanê feydeder û têravkera têhnîşk bere; ragirê wî kesî ye ewê xwe pê bigirê û xilaskerê wî kesî ye ewê xwe bavêjî yê; xwehrî jê re nîne da vêca bê rast kirin û berê wê ji heqî yê nazivirê da vêca lê bê zivirandin; pir xwendin û gohlê dan ewê kevin nakê, kesê bi wê biaxivê rastgûye û yê bi wê ‘emel bikê ew pêş ketîye.

Li vê navbirê da kesek rabî û gotê: Ey mîrê bawerdaran, ji mere behsa fitnê bike, gelo te derheq vê tiştê da qe ji Pêğember (s) pirsyar kirîye? Vêca ewî (s) wiha got:

Dema ev ayet hat xarê: ***“Elif.L.M. Gelo mirov wereng guman dikin ku***

كَمِرْجَلِ الْقَيْنِ، وَلَوْ دُعِيَتْ لِتَنَالَ مِنْ غَيْرِي مَا أَتَتْ إِلَيَّ، لَمْ تَفْعَلْ، وَلَهَا بَعْدُ حُرْمَتُهَا الأُولَى، وَالْحِسَابُ عَلَى اللهِ.

منه في وصف الايمان: سَبِيلٌ أَبْلَجُ الْمِنْهَاجِ، أَنْوَرُ السِّرَاجِ، فَبِالأيمَانِ يُسْتَدَلُّ عَلَى الصَّالِحَاتِ، وَبَالصَّالِحَاتِ يُسْتَدَلُّ عَلَى الأيمَانِ، وَبِالأيمَانِ يُعْمَرُ الْعِلْمُ، وَبِالْعِلْمِ يُرْهَبُ الْمَوْتُ، وَبِالْمَوْتِ تُخْتَمُ الدُّنْيَا، وَبِالدُّنْيَا تُحْرَزُ الأخِرَةُ، وَإِنَّ الْخَلْقَ لاَ مَقْصَرَ لَهُمْ عَنِ الْقِيَامَةِ، مُرْقِلِينَ فِي مِضْمارِهَا إِلَى الْغَايَةِ الْقُصْوَى.

في حال أهل القبور في القيامة:

قَدْ شَخَصُوا مِنْ مُسْتَقَرِّ الأَجْدَاثِ، وَصَارُوا إِلى مَصَائِرِ الْغَايَاتِ، لِكُلِّ دَار أَهْلُهَا، لاَ يَسْتَبْدِلُونَ بِهَا وَلا يَنقلونَ عَنهَا.

وَإِنَّ الأَمْرَ بِالْمَعْرُوفِ، وَالنَّهْيَ عَنِ الْمُنكَرِ، لَخُلُقَانِ مِنْ خُلُقِ اللهِ سُبْحَانَهُ، وَإِنَّهُمَا لاَ يُقَرِّبَانِ مِنْ أَجَلٍ، وَلاَ يَنْقُصَانِ مِنْ رِزْقٍ. وَعَلَيْكُمْ بِكِتَابِ اللهِ، فَإِنَّهُ

dema dibêjin: Me îman anî, wê dest ji wan bê kêşan û êdî nayên imtihan kirin (la yuftenûn)?"[56] Hingê min zanî heta ku Pêğember (s) di nav me da ye, fitne ser me da nayê, vêca min pirsî û got: Ey Resûlê Xwedê! Ev fitna (imtihana) ku Xwedê Te'ala behsa wê ji te re kirî, çi fitneyeke? Ewî (s) kerem kir: Ey 'Elî! Wê piştî min ummeta min bikevê fitnê. Min got: Ya resûlellah! Ma gelo li roja "uhudê" da ku komek ji muslimana şehîd bûyîn û, ez şehîd nebûyîm û vêca li min giran hatî, te ne got min, "mizgînî ji te ra, ku şehadet li pey te ye"?

Vêca Pêğember (s) got: "Werenge çawa tu dibêjî; tu dê hingê bi çi awayî sebir bikî" min gotê: Ey Resûlê Xwedê! Ew ne cihê sebirdarî yê ye, belkî cihê mizgînî û şukir kirinê ye. Ewî kerem kir: "Ey 'Elî! Wê ev qewmê he, paş min bi malê xwe bên imtihan kirin û, wê ji ber ku dînê Xwedê qebûl kirine minetê li Xwedayê xwe bikin û li wî halî da wê berhêvî yê rehmeta wî bin û xwe ji ber xezeba wî li êmnahî yê da bibînin; wê pê şubhên derewîn û hewayê nefs a xafilker, heramê Xwedê helal bikin; wê navê ava tirî deynin ser 'ereqê û navê hedîyê deynin ser rişwetê û navê kirîn firûtinê bi ribayê ve bikin û bi vî awayî ewa hemîyan helal bizanin". Min got: Ey Resûlê Xwedê! Vêca hingê ez xelkê li kîjan mertebê da deynim? Li merteba

الْحَبْلُ الْمَتِينُ، وَالنُّورُ الْمُبِينُ، وَالشِّفَاءُ النَّافِعُ، وَالرِّيُّ النَّاقِعُ، وَالْعِصْمَةُ لِلْمُتَمَسِّكِ، وَالنَّجَاةُ لِلْمُتَعَلِّقِ، لاَ يَعْوَجُّ فَيُقَامَ، وَلاَ يَزِيغُ فَيُسْتَعْتَبَ، وَلاَ تُخْلِقُهُ كَثْرَةُ الرَّدِّ، وَوُلُوجُ السَّمْعِ، مَنْ قَالَ بِهِ صَدَقَ، وَمَنْ عَمِلَ بِهِ سَبَقَ.

وقام إليه رجل فقال: أخبرنا عن الفتنة، وهل سألت عنها رسول الله صلى الله عليه وآله؟ فقال عليه السلام:

لَمَّا أَنْزَلَ اللهُ سُبْحَانَهُ، قَوْلَهُ: (الم * أَحَسِبَ النَّاسُ أَنْ يُتْرَكُوا أَنْ يَقُولُوا آمَنَّا وَهُمْ لاَ يُفْتَنُونَ) عَلِمْتُ أَنَّ الْفِتْنَةَ لاَ تَنْزِلُ بِنَا وَرَسُولُ اللهِ صلى الله عليه وآله بَيْنَ أَظْهُرِنَا. فَقُلْتُ: يَا رَسُولَ اللهِ، مَا هذِهِ الْفِتْنَةُ الَّتِي أَخْبَرَكَ اللهُ بِهَا؟ فَقَالَ: «يَا عَلِيُّ، إِنَّ أُمَّتِي سَيُفْتَنُونَ مِنْ بَعْدِي». فَقُلْتُ: يَا رَسُولَ اللهِ، أَوَلَيْسَ قَدْ قُلْتَ لِي يَوْمَ أُحُد حَيْثُ اسْتُشْهِدَ مَنِ اسْتُشْهِدَ مِنَ الْمُسْلِمِينَ، وَحِيزَتْ عَنِّي الشَّهَادَةُ، فَشَقَّ ذلِكَ عَلَيَّ، فَقُلْتَ لِي: «أَبْشِرْ، فَإِنَّ الشَّهَادَةَ مِنْ وَرَائِكَ»؟.

فَقَالَ لِي: «إِنَّ ذلِكَ لَكَذلِكَ،

“ji dîn derketinê”da, an xaphayîyan û imtihan bûyîyan da? Kerem kir: di cî yê imtihan bûyîyan û lê qewimayan da deyne.

AXIFTINA 157

Ĥemd ji wî Xudayî ra ewê ĥemd kirî kilîda zikrê xwe û sebebê zêdahî ya fezla xwe û rê nîşanderê ni’met û mezinahî ya Xwe.

Bendeyên Xwedê! Zeman wereng ser yên mayîn ra derbaz dibê wek çawa li ser yên bûrîyî ra derbaz bûyî, ew qasê derbaz bûyî êdî nazivirê û ewa mayî jî ji her û her ra namînê; kiryara wê ya dûmahîkê wek ya ewilê wê ye, qewimînên wê pêşî yê ji hev distînin û dighên nîşanên wê jî bi hevra ne.

Vêca we hesab bikin ku hûn li qîyametê da hazir bûne û tên ajûtin wek wê gûlka devê ya har û nexweş mi’emlet ku xweyê wê ewê dajû. Heçî kesê (xafil bê) şûna mijûlî ya bi xwe ve bi tiştek dî mijûl bûyî wê li nav tarîtî yê da şaş (heyrî) bimînê û bikevê di xeterê da û şeytanên wî ewî bihêlin di nav serkêşî yên wî da û karên wî yên pîs pêş çavên wî bixemilînin; vêca bihişt xilaseka rêka pêşî standî ya ye û cehnem jî dumahîka rêka teqsîrkara ye.

Bizanin, ey bendeyên Xwedê!

فَكَيْفَ صَبْرُكَ إِذَنْ»؟.

فَقُلْتُ: يَا رَسُولَ الله، لَيسَ هذَا مِنْ مَوَاطِنِ الصَّبْرِ، وَلكِنْ مِنْ مَوَاطِنِ البشرى وَالشُّكْرِ. وَقَالَ: «يَا عَلِيُّ، إِنَّ الْقَوْمَ سَيُفْتَنُونَ بِأَمْوَالِهِمْ، وَيَمُنُّونَ بِدِينِهِم عَلَى رَبِّهِمْ، وَيَتَمَنَّوْنَ رَحْمَتَهُ، وَيَأْمَنُونَ سَطْوَتَهُ، وَيَسْتَحِلُّونَ حَرَامَهُ بِالشُّبُهَاتِ الْكَاذِبَةِ، وَالأَهْوَاءِ السَّاهِيَةِ، فَيَسْتَحِلُّونَ الْخَمْرَ بِالنَّبِيذِ، وَالسُّحْتَ بِالْهَدِيَّةِ، وَالرِّبَا بِالْبَيْعِ».

قُلْتُ: يَا رَسُولَ الله، فَبِأَيِّ الْمَنَازِلِ أُنْزِلُهُمْ عِنْدَ ذلِكَ؟ أَبِمَنْزِلَةِ رِدَّة، أَمْ بِمَنْزِلَةِ فِتْنَة؟

فَقَالَ: «بِمَنْزِلَةِ فِتْنَة».

[157]

الْحَمْدُ لله الَّذِي جَعَلَ الْحَمْدَ مِفْتَاحاً لِذِكْرِهِ، وَسَبَباً لِلْمَزِيدِ مِنْ فَضْلِهِ، وَدَلِيلاً عَلَى آلاَئِهِ وَعَظَمَتِهِ.

عِبَادَ الله، إِنَّ الدَّهْرَ يَجْرِي بِالْبَاقِينَ كَجَرْيِهِ بِالْمَاضِينَ، لاَ يَعُودُ مَا قَدْ وَلَّى مِنْهُ، وَلاَ يَبْقَى

Teqwatî avahîyeke wek kelh a (şûreh) qayîm, xirabkarî jî xanîyek wek kelh a şikestî ku bela ji ehlê xwe paşda nadê û yê têda jî naparêzê. Heyhê, dirêşka jehrî kirî ya gonehan pê teqwatîyê tê brîn û, pê yeqînê mirov dikarê bighê mexseda xwe ya bilind.

Ey bendeyên Xwedê! Hay ji navbeyna xwe û Xwedê hebin û Xwedê bînin bîra xwe derheq ‘ezîztirîn û mehbûbtirîn kesên li bal hewe; bi rastî Xwedê rêka heq ji hewe re ronahî kirîye, vêca an bextreşyek ji hewe cida nebê, an jî bextewerîyek her û her jibona hewe heye; Nixwe di rojen fanî da ji bona axreta baqî qûtekî berhev bikin; heqîqet ev e ku hûn ji bona qût rênimûn bûne; emrê kûç kirinê ji hewe re hatîye û hûn hatine hay dan ji rêketinê ra, vêca mesela hewe wek wî karwanî ye ku li rêkê da sekinye û nizanê wê kengê fermana rêketinê jê re bê. Heyhê! Ewê ji axretê ra hatî çêkirin, wê çi ji dinyayê bikê? Û wê çi ji wî malî bikê ku ji nêzîkve wê jê bê standin û berpirsyarî û hesaba wê li ser wî bimînê?

Ey bendeyên Xwedê! Ew xêra Xwedê soza wê dayî, ne ya berdanê ye û ew xirabî ya nehî jê kirî, ne ew e ku

سَرْمَداً مَا فِيهِ. آخِرُ فَعَالِهِ كَأَوَّلِهِ، مُتَسَابِقَةٌ أُمُورُهُ، مُتَظَاهِرَةٌ أَعْلاَمُهُ.

فَكَأَنَّكُمْ بِالسَّاعَةِ تَحْدُوكُمْ حَدْوَالزَّاجِرِ بِشَوْلِهِ، فَمَنْ شَغَلَ نَفْسَهُ بِغَيْرِ نَفْسِهِ تَحَيَّرَ فِي الظُّلُمَاتِ، وَارْتَبَكَ فِي الْهَلَكَاتِ، وَمَدَّتْ بِهِ شَيَاطِينُهُ فِي طُغْيَانِهِ، وَزَيَّنَتْ لَهُ سَيِّىءَ أَعْمَالِهِ، فَالْجَنَّةُ غَايَةُ السَّابِقِينَ، وَالنَّارُ غَايَةُ الْمُفَرِّطِينَ.

اعْلَمُوا عِبَادَ الله، أَنَّ التَّقْوَى دَارُ حِصْنٍ عَزِيز، وَالْفُجُورَ دَارُ حِصْنٍ ذَلِيل، لاَ يَمْنَعُ أَهْلَهُ، وَلاَ يُحْرِزُ مَنْ لَجَأَ إِلَيْهِ. أَلاَ وَبِالتَّقْوَى تُقْطَعُ حُمَةُ الْخَطَايَا، وَبِالْيَقِينِ تُدْرَكُ الْغَايَةُ الْقُصْوَى.

عِبَادَ الله، الله الله فِي أَعَزِّ الأَنْفُسِ عَلَيْكُم، وَأَحَبِّهَا إِلَيْكُمْ; فَإِنَّ الله قَدْ أَوْضَحَ سَبِيلَ الْحَقِّ وَأَنَارَ طُرُقَهُ، فَشِقْوَةٌ لاَزِمَةٌ، أَوْ سَعَادَةٌ دَائِمَةٌ! فَتَزَوَّدُوا فِي أَيَّامِ

mirov dilê xwe bibîyê.

Ey bendeyên Xwedê! Bitirsin ji wê roja ku teftêşa ‘emelan, tê kirin; ew roja pir lerzên ku zarûk têda pîr dibin.

Bizanin, ey ‘ebdên Xwedê! Rastî ev e ku hinek nubedar ji hewe bi xwe û çavdêr ji endamên hewe li ser hewe hene û parêzerên rast û durist jî kiryarên hewe diparêzin û heta êjmara nefes kişandinên hewe jî li bal wan paraztî ne. Tarîtîya şevên pir tarî hewe ji wan naveşêrê û dergehên girtî û muhkem jî nikarin hewe ji wan xef bikin. Bi rastî sibehî nêzîkê Îro ye û heçî ya di Îro da heyî wê ew digel xwe bibê û, sibe, wê di pey wê da bê û bighêtê, heçweku ez her yêk ji hewe dibînim ku hûn gihane mala tinêtî yê û ketine di wê çalê da ku ji hewe re hatîye kûlan.

Wey! Ji ber wê mala tinêtîyê! Û çi cihek yê tirs û dehşetê û cihê tinê mana li xerîbetîyê ye! Heçweku eve qêra qîyametê ser hewe da hat û wextê rabînê ser hewe da girt û hûn ji bona mehkemê hazir bûne; êdî ew gotinên pûç ji hewe dûr bûne û bihane rabîne û heqîqet eşkere bûne û ‘emel û kiryarên hewe hûn birine wêderê ku gereke hûn biçûna, vêca nixwe ji cihê ‘ibret girtinê,

الْفَنَاءِ لاَيَّامِ الْبَقَاءِ. قَدْ دُلِلْتُمْ عَلَى الزَّادِ، وَأُمِرْتُمْ بَالظَّعْنِ، وَحُثِثْتُمْ عَلَى الْمَسِيرِ، فَإِنَّمَا أَنْتُمْ كَرَكْب وُقُوف، لاَ يَدْرُونَ مَتَى يُؤْمَرُونَ بَالسَّيْرِ، أَلاَ فَمَا يَصْنَعُ بِالدُّنْيَا مَنْ خُلِقَ لِلاخِرَةِ! وَمَا يَصْنَعُ بِالْمَالِ مَنْ عَمَّا قَلِيل يُسْلَبُهُ، وَتَبْقَى عَلَيْهِ تَبِعَتُهُ وَحِسَابُهُ!

عِبَادَ الله، إِنَّهُ لَيْسَ لِمَا وَعَدَ اللهُ مِنَ الْخَيْرِ مَتْرَكٌ، وَلاَ فِيمَا نَهَى عَنْهُ مِنَ الشَّرِّ مَرْغَبٌ.

عِبَادَ الله، احْذَرُوا يَوْماً تُفْحَصُ فِيهِ الأَعْمَالُ، وَيَكْثُرُ فِيهِ الزِّلْزَالُ، وَتَشِيبُ فِيهِ الأَطْفَالُ.

اعْلَمُوا، عِبَادَ الله، أَنَّ عَلَيْكُمْ رَصَداً مِنْ أَنْفُسِكُمْ، وَعُيُوناً مِنْ جَوَارِحِكُمْ، وَحُفَّاظَ صِدْق يَحْفَظُونَ أَعْمَالَكُمْ، وَعَدَدَ أَنْفَاسِكُمْ، لاَ تَسْتُرُكُمْ مِنْهُمْ ظُلْمَةُ لَيْل دَاج، وَلاَ يُكِنُّكُمْ مِنْهُمْ بَابٌ ذُورِتَاج، وَإِنَّ غَداً مِنَ الْيَوْمِ قَرِيبٌ. يَذْهَبُ الْيَوْمُ بِمَا فِيهِ،

we’z û şîretê bigrin û ji vê hemî goherînê ‘ibretê bigrin û ji hişêdarîyan feydê bibin.

۞ AXIFTINA 158 ۞

Behsa Pêğember (s) û Qur’anê: Li wextekî da ew bi Pêğemberî hinart ku çi Pêğember nebîn û salên sal bî ku xelk li xewa bê xeberî yê da bîn û vehûnana şidîyayî veşerizî bû, vêca ew hat û ewa li ber destê wî (kitêbên asimanî) rast deranî û nûrek anî da ku li pey biçin; ew jî Qur’an e. Vêca ewê bidin xeberdan û, ew qet xeber nadê, lê belê ezê behsa wê ji hewe re bikim. Heyhê, bizanin! Zanînên hêjbên û behsa ji zemanê pêşda û dermanê derdê hewe û sîstim û şiklê jîyana hewe, di wê da ye.

... Derheq dewleta Benî Umeyye da: Hingê çi çadir û malek namînin ku sitemkar ewê tejî xem û kîn nekin, vêca li wî zemanî da ne kesek ji ‘esmana ‘ozrê wa qebûl dikê û ne jî ji ‘erdê arîkarek radibê. Hewe kesek ji hukumdarîyê ra bijartîye ku ne ehlê wê ye û hewe ew danîye cîyekî ku ne cîyê wî bûye; wê Xwedê tolê ji zaliman bigirê, xwarin ji ber xwarinê ve û vexwarin ji ber vexwarnê ve, pê xarinek

وَيَجِيءُ الْغَدُ لاَ حِقاً بِهِ، فَكَأَنَّ كُـلَّ امْرِىء مِنْكُمْ قَدْ بَلَـغَ مِـنَ الأَرْضِ مَنْزِلَ وَحْدَتِهِ، وَمَخَطَّ حُفْرَتِهِ،

فَيَالَهُ مِنْ بَيْتِ وَحْدَة، وَمَنْزِلِ وَحْشَـة، وَمُفْـرَدِ غُرْبَـة! وَكَـأَنَّ الصَّيْحَةَ قَدْ أَتَتْكُمْ، وَالسَّاعَةَ قَـدْ غَشِيَتْكُمْ، وَبَرَزْتُمْ لَفَصْلِ الْقَضَاء، قَـدْ زَاحَـتْ عَـنْكُمُ الأَبَاطِيـلُ، وَاضْـمَحَلَّتْ عَـنْكُمُ الْعِلَـلُ، وَاسْـتَحَقَّتْ بِكُـمُ الْحَقَـائِقُ، وَصَدَرَتْ بِكُمُ الأُمُورُ مَصَادِرَهَا، فَاتَّعِظُوا بِالْعِبَرِ، وَاعْتَبِرُوا بَـالْغِيَرِ، وَانْتَفِعُوا بِالنُّذُرِ.

[158]

[النبي والقرآن] أَرْسَلَهُ عَلَى حِينِ فَتْرَة مِنَ الرُّسُلِ، وَطُولِ هَجْعَة مِنَ الأُمَمِ، وَانْتِقَاض مِنَ الْمُبْرَمِ، فَجَاءَهُمْ بِتَصْدِيقِ الَّذِي بَيْنَ يَدَيْهِ، وَالنُّورِ الْمُقْتَدَى بِهِ. ذلِكَ الْقُرْآنُ فَاسْتَنْطِقُوهُ، وَلَنْ يَنْطِقَ، وَلَكِنْ أُخْبِرُكُمْ عَنْهُ: أَلاَ إِنَّ فِيهِ عِلْمَ مَا يَأْتِي، وَالْحَدِيثَ عَنِ

tehl wek “henzel”ê[57] û avek tehl û jehrî kirî wek “sebir” [58]ê û libasê binve tirs û libasê serve şûr; ewin merkebên (wesîlên suwaryê) xeletîya û dewarên barê gonehan hilgirtîn.

Vêca ez sond dixum û di pey ra dîsa sond dixum ku wê kurên umeyye piştî min, xilafetê berdin wek çawa çilm û tifa dev tê avêtin. Paşê jî çiqa roj û şev di pey hev ra tên, tama wê ber devê wan nakevê û heta hetayê ew wê tam nakin.

AXIFTINA 159

Behsa xweş mi’emletî ya xwe digel xelkê li bin fermana xwe da dikê.

Min digel hewe baş derbaz kir û ji hayjê mana hewe re heta ji min hatî ez xebitîm û min hûn ji bendên zelîlî yê deranîn û ji zincîrên zulmê xilas kirin; evahe sipasî ya wê qencî ya kêm bî ku min ji hewe dît. Min çavê xwe girt ji wa nebaşî yên hewe yên zehfî ku çavan ew dîtin û bedenê ew ragirtin.

AXIFTINA 160

Mezinahî ya Xwedê: Ferman û hukmê wî hetmî û li ser esasê Ĥikmetê ye û razî bûna wî êmnahî û rehmete; hukmê wî bi zanîne û pê sifetê xwe yê

الْمَاضِي، وَدَوَاءَ دَائِكُمْ، وَنَظْمَ مَا بَيْنَكُمْ.

منها: [في دولة بنى أمية] فَعِنْدَ ذلِكَ لاَ يَبْقَى بَيْتُ مَدَر وَلاَ وَبَر إِلاَّ وَأَدْخَلَهُ الظَّلَمَةُ تَرْحَةً، وَأَوْلَجُوا فِيهِ نِقْمَةً، فَيَوْمَئِذ لاَ يَبْقَى لَهُمْ فِي السَّماء عَاذِرٌ، وَلاَ فِي الأَرْضِ نَاصِرٌ. أَصْفَيْتُمْ بِالأَمْرِ غَيْرَ أَهْلِهِ، وَأَوْرَدْتُمُوهُ غَيْرَ مَوْرِدِهِ، وَسَيَنْتَقِمُ اللهُ مِمَّنْ ظَلَمَ، مَأْكَلاً بِمَأْكَل، وَمَشْرَباً بِمَشْرَب، مِنْ مَطَاعِمِ الْعَلْقَمِ، وَمَشَارِبِ الصَّبِرِ وَالْمَقِرِ، وَلِبَاسِ شِعَارِ الْخَوْفِ، وَدِثَارِ السَّيْفِ. وَإِنَّمَا هُمْ مَطَايَا الْخَطِيئَاتِ وَزَوَامِلُ الأَثَامِ.

فَأُقْسِمُ، ثُمَّ أُقْسِمُ، لَتَنَخَّمَنَّهَا أُمَيَّةُ مِنْ بَعْدِي كَمَا تُلْفَظُ النُّخَامَةُ، ثُمَّ لاَ تَذُوقُهَا وَلاَ تَطْعَمُ بِطَعْمِهَا أَبَداً مَا كَرَّ الْجَدِيدَانِ!

[159]

ومن خطبة له(عليه السلام)

[يبيّن فيها حسن معاملته لرعيّته]

وَلَقَدْ أَحْسَنْتُ جِوَارَكُمْ،

hilmê ‘efû dikê.

Ilahî! Hemd ji te ra ye li ser wê ya tu digirî û ya tu didî; û li ser dana selametî yê û gîr û giriftê; hemdek wereng ku layiqtirîn û mehbûbtirîn û seratirîn hemd bin li bal te. Hemdek ku hemî ‘alemê tejî bikê û bighê wê merteba ku tu dixwazî, hemdek ku ji te veşartî nemînê û ji gihana bo layê te paşve nemênê; hemdek ku êjmara wê neyê birîn û zêde bûna wê negihê xilasekê, vêca zanîna me nagihê heqîqeta mezinahî ya te, tinê em vê dizanîn ku tu ***“sax û xweragirî û pûnjîn û xew ji te ra nîne”*** bîr û hizir nikarin bighên te û çi çav nikarin te di xwe da bigrin; tu çavan dibînî û kiryarên bendên xwe tînî hesabê; hemî ceynik (ser) û pî li destê qudreta te da ne. (Ey Xuda!) Mexlûqê te yê ji me veşartî û ewa çavên me nikarin bibînin û ‘eqlên me nikarin bighênê û perdên xeybê ketine navbeyna me û wan da li beraberê wî mexlûqê te da ku em dibînin û ji qudreta te dimînin ‘ecêbmayî û ji ‘ezemeta karîna te daxvîn, zehf mezintir e!

Heçî dilê xwe vale bikê û fikra xwe bidê şixul da bizanê te çawa ‘erşê xwe ragirtîye û mexlûqê xwe çawa afirandî ye (xulqandiye) û ‘esmanê xwe çawa li hewa ra hilawîstî ye û ‘erdê xwe çawa li

وَأَحَطْتُ بِجُهْدِي مِـنْ وَرَائِكُـمْ، وَأَعْتَقْتُكُمْ مِنْ رِبَقِ الذُّلِّ، وَحَلَقِ الضَّيْمِ، شُكْراً مِنِّي لِلْبِـرِّ الْقَلِيـلِ، وَإِطْرَاقـاً عَمَّـا أَدْرَكَـهُ الْبَصَـرُ، وَشَهِدَهُ الْبَدَنُ، مِنَ الْمُنْكَرِ الْكَثِيرِ.

[**160**]

ومن خطبة له(عليه السلام)

أَمْرُهُ قَضَاءٌ وَحِكْمَـةٌ، وَرِضَـاهُ أَمَانٌ وَرَحْمَةٌ، يَقْضِي بِعِلْم، وَيَعْفُـو بِحِلْم.

اللَّهُمَّ لَكَ الْحَمْدُ عَلَى مَا تَأْخُذُ وَتُعْطِي، وَعَلَى مَا تُعَـافي وَتَبْتَلـي. حَمْداً يَكُونُ أَرْضَى الْحَمْـدِ لَـكَ، وَأَحَـبَّ الْحَمْـدِ إِلَيْـكَ، وَأَفْضَـلَ الْحَمْدِ عِنْـدَكَ. حَمْـداً يَمْـلأُ مَـا خَلَقْتَ، وَيَبْلُغُ مَا أَرَدْتَ. حَمْـداً لاَ يُحْجَبُ عَنْكَ، وَلاَ يُقْصَـرُ دُونَـكَ. حَمْداً لاَ يَنْقَطِعُ عَـدَدُهُ، وَلاَ يَفْنَـى مَدَدُهُ. فَلَسْنَا نَعْلَمُ كُنْهَ عَظَمَتِـكَ إِلاَّ أَنَّا نَعْلَمُ أَنَّكَ: حَيٌّ قَيُّومٌ، لاَ تَأْخُذُكَ سِنَةٌ وَلاَ نَوْمٌ، لَمْ يَنْتَهِ إِلَيْـكَ نَظَـرٌ، وَلَـمْ يُـدْرِكْكَ بَصَـرٌ، أَدْرَكْـتَ الأَبْصَـارَ، وَأَحْصَـيْتَ الأَعْمَـالَ،

ser mewcên avê pehn kirîye, wê bimînê navre û şaqiz bizivirê û wê ‘eqlê wî ji kar bikevê û seh kirina wî ji nav biçê û bîr û hizra wî (fikir) şaş bimînê.

Bi gumana xwe dibêjê qey hêvîya xwe bi Xwedêve girêdaye, sond bi Xwedayê mezin ku ew derewan dikê; çi lê hatîye ku hêvîdarî ya wî di ‘emel û kiryarên wî ra xuya nakê? Çiko kesê hêvîdar, hêvîdarî ya wî ji ‘emelê wî tê zanîn. Her hêvîdarî xêncî hêvîdarî ya ji Xwedê, ne xalise, û her tirsek xêncî tirsa ji Xwedê, ne di cî da ye. Li karên mezin da ji Xwedê hêvî dikê û li karên biçûk da hêvîya wî ji ‘ebda ye, lê belê ewê ya didê ‘evda, ewê nadê Xwedayê xwe (xwe li beraberê wî ‘ebdê hêvî jê heyî da dişkênê û teşekkurê jê dikê û heqê wî eda dikê, lê ji Xwedayê xwe ra wenakê) vêca çire wê ya digel bendeyê Xwedê dikê digel xwedê nakê?.

Gelo tu ditirsî ku li hêvîdarî ya ji Xwedê da derewker bibî? An tu ewî ji bona hêvîdarî yê munasib nabînî? Her wiha eger ji bendeyek yê Xwedê bitirsihê ewê ya tirs dikê lazimê xwe digel wî dikê, lê belê digel Xwedayê xwe newerenge, bi vî awayî tirsa wî ji bendeyê Xwedê pêşine (neqde) û tirsa wî ji xaliqê wî paşve dayî û deyne (ji gotinê pêve ne tiştek dî ye). Wihaye ewê dinya li çavê wî da mezin û li dilê wî da berketî (bi qîmet); wê (dinyayê) ser Xwedê

وَأَخَذْتَ (بِالنَّواصِي وَالأَقْدَامِ)، وَمَا الَّذِي نَرَى مِنْ خَلْقِكَ، وَنَعْجَبُ لَهُ مِنْ قُدْرَتِكَ، وَنَصِفُهُ مِنْ عَظِيمِ سُلْطَانِكَ، وَمَا تَغَيَّبَ عَنَّا مِنْهُ، وَقَصُرَتْ أَبْصَارُنَا عَنْهُ، وَانْتَهَتْ عُقُولُنَا دُونَهُ، وَحَالَتْ سَوَاتِرُ الْغُيُوبِ بَيْنَنَا وَبَيْنَهُ أَعْظَمُ.

فَمَنْ فَرَّغَ قَلْبَهُ، وَأَعْمَلَ فِكْرَهُ، لِيَعْلَمَ كَيْفَ أَقَمْتَ عَرْشَكَ، وَكَيْفَ ذَرَأْتَ خَلْقَكَ، وَكَيْفَ عَلَّقْتَ فِي الْهَوَاءِ سَمَاوَاتِكَ، وَكَيْفَ مَدَدْتَ عَلَى مَوْرِ الْمَاءِ أَرْضَكَ، رَجَعَ طَرْفُهُ حَسِيراً، وَعَقْلُهُ مَبْهُوراً، وَسَمْعُهُ وَالِهاً، وَفِكْرُهُ حَائِراً.

منها: يَدَّعِي بِزُعْمِهِ أَنَّهُ يَرْجُو اللهَ، كَذَبَ وَالْعَظِيمِ! مَا بَالُهُ لاَ يَتَبَيَّنُ رَجَاؤُهُ فِي عَمَلِهِ؟ فَكُلُّ مَنْ رَجَا عُرِفَ رَجَاؤُهُ فِي عَمَلِهِ، وَكُلُّ رَجَاءٍ ـ إِلاَّ رَجَاءَ اللهِ ـ فَإِنَّهُ مَدْخُولٌ، وَكُلُّ خَوْفٍ مُحَقَّقٌ، إِلاَّ خَوْفَ اللهِ فَإِنَّهُ مَعْلُولٌ، يَرْجُو اللهَ فِي الْكَبِيرِ، وَيَرْجُو الْعِبَادَ فِي الصَّغِيرِ، فَيُعْطِي الْعَبْدَ مَا لاَ يُعْطِي الرَّبَّ! فَمَا بَالُ اللهِ جَلَّ

ra digrê vêca dil didîyê û xwe ji wê ra vedqetênê û dibê kûleyê wê.

Jîyana Pêğemberan: Muheqeq, Pêğemberê Xuda selewat ser wî û alê wî bin vê derheqê da bo nimûne ji te re bese; ew ji bona te rê rastkere derheq zemma dinyayê û kêmasî û şermezar kirin û pîsatî yên di wê da heyîn. Çiko dinya ji wî (s) hat girtin û ji bona yên dî hat dayîn, ew ji şîrê wê hat vegirtin û xemla wê ji wî hat dûr kirin.

Mûsa (s): Eger tu bixwazî ezê nimûna duwê ji Mûsayê kelîmullah selamên Xwedê lê bin bînim, çewan ku dibêjê: ***"Ey Xuda! Bi rastî ez muhtacê wê xêrê me ewa te ji min ra rêkirî"*** [59]sond bi Xwedê, ku ewî xêncî nanekî ku bixwê ji Xuda nexwest, çiko ji gîyayê 'erdê dixara û ewqas ze'êf û kêm gûşt bîbî ku şînkatî ya gîyayê ewî xarî li zikê wî da xuya dikira.

Dawûd (s): Eger tu bixwazî ezê nimûna sisê jî bînim; ew jî dawûde (s) ; xweyê zebûr a û xwînerê ehlê bihiştê. Ewî bi destê xwe zenbîl dihûna û digota ewa kesên li civata xwe da: Kîjan ji hewe ji ber minve firûtina wê li xwe digrê? Vêca pê bihayê wê tûtikek nanê ceh bi destve danîya û dixara.

Îsa (s): Eger tu bixwazî vê derheqê da ezê ji îsayê korê merîyemê (s)

ثَنَاؤُهُ يُقَصِّرُ بِهِ عَمَّا يُصْنَعُ بِهِ بِعِبَادِهِ؟

أَتَخَافُ أَنْ تَكُونَ فِي رَجَائِكَ لَهُ كَاذِباً؟ أَوْ تَكُونَ لاَ تَرَاهُ لِلرَّجَاءِ مَوْضِعاً؟ وَكَذلِكَ إِنْ هُوَ خَافَ عَبْداً مِنْ عَبِيدِهِ، أَعْطَاهُ مِنْ خَوْفِهِ مَا لاَ يُعْطِي رَبَّهُ، فَجَعَلَ خَوْفَهُ مِنَ الْعِبَادِ نَقْداً، وَخَوْفَهُ مِنْ خَالِقِهِ ضِماراً وَوَعْداً، وَكَذلِكَ مَنْ عَظُمَتِ الدُّنْيَا فِي عَيْنِهِ، وَكَبُرَ مَوْقِعُهَا مِنْ قَلْبِهِ، آثَرَهَا عَلَى اللهِ، فَانْقَطَعَ إِلَيْهَا، وَصَارَ عَبْداً لَهَا.

وَلَقَدْ كَانَ فِي رَسُولِ اللهِ (صلى الله عليه وآله) كَافٍ لَكَ فِي الأُسْوَةِ، وَدَلِيلٌ لَكَ عَلَى ذَمِّ الدُّنْيَا وَعَيْبِهَا، وَكَثْرَةِ مَخَازِيهَا وَمَسَاوِيهَا، إِذْ قُبِضَتْ عَنْهُ أَطْرَافُهَا، وَوُطِّئَتْ لِغَيْرِهِ أَكْنَافُهَا، وَفُطِمَ مِنْ رَضَاعِهَا، وَزُوِيَ عَنْ زَخَارِفِهَا.

[موسى (عليه السلام)]: وَإِنْ شِئْتَ ثَنَّيْتُ بِمُوسى كَلِيمِ اللهِ (صلى الله عليه وآله) إِذْ يَقُولُ: (رَبِّ إِنِّي لِمَا أَنْزَلْتَ إِلَيَّ مِنْ خَيْرٍ فَقِيرٌ)، وَاللهِ، مَا سَأَلَهُ إِلاَّ خُبْزاً يَأْكُلُهُ، لأَنَّهُ كَانَ يَأْكُلُ بَقْلَةَ الأَرْضِ، وَلَقَدْ

biaxivim; ewî kuç (kevr- ber) dikiran bin serê xwe da balgehê wî kevr bî û cilkên zivir dikiran berxwe û nanê hişk dixara û pêxarina wî birsîtî bî û çira wî ya şevê heyv bî û cihê sekna wî li zivistana da şerq û xerbê ‘erdê bî û fêkî û pincara wî ew bî ya ji candarên gîyaxwer ra li ‘erdê şîn dibûya, ne hevjînek hebû ku pê bê xapandin û ne jî zarûk hebûn ku xem û kulan jê re çêkin û ne malek hebû ku pêve mijûl bibê û ne timayî û berhêvîyek hebû ku ewî zelîl bikê; hespê suwarî ya wî dû lingên wî bîn û xizmetkarên wî, dû destên wî.

Pêğember(s): Vêca tu Pêğemberê xwe yê pak û paqij selewat ser wî û alê wî bin ji xwe re bike nimûne û bikeve pey wî. Çiko bi rastî ew baştirîn pêşkare ji bona wî kesê pey wî biçê, ew baştirîn kese ku mirov xwe pê wî nav bidê. Xweşdivêtirîn kes li bal Xwedê ew e yê pey Pêğemberê wî biçê û li ser dewsa wî gava xwe bavêjê; ewî (s) devê xwe ji dinyayê tejî nekir û çavê xwe neda dinyayê, teniştên wî ji yên hemî kesî ze’êftir û zikê wî ji yê hemî kesî valetir bî; dinya li ber wî hat vedan û ewî qebûl nekir; zanî kerbê Xwedê ji çi tê vêca ewî jî kerbê xwe jê anî û pê hesiha çi tiştî kêm zanê ewî jî kêm zanî û, çi tiştî biçûk û çine hesab dikê ewî jî biçûk û çine hesab kir. Eger em hez bikîn ji wê ya Xwedê û Pêğemberê wî kerbê

كَانَتْ خُضْرَةُ الْبَقْلِ تُرَى مِنْ شَفِيفِ صِفَاقِ بَطْنِهِ، لِهُزَالِهِ وَتَشَذُّبِ لَحْمِهِ.

[داوود عليه السلام]: وَإِنْ شِئْتَ ثَلَّثْتُ بِدَاوودَ صَاحِبِ الْمَزَامِيرِ، وقَارِىءِ أَهْلِ الْجَنَّةِ، فَلَقَدْ كَانَ يَعْمَلُ سَفَائِفَ الْخُوصِ بِيَدِهِ، وَيَقُولُ لِجُلَسَائِهِ: أَيُّكُمْ يَكْفِينِي بَيْعَهَا! وَيَأْكُلُ قُرْصَ الشَّعِيرِ مِنْ ثَمَنِهَا.

[عيسى عليه السلام]: وَإِنْ شِئْتَ قُلْتُ فِي عِيسَى بْنِ مَرْيَمَ(عليه السلام)، فَلَقَدْ كَانَ يَتَوَسَّدُ الْحَجَرَ، وَيَلْبَسُ الْخَشِنَ، وَكَانَ إِدَامُهُ الْجُوعَ، وَسِرَاجُهُ بِاللَّيْلِ الْقَمَرَ، وَظِلاَلُهُ فِي الشِّتَاءِ مَشَارِقَ الأَرْضِ وَمَغَارِبَهَا، وَفَاكِهَتُهُ وَرَيْحَانُهُ مَا تُنْبِتُ الأَرْضُ لِلْبَهَائِمِ، وَلَمْ تَكُنْ لَهُ زَوْجَةٌ تَفْتِنُهُ، وَلاَ وَلَدٌ يَحْزُنُهُ، وَلاَ مَالٌ يَلْفِتُهُ، وَلاَ طَمَعٌ يُذِلُّهُ، دَابَّتُهُ رِجْلاَهُ، وَخَادِمُهُ يَدَاهُ!

الرسول الاعظم صلى الله عليه وآله

فَتَأَسَّ بِنَبِيِّكَ الأَطْيَبِ الأَطْهَرِ صلى الله عليه وآله فَإِنَّ فِيهِ أُسْوَةً لِمَنْ تَأَسَّى، وَعَزَاءً لِمَنْ تَعَزَّى ـ وَأَحَبُّ الْعِبَادِ إِلَى اللهِ

wan jê hatî û em mezin ragirîn ewa Xwedê û Pêğemberê wî biçûk û bê qîmet hesab kirîn, evahe tinê ji wê çendê ra bese ku me, serî li ber Xwedê hilanî bê û muxalifeta emrê Xwedê kiribê.

Bê şik û şubhe Pêğember (s) li ser ‘erdê xarin dixara û wek benda (‘evd) rûdinşta û ewî bi destê xwe (pêlav) sûla xwe ya dirhayî didrûta û cilkên xwe bi destê xwe pîne dikiran û suwarê kerê bê kurtan (palan) dibûya û kesek jî lipişt xwe suwar dikira. Perdeyek nexşkirî bi serdera mala wîve kir bîn, vêca gote yêk ji hevjînên xwe: “filankes! Evê perdê ji ber çavê min rake, çiko dema ez lê dinêrim dinya û xemla wê tê bîra min”. Vêca ewî (s) dilê xwe ji dinyayê zivirandibî û bîra dinyayê li xwe da mirandibî û dixwesta xemla dinyayê ji ber çavê xwe hilênê da newebê ku tiştekî jê rakê, ewî, dinya cihê sekinînê nedizanî û ne berhêvî yê mana di wê da bî, vêca ew ji hizra xwe deranî û ji dilê xwe avêt û ji ber çavan winda kir. Her wihaye, kesê ji tiştekî nexweş bê hez nakê lê binêrê û hez nakê li bal wî jê bê axiftin.

Li sîreta Pêğemberê Xwedê da (s) hinek tişt hene ku te rênimûn dikê ji bona kêmasî û ‘eybên dinyayê. Çiko ew digel mirovên xwe yên taybet di wê da

الْمُتَأَسِّي بِنَبِيِّهِ، وَالْمُقْتَصُّ لِأَثَرِهِ ـ قَضَمَ الدُّنْيَا قَضْماً، وَلَمْ يُعِرْهَا طَرْفاً، أَهْضَمُ أَهْلِ الدُّنْيَا كَشْحاً، وَأَخْمَصُهُمْ مِنَ الدُّنْيَا بَطْناً، عُرِضَتْ عَلَيْهِ الدُّنْيَا فَأَبَى أَنْ يَقْبَلَهَا، وَعَلِمَ أَنَّ اللهَ سُبْحَانَهُ أَبْغَضَ شَيْئاً فَأَبْغَضَهُ، وَحَقَّرَ شَيْئاً فَحَقَّرَهُ، وَصَغَّرَ شَيْئاً فَصَغَّرَهُ. وَلَوْ لَمْ يَكُنْ فِينَا إِلاَّ حُبُّنَا مَا أَبْغَضَ اللهُ، وَتَعْظِيمُنَا مَا صَغَّرَ اللهُ، لَكَفَى بِهِ شِقَاقاً لله، وَمُحَادَّةً عَنْ أَمْرِ الله.

وَلَقَدْ كَانَ صلى الله عليه وآله يَأْكُلُ عَلَى الأَرْضِ، وَيَجْلِسُ جِلْسَةَ الْعَبْدِ، وَيَخْصِفُ بِيَدِهِ نَعْلَهُ، وَيَرْقَعُ بِيَدِهِ ثَوْبَهُ، وَيَرْكَبُ الْحِمَارَ الْعَارِيَ، وَيُرْدِفُ خَلْفَهُ، وَيَكُونُ السِّتْرُ عَلَى بَابِ بَيْتِهِ فَتَكُونُ فِيهِ التَّصَاوِيرُ فَيَقُولُ: «يَا فُلاَنَةُ ـ لِإِحْدَى أَزْوَاجِهِ ـ غَيِّبِيهِ عَنِّي، فَإِنِّي إِذَا نَظَرْتُ إِلَيْهِ ذَكَرْتُ الدُّنْيَا وَزَخَارِفَهَا».

فَأَعْرَضَ عَنِ الدُّنْيَا بِقَلْبِهِ،

birsî ma û xemla wê ji wî hat dûr kirin, halhale ew xweyê wê merteba mezin bî.

Vêca bila mirov baş bidê ‘eqlê xwe ku gelo Xwedê pê vê yêkê qedr û qîmet da Muhemmed (s) an ew biçûk û kêm kir?

Eger bêjê ew kêm kir, vêca sond bi Xwedayê mezin, ewî derew û bêbextîyek mezin kirîye; eger bêjê qedr û qîmet dayî yê, vêca bila bizanê ku Xwedê xêncî wî pê berfireh kirina dinyayê li ber wan kêm û bê qîmet kirine; û ew (dinya) ji nêzîktirîn mirovên xwe dûr kirîye.

Nixwe vêca bila her kes bikevê pey Pêğemberê xwe û pê dewsa wî bikevê û rêka wî bidê ber xwe, egerne ew ji ber telef bûnê ne li emanê da ye. Çiko bi rastî Xwedayê Te’ala Muhemmed selewat li wî û alê wî bin kirîye nîşana qîyametê û mizgînîderê bihiştê û tirsînerê ji ‘ezab û cezadanê. Ew bi zikê vale ji dinyayê derket û salim û bê nexweşî giha axretê; Berek nedeyna ser berekî heta li rêka xwe çû û de’weta Xwedayê xwe cewab da. Vêca çiqa mineta Xwedê mezine li ser me ku pê wî ni’met li me kir; ew pêşrewê ku em ketine pey wî û ew rêberê ku em gava xwe li pey wî ra davêjin. Sond bi

وَأَمَاتَ ذِكْرَهَا مِنْ نَفْسِهِ، وَأَحَبَّ أَنْ تَغِيبَ زِينَتُهَا عَنْ عَيْنِهِ، لِكَيْلاَ يَتَّخِذَ مِنْهَا رِيَاشاً، وَلاَ يَعْتَقِدَهَا قَرَاراً، وَلاَ يَرْجُو فِيهَا مُقَاماً، فَأَخْرَجَهَا مِنَ النَّفْسِ، وَأَشْخَصَهَا عَنِ الْقَلْبِ، وَغَيَّبَهَا عَنِ الْبَصَرِ.

وَكَذلِكَ مَنْ أَبْغَضَ شَيْئاً أَبْغَضَ أَنْ يَنْظُرَ إِلَيْهِ، وَأَنْ يُذْكَرَ عِنْدَهُ.

وَلَقَدْ كَانَ فِي رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله مَا يَدُلُّكَ عَلَى مَسَاوِىءِ الدُّنْيَا وَعُيُوبِهَا:

إِذْ جَاعَ فِيهَا مَعَ خَاصَّتِهِ، وَزُوِيَتْ عَنْهُ زَخَارِفُهَا مَعَ عَظِيمِ زُلْفَتِهِ.

فَلْيَنْظُرْ نَاظِرٌ بِعَقْلِهِ: أَكْرَمَ اللهُ مُحَمَّداً عليه السلام بِذلِكَ أَمْ أَهَانَهُ!

فَإِنْ قَالَ: أَهَانَهُ، فَقَدْ كَذَبَ ـ وَاللهِ الْعَظِيمِ ـ وَإِنْ قَالَ: أَكْرَمَهُ، فَلْيَعْلَمْ أَنَّ اللهَ قَدْ أَهَانَ غَيْرَهُ حَيْثُ بَسَطَ الدُّنْيَا لَهُ، وَزَوَاهَا عَنْ أَقْرَبِ النَّاسِ مِنْهُ.

فَتَأَسَّى مُتَأَسٍّ بِنَبِيِّهِ، وَاقْتَصَّ

Xwedê, min ewqas ev “cubbê” xwe pîne kirîye, ku êdî ez ji pînekerê wê şerm dikim. Kesekî got min: Ma vêca tu wê navêjî? Min gotê: Ji min dûr bikeve “berê sibehê ra pesnê rêwingî yên şev hişyar tê dayîn”[60]

أَثَرَهُ، وَوَلَجَ مَوْلِجَهُ، وَإِلاَّ فَلاَ يَـأْمَنِ الْهَلَكَةَ، فَـإِنَّ اللهَ عزّوجـلّ جَعَـلَ مُحَمَّداً(صلى الله عليه وآله) عَلَمـاً لِلسَّاعَةِ، وَمُبَشِّـراً بِالْجَنَّـةِ، وَمُنْـذِراً بِالعُقُوبَةِ.

AXIFTINA 161

Derheq Pêğember (s) û ehlê beyta wî û teqwatî yê da ye.

خَرَجَ مِنَ الدُّنْيَا خَمِيصاً، وَوَرَدَ الْآخِرَةَ سَلِيماً، لَمْ يَضَعْ حَجَراً عَلَى حَجَرٍ، حَتَّى مَضَى لِسَبِيلِهِ، وَأَجَابَ دَاعِيَ رَبِّهِ، فَمَا أَعْظَمَ مِنَّةَ اللهِ عِنْدَنَا حِينَ أَنْعَمَ عَلَيْنَا بِـهِ سَـلَفاً نَتَّبِعُـهُ، وَقَائِداً نَطَأُ عَقِبَهُ!

Ew pê nûra ronahî û delîl û borhana eşkere û rêçka dîyar (xuya) û kitêba rê rastker hinart.

وَاللهِ لَقَدْ رَقَّعْتُ مِدْرَعَتِي هـذِهِ حَتَّى اسْتَحْيَيْتُ مِنْ رَاقِعِهَـا، وَلَقَـدْ قَالَ لِي قَائِلٌ: أَلاَ تَنْبِـذُهَا؟ فَقُلْـتُ: اغْرُبْ عَنِّي، فَعِنْدَ الصَّـبَاحِ يَحْمَـدُ الْقَوْمُ السُّرَى.

Binemala wî baştirîn binemal û, dara neseba wî baştirîn dare; çiqên wê serastin û fêkî yê wê li ber destaye.

[**161**]

ومن خطبة له(عليه السلام)

[في صفة النبي وأهل بيته وأتباع دينه]

[وفيها يعظ بالتقوى]

Cihê weldîna wî meke ye û cihê hicreta wî medîna pake. Li wêderê navê wî bilind bî û dengê wî ji wê derê bilav bî. Ew pê huccetek (delîl) kafî û şîretek şifader û gazîyek avaker û xilasker hinart.

ابْتَعَثَـهُ بِـالنُّورِ الْمُضِـيءِ، وَالْبُرهَانِ الْجَلِيِّ، وَالْمِنْهَاجِ الْبَادِي، وَالْكِتَابِ الْهَادِي.

أُسْرَتُهُ خَيْـرُ أُسْـرَةٍ، وَشَـجَرَتُهُ

Pê wî, rêkên nenas eşkere kirin, bid’etên ku ketbîn nav wan herişandin û hukmên ji wan ra hatîn deynan beyan kirin û gotin.

Vêca kesê xêncî Islamê dînekî bixwazê, bextreşî ya wî muheqeq û werîsê xwe pê girtî, brîyî û serser (deverû) ketina wî dijware û zivirîna wî bi alîyê kol û xemên dirêj û ‘ezabek

dijwarve ye.

Ez xwe bi Xwedê digirim, xwe pê girtinek wek ya wî kesê bi alîyê wîve çûyî û ez ji wî dixwazim ku min serast bikê ser wê rêkê ewa dighê bihiştê û razî bûn û vîyana wî di wê da.

Şîreta teqwatîyê: Ey ‘evdên Xwedê! Ez wesîyeta (şîreta) teqwatî û gohdana Xwedê li hewe dikim, çiko ew sebebê xilasî ya sibehî ye û xilasî ya her û her ji hewe re di wê da ye. Xwedê tirsand û pir tirsand û vîyan çêkir û zehf çêkir; ji hewe re behsa dinyayê û nemana wê û ji nav çûn û gohaztina wê kir.

Vêca nixwe pişt bidin wan tiştên dinyayî yên li hewe xweş tên, çiko mayîna wan digel hewe pir kême. Ew nêzîktirîn ware ji bona xezeba Xwedê û dûrtirîn cihe ji razî bûna wî ra.

Wekî we ye, nixwe ey ‘evdên Xwedê! Çavê xwe bigrin ji kol û nexweşî yên wê, çiko hewe yeqîn heye bi cidahî ya ji wê û goherîna di wê da çêdibê. Û ji ber wê hay ji xwe hebin wek hay ji xwe mana wîyê pir ditirsihê û zehf dixebitê.

Ji serhata yên pêş xwe da ‘ibretê bigrin ku, çawa hestî yên wan ji hev vebûne û bilav bûne û çav û gohên wan ji nav çûne û şeref û mezinahî ya wan ji dest derketîye û keyf û ni’metên wan

خَيْرُ شَجَرَة، أَغصَانُهَا مُعْتَدِلَةٌ، وَثِمَارُهَا مُتَهَدِّلَةٌ.

مَوْلِدُهُ بِمَكَّةَ، وَهِجْرَتُهُ بِطَيْبَةَ، عَلا بِهَا ذِكْرُهُ، وَامْتَدَّ مِنْهَا صَوْتُهُ. أَرْسَلَهُ بِحُجَّة كَافِيَة، وَمَوْعِظَة شَافِية، وَدَعْوَة مُتَلافِيَة.

أَظْهَرَ بِهِ الشَّرائِعَ الْمَجْهُولَةَ، وَقَمَعَ بِهِ الْبِدَعَ الْمَدْخُولَةَ، وَبَيَّنَ بِهِ الأَحْكَامَ الْمَفْصُولَةَ.

فَـ (مَنْ يَبْتَغِ غَيْرَ الاسْلامِ دِيناً) تَتَحَقَّقْ شِقْوَتُهُ، وَتَنْفَصِمْ عُرْوَتُهُ، وَتَعْظُمْ كَبْوَتُهُ، وَيَكُنْ مَآبُهُ إِلَى الْحُزْنِ الطَّوِيلِ وَالْعَذَابِ الْوَبِيلِ.

وَأَتَوَكَّلُ عَلَى الله تَوَكُّلَ الانَابَةِ إِلَيْهِ، وَأَسْتَرْشِدُهُ السَّبِيلَ الْمُؤَدِّيَةَ إِلى جَنَّتِهِ، الْقَاصِدَةَ إِلى مَحَلِّ رَغْبَتِهِ.

[النصح بالتّقوى] أُوصِيكُمْ عِبَادَالله، بِتَقْوَى الله وَطَاعَتِهِ، فَإِنَّهَا النَّجَاةُ غَداً، وَالْمَنْجَاةُ أَبَداً. رَهَّبَ فَأَبْلَغَ، وَرَغَّبَ فَأَسْبَغَ، وَوَصَفَ لَكُمُ الدُّنْيَا وَانْقِطَاعَهَا، وَزَوَالَهَا وَانْتِقَالَهَا.

فَأَعْرِضُوا عَمَّا يُعْجِبُكُمْ فِيهَا لِقِلَّةِ مَا يَصْحَبُكُمْ مِنْهَا، أَقْرَبُ دَار

hatine brîn, vêca ji dest dana zarûkan ketîye şûna nêzîk bûn û hevdilî ya wan da û cida bûna ji hevjînan ketîye şûna hevaletî ya wan da; êdî ew ne fexra xwe dikin û ne zarokan tînin û ne hevdû dibînin û ne seha hev didin û ne jî digel yêk got û bêjê dikin (*an:* ne jî cîranetîya hev dikin). Vêca nixwe ey bendeyên Xwedê! Bitirsin wek tirsa wî yê nefsa xwe bindest kirî û pêşî li şehweta xwe girtî û pê ‘eqlê xwe dinêrê; çiko eve heqîqeta meselê ronahî ye û nîşan vedayî ye û rêk saf û durist e û rêçik serast û vekirî ye.

AXIFTINA 162

dinyayê li xwe girtîye û hûn haydane ji şukir kirinê ra û zikir li ser zimanê hewe ferz kirîye û şîreta teqwatî yê li hewe kirîye û ew kirîye xilaseka razî bûna xwe û ya ji xelkê xwestî ew e.

Teqwatî: Vêca teqwatî ya Xwedê bikin, ewê hûn li ber dîtina wî û ceynka (teqdîra) hewe di destê wî da û gohartin û goherîna hewe li ixtîyara wî da; eger hûn karek xef bikin ew pê zanê û eger hûn eşkere bikin ewê dinivîsê; bê şik ewî hinek parêzerên giranqedr (melaîket) ji bû vî karî danîne ku qet çi heqan (ne nivîsandî) nahêlin û qet ya batil û neheq jî nanivîsin.

Evê jî bizanin: Kesê ku teqwatî yê bikê wê Xwedê rêka xilas bûna ji fitnan li ber vekê û ronahî ya xilasî ya ji tarîtî yan bidîyê û ewî ji her û her ra bihêlê di nav wê ya lê xweştêda û ewî li bal xwe deynê li cihê hêjayî da; li cihekî ku taybetê wî bi xwe çêkirîye; sîbera wê ‘erşe û ronahî ya wê geşî ya razî bûna wî ye û zîyaretkerên wê melaîketên wî û hevalên wî Pêğemberên Xwedê ne, vêca ji zivirîngehê (me’adê) ra bilez bikevin û pêşîyê ji ecel bistînin, çiko we heye hêvîya mirovan bê birîn û ecel bighê wan û derîyê tewbê li ber wan bê girtin. Bê şik hûn bûne wek wa kesan, ewên pêş hewe da çûyîn û ji Xwedê

عَظَّمَ مِنْ نَفْسِهِ،
فَإِنَّهُ لَمْ يُخْفِ عَنْكُمْ شَيئاً مِنْ دِينِهِ،
وَلَمْ يَتْرُكْ شَيئاً رَضِيَهُ أَوْ كَرِهَهُ إِلاَّ
وَجَعَلَ لَهُ عَلَماً بَادِياً، وَآيَةً مُحْكَمَةً،
تَزْجُرُ عَنْهُ، أَوْ تَدْعُو إِلَيْهِ، فَرِضَاهُ
فِيما بَقِيَ وَاحِدٌ، وَسَخَطُهُ فِيما بَقِيَ
وَاحِدٌ.

وَاعْلَمُوا أَنَّهُ لَنْ يَرْضَى عَنْكُمْ
بِشَيءٍ سَخِطَهُ عَلَى مَنْ كَانَ
قَبْلَكُم، وَلَنْ يَسْخَطَ عَلَيْكُمْ بِشَيْءٍ
رَضِيَهُ مِمَّنْ كَانَ قَبْلَكُمْ، وَإِنَّمَا
تَسِيرُونَ فِي أَثَرٍ بَيِّن، وَتَتَكَلَّمُونَ
بِرَجْعِ قَول قَدْ قَالَهُ الرِّجَالُ مِنْ
قَبْلِكُمْ، قَدْ كَفَاكُمْ مَؤُونَةَ دُنْيَاكُمْ،
وَحَثَّكُمْ عَلَى الشُّكْرِ، وَافْتَرَضَ مِنْ
أَلْسِنَتِكُمُ الذِّكْرَ.

وَأَوْصَاكُمْ بِالتَّقْوَى، وَجَعَلَهَا
مُنْتَهَى رِضَاهُ، وَحَاجَتَهُ مِنْ خَلْقِهِ.

[الوصية بالتقوى] فَاتَّقُوا اللهَ
الَّذِي أَنْتُمْ بِعَيْنِهِ، وَنَوَاصِيكُمْ بِيَدِهِ،
وَتَقَلُّبُكُمْ فِي قَبْضَتِهِ، إِن أَسْرَرْتُمْ
عَلِمَهُ، وَإِن أَعْلَنْتُمْ كَتَبَهُ، قَدْ وَكَّلَ
بِذلِكَ حَفَظَةً كِرَاماً، لاَ يُسْقِطُونَ

dixwazin ku ewan (li dinyayê) bizivirênê. Hûn ew rêwingî yên di rêda mayîne di malekî da ku ne mala heweye û fermana barkirinê ji bona hewe hatîye û emrê hewe hatîye kirin ku hûn qûtê xwe jê hilînin.

Evê bizanin ku evî çermê nazik sebir û taqeta agir nîne, vêca rehmê bi xwe bibin, çiko bi rastî hewe ew li musîbet û belayên dinyayê da ceribandî ye.

Gelo hewe bêtabî ya kesekî dîtîye ku stirîyek li bedena wî ra çûbê an şimitînê ew xûnî kiribê an koç hûrkên germ ew şewitand bin? Vêca wê li çi halî da bê dema bikevê di nav dû tebeqên agir da û hevxewê wî koç û hevalê wî şeytan?

Gelo hewe zanîye, dema **Malik**[77] ji agir di'enirê û xezeb digrê, ji ber xezeba wî agir biser hevda diçê û hevdû diperçiqênê? Û dema lê bikê qêrîn, ji tirsa qêrîna wî li nav dergehên wê da difûrihê?

Ey 'emirmendê pîr ku pîratîyê tu ji kar êxistîyî! Halê te çî ye û çawan e, dema tûq û zincîrên ji agir bi hestî yên stûê te ve bizeliqê û zincîrên agirî, gûştê li ser destê te xwarbê?

Vêca ey cima'eta 'evdan, Xwedê bînin bîra xwe, Xwedê!!! Pêşîya nexweşîyê da, niha ku hûn selamet in, pêşîya tengavîyê da ku berfirehî ji hewe ra heye. Ji bona xilasîya xwe, pêşîya wê da ku stûê hewe bikevê li girûwa

حَقّاً، وَلاَ يُثْبِتُونَ بَاطِلاً.

وَاعْلَمُوا أَنَّهُ مَنْ يَتَّقِ اللهَ يَجْعَلْ لَهُ مَخْرَجاً مِنَ الْفِتَنِ، وَنُوراً مِنَ الظُّلَمِ، وَيُخَلِّدْهُ فِيمَا اشْتَهَتْ نَفْسُهُ، وَيُنْزِلْهُ مَنْزِلَ الْكَرَامَةِ عِنْدَهُ، فِي دَارٍ اصْطَنَعَهَا لِنَفْسِهِ، ظِلُّهَا عَرْشُهُ، وَنُورُهَا بَهْجَتَهُ، وَزُوَّارُهَا مَلاَئِكَتُهُ، وَرُفَقَاؤُهَا رُسُلُهُ.

فَبَادِرُوا الْمَعَادَ، وَسَابِقُوا الآجَالَ، فَإِنَّ النَّاسَ يُوشِكُ أَنْ يَنْقَطِعَ بِهِمُ الأَمَلُ، وَيَرْهَقَهُمُ الأَجَلُ، وَيُسَدَّ عَنْهُمْ بَابُ التَّوْبَةِ، فَقَدْ أَصْبَحْتُمْ فِي مِثْلِ مَا سَأَلَ إِلَيْهِ الرَّجْعَةَ مَنْ كَانَ قَبْلَكُمْ، وَأَنْتُمْ بَنُو سَبِيلٍ، عَلَى سَفَرٍ مِنْ دَارٍ لَيْسَتْ بِدَارِكُمْ، وَقَدْ أُوذِنْتُمْ مِنهَا بِالارْتِحَالِ، وَأُمِرْتُمْ فِيهَا بِالزَّادِ.

وَاعْلَمُوا أَنَّهُ لَيْسَ لِهذَا الْجِلْدِ الرَّقِيقِ صَبْرٌ عَلَى النَّارِ، فَارْحَمُوا نُفُوسَكُمْ، فَإِنَّكُمْ قَدْ جَرَّبْتُمُوهَا فِي مَصَائِبِ الدُّنْيَا.

أَ فَرَأَيْتُمْ جَزَعَ أَحَدِكُمْ مِنَ الشَّوْكَةِ تُصِيبُهُ، وَالْعَثْرَةِ تُدْمِيهِ، وَالرَّمْضَاءِ تُحْرِقُهُ؟ فَكَيْفَ إِذَا كَانَ بَيْنَ طَابَقَيْنِ مِنْ نَارٍ، ضَجِيعَ حَجَرٍ،

‘emelê hewe da û êdî imkana xilasî yê tinebê bixebitin. Şevan çavê xwe vekirî bihêlin, zikê xwe ze’êf bihêlin û gava bavêjin (pêşda herin) û malê xwe di rêka Xwedê da bidin û ji kelaşê xwe vegirin û pê wê qencî yê digel rihê xwe bikin û li vê dan û sitandinê da bexîletî yê nekin, çiko Xwedayê Subhan dibêjê: ***“Eger hûn arîkarîya Xwedê bikin, wê ew arîkarîya hewe bikê û gavên hewe qayîm bikê”*** *(Muhemmed / 7)* û: ***“Ew kî ye ku deyn bidê Xwedê, deynek qenc, da vêca Xwedê, jê re ser ve zêde bikê û kiryek berketî jî jê re heye”*** *(Hedîd / 11)* vêca ne ji ber zelîl bûnê ye ku arîkarîyê ji hewe dixwazê û deyn xwestina wî ne ji ber kêm hebûnê ye, hewe ji arîkarî yê ra dixwazê halhale ji wî ra ye ‘eskerên ‘esmanan û ‘erdê û ew qewî û xweyê Ĥikmetê ye û deyn ji hewe dixwazê, halhale ji Wî ra ye xeznên ‘esmana û ‘erdê û ew e yê bê ihtîyac û hemdê Wî tê kirin. Evahe tinê ji ber wê ye ku irade kirîye “hewe biceribênê kanê kî ji hewe wê baş ‘emeltir bê”

Vêca ji bona ‘emel kirinê bilez bikevin da hûn digel cîranê Xwedê bin di malal wî da ku Xwedê Pêğemberên xwe kirine hevalên wan û melaîketên xwe ji zîyaret kirina wan ra rêdikê û gohê wan bi qedr êxistîye ku qet dengê

وَقَرِينَ شَيْطَانٍ؟!

أَعَلِمْتُمْ أَنَّ مَالِكاً إِذَا غَضِبَ عَلَى النَّارِ حَطَمَ بَعْضُهَا بَعْضاً لِغَضَبِهِ، وَإِذَا زَجَرَهَا تَوَثَّبَتْ بَيْنَ أَبوَابِهَا جَزَعاً مِنْ زَجْرَتِهِ؟!

أَيُّهَا الْيَفَنُ الْكَبِيرُ، الَّذِي قَدْ لَهَزَهُ الْقَتِيرُ، كَيْفَ أَنْتَ إِذَا الْتَحَمَتْ أَطْوَاقُ النَّارِ بِعِظَامِ الأَعْنَاقِ، وَنَشِبَتِ الجَوَامِعُ حَتَّى أَكَلَتْ لُحُومَ السَّوَاعِدِ؟

فَاللهَ اللهَ مَعْشَرَ الْعِبَادِ! وَأَنْتُمْ سَالِمُونَ فِي الصِّحَّةِ قَبْلَ السُّقْمِ، وَفِي الْفُسْحَةِ قَبْلَ الضِّيقِ، فَاسْعَوْا فِي فَكَاكِ رِقَابِكُمْ مِنْ قَبْلِ أَنْ تُغْلَقَ رَهَائِنُهَا، أَسْهِرُوا عُيُونَكُمْ، وَأَضْمِرُوا بُطُونَكُمْ، وَاسْتَعْمِلُوا أَقْدَامَكُمْ، وَأَنْفِقُوا أَمْوَالَكُمْ، وَخُذُوا مِنْ أَجْسَادِكُمْ تَجُودُوا بِهَا عَلَى أَنْفُسَكُمْ،

وَلاَ تَبْخَلُوا بِهَا عَنْهَا، فَقَدْ قَالَ اللهُ سُبْحَانَهُ: (إِنْ تَنْصُرُوا اللهَ يَنْصُرْكُمْ وَيُثَبِّتْ أَقْدَامَكُمْ)، وَقَالَ تَعَالَى: (مَنْ ذَا الَّذِي يُقْرِضُ اللهَ قَرْضاً حَسَناً فَيُضَاعِفَهُ لَهُ وَلَهُ أَجْرٌ

agir gohlê nebin û bedena wan paraztî ye ji wê çendê ku nerihetî û derd bighêtê ***"...evahe qencî û fezla Xwedê ye û didê wa yên ew bixwazê; Xwedê xweyê kerema mezin e"*** *(Hedîd / 21)*

Ez wê dibêjim ya hûn gohlê dibin, ez ji bona xwe û hewe arîkarîyê ji Xwedê dixwazim; ew besê me ye û qenc palgeh e ji bona xwe pê girtinê.

۞ AXIFTINA 184 ۞

Borcê korê Musehherê Tayî ku ji xewarican bo, bi awayek wereng ku Imam 'Elî gohlê bibê got: La ĥukme îlla lîllah - çi hukmek nîne xêncî hukmê Xwedê. Vêca ewî (s) gotê:

Hişbe, Xwedê rûyê te kirêt û bêmerês bikê, ey ewê didan ketî! Sond bi Xwedê, heqî eşkere bû û li wî halî da tu şikestî û lawaz û deng nizim bû *(Kinaye ye ji wê çendê ku te şexsîyet û kesayetîyek di nav komelê da neyî)* heta ku vêca qêrîn ji batil hat tu derketî, wek derketina şaxê bizinê.

۞ AXIFTINA 185 ۞

Ĥemdê Xwedê: Hemd ji Xuda re, ewê hewas ewî derk nakin û cih û mekan ewî di xwe da nagirin û çav ewî nabînin û çi perde ewî xef nakin. Pê hadis bûna mexlûqê xwe rênimûnî dikê li ser qedîm bûna xwe û pê çêkirina

كَرِيمٌ)، فَلَمْ يَسْتَنْصِرْكُمْ مِنْ ذُلٍّ، وَلَمْ يَسْتَقْرِضْكُمْ مِنْ قُلٍّ، اسْتَنْصَرَكُمْ وَلَهُ جُنُودُ السَّماوَاتِ وَالأَرْضِ وَهُوَ الْعَزِيزُ الْحَكِيمُ، وَاسْتَقْرَضَكُمْ وَلَهُ خَزَائِنُ السَّماوَاتِ وَالأَرْضِ وَهُوَ الْغَنِيُّ الْحَمِيدُ، وَإِنَّمَا أَرَادَ أَنْ (يَبْلُوَكُمْ أَيُّكُمْ أَحْسَنُ عَمَلاً)

فَبَادِرُوا بِأَعْمَالِكُمْ تَكُونُوا مَعَ جِيرَانِ اللهِ فِي دَارِهِ، رَافَقَ بِهِمْ رُسُلَهُ، وَأَزَارَهُمْ مَلاَئِكَتَهُ، وَأَكْرَمَ أَسْمَاعَهُمْ أَنْ تَسْمَعَ حَسِيسَ نَارٍ أَبَداً، وَصَانَ أَجْسَادَهَمْ أَنْ تَلْقَى لُغُوباً وَنَصَباً، (ذلِكَ فَضْلُ اللهِ يُؤْتِيهِ مَنْ يَشَاءُ وَاللهُ ذُوالْفَضْلِ الْعَظِيمِ)

أَقُولُ مَا تَسْمَعُونَ، وَاللهُ الْمُسْتَعَانُ عَلى نَفْسِي وَأَنْفُسِكُمْ، وَهُوَ حَسْبُنَا وَنِعْمَ الْوَكِيلُ!

[184]

ومن كلام له عليه السلام قاله للبرج بن مسهر الطائي، وقد قال

له بحيث يسمعه: لا حكم إلاَّ لله،
وكان من الخوارج:
اسْكُتْ قَبَحَكَ اللهُ يَا أَثْرَمُ،
فَوَاللهِ لَقَدْ ظَهَرَ الْحَقُّ فَكُنْتَ فِيهِ
ضَئِيلاً شَخْصُكَ، خَفِيّاً صَوْتُكَ،
حَتَّى إِذَا نَعَرَ الْبَاطِلُ نَجَمْتَ نُجُومَ
قَرْنِ الْمَاعِزِ.

wan hebûna xwe nîşan didê û pê wek hevbûna mexlûqê xwe, dîyar dikê (dixweyhênê) ku çi tiştên wek wî nînin. Ew Xwedayê ku li we'de dana xwe da rastgo ye û bilindtir e ji wê çendê ku zulmê li 'evdê xwe bikê; li nav mexlûqê xweda 'edaletê radigrê û hukmê wî li ser wan bi 'edalete. Çêbûna mexlûqan nîşan didê ku ew her hebûye û evahe ku ew bi nekarînê hatine nîşan kirin nîşana qudret û karîna wî ye û evahe ku ew mehkomê bi fenabûnê ne, nîşane ji wê çendê ra ku ew wê her hebê. Ew yêke lê ne bi şiklê êjmar ê; her heye lê ne li zeman da; xwe ragire lê ne pê palgehan; hizir û bîr pê dihesin lê ne pê hiss û lê ketinê, ewa tê dîtin hemî şahide li ser hebûna wî lê ne bi şiklê ku hazir bibê (bi çavan bê dîtin); fikir û xîyal nikarin ewî dixwe da ragirin lê belê ronahîyek da ku bi wucûda wî i'tirafê bikin û bi fikir bighên wê desthatê ku hizir nikarin ewî ihate bikin û hekemiyeta vê çendê jî bi hêvîya wê ve hişt. Mezinahî ya wî neweye ku jêra xilasek hebê da vêca pê hebûna cismê mezin jê bê axiftin 'ezemeta wî ne bi wî awayî ye ku bedenek mezin jê re hebê da ku bê gotin bedenek bê hesab mezin heye. Belkî ev e ku mezine di meqam û qudreta xwe da.

[185]

[حمد الله تعالى]

الْحَمْدُ لله الَّذِي لاَ تُدْرِكُهُ الشَّوَاهِدُ، وَلاَ تَحْوِيهِ الْمَشَاهِدُ، وَلاَ تَرَاهُ النَّوَاظِرُ، وَلاَ تَحْجُبُهُ السَّوَاتِرُ، الدَّالِّ عَلَى قِدَمِهِ بِحُدُوثِ خَلْقِهِ، وَبِحُدُوثِ خَلْقِهِ عَلَى وجُودِهِ، وَبِاشْتِبَاهِهِمْ عَلَى أَنْ لاَ شَبَهَ لَهُ، الَّذِي صَدَقَ فِي مِيعَادِهِ، وَارْتَفَعَ عَنْ ظُلْمِ عِبَادِهِ، وَقَامَ بِالْقِسطِ فِي خَلْقِهِ، وَعَدَلَ عَلَيْهِمْ فِي حُكْمِهِ، مُسْتَشْهِدٌ بِحُدُوثِ الأَشْيَاءِ عَلَى أَزَلِيَّتِهِ، وَبِمَا وَسَمَهَا بِهِ مِنَ الْعَجْزِ عَلَى

Behsa Pêğember (s) : Ez şehde didim ku Muhemmed bende û resûlê wî yê bijartî ye û emînê wî yê ew pê razî ye ku selat û selamên Xwedê li ser wî û binemala wî bin; ew pê delîlên bira (sabit) û pê çûna wê lazim û serketinek eşkere û rêka ronahî hinart, vêca ewî risaleta xwe teblîx kir (ragihand) û pê wê heq û batil ji hev veqetandin û cida kirin û xelk êxistin ser rêka rast û ew bi xwe rêberê wan bî, alayên rê rastker vedan û çirayên ronahî berdanê (hilkirin) û werîsên Islamê qewî kirin û çekalên îmanê muhkem kirin.

... *Afirandina mêrûyê:* Eger li wê qudreta mezin û mezinahî ya ni'metê da fikir bikiran, wê li rêka durist bizivirîna û ji 'ezabê bi şewat bitirsîyan, lê belê dil nexweş in û kêmasî di çavan da heye; ma nanêrin li wî mexlûqê Xwedê yê biçûk kanê çawa ew binecî çêkirîye û bi hûstahî rêk xistîye û jê re çav û goh çêkirine û çerm û hestî jê re danîne. Li mêrûyê binêrin, pê wê bedena hûrik û şiklê nazik; ew qas hûrik ku hema hema bi nêrîna çav neyê dîtin û bi hêza fikrê, xilqeta wê neyê tesewur kirin; ew çawa li ser 'erdê rêve diçê û rizqê xwe bi destve tênê û liban dikêşê bi alîyê kuna xwe ve û li 'enbarê da xwey dike; li

قُدْرَتِهِ، وَبِمَا اضْطَرَّهَا إِلَيْهِ مِنَ الْفَنَاءِ عَلَى دَوَامِهِ، وَاحِدٌ لاَ بِعَدَدٍ، وَدَائِمٌ لاَ بِأَمَدٍ، وَقَائِمٌ لاَ بِعَمَدٍ، تَتَلَقَّاهُ الأَذْهَانُ لاَ بِمُشَاعَرَةٍ، وَتَشْهَدُ لَهُ الْمَرَائِي لاَ بِمُحَاضَرَةٍ، لَمْ تُحِطْ بِهِ الأَوْهَامُ، بَلْ تَجَلَّى لَهَا بِهَا، وَبِهَا امْتَنَعَ مِنهَا، وَإِلَيْهَا حَاكَمَهَا، لَيْسَ بِذِي كِبَرٍ امْتَدَّتْ بِهِ النِّهَايَاتُ فَكَبَّرَتْهُ تَجْسِيماً، وَلاَ بِذِي عِظَمٍ تَنَاهَتْ بِهِ الْغَايَاتُ فَعَظَّمَتْهُ تَجْسِيداً بَلْ كَبُرَ شَأْناً، وَعَظُمَ سُلْطَاناً.

[الرسول الاعظم] وَأَشْهَدُ أَنَّ مُحَمَّداً عَبْدُهُ الصَّفِيُّ، وَأَمِينُهُ الرَّضِيُّ(صلى الله عليه وآله وسلم) أَرْسَلَهُ بِوُجُوبِ الْحُجَجِ، وَظُهُورِ الْفَلَجِ، وَإِيضَاحِ الْمَنْهَجِ، فَبَلَّغَ الرِّسَالَةَ صَادِعاً بِهَا، وَحَمَلَ عَلَى الْمَحَجَّةِ دالاًّ عَلَيْهَا، وَأَقَامَ أَعْلاَمَ الاْهْتِدَاءِ وَمَنَارَ الضِّيَاءِ، وَجَعَلَ أَمْرَاسَ الاْسْلاَمِ مَتِينَةً،

fesla germayê da ji bona wextê serma xwe liba didê hev (berhev dikê) û dema ji cihê xwe derdikevê dizanê wê çewan lê bizivirê. Xwedê rizqê wê li xwe girtîye û ew tişta munasibê halê wê bê dayî yê. Ew Xwedayê xudan qencî ji wê xafil nabê, ew Xwedayê kirêder (ewê kirh û ucretê didê), ewê bê behr (mehrûm) nakê herçend ku li ser teht û berê hişk bê ku tiştek li ser heşîn nabê (dîsa rizqê wê didê).

Eger tu fikir bikî li cihê xarina wê têda diçê xarê, ji serî bigire heta binî û di kerkerûşk û pirasî yên li nav zikê wê da û li dû çav û gohên li serê wê da, tu dê ji ber afirandin û xilqeta wê bikevî nav ‘ecêban ra û li jê axiftina wê da tu dê bikevî zehmetê.

Vêca nixwe bilind mertebeye ew Xwedayê ew li ser pî yên wê rawestandî û li ser sitûnên bedena wê deynayî û li afirandina wê da qe çi xaliqek nebûyî şirîkê wî û kesî li çêkirina wê da arîkarîya wî nekirî.

Eger tu pê fikra xwe geşt û seyranekî bikî da tu bighêy xilaseka meselê, tu dê bighêy evê destahtê ku xaliqê mêrûyê hema xaliqê dara xurmayê ye jî, ji ber wê zerafeta cidakirina her tiştekî ji ya dî û ibhama ku li newek yêk bûna

وَعُرَا الأيمَانِ وَثِيقَةً.

منها:

وَلَوْ فَكَّروا فِي عَظِيمِ الْقُـدْرَةِ، وَجَسِـيمِ النِّعْمَـةِ، لَرَجَعُـوا إِلَـى الطَّرِيقِ، وَخَافُوا عَذَابَ الْحَرِيـقِ، وَلَكِنَّ الْقُلُوبَ عَلِيلَـةٌ، وَالأَبْصَـارَ مَدْخُولَةٌ!

أَلاَ تَنْظُـرُونَ إِلَـى صَـغِيرِ مَـا خَلَقَ اللهُ، كَيْـفَ أَحْكَـمَ خَلْقَـهُ، وَأَتْقَنَ تَرْكِيبَهُ، وَفَلَقَ لَـهُ السَّـمْعَ وَالْبَصَرَ، وَسَوَّى لَهُ الْعَظْمَ وَالْبَشَرَ!. انْظُـرُوا إِلَـى النَّمْلَـةِ فِـي صِـغَرِ جُثَّتِهَا، وَلَطَافَـةِ هَيْئَتِهَـا، لاَ تَكَـادُ تُنَالُ بِلَحْظِ الْبَصَرِ، وَلاَ بِمُسْتَدْرَكِ الْفِكَرِ، كَيْفَ دَبَّتْ عَلَـى أَرْضِـهَا، وَصَبَتْ عَلَى رِزْقِهَا، تَنْقُلُ الْحَبَّـةَ إِلَـى جُحْرِهَـا، وَتُعِـدُّهَا فِـي مُسْتَقَرِّهَا. تَجْمَعُ فِي حَرِّهَا لِبَرْدِهَا، وَفِي وُرُودِهَا لِصَـدَرِهَا، مَكْفُـولٌ بِرِزْقِهَا، مَرْزُوقَةٌ بِوِفْقِهَا، لاَ يُغْفِلُهَا الْمَنَّانُ، وَلاَ يَحْرِمُهَا الـدَّيَّانُ، وَلَـوْ فِـي الصَّـفَا الْيَـابِسِ، وَالْحَجَـرِ الْجَامِسِ!

وَلَوْ فَكَّرْتَ فِي مَجَارِي أَكْلِهَـا،

candaran da heyî (ixtilafa di nav candaran da heyî ji mirov ra baş ne eşkere ye); di wî halî da jî ya mezin û ya hûrik û ya giran û ya sivik û ya qewî û ya ze'êf, li xulqandinê da hemî wek hev in. Her wiha ye 'esman û hewa û ba û av.

Vêca binêre roj û heyvê û gîya û daran û li av û kevr û hat û çûa şev û rojê û peqîna eva behra û zehfî ya eva çîyan û bilindahîya wan û ji hev cida bûna luxeta û ixtilafa zimana. Vêca wey û nexweşî ji wî kesî ra ewê xaliq û teybîrderê wa inkar bikê! Ew guman dikin ku wek gîyayekîne bêy cûtîyar; û ji ne wek yêk çêkirina rûyê wan ra jî xaliqek tinehin û ji bona vê de'wa xwe jî qet çi delîl û huccet neanîne û ew tişta kirîn mejîyê xwe da jî çi serastîyek jê re nîne, ma gelo çi avahî bêy avaker çêdibin? Û çi kuştin (cinayet) bêy kujer (qatil û canî) çêdibin?

Xuliqandina kulîyê: Eger tu bixwazî jî, derheq kulîyê da biaxive; ji wê ra dû çavên sûr çêkirin û hedeqa çavên wê wek dû heyvên ronahî, ronahî kirin, ji wê ra gohek xef çêkir û devek serast û hissek bi hêz û dû didanên wisa (welê - wereng) ku her tiştekî pê wê bibirê û dû destên wek das a ku her tiştekî pê wê

وَفِـي عُلْوهَـا وَسُـفْلِهَا، وَمَـا فِـي الجَوْفِ مِنْ شَرَاسِيفِ بَطْنِهَا، وَمَـا فِي الـرَّأْسِ مِـنْ عَيْنِهَـا وَأُذُنِهَـا، لَقَضَيْتَ مِنْ خَلْقِهَا عَجَباً، وَلَقِيـتَ مِنْ وَصْفِهَا تَعَباً!

فَتَعَـالَى الَّـذِي أَقَامَهَـا عَلَـى قَوَائِمِهَا، وَبَنَاهَا عَلَى دَعَائِمِهَا! لَـمْ يَشْرَكْهُ فِي فِطْرَتِهَـا فَـاطِرٌ، وَلَـمْ يُعِنْهُ عَلَى خَلْقِهَا قَادِرٌ.

وَلَـوْ ضَـرَبْتَ فِـي مَـذَاهِبِ فِكْرِكَ لِتَبْلُـغَ غَايَاتِـهِ، مَـا دَلَّتْـكَ الدَّلَالَةُ إِلاَّ عَلَى أَنَّ فَـاطِرَ النَّمْلَـةِ هُوَ فَاطِرُ النَّخْلَةِ، لِـدَقِيقِ تَفْصِـيلِ كُلِّ شَيْءٍ، وَغَامِضِ اخْتِلاَفِ كُـلِّ حَـيٍّ، وَمَـا الْجَلِيـلُ وَاللَّطِيـفُ، وَالثَّقِيـلُ والخَفِيـفُ، وَالْقَـوِيُّ وَالضَّعِيفُ، فِي خَلْقِـهِ إِلاَّ سَـوَاءً. وَكَذلِكَ السَّماءُ وَالْهَوَاءُ وَالرِّيَـاحُ وَالْمَاءُ.

فَانْظُرْ إِلَى الشَّـمْسِ وَالْقَمَـرِ، وَالنَّبَاتِ وَالشَّجَرِ، وَالْمَاءِ وَالْحَجَرِ، وَاخْـتِلاَفِ هـذَا اللَّيْـلِ وَالنَّهَـارِ، وَتَفَجُّرِ هذِهِ الْبِحَارِ، وَكَثْـرَةِ هـذِهِ الْجِبَـالِ، وَطُـولِ هـذِهِ الْقِـلاَلِ،

bigirê, cûtîyar derheq çandinahî ya xwe da ji wê ditirsin û eger hemî arîkarên xwe jî kom bikin nikarin ewan ji wê derê dûr bikin. Ew li ser meyla xwe dikevin nav çandinahî yê û çî ya bixwazin dixun, halhale ew hemî pêkve ne qasî tilîyek zirave.

Vêca bilind mertebeye ew Xwedayê jê re şikestîne heçîya li ‘esmana û ‘erdê da heyî, çi bivên û çi nevên û rûyê xwe jê re datînin û bi ’erdêve tînin û ji ber teslîm bûn û ze’êfîya xwe hemî fermanê jê dibin û ji tirsan serpêşîyê didin wî.

Vêca firinde bin emrê wî de ne û ew ji êjmara pirtikên wan û nefes kêşanên wan agahe; pîyê wan danîye ser cihê şil û hişk (hnek avî û hinek ne avî çêkirine) û rizqê wan veqetandî ye û qismê wan êjmartîye. Vêca ev Qir e û ya dî kelaş xwer û ewa dî kevûk e û ya dî devemrîşk. Her firindeyek bi nav gazî kirê û rizqê wê li xwe girt.

‘Ewrên giran çêkirin û baranên bi dewam ji wan rijandin û behra her cihekî ji wê kifş kir, ‘erdek ku hişk bûye bi wê av da û piştî hişksalî yê têda gîya şîn kir.

وَتَفَـرُّق هـذِهِ اللُّغَـاتِ وَالأَلْسُـنِ الْـمُخْتَلِفَاتِ. فَالوَيْلُ لِمَـنْ جَحَـدَ الْمُقَدِّرَ، وَأَنْكَرَ الْمُدَبِّرَ! زَعَمُوا أَنَّهُمْ كَالنَّبَـاتِ مَـا لَهُـمْ زَارِعٌ، وَلاَ لاِخْـتِلاَفِ صُـوَرِهِمْ صَـانِعٌ، وَلَـمْ يَلْجَأُوا إِلَى حُجَّة فِيما ادَّعَـوا، وَلاَ تَحْقِيق لِمَا أَوْعَوْا، وَهَلْ يَكُونُ بِنَاءٌ مِنْ غَيْرِ بَان، أَوْ جِنَايَـةٌ مِـن غَيْـرِ جَان؟!

[خلقة الجرادة] وَإِنْ شِئْتَ قُلْتَ فِي الْجَرَادَةِ، إِذْ خَلَـقَ لَهَـا عَيْنَـيْنِ حَمْرَ اوَيْنِ، وَأَسْرَجَ لَهَـا حَـدَقَتَيْنِ قَمْـرَاوَيْنِ، وَجَعَـلَ لَهَـا السَّـمْعَ الْخَفِيَّ، وَفَتَحَ لَهَـا الْفَـمَ السَّـوِيَّ، وَجَعَلَ لَهَا الْحِسَّ الْقَـوِيَّ، وَنَـابَيْنِ بِهِمَـا تَقْـرِضُ، وَمِنْجَلَـيْنِ بِهِمَـا تَقْبِضُ، يَرْهَبُهَا الزُّرَّاعُ فِي زَرْعِهِـمْ، وَلاَ يَسْتَطِيعُونَ ذَبَّهَا، وَلَـوْ أَجْلَبُـوا بِجَمْعِهِم، حَتَّى تَـرِدَ الْحَـرْثَ فِـي نَزَوَاتِهَا، وَتَقْضِـي مِنْـهُ شَـهَوَاتِهَا، وَخَلْقُهَـا كُلُّـهُ لاَ يُكَـوِّنُ إِصْـبَعاً مُسْتَدِقَّةً.

فَتَبَارَكَ اللهُ الَّذِي (يَسْجُدُ لَهُ مَنْ فِـي السَّـماوَاتِ وَالأَرْضِ طَوْعـاً وَكَرْهاً)، وَيُعَفِّرُ لَـهُ خَـدّاً وَوَجْهـاً، وَيُلْقِي بِالْطَّاعَةِ إِلَيْهِ سِلْماً وَضَـعْفاً،

وَيُعْطِي الْقِيَادَ رَهْبَةً وَخَوْفاً!

فَالطَّيْرُ مُسَخَّرَةٌ لِاَمْرِهِ، أَحْصَى عَدَدَ الرِّيشِ مِنْهَا وَالنَّفَسَ، وَأَرْسَى قَوَائِمَهَا عَلَى النَّدَى وَالْيَبَسِ، قَدَّرَ أَقْوَاتَهَا، وَأَحْصَى أَجْنَاسَهَا، فَهذَا غُرابٌ وَهذَا عُقَابٌ، وَهذَا حَمَامٌ وَهذَا نَعَامٌ، دَعَا كُلَّ طَائِر بَاسْمِهِ، وَكَفَلَ لَهُ بِرِزْقِهِ.

وَأَنْشَأَ (السَّحَابَ الثِّقَالَ)، فَأَهْطَلَ دِيَمَهَا، وَعَدَّدَ قِسَمَهَا، فَبَلَّ الأَرْضَ بَعْدَ جُفُوفِهَا، وَأَخْرَجَ نَبْتَهَا بَعْدَ جُدُوبِهَا.

⟐ AXIFTINA 186 ⟐

Derheq tewhîdê da ye, li vê axiftinê de ji hinek esasên zanînê hatine axiftin ku di xutbên dî da ewqas nehatine kom kirin.

Nasandina Xwedê: Kesê çewanîyekî jê re hesab bikê ewî ew tek û tinê ne zanîye; negihaye heqîqeta wî ewê jê re himberekî guman bike; kesê ewî bişubhênê tiştekî ewî berê xwe nedaye wî; kesê tilîya xwe balêve bikê (işare bikê balêve) û li xîyala xwe da bigirê ewî ew qest nekirîye. Heçî tişta bi zatê xwe bê nas kirin ew hatîye çêkirin û mexlûqe û heçî xwe ragirî ya wî bi tiştek dîve girê dayî bê ew me'lûle (ji tiştekî çêbuye).

Xwedê fa'il û kirinkere lê ne pê bi kar birina alet û wesîlan, dênerê qas û qeyda ye lê ne pê hizir kirinê, bê ihtîyac û dewlemende lê ne pê istifade kirina ji hinek dî. Wext û zeman hevaletî ya wî nakin û jê re nîne, alet û wesîle ji wî ra ne arîkarin; hebûna wî pêşîya wext û zemana da û wucûda wî pêş tinebûnê da bûye û ji bona her hebûna wî (ezelîyet) despêkek tinebûye. Pê çêkirina wesîlên pê heshanê, tê zanîn ku ev hiss di wî da nînin, pê danîna dijatî yê li nav tişta da, tê zanîn ku ewî dij nînin, pê danîna tiştan li kêleka hev da û digel yêk, nîşan daye ku ewî heval nînin, ronahî li dijê tarîtî yê da; nekifşe li dijê eşkereyî da;

[**186**]

في التوحيدوتجمع هذه الخطبة من أصول العلوم ما لا تجمعه خطبة

مَا وَحَّدَهُ مَنْ كَيَّفَهُ، وَلاَ حَقِيقَتَهُ أَصَابَ مَنْ مَثَّلَهُ، وَلاَ إِيَّاهُ عَنَى مَنْ شَبَّهَهُ، وَلاَ صَمَدَهُ مَنْ أَشَارَ إِلَيْهِ وَتَوَهَّمَهُ. كُلُّ مَعْرُوف بِنَفْسِهِ مَصْنُوعٌ،

şilî li dijê zowahî yê da û serma li beraberê germayê da danîye. Nav beyna tiştên rêk neketî digel hev, rêk ketin çêkir û tiştên ji hev cida li kêleka hev da danîn û yên ji hev dûr nêzîkê hev kirin û yên nêzîk ji hev dûr kirin.

Çi hed û hudûd ewî di xweda nagirin û pê çi êjmaran nayê êjmartin, pîvek û sînor ji tiştên (maddî yên) wek xwe ra heddekî datînin û pê wesîle û aletan işare tê kirin bal tiştên wek wan tinê ve; evahe ku bê gotin: “j wî wextî ve” pêşî yê li qedîm bûna wî digrê, evahe ku tê gotin: “muheqeq çêbiye” pêşî yê li wê çendê digrê ku ezelî bê, gotina “eger ne wuha bûya” ewî ji kemalê dûr têxê.

Xaliq pê çêkirinê ji ‘eqlan ra eşkere bî û pê vê xulqandinê ye ku pêşî li çavan hatîye girtin û nikarin ewî bibînin, ne jê re tê gotin sekinyîye ne jî tê gotin li halê hereketê da ye, çawa wê wisa bê di halekî da ku ewî ew (hereket û skûn) rêk xistîye; çawa wê ew bizivirê nav wê ya ewî bi xwe çêkirî da, an ewa wî bi xwe çêkirî li wî da peyda bibê, hingê wê goherîn bikevê zatê Xwedê û heqîqeta wî, wê piç û qet jê re hebin û pêşî yê li ezelî bûna wî bigirê. Eger ewî rûyek (berahî) hebê wê pişt jî jê re hebê, vêca li vî halî da wê kêmasî jê re hebê û muhtacê kemalê bê; û hingê wê nîşanên mexlûq bûnê têda hebin û

وَكُلُّ قَائِم فِي سِوَاهُ مَعْلُولٌ.

فَاعِـلٌ لاَ بِاضْـطِرَابِ آلَـة، مُقَدِّرٌ لاَ بِجَـوْلِ فِكْـرَة، غَنِـيٌّ لاَ بِاسْتِفَادَة. لاَ تَصْـحَبُهُ الأَوْقَـاتُ، وَلاَ تَرْفِـدُهُ الأَدَوَاتُ، سَـبَقَ الأَوْقَاتَ كَوْنُهُ، وَالْعَدَمَ وُجُـودُهُ، وَالابْتِدَاءَ أَزَلُهُ. بِتَشْعِيرِهِ الْمَشَاعِرَ عُرِفَ أَنْ لاَ مَشْعَرَ لَهُ، وَبِمُضَادَّتِهِ بَيْنَ الأُمُورِ عُرِفَ أَنْ لاَ ضِدَّ لَـهُ، وَبِمُقَارَنَتِهِ بَيْنَ الأَشْيَاءِ عُـرِفَ أَنْ لاَ قَرِينَ لَهُ. ضَادَّ النُّورَ بِالظُّلْمَـةِ، وَالْوُضُـوحَ بِالْبُهْمَـةِ، وَالْجُمُـودَ بِالْبَلَلِ، وَالْحَرُورَ بِالصَّرَدِ.مُؤَلِّـفٌ بَـيْنَ مُتَعَادِيَاتِهَـا، مُقَـارِنٌ بَـيْنَ مُتَبَايِنَاتِهَا، مُقَرِّبٌ بَيْنَ مُتَبَاعِداتِهَا، مُفَرِّقٌ بَيْنَ مُتَدَانِيَاتِهَا.

لاَ يُشْمَلُ بِحَدّ، وَلاَ يُحْسَـبُ بِعَـدٍّ، وَإِنَّمَـا تَحُـدُّ الأَدَوَاتُ أَنْفُسَـهَا، وَتُشِـيرُ الآلاَتُ إِلَـى نَظَائِرِهَا، مَنَعَتْهَا «مُنْـذُ» الْقِدْمَـةَ،

ew bi xwe wek wa tiştên lê bê ku delîlin ji bûna hebûna wî, halhale ew bi xwe ew e yê mexlûq dibûna delîl ji bona hebûna wî, qudret û hukmeta wî mani'ê wê çendê ye ku ewa eserekî deynê ser mexlûqê wî eserê li ser wî jî deynê.

Ewê ne goherîn jê re heyî û ne zewal û ne winda bûn. Tiştek jê venabê (zarûkan naynê) da vêca ew jî ji tiştekî çêbûbê; û ji tiştekî çênebye da mehdûd û sînor kirî bê, bilindtir e ji wê çendê ku korên wî hebin û pake ji têkelîya jinan.

Wehm nikarin ewî di xwe da bigrin heta qeydeyekî jê re deynin û 'eqlên jîr (jê hatî -tîj fêhm) nagihênê da vêca ewî li zêhnê xwe da bigrin û hewas ewî derk nakin da vêca ew bê his kirin û dest nikarin pêve bên birin da vêca lê bikevin û goherîn nakevê halê wî û vegohaztin nakevê ehwalê wî û şev û roj ewî narizînin û ji hev naêxên û ronahî û tarîtî goherînê jê re çênakin û pê piç û endaman jê nayê axiftin û sifetê wî pê qetên bedenê nayê dayîn û jê re nayê gotin ku wiha û wiha lê qewmî û nayê gotin tiştek piçeke ji wî; jê re nayê gotin: Hed û sînorê wî an nihayeta wî; ne xilasek jê re heye û ne axrîk; nayê gotin: Li hinek tişta da ye ku ewî bilind dikin an tînin xarê, an tiştekî ew hilgirtîye da bi alîyekîve

وَحَمَتْهَا «قَدُ» الأَزَلِيَّـةَ، وَجَنَّبَتْهَـا «لَوْلاَ» التَّكْمِلَةَ!

بِهَا تَجَلَّى صَانِعُهَا لِلْعُقُول، وَبِهَا امْتَنَعَ عَنْ نَظَـرِ الْعُيُـونِ. لاَ يَجْرِي عَلَيْهِ السُّكُونُ وَالْحَرَكَـةُ، وَكَيْفَ يَجْرِي عَلَيْهِ مَا هُوَ أَجْرَاهُ، وَيَعُودُ فِيهِ مَا هُوَ أَبْدَاهُ، وَيَحْدُثُ فِيهِ مَا هُوَ أَحْدَثَهُ ؟! إِذاً لَتَفَاوَتَتْ ذَاتُهُ، وَلَتَجَزَّأَ كُنْهُهُ، وَلاَمْتَنَعَ مِـنَ الأَزَلِ مَعْنَاهُ، وَلَكَانَ لَـهُ وَرَاءٌ إِذْ وُجِدَ لَهُ أَمَامٌ، وَلاَلْـتَمَسَ الـتَّمَامَ إِذْ لَزِمَهُ النُّقْصَـانُ. وَإِذاً لَقَامَـتْ آيَةُ الْمَصْنُوعِ فِيهِ، وَلَتَحَوَّلَ دَلِيلاً بَعْدَ أَنْ كَانَ مَدْلُولاً عَلَيْهِ، وَخَرَجَ بِسُلْطَانِ الاْمْتِنَاعِ مِنْ أَنْ يُؤَثِّرَ فِيهِ مَا يُؤَثِّرُ فِي غَيْرِهِ.

الَّذِي لاَ يَحُولُ وَلاَ يَزُولُ، وَلاَ يَجُوزُ عَلَيْهِ الأُفُولُ. لَمْ يَلِدْ فَيَكُونَ مَوْلُوداً، وَلَمْ يُولَدْ فَيَصِيرَ مَحْدُوداً، جَلَّ عَنِ اتِّخَاذِ الأَبْنَاءِ، وَطَهُرَ عَنْ مُلاَمَسَةِ النِّسَاءِ.

لاَ تَنَالُهُ الأَوْهَامُ فَتُقَـدِّرَهُ، وَلاَ

xwehr bikê an rast bihêlê. Ne di nav tiştan da ye, ne jî ji derveyê wan da. Xeber didê, lê ne pê ziman an zimanê biçûkê li binê gerîyê da, gohlê dibê lê ne pê kun (an: Kelş) û wesîlên gohlê bûnê, daxivê lê belê ne pê bikar birina kelîman û şixulandina ziman, diparêzê lê ne bi zehmet, irade dikê, lê ne ku di hizra xwe ra derbaz bikê, hez kirin û razî bûn her dû jê re hene, lê ne ji ber dil nazikî yê, hem kerb û hem xezeb jê re heye, lê bêy zehmet, heçî tişta bixwazê hebê, dibêjîyê: "çêbe" vêca hema di cih da çêdibê, lê ev gotina wî ne dengeke ku li goha bikevê û ne gazîyeke ku bê seh kirin; kelamê Xwedayê subhan ew kare ku ji wî çêdibê û şiklekî bi xwe digrê ku pêşîyê da ew nebî; eger ew fi'l ji kevin da hebûya wê ew bibîya Xwedayê dûwê.

Nayê gotin: Hebûna wî paş tinebûnê bûye, çiko hingê wê sifetên mexlûqan li ser bên carî kirin û ferq li nav beyna wî û wan da namînê û ji bûna wî çi zêdahî li ser wan namînê, vêca wê çêker û çêbûyî beraber bibin û xaliq û mexlûq wek hev lê bên.

Mexlûq afirand, bêy nimûneyekî ku şûn xêncî wîve mabê (şûnvemayî yê kesî ji xwere nekirîye nimûna xulqandinê) û li

تَتَوَهَّمُـهُ الْفِطَـنُ فَتُصَـوِّرَهُ، وَلاَ تُدْرِكُـهُ الْحَـوَاسُّ فَتُحِسَّـهُ، وَلاَ تَلْمِسُهُ الأَيْدِي فَتَمَسَّهُ. وَلاَ يَتَغَيَّرُ بِحَال، وَلاَ يَتَبَدَّلُ فِي الأَحْـوَال، وَلاَ تُبْلِيـهِ اللَّيَـالي وَالأَيَّـامُ، وَلاَ يُغَيِّـرُهُ الضِّـيَاءُ وَالظَّـلاَمُ، وَلاَ يُوصَفُ بِشَيء مِنَ الأَجْزَاء، وَلاَ بِـالجَوَارِحِ وَالأَعْضَـاء، وَلاَ بِعَـرَض مِـنَ الأَعْـرَاض، وَلاَ بِالْغَيْرِيَّةِ وَالأَبْعَاض. وَلاَ يُقَالُ: لَهُ حَدٌّ وَلاَ نِهَايَـةٌ، وَلاَ انقِطَـاعٌ وَلاَ غَايَـةٌ، وَلاَ أَنَّ الأَشْـيَاءَ تَحْوِيـهِ فَتُقِلَّـهُ أَوْ تُهْوِيَـهُ، أَوْ أَنَّ شَـيْئاً يَحْمِلُهُ، فَيُمِيلَهُ أَوْ يُعَدِّلَـهُ. لَـيْسَ فِـي الأَشْـيَاء بِـوَالِج، وَلاَ عَنْهَـا بِخَارِج. يُخْبِرُ لاَ بِلِسَان وَلَهوَات، وَيَسْـمَعُ لاَ بِخُـرُوق وَأَدَوَات، يَقُـولُ وَلاَ يَلْفِـظُ، وَيَحْفَـظُ وَلاَ يَتَحَفَّظُ، وَيُرِيدُ وَلاَ يُضْمِرُ. يُحِبُّ وَيَرْضَى مِنْ غَيْرِ رِقَّة، وَيُـبْغِضُ وَيَغْضَبُ مِنْ غَيْرِ مَشَـقَّة. يَقُـولُ لِمَا أَرَادَ كَوْنَهُ: (كُنْ فَيَكُونُ)، لاَ

afirandina wan da arîkarî ji çi yêk ji mexlûqê xwe negirtîye, ‘erd afirand û ew ragirt bêy wê çendê ku pêve mijûl bibê û li halê bê qerarî û hereketa wê da ew serast û bi cî kir û bêy hebûna pîyan ew rawestand û bêy sitûn ew bilind kir û ji xwehr û mherî yê parazt û pêşî li ketin û şeq bûna wê girt, singên wê qayîm kirin û çîyayên wê têda kutan û serkanî yên wê deranîn û herikandin, dûl û newalên wê vekirin, vêca ewa wî ava kirî ne siste û ya wî qewî kirî ne ze’îf û bê hêze. Ew bi qudret û mezinahî ya xwe ser mexlûqê xwe ketîye û ew e yê bi ‘ilm û nasîna xwe ji navdeyê tiştan agah û ser hemî tiştî ketî bi celal û ‘izzeta xwe. Heçî tişta ew bixwazê li xwestinê da nekar nabê û çi tişt nikarê nefermanî ya wî bikê da vêca ser wî bikevê û çi yên bilez û bez ji wî xilas nabin da vêca pêşî yê jê bistînin, ew ne muhtacê çi maldara ye da vêca rizqê wî bidin. Hemî tişt jê re şikestî û li beraberê mezinahî ya wî da zelîl û ketîne, kes nikarê ji bin hukumdarî ya wî derkevê û biçê bal kesek dî û xwe ji menfî’et û zerera wî paşda bigirê. Kes himberê wî nîne da xwe ber ra bikê û kes wek wî nîne da ku xwe wek wî bizanê.

Ewe yê mexlûqê xwe piştî çêkirinê ji

بِصَوْت يَقْرَعُ، وَلاَ بِنِدَاء يُسْمَعُ، وَإِنَّمَا كَلاَمُهُ سُبْحَانَهُ فِعْلٌ مِنْهُ أَنْشَأَهُ وَمَثَّلَهُ، لَمْ يَكُنْ مِنْ قَبْلِ ذلِكَ كَائِناً، وَلَوْ كَانَ قَدِيماً لَكَانَ إِلهاً ثَانِياً.

لاَ يُقَالُ: كَانَ بَعْدَ أَنْ لَمْ يَكُنْ، فَتَجْرِيَ عَلَيْهِ الصِّفَاتُ الْمُحْدَثَاتُ، وَلاَ يَكُونُ بَيْنَهَا وَبَيْنَهُ فَصْلٌ، وَلاَ لَهُ عَلَيْهَا فَضْلٌ، فَيَسْتَوِيَ الصَّانِعُ والْمَصْنُوعُ، وَيَتَكَافَأَ الْمُبْتَدَعُ وَالْبَدِيعُ.

خَلَقَ الْخَلاَئِقَ عَلَى غَيْرِ مِثَال خَلاَ مِنْ غَيْرِهِ، وَلَمْ يَسْتَعِنْ عَلَى خَلْقِهَا بِأَحَد مِنْ خَلْقِهِ. وَأَنْشَأَ الأَرْضَ فَأَمْسَكَهَا مِنْ غَيْرِ اشْتِغَال، وَأَرْسَاهَا عَلَى غَيْرِ قَرَار، وَأَقَامَهَا بِغَيْرِ قَوَائِمَ، وَرَفَعَهَا بِغَيْرِ دَعَائِمَ، وَحَصَّنَهَا مِنَ الأَوَدَ وَالاعْوِجَاجِ، وَمَنَعَهَا مِنَ التَّهَافُتِ وَالانْفِرَاجِ، أَرْسَى أَوْتَادَهَا، وَضَرَبَ أَسْدَادَهَا، وَاسْتَفَاضَ عُيُونَهَا، وَخَدَّ أَوْدِيَتَهَا، فَلَمْ يَهِنْ مَا بَنَاهُ، وَلاَ ضَعُفَ مَا

nav dibê bi awayek wereng ku hebûn û tine bûn ji bona wan wek hev lê bê.

Ji nav çûna dinyayê piştî çêkirina wê, ne ‘ecêbtir e ji çêkirina cara ewil, çawa wê newereng bê, halhale eger hemî candar, ji firinde û heywanên ‘erdê, çi ewên di gûv û paga da bin û çi ewên li çêrîngeha da ji her cins û new’ê heyîn û hemî mirov, çi bê sewad û nezan û çi jî ewên zîrek û jêhatî, hemî pêkve kom bibin da pêşûyekî çêkin û bixulqînin, wê nekarbin evê yêkê bikin û heta wê nekarin bizanin kanê çawa çêdibê jî; wê ‘eqlê wan şaş û heyrî bimînê derheq zanîna wê da û wê hêzên wa nekar bibin û bighên axirîkê û şikestî û westihayî paşve bizivirin û pê bihesin ku ew şikestin û iqrar bikin ku nikarin ewê çêkin û ji nav bibin.

Rastî ev e ku piştî ji nav birina dinyayê wê Xwedê tinê bimînê û kes digel wî namînê wek çawa hêca ew (dinya) çênekirî tek û tinê bî wê piştî ji nav birinê, dîsa welê bê; Ne wext û bêhnek û ne cî û mekanek û ne dem û zemanek; hingê wê muhlet û wext ji beyn biçin û sal û bêhn û zeman ji halê rabin û nemînin û tiştek xêncî Xwedayê qehhar û serketî -ewê hemî tişt li wî dizivirin- kes namînê; ev mexlûqê ku li

قَوَّاهُ. هُوَ الظَّاهِرُ عَلَيْهَا بِسُلْطَانِهِ وَعَظَمَتِهِ، وَهُوَ الْبَاطِنُ لَهَا بِعِلْمِهِ وَمَعْرِفَتِهِ، وَالْعَالِي عَلَى كُلِّ شَيْءٍ مِنهَا بِجَلاَلِهِ وَعِزَّتِهِ. لاَ يُعْجِزُهُ شَيْءٌ مِنْهَا طَلَبَهُ، وَلاَ يَمْتَنِعُ عَلَيْهِ فَيَغْلِبَهُ، وَلاَ يَفُوتُهُ السَّرِيعُ مِنْهَا فَيَسْبِقَهُ، وَلاَ يَحْتَاجُ إِلَى ذِي مَال فَيَرْزُقَهُ. خَضَعَتِ الأَشْيَاءُ لَهُ، وَذَلَّتْ مُسْتَكِينَةً لِعَظَمَتِهِ، لاَ تَسْتَطِيعُ الْهَرَبَ مِنْ سُلْطَانِهِ إِلَى غَيْرِهِ فَتَمْتَنِعَ مِنْ نَفْعِهِ وَضَرِّهِ، وَلاَ كُفؤَ لَهُ فَيُكَافِئَهُ، وَلاَ نَظِيرَ لَهُ فَيُسَاوِيَهُ.

هُوَ الْمُفْنِي لَهَا بَعْدَ وُجُودِهَا، حَتَّى يَصِيرَ مَوْجُودُهَا كَمَفْقُودِهَا.

وَلَيْسَ فَنَاءُ الدُّنْيَا بَعْدَ ابْتِدَاعِهَا بِأَعْجَبَ مِنْ إِنْشَائِهَا وَاخْتِرَاعِهَا، وَكَيفَ وَلَوْ اجْتَمَعَ جَمِيعُ حَيَوانِهَا مِنْ طَيْرِهَا وَبَهَائِمِهَا، ومَا كَانَ مِنْ مُرَاحِهَا وَسَائِمِهَا، وَأَصْنَافِ أَسْنَاخِهَا وَأَجْنَاسِهَا، وَمُتَبَلِّدَةِ أُمَمِهَا وَأَكْيَاسِهَا، عَلَى إِحْدَاثِ بَعُوضَة، مَا قَدَرَتْ عَلَى إِحْدَاثِهَا، وَلاَ عَرَفَتْ

wextê ewil hatî çêkirin çi qudret û karîn ji xwe nebî, ji nav çûn û fena bûna wan jî ne li destê wan da ye û nikarin pêşîyê lê bigrin, û eger bikarîya pêşî yê li fenaya xwe bigirê wê mayîn û hebûna wê dewam bikira.

Dema Xwedê des avêtî xulqandinê, afirandina çi tiştî jê re giran nebo û xulqandina wê ya ewî çêkirî ew ji kar neêxist û newestand. Ew çênekirin da li ser karîn û qudreta xwe ve zêde bikê an ji zewal û kêmasî yê bitirsihê, an bixwazê li biraberê himberek zêdexwaz, arîkarî yê ji wan bigirê, an li beraberê dijminê hêrişker da xwe biparêzê. Çêkirina mexlûqan ne ji ber wê çendê bî ku hukumdarî ya xwe berfireh bikê an li beraberê hevpişkekî da hevalan li xwe zêde bikê; ne ji ber wê çendê bî ku (ji ber tinêtî yê) ketbê dehşetê da pê xulqandina wan bêhna wî bi wan derkevê.

Piştî çêkirinê jî vêca wê ewa ji nav bibê, ne ji ber wê çendê ku westiha bê ji idare kirin û teybîr danê û ne ji ber wê çendê ku wê rihetî jê re çêbê û ne ku tiştek ji wê li ser wî giran bê.

Dewam kirin û dirêj bûna mayîna wê ewî melûl û neçar nakê da vêca ji bona ji navbirna wê bikevê lezê, belkî

كَيْفَ السَّبِيلُ إِلَى إِيجَادِهَا، وَلَتَحَيَّرَتْ عُقُولُهَا فِي عِلْمِ ذٰلِكَ وَتَاهَتْ، وَعَجِزَتْ قُوَاهَا وَتَنَاهَتْ، وَرَجَعَتْ خَاسِئَةً حَسِيرَةً، عَارِفَةً بِأَنَّهَا مَقْهُورَةٌ، مُقِرَّةً بِالْعَجْزِ عَنْ إِنْشَائِهَا، مُذْعِنَةً بِالضَّعْفِ عَنْ إِفْنَائِهَا؟!

وَإِنَّهُ سُبْحَانَهُ، يَعُودُ بَعْدَ فَنَاءِ الدُّنْيَا وَحْدَهُ لاَ شَيْءَ مَعَهُ، كَمَا كَانَ قَبْلَ ابْتِدَائِهَا، كَذٰلِكَ يَكُونُ بَعْدَ فَنَائِهَا، بِلاَ وَقْتٍ وَلاَ مَكَانٍ، وَلاَ حِينٍ وَلاَ زَمَانٍ، عُدِمَتْ عِنْدَ ذٰلِكَ الآجَالُ وَالأَوْقَاتُ، وَزَالَتِ السِّنُونَ وَالسَّاعَاتُ، فَلاَ شَيْءَ إِلاَّ الْوَاحِدُ الْقَهَّارُ الَّذِي إِلَيْهِ مَصِيرُ جَمِيعِ الأُمُورِ، بِلاَ قُدْرَةٍ مِنْهَا كَانَ ابْتِدَاءُ خَلْقِهَا، وَبِغَيْرِ امْتِنَاعٍ مِنْهَا كَانَ فَنَاؤُهَا، وَلَوْ قَدَرَتْ عَلَى الامْتِنَاعِ لَدَامَ بَقَاؤُهَا.

لَمْ يَتَكَاءَدْهُ صُنْعُ شَيْءٍ مِنْهَا إِذْ صَنَعَهُ، وَلَمْ يَؤُدْهُ مِنْهَا خَلْقُ مَا بَرَأَهُ وَخَلَقَهُ، وَلَمْ يُكَوِّنْهَا لِتَشْدِيدِ

Xwedayê pak bi lutfa xwe teybîra çêbûna wê dayê û bi fermana xwe ew ragirt û bi qudreta xwe ew binecî kir;

Piştî ji nav çûnê dîsa wê bizivirênê, bêy wê çendê ku ewî ihtîyac bi wê hebê, an pê hinek ji wê arîkarîyekî bigirê an goherînê bêxê hal û wez'ê xwe; ji dehşetê derkevê û bighê rihetî yê an ji nezanî û kûrîtî yê xilas bibê û bighê zanîn û bînayî yê, an ji feqîrî û ihtîyacî yê derkevê û bighê dewlemendî û pirdarîyê an ji zelîlî û kêmasîyê derkevê û bighê mezinahî û qudretê.

AXIFTINA 187

Qewmînên nexweş yên hêj neqewimyîn.

Heyhê, dê û babên min qurbana wan, ew komekin ku navê wan li 'esmana da nas kirî û meşhûre û li 'erdê da nenasin. Vêca hêvîya wê çendê bin ku karûbarên hewe pişt bidin û girêdanên hewe bên birîn û biçûktirê hewe kar bi dest bibin. Ew hingê ye ku birîna şûr ji mirovê mu'min ra rihet tir e ji destve anîna derhemekî ji malê helal; hingê ye ku kirîya ewê distênê mezintir e ji yê didê, ew hingê ye ku hûn ne pê 'ereqê belkî pê berfirehîya ni'metan serxweş

سُلْطَان، وَلاَ لِخَـوْف مِـنْ زَوَال وَنُقْصَان، وَلاَ لِلاسْتِعَانَةِ بِهَا عَلَى نِدٍّ مُكَاثِر، وَلاَ لِلاحْتِرَازِ بِهَا مِـنْ ضِدٍّ مُثَاوِر، وَلاَ لِلازْدِيَادِ بِهَا فِي مُلْكِهِ، وَلاَ لِمُكَاثَرَةِ شَـرِيك فِـي شِرْكِهِ، وَلاَ لِوَحْشَة كَانَـتْ مِنْـهُ، فَأَرَادَ أَنْ يَسْتَأْنِسَ إِلَيْهَا.

ثُمَّ هُوَ يُفْنِيهَا بَعْدَ تَكْوِينِهَـا، لاَ لِسَأَم دَخَلَ عَلَيْـهِ فِـي تَصْـرِيفِهَا وَتَدْبِيرِهَا، وَلاَ لِرَاحَة وَاصِلَة إِلَيْهِ، وَلاَ لِثِقَلِ شَيْء مِنْهَا عَلَيْهِ.

لاَ يُمِلُّهُ طُولُ بَقَائِهَـا فَيَـدْعُوَهُ إِلَى سُرْعَةِ إِفْنَائِهَا، لكِنَّهُ سُـبْحَانَهُ دَبَّرَهَا بِلُطْفِـهِ، وَأَمسَـكَهَا بِـأَمْرِهِ، وَأَتْقَنَهَا بِقُدْرَتِهِ.

ثُمَّ يُعِيدُهَا بَعْدَ الْفَنَاء مِنْ غَيْـرِ حَاجَـة مِنْـهُ إِلَيْهَـا، وَلاَ اسْـتِعَانَة بَشَيْء مِنْهَا عَلَيْهَا، وَلاَ لِانصِـرَاف مِـنْ حَـال وَحْشَـة إِلَـى حَـال اسْـتِئْنَاس، وَلاَ مِـنْ حَـال جَهْـل وَعَمىً إِلَى [حَال]عِلْم وَالْتمَاس، وَلاَ مِنْ فَقْر وَحَاجَـة إِلَـى غِنـىً

dibin û bê mecbûrîyet hûn sond dixun û bêy zehmet hûn derewan dikin. Hingê wê bela, hewe gez bikê û biêşênê wek çawa kurtan nav milê devê gez dikê û diêşênê; çiqa dirêj ev zehmetê hewe û berhêvîya xilasîya ji wê çiqa dûre.

Gelî mirovno! Hefsarê va dewarên barê giranê gonehên hewe hilgirtîn berdin û ji dûra mezinê xwe bilav nebin ku vêca hûn paşê behsa pîsatî ya karê hewe kirî, bikin û xwe neavêjin nav pêta agirê fitnê ra ku li beraberê hewe da ye û ji rêkên fitnê bizivirin û rêkê ji wê ra vale bikin, çiko, ez bi canê xwe kim; wê mirovê mu'min di nav pêta wê ra ji nav biçê û yê ne musliman wê li emanê da bê û selamet bimînê.

Mesela min li nav hewe da wek çiraya li tarîtî yê da ye, kesê bikevê wê tarîtî yê wê ji ronahî yê istifade bikê. Vêca gelî mirovno! Gohlê bibin û di hizra xwe da bigrin û gohê dilê xwe hazir bikin da hûn fêhm bikin.

AXIFTINA 188

Şîreta teqwatî yê: Gelî mirovno! Ez wesîyeta teqwatî ya Xwedê û sipasî ya

وَكَثْرَة، وَلاَ مِنْ ذُلٍّ وَضَعَة إِلَى عِزٍّ وَقُدْرَة.

[**187**]

تختصّ بذكر الملاحم

أَلاَ بِأَبِي وَأُمِّي، هُمْ مِنْ عِدَّة أَسْمَاؤُهُمْ فِي السَّماء مَعْرُوفَةٌ وَفِي الأَرْضِ مَجْهُولَةٌ.

أَلاَ فَتَوَقَّعُوا مَا يَكُونُ مِنْ إِدْبَارِ أُمُورِكُمْ، وَانْقِطَاعِ وُصَلِكُمْ، وَاسْتِعْمَالِ صِغَارِكُمْ:

ذاكَ حَيْثُ تَكُونُ ضَرْبَةُ السَّيْفِ عَلَى الْمُؤْمِنِ أَهْوَنَ مِنَ الدِّرْهَمِ مِنْ حِلِّهِ!

ذَاكَ حَيْثُ يَكُونُ الْمُعْطَى أَعْظَمَ أَجْراً مِنَ الْمُعْطِي!

ذَاكَ حَيْثُ تَسْكَرُونَ مِنْ غَيْرِ شَرَاب، بَلْ مِنَ النِّعْمَةِ والنَّعِيمِ، وَتَحْلِفُونَ مِنْ غَيْرِ اضْطِرَار، وَتَكْذِبُونَ مِنْ غَيْرِ إِحْرَاج

ذَاكَ إِذَا عَضَّكُمُ الْبَلاَءُ كَمَا يَعَضُّ الْقَتَبُ غَارِبَ الْبَعِيرِ.مَا أَطْوَلَ هذَا الْعَنَاءَ، وَأَبْعَدَ هذا الرَّجَاءَ!

أَيُّهَا النَّاسُ، أَلْقُوا هذِهِ الأَزِمَّةَ الَّتِي تَحْمِلُ ظُهُورُهَا الاَثْقَالَ مِنْ

pir ji wî, li hewe dikim, çiko ewî pir qencî û ihsan digel hewe kirîye, vêca binêrin ku çiqas ni'metên taybet li hewe kirine û hûn ji rehmeta xwe behremend kirine û çiqa hewe gonehên xwe eşkere kirine û ewî nixumandine û hewe xwe kirîye musteheqê lê girtin û 'ezabê wî, ewî muhlet (a tewbê) daye hewe.

Mirin: Ez hewe şîret dikim ku mirinê bînin bîra xwe û kêmtir ji wê bê xeber û xafil bibin. Çawa hûn xafil dibin ji wê ya ku ew ji hewe xafil nabê? Û çawa hûn timahî yê dikin li wê da ku muhletê nadê hewe? Vêca ew kesên hewe mirina wan li ber çavê xwe dîtî ji we'z û şîret kirinê ra bes in. Ew ne bi suwarî, rakirin û bi alîyê gora wan ve birin (çiko bê can bîn û di tabûtê da bûn) û ew ne bi vîyana wan kirin di gora wan da; heçweku ne ew bûn yên dinya ava kirîn û heçweku cihê wan yê ileh, axret. Ji cî û warê xwe kûvî bûne û ew cîyê ku jê kûvî û jê direvîyan ji bona xwe kirine cî û war. Bi wê ya jê vebûyîn (dinya) ra mijûl bûn û axireta ku cîyê wan bî telef kirin. Ew li wêderê nikarin ji pîsatîyan desta bikêşin û xwe jê bigohêzin û nikarin ser qencî û başî yên xwe ve zêde bikin, ew bi dinyayê bêhn fireh bûn, vêca ewê ew xapandin û bawerî ya

أَيْـدِيكُمْ، وَلاَ تَصَـدَّعُوا عَلَـى سُلْطَانِكُمْ فَتَذُمُّوا غِبَّ فِعَالِكُمْ، وَلاَ تَقْتَحِمُوا مَا اسْتَقْبَلْتُمْ مِنْ فَـوْرِ نَـارِ الْفِتْنَةِ، وأَمِيطُوا عَنْ سَـنَنِهَا، وَخَلُّـو قَصْدَ السَّـبِيلِ لَهَـا، فَقَـدْ لَعَمْـرِي يَهْلِكُ فِي لَهَبِهَا الْمُـؤْمِنُ، وَيَسْـلَمُ فِيهَا غَيْرُ الْمُسْلِمِ.

إِنَّمَا مَثَلِي بَيْنَكُمْ مَثَـلُ السِّـرَاجِ فِـي الظُّلْمَـةِ، يَسْتَضِـيءُ بِـهِ مَـنْ وَلَجَهَا. فَاسْمَعَوا أَيُّهَا النَّاسُ وَعُوا، وَأَحْضِرُوا آذَانَ قُلُـوبِكُمْ تَفْهَمُـوا.

[188]

ومن خطبة له عليه السلام

[التقوى] أُوصِيكُمْ، أَيُّهَا النَّاسُ، بِتَقْوَى الله، وَكَثْرَةِ حَمْدِهِ عَلَى آلاَئِهِ إِلَـيْكُمْ، وَنَعْمَائِـهِ عَلَـيْكُمْ، وَبَلاَئِـهِ لَدَيْكُمْ.

فَكَمْ خَصَّكُمْ بِنِعْمَةٍ، وَتَدَارَكَكُمْ بِرَحْمَـةٍ! أَعْـوَرْتُمْ لَـهُ فَسَـتَرَكُمْ، وَتَعَرَّضْتُمْ لاَخْذِهِ فَأَمْهَلَكُمْ!

[المـوت] وَأُوصِـيكُمْ بِـذِكْرِ الْمَوْتِ، وَإِقْلاَلِ الْغَفْلَةِ عَنْهُ، وَكَيْفَ غَفْلَـتُكُمْ عَمَّـا لَـيْسَ يُغْفِلُكُـمْ،

xwe pê anîn û ewê ew li ‘erdê dan.

Xwedê rehmê li hewe bikê, vêca pêşî yê ji hev bistênin ji bona wî cihê destûra ava kirina wê ji hewe ra hatî dayîn; bo wî cihê Xwedê berê hewe dayî yê û hûn bû wêderê gazî kirîn.

Pê sebra li ser ta’et û gohdana Xwedê û xwe dûr girtina ji goneh û bê emrîya wî, ni’metên Xwedê li ser xwe temam bikin, çiko bi rastî sibehî pir nêzîkê Îro ye, çiqa bilez derbaz dibin û dibûrin; bêhn û s’et li rojê da û roj li mehê da û meh di salê da û salên ‘emr û temenan, çiqa lez derbaz dibin.

AXIFTINA 189

Li sala 38 ê h. li Kûfayê axiftîye.

Qismên îmanê: Şiklek yê îmanê sabit e û li dilan da cîgir bûye, şiklek jî li nav dil û sing da emanete û ne cî girtî ye, heta wext û zemanê jê re hatî deynan (mirina wî). Dema hewe xwest hûn xwe ji kesekî berî bikin, bisekinin heta zemanê mirina wî bê, vêca hed û sînorê berî kirinê (û berî nekirinê) hingê ye.

Hicret: Hicret (ji xeletî yê bo alîyê rastî û duristî yê ve) wek ewil heye û berdewame, Xwedê ne muhtacê xelkê li ser ‘erdê ye, çi ewê îmana xwe xef dikê

وَطَمَعُكُمْ فِـيمَنْ لَـيْسَ يُمْهِلُكُـمْ؟!

فَكَفَـــى وَاعِظـــاً بِمَـــوْتَى عَايَنْتُمُوهُمْ، حُمِلُوا إِلَـى قُبُـورِهِمْ غَيْرَ رَاكِبِـينَ، وَأُنْزِلُـوا فِيهَـا غَيْـرَ نَازِلِينَ، كَأَنَّهُمْ لَـمْ يَكُونُـوا لِلـدُّنْيَا عُمَّاراً، وَكَأَنَّ الاخِرَةَ لَمْ تَـزَلْ لَهُـمْ دَاراً، أَوْحَشُوا مَا كَـانُوا يُوطِنُـونَ، وَأَوْطَنُـوا مَـا كَـانُوا يُوحِشُـونَ، وَاشْتَغَلُوا بِمَا فَارَقُوا، وَأَضَاعُوا مَـا إِلَيْهِ انْتَقَلُوا، لاَ عَنْ قَبِيح يَسْتَطِيعُونَ انْتِقَالاً، وَلاَ فِي حَسَـن يَسْـتَطِيعُونَ ازْدِيَـاداً، أَنِسُـوا بِالـدُّنْيَا فَغَـرَّتْهُمْ، وَوَثِقُوا بِهَا فَصَرَعَتْهُمْ.

فَسَابِقُوا ـ رَحِمَكُمُ اللهُ ـ إِلَـى مَنَازِلِكُمْ الَّتِي أُمِرْتُمْ أَنْ تَعْمُرُوهَـا، وَالَّتِي رُغِّبْتُمْ فِيهَا، وَدُعِيتُمْ إِلَيْهَا.

وَاسْـتَتِمُّوا نِعَـمَ اللهِ عَلَـيْكُمْ بِالصَّبْرِ عَلَى طَاعَتِـهِ، وَالْـمُجَانَبَةِ لِمَعْصِيَتِهِ، فَإِنَّ غَداً مِنَ الْيَوْمِ قَرِيبٌ. مَـا أَسْـرَعَ السَّـاعَاتِ فِـي الْيَـوْمِ، وَأَسْرَعَ الأَيَّامَ فِي الشَّـهْرِ، وَأَسْـرَعَ

û çi jî ewê eşkere dikê.

Navê hicretê nakevê ser kesî (jêre muhacir nayê gotin) neheta hûcceta Xwedê li ser ‘erdê (pêşkar û rêberê Xudayî) nas bikê, vêca kesê ew nas kir û qebûl kir, ew muhacire. Her wiha ew kesê huccet û delîl bighêtê, vêca gohê wî goh lê bibê û li dilê wî da (rûnê û) cî bigirê, navê “mustez’ef” jê re bikar nayê birin.

Heqîqeta karê me asê ye û ragirtina wê zehmete, xêncî bendeyê mu’min ku Xwedê dilê wî pê îmanê ceribandî naçê bin barê wê da û ewê hilnagirê. Xêncî singên emanet dar û ‘eqlên xwe ragir jî hedîsên me di xwe da nagirin.

Zanîna Imam ‘Elî (s) : Xelkîno! Pêşîya ku hûn, min ji dest bidin ji min bipirsin, çiko ez rêkên ‘esmana ji rêkên ‘erdê pitir nas dikim; pêşîya wê çendê ku fitne xwe hilavêjê û hefsarê xwe pêpez bikê (ser beredayî bibê) û ‘eqlê xelkê ji serê wan derênê, bipirsin.

AXIFTINA 190

Ez hemdê Xwedê dikim ji bona pêk anîna şukir kirina li beraberê ni’metên wî da û ez ji bona pêk anîna huqûqê wî, arîkarîyê ji wî dixwazim, ewê leşkerê wî qewî û ew bi xwe mezin mertebe.

الشُّهُورَ فِي السَّنَةِ، وَأَسْرَعَ السِّنِينَ فِي الْعُمُرِ!

[**189**]

ومن خطبة له (عليه السلام)

[أقسام الايمان] فَمِنَ الأيمَانِ مَا يَكُونُ ثَابِتاً مُسْتَقِرّاً فِي الْقُلُوبِ، وَمِنْهُ مَا يَكُونُ عَوَارِىَ بَيْنَ الْقُلُوبِ وَالصُّدورِ، إِلَى أَجَل مَعْلُوم، فَإِذَا كَانَتْ لَكُمْ بَرَاءَةٌ مِنْ أَحَد فَقِفُوهُ حَتّى يَحْضُرَهُ الْمَوْتُ، فَعِنْدَ ذَلِكَ يَقَعُ حدُّ الْبَرَاءَةِ.

[الهجرة] وَالْهِجْرَةُ قَائِمَةٌ عَلَى حَدِّهَا الأَوَّل، مَا كَانَ لله تعالى فِي أَهْلِ الأَرْضِ حَاجَةٌ مِنْ مُسْتَسِرِّ الأُمَّةِ وَمُعْلِنِهَا،

لاَ يَقَعُ اسْمُ الْهِجْرَةِ عَلَى أَحَد إِلاَّ بِمَعْرِفَةِ الْحُجَّةِ فِي الأَرْضِ، فَمَنْ عَرَفَهَا وَأَقَرَّ بِهَا فَهُوَ مُهَاجِرٌ، وَلاَ يَقَعُ اسْمُ الاسْتِضْعَافِ عَلَى مَنْ بَلَغَتْهُ الْحُجَّةُ فَسَمِعَتْهَا أُذُنُهُ وَوَعَاهَا قَلْبُهُ.

إِنَّ أَمْرَنَا صَعْبٌ مُسْتَصْعَبٌ، لاَ يَحْتَمِلُهُ إِلاَّ عَبْدٌ مُؤْمِنٌ امْتَحَنَ اللهُ

Ez şehde didim ku Muhemmed ‘evd û hinartî yê wî ye, xelk ji gohdana wî ra gazî kirin û pê cihad û berevanî ya ji dînê wî dijminên wî bin êxistin; hev girtin li ser derew êxistina wî û xebat ji bona temirandina nûra wî, ew ji xebat û cihadê paşve neda.

Wesîyeta teqwatîyê: Vêca pê teqwatî ya Xwedê xwe biparêzin, çiko bi rastî çekalê werîsê wê cihê bawerîyê ye û bilindahî ya wê xweş penahbere ji bûna pêşî girtina ji belan û parastinê. Pê karên qenc pêşîyê ji mirin û dijwarî ya wê bistînin û pêşîya gehiştina wê xwe jê re hazir bikin û pêşîya hatina wê xwe jê re pêk bînin, vêca bi rastî qîyamet xilaseka kar e; û mirin, ji we’z û şîret kirina mirovê ‘eqilmend ra bese û her wiha cihê ‘ibret girtinê ye ji mirovê cahil ra ku xwe li nezanînê datînê.

Pêşîya gehiştina qîyametê jî hûn zanin ku: Tengî ya qebran û xema bê hêvî bûnê û dehşeta dîtina cihê xwe yê qîyametê û tirsanên li pey hev çêdibin û têk çûna pirasîyan û kerr bûna gohan û tarîtî ya goran û tirsa ji we’da ‘ezabê û girtina devê qebrê û danîna kuç û bera li ser wê, heye.

Vêca ey bendeyên Xwedê, hûn bi xatirê Xwedê, hûn bi xatirê Xwedê! Rastî ev e ku dinya hewe bi yêk rêkêve dibê û hûn û qîyamet biheve hatine

قَلْبَهُ لِلإِيمَانِ، وَلاَ يَعِي حَدِيثَنَا إِلاَّ صُدُورٌ أَمِينَةٌ، وَأَحْلاَمٌ رَزِينَةٌ.

[علم الوصي] أَيُّهَا النَّاسُ، سَلُوني قَبْلَ أَنْ تَفْقِدُوني، فَلأَنَا بِطُرُقِ السَّماءِ أَعْلَمُ مِنِّي بِطُرُقِ الأَرْضِ، قَبْلَ أَنْ تَشْغَرَ بِرِجْلِهَا فِتْنَةٌ تَطَأُ فِي خِطَامِهَا وَتَذْهَبُ بِأَحْلاَمِ قَوْمِهَا.

[190]

ومن خطبة له (عليه السلام)

أَحْمَدُهُ شُكْراً لإِنْعَامِهِ، وَأَسْتَعِينُهُ عَلَى وَظَائِفِ حُقُوقِهِ، عَزِيزَ الْجُنْدِ، عَظِيمَ الْمَجْدِ.

وَأَشْهَدُ أَنَّ مُحَمَّداً عَبْدُهُ وَرَسُولُهُ، دَعَا إِلَى طَاعَتِهِ، وَقَاهَرَ أَعْدَاءَهُ جِهَاداً عَنْ دِينِهِ، لاَ يَثْنِيهِ عَنْ ذلِكَ اجْتِمَاعٌ عَلَى تَكْذِيبِهِ، وَالْتِمَاسٌ لإِطْفَاءِ نُورِهِ.

[العظة بالتقوى] فَاعْتَصِمُوا بِتَقْوَى اللهِ، فَإِنَّ لَهَا حَبْلاً وَثِيقاً عُرْوَتُهُ، وَمَعْقِلاً مَنِيعاً ذِرْوَتُهُ، وَبَادِرُوا الْمَوْتَ وَغَمَرَاتِهِ،

girêdan, eve heçweku qîyametê nîşanên xwe eşkere kirine û alaya wê nêzîk bûye û hûn li cihê hewe da sekinandine; heçweku eve zelzelên wê despê kirine û giranî ya xwe daye ‘erdê û dinya ji ehlê xwe hatîye birrîn û ew ji ber xwe avêtine.

Tu dibêjî qey dinya hema rojek bî û derbaz bî û mehek bî ku giha axir û xilas bî; nû ya wê kevin bî û qelewê wê ze’êf û lawaz bî. Ew li cihek teng û li nav muşkilatên mezinda ne û li nav agirekî da ne ku pir xwera ye û têr nabê, qêra wê pir bilind û pêt û gorîya wê geş û fwîrîna wê xezebgirtî û agirê wê bi şewat û temrîna wê dûr û şewata wê agir pê ketî, tehdîdên wê dehşet îner, pir kûr û binê wê nepeyda û etrafê wê reş û tarî û qazanên wê kel û hemî pêkve dijwarî û nexweşî.

Ewên hay ji navbeyna xwe û Xwedayê xwe heyîn wê kom kom bi alîyê bihiştêve bên birin. Ew ji ber ‘ezab li êmnahî yê da ne û lome li wan nayê kirin û ji agir dûrin, cihê wan cihê pê bawerî yê ye û ew pê razîne; evênhe ewin yên karên wan li dinyayê da baş û çavê wan bigirî ku şeva wan roja wan bî û şeva xwe bi xwe şikandin û istixfarê dibûrandan û roja wan ji wan ra wek şêvê bî ku xwe tinê dikiran.

وَامْهَدُوا لَهُ قَبْلَ حُلُولِهِ، وأَعِـدُّوا لَهُ قَبْلَ نُزُولِهِ، فَإِنَّ الْغَايَةَ الْقِيَامَةُ، وَكَفَى بِذلِكَ وَاعِظاً لِمَنْ عَقَـلَ، وَمُعْتَبَراً لِمَنْ جَهِلَ!

وَقَبْلَ بُلُوغِ الْغَايَةَ مَا تَعْلَمُـونَ مِـنْ ضِـيقِ الأَرْمَـاسِ، وَشِـدَّةِ الأَبْلاَسِ، وَهَوْلِ الْمُطَّلَعِ، وَرَوْعَاتِ الْفَـزَعِ، وَاخْـتلاَفِ الأَضْـلاَعِ، وَاسْتِكَاكِ الأَسْمَاعِ، وَظُلْمَةِ اللَّحْـدِ، وَخِيفَةِ الْوَعْدِ، وغَمِّ الضَّرِيحِ، وَرَدْمِ الصَّفِيحِ.

فَاللهَ اللهَ عِبَـادَ اللهِ! فَـإِنَّ الْـدُّنْيَا مَاضِـيَةٌ بِكُـمْ عَلَـى سَـنَنٍ، وَأَنْـتُمْ وَالسَّـاعَةُ فِـي قَـرَنٍ، وَكَأَنَّهَـا قَـدْ جَاءَتْ بِأَشْرَاطِهَا، وَأَزِفَتْ بِأَفْرَاطِهَا، وَوَقَفَتْ بِكُمْ عَلَى سِراطِهَا، وَكَأَنَّهَا قَـدْ أَشْـرَفَتْ بِزَلاَزِلِهَـا، وَأَنَاخَـتْ بِكَلاَكِلِهَا، وَانْصَرَمَتِ الدُّنْيَا بِأَهْلِهَا، وَأَخْرَجَتْهُمْ مَنْ حِضْنِهَا،

فَكَانَـتْ كَيَـوْمٍ مَضَـى وَشَـهْرٍ انْقَضَـى، وَصَـارَ جَدِيـدُهَا رَثّـاً، وَسَمِينُهَا غَثّاً، فِـي مَوْقِـفٍ ضَـنْكِ الْمَقَامِ، وَأُمُورٍ مُشْتَبِهَةِ عِظَامٍ، ونَـارٍ

Vêca Xwedê bihişt kir cihê zivirîna wan û kirha xêr û başîya wan da û ***"ew musteheqê bihiştê û ehlê wê bûn"***[78] ku ileh li wêderê di nav ni'metên her heyîn da bimînin.

Vêca ey bendeyên Xwedê! Hay ji wê bimînin ewa xilasbûyên hewe pê hay jê mana wê gihan xilasî yê û xirabkarên hewe pê ji nav birina wê xusirîn û zîyan dîtin. Pê kiryarên xwe pêşî yê ji ecelê xwe bistînin çiko hûn li girûwa karekî da ne ku hewe pêş da kirîye û hûnê kirîya wan karan bigrin ewên hewe pêşda rêkirîn. Heçweku eve ew qewmîna bi tirs ser hewe da hatîye û rêka zivirîna hewe hatîye girtin û hûn ji şimitînên xwe nikarin xilas bibin.

Xwedê me û hewe bêxê di rêka gohdana xwe û Pêğemberê xwe da û bi fezl û rehmeta xwe li me û hewe biborê û 'efû bikê.

Xwe li cî da qayîm bikin û li ser bela sebir bikin. Dest û şûrên xwe di rêka hewesên zimanê xwe da bikar nebin. Lez nekevin ji karekî ra ku teklîfa wê li hewe ne kirine.

Çiko bi rastî ew kesê li ser cihkê xwe bimrê di halekî da ku ewî heqê Xwedayê xwe û heqê Pêğemberê wî û ehlê beyta Pêğember (s) nas kiribê ew şehîd mirîye û kirîya wî li ser Xwedê ye, wê ew xêr û sewaba karê qenc ku li

شَدِيد كَلَبُهَا، عَال لَجَبُهَا، سَاطع لَهَبُهَا، مُتَغَيِّظ زَفِيرُهَا، مُتَأَجِّج سَعِيرهَا، بَعِيد خُمُودُهَا، ذَاك وُقُودُهَا، مَخُوف وعِيدُهَا، عُم قَرارُهَا، مُظْلِمَة أَقْطَارُهَا، حَامِيَة قُدُورُهَا، فَظِيعَة أُمُورُهَا.

وَسِيقَ الَّذِينَ اتَّقَوْا رَبَّهُمْ إِلَى الْجَنَّةِ زُمَراً، قَدْ أُمِنَ الْعَذَابُ، وَانْقَطَعَ الْعِتَابُ، وَزُحْزِحُوا عَنِ النَّارِ، وَاطْمَأَنَّتْ بِهِمُ الدّارُ، وَرَضُوا المَثْوَى وَالْقَرَارَ، الَّذِينَ كَانَتْ أَعْمَالُهُمْ فِي الدُّنْيَا زَاكِيةً، وَأَعْيُنُهُمْ بَاكِيَةً، وَكَانَ لَيْلُهُمْ فِي دُنْيَاهُمْ نَهَاراً، تَخَشُّعاً وَاسْتِغفَاراً، وَكَانَ نَهَارُهُمْ لَيْلاً، تَوَحُشّاً وَانقِطَاعاً،

فَجَعَلَ اللهُ لَهُمُ الْجَنَّةَ [مَآباً، وَالْجَزَاءَ] ثَوَاباً،(وَكَانُوا أَحَقَّ بِهَا وَأَهْلَها) فِي مُلْك دَائِم، وَنَعِيم قَائِم.

فَارْعَوْا عِبَادَ اللهِ مَا بِرِعَايَتِهِ يَفُوزُ فَائِزُكُمْ، وَبِإِضَاعَتِهِ يَخْسَرُ مُبْطِلُكُمْ، وَبَادِرُوا آجَالَكُمْ بِأَعْمَالِكُمْ، فَإِنَّكُمْ مُرْتَهَنُونَ بِمَا أَسْلَفْتُمْ، وَمَدِينُونَ بِمَا قَدَّمْتُمْ،

dilê xwe da gerandî bidîyê; niyeta wî wek hejandin û veweşandina şûrê birra ye. Ji bona her tiştekî wext û zemanek dîyar kirî heye.

AXIFTINA 191

emrê bi me’rûf û nehya ji munker, vêca Xwedê mirovê bê aqil ji ber kirina gonehan û ‘eqilmendan ji ber terk kirina nehya ji munker, ji rehmeta xwe dûr kirine.

Heyhê! Eve hewe girêdana bi Islamê ve birî û hudûdên wê ji kar êxistin û hukmên wê mirandin. Heyhê! Bizanin, Xwedê emrê min kirîye ku ez digel ehlê zulmê û soz şikên û xirabî çêkerên di ‘erdê da bikevim şer; vêca min digel soz şikêna şer kir û li beraberê zalimên ji heqî yê derketî da ez ketim cihadê û min ewên ji dîn derketîn ze’êf û zelîl kirin. Pê qêrekî, min karê Şeytanê “redhe”yê[88] jî temam kir; dilê wî lerizî û singê wî recifî. Ya mayî, paşve mayî yên ehlê zulmê ne. Eger Xwedê izna min bidê li hêrişa vê carê da ezê ewan bi dewleta wanve ji nav bibim ku xêncî hinek bilavbûyî li dûr û berê ‘erdê ji wan nemînin.

Ez ew im, yê li zarokî ya xwe da min giregirên ‘Ereba li ‘erdê dayîn û şaxê (dû qebîlên:) “rebî’e” û “muzer” şikandîn û, hûn ji merteba min li bal Pêğemberê Xwedê (s) agahin; hem ji alîyê eqrebatî yê ve hem jî ji nezer ewî qîmet ê taybet ku dida min; ez biçûk bûm, ku ez li kêleka xwe da rûdinştandim û bi singê xwe ve datanîyam û di nav cîyê xwe da

مُهَاجِرُونَ وَلاَ أَنْصَارٌ يَنْصُرُونَكُمْ إِلاَّ الْمُقَارَعَةَ بِالسَّيْفِ حَتَّى يَحْكُمَ اللهُ بَيْنَكُمْ.

وَإِنَّ عِنْدَكُمُ الأَمْثَالَ مِنْ بَأْسِ اللهِ تَعَالَى وَقَوَارِعِهِ، وَأَيَّامِهِ وَوَقَائِعِهِ، فَلاَ تَسْتَبْطِئُوا وَعِيدَهُ جَهْلاً بَأْخْذِهِ، وَتَهَاوُناً بِبَطْشِهِ، وَيَأْساً مِنْ بَأْسِهِ، فَإِنَّ اللهَ سُبْحَانَهُ لَمْ يَلْعَنِ الْقَرْنَ الْمَاضِيَ بَيْنَ أَيْدِيكُمْ إِلاَّ لِتَرْكِهِمُ الأَمْرَ بِالْمَعْرُوفِ وَالنَّهْيَ عَنِ الْمُنكَرِ، فَلَعَنَ السُّفَهَاءَ لِرُكُوبِ الْمَعَاصِي، وَالْحُلَمَاءَ لِتَرْكِ التَّنَاهِي!

أَلاَ وَقَدْ قَطَعْتُمْ قَيْدَ الإِسْلاَمِ، وَعَطَّلْتُمْ حُدُودَهُ، وَأَمَتُّمْ أَحْكَامَهُ.

أَلاَ وَقَدْ أَمَرَنِيَ اللهُ بِقِتَالِ أَهْلِ الْبَغْيِ وَالنَّكْثِ وَالْفَسَادِ فِي الأَرْضِ، فَأَمَّا النَّاكِثُونَ فَقَدْ قَاتَلْتُ، وَأَمَّا الْقَاسِطُونَ فَقَدْ جَاهَدْتُ، وَأَمَّا الْمَارِقَةُ فَقَدْ دَوَّخْتُ، وَأَمَّا شَيْطَانُ الرَّدْهَةِ فَقَدْ كُفِيتُهُ بِصَعْقَةٍ سَمِعْتُ لَهَا وَجْبَةَ قَلْبِهِ وَرَجَّةَ صَدْرِهِ، وَبَقِيَتْ بَقِيَّةٌ مِنْ أَهْلِ الْبَغْيِ، وَلَئِنْ أَذِنَ اللهُ فِي

radizandim; bedena min bi bedena wîve dihata diçûwa û bêhna xwe ya xweş dida min; carna tiştek dicûya û dikira devê min da, ewî qet ne derewek ji min seh kir ne jî li rabîn rûniştina min da xeletîyek dît. Ji wî wextîve ku ew (s) ji şîr hat girtin, Xuda mezintirîn melaîketê xwe, şev û roj danî gel wî, da ku ewî li ser rêka hêjayî û xesletên qencên exlaqî bidê meşandin. Ka çawa gûlka devê ileh digel deyka xwe ye û jê venabê, ez jî hema her li pey Pêğember bûm, her roj alayek ji alayên exlaqê xwe ji min ra bilind dikira û destûr dida ku ez bi cî bînim. Her sal çend wextekî li (şikefta) Herayê da dima, min ew didîta û xêncî min kesî nadîta. Li wextekî da xêncî wê mala Pêğemberê Xuda (s) û xedîce têda dijîyan û ez yê sisê bûm, iselametî li çi malên dî da nebû. Min ronahî ya wehî û Pêğemberî yê bi çavê xwe didîta û bêhna nubowwetê his dikira.

Bê şubhe, dema wehy nazil bî ser Pêğember (s) min dengê nalêna şeytan gohlê bî, min pirsî: Ey resûlê Xwedê! Ev dengê çiye? Kerem kir: Nalêna şeytane; bê hêvî bûye ku ‘ibadet jê re bê

الْكَرَّةَ عَلَيْهِمْ لأُدِيلَنَّ مِنْهُمْ إِلاَّ مَا يَتَشَذَّرُ فِي أَطْرَافِ الأَرْضِ تَشَذُّراً!

أَنَا وَضَعْتُ [فِي الصِّغَرِ] بَكَلاَكِلِ الْعَرَبِ، وَكَسَرْتُ نَوَاجِمَ قُرُونِ رَبِيعَةَ وَمُضَرَ.

وَقَدْ عَلِمْتُمْ مَوْضِعِي مِنْ رَسُولِ اللهِ(صلى الله عليه وآله) بِالْقَرَابَةِ الْقَرِيبَةِ، وَالْمَنْزِلَةِ الْخَصِيصَةِ: وَضَعَنِي فِي حِجْرِهِ وَأَنَا وليدٌ يَضُمُّنِي إِلَى صَدْرِهِ، وَيَكْنُفُنِي فِي فِرَاشِهِ، وَيُمِسُّنِي جَسَدَهُ، وَيُشِمُّنِي عَرْفَهُ، وَكَانَ يَمْضَغُ الشَّيْءَ ثُمَّ يُلْقِمُنِيهِ، وَمَا وَجَدَ لِي كَذْبَةً فِي قَوْلٍ، وَلاَ خَطْلَةً فِي فِعْلٍ. وَلَقَدْ قَرَنَ اللهُ تَعَالَى بِهِ(صلى الله عليه وآله) مِنْ لَدُنْ [أَنْ] كَانَ فَطِيماً أَعْظَمَ مَلَكٍ مِنْ مَلاَئِكَتِهِ يَسْلُكُ بِهِ طَرِيقَ الْمَكَارِمِ، وَمَحَاسِنَ أَخْلاَقِ الْعَالَمِ، لَيْلَهُ وَنَهَارَهُ، وَلَقَدْ كُنْتُ أَتَّبِعُهُ اتِّبَاعَ الْفَصِيلِ أَثَرَ أُمِّهِ، يَرْفَعُ لِي فِي كُلِّ يَوْمٍ عَلَماً مِنْ أَخْلاَقِهِ، وَيَأْمُرُنِي بِالاقْتِدَاءِ بِهِ.

kirin. Bi rastî tu gohlê dibî wê ya ez gohlê dibim û dibînî wê ya ez dibînim, lê tinê ev heye ku tu ne Pêğemberî, lê bi yeqîn tu wezîrî û tu li ser qencî yê yî.

Ez digel wî bûm selewatên Xwedê li wî û alê wî bin dema komek ji giregirên Qureyşîya hatîn û gotîn: Ey Muhemed, de'wa tu dikî tiştek pir mezine ku ne babkên te ew de'we kirine û ne jî çi yêk ji binemala te. Emê tiştekî ji te bixazin, eger tu pêk bînî û nîşanê me bidî, emê bizanin tu Pêğemberî û rêkirîyê Xudayî lê eger tu ewê nekî, emê bizanin tu sahirek derewkerî. Vêca ewî selewatên Xwedê li wî û alê wî bin kerem kir: Hûn çi dixwazin? Ewan got: Ji bona me gazî wê dara he bike, heta bi reh û rîşên xwe ve ji cî yê xwe derkevê û bê li berahîya te da bisekinê.

Ewî (s) got: "hemî kar ji Xwedê tên, vêca eger Xwedê ewî karî bikê (bidê kirin) gelo hûnê bawerî yê bînin û şehdeyî yê li ser heqî yê bidin?" Gotin: Belê; kerem kir: ezê wê ya hûn dixwazin, nîşa hewe bikim, lê ez baş zanim ku hûn bi alîyê xêr û başî yê ve, nazivirin. Çiko di nav hewe da ye ewê

وَلَقَدْ كَانَ يُجَاوِرُ فِي كُلِّ سَنَةٍ بِحِرَاءَ، فَأَرَاهُ وَلاَ يَرَاهُ غَيْرِي، وَلَمْ يَجْمَعْ بَيْتٌ وَاحِدٌ يَوْمَئِذٍ فِي الْإِسْلاَمِ غَيْرَ رَسُولِ الله صلى الله عليه وآله وَخَدِيجَةَ وَأَنَا ثَالِثُهُمَا، أَرَى نُورَ الْوَحْيِ وَالرِّسَالَةِ، وَأَشُمُّ رِيحَ النُّبُوَّةِ.

وَلَقَدْ سَمِعْتُ رَنَّةَ الشَّيْطَانِ حِينَ نَزَلَ الْوَحْيُ عَلَيْهِ(صلى الله عليه وآله) فَقُلْتُ: يَا رَسُولَ الله مَا هذِهِ الرَّنَّةُ؟ فَقَالَ: «هذَا الشَّيْطَانُ قَدْ أَيِسَ مِنْ عِبَادَتِهِ، إِنَّكَ تَسْمَعُ مَا أَسْمَعُ، وَتَرَى مَا أَرَى، إِلاَّ أَنَّكَ لَسْتَ بِنَبِيٍّ، وَلكِنَّكَ وَزِيرٌ، وَإِنَّكَ لَعَلَى خَيْرٍ».

وَلَقَدْ كُنْتُ مَعَهُ صلى الله عليه وآله لَمَّا أَتَاهُ المَلأُ مِنْ قُرَيْشٍ، فَقَالُوا لَهُ: يَا مُحَمَّدُ، إِنَّكَ قَدِ ادَّعَيْتَ عَظِيماً لَمْ يَدَّعِهِ آبَاؤُكَ وَلاَ أَحَدٌ مِنْ بَيْتِكَ، وَنَحْنُ نَسْأَلُكَ أَمْراً إِنْ أَجَبْتَنَا إِلَيْهِ وَأَرَيْتَنَاهُ، عَلِمْنَا أَنَّكَ نَبِيٌّ وَرَسُولٌ، وَإِنْ لَمْ تَفْعَلْ عَلِمْنَا أَنَّكَ سَاحِرٌ كَذَّابٌ. فَقَالَ لهم صلى الله عليه

bê avêtin nav çala **Qelîb**[89] da û ewê hizban li hev kom bikê.[90]

Paşê Ewî selewatên Xwedê li wî û alê wî bin got: “Ey darê, eger te bawerî bi Xwedê û roja qîyametê heye û tu dizanî ez Pêğemberê Xwedê me, bi izna Xwedê ji cî hilbe, bi reh û rîşên xwe ve were li ber min raweste”.

Vêca sond bi Wî yê ew li ser heqîyê şandî (rêkirî) ew dar ji rehve hilbû û hat, dengek dijwar jê dihata û wek çawa firinde çeng û perê xwe li hev didin rê ket û li beraberê Resûlê Xwedê da (s) sekinî û pê çiqê xwe yê jûrî li ser Pêğember selewatên Xwedê li wî û alê wî bin kir sîber û çiqek yê xwe jî danî ser milê min, li wî halî da ez li alîyê rastê yê Pêğember (s) rawesta bîm.

Vêca dema ewa wereng dîtin, bi kubarî û qodetî gotin: Niha vêca destûrê bidîyê ku nîvek ji wê bê cem te û nîva dî li cîyê xwe da bisekinê. Ewî jî bi wî awayî destûr dayê, vêca nîvek ji wê bi şiklek ‘ecêb û dengek bilindtir hat balê û ewqas nêzîk bî û kêm mabî xwe li Pêğember selat û selamên Xwedê li wî û alê wî bin bialînê.

وآله: «وَمَا تَسْأَلُونَ؟».قَالُوا: تَدْعُو لَنَا هذِهِ الشَّجَرَةَ حَتَّى تَنْقَلِعَ بِعُرُوقِهَا وَتَقِفَ بَيْنَ يَدَيْكَ.

فَقَالَ صلى الله عليه وآله: «إِنَّ اللهَ عَلَى كُلِّ شَيْءٍ قَدِيرٌ، فَإِنْ فَعَلَ اللهُ ذلِكَ لَكُمْ، أَتُؤْمِنُونَ وَتَشْهَدُونَ بِالْحَقِّ؟». قَالُوا: نَعَمْ. قَالَ: «فَإِنِّي سَأُرِيكُمْ مَا تَطْلُبُونَ، وإِنِّي لأَعْلَمُ أَنَّكُمْ لاَ تَفِيئُونَ إِلَى خَيْرٍ، وَإِنَّ فِيكُمْ مَنْ يُطْرَحُ فِي الْقَلِيبِ، وَمَنْ يُحَزِّبُ الأَحْزَابَ».

ثُمَّ قَالَ: «يَا أَيَّتُهَا الشَّجَرَةُ إِنْ كُنْتِ تُؤْمِنِينَ بِاللهِ وَاليَوْمِ الأخِرِ، وَتَعْلَمِينَ أَنِّي رَسُولُ اللهِ، فَانْقَلِعِي بِعُرُوقِكِ حَتَّى تَقِفِي بَيْنَ يَدَيَّ بِإِذْنِ اللهِ».

فَوَالَّذِي بَعَثَهُ بِالْحَقِّ نَبِيّاً لاَنْقَلَعَتْ بِعُرُوقِهَا، وَجَاءَتْ وَلَهَا دَوِيٌّ شَدِيدٌ، وَقَصْفٌ كَقَصْفِ أَجْنِحَةِ الطَّيْرِ، حَتَّى وَقَفَتْ بَيْنَ يَدَيْ رَسُولِ اللهِ(صلى الله عليه وآله)مُرَفْرِفَةً، وَأَلْقَتْ بِغُصْنِهَا الأَعْلَى عَلَى رَسُولِ اللهِ(صلى الله

Vêca ewan bi kufr û serpêçan gotin: Niha, bêje vê nîvê, bila biçê bighê nîva xwe ya dî û wek pêş da lê bê. Pêğember emrê wê kir û ew jî zivirî. Min got: “La ilahe ille llah” ez ewilîn kes im ku îman bi te anîye ey Resûlê Xwedê; ez ewilîn kes im şehdeyîyê didim ku bi fermana Xwedê ji bona rast deranîna pêğemberî ya te û biha dana peyva te evê darê çi kir û çi kir! Vêca ewê komê hemîyan gotin: Nexêr; ew sahirek derewker e; ew jî çi sihrek ‘ecêb û bi dest sivikî; ma gelo xêncî yêk wek vî -mexseda wan ez bûm- kes dî tesdîqa te dikê li ser vî karê te?

Halhale bi rastî ez ji wê komê me ku lûma lûmekeran ewa ji rêka Xwedê paşve nadê; ewên rûyê (dêmen) wan rûyê rastbêjan û axiftin û peyva wan peyva qencan, ewên şev avakerin (pê ‘ibadet) û birojve ronahîderin (çira yên hidayetê). Xwe bi werîsê Qur’anê ve girtine û rêkên Xwedê û sunnetên Pêğemberê wî sax dihêlin; ne serkêşî yê dikin ne jî xwe mezin dikin; ne zêdegavîyan dikin ne jî fesadê (xirabkarî). Dilê wan di bihiştê da ye û bedena wan mijûlê kar û ‘emel.

AXIFTINA 193

Hatîye riwayet kirin ku mîrê

عليه وآلـه)، وَبِـبَعْضِ أَغْصَـانِهَا عَلَـى مَنْكِبِـي، وَكُنْـتُ عَـنْ يَمِينِهِ(عليه السلام).

فَلَمَّا نَظَرَ الْقَوْمُ إِلَى ذلِكَ قَالُوا ــ عُلُـوّاً وَاسْـتِكْبَاراً ــ : فَمُرْهَـا فَلْيَأْتِكَ نِصْفُهَا وَيَبْقَى نِصْفُهَا.

فَأَمَرَهَـا بِـذلِكَ، فَأَقْبَـلَ إِلَيْـهِ نِصْفُهَا كَأَعْجَـبِ إِقْبَـال وَأَشَـدِّهِ دَوِيّـاً، فَكَـادَتْ تَلْتَـفُّ بِرَسُـولِ اللهِ(صلى الله عليه وآله).

فَقَالُوا ــ كُفْراً وَعُتُوّاً ــ : فَمُـرْ هذَا النِّصْفَ فَلْيَرْجِعْ إِلَـى نِصْـفِهِ كَمَا كَانَ.

فَأَمَرَهُ فَرَجَعَ.

فَقُلْتُ أَنَا: لاَ إِلهَ إِلاَّ اللهُ، إِنِّـي أَوَّلُ مُـؤْمِن بِـكَ يَـا رَسُـولَ اللهِ، وَأَوَّلُ مَنْ آمَنَ بِأَنَّ الشَّجَرَةَ فَعَلَتْ مَـا فَعَلَـتْ بِـأَمْرِ اللهِ تَصْـدِيقاً لِنُبُوَّتِكَ، وإِجْلاَلاً لِكَلِمَتِكَ.

فَقَالَ الْقَوْمُ كُلُّهُمْ: بَـلْ سَـاحِرٌ كَذَّابٌ، عَجِيـبُ السِّـحْرِ خَفِيـفٌ فِيهِ، وَهَلْ يُصَدِّقُكَ فِي أَمْـرِكَ إِلاَّ مِثْلُ هذَا! يَعْنُونَنِي.

وَإِنِّي لَمِنْ قَوْم لاَ تَأْخُذُهُمْ فِي

bawerdara (s) hevalek hebû digotanê "**Hemam**" ew mirovek 'abid bî. Rojekî gotê: Ey mîrê bawerdaran, ji bona min wisa behsa ehlê teqwayê bike, heçweku ez wan bibînim. Vêca ewî selamên Xwedê lê bin hinekî xwe giran kir û cewaba wî paşve da, paşê got:

"Ey Hemam! Ji Xwedê bitirse û qencî yê bike, çiko Xwedê digel wan kesaye ewên ji Xwedê bitirsin û her wiha digel wa kesa ye ewên qencî ker".

Lê belê Hemam bi vî qasî razî nebî û ew da sondê. Vêca Imam hemd û senayê Xwedê gotin û selewat dan Pêğember (s) û got:

Bi rastî Xwedayê bilind û pak mexlûq xulqandin (afirandin), di halekî da ew çêkirin ku ji ta'et û gohdana wan bê ihtîyac û ji ber ne gohdarî ya wan li êmnahîyê da bî. Çiko rastî ev e ku negohdarî ya ne gohdaran çi zererê nagihênî yê û gohdana gohdaran jî çi menfî'etê lê nakê. Vêca rizqê jîyana wan li nav wan da bilav kir û li dinyayê da her kes danî ser cihê wî.

Vêca ehlê seratî û başîyan di dinyayê da, hema xudan teqwa ne.

Xeberdana wan durist, ber kirina (cil û bergê) wan navincî û rêçika (rabûn runiştin) wan hevrê ye digel (tewazû' û)

الله لَوْمَـةُ لاَئِـم، سِـيَماهُمْ سِـيَما الصِّـدِّيقِينَ، وَكَلاَمُهُـمْ كَـلاَمُ الأَبْرَارِ، عُمَّارُ اللَّيْلِ، وَمَنَارُ النَّهَارِ، مُتَمَسِّكُونَ بِحَبْلِ الْقُرْآنِ، يُحْيُـونَ سُـنَنَ الله وسُـنَنَ رَسُـولِهِ، لاَ يَسْتَكْبِرُونَ وَلاَيَعْلُـونَ، وَلاَيَغُلُّـونَ وَلاَ يُفْسِدُونَ، قُلُوبُهُمْ فِي الْجِنَانِ، وَأَجْسَادُهُمْ فِي الْعَمَلِ!

[193]

[يصف فيها المتقين]

روي أنّ صاحباً لاميرالمؤمنين عليه السلام يقال له همّامٌ كان رجلاً عابداً، فقال له: يا أميرالمؤمنين، صف لي المتقين كأني أنظر إليهم. فتثاقل عن جوابه، ثم قال عليه السلام:

يا همّامُ، اتقِ اللهَ وأحْسِنْ فَـ (إنَّ اللهَ مَعَ الَّذِينَ اتَّقَوْا والَّـذِينَ هُمْ مُحْسِنُونَ)

فلم يقنع همّامٌ بِـذَلِكَ القـول حتّى عزم عليه. قال: فحمد الله وأثنى عليه، وصلّى على النبي(ص)، ثم قال:

أَمَّا بَعْـدُ، فَـإِنَّ اللهَ سُـبْحَانَهُ

xwe şikandinê. Heçî ya Xwedê li ser wan heram kirî, çavê xwe jê digrin û gohê xwe ji wê çendê ra danîne (weqf kirine) ku pê wê zanîna feyda wan têda heyî bi destve bînin, rojên bela (û zehmetê) ji bona wan wek rojên rihetî û berfirehî yê ne.

Eger ne ew mudetê ‘emr (temen) bîya ku Xwedê ji wan ra danîye, ji ber şewqa girtina kirîya qenc û tirsa ji ‘ezab, qas çav nûqandinekî canê wan di bedena wan da nedisekinî;

Xwedê di çavê wan da mezine, vêca ji ber wê xêncî wî li ber çavê wan biçûke; ji bihiştê ra wek wa kesane ewên heçweku bihişt dîtîn û di nava ni’met û xweşî yên wê da mayîn, ji agir (cehnemê) ra wek wane yên heçweku ew dîtîn û di nava ‘ezabê wê da. Dilê wan xemdare û xelk ji zerer a wan li êmnahî yê da ne. Bedena wan ze’êf (lawaz) û ihtîyacî ya wan kêm û nefsa wan paqije.

Çend rojek kurt xwe radigrin (sebir dikin) ku di peyda ji wan ra rihetîyek dirêj hebê, ev ticareta pir sûd Xwedayê wan ji bona wan hêsan kirîye. Dinyayê qesta wan kirîye û ew wê naxwazin û, ewê ew esîr kirine lê ew canê xwe didin û xwe ji esîrîyê xilas dikin.

Hindîke di şevê da, ew ji pêve ne

وَتَعَالَى خَلْقَ الْخَلْقَ حِينَ خَلَقَهُمْ غَنِيّاً عَنْ طَاعَتِهِمْ آمِناً مِنْ مَعْصِيَتِهِمْ، لِأَنَّهُ لاَ تَضُرُّهُ مَعْصِيَةُ مَنْ عَصَاهُ، وَلاَ تَنْفَعُهُ طَاعَةُ مَنْ أَطَاعَهُ، فَقَسَمَ بَيْنَهُمْ مَعَايِشَهُمْ، وَوَضَعَهُمْ مِنَ الدُّنْيَا مَوَاضِعَهُمْ.

فَالْمُتَّقُونَ فِيهَا هُمْ أَهْلُ الْفَضَائِلِ:

مَنْطِقُهُمُ الصَّوَابُ، وَمَلْبَسُهُمُ الاْقْتِصَادُ، وَمَشْيُهُمُ التَّوَاضُعُ. غَضُّوا أَبْصَارَهُمْ عَمَّا حَرَّمَ اللهُ عَلَيْهِمْ، وَوَقَفُوا أَسْمَاعَهُمْ عَلَى الْعِلْمِ النَّافِعِ لَهُمْ. نَزَلَتْ أَنْفُسُهُمْ مِنْهُمْ فِي الْبَلاَءِ كَالَّتِي نَزَلَتْ فِي الرَّخَاءِ.

لَوْ لاَ الأَجَلُ الَّذِي كَتَبَ اللهُ عَلَيْهِمْ لَمْ تَسْتَقِرَّ أَرْوَاحُهُمْ فِي أَجْسَادِهِمْ طَرْفَةَ عَيْنٍ، شَوْقاً إِلَى الثَّوَابِ، وَخَوْفاً مِنَ الْعِقَابِ.

عَظُمَ الْخَالِقُ فِي أَنْفُسِهِمْ فَصَغُرَ مَا دُونَهُ فِي أَعْيُنِهِمْ، فَهُمْ وَالْجَنَّةُ كَمَنْ قَدْ رَآهَا، فَهُمْ فِيهَا

(mijûlê nimêjê ne) û piç piçên Qur’anê dixûnin, ewê dixûnin û bi tertîl (hêdî hêdî û bi fikir) dixûnin. Li demê xwendinê da xwe pê wê xemdar dikin û li derman kirina derdê xwe digerin. Vêca dema bighên ayetekî ku (bişaret û) mizgînî têda ye, lê disekinin û lê tima dibin û dilê wan bi şewq difirijîyê û xweşî yan tînin ber çavê xwe. Û dema bighên ayetekî ku tirsandin têda heye, gohê dil bi alîyê wêve didin û wereng hesab dikin ku qêr û dengê fûrîna cehnemê di gohê wan da ye. Vêca (bi rukû’ê) tewandî ne; ehnî û kefdest û çûk û sertlî bi ‘erdêve danîne û azad kirina xwe ji Xwedê dixwazin.

Bi rojve jî ew nerm û helîm û zana û qenckar û bi teqwa ne, ku tirsa ji Xwedê wisa ew zirav kirine wek çawa pê tiraşînê tîr zirav dibê, ewê berê xwe bidê wan ewa nexweş (nesax) hesab dikê, halhale ew qe nexweş nînin; û dibêjê: ‘eqlê wan têk çûye!! Ĥeqîqet ev e ku karek mezin, halê wan têk daye.

Bi ‘emelê xwe yê kêm razî nînin û karê xwe yê zehfî, pir nizanin, vêca ew li bal xwe li bin ithamî da ne û ji kiryarên xwe ditirsin.

Dema bi qencî pesnê yêk ji wan bê dayîn ji wê ya derheq wî da hatî gotin ditirsihê û dibêjê: Ez baştir ji herkesî

مُنَعَّمُونَ، وَهُمْ وَالنَّارُ كَمَنْ قَدْرَآهَا، فَهُمْ فِيهَامُعَذَّبُونَ. قُلُوبُهُمْ مَحْزُونَةٌ، وَشُرُورُهُمْ مَأْمُونَةٌ، وَأَجْسَادُهُمْ نَحِيفَةٌ، وَحَاجَاتُهُمْ خَفِيفَةٌ، وَأَنْفُسُهُمْ عَفِيفَةٌ.

صَبَرُوا أَيَّاماً قَصِيرَةً أَعْقَبَتْهُمْ رَاحَةً طَوِيلَةً، تِجَارَةٌ مَرْبِحَةٌ، يَسَّرَهَا لَهُمْ رَبُّهُم. أَرَادَتْهُمُ الدُّنْيَا وَلَمْ يُرِيدُوهَا، وَأَسَرَتْهُمْ فَفَدَوْا أَنْفُسَهُمْ مِنْهَا.

أَمَّا اللَّيْلَ فَصَافُّونَ أَقْدَامَهُمْ، تَالِينَ لِأَجْزَاءِ الْقُرْآنِ يُرَتِّلُونَهَا تَرْتِيلاً، يُحَزِّنُونَ بِهِ أَنْفُسَهُمْ، وَيَسْتَثِيرُونَ بِهِ دَوَاءَ دَائِهِمْ، فَإِذَا مَرُّوا بِآيَة فِيهَا تَشْوِيقٌ رَكَنُوا إِلَيْهَا طَمَعاً، وَتَطَلَّعَتْ نُفُوسُهُمْ إِلَيْهَا شَوْقاً، وَظَنُّوا أَنَّهَا نُصْبَ أَعْيُنِهِمْ، وَإِذَا مَرُّوا بِآيَة فِيهَا تَخْوِيفٌ أَصْغَوْا إِلَيْهَا مَسَامِعَ قُلُوبِهِمْ، وَظَنُّوا أَنَّ زَفِيرَ جَهَنَّمَ وَشَهِيقَهَا فِي أُصُولِ آذَانِهِمْ، فَهُمْ حَانُونَ عَلَى أَوْسَاطِهِمْ، مُفْتَرِشُونَ لِجَبَاهِهِمْ وَأَكُفِّهِمْ، وَأَطْرَافِ أَقْدَامِهِمْ، يَطْلُبُونَ إِلَى اللهِ فِي فَكَاكِ رِقَابِهِمْ.

xwe nas dikim û bi xwe dizanim û Xwedayê min jî ji min pitir agahî û zanîn derheq min da heye, ey Xuda, ji ber wê ya ew dibêjin, li min negire û min baştir bike ji wê ya ew guman dikin û li min bibore û ‘efû bike wê ya ew pê nizanin.

Ji nîşanên her yêk ji wan ev e ku: Tu dibînî ew di karê dînî da bi hêz û jêhatî ye û digel wê çendê ku hay ji xwe mayî ye, nerme û îmana wî hevrê ye digel yeqînê, ji zanînê ra kulboye û ‘ilmê wî hevrê digel hilm û nermîyê ye, digel dewlemendîyê mesrefa wî qutîtî ye (navincî ye), di ‘ibadet da ehlê xuşû’ê ye, di nedarîyê da jî li hevketî û spehî ye û li wextê dijwarîyê da sebirdare û peyketina wî li malê helal da ye û ji hidayet bûnê ra bi keyf û neşate û ji timahîyê dûre.

Li halê kirina karê qenc û baş da jî li nav tirsê da ye, xema wî şukir kirine heta lê dibê şev û xema wî zikir kirine heta lê dibê sibeh. Bi tirs, şeva xwe dibê serî û bi keyfxweşî lê dibê sibeh. Tirsa wî ji wê xefletê ye ku newebê serda bigirê û keyfa wî ji ber wê rehmet û fezla Xwedê ye ku gihayîyê.

Eger nefsa wî ji kirina karê ku lê xweş nayê ne gohdarî ya wî bikê, ewê

وَأَمَّا النَّهَارَ فَحُلَمَاءُ عُلَمَاءُ، أَبْرَارٌ أَتْقِيَاءُ، قَدْ بَرَاهُمْ الْخَوْفُ بَرْيَ الْقِدَاحِ، يَنْظُرُ إِلَيْهِمُ النَّاظِرُ فَيَحْسَبُهُمْ مَرْضَى، وَمَا بِالْقَوْمِ مِنْ مَرَض، وَيَقُولُ: قَدْ خُولِطُوا! وَلَقَدْ خَالَطَهُمْ أَمْرٌ عَظِيمٌ!

لاَ يَرْضَوْنَ مِنْ أَعْمَالِهِمُ الْقَلِيلَ، وَلاَ يَسْتَكْثِرُونَ الْكَثِيرَ، فَهُمْ لأَنْفُسِهِمْ مُتَّهِمُونَ، وَمِنْ أَعْمَالِهِمْ مُشْفِقُونَ.

إِذَا زُكِّيَ أَحَدٌ مِنْهُمْ خَافَ مِمَّا يُقَالُ لَهُ، فَيَقُولُ: أَنَا أَعْلَمُ بِنَفْسِي مِنْ غَيْرِي، وَرَبِّي أَعْلَمُ مِنِّي بِنَفْسِي! اللَّهُمَّ لاَ تُؤَاخِذْنِي بِمَا يَقُولُونَ، وَاجْعَلْنِي أَفْضَلَ مِمَّا يَظُنُّونَ، وَاغْفِرْ لِي مَا لاَ يَعْلَمُونَ.

فَمِنْ عَلاَمَةِ أَحَدِهِمْ أَنَّكَ تَرَى لَهُ قُوَّةً فِي دِين، وَحَزْماً فِي لِين، وَإِيمَاناً فِي يَقِين، وَحِرْصاً فِي عِلْم، وَعِلْماً فِي حِلْم، وَقَصْداً فِي غِنىً، وَخُشُوعاً فِي عِبَادَة، وَتَجَمُّلاً فِي فَاقَة، وَصَبْراً

mehrûm (bê behr) dikê ji wê ya ew hejê dikê, hez kirina wî di wê da ye ewa ji nav naçî û xwe vedere ji wê ya ne bidewam û namînê. Nermîyê têkel ‘ilm û zanînê dikê û gotin û ‘emel digel hev rêk têxê.

Tu ewî dibînî ku hêvî kurt û kêm şimitîne, dilê wî xaşi’e û nefsa wî qani’, xarina wî kême û karê wî rihet û hêsan, dînê wî paraztî ye û şehweta wî mirî ye û xezeba wî daketî ye. Hêvîya xêr û başîyê jê heye û mirov ji xirabî gehandina wî li êmnahîyê da ye.

Eger li nav koma xafilan da bê li nav zakiran da tê nivîsîn û eger li nav zakiran da bê, ji xafilan nayê nivîsîn. Wî yê zulm lê kirî ‘efû dikê û danê dikê digel wî yê ew bê behr kirî, girêdanê çêdikê digel wî yê jê biryî. Pîs axiftin ji wî dûre û xeberdana wî nerme û karê kûtî (nehez) li bal wî peyda nabê û başî ileh digele; xêr û başî ya wî berê xwe daye û xirabî ya wî pişt daye.

Di wextê dijwarî yên hejandinker da bi weqare û nahejê, di nexweşî ya da pir sebirdare û li wextê rihetîyê (berfirehî) da pir şukirdare.

Zulmê nakê li wî kesê kerbê wî jê hatî û xwe gonehkar nakê ji ber wî yê hejê dikê, heqîyê dibêjê hêj şehdeyî li ser nehatî dayîn, ewa dayînê ku

فِي شِدَّة، وَطَلَباً فِي حَلاَل، وَنَشاطاً فِي هُدىً، وَتَحَرُّجاً عَنْ طَمَع.

يَعْمَلُ الأَعْمَالَ الصَّالِحَةَ وَهُوَ عَلَى وَجَل، يُمْسِي وَهَمُّهُ الشُّكْرُ، وَيُصْبِحُ وَهَمُّهُ الذِّكْرُ، يَبِيتُ حَذِراً، وَيُصْبِحُ فَرِحاً، حَذِراً لَمَّا حُذِّرَ مِنَ الْغَفْلَةِ، وَفَرِحاً بِمَا أَصَابَ مِنَ الْفَضْلِ وَالرَّحْمَةِ.

إِنِ اسْتَصْعَبَتْ عَلَيْهِ نَفْسُهُ فِيمَا تَكْرَهُ لَمْ يُعْطِهَا سُؤْلَهَا فِيمَا تُحِبُّ.

قُرَّةُ عَيْنِهِ فِيمَا لاَ يَزُولُ، وَزَهَادَتُهُ فِيمَا لاَ يَبْقَى، يَمْزُجُ الْحِلْمَ بِالْعِلْمِ، وَالْقَوْلَ بِالْعَمَلِ.

تَرَاهُ قَرِيباً أَمَلُهُ، قَلِيلاً زَلَلُهُ، خَاشِعاً قَلْبُهُ، قَانِعَةً نَفْسُهُ، مَنْزُوراً أَكْلُهُ، سَهْلاً أَمْرُهُ، حَرِيزاً دِينُهُ، مَيِّتَةً شَهْوَتُهُ، مَكْظُوماً غَيْظُهُ. الْخَيْرُ مِنْهُ مَأْمُولٌ، وَالشَّرُّ مِنْهُ مَأْمُونٌ.

إِنْ كَانَ فِي الْغَافِلِينَ كُتِبَ فِي الذَّاكِرِينَ، وَإِنْ كَانَ فِي

biparêzê ji nav nabê, ewa jê xwestîn ku li bîra xwe da bihêlê ji bîr nakê û pê nav û leqebên nebaş gazî xelkê nakê, zererê nagihênê cîranê xwe û li wextê musîbet û belayê da lûman (şematet) nakê û keyfa xwe naynê, qet nakevê nav karê batil û pûçek da û ji heqîyê dernakevê.

Eger bê deng bibê bê dengî ya wî ewî xemdar nakê; eger bikenê dengê xwe bilind nakê; eger neheqîyek digel bê kirin (di cî da tûlê nagirê) sebir dikê heta Xwedê heyfa wî hildê.

Nefsa wî ji ber wî li zehmetê da ye û xelk ji ber wî di rihetîyê da ne; ew xwe ji axreta xwe ra didê zehmetê û xelkê rihet dihêlê.

Dûr bûna wî ji kesê ku xwe jê dûr digrê ji ber zuhd û pakîyê ye, û xwe nêzîkê kî bikê, ji ber xweş exlaqî û dilovanî ya wî ye. Ne xwe dûr girtina wî ji ber kibr û xwe mezin kirinê ye û ne jî nêzîk bûna wî ji bona hîle û xapandinê ye.

***Rawî dibêjê**: Vêca Hemam qêrek da û can ji bedena wî derket. Mîrê bawerdaran jî kerem kir:*

İha, wellahî tirsa min derheq wî da ji vê yêkê bû. *Di pey ra got:* Şîretên cîgir digel ehlê xwe, iha wiha dikê!

Vêca kesekî gotê: Tu çawa? Ey emîr el mu'minîn! Çire wel te nekir? Kerem kir:

الذَّاكِرِينَ لَمْ يُكْتَبْ مِنَ الْغَافِلِينَ. يَعْفُو عَمَّنْ ظَلَمَهُ، وَيُعْطِي مَنْ حَرَمَهُ، وَيَصِلُ مَنْ قَطَعَهُ. بَعِيداً فُحشُهُ، لَيِّناً قَوْلُهُ، غَائِباً مُنْكَرُهُ، حَاضِراً مَعْرُوفُهُ، مُقْبِلاً خَيْرُهُ، مُدْبِراً شَرُّهُ.

فِي الزَّلاَزِلِ وَقُورٌ، وَفِي الْمَكَارِهِ صَبُورٌ، وَفِي الرَّخَاءِ شَكُورٌ.

لاَ يَحِيفُ عَلَى مَنْ يُبْغِضُ، وَلاَ يَأْثَمُ فِيمَنْ يُحِبُّ. يَعْتَرِفُ بِالْحَقِّ قَبْلَ أَنْ يُشْهَدَ عَلَيْهِ. لاَ يُضَيِّعُ مَا اسْتُحْفِظَ، وَلاَ يَنْسَى مَا ذُكِّرَ، وَلاَ يُنَابِزُ بِالأَلْقَابِ، وَ لاَ يُضَارُّ بِالْجَارِ، وَلاَ يَشْمَتُ بِالْمَصَائِبِ، وَلاَ يَدْخُلُ فِي الْبَاطِلِ، ولاَ يَخْرُجُ مِنَ الْحَقِّ.

إِنْ صَمَتَ لَمْ يَغُمَّهُ صَمْتُهُ، وَإِنْ ضَحِكَ لَمْ يَعْلُ صَوْتُهُ، وَإِنْ بُغِيَ عَلَيْهِ صَبَرَ حَتّى يَكُونَ اللهُ هُوَ الَّذِي يَنْتَقِمُ لَهُ.

نَفْسُهُ مِنْهُ فِي عَنَاء، وَالنَّاسُ

Wey, ji tera! Mirina herkesî wextek jê re heye ku ji wê derbaz nakê û sebebek heye ku ji wê dernakevê. Ji van axiftina neke ku eva he pif kirina şeytane li ser zimanê te (şeytan eva gotina bi te didê gotin).

AXIFTINA 194

Behsa minafiqan dikê (heçweku li bajarê Kûfayê axift bê).

Em hemdê wî Xudayî dikîn ku tewfîqa ta'et daye û ji ne gohdarîyê dûr kirîye, em temam kirina qencî û ihsanê ji wî dixwazîn, her wiha xwe girtina bi werîsê wî jî.

Em şehde didîn ku Muhemmed 'evd û hinartî yê wî ye ku ji bona razî bûna wî xwe avêt nav hemî dijwarî yan û kol û mereq, qurt û qurt bi ser xwe da kirin. Heta bi wê derê ku nêzîkên wî dûrûyî digel kirin û yên ji wî dûr li dijê wî da xwe dan hev; 'Ereban ji bona hêriş birina ser wî hefsar berdan û pê şivan li bin zikê heywana xwe dan, da ku kîn û rika xwe, ji cihên dûr bînin û birêjin ser cihê wî.

Ey 'evdên Xwedê, ez wesîyeta teqwatî ya Xwedê li hewe dikim û ez hewe ji ehlê nifaqê ditirsînim; minafiq, ji rê derin û ji rê derkerin, ew bi xwe

مِنْـهُ فِـي رَاحَـة. أَتْعَـبَ نفسـه لاِخِرَتِهِ، وَأَرَاحَ النَّاسَ مِنْ نَفْسِهِ.

بُعْدُهُ عَمَّنْ تَبَاعَدَ عَنْـهُ زُهْـدٌ وَنَزاهَةٌ، وَدُنُوُّهُ مِمَّنْ دَنَا مِنَهُ لِـينٌ وَرَحْمَـةٌ، لَـيْسَ تَبَاعُـدُهُ بِكِبْـر وَعَظَمَـة، وَلاَ دُنُـوُّهُ بِمَكْـر وَخَدِيعَة.

قال: فصعق همّام رحمه الله صعقةً كانت نفسُه فيها. فقال أميرالمؤمنين عليه السلام:

أَمَا وَاللهِ لَقَدْ كُنْتُ أَخَافُهَا عَلَيْهِ. ثُمَّ قَالَ: هكَذَا تَصْنَعُ الْمَوَاعِظُ البَالِغَةُ بِأَهْلِهَا؟

فقال له قائل: فما بالك يا أميرالمؤمنين ؟ فقال عليه السلام:

وَيْحَكَ، إِنَّ لِكُلِّ أَجَل وَقْتاً لاَ يَعْدُوهُ، وَسَبَباً لاَ يَتَجَاوَزُهُ، فَمَهْلاً، لاَ تعُدْ لِمِثْلِهَا، فَإِنَّمَا نَفَثَ الشَّيْطَانُ عَلَى لِسَانِكَ!

[194]

من خطبة له عليه السلام يصف فيها المنافقين

نَحْمَدُهُ عَلَى مَا وَفَّقَ لَـهُ مِـنَ الطَّاعَةِ، وَذَادَ عَنْهُ مِـنَ الْمَعْصِـيَةِ،

şimitîne û xelkê jî dişimitînin, her car rengekî li xwe didin û her roj gotinekî dibêjin û rêkekî didin berxwe û, ji rê deranîna hewe ra ji hemî wesîlan istifade dikin û li her cihî kemînê digrin. Dilê wan nexweşe, nexweşîyek bê derman, lê belê eşkereyê wan xemilandî û paqije.

Ji xefve hirve wêve diçin û wek xwe xişikênên di nav bîşîyan da nerm û veşartî rêve diçin. Axiftina wan wek dermane û bi ziman saxî û şifaya xelkê dixwazin lê bi kiryar derdê bê derman. Eger xelk li rihetîyê da bin ew hesedê bi wan dibin û hema rastî belayê dixwazin û benê hêvî yan dibirin.

Li her rêkekî da hinek gohrî xwe kirine û dane telef kirin. Ewan li her dilekî da mehderkarek heye û li bal her nexweşî û kulekî rûndikekî dirêjin (bi derew rûndik ji çavê wan tên) ew pesnan bi deyn didin hev û hêvîya kirîya wê ne.

Eger tiştekî bixwazin pêkutanê li ser dikin û eger lome li wan bê kirin hetk û şermê dibin û eger Ĥukum bidin zêdegavîyê têda dikin.

Ji her heqekî ra batilek hazir kirine û ji her rastekî ra xwehrîyek û ji her saxekî ra qatilek û ji her dergehekî ra kilîdek û ji her şevekî ra çirayek.

Bê hêvîtî kirine wesîla kulbûtî ya

وَنَسْأَلُهُ لِمِنَّتِهِ تَمَاماً، وَبِحَبْلِهِ اعْتِصَاماً.

وَنَشْهَدُ أَنَّ مُحَمَّداً عَبْدُهُ وَرَسُولُهُ، خَاضَ إِلَى رِضْوَانِ اللهِ كُلَّ غَمْرَة، وَتَجَرَّعَ فِيهِ كُلَّ غُصَّة، وَقَدْ تَلَوَّنَ لَه الأَدْنَوْنَ، وَتَأَلَّبَ عَلَيْهِ الأَقْصَوْنَ، وَخَلَعَتْ إِلَيْهِ الْعَرَبُ أَعِنَّتَهَا، وَضَرَبَتْ إِلَى مُحَارَبَتِهِ بُطُونَ رَوَاحِلِهَا، حَتَّى أَنْزَلَتْ بِسَاحَتِهِ عَدَاوَتَهَا، مِنْ أَبْعَدِ الدَّارِ، وَأَسْحَقِ الْمَزَارِ.

أُوصِيكُمْ عِبَادَ اللهِ، بِتَقْوَى اللهِ، وَأُحَذِّرُكُمْ أَهْلَ النِّفَاقِ، فَإِنَّهُمُ: الضَّالُّونَ الْمُضِلُّونَ، وَالزَّالُّونَ الْمُزِلُّونَ. يَتَلَوَّنُونَ أَلْوَاناً، وَيَفْتَنُّونَ افْتِنَاناً، وَيَعْمِدُونَكُمْ بِكُلِّ عِمَاد، وَيَرْصُدُونَكُمْ بِكُلِّ مِرْصَاد. قُلُوبُهُمْ دَوِيَّةٌ، وَصِفَاحُهُمْ نَقِيَّةٌ.

يَمْشُونَ الْخَفَاءَ، وَيَدِبُّونَ الضَّرَاءَ. وَصْفُهُمْ دَوَاءٌ، وَقَوْلُهُمْ شِفَاءٌ، وَفِعْلُهُمُ الدَّاءُ الْعَيَاءُ. حَسَدَةُ الرَّخَاءِ، وَمُؤَكِّدُوا الْبَلاَءِ،

xwe, da bazara xwe germ bihêlin û tiştên xwe bi bihayek girantir bifirûşin, daxivin vêca rengê heqîyê bi axiftina xwe ra didin, behsa tiştekî dikin vêca hîlan dikin, rêkê (dîn) sist dikin û pêç û xwehrîyê têxinê. Ew benda (terefdar) şeytan û pîjkê agir in ***"ew hizba şeytan in, heyhê, bi rastî ewên xusirîyîn, ew hizba şeytan in"***.[91]

وَمُقْنطُوا الرَّجَاء.

لَهُمْ بِكُلِّ طَرِيق صَرِيعٌ، وَإلى كُلِّ قَلْب شَفِيعٌ، وَلِكُلِّ شَجْو دُمُوعٌ. يَتَقَارَضُونَ الثَّنَاءَ، وَيَتَرَاقَبُونَ الْجَزَاء.

إِنْ سَأَلُوا أَلْحَفُوا، وَإِنْ عَذَلُوا كَشَفُوا، وَإِنْ حَكَمُوا أَسْرَفُوا.

قَدْ أَعَدُّوا لِكُلِّ حَقٍّ بَاطِلاً، وَلِكُلِّ قَائِم مَائِلاً، وَلِكُلِّ حَيّ قَاتِلاً، وَلِكُلِّ بَاب مِفْتَاحاً، وَلِكُلِّ لَيْل مِصْبَاحاً.

يَتَوَصَّلُونَ إِلَى الطَّمَعِ بِالْيَأْسِ لِيُقِيمُوا بِهِ أَسْوَاقَهُمْ، وَيُنَفِّقُوا بِهِ أَعْلاَقَهُمْ. يَقُولُونَ فَيُشَبِّهُونَ، وَيَصِفُونَ فَيُمَوِّهُونَ.قَدْ هيّأُوا الطَّرِيقَ، وَأَضْلَعُوا الْمَضِيقَ. فَهُمْ لُمَةُ الشَّيْطَانِ، وَحُمَةُ النِّيرَانِ (أُولئِكَ حِزْبُ الشَّيْطَانِ أَلاَ إِنَّ حِزْبَ الشَّيْطَانِ هُمُ الْخَاسِرُونَ).

۞ AXIFTINA 195 ۞

[195]

Ĥemd ji wî Xudayî ra ewê eser û nîşanên qudret û celal û mezinahî ya xwe eşkere kirî, bi awayekî ku çav li nav 'ecêbên qudreta xwe da heyrî hiştin û bîr û hizir ji nas kirina kûra sifetê xwe paşve da.

Ez şehde didim ku xêncî "Ellah" çi ilah nînin, şehadetek hilketî ji îman û yeqîn û ixilas û ferman birinê. Û ez şehde didim ku Muhemmed bende û resûlê wî ye; ew wextekî rêkir ku nîşanên hidayetê ji nav çûbîn û rêkên dîn veşartî bûn, vêca heq eşkere kir û xelk şîret kirin û ew ji rêka rast ra rênimûn kirin û fermana duristî û 'edaletê da, selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin.

[حمدالله]: الْحَمْدُ لله الَّذِي أَظْهَرَ

We'z û şîret: Evê bizanin ey bendeyên Xwedê ku Xwedê hûn bê

hûde çênekirine û serberedayî ne kirine, ewqas ni’meta li hewe kirî agahî jê heye û qencî yên li hewe kirîn êjmartîye (her tişt bi hesab daye) vêca serketinê û berfireh dana ni’metan ji wî bixwazin û hûn çi dixwazin, ji wî bixwazin, çiko perdeyek nîne ku hewe ji wî cida bikê û çi dergeh nînin ku li ber hewe girtî bimînê, bi rastî ew li her cihî ye û li hemî wext û deman da heye, ew digel hemî cin û mirova ye; dan kirin, xirabîyê ji xezna wîra çênakê û ew çiqa bidê ji heyî ya wî kêm nabê û xwazûk çiqa bixwazin (û bigrin) heyî ya wî xilas nakin. Heçî xwestinê bikê nikarê bighê axrîka wê û kes nikarê pêşîyê li dana wî bigirê û çi deng (gazî) ewî bi xwe ve mijûl nakin ku hay ji ya dî nemînê, dana ni’metekî ewî ji girtina ni’meta dî paşda nagirê. Dema xezeb bikê ji rehmetê paş nakevê û ‘efû kirina kesekî ewî ji ceza dana kesek dî paşve nadê, veşartî bûna wî ne perda eşkere bûna wî ye û eşkere bûna wî ewî ji veşartî bûna wî cida nakê, nêzîke lê dûrê ji gehiştinê, bilinde lê nêzîkê her kesî ye. Eşkereye lê veşartî, xefe lê eşkere ye, ew kirîya hemîyan didê wan lê kirîya wî nayê dan, mexlûq afirand, ne pê bîr û hizrê (teybîr danê) xuliqand û ji ber westihanê jî arîkarî ji wan nexwest.

Ey bendeyên Xwedê, ez şîreta

مِنْ آثَارِ سُلْطَانه وَجَلاَلِ كِبْرِيَائِهِ، مَا حَيَّرَ مُقَلَ الْعُقُولِ مِنْ عَجَائِبِ قُدرَتِهِ وَرَدَعَ خَطَرَاتِ هَمَاهِمِ النُّفُوسِ عَنْ عِرْفَانِ كُنْهِ صِفَتِهِ.

وَأَشْهَدُ أَنْ لاَ إِلهَ إِلاَّ اللهُ، شَهَادَةَ إِيمَان وَإِيقَان، وَإِخْلاَص وَإِذْعَان. وَأَشْهَدُ أَنَّ مُحَمَّداً عَبْدُهُ وَرَسُولُهُ، أَرْسَلَهُ وَأَعْلاَمُ الْهُدَى دَارِسَةٌ، وَمَنَاهِجُ الدِّينِ طَامِسَةٌ، فَصَدَعَ بِالْحَقِّ، وَنَصَحَ لِلْخَلْقِ، وَهَدَى إِلَى الرُّشْدِ، وَأَمَرَ بِالْقَصْدِ صلى الله عليه وآله وسلم.

[العظة]: وَاعْلَمُوا عِبَادَ الله، أَنَّهُ لَمْ يَخْلُقْكُمْ عَبَثـاً، وَلَـمْ يُرْسِـلْكُمْ هَمَلاً، عَلِمَ مَبْلَـغَ نِعَمِـهِ عَلَـيْكُمْ، وَأَحْصَـــى إِحْسَـــانَهُ إِلَـــيْكُمْ، فَاسْتَفْتِحُوهُ وَاسْتَنْجِحُوهُ، وَاطْلُبُـوا إِلَيْهِ وَاسْتَمْنِحُوهُ، فَمَا قَطَعَكُمْ عَنْهُ حِجَابٌ، وَلاَ أُغْلِـقَ عَـنْكُمْ دُونَـهُ بَابٌ، وَإِنَّهُ لَبِكُلِّ مَكَان، وَفِي كُـلِّ حِـين وَأَوَان، وَمَـعَ كُـلِّ إِنْـس وَجَـانّ، لاَ يَثْلِمُـهُ الْعَطَـاءُ، وَلاَ يَنْقُصُهُ الْحِبَاءُ، وَلاَ يَسْتَنْفِدُهُ سَائِلٌ،

teqwatî yê li hewe dikim, ku ew sebebê kunturul û xwe ragirî ya hewe ye. Vêca xwe bi werîsê qewî yê teqwayê bigrin û hana xwe ji heqîqetên wê ra bibin da hewe bighênê rihetî û cihên berfireh û penahgehên qayîm û ‘erdên berketî û bi ‘izzet, ew jî di rojekî da ku ***“çav têda şaqiz dibin”*** û tarîtî hemî cihî li ber xwe digrê û hêştirên avis, bê xudan tên beredayî kirin û li sûrê da tê pif kirin û can ji bedena derdikevin û ziman lal dibin û çîyayên bilind û tehtên qayîm hûr dibin û dirijin, bi awayekî ku wek leylanê ji dûrve bi recf tê dîtin. Cihê ava, wek ‘erdê hişk û rast lê tê, vêca ne mehderkarek heye mehderê bikê û ne dustek heye ku feydê bighênê û ne jî ‘ozrek belayekî paşve didê.

وَلاَ يَسْتَقْصِيهِ نَائِلٌ، وَلاَ يَلْوِيهِ شَخْصٌ عَنْ شَخْص، وَلاَ يُلْهِيهِ صَوْتٌ عَنْ صَوْت، وَلاَ تَجْجُزُهُ هِبَةٌ عَنْ سَلْب، وَلاَ يَشْغَلُهُ غَضَبٌ عَنْ رَحْمَة، وَلاَ تُوَلِّهُهُ رَحْمَةٌ عَنْ عِقَاب، وَلاَ يُجِنُّهُ الْبُطُونُ عَنِ الظُّهُور، وَلاَ يَقْطَعُهُ الظُّهُورُ عَنِ الْبُطُونِ، قَرُبَ فَنَأَى، وَعَلاَ فَدَنَا، وَظَهَرَ فَبَطَنَ، وَبَطَنَ فَعَلَنَ، ودَانَ وَلَمْ يُدَنْ، لَمْ يَذْرَا الْخَلْقَ بِاحْتِيَال، وَلاَ اسْتَعَانَ بِهِمْ لِكَلاَل.

أُوصِيكُمْ عِبَادَ الله، بِتَقْوَى الله، فَإِنَّهَا الزِّمَامُ وَالْقِوَامُ، فَتَمَسَّكُوا بِوَثَائِقِهَا، وَاعْتَصِمُوا بِحَقَائِقِهَا، تَؤُلْ بِكُمْ إِلَى أَكْنَانِ الدَعَةِ، وَأَوْطَانِ السَّعَةِ، وَمَعَاقِلِ الْحِرْزِ، وَمَنَازِلِ الْعِزِّ في (يَوْم تَشْخَصُ فِيهِ الأَبْصَارُ)، وَتُظْلِمُ لَهُ الأَقْطَارُ، وَتُعَطَّلُ فِيهِ صُرُومُ الْعِشَارِ، وَيُنْفَخُ فِي الصُّور، فَتَزْهَقُ كُلُّ مُهْجَة، وَتَبْكَمُ كُلُّ لَهْجَة، وَتَذِلُّ الشُّمُّ الشَّوَامِخُ، وَالصُّمُّ الرَّوَاسِخُ، فَيَصِيرُ

AXIFTINA 196

Hatina Pêğember: Ew bi Pêğemberî rêkir li zemanekî da ku çi nîşanek vedayî û çi çirayê ronahî û çi rêkek eşkere tinebûn.

Şîreta zuhdê: Ez wesîyeta teqwatî ya Xwedê li hewe dikim, ey ‘evdên Xwedê! Ez hişyarîyê didim hewe derheq dinyayê da, çiko bi rastî ew mala jê barkirinê û cihê zehmet û meşeqqetê ye, kesê di wê da hema her

li ser seferê ye û ewê cihê xwe têda germ kirî hazirê cidayîyê. Dinya ileh ehlê xwe dihejênê wek wê gemîya li nav pêlên behrê da ketî ber tûfanê; hinek nûqî dibin û dimirin, hinek jî ser pêla dikevin û ji mirinê xilas dibin û ba, ewa hirve wêve dibê û têxê nav tirs û dehşetê da. Vêca kesê xerq (nûqî) bû, êdî destve nayê û ewê xilas bî jî berew telef bûnê diçê.

Ey ‘evdên Xwedê! A niha bizanin; hêca ziman, vekirî ne û dişixulin û beden salim in û endam nerm û fermanber in û cihê li xwe zivirînê berfireh û cewlangeh pehn û fireh e, (a niha bi xwe bihesin û dest bavêjin kar) pêşya wê çendê da ku furset (derfet) ji dest biçê û mirin bighê, vêca hûn ji bona xwe ewê hatî (gehayî), hesab bikin û nemînin hêvîya hatina wê.

AXIFTINA 197

Bi rastî ew sehabên emanet darên Muhemmed selewatên Xwedê li ser wî û alê wî bin zanin ku heta yêk bêhnê tinê jî min fermana Xwedê û Pêğemberê wî paşda nedaye û min bi

صَلْدُهَا سَـرَاباً رَقْرَقـاً، وَمَعْهَـدُهَا قَاعاً سَمْلَقاً، فَلاَ شَفِيعٌ يَشْفَعُ، وَلاَ حَمِيمٌ يَنْفَعُ، وَلاَ مَعْذِرَةٌ تَدْفَعُ.

[196]

[بعثة النبي صلى الله عليه وآله وسلم]

بَعَثَهُ حِينَ لاَ عَلَـمٌ قَـائِمٌ، وَلاَ مَنَارٌ سَاطِعٌ، وَلاَ مَنْهَجٌ وَاضِحٌ.

[العظة بالزهد] أُوصِيكُمْ عِبَادَ اللهِ، بِتَقْوَى اللهِ، وَأُحَذِّرُكُمُ الدُّنْيَا، فَإِنَّهَـا دَارُ شُـخُوص، وَمَحَلَّـةُ تَنْغِيص، سَاكِنُهَا ظَاعِنٌ، وَقَاطِنُهَا بَائِنٌ، تَمِيدُ بِأَهْلِهَا مَيَدَانَ السَّفِينَةِ تَقْصِفُهَا الْعَوَاصِـفُ فِـي لُجَـجِ الْبِحَارِ، فَمِـنْهُمُ الْغَـرِقُ الْوَبِـقُ، وَمِـنْهُمُ النَّـاجِي عَلَـى مُتُـونِ الأَمْوَاجِ، تَحْفِزُهُ الرِّيَاحُ بِأَذْيَالِهَا، وَتَحْمِلُهُ عَلَى أَهْوَالِهَا، فَمَا غَرِقَ مِنْهَا فَلَيْسَ بِمُسْتَدْرَك، وَمَا نَجَـا مِنْهَا فَإِلَى مَهْلَك!

عِبَـادَ اللهِ، الأَنَ فَـاعْلَمُوا،

dil û can arîkarî ya Pêğember kirîye li cihan ku pehlewan paşve dihatan zivirandin û gav paşve dihatan avêtin, ev cesaret kerema Xwedê bî ku di gel min kirbû.

Şik di vê da jî nîne ku dema Pêğemberê Xwedê selewat li ser wî û alê wî bin wefat kirî, serê wî li ser singê min bî û canê wî li kefa destê min da herikî û min ew li rûyê xwe da[92] û ew ez bûm ewê şûştina wî (s) mayî hêvîyêve û melaîket arîkarê min bûn. Vêca mal û hewş hemî pêkve qêr û hewar bî û komek dihatan xarê û komek bilind dibûyan bo ‘esmana, heta bêhnekî jî ahêna wan ji gohê min xilas nedibîya, selewat didanê heta me ew li mezara wî da veşart. Vêca li halê saxî û mirinê da, çi kes ji min musteheqtir e ji wî ra?

Nixwe Ji bona cihada digel dijminê xwe ‘eqlê xwe bikar bibin (bişixulênin) û niyeta xwe dorist û xalis bikin.

Pa, sond bi wî yê xêncî wî çi ilah neyîn, muheqeq ez li ser rêka heqim û ew şimitîngeha batilê ne.

Eve ez wê dibêjim ya hûn gohlê dibin û, ez ji xwe û hewe ra daxwaza lê bûrînê ji Xwedê dikim.

وَالأَلْسُنُ مُطْلَقَةٌ وَالأَبْدَانُ صَحِيحَةٌ وَالأَعْضَاءُ لَدْنَةٌ وَالْمُنقَلَبُ فَسِيحٌ وَالْمَجَالُ عَرِيضٌ، قَبْلَ إِرْهَاقِ الْفَوْتِ، وَحُلُولِ الْمَوْتِ، فَحَقِّقُوا عَلَيْكُمْ نُزُولَهُ، وَلاَ تَنْتَظِرُوا قُدُومَهُ.

[**197**]

وَلَقَدْ عَلِمَ الْمُسْتَحْفَظُونَ مِنْ أَصْحَابِ مُحَمَّد صلى الله عليه وآله أَنِّي لَمْ أَرُدَّ عَلَى الله وَلاَ عَلَى رَسُولِهِ سَاعَةً قَطُّ، وَلَقَدْ وَاسَيْتُهُ بِنَفْسِي فِي الْمَوَاطِنِ الَّتي تَنْكُصُ فِيهَا الأَبْطَالُ وَتَتَأَخَّرُ الأَقْدَامُ، نَجْدَةً أَكْرَمَنِي اللهُ بِهَا.

وَلَقَدْ قُبِضَ رَسُولُ الله صلى الله عليه وآله وَإِنَّ رَأْسَهُ لَعَلَى صَدْرِي. وَلَقَدْ سَالَتْ نَفْسُهُ فِي كَفِّي، فَأَمْرَرْتُهَا عَلَى وَجْهِي. وَلَقَدْ وُلِّيتُ غُسْلَهُ صلى الله عليه وآله

AXIFTINA 198

Zanîna Xwedê: Ew bi qêrqêra heywanan li çûlan û bê emrîya bendeyan li tinêtîyê da û hat û çûa masî yan li behrên kûr û ser hevda hatina avê li ber bayên dijwar, zanê. Ez şehde didim ku Muhemmed selat û selam li ser wî û alê wî bin bijartî yê Xuda û înerê wehî û rehmeta wî ye.

Şîreta teqwatîyê: Emma be'd. Vêca ez wesîyet û şîreta teqwatî ya Xwedê li hewe dikim, ewê des avêtî çêkirina hewe û, zivirîna hewe bi alîyê wîve û pêk hatina ihtîyacî yên hewe jî bi wî ye; û axrîka xwest û vîyanên hewe û rêka rasta hewe bal wî veye; û li wextê tirs û dehşetê cihê hewar û xwe pê girtina heweye. Rastî ev e ku teqwatî ya Xwedê dermanê derdê dilên hewe û ronahî ya tarîtî ya qelbên hewe ye; şifaye ji nexweşî ya bedena hewe re û duristkerê xirabî ya dilê hewe ye. Ew pak kerê qirêja rihê hewe û bînakerê çavê hewe yê nabînê û êmnahî ya ji tirs û dehşeta hewe û ronahî ya tarîtî ya hewe ye.

Vêca nixwe hûn goh dana Xwedê ji xwe re bikin cil û libasê binve, ne ku

وَالْمَلاَئِكَةُ أَعْوَانِي، فَضَجَّتِ الدَّارُ و الأَفْنِيَةُ، مَلاَّ يُهْبِطُ، وَمَلاَّ يَعْـرُجُ، وَمَا فَارَقَتْ سَمْعِي هَيْنَمَـةٌ مِـنْهُمْ، يُصَلُّونَ عَلَيْهِ حَتَّـى وَارَيْنَـاهُ فِـي ضَرِيحِهِ.

فَمَنْ ذَا أَحَـقُّ بِـهِ مِنِّـي حَيّـاً وَمَيِّتاً؟ فَانْفُـذُوا عَلَـى بَصَـائِرِكُمْ، وَلْتَصْدُقْ نِيَّاتُكُمْ فِي جِهَادِ عَدُوِّكُمْ.

فَوَالَّـذِي لاَإِلَـهَ إِلاَّ هُـوَ إِنِّـي لَعَلَى جَادَّةِ الْحَقِّ، وَإِنَّهُـمْ لَعَلَـى مَزَلَّةِ الْبَاطِلِ.

أَقُولُ مَا تَسْـمَعُونَ، وَأَسْـتَغْفِرُ اللهَ لِي وَلَكُمْ!

[**198**]

إحاطة علم الله بالجزئيات

يَعْلَـمُ عَجِـيجَ الْوُحُـوشِ فِـي الْفَلَـوَاتِ، وَمَعَاصِـيَ الْعِبَـادِ فِـي الْخَلَوَاتِ، وَاخْـتِلاَفَ النِّينَـانِ فِـي الْبِحَارِ الْغَـامِرَاتِ، وَتَلاَطُـمَ الْمَـاءِ بِالرِّيَـاحِ الْعَاصِـفَاتِ. وَأَشْـهَدُ أَنَّ مُحَمَّداً نَجِيبُ اللهِ، وَسَـفِيرُ وَحْيِـهِ، وَرَسُولُ رَحْمَتِهِ.

libasê serve; belkî ewê bikin nav rihê xwe ra û li bin pirasî yên xwe da ewî cî bi cî bikin, ewê bikin serok û ser karûbarê xwe ra deynin, bila ew serkanî ya hewe bê ji wextê têhnîtîyê ra û mehderkarê hewe bê ji gihana xwesta hewe ra, bila mertalê hewe bê ji roja tirsa hewe ra, ewê ji xwe ra bikin çiraya qebra (gor) xwe û rihetkerê xwe li dirêjîya dehşeta xwe da û ewê ji xwera bikin dil firehî li cihê sekna xwe da. Çiko rastî ev e ku gohdana Xwedê mirov diparêzê ji cihê telef bûn; û ji wa cihên tirsê ku li ser rêka wî ye û ji germîya agirê bi gurî û bi pêt xilas dikê.

Vêca kesê xwe bi teqwayê bigrê wê zehmetîyên jê re nêzîk bûyîn dûr bibin, wê tehlî jê re şîrîn bibin û pêlên bela ku dûra wî girtine xwe jê bidin alî û dûra wî vekin û dijwarî wê jê re bizivirin ser rihetîyê û barana rehmeta ilahî ku jê hatibî birîn wê ji nû ve bibarê û rehmeta heq ku jê revî bî wê berê xwe bidîyê û serkanîyên ni'metê ku çik bibon wê biherikin û bereket ku piçû piçû (kêm kêm) dihata wê bûş (pir -gelek -zêde) bibê û wek barana lib mezin ser wî da bibarê.

Vêca nixwe bitirsin ji Wî Xwedayê pê we'z û şîretan menfî'et dayî hewe û bi rêka Pêğemberên Xwe ve hûn şîret

[الوصية بالتقوى]: أَمَّـا بَعْـدُ، فَإِنِّي أُوصِيكُمْ بِتَقْـوَى اللهِ الَّـذِي ابْتَــدَأَ خَلْقَكُــمْ، وَإِلَيْــهِ يَكُــونُ مَعَادُكُمْ، وَبِهِ نَجَاحُ طَلِبَتِكُمْ، وَإِلَيْهِ مُنْتَهَـى رَغْبَـتِكُمْ، وَنَحْـوَهُ قَصْـدُ سَبِيلِكُمْ، وَإِلَيْهِ مَرَامِـي مَفْـزَعِكُمْ، فَإِنَّ تَقْوَى اللهِ دَوَاءُ دَاءِ قُلُـوبِكُمْ، وَبَصَـرُ عَمَـى أَفْئِـدَتِكُمْ، وَشِـفَاءُ مَرَضِ أَجْسَادِكُمْ، وَصَلَاحُ فَسَـادِ صُدُورِكُمْ، وَطُهُورُ دَنَسِ أَنْفُسِكُمْ، وَجِلَاءُ عَشَا أَبْصَارِكُمْ، وَأَمْنُ فَزَعِ جَأْشِكُمْ، وَضِيَاءُ سَوَادِ ظُلْمَتِكُمْ.

فَاجْعَلُوا طَاعَةَ اللهِ شِعَاراً دُونَ دِثَارِكُمْ، وَدَخِيلاً دُونَ شِـعَارِكُمْ، وَلَطِيفاً بَـيْنَ أَضْـلَاعِكُمْ، وَأَمِيـراً فَـوْقَ أُمُـورِكُمْ، وَمَـنْهَلاً لِحِـينِ وِرْدِكُم، وَشَفِيعاً لِـدَرَكِ طَلِبَـتِكُمْ، وَجُنَّةً لِيَـوْمِ فَـزَعِكُمْ، وَمَصَـابِيحَ لِبُطُونِ قُبُـورِكُمْ، وَسَـكَناً لِطُـولِ وَحْشَـتِكُمْ، وَنَفَسـاً لِكَـرْبِ مَوَاطِنِكُمْ، فَإِنَّ طَاعَةَ اللهِ حِرْزٌ مِنْ مَتَالِفَ مُكْتَنِفَة، وَمَخَاوِفَ مُتَوَقَّعَة،

kirîn û ni’met û qencî yên zehfî dayîn hewe, nixwe hûn jî li ‘ibadet kirinê da ji bona Wî xwe bişkînin û pê bi cî anîna bi heqî ya gohdana Wî bi alîyê Wî ve herin.

Seratî ya Iselamê: Paş wê jî, bi rastî ev islam ew dînê Xwedê yê werenge ku ji xwe ra bijart û bi şiklek taybet ew serast kir û baştirîn xelqê xwe ji ragehandina wê ra bijart û sitûnên wê li ser hejêkirina xwe ragirt. Bi ‘izzeta wê dînên dî bin êxistin û bi bilind kirina wê rêçkên (rêbaz) dî niviz kirin û pê bihadana wê dijminên wê bê çine (tehqîr-kêm) kirin û pê piştîvanî ya ji wê dijên wê bê kes kirin, pê qewî kirina sitûna wê xîmê li rê windabûnê êxist û têhnî ji hewzê wê têr av kirin û hewzên wê ji bona avberan tejî kir, paşê jî ew wisa qayîm kir ku heçkê wê neyê şikandin û helqên wê neyên vekirin û esasê wê ji nav neçê û xirab nebê û sitûnên wê nekevin û dara wê ji rehve hilnebê û zemanê wê xilas nebê û qanûnên wê kevin û pûç nebin û çiqên wê neyên birîn û rêkên wê teng nebin û daketin û pêveçûna deştên wê yên xweş bi zehmet nekevin û reşatî ji ronahî ya wê ra nebê û rastî ya wê xwehrî nekeftê û dara wê ya rast xwehr nebê û çûna li ser rêkên wê yên fireh zehmet nebê û

وَأَوَارِ نِيرَانٍ مُوقَدَةٍ.

فَمَنْ أَخَذَ بِالتَّقْوَى عَزَبَتْ عَنْهُ الشَّدَائِدُ بَعْدَ دُنُوِّهَا، وَاحْلَوْلَتْ لَهُ الْأُمُورُ بَعْدَ مَرَارَتِهَا، وَانْفَرَجَتْ عَنْهُ الْأَمْوَاجُ بَعْدَ تَرَاكُمِهَا، وَأَسْهَلَتْ لَهُ الصِّعَابُ بَعْدَ إِنْصَابِهَا، وَهَطَلَتْ عَلَيْهِ الْكَرَامَةُ بَعْدَ قُحُوطِهَا، وَتَحَدَّبَتْ عَلَيْهِ الرَّحْمَةُ بَعْدَ نُفُورِهَا، وَتَفَجَّرَتْ عَلَيْهِ النِّعَمُ بَعْدَ نُضُوبِهَا، وَوَبَلَتْ عَلَيْهِ الْبَرَكَةُ بَعْدَ إِرْذَاذِهَا.

فَاتَّقُوا اللهَ الَّذِي نَفَعَكُمْ بِمَوْعِظَتِهِ، وَوَعَظَكُمْ بِرِسَالَتِهِ، وَامْتَنَّ عَلَيْكُمْ بِنِعْمَتِهِ، فَعَبِّدُوا أَنْفُسَكُمْ لِعِبَادَتِهِ، وَاخْرُجُوا إِلَيْهِ مِنْ حَقِّ طَاعَتِهِ.

[فضل الاسلام]: ثُمَّ إِنَّ هذَا الْاِسْلَامَ دِينُ اللهِ الَّذِي اصْطَفَاهُ لِنَفْسِهِ، وَاصْطَنَعَهُ عَلَى عَيْنِهِ، وَأَصْفَاهُ خِيْرَةَ خَلْقِهِ، وَأَقَامَ دَعَائِمَهُ عَلَى مَحَبَّتِهِ، أَذَلَّ الْأَدْيَانَ بِعِزِّهِ، وَوَضَعَ الْمِلَلَ بِرَفْعِهِ، وَأَهَانَ

çirayên wê yên ronahî temirandin jê re nebê û şîrînî ya wê bi alîyê tehlîyêve neçê.

Islam ew sitûn in ku eslê wan di nav heqîyê da hatine cî kirin û xîmê wan hatine qayîm kirin û serkanîne ku kanîyên wê av di ser da dirijin û ew çirane ku pêta wan bilind û ew nîşanin ku rêwingî yên wê bi wan, rêka xwe peyda dikin û dibînin û ‘elametin ku ji bona li rê xelet bûyan hatine vedan. Ser avin têr av dikin.

Xwedê xilaseka razî bûna xwe û bilind tirîn cihê sitûnên dînên xwe li nav wê da deynaye û seratirîn merteba ta’etê xwe di peyrewîya wê da deynaye. Vêca ew li bal Xwedê sitûn qayîm û bilind avahî û delîl ronahî û çira geş û qudreta serketî ye; ew nîşan bilinde û kes nikarê digel wê beraberîyê bikê, vêca pê wê xwe bi qîmet bêxin û bikevin pey û heqê wê eda bikin û ewê li cihê wê da deynin.

Pêğember: Xwedayê pak Muhemmed selat û selam li ser wî û alê wî bin bi heq ji bona Pêğemberîyê rêkir li zemanekî da ku dinya nêzîkê xilaseka wextê xwe bûyî û axretê ber, dayî û rewş û biriqîna dinyayê paş ronahîyê berê xwe dayî tarîtîyê û ehlê xwe êxistî şer û nerihetîyê û cihê wa yê êmin û rihet ketî

أَعْدَاءَهُ بِكَرَامَتِهِ، وَخَـذَلَ مُحَادِّيـهِ بِنَصْرِهِ، وَهَـدَمَ أَرْكَـانَ الضَّـلاَلَةِ بِرُكْنِهِ، وَسَـقَى مَـنْ عَطِـشَ مِـنْ حِيَاضِهِ، وَأَتْأَقَ الْحِيَاضَ بِمَوَاتِحِهِ. ثُمَّ جَعَلَهُ لاَ انْفِصَامَ لِعُرْوَتِـهِ، وَلاَ فَكَّ لِحَلْقَتِهِ، وَلاَ انْهِدَامَ لِأَسَاسِـهِ، وَلاَ زَوَالَ لِدَعَائِمِـهِ، وَلاَ انْقِـلاَعَ لِشَجَرَتِهِ، وَلاَ انْقِطَاعَ لِمُدَّتِـهِ، وَلاَ عَفَاءَ لِشَرَائِعِهِ، وَلاَ جَـذَّ لِفُرُوعِـهِ، وَلاَ ضَـنْكَ لِطُرُقِـهِ، و لاَ وُعُوثَـةَ لِسُهُولَتِهِ، و لاَ سَوَادَ لِوَضَحِهِ، وَلاَ عِوَجَ لاِنْتِصَـابِهِ، وَلاَ عَصَـلَ فِـي عُـودِهِ، وَلاَ وَعَـثَ لِفَجَّـهِ، وَلاَ انْطِفَـاءَ لِمَصَـابِيحِهِ، وَلاَ مَـرَارَةَ لِحَلاَوَتِهِ.

فَهُوَ دَعَائِمُ أَسَـاخَ فِـي الْحَـقِّ أَسْـنَاخَهَا، وَثَبَّـتَ لَهَـا آسَاسَـهَا، وَيَنَابِيعُ غَزُرَتْ عُيُونُهَـا، وَمَصَـابِيحُ شَبَّتْ نِيرَانُهَا، وَمَنَـارٌ اقْتَـدَى بِهَـا سُفَّارُهَا، وَأَعلاَمٌ قُصِدَ بِهَا فِجَاجُهَا، وَمَنَاهِلُ رَوِيَ بِهَا وُرَّادُهَا.

جَعَلَ اللهُ فِيهِ مُنْتَهَى رِضْـوَانِهِ،

nexweşîyê û dinya berew xirab bûn çûyî û ‘emrê wê xilas bûyî û nîşanên ji nav çûna wê xweyhayîn û ji xelkê biriyî û helqên peywenda wan vebûyîn û sebebên tevhev bûna wê pir bûyî û dewsa xilasîyê nepeyda û ‘eybên wê eşkere û zemanê ‘emrê wê yê dirêj kurt bûyî. Li vî wextî da Xwedê risaleta xwe ji wî ra ragehand da ku qedr û qîmet û bilind mertebetîyê bidê ummeta xwe û xelkê zemanê xwe bighênê bihara jîyanê û hevalên xwe ser bilind bikê û şeref û mezinahîyê bidê arîkarên xwe.

Qur’ana pîroz: Paşê vêca kitêbek jê re şand; nûrek ku çirayên wê natefin; çirayek ku ji ronahî ya wê kêm nabê; behrek ku kûratî ya wê nayê zanîn; rêkek ku rêwingîyê xwe winda (berze) nakê; ronahîyek ku ronahî ya wê tarî nabê; forqanek (ji hev cidaker) ku delîla wê nayê vemrandin; avahîyek ku sitûnên wê wîran nabin û dermanek ku di wê da tirsa nexweşîyê nîne û serketinek ku hevalên wê nayên şikandin û heqek ku arîkarên wî bin nakevin û zelîl nabin.

Ew me’dena îmanê û merkeza wê ye, serkanî û behrên ‘ilm û zanînê ye, bax û bûstanê ‘edaletê ye û hewzê wê; xîm û esasê Islamê ye û newalên (dûl -gelî) heqîyê ye û mêrgên wê.

Ew behreke ku av kêş nikarin vale

وَذِرْوَةَ دَعَائِمِهِ، وَسَنَامَ طَاعَتِهِ، فَهُوَ عِنْدَ اللهِ وَثِيقُ الأَرْكَانِ، رَفِيعُ الْبُنْيَانِ، مُنِيرُ الْبُرْهَانِ، مُضِيءُ النِّيرَانِ، عَزِيزُ السُّلْطَانِ، مُشْرِفُ الْمَنَارِ، مُعْوِذُ الْمَثَارِ. فَشَرِّفُوهُ وَاتَّبِعُوهُ، وَأَدُّوا إِلَيْهِ حَقَّهُ، وَضَعُوهُ مَوَاضِعَهُ.

الرسول الاعظم صلى الله عليه وآله

ثُمَّ إِنَّ اللهَ سُبْحَانَهُ بَعَثَ مُحَمَّداً صلى الله عليه وآله بِالْحَقِّ حِينَ دَنَا مِنَ الدُّنْيَا الانْقِطَاعُ، وَأَقْبَلَ مِنَ الآخِرَةِ الأَطِّلاَعُ، وَأَظْلَمَتْ بَهْجَتُهَا بَعْدَ إِشْرَاق، وَقَامَتْ بِأَهْلِهَا عَلَى سَاق، وَخَشُنَ مِنْهَا مِهَادٌ، وَأَزِفَ مِنْهَا قِيَادٌ، فِي انْقِطَاع مِنْ مُدَّتِهَا، وَاقْتِرَاب مِنْ أَشْرَاطِهَا، وَتَصَرُّم مِنْ أَهْلِهَا، وَانْفِصَام مِنْ حَلْقَتِهَا، وَانْتِشَار مِنْ سَبَبِهَا، وَعَفَاء مِنْ أَعْلاَمِهَا، وَتَكَشُّف مِنْ عَوْرَاتِهَا، وَقِصَر مِنْ طُولِهَا. جَلَعَهُ اللهُ تعالى بَلاَغاً لِرِسَالَتِهِ، وَكَرَامَةً لأُمَّتِهِ، وَرَبِيعاً لأَهْلِ زَمَانِهِ، وَرِفْعَةً لأَعْوَانِهِ، وَشَرَفاً لأَنْصَارِهِ.

bikin, serkanî ne ku avber ava wan xilas nakin, ser avên werengin ku çiqas avê jê vexun ava wê kêm nabê, ew cihin ku rêwingî rêka wa winda nakin, ew nîşanin, ku ji ber çavan nayên veşartin û girkên xweş rûniştinin ku ewên qesta wa bikin ji wan derbaz nabin.

Xwedê ew (Qur'an) kir ji navbera têhnîşka 'aliman û bihara dilê peyketên fêhm kirina heqîqetan û meqsed û meqsûda salihan. Dermanek ku paş wê derdek nemînê, ronahîyek ku tarîtî digel nîne, werîsek ku heçkê wê qewî ye, penahgehek bilind û qayîm; serketin bo heçî kesê ewê bikê mezinê xwe; selametî ji bona kesê bikevê di nav da; hidayet bo wî kesê bikevê pey; 'ozirxwaz bo kesê xwe nisbet bidê bal wêve; delîl bo kesê bi wê biaxivê; şahid bo kesê li beraberê dijminê xwe da xwe bi wê bigirê; serketin bo wî yê ewê ji xwe ra bikê delîl; ragirê wî kesê ragirê wê; Hilgirê wî kesê ewê bikar bibê û pê 'emel bikê; nîşan bo kesê ewê ji xwe ra bikê nîşan; mertal û siper ji bona kesê xwe bidê ber wê; zanîn bo kesê ewê di zêhnê xwe da biparêzê; hedîs bo wî yê jê biaxivê û riwayet bikê û, hukme ji bo wî kesê hukmê pê bikê.

AXIFTINA 199

[القرآن الكريم] ثُمَّ أَنْزَلَ عَلَيْهِ الْكِتَابَ نُوراً لاَ تُطْفَـأُ مَصَـابِيحُهُ، وَسِرَاجاً لاَ يَخْبُو تَوَقُّدُهُ، وَبَحْراً لاَ يُدْرَكُ قَعْـرُهُ، وَمِنْهَاجـاً لاَ يُضِـلُّ نَهْجُهُ، وَشُعَاعاً لاَ يُظْلِـمُ ضَـوْؤُهُ، وَفُرْقَاناً لاَ يُخْمَدُ بُرْهَانُهُ، وَتِبْيَاناً لاَ تُهْدَمُ أَرْكَانُهُ، وَشِـفَاءً لاَ تُخْشَـى أَسْقَامُهُ، وَعِزّاً لاَ تُهْـزَمُ أَنْصَـارُهُ، وَحَقّاً لاَ تُخْذَلُ أَعْوَانُهُ.

فَهُوَ مَعْدِنُ الْإِيمَانِ وَبُحْبُوحَتُهُ، وَيَنَابِيعُ الْعِلْمِ وَبُحُـورُهُ، وَرِيَـاضُ الْعَدْلِ وَغُدْرَانُهُ، وَأَثَافِيُّ الْإِسْـلاَمِ وَبُنْيَانُهُ، وَأَوْدِيَةُ الْحَقِّ وَغِيطَانُهُ.

وَبَحْـرٌ لاَ يَنْزِفُـهُ الْمُسْـتَنْزِفُونَ، وَعُيُـونٌ لاَ يُنضِـبُهَا الْمَـاتِحُونَ، وَمَنَاهِلُ لاَ يَغِيضُهَا الْوَارِدُونَ، وَمَنَازِلُ لاَ يَضِلُّ نَهْجَهَا الْمُسَافِرُونَ، وَأَعْلاَمٌ لاَ يَعْمَى عَنْهَا السَّائِرُونَ، وَآكَـامٌ لاَ يَجُوزُ عَنْهَا الْقَاصِدُونَ.

جَعَلَهُ اللهُ رِيّاً لِعَطَشِ الْعُلَمَاءِ، وَرَبِيعاً لِقُلُوبِ الْفُقَهَـاءِ، وَمَحَـاجَّ

Şîret li heval û hogiran:

Nimêj: Hay ji mesela nimêjê hebin û ji parastina wê ra bixebitin û pir nimêj bikin û pê wê xwe nêzîkê Xwedê bikin, çiko nimêj ferzeke li ser mu'minan ku muheqeq lazim e ewê li wextê wê da pêk bînin.

Ma gelo hûn goh ranagirin bo cewaba cehnemîyan? Dema ji wan tê pirsyar kirin: ***"Çi tiştî hûn bi alîyê cehnemê ve birin? Dibêjin: Em ne ji nimêjkeran bûn"***[93] Nimêj gonehan ji mirov dibê wek çawa bergên daran tên rijandin; gonehan ji mirov vedikê wek çawa girê yê benika tên vekirin. Pêğember ê Xwedê selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin nimêj wereng hesab kirîye heçweku kanîyek ya germavê li ber derê mala kesekî bê, vêca ew li roj û şevê da pênc caran xwe têda bişû, hingê êdî qirêj li ser beden a wî namînê.

Bi rastî ewa bawerdara heqê nimêjê nas kirine ewên xeml û ciwanî ya çi tiştî ewan bi xwe ve mijûl nakê ku vêca hay ji nimêjê nemînin, ne jî zarûk û mal ku ronahî ya çavê wa ye. Xwedayê subhan kerem dikê: ***"Ew mirovên wereng in ku çi ticaret û kirîn û firotin ewa paşve nadê ji zikrê Xwedê û bi cî anîna nimêjê û dana zekatê"***.[94] Pêğemberê Xwedê (s) digel wî qasî ku mizgînî ya

لِطُرُقِ الصُّلَحَاءِ، وَدَوَاءً لَيْسَ بَعْدَهُ دَاءٌ، وَنُوراً لَيْسَ مَعَهُ ظُلْمَةٌ، وَحَبْلاً وَثِيقاً عُرْوَتُهُ، وَمَعْقِلاً مَنِيعاً ذِرْوَتُهُ، وَعِزّاً لِمَنْ تَوَلاَّهُ، وَسِلْماً لِمَنْ دَخَلَهُ، وَهُدىً لِمَنِ ائْتَمَّ بِهِ، وَعُذْراً لِمَنِ انْتَحَلَهُ، وَبُرْهَاناً لِمَنْ تَكَلَّمَ بِهِ، وَشَاهِداً لِمَنْ خَاصَمَ بِهِ، وَفَلْجاً لِمَنْ حَاجَّ بِهِ، وَحَامِلاً لِمَنْ حَمَلَهُ، وَمَطِيَّةً لِمَنْ أَعْمَلَهُ، وَآيَةً لِمَنْ تَوَسَّمَ، وَجُنَّةً لِمَنِ اسْتَلأَمَ، وَعِلْماً لِمَنْ وَعَى، وَحَدِيثاً لِمَنْ رَوَى، وَحُكْماً لِمَنْ قَضَى.

[199]

كان يوصي به أصحابه

تَعَاهَدُوا أَمْرَ الصَّلاَةِ، وَحَافِظُوا عَلَيْهَا، وَاسْتَكْثِرُوا مِنْهَا، وَتَقَرَّبُوا بِهَا، فَإِنَّهَا (كَانَتْ عَلَى الْمُؤْمِنِينَ كِتَاباً مَوْقُوتاً)

أَلاَ تَسْمَعُونَ إِلَى جَوَابِ أَهْلِ النَّارِ حِينَ سُئِلُوا: (مَا سَلَكَكُمْ فِي سَقَرَ * قَالُوا لَمْ نَكُ مِنَ

bihiştê jê re hatibî jî dîsa ji nimêjê ra xwe dida zehmetê, çiko Xwedayê subhan kerem kiribî: ***"Emrê ehlê xwe bike ji nimêjê ra û li ser wê sebir bike"***[95] vêca emrê malîyên xwe dikira ji bona nimêjê û ew bi xwe jî li ser wê sebirdar bî.

Zekat: Derheq zekatê da jî rastî ev e ku zekat digel nimêjê ji bona nêzîk bûna muslimanan bal Xwedêve hatîye danîn, heçî kesê zekatê bi xweşîya dilê xwe bidê, wê ew bibê kefara gonehê wî û ewî ji agir paşda bidê û biparêzê. Vêca kesê zekatê bidê bila ileh fikra xwe pêve girê nedê û mereqan nekê, Çiko kesê ne ji dil (ne bi razî bûn) zekatê bidê û ji Xwedê berhêvî bê ku tiştekî baştir ji wê ya dayî bigrê, ewî bi sunneta Pêğember selat û selam li ser wî û alê wî bin agahî nîne; ewî ji alîyê kirîyêve (kirih-ucret) zerer kirîye û 'emelê wî ji dest çûye û pûşmanîya dirêj jê re heye.

Emanet: Lê vêca zivirandina emanet; ewê ne emanetdar bê jê çûye û ketîye zerer û zîyanê, bi rastî emanet hat dayîn ji bona 'esmanê jûrî û 'erdê rayêxistî û çîyayên bilind û vedayî ku tiştek ji wan dirêjtir û pehntir û bilindtir û mezintir nebî, lê belê ewa digel wê çendê ku bilind û berfireh û qewî û mezin bûn, xwe ji ber avêtin û ji ceza

الْمُصَلِّينَ) وَإِنَّهَا لَتَحُتُّ الذُّنُوبَ حَتَّ الْوَرَقِ، وَتُطْلِقُهَا إِطْلاَقَ الرِّبَقِ، وَشَبَّهَهَا رَسُولُ اللهِ صلى الله عليه وآله بِالْحَمَّةِ تَكُونُ عَلَى بَابِ الرَّجُلِ، فَهُوَ يَغْتَسِلُ مِنْهَا فِي الْيَوْمِ وَاللَّيْلَةِ خَمْسَ مَرّات، فَمَا عَسَى أَنْ يَبْقَى عَلَيْهِ مِنَ الدَّرَنِ؟

وَقَدْ عَرَفَ حَقَّهَا رِجَالٌ مِنَ الْمُؤْمِنِينَ الَّذِينَ لاَ تَشْغَلُهُمْ عَنْهَا زِينَةُ مَتَاع، وَلاَ قُرَّةُ عَيْن مِنْ وَلَد وَلاَ مَال، يَقُولُ اللهُ سُبْحَانَهُ: (رِجَالٌ لاَ تُلْهِيهِمْ تِجَارَةٌ وَلاَ بَيْعٌ عَنْ ذِكْرِ اللهِ وَإِقَامِ الصَّلاَةِ وَإِيتَاءِ الزَّكَاةِ) وَكَانَ رَسُولُ اللهِ(صلى الله عليه وآله) نَصِباً بِالصَّلاَةِ بَعْدَ التَّبْشِيرِ لَهُ بِالْجَنَّةِ، لِقَوْلِ اللهِ سُبْحَانَهُ: (وَأْمُرْ أَهْلَكَ بِالصَّلاَةِ وَاصْطَبِرْ عَلَيْهَا)، فَكَانَ يَأْمُرُ بِهَا أَهْلَهُ وَيَصْبِرُ عَلَيْهَا نَفْسَهُ.

[الزكاة]: ثُمَّ إِنَّ الزَّكَاةَ جُعِلَتْ مَعَ الصَّلاَةِ قُرْبَاناً لاَِهْلِ الاِْسْلاَمِ، فَمَنْ أَعْطَاهَا طَيِّبَ النَّفْسِ بِهَا،

danê tirsihan, ew bi tiştekî hesabîn ku mirov; ew mexlûqê ji wan lawaztir, jê bê xeber mabî: ***"Hema rastî ew pir zalim û nezan bû"***[96]**.**

Ji Xwedayê Subhan û bilind mertebe ne veşartî ye ewa bende şev û roj dikin û bi destve tînin, ew ji biçûktirîn karê wan agahe û bi zanîn dûra wan girtîye, endamên hewe şahidên wî ne û qetên bedena hewe leşkerên wî ne û veşartî yên ji hewe me'mûrên wî ne û tinêtî ya hewe li ber wî 'eyan û eşkere ye.

AXIFTINA 200

Wellahî, Mu'awîye ne ji min jêhatî tir e, lê xîyanetê dikê û gonehkarîyê, eger ne pîsatî û kirêtî ya xîyanetê bûya, ezê jêhatî tirîn kes bûma. Lê belê her xîyanetek goneheke û her gonehek inkar kirin e (ji heqîyê ra), roja qîyametê jî her xîyanetkarekî alayek heye ku pê wê tê nas kirin. Bi Xwedê, ez bi hîlan nayêm xafil kirin û bi dijwarî yan nekar nabim.

AXIFTINA 201

Gelî mirovno! Li rêka hidayetê da ji ber ku ehlê wê kêmin, nekevin dehşetê. Çiko xelk li ser sifreyekî rûniştine ku zemanê têrîya wê kurt û birsîtî ya wê

فَإِنَّهَا تُجْعَلُ لَهُ كَفَّارَةً، وَمِنَ النَّارِ حِجَازاً وَوِقَايَةً، فَلاَ يُتْبِعَنَّهَا أَحَدٌ نَفْسَهُ، وَلاَ يُكْثِرَنَّ عَلَيْهَا لَهَفَهُ، فَإِنَّ مَنْ أَعْطَاهَا غَيْرَ طَيِّبِ النَّفْسِ بِهَا، يَرْجُو بِهَا مَا هُوَ أَفْضَلُ مِنْهَا، فَهُوَ جَاهِلٌ بِالسُّنَّةِ، مَغْبُونُ الأَجْرِ، ضَالُّ الْعَمَلِ، طَوِيلُ النَّدَمِ.

[الامانة]: ثُمَّ أَدَاءَ الأَمَانَةِ، فَقَدْ خَابَ مَنْ لَيْسَ مِنْ أَهْلِهَا، إِنَّهَا عُرِضَتْ عَلَى السَّماوَاتِ الْمَبْنِيَّةِ، وَالأَرَضِينَ الْمَدْحُوَّةِ، وَالْجِبَالِ ذَاتِ الطُّولِ الْمَنْصُوبَةِ، فَلاَ أَطْوَلَ وَلاَ أَعْرَضَ، وَلاَ أَعْلَى وَلاَ أَعْظَمَ مِنْهَا، وَلَوِ امْتَنَعَ شَيْءٌ بِطُول أَوْ عَرْض أَوْ قُوَّة أَوْ عِزٍّ لاَمْتَنَعْنَ، وَلَكِنْ أَشْفَقْنَ مِنَ الْعُقُوبَةِ، وَعَقَلْنَ مَا جَهِلَ مَنْ هُوَ أَضْعَفُ مِنْهُنَّ، وَهُوَ الأِنْسَانُ، (إِنَّهُ كَانَ ظَلُوماً جَهُولاً)

إِنَّ اللهَ سُبْحَانَهُ لاَ يَخْفَى عَلَيْهِ مَا الْعِبَادُ مُقْتَرِفُونَ فِي لَيْلِهِمْ وَنَهَارِهِمْ، لَطُفَ بِهِ خُبْراً، وَأَحَاطَ بِهِ عِلْماً، أَعْضَاؤُكُمْ شُهُودُهُ، وَجَوَارِحُكُمْ جُنُودُهُ، وَضَمائِرُكُمْ

dirêje.

Gelî mirovno! Razî bûna ji karekî û razî nebûna ji wê, xelkê dighênê hev. Yêkî tinê devemê ya qewmê “Semûd” kuşt, lê belê Xwedê ‘ezab ser hemîyan da şand (rêkir), çiko ew hemî bi wî karî razî bûn, ji ber wê Xwedê wiha dibêjê: ***“Ewa, ew dev e kuştin, vêca pûşman bûn”***.[97] Di peyda ‘erdê wan wek çawa singê hêsinî ku hatibê sûr kirin di ‘erdê nerm da diçê xarê, di ‘erdê da çû xarê û dengek wek ûrîna ga, jê hat.

Gelî mirovno! Kesê di rêka ronahî (eşkere) da biçê wê bighê ser avê û yê bervajî bikê wê li çûlê da şaş bimînê.

AXIFTINA 202

Dema Fatima, serwerê jinan (s) defn kirî, çûye ser qebra Pêğember (s) û axiftîye:

Selam li ser te bê, ey Resûlê Xwedê, ji alîyê min ve û ji alîyê keça te ve ku niha hatîye bûye cîranê te. Ewa li kêleka te da hatî deynan û gelek zûka gihayî te.

Ey Resûlê Xwedê! Ji ber keça te ya pir xêr û bereket, sebra min kêm û taqeta min lawaz bûye. Lê belê giringî ya cidahî ya ji te û giranîya musîbeta ji dest dana te (piçekî evahe li ser min sivik kirîye) cihê serxweşî danê girtîye. Çiko

عُيُونُهُ، وَخَلَوَاتُكُمْ عِيَانُهُ.

[200]

وَاللهِ مَا مُعَاوِيَةُ بِـأَدْهَى مِنِّـي، وَلكِنَّهُ يَغْدِرُ وَيَفْجُرُ، وَلَوْلاَ كَرَاهِيَةُ الْغَدْرِ لَكُنْتُ مِـنْ أَدْهَـى النَّـاسِ، وَلَكِنْ كُلُّ غَـدْرَة فَجْـرَةٌ، وَكُـلُّ فَجْرَة كَفْرَةٌ، وَلِكُـلِّ غَـادِر لِـوَاءٌ يُعْرَفُ بِهِ يَـوْمَ الْقِيَامَـةِ. وَاللهِ مَـا أُسْتَغْفَلُ بِالْمَكِيـدَةِ، وَلاَ أُسْـتَغْمَزُ بِالشَّدِيدَةِ.

[201]

أَيُّهَا النَّاسُ، لاَ تَسْتَوْحِشُوا فِي طَرِيقِ الْهُدَىٰ لِقِلَّةِ أَهْلِهِ، فَإِنَّ النَّاسَ قَدِ اجْتَمَعُوا عَلَى مَائِدَة شِبَعُهَا قَصِيرٌ، وَجُوعُهَا طَوِيلٌ.

أَيُّهَا النَّاسُ، إِنَّمَا يَجْمَعُ النَّاسَ الرِّضِى وَالسُّخْطُ، وَإِنَّمَا عَقَرَ نَاقَةَ ثَمُودَ رَجُلٌ وَاحِدٌ فَعَمَّهُمُ اللهُ تَعَالَى بِالْعَذَابِ لَمَّا عَمُّوهُ بِالرِّضَى، فَقَالَ سُبْحَانَهُ: (فَعَقَرُوهَا فَأَصْبَحُوا نَادِمِينَ)، فَمَا كَانَ إِلاَّ أَنْ خَارَتْ أَرْضُهُمْ بِالْخَسْفَةِ خُوَارَالسِّكَّةِ الْـمُحْمَاةِ فِي الأَرْضِ الْخَوَّارَةِ.

(nayê ji bîr kirin demên) min serê te li qebrê da danî ser balgehê te, û li ser ranê min û li ber singê min te wefat kir, ***"inna lillah we inna ileyhî raci'un"***.

Vêca eve emanet, hat zivirandin û rehîne hat girtin, lê belê kol û mereqên min, wê her hebin û şevan wê xew nekevê çavên min heta ku Xuda ewê 'alema ku tu têda, ji bona min jî bibjêrê.

Wê keça te ji te ra bêjê kanê çewa ummetê pişta hev girt ji bona şikandina wê. Vêca gelek pirsyaran jê bike û xeberê wez' û hal jê bigire. Belê, bi vî awayî ye, halhale hêca serçûna te ve pir derbaz nebûye û behs kirina ji te ji nav neçûye.

Selam li ser hewe herdûka, selama xatir xwazê ku selama wî ne ji keyfxweşî ye ne jî bi westan, eger ez biçim, ne ji ber westanê ye û eger ez bisekinim, ne ji ber gumana xirab e ku min derheqê we'da Xuda da hebê, ew we'da dayî sebirdaran.

AXIFTINA 203

Zuhd: Gelî mirovno! Dinya cihê têra derbaz bûnê ye û axiret cihê lê sekinînê, vêca ji cihê derbaz bûna xwe ji bona cihê sekinîna xwe qutekî hazir bikin û

أَيُّهَا النَّاسُ، مَنْ سَلَكَ الطَّرِيقَ الْوَاضِحَ وَرَدَ الْمَاءَ، وَمَنْ خَالَفَ وَقَعَ فِي التِّيهِ!

[202]

روي عنه أنّه قاله عند دفن سيدة النساء فاطمة عليها السلام كالمناجي به رسول الله صلى الله عليه وآله عند قبره:

السَّلاَمُ عَلَيْكَ يَا رَسُولَ اللهِ عَنِّي، وَعَنِ ابْنَتِكَ النَّازِلَةِ فِي جِوَارِكَ، وَالسَّرِيعَةِ اللَّحَاقِ بِكَ!

قَلَّ يَا رَسُولَ اللهِ، عَنْ صَفِيَّتِكَ صَبْرِي، وَرَقَّ عَنْهَا تَجَلُّدِي، إِلاَّ أَنَّ لِي فِي التَّأَسِّي بِعَظِيمِ فُرْقَتِكَ، وَفَادِحِ مُصِيبَتِكَ، مَوْضِعَ تَعَزٍّ، فَلَقَدْ وَسَّدْتُكَ فِي مَلْحُودَةِ قَبْرِكَ، وَفَاضَتْ بَيْنَ نَحْرِي وَصَدْرِي نَفْسُكَ.

(إِنَّا لله وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاجِعُونَ)، فَلَقَدِ اسْتُرْجِعَتِ الْوَدِيعَةُ، وَأُخِذَتِ الرَّهِينَةُ! أَمَّا حُزْنِي فَسَرْمَدٌ، وَأَمَّا لَيْلِي فَمُسَهَّدٌ، إِلَى أَنْ يَخْتَارَ اللهُ لِي دَارَكَ الَّتِي أَنْتَ بِهَا مُقِيمٌ.

wergirin. Perda xwe li bal kesekî ku xefên hewe zanê nedirînin û pêşîya wê çendê ku bedena hewe ji dinyayê bê deranîn dilê xwe jê derînin, vêca bi rastî hûn di wê da tên ceribandin û ji xêncî wê ra hatine afirandin.

Dema ksek ji nav biçê, xelk dibêjin: Çi paş xwe ve hiştîye? Û melaîket dibêjin: Çi pêşîya xwe da rêkirîye.

Rehme l baba! Hinekî pêşîya xwe da rêkin da hewe deynek dabê (paşê feydê jê bibin) û hemîyê paş xwe ve nehêlin ku hûn ji wê bê behr bimînin û feydê jê nebin.

وَسَتُنَبِّئُكَ ابْنَتُكَ [بِتَضَافُرِ أُمَّتِكَ عَلَى هَضْمِهَا] ، فَأَحْفِهَا السُّؤَالَ ، وَاسْتَخْبِرْهَا الْحَالَ، هذَا وَلَمْ يَطُلِ الْعَهْدُ، وَلَمْ يَخْلُ مِنْكَ الذِّكْرُ.

وَالْسَّلاَمُ عَلَيْكُمَا سَلاَمَ مُوَدِّعٍ، لاَ قَال وَلاَ سَئم، فَإِنْ أَنْصَرِفْ فَلاَ عَنْ مَلاَلَة، وَإِنْ أُقِمْ فَلاَ عَنْ سُوءِ ظَنٍّ بِمَا وَعَدَ اللهُ الصَّابِرِينَ.

AXIFTINA 204

Gelek caran bi vî awayî gazî heval û hogirên xwe dikira:

Ĥazir bibin, Xwedê rehma xwe li hewe bikê, çiko hûn hatine gazî kirin ji bona bar kirinê. Girêdana xwe ji dinyayê ra kêm bikin û digel wî zad û qûtê qenc yê digel hewe cihê xwe bigohêzin. Çiko li beraberê hewe da pêç hene ku derbaz bûna ji wa zehmet e; cihên bi tirs û wehşet ku bivê nevê hûnê biçinê û li wêderê bisekinin.

Bizanin ku mirin li nêzîkî ya hewe da ye û li bin çavê xwera li hewe dinêrê û heçweku hûn di nav çengê wê da û ewê kulafê xwe li bedena hewe da cî

[203]

في التزهيد من الدنيا والترغيب في الاخرة

أَيُّهَا النَّاسُ، إِنَّمَا الدُّنْيَا دارُ مَجَاز، وَالأْخِرَةُ دَارُ قَرَار، فَخُذُوا مِنْ مَمَرِّكُمْ لِمَقَرِّكُمْ، وَلاَ تَهْتِكُوا أَسْتَارَكُمْ عِنْدَ مَنْ يَعْلَمُ أَسْرَارَكُم، وَأَخْرِجُوا مِنَ الدُّنْيَا قُلُوبَكُمْ مِنْ قَبْلِ أَنْ تَخْرُجَ مِنْهَا أَبْدَانُكُمْ، فَفِيهَا اخْتُبِرْتُمْ، ولِغَيْرِهَا خُلِقْتُمْ.

إِنَّ الْمَرْءَ إِذَا هَلَكَ قَالَ النَّاسُ: مَا تَرَكَ؟ وَقَالَتِ الْمَلاَئِكَةُ: مَا

kirî û dijwarî û zehmeta wê hûn li ber xwe girtîn.

Vêca nixwe girêdana xwe ji dinyayê bibirin û pê rizq û qûtê teqwatîyê xwe qewî û bi hêz bikin.

Seyidê Rezî *dibêjê: Hinek ji vê axiftinê pêşda derbaz bî, ew riwayetek bî xêncî ji vê.*

AXIFTINA 205

Berê axiftinê li Telhe û Zubeyr e, piştî bey'eta digel wî (s). Herdûka ji ber vê çendê ku digotan ewî (s) li karan da digel wan meşweret nekirîye û arîkarî ji wan nexwestîye, nerihetî ya xwe dîyar kirbûn.

Hûn herdûk ji ber tiştek kêm nerihet bûn û hewe gelek kar jî paş êxistin. Çire hûn nabêjin kanê hewe li çi da heqek hebûye û min hûn ji wê paşve dane? An li dagîr kirina kîjan behr û danekî da min xwe ser hewe ra girtîye? An çi heqek hebûye ku kesek ji muslimana hukmê wê ji min xwestbê û ez li pêk anîna wê da ze'êf mabim, an min wê derheqê da zanîn nebê an jî ez têda xelet bûbim?

Sond bi Xwedê, min qe meyl û vîyan di xelîfetîyê da nebû û min hukumdarî nedixwesta, lê belê hewe ez ji wê ra gazî kirim û hewe ew li min bar kir. Dema ew giha min, min berê xwe da

قَدَّمَ؟ لله آبَاؤُكُمْ! فَقَدِّمُوا بَعْضاً يَكُنْ لَكُمْ قَرْضاً، وَلاَ تُخَلِّفُوا كُلاًّ فَيَكُونَ عَلَيْكُمْ.

[**204**]

كان كثيراً ما ينادي به أصحابه

تَجَهَّزُوا رَحِمَكُمُ اللهُ! فَقَدْ نُودِيَ فِيكُمْ بِالرَّحِيلِ، وَأَقِلُّوا الْعُرْجَةَ عَلَى الدُّنْيَا، وَانْقَلِبُوا بِصَالِحِ مَا بِحَضْرَتِكُمْ مِنَ الزَّادِ، فَإِنَّ أَمَامَكُمْ عَقَبَةً كَؤُوداً، وَمَنَازِلَ مَخُوفَةً مَهُولَةً، لاَبُدَّ مِنَ الْوُرُودِ عَلَيْهَا، وَالْوُقُوفِ عِنْدَهَا.

وَاعْلَمُوا أَنَّ مَلاَحِظَ الْمَنِيَّةِ نَحْوَكُمْ دَانِيَةٌ، وَكَأَنَّكُمْ بِمَخَالِبِهَا وَقَدْ نَشِبَتْ فِيكُمْ، وَقَدْ دَهَمَتْكُمْ فِيهَا مُفْظِعَاتُ الأُمُورِ، وَمُعْضِلاَتُ الْمَحْذُورِ.

فَقَطِّعُوا عَلاَئِقَ الدُّنْيَا، وَاسْتَظْهِرُوا بِزَادِ التَّقْوَى.

وقد مضى شيء من هذا الكلام فيما تقدم، بخلاف هذه الرواية.

[**205**]

kitêba Xwedê û ewa ji me ra hatî deynan û emrê me kirî ku em bi wê ĥukum bikîn, vêca ez ketim pey wê û min berê xwe da ewa sunnetên Pêğember selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin di nav me da hiştîn û vêca min peyrewî jê kir, di wê da jî ez ne muhtacê bîr û hizra hewe bûm û ne jî ya xêncî hewe. Qet hukmek nehat pêş ez nezanim da vêca meşweretê digel hewe û birayên muslimanên dî yên xwe bikim. Eger tiştek wereng hebûya min xwe ji meşwereta digel hewe û xêncî hewe, paşve nedida.

Ema derheq teqsîm kirina (pişk kirin) wek yêk jî, ew tişteke ku di wê da min ne pê bîr û hizra xwe û ne pê hewayê nefsa xwe, ĥukum daye. Belkî min û hewe herdûka dîtîye ku Resûlê Xwedê selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin vê derheqê da çi ĥukum anîye û çawa ‘emel kirîye. Vêca nixwe li karekî da ku Xwedê hukmê wê danîye û imza kirîye min ihtîyacî bi nezera (bîr û hizr) hewe tinebûye, vê gûrekê, wellahî ne hewe herdûka û ne jî xêncî hewe vê derheqê da çi heq li ser min nîne ku lûman bikê û min ji vî karî bizivirînê.

Xwedê berê dilê me û hewe bidê heqîyê û sebrê bidê me û hewe.

Paşê kerem kir: Xwedê rehmetê bikê li wî kesê heqekî bibûnê vêca arîkarî ya

كلّم به طلحة والزبير بعد بيعته بالخلافة وقد عتبا من ترك مشورتهما، و لاستعانة في الامور بهما

لَقَدْ نَقَمْتُما يَسِيراً، وَأَرْجَأْتُمَا كَثِيراً، أَلاَ تُخْبِرَانِي، أَيُّ شَيْءٍ لَكُمَا فِيهِ حَقٌّ دَفَعْتُكُمَا عَنْهُ؟ وأَيُّ قَسْم اسْتَأْثَرْتُ عَلَيْكُمَا بِهِ؟ أَمْ أَيُّ حَقّ رَفَعَهُ إِلَيَّ أَحَدٌ مِنَ الْمُسْلِمِينَ ضَعُفْتُ عَنْهُ، أَمْ جَهِلْتُهُ، أَمْ أَخْطَأْتُ بَابَهُ ؟!

وَاللهِ مَا كَانَتْ لِي فِي الْخِلاَفَةِ رَغْبَةٌ، وَلاَ فِي الْوِلاَيَةِ إِرْبَةٌ، وَلكِنَّكُمْ دَعَوْتُمُونِي إِلَيْهَا، وَحَمَلْتُمُونِي عَلَيْهَا، فَلَمَّا أَفْضَتْ إِلَيَّ نَظَرْتُ إِلَى كِتَابِ اللهِ وَمَا وَضَعَ لَنَا، وَأَمَرَنَا بِالْحُكْمِ بِهِ فَاتَّبَعْتُهُ، وَمَا اسْتَسَنَّ النَّبِيُّ صلى الله عليه وآله فَاقْتَدَيْتُهُ، فَلَمْ أَحْتَجْ فِي ذلِكَ إِلَى رَأْيِكُمَا، وَلاَ رَأْيِ غَيْرِكُمَا، وَلاَ وَقَعَ حُكْمٌ جَهِلْتُهُ، فَأَسْتَشِيرَكُمَا وَإِخْوَانِي مِنَ

wê bikê û zulmekî bibînê û ewê dûr bikê û arîkarê xweyê heq bê ji bona girtina heqê wî.

۞ AXIFTINA 206 ۞

Gohlê bû komek ji hevalên wî li Siffînê dijûna didin Şamîyan:

Ez ji bona hewe kirêt zanim ku hûn dijûnker bin. Lê belê eger hûn behsa karê wan bikin û ji halê wan biaxivin, ev axiftin, nêzîktirê duristîyê ye û pitir wê ‘ozrê hewe bê qebûl kirin. Şûna dijûn a de bêjin: ilahî, pêşîya rijana xwîna me û ya wan bigire û navbeyna me û wan da xweşîyê çêke û ewan ji rê winda bûna wan bizivirîne bi alîyê hidayetê ve, da heçî heqîyê nas nakê, nas bikê û heçî yê ji xeletî û dijminîyê ra kulbû, ji kulbûtîyê derkevê.

۞ AXIFTINA 207 ۞

Li rojek ya Siffînê da korê xwe, Hesen (s) dît ku li şer da ketîye lezê, wiha got:

Evî xûrtî ji min ra xwey kin, da pişta min neşikênê. Çiko bi rastî heyfa min tê ku ev herdû (Imam Hesen û Huseyn) bikevin berê mirinê ve û pê mirina wan zurrîyeta Pêğemberê Xuda (s) bê birrîn.

Seyidê rezî: *Rista “emlikû ‘ennî …” ji seratirîn û fesîhtirîn peyva ye.*

الْمُسْلِمِينَ; وَلَوْ كَانَ ذٰلِكَ لَمْ أَرْغَبْ عَنْكُمَا، وَلاَ عَنْ غَيْرِكُمَا.

وَأَمَّا مَا ذَكَرْتُمَا مِنْ أَمْرِ الأُسْوَةِ، فَإِنَّ ذٰلِكَ أَمْرٌ لَمْ أَحْكُمْ أَنَا فِيهِ بِرَأْيِي، وَلاَ وَلِيتُهُ هَوىً مِنِّي، بَلْ وَجَدْتُ أَنَا وَأَنْتُمَا مَا جَاءَ بِهِ رَسُولُ الله صلى الله عليه وآله قَدْ فُرِغَ مِنْهُ، فَلَمْ أَحْتَجْ إِلَيْكُمَا فِيمَا قَدْ فَرَغَ اللهُ مِنْ قَسْمِهِ، وَأَمْضَى فِيهِ حُكْمَهُ، فَلَيْسَ لَكُمَا، وَاللهِ، عِنْدِي وَلاَ لِغَيْرِكُمَا فِي هٰذَا عُتْبَى.

أَخَذَ اللهُ بِقُلُوبِنَا وَقُلُوبِكُمْ إِلَى الْحَقِّ، وَأَلْهَمَنَا وَإِيَّاكُمْ الصَّبْرَ.

ثم قال: رَحِمَ اللهُ رَجُلاً رَأَى حَقّاً فَأَعَانَ عَلَيْهِ، أَوْ رَأَى جَوْراً فَرَدَّهُ، وَكَانَ عَوْناً بِالْحَقِّ عَلَى صَاحِبِهِ.

[206]

سمع قوماً من اصحابه يسبّون أهل الشام أيام حربهم بصفين:

إِنِّي أَكْرَهُ لَكُمْ أَنْ تَكُونُوا سَبَّابِينَ، وَلٰكِنَّكُمْ لَوْ وَصَفْتُمْ

۞ AXIFTINA 208 ۞

Dema yaranên wî derheq mesela hekemiyetê da digel wî rêk neketin, got:

Eyyuh-en nas (xelkîno)! Karê min digel hewe wereng bûye çawa min xwestî, heta hingê ku şer, hûn ze'êf kirîn. Wullahî şer hinek ji hewe girtin û hinek paşda hiştin, lê dijminê hewe nekartir û ze'êftir kir.

Ĥeqîqet ev e ku duhî ez emîr bûm û îro ez bûme me'mûr (emrê min tê kirin), duhî min nehî dikira, Îro nehya min tê kirin. Hûn hez dikin bimînin û bijîn û ez nikarim hewe mecbûrê karekî bikim ku li hewe nexweş e.

۞ AXIFTINA 209 ۞

Imam 'Elî (s) li Besrayê bo seradan çû mala hogirek yê xwe, bi navê 'Ela yê korê Zîyadê harisî, vêca dema mala wî ya fireh dît, wiha got:

Li vê dinyayê da tu dê çi ji vê mala fireh bikî? Halhale li axretê da tu ji wê ra muhtac tirî. Elbet, eger tu bixwazî, tu dikarî pê vê, axretê bi destve bênî; ku tu têda mihvandarîyê bikî û di wê da heqê mirovanîyê pêk bînî û heqan eda bikî, bi vî awayî tu dikarî bighêy axretê jî.

Vêca 'Ela got: Ez şikayeta birê xwe

أَعْمَالَهُمْ، وَذَكَرْتُمْ حَالَهُمْ، كَانَ أَصْوَبَ فِي الْقَوْلِ، وَأَبْلَغَ فِي الْعُذْرِ، وَقُلْتُمْ مَكَانَ سَبِّكُمْ إِيَّاهُمْ:

اللَّهُمَّ احْقِنْ دِمَاءَنَا وَدِمَاءَهُمْ، وَأَصْلِحْ ذَاتَ بَيْنِنَا وَبَيْنِهِمْ، وَاهْدِهِمْ مِنْ ضَلَالَتِهِمْ، حَتَّى يَعْرِفَ الْحَقَّ مَنْ جَهِلَهُ، وَيَرْعَوِيَ عَنِ الْغَيِّ وَالْعُدْوَانِ مَنْ لَهِجَ بِهِ.

[207]

في بعض أيام صفين وقد رأى الحسن عليه السلام **يتسرع إلى الحرب:**

امْلِكُوا عَنِّي هَذَا الْغُلَامَ لاَ يَهُدَّنِي، فَإِنَّنِي أَنْفَسُ بِهذَيْنِ - يَعْنِي الحَسَنَ وَالْحُسَيْنَ عليهما السلام **عَلَى الْمَوْتِ، لِئَلاَّ يَنْقَطِعَ بِهِمَا نَسْلُ رَسُولِ اللهِ** صلى الله عليه وآله.

قوله (عليه السلام): «املكوا عني هذا الغلام» من أعلى الكلام وأفصحه.

[208]

قاله لمّا اضطرب عليه أصحابه في أمر الحكومة

أَيُّهَا النَّاسُ، إِنَّهُ لَمْ يَزَلْ أَمْرِي مَعَكُمْ عَلَى مَا أُحِبُّ، حَتَّى نَهَكَتْكُمُ الْحَرْبُ، وَقَدْ، وَاللهِ أَخَذَتْ مِنْكُمْ وَتَرَكَتْ، وَهِيَ

‘asimê korê Zîyad tînim bal te, ey mîrê bawerdaran. Imam gotê: Qey çi bûye ji wî? ‘Ela got: cilê hirî berkirîye û ji dinyayê cida bûye. Imam got: Ewî bînin bal min. Vêca dema hat, gotê:

Ey dijminûkê xwe, şeytanê pîs dixwazê te ji rê derênê, ma tu rehmê bi ‘eyal û zarokê xwe nabî? Tu guman dikî ku Xwedê tiştên pak û paqij ji te ra helal kirîye, lê naxwazê tu istifadê jê bikî? Tu kêmtirî ji wê çendê ku tu wiha derheqê wî da guman bikî.

Ewî got: Ey mîrê bawerdara! Eve tu, tu bi xwe jî cilkên zivir li xwe dikî û xarina nexweş dixwî! Imam li cewaba wî da got:

Wey ji te ra, ez ne wek teme, Xwedê Te’ala li ser Imamê bi heq ferz kirîye ku li jîyanê da xwe wek mirovê nedar û ze’êf lê bikê da ku feqîrî û nedarî ya feqîr, nebê sebebê serkêşî û ji hed derketina wî.

AXIFTINA 210

Kesekî derheq hedîsên hatîn çêkirin û exbarên cûrbicûr ku li destê xelkê da hene, pirsyar jê kir, ewî wiha got:

لِعَدُوِّكُمْ أَنْهَكُ.

لَقَدْ كُنْتُ أَمْسِ أَمِيراً، فَأَصْبَحْتُ الْيَوْمَ مَأْمُوراً! وَكُنْتُ أَمْسِ نَاهِياً، فَأَصْبَحْتُ الْيَوْمَ مَنْهِيّاً! وَقَدْ أَحْبَبْتُمُ الْبَقَاءَ، وَلَيْسَ لِي أَنْ أَحْمِلَكُمْ عَلَى مَا تَكْرَهُونَ!

[209]

ومن كلام له عليه السلام

بالبصرة، وقد دخل على العلاء بن زياد الحارثي ـ وهو من أصحابه ـ يعوده، فلما رأى سعة داره قال:

مَا كُنْتَ تَصْنَعُ بِسِعَةِ هذِهِ الدارِ فِي الدُّنْيَا، أَنْتَ إِلَيْهَا فِي الْآخِرَةِ كُنْتَ أَحْوَجَ؟ وَبَلَى إِنْ شِئْتَ بَلَغْتَ بِهَا الْآخِرَةَ، تَقْرِي فِيهَا الضَّيْفَ، وَتَصِلُ فِيهَا الرَّحِمَ، وَتُطْلِعُ مِنْهَا الْحُقُوقَ مَطَالِعَهَا، فَإِذَا أَنْتَ قَدْ بَلَغْتَ بِهَا الْآخِرَةَ.

فقال له العلاء: يا أميرالمؤمنين، أشكو إليك أخي عاصم بن زياد. قال: وما له؟

قال: لبس العباءة وتخلّى من الدنيا. قال: عليَّ به. فلمّا جاء قال:

يَا عُدَيَّ نَفْسِهِ! لَقَدِ اسْتَهَامَ بِكَ

Di destê xelkê da ya heq jî heye û ya batil jî, ya rast jî heye û ya derew jî, nasix û mensûx û ‘am û xas û muhkem û muteşabih heye, her wiha bê xelet jî heye û tevlî xeletîyê bûyî jî heye. Heta li zemanê Pêğember (s) bi xwe da ewqas derew li ser çêkirin, heta rabî axift û keremkir: Kesê ji qestî (bi zanîn) derewan li ser min çêkê bila xwe hazir bikê ji cihê xwe yê di nav agir da.

Çar kes hedîsê neqil dikin û yê pêncê nîne:

Minafiq: Mirovê minafiq ku îmanê ji xwe eşkere dikê û xwe musliman didê nîşan dan, ku ne ji gonehkarîyê ditirsihê û ne jî ji mucrimîyê; derewa li ser Pêğember (s) çêdikê bi qest û zanîn, vêca eger xelk bizanin ew minafiqek derewkere, jê qebûl nakin û tesdîqa gotina wî nakin, lê belê dibêjin: Evêhe sehabî yê Pêğembere selat û selam ser wî û alê wî bin, ewî Pêğember (s) dîtîye û jê gohlê bûye û ji wî girtîye, vêca gotina wî ji xwe ra digrin û qebûl dikin. Lê pa Xwedê bi wî awayî derheq minafiqan da xeber dayî û nîşan û sifetên wan gotî, agahî daye te. Vêca evênhe piştî wî man û xwe nêzîkê rêberên rê windabûnê kirin û xwe dan gel wa kesên bi neheqî û bê bextî xelkê

الْخَبِيثُ! أَمَا رَحِمْتَ أَهْلَكَ وَوَلَدَكَ! أَتَرَى اللهَ أَحَلَّ لَكَ الطَّيِّبَاتِ، وَهُوَ يَكْرَهُ أَنْ تَأْخُذَهَا! أَنْتَ أَهْوَنُ عَلَى اللهِ مِنْ ذلِكَ!

قال: يا أميرالمؤمنين، هذا أنت في خشونة ملبسك وجُشوبة مأكلك!

قَالَ: وَيْحَكَ، إِنِّي لَسْتُ كَأَنْتَ، إِنَّ اللهَ تَعَالَى فَرَضَ عَلَى أَئِمَّةِ الْعَدْلِ أَنْ يُقَدِّرُوا أَنْفُسَهُمْ بِضَعَفَةِ النَّاسِ، كَيْلاَ يَتَبَيَّغَ بِالْفَقِيرِ فَقْرُهُ!

[210]

وقد سأله سائل عن أحاديث البدع، وعما في أيدي الناس من اختلاف الخبر. فقال عليه السلام:

إِنَّ فِي أَيْدِي النَّاسِ حَقّاً وَبَاطِلاً، وَصِدْقاً وَكَذِباً، وَنَاسِخاً وَمَنْسُوخاً، وَعَامّاً وَخَاصّاً، وَمُحْكَماً وَمُتَشَابِهاً، وَحِفْظاً وَوَهْماً، وَقَدْ كُذِبَ عَلَى رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله وسلم عَلَى عَهْدِهِ، حَتَّى قَامَ خَطِيباً، فَقَالَ: «مَنْ كَذَبَ عَلَيَّ

ji agir ra gazî dikin. Ewa jî karûbarên hukmetê kirin destê wan da û ew kirin hakim û li ser stowê xelkê mezin kirin, vêca pê wan dinya xarin. Çiko xelk xêncî ji wa yên Xwedê ew paraztîn digel hukumdar û dinyayê ne. Evêhe yêk ji wan çara bî.

Ehlê xeletîyê: Kesekî jî tiştek ji Pêğemberê Xwedê (s) gohlê bûye lê belê baş nespartî ye hizra xwe û têda xelet bûye û bi zanîn derew nekirîye. Ew wê tişta hîn bûyî riwayet dikê û bi xwe jî pê 'emel dikê û li her cihî dibêjê ku min ev gotin ji resûlê Xwedê (s) seh kirîye. Eger muslimana bizanbîya ew di wê da xelet bûye, ew ji wî qebûl nedikiran û eger ewî bi xwe jî bizanîya ku xelete wê dest jê bikêşa.

Ehlê şubhê: Yê sisê jî ew e yê tiştek ji Pêğember selat û selam ser wî û alê wî bin gohlê bûyî ku emir kirîye pêk bê paşê jî nehî jê kirîye, halhale ew ji wê (nehî kirinê) bê xebere. An ji wî seh kiribê ku nehî ji tiştekî kiribê, paşê emrê bi kirina wê kiribê û li wî halî da ewî agahî ji wî (emrî) nebê. Vê gûrekî ewî "mensûx" gohlê bûye, lê belê "nasix" gohlê nebûye. Evî mirovî eger bizanbîya ewa ew dibêjê hatîye nesix kirin qet ew nedigota û eger muslimana dema ew ji wî

مُتَعَمِّداً فَلْيَتَبَوَّأْ مَقْعَدَهُ مِنَ النَّارِ».

وَإِنَّمَا أَتَاكَ بِالْحَدِيثِ أَرْبَعَةُ رِجَالٍ لَيْسَ لَهُمْ خَامِسٌ:

[المنافقون]: رَجُلٌ مُنَافِقٌ مُظْهِرٌ لِلإِيمَانِ، مُتَصَنِّعٌ بِالإِسْلاَمِ، لاَيَتَأَثَّمُ وَلاَ يَتَحَرَّجُ، يَكْذِبُ عَلَى رَسُولِ الله صلى الله عليه وآله مُتَعَمِّداً، فَلَوْ عَلِمَ النَّاسُ أَنَّهُ مُنَافِقٌ كَاذِبٌ لَمْ يَقْبَلُوا مِنْهُ، وَلَمْ يُصَدِّقُوا قَوْلَهُ، وَلكِنَّهُمْ قَالُوا: صَاحِبُ رَسُولِ الله صلى الله عليه وآله رَآهُ، وَسَمِعَ مِنْهُ، وَلَقِفَ عَنْهُ، فَيَأْخُذُونَ بِقَوْلِهِ، وَقَدْ أَخْبَرَكَ اللهُ عَنِ الْمُنَافِقِينَ بِمَا أَخْبَرَكَ، وَوَصَفَهُمْ بِمَا وَصَفَهُمْ بِهِ لَكَ، ثُمَّ بَقُوا بَعْدَهُ عليه السلام فَتَقَرَّبُوا إِلَى أَئِمَّةِ الضَّلاَلَةِ، وَالدُّعَاةِ إِلَى النَّارِ بِالزُّورِ وَالْبُهْتَانِ، فَوَلَّوهُمُ الأَعْمَالَ، وَجَعَلُوهُمْ عَلَى رِقَابِ النَّاسِ، وَأَكَلُوا بِهِمُ الدُّنْيَا، وَإِنَّمَا النَّاسُ مَعَ الْمُلُوكِ وَالدُّنْيَا، إِلاَّ مَنْ عَصَمَ اللهُ، فَهذَا أَحَدُ الأَرْبَعَةِ.

[الخاطئون]: وَرَجُلٌ سَمِعَ مِنْ رَسُولِ الله(صلى الله عليه وآله)

seh kirîn bizanbûna ku ew “nesix” bûye, wê ew terk bidan û dest jê bikêşan.

Rastgûyên Ĥedîsparêz: Yê çarê jî keseke ku qet derewan bi Xwedê û Pêğemberê wîve dananê û ji ber tirsa ji Xwedê heyî û mezin ragirtina Pêğemberê wî (s) dijminê derewa ye; xelet jî nebûye, belkî her axiftinek çawa ji Pêğember selat û selam ser wî û alê wî bin gohlê bûyî li mejîyê xwe da girtîye û riwayet kirîye, ne lê zêde kirîye û ne jê kêm kirîye, vêca ewî nasix nas kirîye û pê ‘emel dikê û zanîye mensûx kîjane, vêca xwe jê dûr kirîye. Her wiha xas û’am û muhkem û muteşabih nas kirne û her yêk li cihê wê da deyna ye.

Carnan jî çêbuye ku xeberdana resûlê Xwedê selat û selam ser wî û alê wî bin dû alî bê; ji alîyekîve xas û ji alîyê dîve (‘am) giştî. Vêca kesê ku mexseda Xwedayê Subhan û Pêğemberê wî (s) nedizanî, ew gohlê dibûya û bêy wê çendê ku zanînek derheq wê da hebê û mexseda wî yê ew gotî nas kiribê bi awayekî ew me’ne dikira. Ne wisa bûye ku hemî sehabî yên Pêğember selat û selam ser wî û alê wî bin tiştek ji wî pirsî bin û fêhm kirin û tê gehiştina wê ji wî xwestibin, heta

شَيْئاً لَمْ يَحْفَظْهُ عَلَى وَجْهِهِ، فَوَهِمَ فِيهِ، وَلَمْ يَتَعَمَّدْ كَذِباً، فَهُوَ فِي يَدَيْهِ، يَرْوِيهِ وَيَعْمَلُ بِهِ، وَيَقُولُ: أَنَا سَمِعْتُهُ مِنْ رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله فَلَوْ عَلِمَ الْمُسْلِمُونَ أَنَّهُ وَهِمَ فِيهِ لَمْ يَقْبَلُوهُ مِنْهُ، وَلَوْ عَلِمَ هُوَ أَنَّهُ كَذلِكَ لَرَفَضَهُ!

[أهل الشبهة]: وَرَجُلٌ ثَالِثٌ، سَمِعَ مِنْ رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآله شَيْئاً يَأْمُرُ بِهِ، ثُمَّ نَهَى عَنْهُ وَهُوَ لاَ يَعْلَمُ، أَوْ سَمِعَهُ يَنْهَى عَنْ شَيْءٍ، ثُمَّ أَمَرَ بِهِ وَهُوَ لايَعْلَمُ، فَحَفِظَ المَنسُوخَ، وَلَمْ يَحْفَظِ النَّاسِخَ، فَلَوْ عَلِمَ أَنَّهُ مَنْسُوخٌ لَرَفَضَهُ، وَلَوْ عَلِمَ الْمُسْلِمُونَ إِذْ سَمِعُوهُ مِنْهُ أَنَّهُ مَنْسُوخٌ لَرَفَضُوهُ.

[الصادقون الحافظون]

وَآخَرُ رَابِعٌ، لَمْ يَكْذِبْ عَلَى اللهِ، وَلاَ عَلَى رَسُولِهِ، مُبْغِضٌ لِلْكَذِبِ، خَوْفاً لله، وَتَعْظِيماً لِرَسُولِ اللهِ، وَلَمْ يَهِمْ، بَلْ حَفِظَ مَا سَمِعَ عَلَى وَجْهِهِ، فَجَاءَ بِهِ عَلَى

bi wê derecê ku hez dikiran kûçerek an xerîbek bihata û ji wî selewatên Xwedê lê bin tiştek bipirsîna da ewa gohê xwe bidayê û seh bikiran. Lê belê çi muşkilek ji minra bihata pêş muheqeq min jê dipirsîya û bi şiklek durist li hizrê xweda digirta û diparazta.

Belê vêca hema ev e sebebê ixtilaf û newek yêk bûna xelkê li neqil kirina riwayetan da.

AXIFTINA 211

Ji eserên mezinatî û bê nimûne bûna xulqandina wî, ev e ku di nav ava behra tejî ku pêlên wê ser hevda tên û pêlek pêla dî dehf didê cihek zowa û hişk û bê teratî çêkir û ji wê tebeq çêkirin û ew tebeq ku biheve bûn ji hev cida kirin û heft ‘esman çêkirin û ‘esmana bi fermana wî xwe ragirtin û her yêk li cihê xwe da sekinî; ‘erd qayîm kir, di halekî da ku behra mezin û kesk fermanberê wî bî ew li xwe suwar kir bî û li beraberê fermana wî da ketî û şikestî bî û ji ber heybeta wî gohdar. Ava carî û diherkê ji tirsa wî li cî da sekinî, vêca tehtên ‘erdê çêkirin û girkên bilind û çîyayên mezin anîn wucûdê û li cîyê wan da rawestandin û

مَا سَمِعَهُ، لَمْ يَزِدْ فِيهِ وَلَمْ يَـنْقُصْ مِنْهُ، وَحَفِظَ النَّاسِـخَ فَعَمِـلَ بِـهِ، وَحَفِظَ الْمَنْسُـوخَ فَجَنَّـبَ عَنْـهُ، وَعَرَفَ الْخَاصَّ وَالْعَـامَّ، فَوَضَـعَ كُـلَّ شَـيْءٍ مَوْضِـعَهُ، وَعَـرفَ الْمُتَشَابِهَ وَمُحْكَمَهُ.

وَقَدْ كَانَ يَكُونُ مِـنْ رَسُـولِ اللهِ(صلى الله عليه وآله) الْكَلاَمُ لَهُ وَجْهَانِ: فَكَـلاَمٌ خَـاصٌّ، وَكَـلاَمٌ عَامٌّ، فَيَسْمَعُهُ مَـنْ لاَ يَعْـرِفُ مَـا عَنَى اللهُ بِهِ، وَلاَ مَا عَنَى بِهِ رَسُولُ اللهِ(صلى الله عليه وآلـه)فَيَحْمِلُـهُ السَّامِعُ، وَيُوَجِّهُهُ عَلَى غَيْرِ مَعْرِفَةِ بِمَعْنَاهُ، وَمَا قُصِدَ بِهِ، وَمَـا خَـرَجَ مِنْ أَجْلِهِ، وَلَيْسَ كُـلُّ أَصْـحَابِ رَسُولِ اللهِ صلى الله عليه وآلـه مَنْ كَـانَ يَسْأَلُهُ وَيَسْتَفْهِمُهُ، حَتَّى إِنْ كَـانُوا لَيُحِبُّـونَ أَنْ يَجِـيءَ الأَعْرَابِـيُّ أَوْ الطَّارِىءُ، فَيَسْأَلَهُ عليه السلام حَتَّـى يَسْمَعُوا، وَكَانَ لاَ يَمُـرُّ بِـي مِـنْ ذلِـكَ شَـيْءٌ إِلاَّ سَـأَلْتُ عَنْـهُ وَحَفِظْتُهُ.

فَهذِهِ وُجُوهُ مَا عَلَيْهِ النَّاسُ فِي

qirar da ku li cîyê xwe da bimînin; çîya li nav hewayê ra bilind kirin û binê wan di avê da kirin xarê û ew ji ‘erdê berfireh hilkişandin û li etrafê ‘erdê da danîn û kirin di wa ciha ra ewên niha têra çûyîn. Serê çîyan bilind kir û binyata wan berfireh kir û ew ji ‘erdê ra kirin palgeh û sitûn û wek singan di wê da kirin. Vêca ‘erd ji bizavê sekinî da ehlê xwe nelerzênê û barê xwe nerêjê û ji cîyê xwe neçê.

Vêca pake ewê ‘erd, piştî pêlên avên wê ragirtî û piştî şilatî ya teniştên wê ew zowa kirî û kirî cihê rihetî ya mexlûqan û ew ji wan ra rayêxistî ser behra kûr û sekinyî; ewa naherkê û rawestayî; ewa ba yên dijwar ewê dibê û dizivirînê ser cihê wê û ‘ewrên pir baran li ser wê dibarê û têxê herektê û: ***“Di wê da ji Xwedê tirsa ra ‘ibret heye”***.[98]

AXIFTINA 212

Ey Xuda! Heçî ji bendeyên te ku gotina me ya bi ‘edalet û ne zalimane û li xêra dîn û dinyayê da û ne xirabker, gohlê bibê û paş gohlê bînê vêca xwe lê ba bidê û ji arîkarî ya te bisekinê û ji bona qewî kirina dînê te sistîyê bikê, ey mezintirîn şahid, em te

اخْتِلاَفِهِمْ، وَعِلَلِهِمْ فِي رِوَايَاتِهِمْ.

[211]

وَكَانَ مِنِ اقْتِدَارِ جَبَرُوتِهِ، وَبَدِيعِ لَطَائِفِ صَنْعَتِهِ، أَنْ جَعَلَ مِنْ مَاءِ الْبَحْرِ الزَّاخِرِ الْمُتَرَاكِمِ الْمُتَقَاصِفِ يَبَساً جَامِداً، ثُمَّ فَطَرَ مِنْهُ أَطْبَاقاً، فَفَتَقَهَا سَبْعَ سَمَاوَاتٍ بَعْدَ ارْتِتَاقِهَا فَاسْتَمْسَكَتْ بِأَمْرِهِ، وَقَامَتْ عَلَى حَدِّهِ [وَأَرْسَى أَرْضاً] يَحْمِلُهَا الأَخْضَرُ الْمُثْعَنْجِرُ وَالْقَمْقَامُ الْمُسَخَّرُ، قَدْ ذَلَّ لاِمْرِهِ، وَأَذْعَنَ لِهَيْبَتِهِ، وَوَقَفَ الْجَارِي مِنْهُ لِخَشْيَتِهِ، وَجَبَلَ جَلاَمِيدَهَا، وَنُشُوزَ مُتُونِهَا وَأَطْوَادِهَا، فَأَرْسَاهَا فِي مَرَاسِيهَا، وَأَلْزَمَهَا قَرَارَاتِهَا، فَمَضَتْ رُؤُسُهَا فِي الْهَوَاءِ، وَرَسَتْ أُصُولُهَا فِي الْمَاءِ، فَأَنْهَدَ جِبَالَهَا عَنْ سُهُولِهَا، وَأَسَاخَ قَوَاعِدَهَا فِي مُتُونِ أَقْطَارِهَا، وَمَوَاضِعِ أَنْصَابِهَا، فَأَشْهَقَ قِلاَلَهَا، وَأَطَالَ أَنْشَازَهَا، وَجَعَلَهَا لِلأَرْضِ عِمَاداً، وَأَرَّزَهَا فِيهَا أَوْتَاداً، فَسَكَنَتْ عَلَى حَرَكَتِهَا مِن أَنْ

li dijê wa da dikîn şahid û her wiha hemî ewên te li ‘erd û ‘esmanên xwe da cî kirîn em wa jî li ser wan dikin şahid. Piştî wê jî tuyî yê me ji arîkarîya wan bê ihtîyac dikî û gonehê wan li wan digirî.

تَمِيدَ بِأَهْلِهَا، أَوْ تَسِيخَ بِحِمْلِهَا، أَوْ تَزُولَ عَنْ مَواضِعِهَا.

فَسُبْحَانَ مَنْ أَمْسَكَهَا بَعْدَ مَوَجَانِ مِيَاهِهَا، وَأَجْمَدَهَا بَعْدَ رُوطُوبَةِ أَكْنَافِهَا، فَجَعَلَهَا لِخَلْقِهِ مِهَاداً، وَبَسَطَهَا لَهُمْ فِرَاشاً! فَوْقَ بَحْرٍ لُجِّيٍّ رَاكِدٍ لاَ يَجْرِي، وَقَائِمٍ لاَ يَسْرِي، تُكَرْكِرُهُ الرِّيَاحُ الْعَوَاصِفُ، وَتَمْخُضُهُ الْغَمَامُ الذَّوَارِفُ، (إِنَّ فِي ذلِكَ لَعِبْرَةً لِمَنْ يَخْشَى)

AXIFTINA 213

Ĥemd ji Xuda ra ewê bilindtir ji wê çendê ku digel mexlûqê xwe beraber bê ragirtin û bilindtir e ji wesf ê pesinderan, ewê bi ‘ecêba afirandin a xwe ji bona wa yên dinêrin eşkere ye û bi celal û ‘izzet a xwe ji bîr û hizra xîyalkeran veşartî. Ewê zana, bêy wê çendê ku zanîn bi destve anîbê an ser zanîna wî ve zêde bibê an zanîna xwe pê zanînek dî hasil kiribê, ewê her tişt çêkirî, bêy fikir kirin û bîr û hizir kirinê, ewê tarîtî ewî naveşêrin û ronahî ya xwe ji nûr û ronahîyan nagirê, ewê ne şev ewî dinxumênê û ne jî roj ser wî da derbaz dibin. Pêhesan û idraka wî ne bi dîtinê ye û zanîna wî jî ne pê xeber gehandinê ye.

…Derheq Pêğember da (s):

Ew digel ronahî yê rêkir û li bijartinê da pêş êxist. Bi wî kelş (nekûkî) bi heve

[**212**]

اللَّهُمَّ أَيُّمَا عَبْد مِنْ عِبَادِكَ سَمِعَ مَقَالَتَنَا الْعَادِلَةَ غَيْرَ الْجَائِرَةِ، وَالْمُصْلِحَةَ فِي الدِّينِ وَالدُّنْيَا غَيْرَ الْمُفْسِدَةِ، فَأَبَى بَعْدَ سَمْعِهِ لَهَا إِلاَّ النُّكُوصَ عَنْ نُصْرَتِكَ، وَالاْبْطَاءَ عَنْ إِعْزَازِ دِينِكَ، فَإِنَّا نَسْتَشْهِدُكَ عَلَيْهِ يَا أَكْبَرَ الشَّاهِدِينَ شَهَادَةً، وَنَسْتَشْهِدُ عَلَيْهِ جَمِيعَ مَا اَسْكَنْتَهُ أَرْضَكَ وَسَمَاوَاتِكَ، ثُمَّ أَنْتَ بَعْدُ الْمُغْنِي عَنْ نَصْرِهِ، وَالاْخِذُ لَهُ بِذَنْبِهِ.

[**213**]

danîn û serketî şikandin û zehmetî rihet kirin û nerastî rast kir heta ku xeletî ji çep û rastve ji hev bilav kir.

AXIFTINA 214

Ez şahidîyê didim ku Xuda adile û ‘edaletê digel mexlûqê xwe dikê, hakimeke ku heq û batil ji hev cida dikê; Ez şehde didim ku Muhemmed (s) ‘evd û resûlê wî û serwerê bendeyên wî ye. Çiqa Xwedê bendeyên xwe kirîn dû kom, ew danî di nav koma baştir da, di binemala wî da ne zinakaran behrek hebûye û ne jî gonehkaran nesîbek.

Heyhê, rastî ev e ku Xwedayê subhan, ji xêrê ra hinek kes danîne û ji heqî yê ra hinek sitûn û ji ta’et ra jî hinek parêzer. Li wextê her ta’etekî da ji bona hewe ji alîyê Xwedayê hewe ve mededkarek heye ku peyvan tênê ser zimanan û dilan qayîm dikê ku bese ji wî yê arîkar xwaz ra û şifaye ji wî yê li pey şifayê ra.

Sifetê ‘aliman: Bizanin ew bendeyên Xuda ku xweykerê ‘ilmê wî ne, ewa ku xwey kirina wê lazim, xwey dikin û avê ji kanîyên wê diherkînin û bi hevaltî têkelîyê digel hev dikin û bi hez kirin hevdû dibînin û kaskên tejî bi

الْحَمْدُ لله الْعَلِيِّ عَنْ شَبَهِ الْـمَخْلُوقِينَ، الْغَالِبِ لِمَقَالِ الْوَاصِفِينَ، الظَّاهِرِ بِعَجَائِبِ تَدْبِيرِهِ لِلنَّاظِرِينَ، الْبَاطِنِ بِجَلاَلِ عِزَّتِهِ عَنْ فِكْرِ الْمُتَوَهِّمِينَ، الْعَالِمِ بِلاَ اكْتِسَابٍ وَلاَ ازْدِيَادٍ، وَلاَ عِلْمٍ مُسْتَفَادٍ، الْمُقَدِّرِ لِجَمِيعِ الأُمُورِ بِلاَ رَوِيَّةٍ وَلاَ ضَمِيرٍ، الَّذِي لاَ تَغْشَاهُ الظُّلَمُ، وَلاَ يَسْتَضِيءُ بِالأَنْوَارِ، وَلاَ يَرْهَقُهُ لَيْلٌ، وَلاَ يَجْرِي عَلَيْهِ نَهَارٌ، لَيْسَ إِدْرَاكُهُ بِالأَبْصَارِ، وَلاَ عِلْمُهُ بِالأَخْبَارِ.

منها: في ذكر النبي صلى الله عليه وآله:

أَرْسَلَهُ بِالضِّيَاءِ، وَقَدَّمَهُ فِي الاصْطِفَاءِ، فَرَتَقَ بِهِ الْمَفَاتِقَ، وَسَاوَرَ بِهِ الْمُغَالِبَ، وَذَلَّلَ بِهِ الصُّعُوبَةَ وَسَهَّلَ بِهِ الْحُزُونَةَ، حَتَّى سَرَّحَ الضَّلاَلَ، عَنْ يَمِينٍ وَشِمَالٍ.

[214]

وَأَشْهَدُ أَنَّهُ عَدْلٌ عَدَلَ، وَحَكَمٌ فَصَلَ، وَأَشْهَدُ أَنَّ مُحَمَّداً عَبْدُهُ

hevdû didin vexwarin û têhnîşka hev dişkînin. Şik û gumana xirabîyê di wan da peyda nabê û lez nakevin ji bona xeybet kirinê (behsa xirabî ya xelkê nakin) tebî'et û exlaqê wan bi vî awayî ye û li ser vî halî dostînîyê digel hev dikin û hev girtinê çêdikin. Ew wek tûvê bijartîne ku ewa ji xwe ra cida dikin û li zevî yê direşînin; ew tûvê ku xalis bûna wê ew ser tûvê dî êxistîye û imtihan û ceribandinê ew pak kirîye.

Şîret: Vêca divê (lazime) mirov şîretên hêja û berketî qebûl bikê û pêşîya qewmînê da hay jê hebê û li rojên temenê xwe yê kurt û mana xwe ya kêm binêrê li wî warî da ku ji nêzîkve wê berdê û şûna wê da biçê warek dî. Vêca bila ji bona cihê çûna xwe û nas kirina gohaztingeha xwe karekî bikê.

Xwezka wî kesê dilek salim û temîz heyî ku gohdere ji wî kesî ra ewê wî hidayet û rê rast dikê û xwe dûr dikê ji kesê ewî telef dikê; ewê bi rênimûnî ya wî yê çavê wî bîna kirî û gohdarî kirina fermana wî yê ew hidayet kirî rêka selametî yê bi dest xwe ve anîyî; ewê bi alîyê hidayetêve lez ketî pêşîya ku dergehên wê bên girtin û wesîlên gehiştina wê bên birîn; ewê derîyê tewbê ji xwe ra vekirî bihêlê da

وَرَسُولُهُ، وَسَيِّدُ عِبَادِهِ، كُلَّمَا نَسَخَ اللهُ الْخَلْقَ فِرْقَتَيْنِ جَعَلَهُ فِي خَيْرِهِمَا، لَمْ يُسْهِمْ فِيهِ عَاهِرٌ، وَلاَ ضَرَبَ فِيهِ فَاجِرٌ.

أَلاَ وإِنَّ اللهَ جَعَلَ لِلْخَيْرِ أَهْلاً، وَلِلْحَقِّ دَعَائِمَ، وَلِلطَّاعَةِ عِصَماً، وَإِنَّ لَكُمْ عِنْدَ كُلِّ طَاعَةٍ عَوْناً مِنَ اللهِ يَقُولُ عَلَى الأَلْسِنَةِ، وَيُثَبِّتُ الأَفْئِدَةَ، فِيهِ كِفَاءٌ لِمُكْتَفٍ، وَشِفَاءٌ لِمُشْتَفٍ.

[صفة العلماء]: وَاعْلَمُوا أَنَّ عِبَادَ اللهِ الْمُسْتَحْفَظِينَ عِلْمَهُ، يَصُونُونَ مَصُونَهُ، وَيُفَجِّرُونَ عُيُونَهُ، يَتَوَاصَلُونَ بِالْوِلاَيَةِ، وَيَتَلاَقَوْنَ بِالْمَحَبَّةِ، وَيَتَسَاقَوْنَ بِكَأْسٍ رَوِيَّةٍ، وَيَصْدُرُونَ بِرِيَّةٍ، لاَ تَشُوبُهُمُ الرِّيبَةُ، وَلاَ تُسْرِعُ فِيهِمْ الْغِيبَةُ. عَلَى ذلِكَ عَقَدَ خَلْقَهُمْ وَأَخْلاَقَهُمْ، فَعَلَيْهِ يَتَحَابُّونَ، وَبِهِ يَتَوَاصَلُونَ، فَكَانُوا كَتَفَاضُلِ الْبَذْرِ يُنْتَقَى، فَيُؤْخَذُ

gonehên xwe ji xwe bibê, ewê bi vî awayî, ew e yê li ser rêkê û ketî ser rêka ronahî ya hidayetê.

مِنْهُ وَيُلْقَى، قَد مَيَّزَهُ التَّخْلِيصُ، وَهذَّبَهُ الـتَّمْحيصُ.

AXIFTINA 215

Ji Di'ayên wî ye (s) ku zehf caran digota: Ĥemd hemî ji wî Xudayî ra ne ewê li min dikê sibeh, bêy wê hindê ku ez mirıbim an nexweş bim, an nexweşîyek ser rehên bedena min da hatibê an ji ber kiryarên min yên nebaş li min hatibê girtin; bêy wê çendê ku ez bê zarûk mabim, an ji dîn zivirî bim an inkara Xwedayê xwe bikim an ji ber îmana xwe li tirsê da bim, an 'eqlê min tevhev bûbê an ez bi 'ezabê ummetên pêşîya xwe da hatibim 'ezab dan.

Di halekî da li min bû sibeh ku ez bendeyek bê ixtîyarim ku zulm li xwe kirîye, te li ser min delîl heye û ez bê delîl im û ez nikarim bigrim xêncî ya tu bidî min û ez nikarim xwe biparêzim xêncî bi parastina te.

Ey Xuda! Ez hana xwe ji te ra tînim ku newebê digel bê ihtîyacî ya te ez feqîr û nedar bimînim û digel hidayeta te ez li rê winda bibim, an digel hebûna qudret û hukmê te, zulm li min bê kirin an ez kêm û zelîl bibim, halhale ferman fermana te ye.

[العظة]: فَلْيَقْبَلِ امْرُؤٌ كَرَامَـةً بِقَبُولِهَـا، وَلْيَحْـذَرْ قَارِعَـةً قَبْـلَ حُلُولِهَا، وَلْيَنْظُرِ امْرُؤٌ فِي قَصِـيرِ أَيَّامِهِ، وَقَلِيلِ مُقَامِهِ، فِـي مَنْـزِلٍ حَتَّى يَسْتَبْدِلَ بِهِ مَنْزِلاً، فَلْيَصْـنَعْ لِمُتَحَوَّلِهِ، وَمَعَارِفِ مُنْتَقَلِهِ.

فَطُوبَى لِذِي قَلْب سَلِيم، أَطَاعَ مَنْ يَهْدِيهِ، وَتَجَنَّـبَ مَـنْ يُرْدِيـهِ، وَأَصَابَ سَبِيلَ السَّلاَمَةِ بِبَصَرِ مَـنْ بَصَّرَهُ، وَطَاعَةِ هَاد أَمَـرَهُ، وَبَـادَرَ الْهُـدى قَبْـلَ أَنْ تُغْلَـقَ أَبْوَابُـهُ، وَتُقْطَعَ أَسْبَابُهُ، وَاسْـتَفْتَحَ التَّوْبَـةَ، وَأَمَاطَ الْحَوْبَةَ، فَقَـدْ أُقِـيمَ عَلَـى الطَّرِيقِ، وَهُدِيَ نَهْجَ السَّبِيلِ.

[215]

كان يدعو به كثيراً

الْحَمْدُ لله الَّذِي لَمْ يُصبِحْ بِـي

Ey Xuda! Canê min, bila ewilîn ni'meta bi qîmet bê ku tu ji nav ni'metên bi qedr û qîmetên xwe ji min dıstînî û ewilîn sipartî (wedî'et) bê ji nav sipartî yên te, ku tu paşve dizivirînî û digirî.

Ilahî! Em hana xwe ji Te ra tênîn, ji ber wê yêkê ku em ji gotina Te derkevîn an desta ji dînê Te bikêşîn, an xwestên nefsanî di pey hevda ser me da bên û me ji hidayeta ji bal Te ve hatî paşda bidin.

مَيِّتاً وَلاَ سَقِيماً، وَلاَ مَضْرُوباً عَلَى عُرُوقِي بِسُوء، وَلاَ مَأْخُوذاً بِأَسْوَاَ عَمَلِي، وَلاَ مَقْطُوعاً دَابِرِي، وَلاَ مُرْتَدّاً عَنْ دِينِي، وَلاَ مُنْكِراً لِرَبِّي، وَلاَ مُسْتَوْحِشاً مِنْ إِيمَانِي، وَلاَ مُلْتَبِساً عَقْلِي، وَلاَ مُعَذَّباً بَعَذَابِ الأُمَمِ مِنْ قَبْلِي.

أَصْبَحْتُ عَبْداً مَمْلُوكاً ظَالِماً لِنَفْسِي، لَكَ الْحُجَّةُ عَلَيَّ وَلاَ حُجَّةَ لِي، لاَ أَسْتَطِيعُ أَنْ آخُذَ إِلاَّ مَا أَعْطَيْتَنِي، وَلاَ أَتَّقِيَ إِلاَّ مَا وَقَيْتَنِي.

اللَّهُمَّ إِنِّي أَعُوذُ بِكَ أَنْ أَفْتَقِرَ فِي غِنَاكَ، أَوْ أَضِلَّ فِي هُدَاكَ، أَوْ أُضَامَ فِي سُلْطَانِكَ، أَوْ أُضْطَهَدَ وَالأَمْرُ لَكَ!

اللَّهُمَّ اجْعَلْ نَفْسِي أَوَّلَ كَرِيمَة تَنْتَزِعُهَا مِنْ كَرَائِمِي، وَأَوَّلَ وَدِيعَة تَرْتَجِعُهَا مِنْ وَدَائِعِ نِعَمِكَ عِنْدِي!

اللَّهُمَّ إِنَّا نَعُوذُ بِكَ أَنْ نَذْهَبَ عَنْ قَوْلِكَ، أَوْ نُفْتَتَنَ عَنْ دِينِكَ،

۞ AXIFTINA 216 ۞

Li Siffînê xeber daye:...

Muheqeq Xuda ji ber welayeta min li ser hewe (ji ber pêk anîna karên hewe) heqê min êxistîye ser hewe, hewe jî heqek li ser min heye wek wî heqê min li ser hewe heyî.

Vêca heq, li wextê jê axiftinê de berfirehtirînê tişta û li wextê pêk anîn (pê 'emel kirinê) da tengtirînê tişta ye. Çawa ku kesekî heqek li ser yê dî hebê, heqek jî li feyda wî da çêdibê, eger kesek hebê ku heq hemî ji wî ra bê û kesî li ser wî heq tinebê, ew tinê Xwedayê pak û subhane û ne kesek ji mexlûqê wî, çiko ew e yê karîn heyî li ser bendeyên xwe û 'edalaeta wî li hemî wa tiştên derheq wan da Ĥukum heyî,

eşkereye. Lê belê ewî heqê xwe li ser ‘evdan kir ew ku gohdarê wî bin û kirh û xêra gohdan û ta’etê wan jî dû beraber li xwe girt. Evahe fezl û bereketa wî û dan û berfirehî ya wî ya bi zêdahî ve ye ji bona wî kesê ehlê wê bê.

Îheqê walî û xelkê: Vêca Xwedayê subhan hinek ji heqên xwe li ser hinek kesan li beraberê hinek dî da ferz û wacib kirin û her heqek deyna li beraberê heqek dî da, hinek ji wan heqan hingê ferz dibin ku ewê dî jî heqê li stowê wî da heyî eda bikê (pêk bênê).

Mezintirîn heq ji wa heqên Xwedê ferz û wacib kirîn, heqê walî ye li ser xelkê û heqê xelkê ye li ser walî; ev ew ferze ku Xwedayê subhan ji bona her yêk ji wan li ser yê dî ferz kirîye û ew kirîye sebebê hev girtina wan û quwet û qudret ji dînê wan ra, vêca xelk bêy durist bûna serpêş û walî yan durist nabin û serpêş jî bêy serast bûna xelkê durist nabin;

Vêca dema xelkê heqê serokê xwe pêk anî û eda kir û ewî jî heqê wan pêk anî, wê heq li nav wan da bi quwet bibê û rêkên dîn bên ragirtin û nîşanên ‘edaletê bên vedan û sunnet bikevin di rêka xwe da û pê bên ‘emel kirin û di pey wê ra wê zeman durist bibê û

أَوْ تَتَابَعَ بِنَا أَهْوَاؤُنَا دُونَ الْهُدَى الَّذِي جَاءَ مِنْ عِنْدِكَ!

[216]

ومن خطبة له بصفين

أَمَّا بَعْدُ، فَقَدْ جَعَلَ اللهُ لِي عَلَيْكُمْ حَقّاً بِولاَيَةِ أَمْرِكُمْ، وَلَكُمْ عَلَيَّ مِنَ الْحَقِّ مِثْلُ الَّذِي لِي عَلَيْكُمْ.

فَالْحَقُّ أَوْسَعُ الأَشْيَاءِ فِي التَّوَاصُفِ، وَأَضْيَقُهَا فِي التَّنَاصُفِ. لاَيَجْرِي لِاَحَد إِلاَّ جَرَى عَلَيْهِ، وَلاَ يَجْرِي عَلَيْهِ إِلاَّ جَرَى لَهُ، وَلَوْ كَانَ لِاَحَد أَنْ يَجْرِيَ لَهُ وَلاَ يَجْرِيَ عَلَيْهِ، لَكَانَ ذلِكَ خَالِصاً لله سُبْحَانَهُ دُونَ خَلْقِهِ، لِقُدْرَتِهِ عَلَى عِبَادِهِ، وَلِعَدْلِهِ فِي كُلِّ مَا جَرَتْ عَلَيْهِ صُرُوفُ قَضَائِهِ، وَلكِنَّهُ جَعَلَ حَقَّهُ عَلَى الْعِبَادِ أَنْ يُطِيعُوهُ، وَجَعَلَ جَزَاءَهُمْ عَلَيْهِ مُضَاعَفَةَ الثَّوَابِ تَفَضُّلاً مِنْهُ، وَتَوَسُّعاً بِمَا هُوَ مِنَ الْمَزِيدِ أَهْلُهُ.

حق الوالي وحق الرعية

ثُمَّ جَعَلَ ـ سُبْحَانَهُ ـ مِنْ

berhêvîya dewama dewletê bi quwet bikevê û dijmin bê hêvî bibê.

Û eger xelk desthelatê li ser mezinê xwe bikin û ew jî zulmê û neheqîyê digel wan bikê, hingê wê xeberdana wa digel hev rêk nekevê û alayên zulmê eşkere bibin û xirabî li dîn da pir bibê û ‘emelê bi sunnetê bê terk dan, vêca wê bi hewayê nefsê bê ‘emel kirin û ĥukum ji kar bê êxistin û derd û nexweşî yên rihî pir bibin û êdî kes ji ber ji dest çûna heqê mezin û pêk hatina karên batil û pûç natirsê, vêca hingê ye ku wê qenc zelîl bibin û bişkihên û pîsek mezin û qewî bibin û cezadana Xudayî li bal bendan mezin û giran bibê.

Vêca nixwe vê derheqê da ji hevdu ra şîretkar bin û baş arîkarî ya hev bikin. Elbet kes nikarê heqê ta’etê Xwedê wek çawa layiqê wî, pêk bênê, herçend ku ji destve anîna razî bûna wî ra kulbû û pir xebatkar bê. Yêk ji heqên ferz û wacibên ilahî li ser bendên wî ew e ku hemî xebata xwe bikar bibê ji bona şîret û xêrxwazî yê; û arîkarî digel hev bê kirin ji bona pêk anîna heqan li nav wan da.

Û kes nîne ku bê ihtîyac bê ji pêk anîna wî heqî ra ku Xwedê li ser wî deynayî, herçend merteba wî di heqîyê da mezin an seratî ya wî li dîn da ji yên

حُقُوقِهِ حُقُوقـاً افْتَرَضَـهَا لِـبَعْضِ النَّاسِ عَلَى بَعْض، فَجَعَلَهَا تَتَكَافَأُ فِـي وُجُوهِهَـا وَيُوجِـبُ بَعْضُـهَا بَعْضاً وَلاَ يُسْـتَوْجَبُ بَعْضُـهَا إِلاَّ بِبَعْض.

وَأَعْظَمُ مَا افْتَرَضَ سُبْحَانَه مِـنْ تِلْكَ الْحُقُوقِ حَـقُّ الْـوَالِي عَلَـى الرَّعِيَّةِ، وَحَقُّ الرَّعِيَّةِ، عَلَى الْـوَالِي، فَرِيضةً فَرَضَـهَا اللهُ سُـبْحَانَهُ لِكُـلّ عَلَى كُلّ، فَجَعَلَهَا نِظَامـاً لِأُلْفَـتِهِمْ، وَعِزّاً لِدِينِهِمْ، فَلَيْسَتْ تَصْلُحُ الرَّعِيَّةُ إِلاَّ بِصَـلاَحِ الْـوُلاَةِ، وَلاَ تَصْـلُحُ الْوُلاَةُ إِلاَّ بِاسْتِقَامَةِ الرَّعِيَّةِ.

فَإِذا أَدَّتِ الرَّعِيَّةُ إِلَى الْـوَالِي حَقَّهُ، وَأَدَّى الْوَالِي إِلَيْهَـا حَقَّهَـا، عَزَّ الْحَقُّ بَيْنَهُمْ، وَقَامَـتْ مَنَـاهِجُ الدِّينِ، وَاعْتَدَلَتْ مَعَـالِمُ الْعَـدْلِ، وَجَرَتْ عَلَى أَذْلاَلِهَاالسُّنَنُ، فَصَلَحَ بِذلِكَ الزَّمَانُ، وَطُمِـعَ فِـي بَقَـاءِ الدَّوْلَةِ، وَيَئِسَتْ مَطَامِعُ الأَعْدَاءِ.

وَإِذَا غَلَبَتِ الرَّعِيَّةُ وَالِيَهَـا، أَوْ أَجْحَفَ الْوَالِي بِرَعِيَّتِـهِ، اخْتَلَفَـتْ هُنَالِكَ الْكَلِمَـةُ، وَظَهَـرَتْ مَعَـالِمُ الْجَوْرِ، وَكَثُرَ الاِدْغَالُ فِي الـدِّينِ،

dî pitir bê. Her wiha kes nîne - herçend xelk ewî biçûk bibînin û neyê ber çavan- kêmtir ji wê çendê ku ji pêk anîna heqîyê ra arîkarîyê bikê an ji wê çendê ra arîkarî jê re bê kirin.

Li vê navbirê da yêkî ji yaranên wî bi dirêjî axift û pir pesnê wî dan û behsa fermanberî û gohdana xwe ji wî ra kir. Vêca di pey ra Imam (s) wiha got:

Heçî kesê ‘ezemet û celala Xwedê li bal wî giring bê û cihê wî li dilê wî da mezin bê, lazime ku heqê vê mezinahî û celalê pêk bênê û divê (lazime) heçî tişta ji xêncî wî li ber çavê wî kêm û biçûk bê. Rastî ev e ku musteheq tirîn kes ji vê yêkê ra ew e yê ni’metên Xwedê li ser wî zehf bin û Xwedê digel wî baş qencî kirbin, çiko ni’meta Xwedê ji kesekî ra zehf nabê xêncî ku heqê Xwedê li dilê wî da mezintir bê. Bi rastî pîstirîn haletên serokan li bal mirovên qenc ew e ku gûman bikin ew hej fexr û xwe mezin kirinê dikin û karê wan li ser kibr û xurûrê hatîye danîn.

Ez hez nakim bikevê hizra hewe û hûn guman bikin ku ez hej pesn dan û medeh kirinê dikim û hemd ji Xwedê re ku ez ne werengim; eger min bixwesta ku pesnê min bê dayîn jî, minê ji ber tewazû’ û xwe şikndina li beraberê

وَتُرِكَتْ مَحَاجُّ السُّنَنِ، فَعُمِلَ بِالْهَوَى، وَعُطِّلَتِ الأَحْكَامُ، وَكَثُرَتْ عِلَلُ النُّفُوسِ، فَلاَ يُسْتَوْحَشُ لِعَظِيمِ حَقٍّ عُطِّلَ، وَلاَ لِعَظِيمِ بَاطِلٍ فُعِلَ! فَهُنَالِكَ تَذِلُّ الأَبْرَارُ، وَتَعِزُّ الأَشْرَارُ، وَتَعْظُمُ تَبِعَاتُ اللهِ عِنْدَ الْعِبَادِ.

فَعَلَيْكُمْ بِالتَّنَاصُحِ فِي ذلِكَ، وَحُسْنِ التَّعَاوُنِ عَلَيْهِ، فَلَيْسَ أَحَدٌ ـــ وَإِنِ اشْتَدَّ عَلَى رِضَى اللهِ حِرْصُهُ، وَطَالَ فِي الْعَمَلِ اجْتِهَادُهُ ـ بِبَالِغٍ حَقِيقَةَ مَا اللهُ سُبْحَانَهُ أَهْلُهُ مِنَ الطَّاعَةِ لَهُ، وَلكِنْ مِنْ وَاجِبِ حُقُوقِ اللهِ عَلَى العِبَادِ النَّصِيحَةُ بِمَبْلَغِ جُهْدِهِمْ، وَالتَّعَاوُنُ عَلَى إِقَامَةِ الْحَقِّ بَيْنَهُمْ.

وَلَيْسَ امْرُؤٌ ـ وَإِنْ عَظُمَتْ فِي الْحَقِّ مَنْزِلَتُهُ، وَتَقَدَّمَتْ فِي الدِّينِ فَضِيلَتُهُ ـ بِفَوْقِ أَنْ يُعَانَ عَلَى مَا حَمَّلَهُ اللهُ مِنْ حَقِّهِ. وَلاَ امْرُؤٌ ـ وَإِنْ صَغَّرَتْهُ النُّفُوسُ، وَاقْتَحَمَتْهُ الْعُيُونُ ـ بِدُونِ أَنْ يُعِينَ عَلَى ذلِكَ أَوْ يُعَانَ عَلَيْهِ.

فأجابه عليه السلام رجل من

Xwedê da ew terk bida, çiko tinê ew e layiqê ‘ezemet û mezinahî yê.

Gelek caran çêdibê xelk piştî karê muhim ku kirne, dixwazin pesnê wan bê dayîn, lê belê ji ber wî qasî ku min ferman ji Xuda birîye û bi qencî digel hewe derbaz kirîye, pesnê min nedin, çiko hêca hinek heq hene ku min pêk neanîne û ez pêveme û hinek ferz li ser min hene ku lazime ez bi cî bînim, vêca bi wî awayê hûn digel zûrgo û zaliman taxivin, digel min neaxivin û wek çawa xelk xwe ji mirovê xezeb girtî paşve didin, hûn xwe ji min paşda nedin; bi ziman hilwîtîyê (û tesennu’ê) têkelîyê digel min nekin; û guman nekin ku gotina heqîyê derheq min da wê li min giran bê an ez mezin kirina xwe ji hewe bixwazim, çiko heçî kesê seh kirina heqî yê lê giran bê an nekarê şîreta kesekî derheq ‘edaletê da gohlê bibê, ‘emel kirina bi heqî û ‘edaletê wê ji wî ra girantir bê.

Nixwe vêca xwe paşda nedin ji gotina bi heq û meşwereta bi ‘edalet. Çiko ez li dilê xwe da xwe wereng hesab nakim ku ez xelet nebim û li kiryarên xwe da ji xeletê êmin bim, xêncî ku Xuda, min biparêzê, çiko ew derheq min bi xwe da jî ji min pitir

أصحابه بكلام طويل يكثر فيه الثناء عليه ويذكر سمعه وطاعته له. فقال عليه السلام:

إِنَّ مِنْ حَقِّ مَنْ عَظُمَ جَلاَلُ اللهِ فِي نَفْسِهِ، وَجَلَّ مَوْضِعُهُ مِنْ قَلْبِهِ، أَنْ يَصْغُرَ عِنْدَهُ ـ لِعِظَمِ ذلِكَ ـ كُلُّ مَا سِوَاهُ، وَإِنَّ أَحَقَّ مَنْ كَانَ كَذلِكَ لَمَنْ عَظُمَتْ نِعْمَةُ اللهِ عَلَيْهِ، وَلَطُفَ إِحْسَانُهُ إِلَيْهِ، فَإِنَّهُ لَمْ تَعْظُمْ نِعْمَةُ اللهِ عَلَى أَحَدٍ إِلاَّ ازْدَادَ حَقُّ اللهِ عَلَيْهِ عِظَماً، وَإِنَّ مِنْ أَسْخَفِ حَالاَتِ الْوُلاَةِ عِنْدَ صَالِحِ النَّاسِ، أَنْ يُظَنَّ بِهِمْ حُبُّ الْفَخْرِ، وَيُوضَعَ أَمْرُهُمْ عَلَى الْكِبْرِ.

وَقَدْ كَرِهْتُ أَنْ يَكُونَ جَالَ فِي ظَنِّكُمْ أَنِّي أُحِبُّ الاْطْرَاءَ، وَاسْتِمَاعَ الثَّنَاءِ، وَلَسْتُ ـ بِحَمْدِ اللهِ ـ كَذلِكَ، وَلَوْ كُنْتُ أُحِبُّ أَنْ يُقَالَ ذلِكَ لَتَرَكْتُهُ انْحِطَاطاً للهِ سُبْحَانَهُ عَنْ تَنَاوُلِ مَا هُوَ أَحَقُّ بِهِ مِنَ الْعَظَمَةِ وَالْكِبْرِيَاءِ.

وَرُبَّمَا اسْتَحْلَى النَّاسُ الثَّنَاءَ بَعْدَ الْبَلاَءِ، فَلاَ تُثْنُوا عَلَيَّ بِجَمِيلِ ثَنَاءٍ، لِاِخْرَاجِي نَفْسِي إِلَى اللهِ وَ

dikarê min biparêzê.

Ez û hûn ew ‘evdin ewên li bin qudreta wî Xudayî da ku xêncî wî çi xudan û xweyker nînin. Ew ji me bi xwe pitir xweyê me ye; ew e yê em ji wî halê me yê pêşda deranîn û bi wî alîyîve birin ku xêr û başî ya me têda, vêca li rê windabûna me, zivirand ser hidayetê û piştî kûratî yê bînayî kir behra me.

AXIFTINA 217

Ilahî! Tu ‘ewdha min li qureyşî yan û ewên arîkarî ya wan kirîn veke (tûla min bigire - heyfa min hilîne), çiko bi rastî ewa peywenda mirovanî ya min birîn û kaska min qulibandin û ji bona munaqişa digel min li ser heqekî ku ez ji yên dî musteheqtirê wê bûm li hev kom bûn û gotin: Eger tu heqê xwe digirî, bigire û eger tu ji heq bêy mehrûm kirin jî, tu dixazî bi xema xwe ve sebir bike û te bivê jî bi kol û mereqanve bimre.

Wekî min nêrî ku ji bona min, xêncî ehlê mala min qe çi piştek û berevan û arîkar nînin, vêca (giran hat) min nexwest ku ez wan bi alîyê mirinêve bibim, li vî halî da min çavê xwe ku qirşik têda bî nuqand û min tifa xwe piçu piçu daqurtand, li halekî da ku hestî di gerîya min ra bî. Û min li halekî da sebir kir û

إِلَيْكُمْ مِنَ التَّقِيَّةِ فِي حُقُوقٍ لَمْ أَفْرُغْ مِنْ أَدَائِهَا، وَفَرَائِضَ لاَ بُدَّ مِنْ إِمْضَائِهَا، فَلاَ تُكَلِّمُونِي بِمَا تُكَلَّمُ بِهِ الْجَبَابِرَةُ، وَلاَ تَتَحَفَّظُوا مِنِّي بِمَا يُتَحَفَّظُ بِهِ عِنْدَ أَهْلِ الْبَادِرَةِ، وَلاَ تُخَالِطُونِي بِالْمُصَانَعَةِ، وَلاَ تَظُنُّوا بِيَ اسْتِثْقَالاً فِي حَقٍّ قِيلَ لِي، وَلاَ الْتِمَاسَ إِعْظَامٍ لِنَفْسِي، فَإِنَّهُ مَنِ اسْتَثْقَلَ الْحَقَّ أَنْ يُقَالَ لَهُ أَوْ الْعَدْلَ أَنْ يُعْرَضَ عَلَيْهِ، كَانَ الْعَمَلُ بِهِمَا أَثْقَلَ عَلَيْهِ.

فَلاَ تَكُفُّوا عَنْ مَقَالٍ بِحَقٍّ، أَوْ مَشُورَةٍ بِعَدْلٍ، فَإِنِّي لَسْتُ فِي نَفْسِي بِفَوْقِ أَنْ أُخْطِىءَ، وَلاَ آمَنُ ذلِكَ مِنْ فِعْلِي، إِلاَّ أَنْ يَكْفِيَ اللهُ مِنْ نَفْسِي مَا هُوَ أَمْلَكُ بِهِ مِنِّي.

فَإِنَّمَا أَنَا وَأَنْتُمْ عَبِيدٌ مَمْلُوكُونَ لِرَبٍّ لاَ رَبَّ غَيْرُهُ، يَمْلِكُ مِنَّا مَا لاَ نَمْلِكُ مِنْ أَنْفُسِنَا، وَأَخْرَجَنَا مِمَّا كُنَّا فِيهِ إِلَى مَا

kerb û xezeba xwe daxwar ku ji bona min ji “henzelê” tehltir bî û ji dilê min ra bi êş tir bî ji birîna kêra tîj.

***Seyidê Rezî**: Ev axiftin li nav axiftinên pêşîyê da bûrî, lê ji ber ku ew dû riwayet ji hev ferq bîn, min li vê derî jî, anî.*

صَـلَحْنَا عَلَيْـهِ، فَأَبْـدَلَنَا بَعْـدَ الضَّـلاَلَةِ بِالْهُـدَى، وَأَعْطَانَـا الْبَصِيرَةَ بَعْدَ الْعَمَى.

[**217**]

اللَّهُمَّ إِنِّي أَسْـتَعْدِيكَ عَلَـى قُرَيْش، فَإِنَّهُمْ قَدْ قَطَعُوا رَحِمِي، وَأَكْفَأُوا إِنَائِي، وَأَجْمَعُـوا عَلَـى مُنَازَعَتِي حَقّاً كُنْتُ أَوْلَى بِهِ مِـنْ غَيْرِي، وَقَالُوا: أَلاَ إِنَّ فِي الْحَـقِّ أَنْ تَأْخُذَهُ، وَفِي الْحَقِّ أَنْ تُمْنَعَهُ، فَاصْبِرْ مَغْمُوماً، أَوْ مُتْ مُتَأَسِّفاً.

وَمَا نِلْتَ مِنْ دُنْيَاكَ فَلاَ تُكْثِرْ بِهِ فَرَحاً، وَمَا فَاتَكَ مِنْهَا فَلاَ تَأْسَ عَلَيْهِ جَزَعاً، وَلْيَكُنْ هَمُّكَ فِيمَا بَعْدَ الْمَوْتِ.

۞ NIVÎSOKA 24 ۞

Piştî zivirîna ji Siffînê bi nivîsîn wesîyet kirîye ku paş wî çi li malê wî bikin:

Eva he ew destûr e ku 'ebdê Xwedê 'Elî yê korê Ebû Talib, mîrê bawerdaran, derheq mal û heyî ya xwe da ji bona xwatirê Xwedê û razî bûna Wî da ye, da ku ewî bibê bihiştê û êmnahîyê bidîyê.

... Hesenê korê 'Elî bila evê wesîyetê bi cî bênê. Bila ew bi qencî û qeyde ji malê min mesref bikê û bi qencî û qeyde danê bikê. Eger tiştek hat serê Hesen û, Huseyn sax bê, piştî wî, wê ew pêk anîna vê wesîyetê li xwe bigirê û ewê li cîyê wê da ragirê.

Behra dû korên Fatimayê ji vî malî, qas behra ewladên dî yên 'Elî ye. Û eger min zarokên Fatimayê ji vî karî ra

[23]

قاله قُبَيْلَ موته لمّا ضربه ابن ملجم على سبيل الوصية

وَصِيَّتِي لَكُمْ: أَنْ لاَ تُشْرِكُوا بِالله شَيْئاً، وَمُحَمَّدٌ(صلى الله عليه وآله) فَلاَ تُضَيِّعُوا سُنَّتَهُ، أَقِيمُوا هذَيْنِ الْعَمُودَينِ، وَخَلاَ كُمْ ذَمٌّ.

أَنَا بالأَمْسِ صَاحِبُكُمْ، وَالْيَوْمَ عِبْرَةٌ لَكُمْ، وَغَداً مُفَارِقُكُمْ، إِنْ أَبْقَ فَأَنَا وَلِيُّ دَمِي، وَإِنْ أَفْنَ فَالْفَنَاءُ مِيعَادِي، وَإِنْ أَعْفُ فَالْعَفْوُ لِي قُرْبَةٌ، وَهُوَ لَكُمْ حَسَنَةٌ، فَاعْفُوا (أَلاَ تُحِبُّونَ أَنْ يَغْفِرَ اللهُ لَكُمْ)

وَالله مَا فَجَأَنِي مِنَ الْمَوْتِ وَارِدٌ كَرِهْتُهُ، وَلاَ طَالِعٌ أَنْكَرْتُهُ، وَمَا كُنْتُ إِلاَّ كَقَارِبٍ وَرَدَ، وَطَالِبٍ وَجَدَ، (وَمَا عِنْدَ اللهِ خَيْرٌ لِلأَبْرَارِ)

veqetandin ji ber razî bûna Xwedê û nêzîk bûna bal Pêğember ve ye selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin û ragirtina hurmeta wî û bihadana mirovatî û xizmanî ya digel wî ye. Digel wî kesê ev kar bi hêvîya wî ve mayî, ez şert dikim ku eslê mal, bi wî şiklê heyî bihêlê û ji fêkî yê wî mesref bikê wek çawa destûra wî hatî dayîn û rêk hatî nîşan dan, şertê dî jî ev e ku qe çi darên taze çandî yên xurmên wa gonda nefrûşê heta ku ew ‘erd tejî darên xurmayê bibê ku hatine çandin.

Ew carîyên min yên ez diçûma bal wan, eger zarok hebin an pê giran bin, bila li ser zarokê wan bên hiştin û ew yên wan e, vêca eger zarokê wê bimrê û ew sax bê, êdî ew aza ye û benda ‘ebdînîyê ji ser wê rabûye û ji aza bûyîya ye. [123]

۞ NIVÎSOKA 25 ۞

Ji wesîyetên wî (s) ji wan kesan ra dinivîsîya ku rêdikira ji girtina zekat û sedeqan ra.

***Seyidê Rezî**: Emê hinek ristên vê nivîsokê bînin, da hemî bizanin ku ewî selamên Xwedê lê bin sitûna heqîyê radigirta û nîşanên ‘edaletê li karên biçok, mezin, hûr û gir da eşkere dikira.*

Pê teqwa Xwedê, bikeve rê, ew

وقد مضى بعض هـذا الكـلام فيما تقدّم من الخطب، إلاّ أنّ فيـه هاهنا زيادة أوجبت تكريره.

[24]

ومن وصية له عليه السلام بما يُعمل في أمواله، كتبها بعد منصرفه من صفين

هذَا مَا أَمَرَ بِهِ عَبْدُ الله عَلِيُّ بْـنُ أَبِي طَالِب أَمِيرُالْمُؤْمِنِينَ فِي مَالِـهِ، ابْتِغَاءَ وَجْهِ الله، لِيُولِجَنِي بِهِ الْجَنَّـةَ، وَيُعْطِيَنِي الأَمَنَةَ.

منها: فَإِنَّهُ يَقُومُ بِذلِكَ الْحَسـنُ بْنُ عَلِيّ، يأْكُـلُ مِنْـهُ بِـالْمَعْرُوفِ، وَيُنْفِقُ مِنْـهُ فِـي المَعْـرُوفِ، فَـإِنْ حَدَثَ بِحَسَن حَدَثٌ وَحُسَيْنٌ حَيٌّ، قَامَ بِالأَمْرِ بَعْدَهُ، وَأَصْدَرَهُ مَصْدَرَهُ.

وَإِنَّ لابْنَيْ فَاطِمَةَ مِـنْ صَـدَقَةِ عَلِيّ مِثْلَ الَّذِي لِبَنِي عَلِـيّ، وَإِنِّـي إِنَّمَا جَعَلْتُ الْقِيَامَ بِذلِكَ إِلَى ابْنَـيْ فَاطِمَةَ ابْتِغَاءَ وَجْهِ الله، وَقُرْبَةً إِلَـى رَسُولِ الله صلى الله عليه وآله وَتَكْرِيمـاً لِحُرْمَتِهِ، وَتَشْرِيفاً لِوُصْلَتِهِ.

وَيَشْتَرِطُ عَلَى الَّذِي يَجْعَلُهُ إِلَيْهِ أَنْ يَتْـرُكَ الْمَـالَ عَلَـى أُصُـولِهِ، وَيُنْفِقَ مِنْ ثَمَـرِهِ حَيْـثُ أُمِـرَ بِـهِ وَهُدِيَ لَهُ،أَلاَّ يَبِيعَ مِنْ أَوْلاَدِ نَخِيـلَ

Xweda yê tek û şirîk jê re neyî. Û qe çi muslimana netirsîne û heta ew bi xwe nexwazê serda neçe û zêdeyê ji heqê Xwedê jê nestîne.

Dema tu çûyî bal qebîleyekî here ser ava wan û neçe mala wan da; bi awayek sekinyî û weqar here heta tu biçî nav wan, vêca selam bikî û ji selamê kêm nehêlî. Paşê tu dê bêjî:

Ey bendeyên Xwedê! Welî yê Xwedê û xelîfê Wî ez şandime bal hewe da ku ez heqê Xwedê yê li nav malê hewe da heyî bigrim, vêca gelo Xwedê heqek li nav malê hewe da heye ku hûn bidin welî yê Xwedê? Eger kesekî got: Belê, bêy wê çendê ku tu ewî bitirsînî an tehdîd bikî (û xortîyê lê bikî) an li ser bişidînî an barê wî giran bikî (û bêxî zehmetê) digel wî here û ew zêr û zîvê ew bidê te, jê bigire. Vêca eger ewî pez an deve hebin bêy izna wî neçe navda, çiko behra pitir ya wî bi xwe ye. Eger tu çûyî nav kerîyê pez û devên wî jî, wek mirovê xort û bivê lê bişidênê neçe, her wiha qe heywana birev neêxe û netirsîne û li ser girtina wan xweyê wan neêşîne. Ew mal, hema çi bê bike dû qism û heqê bijartinê bide xweyê mal ku behrekî ji xwe ra rakê û ew kîjanê rakê xwe têkel neke. Pîştî wê qasê mayî dîsa bike dû behr û dîsa heqê bijartina yêkî ji wan dû behran bidîyê û ji ber wê

هذِهِ الْقُـرَى وَدِيَّـةً حَتَّـى تُشْـكِلَ أَرْضُهَا غِرَاساً.

وَمَنْ كَانَ مِـنْ إِمَـائِي اللاَّتِـي أَطُوفُ عَلَـيْهِنَّ لَهَـا وَلَـدٌ، أَوْهِـيَ حَامِلٌ، فَتُمْسَكُ عَلَى وَلَدِهَا وَهِـيَ مِنْ حَظِّهِ، فَإِنْ مَاتَ وَلَـدُهَا وَهِـيَ حَيَّةٌ فَهِيَ عَتِيقَةٌ، قَـدْ أَفْـرَجَ عَنْهَـا الرِّقُّ، وَحَرَّرَهَا الْعِتْقُ.

قوله في هـذه الوصـية: "وألا يبيـع مـن نخلها وَدِيَّةً"، الوَدِيَّةُ: الفَسِيلَةُ، وجمعهـا وَدِيٌّ. وَقوله: "حتى تشكل أرضها غراسـاً" هـو مـن أفصح الكلام، والمـراد بـه: أن الارض يكثـر فيها غراس النخل حتّى يراها الناظر على غيـر تلك الصفة التي عرفها بها فيشكل عليه أمرها ويحسبها غيرها.

[25]

كان يكتبها لمن يستعمله على الصدقات

و إنما ذكرنا منها جملاً هاهنا لـيُعلَمَ بها أنه عليه السلام كان يقيم عماد الحق، ويشرع أمثلة العدل، فـي صـغير الامـور وكبيرها، ودقيقها وجليلها.

انْطَلِقْ عَلَى تَقْوَى الله وَحْدَهُ لاَ شَرِيكَ لَهُ، وَلاَ تُرَوِّعَنَّ مُسْـلِماً، وَلاَ تَجْتَازَنَّ عَلَيْهِ كَارِهـاً، وَلاَ تَأْخُـذَنَّ مِنْهُ أَكْثَرَ مِنْ حَقِّ الله فِي مَالِهِ.

فَإِذَا قَدِمْتَ عَلَى الْحَيِّ فَـانْزِلْ بِمَائِهِمْ مِنْ غَيْرِ أَنْ تُخَالِطَ أَبْيَـاتَهُمْ،

ya ji xwe ra bijartî lûman lê neke, hema her bi vî awayî bike heta ew qismetê ku heqê Xwedê di wê da heye, bimînê, vêca ji wê, heqê Xwedê bigire.

Eger guman kir ew behra ji xwe re bijartî nebaş bijartîye û daxwaz kir ku ewê lêkvekirinê qebûl nekê, tu xwesta wî jê qebûl bike û dîsa ewî malî tevhev bike û paşê dîsa ji ewil ve karê pişk kirinê (teqsîm kirin û lêkve kirinê) despê bike heta ku tu heqê Xwedê yê li nav malê wî da heyî bigirî.

Elbet, heywana pîr û ‘emirmend û pî û pişt şikestî û nexweş û lawaz û me’yûb negire. Ji rêkirina wê ra jî, ewê bispêre kesekî ku tu bi dîndarî ya wî bawer bî, da ku ewê bighênê welî yê emrê muslimana û ew jî ewê di nav wan da teqsîm bikê (lêkvekê). Ji xwey kirinê ra jî ewê nespêre kesî, xêncî mirovek xêrxwaz û dilovan û emîn ku baş xwe lê bikê xwey; kesek ku neheqîyê li wan heywana nekê û ewa lez neajû û newestênê. Di pey da jî heçî ya berhev bûyî, zûka rêke bal me, da em jî di wî cihî da deynîn ku Xwedê emr dayî.

Vêca dema emîndarê te ew heywan girtin, jê bixwaze ku li rêkê da, daykê ji gûlka wê ya şîrxwer cida nekê û ewqas ewê nedûşê ku zerer bighê gûlka wê û pê suwarîya li wan ewa nedê zehmetê û

ثُمَّ امْضِ إِلَيْهِمْ بِالسَّكِينَةِ وَالْوَقَارِ، حَتَّى تَقُومَ بَيْنَهُمْ فَتُسَلِّمَ عَلَيْهِمْ، وَلاَ تُخْدِجْ بِالتَّحِيَّةِ لَهُمْ، ثُمَّ تَقُولَ:

عِبَادَ اللهِ، أَرْسَلَنِي إِلَيْكُمْ وَلِيُّ اللهِ وَخَلِيفَتُهُ، لِاخُذَ مِنْكُمْ حَقَّ اللهِ فِي أَمْوَالِكُمْ، فَهَلْ لِلَّهِ فِي أَمْوَالِكُمْ مِنْ حَقّ فَتُؤَدُّوهُ إِلَى وَلِيِّهِ؟ فَإِنْ قَالَ قَائِلٌ: لاَ، فَلاَ تُرَاجِعْهُ، وَإِنْ أَنْعَمَ لَكَ مُنْعِمٌ فَانْطَلِقْ مَعَهُ مِنْ غَيْرِ أَنْ تُخِيفَهُ أَوْ تُوعِدَهُ أَوْ تَعْسِفَهُ أَوْ تُرْهِقَهُ، فَخُذْ مَا أَعْطَاكَ مِنْ ذَهَبٍ أَوْ فِضَّةٍ، فَإِنْ كَانَتْ لَهُ مَاشِيَةٌ أَوْ إِبِلٌ فَلاَ تَدْخُلْهَا إِلاَّ بِإِذْنِهِ، فَإِنَّ أَكْثَرَهَا لَهُ، فَإِذَا أَتَيْتَهَا فَلاَ تَدْخُلْهَا دُخُولَ مُتَسَلِّطٍ عَلَيْهِ وَلاَ عَنِيفٍ بِهِ، وَلاَ تُنَفِّرَنَّ بَهِيمَةً وَلاَ تُفْزِعَنَّهَا،وَلاَ تَسُوءَنَّ صَاحِبَهَا فِيهَا، وَاصْدَعِ الْمَالَ صَدْعَيْنِ، ثُمَّ خَيِّرْهُ، فَإِذَا اخْتَارَ فَلاَ تَعْرِضَنَّ لِمَا اخْتَارَهُ، ثُمَّ اصْدَعِ الْبَاقِيَ صَدْعَيْنِ، ثُمَّ خَيِّرْهُ، فَإِذَا اخْتَارَ فَلاَ تَعْرِضَنَّ لِمَا اخْتَارَ، فَلاَ تَزَالُ بِذلِكَ حَتَّى يَبْقَى مَا فِيهِ وَفَاءٌ لِحَقِّ اللهِ فِي مَالِهِ، فَاقْبِضْ حَقَّ اللهِ مِنْهُ.

فَإِنِ اسْتَقَالَكَ فَأَقِلْهُ، ثُمَّ

‘edaletê pêk bênê derheq wê deva, lê suwar dibê an didûşê û devên dîtir da, bila we bikê ku deva westayî bikevê rihetîyê û bêhna xwe vedê û biborênê digel wê deva pîyê wê kol bûyî û nikarê rêve biçê; bila ewa bibê ser avan û ewa av bidê û bila di wan rêka ra bibê ku çêrîngeh li dûra wê hebin, ne di rêkên hişk û bê gîya da; bila car car muhleta bêhn vedanê bidê wan û bihêlê bixwun û vexwun. Heta ku bi izna Xwedê ewa bighênê me, di halekî da ku ew qelew û qewî bin, ne westayî û lawaz bin, em jî ewa gûrekî kitêba Xwedê û sunneta Pêğemberê Wî teqsîm bikin û lêkve kin.

Ev yêk dibê sebebê mezin bûna xêra te û te ji rêka xilasîyê ra nêzîktir dikê, **Inşallah**.

اخْلِطْهُمَا، ثُمَّ اصْنَعْ مِثْلَ الَّذِي صَنَعْتَ أَوَّلاً حَتَّى تَأْخُذَ حَقَّ اللهِ فِي مَالِهِ.

وَلاَ تَأْخُذَنَّ عَوْداً، وَلاَ هَرِمَةً، وَلاَ مَكْسُورَةً، وَلاَ مَهْلُوسَةً، وَلاَ ذَاتَ عَوَارٍ. وَلاَ تَأْمَنَنَّ عَلَيْهَا إِلاَّ مَنْ تَثِقُ بِدِينِهِ، رَافِقاً بِمَالِ الْمُسْلِمِينَ حَتَّى يُوصِلَهُ إِلَى وَلِيِّهِمْ فَيَقْسِمَهُ بَيْنَهُمْ. وَلاَ تُوَكِّلْ بِهَا إِلاَّ نَاصِحاً شَفِيقاً، وَأَمِيناً حَفِيظاً، غَيْرَ مُعَنِّفٍ وَلاَ مُجْحِفٍ، وَلاَ مُلْغِبٍ وَلاَ مُتْعِبٍ. ثُمَّ احْدُرْ إِلَيْنَا مَا اجْتَمَعَ عِنْدَكَ، نُصَيِّرْهُ حَيْثُ أَمَرَ اللهُ بِهِ.

فَإِذَا أَخَذَهَا أَمِينُكَ فَأَوْعِزْ إِلَيْهِ: أَلاَّ يَحُولَ بَيْنَ نَاقَةٍ وَبَيْنَ فَصِيلِهَا، وَلاَ يَمْصُرَ لَبَنَهَا فَيَضُرَّ ذَلِكَ بِوَلَدِهَا، وَلاَ يَجْهَدَنَّهَا رُكُوباً، وَلْيَعْدِلْ بَيْنَ صَوَاحِبَاتِهَا فِي ذَلِكَ وَبَيْنَهَا، وَلْيُرَفِّهْ عَلَى اللاَّغِبِ، وَلْيَسْتَأْنِ بِالنَّقِبِ وَالظَّالِعِ، وَلْيُوِرِدْهَا مَا تَمُرُّ بِهِ مِنَ الْغُدُرِ،

۞ NIVÎSOKA 26 ۞

Eva he ji kar bi destek yê xwe ra nivîsîye, dema ew ji girtina zekatê ra rêkirî:

Ez emrê wî dikim bi teqwatî ya Xwedê, çi li karên veşartî da û çi jî li wextê ‘emelê wî yê xef da ku nixumandîye li ber çavan û xêncî Xwedê çi şahid û wekîl li ser nîn in; ez emrê wî dikim ku newebê ew li eşkereyê da gohdarê Xwedê bê û bi xef, bervajîyê wê. Çiko kesê xef û eşkereyê

wî û kiryar û gotinên wî yêk bin, ewî emanetê Xwedê eda kirîye û ‘ibadetê wî xalisane bi cî anîye.

Ez emrê wî dikim ku xelkê neêşênê û boxtana li wan nekê (derewker nehesibêne) û ji ber vê yêkê ku seratî ya hukumdarîyê heye berê xwe ji wan nezivirênê, çiko ew birayên dînî yên wî ne û arîkar in ji girtin û pêk anîna huqûqan ra.

Te li vê sedeqê da behrek sabit û heqek kifş heye û, belengaz û nedar û jar û feqîr jî şirîkê te ne. Ez heqê te bi temamî didim te, tu jî bi temamî heqê wan bide wan. Eger tu we nekî roja qîyametê wê de’wekarên li ser te ji hemîyan pitir bin û çi pîs hal e, halê kesê ku de’wekarên wî li beraberê ‘edaleta ilahî da, feqîr û jar û xwazûk û dûrî kirî û deyndar û rêwingî yên di rê da mayî bin.

Kesê biha û qîmet nedê emanet û ji çêrîngeha xîyanetê biçêrê û rih û dînê xwe ji xîyanetê pak nekir bê, ewî li dinyayê da xwe êxistîye nav hetk birin û zelîlîyê da û ew li axretê da hêj zelîltir û bê abirûtir e jî.

Bi rastî, mezintirîn xîyanet, xîyanet kirina li ummetê ye û hetk çûna mezin ew e ku digel serok û pêşkaran dexelkarî bê kirin û ew bên xapandin.

وَلاَ يَعْدِلْ بِهَا عَـنْ نَبْـتِ الأَرْضِ إِلَى جَوَادِّ الطُّرُقِ، وَلْيُرَوِّحْهَا فِـي السَّاعَاتِ، وَلْـيُمْهِلْهَا عِنْدَ النِّطَافِ وَالأَعْشَابِ، حَتَّى تَأْتِيَنَا بِـإِذْنِ اللهِ بُدَّناً مُنْقِيَـات، غَيْـرَ مُتْعَبَـات وَلاَ مَجْهُودَات، لِنَقْسِمَهَا عَلَى كِتَـابِ اللهِ وَسُنَّةِ نَبِيِّهِ(عليه السـلام) فَـإِنَّ ذلِـكَ أَعْظَـمُ لِاَجْـرِكَ، وَأَقْـرَبُ لِرُشْدِكَ، إِنْ شَاءَ اللهُ.

[26]

ومن عهد له عليه السلام إلى بعض عمّاله، وقد بعثه على الصدقة

آمَـرَهُ بِتَقْـوَى اللهِ فِـي سَـرَائِرِ أُمُورِهِ وَخَفِيَّاتِ أَعْمَالِـهِ، حَيْـثُ لاَ شَهِيدَ غَيْرُهُ، وَلاَ وَكِيلَ دُونَهُ. وَآمَرَهُ أَلاَّ يَعْمَلَ بَشَيْءٍ مِنْ طَاعَةِ اللهِ فِيمـا ظَهَرَ فَيُخَالِفَ إِلَى غَيْرِهِ فِيَما أَسَـرَّ، وَمَنْ لَـمْ يَخْتَلِـفْ سِـرُّهُ عَلاَنِيَتُـهُ، وَفِعْلُهُ وَمَقَالَتُهُ، فَقَـدْ أَدّى الأَمَانَـةَ، وَأَخْلَصَ الْعِبَادَةَ.

وَآمَـــرَهُ أَلاَّ يَجْـــبَهَهُمْ، وَلاَ يَعْضَهَهُمْ، وَلاَ يَرْغَبَ عَنْهُمْ تَفَضُّـلاً

Êdî di nav xweşî û selametîyê da bî.

بِالأَمَارَةِ عَلَيْهِمْ، فَإِنَّهُمُ الأُخْوَانُ فِي الدِّينِ، وَالأَعْوَانُ عَلَى اسْتِخْرَاجِ الْحُقُوقِ.

۞ NIVÎSOKA 27 ۞

Dema Muhammedê korê Ebûbekr kirî fermanderê Misrê, eva he jê re nivîsîye:

وَإِنَّ لَكَ فِي هذِهِ الصَّدَقَةِ نَصِيباً مَفْرُوضاً، وَحَقّاً مَعْلُوماً، وَشُرَكَاءَ أَهْلَ مَسْكَنَة، وَضَعَفَاءَ ذَوِي فَاقَة،إِنَّا مُوَفُّوكَ حَقَّكَ، فَوَفِّهِمْ حُقُوقَهُمْ، وَإِلاَّ تَفْعَلْ فَإِنَّكَ مِنْ أَكْثَرِ النَّاسِ خُصُوماً يَوْمَ الْقِيَامَةِ، وَبُؤْساً لِمَنْ خَصْمُهُ عِنْدَ اللهِ الْفُقَرَاءُ وَالْمَسَاكِينُ وَالسَّائِلُونَ وَ الْمَدْفُوعُونَ وَالْغَارِمُ وَابْنُ السَّبِيلِ!

Çengê (perê) xwe ji xelkê ra deyne, digel wan xweş exlaq û rûvekirî be, li nêrîn û berê xwe danê da bila hemî ji te ra wek hev bin, da yên mezin timahîyê li te da nekin ku tu ji wan ra zulmê bikî û ze'êf jî ji 'edaleta te derheq xwe da bê hêvî nebin. Rastî ev e ku wê Xwedê derheq 'emelên biçûk û mezin û eşkere û xef yên hewe koma bendeyên xwe bipirsê, vêca eger 'ezab bidê, ew ji ber zulm kirina hewe ye û eger 'efû jî bikê ew xudan kerem e…

وَمَنِ اسْتَهَانَ بِالأَمَانَةِ، وَرَتَعَ فِي الْخِيَانَةِ، وَلَمْ يُنَزِّهْ نَفْسَهُ وَدِينَهُ عَنْهَا، فَقَدْ أَحَلَّ بِنَفْسِهِ فِي الدُّنْيَا الْخِزْيَ، وَهُوَ فِي الأخِرَةِ أَذَلُّ وَأَخْزَى.

Evê jî bizanin, ey bendeyên Xwedê, bi rastî ehlê teqwatîyê hem di vê dinya zû derbaz dibê da li ser feydê ne û hem jî li alema hêj bê ya axretê da, ew li karê dinyayê da digel xelkê dinyayê şirîk bûne û xelkê dinyayê nebûne şirîkê wan li karê axretê da. Li dinyayê da bi baştirîn şiklê jîyanê, jîyan kirin û ji baştirîn xwarinên dinyayê xwarin, ji dinyayê istifade kirin wek çawa ewên di nav ni'metan da nûqî bûyîn istifade kirîn, û ji wê girtin wek wê ya zûrgû yên mutekebbir ji wê hilanîyîn, paşê jî ewa ji wê bar kir (çûn alema dî) digel zad û qûtekî ku ewa bighênê mexsedê û

وَإِنَّ أَعْظَمَ الْخِيَانَةِ خِيَانَةُ الأُمَّةِ، وَأَفْظَعَ الْغِشِّ غِشُّ الأَئِمَّةِ، وَالسَّلاَم.

[27]

ومن عهد له إلى محمد بن أبي بكر حين قلّده مصر

ticaretek pir sûd kirin, ewa lezzeta zuhdê li dinyayê da tam kirin û gihan yeqînê ku li axretê da li bal Xwedê ne, eger di'a bikin Xuda di'a wan paşve nazivirênê û behra wan ji xweşî û rihetîyê bê kêmasî ye.

Ey bendeyên Xwedê, ji mirinê û nêzîkî ya wê bitirsin û hay ji xwe hebin, û xwe jê re pêk bînin û hazir bikin, çiko mirin, karek mezin û qewmînek girîng gel xwe tênê, heçî ya mirin tênê, an hemî xêr e û xirabî digel wê tinehin û an jî hemî xirabî ye ku nîşanek ji xêrê digel wê tinehin.

Kî ji bihiştê ra nêzîktir e ji wî kesê ji bihiştê ra dixebitê? Û kî ji cehnemê ra nêzîktir e ji wî kesê ji cehnemê ra dişixulê? Hûn ber mirinê ve hatine avêtin (mirin li pey hewe ye) eger hûn bisekinin, wê hewe bigirê û eger hûn bazdin jî (birevin û bihelên) wê dîsa bighê hewe, ew ji sîbera hewe nêzîktirê hewe ye. Mirin bi ceynika hewe ve hatîye girêdan û dinya paş hewe ve tê pêçan, vêca bitirsin ji wî agirê ku binê wê kûr e û germî ya wê pir dijwar e û 'ezabê wê hema her nû dibê; ew maleke ku di wê da qe piçek dilovanî nîne û kes gohê xwe nadê gazî ya kesî û xilasî ya ji mereqan li wê derê tinehin.

Eger hewe karî hûn di navbeyna pir tirsana ji Xwedê da û gumana qenc bi wî kom bûnekî çêkîn, ewê bikin, çiko gereke gumana qenc ya bende ji Xwedayê xwe

فَاخْفِضْ لَهُمْ جَنَاحَكَ، وَأَلِنْ لَهُمْ جَانِبَكَ، وَابْسُطْ لَهُمْ وَجْهَكَ، وَآسِ بَيْنَهُمْ فِي اللَّحْظَةِ وَالنَّظْرَةِ، حَتَّى لاَ يَطْمَعَ الْعُظَمَاءُ فِي حَيْفِكَ لَهُمْ، وَلاَ يَيْأَسَ الضُّعَفَاءُ مِنْ عَدْلِكَ عَلَيْهِمْ. وَإِنَّ اللهَ تَعَالَى يُسَائِلُكُمْ مَعْشَرَ عِبَادِهِ عَنِ الصَّغِيرَةِ مِنْ أَعْمَالِكُمْ وَالْكَبِيرَةِ، وَالظَّاهِرَةِ وَالْمَسْتُورَةِ، فَإِنْ يُعَذِّبْ فَأَنْتُمْ أَظْلَمُ، وَإِنْ يَعْفُ فَهُوَ أَكْرَمُ.

وَاعْلَمُوا عِبَادَ اللهِ، أَنَّ الْمُتَّقِينَ ذَهَبُوا بِعَاجِلِ الدُّنْيَا وَآجِلِ الأخِرَةِ، فَشَارَكُوا أَهْلَ الدُّنْيَا فِي دُنْيَاهُمْ، وَلَمْ يُشَارِكُهم أَهْلُ الدُّنْيَا فِي آخِرَتِهِمْ; سَكَنُوا الدُّنْيَا بِأَفْضَلِ مَا سُكِنَتْ، وَأَكَلُوهَا بِأَفْضَلِ مَا أُكِلَتْ، فَحَظُوا مِنَ الدُّنْيَا بِمَا حَظِيَ بِهِ الْمُتْرَفُونَ وَأَخَذُوا مِنْهَا مَا أَخَذَهُ الْجَبَابِرَةُ الْمُتَكَبِّرُونَ، ثُمَّ انْقَلَبُوا عَنْهَا بِالزَّادِ الْمُبَلِّغِ، وَالْمَتْجَرِ الرَّابِحِ، أَصَابُوا لَذَّةَ زُهْدِ الدُّنْيَا فِي دُنْيَاهُمْ، وَتَيَقَّنُوا أَنَّهُمْ جِيرَانُ اللهِ غَداً فِي آخِرَتِهِمْ، لاَ تُرَدُّ لَهُمْ دَعْوَةٌ، وَلاَ يَنْقُصُ لَهُمْ نَصِيبٌ مِنْ لَذَّة.

qas tirsa wî bê ji Xudayê wî. Di nav Xelkê da wa kesa derheq Xwedê da gumana wan ya qenc pitir e ewên tirsa wan ji wî pitir.

Bizane, Muhemmedê korê Ebûbekr, min tu kirî walî li ser mezintirîn ‘eskerê xwe; yanî xelkê Misrê, vêca tu mecbûrî ku muxalifet bikî digel nefsa xwe û berevanîyê ji dînê xwe bikî, heta eger yêk bêhn tinê ji ‘emrê te di vê dinyayê da ma bê; tu pê razî kirina çi yêk ji mexlûqê Xwedê, Xwedayê xwe nerazî neke, çiko razî bûna Xwedê cihê her tiştî digirê, lê tiştek cîyê razî bûna Xwedê nagirê.

Nimêjê di wextê jê re hatî deynan da bike ji ber ku tu vale mayî, nimêjê pêş wextê wê neêxe û ji ber mijûl bûna bi karên dî ve jî nimêjê paş neêxe, evê jî bizane ku hemî karên te bi nimêjê ve girêdayî ne (eger qebûl bibê ‘emelên dî jî qebûl dibin).

... Muheqeq neberaber û himber e Imamê hidayet dikê û yê li rê winda dikê; û dostê pêğember û dijminê pêğember.

Resûlê Xwedê jî selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin kerem kirîye: “Ez ji mu’min û muşrikê ummeta xwe natirsim, çiko Xwedê mirovê mu’min pê îmana wî radigirê û yê muşrik jî ji ber şirka wî ji nav dibê. Lê belê ez pir ditirsim ji wî yê di dil da minafiq û bi ziman zana; ku ewa

فَاحْـذَرُوا عِبَـادَ الله الْمَـوْتَ وَقُرْبَهُ، وَأَعِدُّوا لَهُ عُدَّتَهُ، فَإِنَّهُ يَأْتِي بِأَمْرٍ عَظِيم، وَخَطْب جَلِيل، بِخَيْر لاَ يَكُونُ مَعَـهُ شَـرٌّ أَبَـداً، أَوْ شَـرٍّ لاَ يَكُونُ مَعَهُ خَيْرٌ أَبداً.

فَمَنْ أَقْـرَبُ إِلَـى الْجَنَّـةِ مِـنْ عَامِلِهَا! وَمَنْ أَقْرَبُ إِلى النَّـارِ مِـنْ عَامِلِهَا! وَأَنْتُمْ طُـرَدَاءُ الْمَـوْتِ، إِنْ أَقَمْتُمْ لَهُ أَخَذَكُمْ، وَإِنْ فَرَرْتُمْ مِنْـهُ أَدْرَككُمْ، وَهُوَ أَلْزَمُ لَكُمْ مِنْ ظِلِّكُمْ، الْمَوْتُ مَعْقُودٌ بِنَوَاصِيكُمْ، وَالـدُّنْيَا تُطْوَى مِنْ خَلْفِكُمْ. فَاحْـذَرُوا نَـاراً قَعْرُهَـا بَعِيـدٌ، وَحَرُّهَـا شَـدِيدٌ، وَعَـذَابُهَا جَدِيـدٌ، دَارٌ لَـيْسَ فِيهـا رَحْمَةٌ، وَلاَ تُسْمَعُ فِيهَا دَعْـوَةٌ، وَلاَ تُفَرَّجُ فِيهَا كُرْبَةٌ.

وَإِنِ اسْتَطَعْتُمْ أَنْ يَشْتَدَّ خَوْفُكُمْ مِـنَ الله، وَأَنْ يَحْسُـنَ ظَـنُّكُمْ بِـهِ، فَاجْمَعُوا بَيْنَهُمَا، فَـإِنَّ الْعَبْـدَ إِنَّمَـا يَكُونُ حُسْنُ ظَنِّهِ بِرَبِّهِ عَلَـى عَلَـى قَدْرِ خَوْفِهِ مِنْ رَبِّـهِ، وَإِنَّ أَحْسَـنَ النَّاسِ ظَنّاً بِالله أَشَدُّهُمْ خَوْفاً لله.

وَاعْلَمْ يَا مُحَمَّدُ بْنَ أَبِـي بَكْـر أَنِّي قَدْ وَلَّيْتُكَ أَعْظَمَ أَجْنَادِي فِـي

hûn jê hez dikin, ewê dibêjê û ya hûn jê hez nakin (jê dikirhînin) jî (pêk tênê) û dikê".

۞ NIVÎSOKA 28 ۞

Cewaba Mu'awîye ye û yêk ji baştirîn namên wî ye, selamên Xwedê lê bin.

... Nivîsoka te gehişt min, te di wê da nivîsî bû ku: Xwedê, Muhemmed (s) ji bona dînê xwe bijart û pê wa sehabên ku hêz û qudret dayî wan, arîkarî ya wî kir; vêca 'eceb! Zeman tiştek ji me veşartî hişt bû û te eşkere kir! Tu dixwazî ji bona me behsa wê ni'metê bikî ku Xwedê daye me û Pêğemberê xwe ji nav me bi xwe rêkirîye? Li vê meselê da tu wek wî kesî yî ku xurma dibê "**Hecer**"ê; [124] an wek wî kesê seydayê xwe yê ew hînê tîr avêtinê kirî, ji nîşan girtin û jêbirkanê ra gazî bikê.

Te guman kirîye ku seratirîn kes li Islamê da filan kes û filan kes in, vêca bi vê yêkê te tiştek gotîye ku eger tam rast bê, qe ji te ra nabê mal û tu jê der î û, eger nedurist bê jî, qe kêmasîyê di te da çênakê. Çi karê te bi yê seratir û binratir ketîye? Û te ji xwe li rêve ber û li pey çûa ye? Aza bûyî û zarokên aza bûyan [125] li kû, û ji hev cida kirina muhacirên pêşîn li ku! Kengê dûr gihaye wan ku tertîb û rêzekî bidin derece û meqam û merteba wan? Heyhat, deng ji wê tîrê hat ewa ne ji cinsê tîrên dî [126] û bîr û hizra xwe derheq

نَفْسِي أَهْلَ مِصْرَ، فَأَنْتَ مَحْقُوقٌ أَنْ تُخَالِفَ عَلَى نَفْسِكَ، وَأَنْ تُنَافِحَ عَنْ دِينِكَ، وَلَوْ لَمْ يَكُنْ لَكَ إِلاَّ سَاعَةٌ مِنَ الدَّهْرِ، وَلاَ تُسْخِطِ اللهَ بِرِضَى أَحَدٍ مِنْخَلْقِهِ، فَإِنَّ فِي اللهِ خَلَفاً مِنْ غَيْرِهِ، وَلَيْسَ مِنَ اللهِ خَلَفٌ فِي غَيْرِهِ.

صَلِّ الصَّلاَةَ لِوَقْتِهَا الْمُوَقَّتِ لَهَا، وَلاَ تُعَجِّلْ وَقْتَهَا لِفَرَاغٍ، وَلاَ تُؤَخِّرْهَا عَنْ وَقْتِهَا لاشْتِغَالٍ، وَاعْلَمْ أَنَّ كُلَّ شَيْءٍ مِنْ عَمَلِكَ تَبَعٌ لِصَلاَتِكَ.

ومن هذا العهد: فَإِنَّهُ لاَ سَوَاءَ، إِمَامُ الْهُدَى وَإِمَامُ الرَّدَى، وَوَلِيُّ النَّبِيِّ وَعَدُوُّ النَّبِيِّ، وَلَقَدْ قَالَ لِي رَسُولُ اللهِ صلى الله عليه وآله: "إِنِّي لاَ أَخَافُ عَلَى أُمَّتِي مُؤْمِناً وَلاَ مُشْرِكاً، أَمَّا الْمُؤْمِنُ فَيَمْنَعُهُ اللهُ بِإِيمَانِهِ، وَأَمَّا الْمُشْرِكُ فَيَقْمَعُهُ اللهُ بِشِرْكِهِ،لكِنِّي أَخَافُ عَلَيْكُمْ كُلَّ مَنَافِقِ الْجَنَانِ، عَالِمِ اللِّسَانِ، يَقُولُ مَا تَعْرِفُونَ، وَيَفْعَلُ مَا تُنْكِرُونَ".

[28]

إلى معاوية جواباً وهو من

wê tiştê da beyan kir û got, ewa bi zerera wî (kesekî ĥukum da ku ew bi xwe meĥkûm).

Ey insan! Ma tu li hedê xwe nasekinî? Çire tu qam û qeyda xwe nizanî û bi kêmasî ya xwe nahesî? Tu çima li rutba xwe ya paşketî da ku ji te ra hatîye danîn, ranawestî! Ji te ra çi, ku (pêşîyê da) kî bin dest bûye û kî serketîye! Halhale tu bi xwe zehf ji rê derketî û te pir ji duristîyê berê xwe zivirandîye.

Ez naxwazim ji tera bêjim û te jê agah bikim, belkî min divê ez ji wê ni'meta Xwedê li me kirî biaxivim; ma tu nabînî ku komek ji muhacir û ensaran di rêka Xwedê da şehîd bûn û her yêkî seratîyek hebû, lê dema şehadet bû nesîbê şehîdê me (Hemzeyê korê 'Ebdulmutellib) jê re hat gotin "Seyyidu-ş Şuheda - mezin û serwerê şehîdan" û Pêğemberê Xwedê selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin li ser wî nimêj kir û mexsûsê wî bû ku heftê tekbîr anîn?

An tu nabînî ku destê hinek ji wan qencan di rêka Xwedê da dihatan qet kirin, lê dema destê yêk ji me wek destê yêk ji wan hat jê kirin, navê: **Teyar fîlcenne** - firnde yê bihiştî û **Zulcenaheyn** - xweyê dû peran danîn ser. Eger Xwedê nehy nekir bûya ji wê çendê ku kesek pesnê xwe bidê (medhê xwe bikê) wê kesekî ji te ra behsa wan

محاسن الكتب.

أَمَّا بَعْدُ، فَقَدْ أَتَانِي كِتَابُكَ تَذْكُرُ [فِيهِ] اصْطِفَاءَ اللهِ تعالى مُحَمَّداً صلى الله عليه وآله **لِدِينِهِ، وَتَأْيِيدَهُ إِيَّاهُ بِمَنْ أَيَّدَهُ مِنْ أَصْحَابِهِ، فَلَقَدْ خَبَّأَ لَنَا الدَّهْرُ مِنْكَ عَجَباً، إِذْ طَفِقْتَ تُخْبِرُنَا بِبَلاَءِ اللهِ عِنْدَنَا، وَنَعْمَتِهِ عَلَيْنَا فِي نَبِيِّنَا، فَكُنْتَ فِي ذلكِ كَنَاقِلِ التَّمْرِ إِلَى هَجَرَ، أَوْ دَاعِي مُسَدِّدِهِ إِلَى النِّضَالِ.**

وَزَعَمْتَ أَنَّ أَفْضَلَ النَّاسِ فِي الأِسْلاَمِ فُلاَنٌ وَفُلاَنٌ، فَذَكَرْتَ أَمْراً إِنْ تَمَّ اعْتَزَلَكَ كُلُّهُ، وَإِنْ نَقَصَ لَمْ يَلْحَقْكَ ثَلْمُهُ، وَمَا أَنْتَ وَالْفَاضِلَ وَالْمَفْضُولَ، وَالسَّائِسَ وَالْمَسُوسَ! وَمَا لِلطُّلَقَاءِ وَأَبْنَاءِ الطُّلَقَاءِ، وَالتَّمْيِيزَ بَيْنَ الْمُهَاجِرِينَ الأَوَّلِينَ، وَتَرْتِيبَ دَرَجَاتِهِمْ، وَتَعْرِيفَ طَبَقَاتِهِمْ! هَيْهَاتَ لَقَدْ حَنَّ قِدْحٌ لَيْسَ مِنْهَا، وَطَفِقَ يَحْكُمُ فِيهَا مَنْ عَلَيْهِ الْحُكْمُ لَهَا!

أَلاَ تَرْبَعُ أَيُّهَا الأِنْسَانُ عَلَى ظَلْعِكَ، وَتَعْرِفُ قُصُورَ ذَرْعِكَ،

qencî û seratîyan bikira ku dilê mu'minan digel wan nasyarin û gohê gohlêderan jî xwe ji bihîstina wan paşve nedida. Vêca dev berde ji vê nêçîrê ku tîra te xwehr çû; [127] em perwerdeyê Xuda ne û xelkên dî li ber destê me terbîyet û perwerde bûne.

Eger em tevlî (binemala) hewe bûn û me wek wa kesên beraber û wek hev ji hewe jin anîn û jin dan hewe, di 'izzet û şerefa me ya ji kevin da heyî kêmasîyek çênebû, halhale hûn ne di merteba me da bûn û digel me ne beraber bûn; çawa çêdibê ku hûn beraber bin digel me, halhale Pêğember ji me ye û inkar ker (Ebû Cehl) ji hewe ye û şêrê Xwedê (Hemze) ji me ye û şêrê sond û bend girêdanê (Ebû Sufyan an 'Utbeyê korê Rebî'e) ji hewe ye û dû seyid û serwerên ciwanên ehlê bihiştê (Hesen û Huseyn) ji me ne û zarokên cehnemê (zarokên ibn Mu'eyt) ji hewe ne û baştirîn jina alemê ji me ye û "Hemmalatel heteb" [128] ji hewe ye û gelek seratî yên dîtir jî ji me ra hene ku li dij û zîyana hewe da ne.

Vêca herkesî islametî ya me gohlê bûye û merteba me jî li 'esrê cahilîyetê da nayê inkar kirin, kitêba Xwedê jî ew ji me re berhev kirîye, ya ji me tinê ra heyî (nêzîkî ya Pêğember) ew jî ev gotina Xudê ye ku kerem dikê: ***"Bi hukmê kitêba Xwedê mirovên hev ji bona hev***

وَتَتَأَخَّرُ حَيْثُ أَخَّرَكَ الْقَدَرُ! فَمَا عَلَيْكَ غَلَبَةُ الْمَغْلُوبِ، وَلاَ لَكَ ظَفَرُ الظَّافِرِ! وَإِنَّكَ لَذَهَّابٌ فِي التِّيهِ، رَوَّاغٌ عَنِ الْقَصْدِ.

أَلاَ تَرَى ـ غَيْرَ مُخْبِرٍ لَكَ، لكِنْ بِنِعْمَةِ اللهِ أُحَدِّثُ ـ أَنَّ قَوْماً اسْتُشْهِدُوا فِي سَبِيلِ اللهِ مِنَ الْمُهاجِرِينَ،لِكُلٍّ فَضْلٌ، حَتَّى إِذَا اسْتُشْهِدَ شَهِيدُنَا قِيلَ: سَيِّدُ الشُّهَدَاءِ، وَخَصَّهُ رَسُولُ اللهِ صلى الله عليه وآله بِسَبْعِينَ تَكْبِيرَةً عِنْدَ صَلاَتِهِ عَلَيْهِ!

أَوَلاَ تَرَى أَنَّ قَوْماً قُطِّعَتْ أَيْدِيهِمْ فِي سَبِيلِ اللهِ ـ وَلِكُلّ فَضْلٌ ـ حَتَّى إِذَا فُعِلَ بِوَاحِدِنَا كَمَا فُعِلَ بِوَاحِدِهِمْ، قِيلَ: الطَّيَّارُ فِي الْجَنَّةِ وَذُوالْجَنَاحَيْنِ! وَلَوْ لاَ مَا نَهَى اللهُ عَنْهُ مِنْ تَزْكِيَةِ الْمَرْءِ نَفْسَهُ، لَذَكَرَ ذَاكِرٌ فَضَائِلَ جَمَّةً، تَعْرِفُهَا قُلُوبُ الْمُؤْمِنِينَ، وَلاَ تَمُجُّهَا آذَانُ السَّامِعِينَ. فَدَعْ عَنْكَ

musteheqtir in û nêzîktirê yêk in” [129] û ew gotina Wî: ***“Nêzîktirîn kes ji Ibrahîm ra hema peyrewên wî ne û ev Pêğember e û ew in yên îman anîyîn, û Xwedê welî û xweyê mu’mina ye”****(Alê ‘Imran/68)* Vêca carekî em musteheqtir în (ji cîgirî ya Pêğember (s) ra) ji ber mirovanî ya wî û carekî jî ji ber gohdar bûna ji wî ra û pey ketina ji wî.

Dema li roja Seqîfê da muhaciran ji ensara ra delîl anîn ku em ji nêzîkên Pêğemberê Xuda ne (s) ser hemîyan ketin. Vêca eger nêzîk bûn û eqrebatî ya digel Pêğember (s) delîla serketinê ye, nixwe ev heqê me ye, ne yê hewe û eger xêncî vê bê nixwe ensar li ser de’wa xwe berdewam in.

Te guman kirîye ku min bi hemî xelîfan hesed birîye û ez li dijê hemîyan da rabûme, eger wereng bê ku tu dibêjî, vêca cinayetek li ser te pêk nehatîye ku ‘ozr ji te bê xwestin. *(vêca ev helbest xwend ku)* Û ew kêmasîyeke ku şerma wê bi te ve nagirhê.”

Û te gotîye ku ez wek wê deva dar li pûz rakirî, rakêşame, heta ez bey’et bikim. Sond bi Xwedê, te xwest tu xirabî ya min bêjî, lê te pesin dan; te xwest tu hetka min bibî lê te hetka xwe

مَنْ مَالَتْ به الرَّمِيَّةُ، فَإِنَّـا صَـنَائِعُ رَبِّنَا، وَالنَّاسُ بَعْدُ صَنَائِعُ لَنَا.

لَمْ يَمْنَعْنَـا قَـدِيمُ عِزِّنَـا وَلاَ عَادِيُّ طَوْلِنَـا عَلَـى قَوْمِـكَ أَنْ خَلَطْنَـاكُمْ بَأَنْفُسِـنَا، فَنَكَحْنَـا وَأَنْكَحْنا، فِعْلَ الأَكْفَـاءِ، وَلَسْـتُمْ هُنَاكَ! وَأَنَّى يَكُونُ ذلِكَ كَـذَلِكَ وَمِنَّا النَّبِيُّ وَمِنْكُمُ الْمُكَذِّبُ، وَمِنَّا أَسَدُ الله وَمِنْكُمْ أَسَدُ الأَحْـلاَفِ، وَمِنَّا سَيِّدَا شَـبَابِ أَهْـلِ الْجَنَّـةِ وَمِنْكُمْ صِبْيَةُ النَّـارِ، وَمِنَّـا خَيْـرُ نِسَاءِ الْعَـالَمِينِ وَمِـنْكُمْ حَمَّالَـةُ الْحَطَـبِ، فِـي كَثِيـرٍ مِمَّـا لَنَـا وَعَلَيْكُمْ!

فَإِسْـلاَمُنَا مَـا قَـدْ سُـمِعَ، وَجَاهِلِيَّتُنَا لاَ تُدْفَعُ، وَكِتَـابُ الله يَجْمَعُ لَنَا مَا شَذَّ عَنَّا، وَهُوَ قَوْلُـهُ سُبْحَانَهُ: (وَأُولُو الأَرْحَامِ بَعْضُهُمْ أَوْلَى بِبَعْضٍ فِي كِتَابِ الله)،

وَقَوْلُهُ تَعَالَى: (إِنَّ أَوْلَـى النَّـاسِ بِـإِبْرَاهِيمَ لَلَّـذِينَ اتَّبَعُـوهُ وَهَـذَا

bir. Heta ku musliman di dînê xwe da neketbê şikê û di yeqîna xwe da dudilî jê re çênebûbê, mezlûm bûn, jê re ne kêmasî ye; berê vê delîla min anîyî, ne li te ye, lê belê ewa lazim û hatî bîra min, min ber te ve jî avêt.

Paşê jî te behsa mesela min û ‘Osman kirîye, vêca çiko tu mirovê wî yî, heq e ku derheq vê da cewaba te bê dayîn. Vêca hema tu bêje kanê kîjanî ji me (herdûka) pitir dijminî ya wî kir û berê wî da kuştingeha wî? Gelo ewê xwestî arîkarî ya wî bikê, vêca wî bi xwe jê xwestî rûnê û xwe têkel nekê? An ewê wî (‘Osman) arîkarî jê xwestî lê belê ewî arîkarî dereng êxistî û sebebê ji nav birina wî hazir kirî, heta ew ser nivîsa wî serda hatî? Ne, ez bi Xwedê kim, ***“muheqeq Xwedê ewa kesan ji hewe nas dikê û pê dizanê ewên ku xelkê (ji şer) paşda didin û dibêjin biraderên xwe: Bi alîyê me ve werin, û xêncî kêmeka, nayên şer”.*** [130]

Niha ji ber wê çendê ku min ji ber bid’eyên wî tab û lome lê dikiran, ez ‘ozrê xwe naxwazim, eger eva he ku min ew rê rast kir û rêk nîşê da, gonehê min bê, vêca çêdibê ku lome li mirovek bê goneh bê kirin û çêdibê ku şîretker carnan gumanên xirab derheq wî da bên birin.

النَّبِيُّ وَالَّذِينَ آمَنُوا وَاللهُ وَلِيُّ الْمُؤمِنِينَ)، فَنَحْنُ مَرَّةً أَوْلَى بِالْقَرَابَةِ، وَتَارَةً أَوْلَى بِالطَّاعَةِ.

وَلَمَّا احْتَجَّ الْمُهَاجِرُونَ عَلَى الأَنْصَارِ يَوْمَ السَّقِيفَةِ بِرَسُولِ الله صلى الله عليه وآله فَلَجُوا عَلَيْهِمْ، فَإِنْ يَكُنِ الْفَلَجُ بِهِ فَالْحَقُّ لَنَا دُونَكُمْ، وَإِنْ يَكُنْ بِغَيْرِهِ فَالأَنْصَارُ عَلَى دَعْوَاهُمْ.

وَزَعَمْتَ أَنِّي لِكُلِّ الْخُلَفَاءِ حَسَدْتُ، وَعَلَى كُلِّهِمْ بَغَيْتُ، فَإِنْ يَكُنْ ذلِكَ كَذلِكَ فَلَيْسَ الْجِنَايَةُ عَلَيْكَ، فَيَكُونَ الْعُذْرُ إِلَيْكَ.

وَتِلْكَ شَكَاةٌ ظَاهِرٌ عَنْكَ عَارُهَا

وَقُلْتَ: إِنِّي كُنْتُ أُقَادُ كَمَا يُقَادُ الْجَمَلُ الْمَخْشُوشُ حَتَّى أُبَايِعَ، وَلَعَمْرُ الله لَقَدْ أَرَدْتَ أَنْ تَذُمَّ فَمَدَحْتَ، وَأَنْ تَفْضَحَ فَافْتَضَحْتَ! وَمَا عَلَى الْمُسْلِمِ مِنْ غَضَاضَةٍ فِي أَنْ يَكُونَ مَظْلُوماً مَا لَمْ يَكُنْ شَاكّاً فِي دِينِهِ، وَلاَ مُرْتَاباً بِيَقِينِهِ! وَهذِهِ

Min nexwestîye ***"xêncî durist kirinê qas karîna xwe, tewfîqa (li hev anîna ji bona) min bi Xwedê ye, min tewekula xwe daye ser wî û berê min li wî tinê ye"***.[131]

Te gotîye ku ji min û yaranên min ra cewaba te hema şûr e û ne tiştek dî, vêca hema rastî pê vê gotinê te kenê min anî piştî girîyandinê, te kengê dîtîye ku zarokên 'Ebdulmutellib li beraberê dijmin da paşda biçin û bi şûr bên tirsandin?!

Piçekî sebir bike heta "**Hemel**" [132] dakevê meydana şer. Ji nêzîk ve ewê tu dixwazî wê bikevê pey te û li te bigerê, ewê tu dûr hesab dikî wê nêzîkê te bibê; ezê digel leşkerek giran ji muhacir û ensara û ewên bi qencî pey wan ketîn, bi lez û bez ser te da bêm; leşkerek bûş û ser hevda kurisîyî ku tûza ku ji ber pîyê wan radibê wê 'esmana reş û tarî bikê û hemîyan cilkên mirinê berkirine û mehbûbtirîn rûbirû bûn ji bona wan rûbirû bûna digel Rebbê wa ye. Digel wan e, zurîyetek ji ehlê "Bedrê" û şûrên Benî Haşim. Û tu pê dizanî kanê şûrê wan çi anî serê birayê te û xalê te û kalkê te[133] û binemala te ***"û ew 'ezab ji zaliman ra dûr nîne".*** [134]

حُجَّتِي إِلَى غَيْرِكَ قَصْدُهَا، وَلكِنِّـي أَطْلَقْتُ لَكَ مِنْهَا بِقَدْرِ مَا سَنَحَ مِـنْ ذِكْرِهَا.

ثُمَّ ذَكَرْتَ مَا كَانَ مِنْ أَمْـرِي وَأَمْرِ عُثْمانَ، فَلَـكَ أَ نْ تُجَـابَ عَنْ هذِهِ لِرَحِمِكَ منْهُ، فَأَيُّنَا كَانَ أَعْدَى لَهُ، أَهْدَى إِلَى مَقَاتِلِـهِ! أَمْ مَنْ بَذَلَ لَـهُ نُصْـرَتَهُ فَاسْـتَقْعَدَهُ وَاسْـتَكَفَّهُ، أَمْ مَـنِ اسْتَنْصَـرَهُ فَتَرَاخى عَنْهُ بَثَّ الْـمَنُونَ إِلَيْـهِ، حَتَّى أَتَى قَدَرُهُ عَلَيْهِ، كَـلاَّ وَاللهِ لَقَد عَلِـمَ اللهُ الْمُعَـوِّقِينَ مِـنْكُمْ وَالْقَائِلِينَ لِاِخْوَانِهِمْ هَلُمَّ إِلَيْنَا وَلاَ يَأْتُونَ الْبَأْسَ إِلاَّ قَلِيلاً.

وَمَا كُنْتُ لِاَعْتَذِرَ مِـنْ أَنِّـي كُنْتُ أَنْقِمُ عَلَيْهِ أَحْدَاثاً، فَإِنْ كَانَ الذَّنْبُ إِلَيْهِ إِرْشَـادِي وَهِـدَايَتِي لَهُ، فَرُبَّ مَلُوم لاَ ذَنْبَ لَهُ.

وَقَدْ يَسْتَفِيدُ الظِّنَّةَ الْمُتَنَصِّحُ.

وَمَا أَرَدْتُ (إِلاَّ الْأَصْـلاَحَ مَـا اسْتَطَعْتُ وَمَا تَوْفِيقِي إِلاَّ بِاللهِ عَلَيْهِ

تَوَكَّلْتُ)

۞ NIVÎSOKA 29 ۞

Ji xelkê Besrayê ra nivîsîye:

Bê şik hûn bi xwe zanin kanê hewe çawa werîsê hevgirtina xwe veşerizand û hûn ketin nav dijminîyê ra û ji hev cida bûn; vêca min gonehkarên hewe ‘efû kirin û şûr ji ser pişt dayî yê hewe rakir û ewên berew min hatîn, min ew qebûl kirin.

Vêca eger kiryarên mirin înerên hewe û bîr û hizrên hewe yên sefêkî û dûrê ji duristî yê, hewe ji soz şikandinê ra hay bidê û hûn bikevin li beraberê min da, bizanin ez hazirê şerm û min hespê xwe hazir kirîye û palan li devan kirîye.

Eger hûn min mecbûr bikin ku ez hêrişê bînim ser hewe, ezê des şerek wereng bikim ku şerê cemelê li beraberê wê da kêm û çine bê hesab kirin, digel vê hemî yê jî ez qîmet û bihayê gohdar bûna hewe zanim û ezê heqê xêrxwazên hewe eda bikim û ez bê gonehan ji ber gonehkaranve

وَذَكَرْتَ أَنَّـهُ لَـيْسَ لِـي وَلاَ لِأَصْـحَابِي عِنْـدَكَ إِلاَّ السَّـيْفُ، فَلَقَدْ أَضْـحَكْتَ بَعْـدَ اسْـتِعْبَار! مَتَى أَلْفَيتْ بَنُو عَبْدِ الْمُطَّلِبِ عَنِ الأَعْـدَاءِ نَـاكِلِينَ، وبِالسُّـيُوفِ مُخَوَّفِينَ؟!

فَـلَبِّثْ قَلِيلاً يَلْحَـقِ الْهَيْجَـا حَمَلْ فَسَـيَطْلُبُكَ مَـنْ تَطْلُـبُ، وَيَقْرُبُ مِنْكَ مَـا تَسْـتَبْعِدُ، وَأَنَـا مُرْقِلٌ نَحْوَكَ فِـي جَحْفَـل مِـنَ الْمُهَاجِرِينَ وَالأَنْصَارِ وَالتَّـابِعِينَ [لَهُمْ] بِإِحْسَان، شَدِيد زِحَـامُهُمْ، سَـاطِع قَتَـامُهُمْ، مُتَسَـرْبِلِينَ سَرَابِيلَ الْمَـوْتِ، أَحَـبُّ اللِّقَـاء إِلَيْهِمْ لِقَاءُ رَبِّهِمْ، قَـدْ صَـحِبَتْهُمْ ذُرِّيَّةٌ بَدْرِيَّةٌ، وَسُيُوفٌ هَاشِـمِيَّةٌ، قَدْ عَرَفْتَ مَوَاقِـعَ نِصَـالِهَا فِـي أَخِيكَ وَخَالِكَ وَجَدِّكَ وَأَهْلِـكَ، (وَمَا هِيَ مِنَ الظَّالِمِينَ بِبَعِيد)

nagirim û ez wefadarên bi soz û qiraran şûna bê soz û qiraran da ceza nadim.

۞ NIVÎSOKA 30 ۞

Ji Mu'awîye ra şandîye:

Vêca derheq wê ya te heyî da teqwatî ya Xwedê bike û binêre ewî heqê li stûê te da heyî û, li nas kirina wan tiştan bizivire ku ji ber nezanîna wan te çi 'ozr nîne.

Çiko ji gohdanê ra nîşanên eşkere û rêkên ronahî û şeqamên (ce'de-rêk) rast û nexwehr û xilasekek li ser dilê hemîyan heye; ew rêka mirovên hişyar û 'eqilmend gava xwe li ser davêjin û yên bê xêr û pîs jê dixalêfin. Kesê ji wê derkevê ew ji heqîyê derketîye û li çûla rê nedîyar da şaş û heyrî dimînê û Xwedê ni'meta li ser wî digoherênê û xezebê ser da dibarênê. Vêca hay ji xwe hebe, hay ji xwe hebe, çiko bê şik û şubhe Xwedê rêka te ji bona te eşkere kirîye, li cîyê xwe da bisekine ku te êdî kar gihandîye xilasekê, ew xilaseka ku zîyan û kufr e. Vêca eva he rastî ye ku nefsa te tu êxistyî di nav pîsatî yê ra û tu li rê winda kirî û tu birîyî ber telef bûnê û rêk li te

إلى أهل البصرة

وَقَدْ كَانَ مِن انْتِشَارِ حَبْلِكُمْ وَشِقَاقِكُمْ مَا لَوْ تَغْبَوْا عَنْهُ، فَعَفَوْتُ عَنْ مُجْرِمِكُمْ، وَرَفَعْتُ السَّيْفَ عَنْ مُدْبِرِكُمْ، وَقَبِلْتُ مِنْ مُقْبِلِكُمْ.

فَإِنْ خَطَتْ بِكُمُ الأُمُورُ الْمُرْدِيَةُ، وَسَفَهُ الآرَاءِ الْجَائِرَةِ، إِلَيَّ مُنَابَذَتِي وَخِلاَفِي، فَهَا أَنَاذَا قَدْ قَرَّبْتُ جِيَادِي، وَرَحَلْتُ رِكَابِي.

وَلَئِنْ أَلْجَأْتُمُونِي إِلَى الْمَسِيرِ إِلَيْكُمْ، لأُوقِعَنَّ بِكُمْ وَقْعَةً لاَ يَكُونُ يَوْمُ الْجَمَلِ إِلَيْهَا إِلاَّ كَلَعْقَةِ لاَعِق، مَعَ أَنِّي عَارِفٌ لِذِي الطَّاعَةِ مِنْكُمْ فَضْلَهُ، وَلِذِي النَّصِيحَةِ حَقَّهُ، غَيْرُ مُتَجَاوِز مُتَّهَماً إِلَى بَرِيّ، وَلاَ ناكِثاً إِلَى وَفِيّ.

teng kirine û bi zehmet êxistine.

إلى معاوية

فَاتَّقِ اللهَ فِيما لَدَيْكَ، وَانْظُرْ فِي حَقِّهِ عَلَيْكَ، وَارْجِعْ إِلَى مَعْرِفَةِ مَا لاَ تُعْذَرُ بِجَهَالَتِهِ،

فَإِنَّ لِلطَّاعَةِ أَعْلاَماً وَاضِحَةً، وَسُبُلاً نَيِّرَةً، وَمَحَجَّةً نَهْجَةً، وَغَايَةً مُطَّلَبَةً، يَرِدُهَا الأَكْيَاسُ، وَيُخَالِفُهَا الأَنْكَاسُ، مَنْ نَكَبَ عَنْهَا جَارَ عَنِ الْحَقِّ، وَخَبَطَ فِي التِّيهِ، وَغَيَّرَ اللهُ نِعْمَتَهُ، وَأَحَلَّ بِهِ نِقْمَتَهُ. فَنَفْسَكَ نَفْسَكَ! فَقَدْ بَيَّنَ اللهُ لَكَ سَبِيلَكَ، وَحَيْثُ تَنَاهَتْ بِكَ أُمُورُكَ، فَقَدْ أَجْرَيْتَ إِلَى غَايَةِ خُسْرٍ، وَمَحَلَّةِ كُفْرٍ، وَإِنَّ نَفْسَكَ قَدْ أَوْحَلَتْكَ شَرّاً، وَأَقْحَمَتْكَ غَيّاً، وَأَوْرَدَتْكَ الْمَهَالِكَ، وَأَوْعَرَتْ عَلَيْكَ الْمَسَالِكَ.

۞ NIVÎSOKA 31 ۞

Dema ji Siffînê dizivirîya, li **Hazireynê** nivîsîye, ji bona Hesen bin ‘Elî *selamên Xwedê li wa bin (38-ê h.).* [135]

Ji babek, li ber çûnê (fanî), i’tiraf kirî bi dijwarî ya zeman, ewê ‘emrê wî pişt dayî û teslîmê dinyayê (ku barkirina ji dinyayê jê re muheqeq bûyî) û cî girtî di cîyê mirî yan da ku sibe wê ji wê bar bikê; bo weledê xwe ku berhêvî yê wê tiştê ye ewa neyê dest û di wê rêkê da ye (di wê dinyayê da ye) ewa rêwingî yê wê ji nav çûyî û li ber bela û li girûa derbaz bûna zeman da û li ber tîrên musîbeta, (ew dinya ku ehlê wê) bendeyê dinyayê û tacirê xapandinê (dinya hîlan) û deyndarê mirinê û esîrê ji nav çûnê û hevsozê xeman û hevjînê mereqan û vedayî yê li ber afetan û ketî yê li ber şehwetan û xelîfe û paş ve mayî yê mirî ya ye.

… Ji ber vê çendê ku min dît dinyayê pişt da min û zeman ji min ra hêç û har bû û axretê berê xwe da min, ez pê hesîyam ku şûna xêncî xwe de ez fikra xwe bikim û ewê ya di pey xwe ra (axretê) muhim bigrim. Eva he ku ez şûna yên dî da ketim xema xwe bi xwe, evê xemê, ez ji xwestên nefsanî paş ve dam û heqîqet a karê min ji min ra

eşkere kir û ez ji xebatê ra rakirim, xebatek bêy leystok û ez ji rastî û duristîyekî ra hay dam, ku di wê da qe çi nîşan ji derewê nebû.

Her wiha min dît tu qetekî ji min, ne, belkî jî tu hemî yê min î, bi awayek wereng ku ew tişta ser te da bê, ser min da hatîye û heçweku ew mirina ser te da bê ser min da hat bê, vêca min karê te ‘eynî wek karê xwe bi xwe zanî, ji ber wê min ev nivîsok ji te ra nivîsî da ji te ra bibê piştîvan, çi ez ji te ra sax bimînim û çi ez bimrim.s

Vêca li her hal û karî da ez şîreta teqwatî ya Xwedê li te dikim, ey korê min; her wiha rêk ketina digel ferman û emrê Wî û ava kirina dilê xwe pê zikrê Wî û xwe pê girtina werîsê Wî. Kîjan sebeb û wesîle ji wê wesîla di navbeyna te û Xuda da heyî pitir cihê pê bawerîyê ye, eger tu xwe pê bigirî?

Dilê xwe bi we’zê sax bike û pê zuhdê ewê bimrîne û pê yeqînê bi hêz û quwet bêxe û bi ĥikmetê ronahî bike û pê bîra mirinê bişkîne û mecbûr bike ku bi fena bûna xwe iqrar bikê, çavê wê li bela û nexweşîyên dinyayê veke û ewê bitirsîne ji hêriş û hucûma zeman û xirabî ya goherîna şev û rojan. Xeberên derbaz bûyan ber ve bavêje û ew musîbetên hatîn serê yên pêşîya te da, bîne bîrê û here li warê wan bigere û

ومن وصيّته عليه السلام

للحسن بن علي عليه السلام كتبها إليه بـ "حاضرين" عند انصرافه من صفّين

مِنَ الْوَالِدِ الْفَانِ، الْمُقِرِّ لِلزَّمَانِ، الْمُدْبِرِ الْعُمُرِ، الْمُسْتَسْلِمِ لِلدَّهْرِ، الذَّامِّ لِلدُّنْيَا، السَّاكِنِ مَسَاكِنَ الْمَوْتَى، الظَّاعِنِ عَنْهَا غَداً، إِلَى الْمَوْلُودِ الْمُؤَمِّلِ مَا لاَ يُدْرِكُ، السَّالِكِ سَبِيلَ مَنْ قَدْ هَلَكَ، غَرَضِ الأَسْقَامِ،رَهِينَةِ الأَيَّامِ، وَرَمِيَّةِ الْمَصَائِبِ، وَعَبْدِ الدُّنْيَا، وَتَاجِرِ الْغُرُورِ، وَغَرِيمِ الْمَنَايَا، وَأَسِيرِ الْمَوْتِ، وَحَلِيفِ الْهُمُومِ،قَرِينِ الأَحْزَانِ، وَنُصْبِ الآفَاتِ، وَصَرِيعِ الشَّهَوَاتِ، وَخَلِيفَةِ الأَمْوَاتِ.

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنَّ فِيمَا تَبَيَّنْتُ مِنْ إِدْبَارِ الدُّنْيَا عَنِّي، وَجُمُوحِ الدَّهْرِ عَلَيَّ، وَإِقْبَالِ الآخِرَةِ إِلَيَّ، مَا يَزَعُنِي عَنْ ذِكْرِ مَنْ سِوَايَ، وَالاهْتِمَامِ بِمَا وَرَائِي، غَيْرَ أَنِّي حَيْثُ تَفَرَّدَ بِي دُونَ هُمُومِ النَّاسِ هَمُّ نَفْسِي، فَصَدَفَنِيرَأْيِي، وَصَرَفَنِي عَنْ هَوَايَ، وَصَرَّحَ لِي مَحْضُ أَمْرِي، فَأَفْضَى بِي إِلَى جِدّ لاَ يَكُونُ فِيهِ لَعِبٌ، وَصِدْق لاَ يَشُوبُهُ كَذِبٌ.

eser û şûnewarên wan bibîne, vêca binêre kar û kirinên wan û bibîne ku goherînên wan çawa bûne; kûda çûne û li kûderê da nîne. Vêca hingê tu dê bibînî ku ew ji dost û ehbaban cida bûne û ketine di warê xerîbîyê da, tu jî ji nêzîk ve wê wek yêk ji wan lê bêyî.

Vêca nixwe cihê xwe serast bike û axreta xwe nefrûşe bi dinya xwe û dev berde ji wê axiftina tu jê nizanî û ewê xeberdana tu jê nemesûl (neberpirsyar).

Di wê rêkê da neçe ewa tu ji xeletî ya wê bitirsî, çiko xwe vedana ji wê şaşî ya dibê sebebê li rê winda bûnê baştir e ji ketina di nav sehw û nerihetîyê da. Emrê bi qencîyê bike da tu bibî ji qencan û ji kirêt û munkerê nehy bike bi dest û zimanê xwe û pir bixebite da tu xwe dûr bigirî ji wa kesên karên kirêt û nebaş dikin.

Di rêka Xwedê da wek çawa heqê wê cihadê bike û bila di rêka Xwedê da lûma lûmekeran te'sîrê li te nekê û li kûderê hebê ji bona Xwedê xwe bide zehmetê û xwe di dîn da zana û têgehiştî bike û nefsa xwe hînê sebra li ser nexweşîyan bike û çi xweş exlaq e sebirdarî ya li ser heqîyê! Li hemî karûbarê xwe da, hana xwe ji Xweda yê xwe ra bibe, çiko eger tu bi alîyê Wî ve biçî te xwe avêtîye di penahgehekî qayîm da û te xwe avêtîye parêzerekî serketî.

Li xwestinê da xwe ji Xuda re xalis

وَوَجَدْتُكَ بَعْضِي، بَلْ وَجَدْتُكَ كُلِّي، حَتَّى كَأَنَّ شَيْئاً لَوْ أَصَابَكَ أَصَابَنِي، وَكَأَنَّ الْمَوْتَ لَوْ أَتَاكَ أَتَانِي، فَعَنَانِي مِنْ أَمْرِكَ مَا يَعْنِينِي مِنْ أَمْرِ نَفْسِي، فَكَتَبْتُ إِلَيْكَ كِتَابِي هَذا، مُسْتَظْهِراً بِهِ إِنْ أَنا بَقِيتُ لَكَ أَوْ فَنِيتُ.

فَإِنِّي أُوصِيكَ بِتَقْوَى الله أَيْ بُنَيَّ وَلُزُومِ أَمْرِهِ، وَعِمَارَةِ قَلْبِكَ بِذِكْرِهِ، وَالاْعْتِصَامِ بِحَبْلِهِ، وَأَيُّ سَبَب أَوْثَقُ مِنْ سَبَب بَيْنَكَ وَبَيْنَ الله عَزّوَجَلَّ إِنْ أَنْتَ أَخَذْتَ بِهِ!

أَحْيِ قَلْبَكَ بِالْمَوْعِظَةِ، وَأَمِتْهُ بِالزَّهَادَةِ، وَقَوِّهِ بِالْيَقِينِ، وَنَوِّرْهُ بِالْحِكْمَةِ، وَذَلِّلْهُ بِذِكْرِ الْمَوْتِ، وَقَرِّرْهُ بِالْفَنَاء، وَبَصِّرْهُ فَجَائِعَ الدُّنْيَا، وَحَذِّرْهُ صَوْلَةَ الدَّهْرِ وَفُحْشَ تَقَلُّبِ اللَّيَالِي وَالأَيَّامِ، وَاعْرِضْ عَلَيْهِ أَخْبَارَ الْمَاضِينَ، وَذَكِّرْهُ بِمَا أَصَابَ مَنْ كَانَ قَبْلَكَ مِنَ الأَوَّلِينَ، وَسِرْ فِي دِيَارِهِمْ وَآثَارِهِمْ، فَانْظُرْ مَا فَعَلُواعَمَّا انْتَقَلُوا، وَأَيْنَ حَلُّوا وَنَزَلُوا! فَإِنَّكَ تَجِدُهُمْ انْتَقَلُوا عَنِ الأَحِبَّةِ، وَحَلُّوا دَارَالْغُرْبَةِ، وَكَأَنَّكَ

bike û ji Wî tinê bixwaze, çiko dan û mehrûm kirin, herdû di destê Wî da ne, û pir zêde xêr û başîyê ji xwe ra daxwaz bike; evê wesîyet û şîretê ji xwe ra baş bigire û hema birihetî ber ra derbaz nebe, çiko bi rastî, baştirîn gotin ew e ya feydê bidê, evê jî bizane ku qe çi xêr di wê zanînê da nîne ku menfî'etê nedê û ew 'ilmê ku feydeyekî nedê nelayiqê hîn bûn û 'elimînê ye.

Ey korê min, rastî ev e, dema min dît ku eve 'emrek ji min derbaz bû û sistî û bê taqetî ya min berew zêdahî ye, min des avêtê ku ez vê şîretnamê ji te ra binivîsim û di wê da behsa hinek tişta bikim, pêşîya ku mirin li min lez bikevê û ez nekarim ewa li dilê xwe da ji bona te bêjim û an kêmasî bikevê bîr û hizra min wek çawa ketî bedena min, an jî pêşîya şîretên min da hinek hewayê nefsê û fitnên dinyayî bi ser te da bên û tu wek wî hespê birevketî lê bêy ku kûvî bibê. Tinê dilê ciwana ye wek 'erd û zevîya vale ku tu çi lê bireşînî ewê qebûl dikê (û ew têda şîn dibê) vêca ji ber vê yêkê, min des terbîyet kirina te kir hêca dilê te req nebûyî û mejîyê te mijûl nebûyî. Da tu bi pey ketinek temam des bavêjî kar û 'emel û behra xwe ji wê ya ehlê tecribê ew dixwestan û ceribandine, dest ve bênî û êdî tu muhtac nebî ku ji ewil ve ewê

عَنْ قَلِيلٍ قَدْ صِرْتَ كَأَحَدِهِمْ.

فَأَصْلِحْ مَثْوَاكَ، وَلاَ تَبِعْ آخِرَتَكَ بِدُنْيَاكَ، وَدَعِ الْقَوْلَ فِيمَا لاَ تَعْرِفُ، وَالْخِطَابَ فِيمَا لَمْ تُكَلَّفْ، وَأَمْسِكْ عَنْ طَرِيقٍ إِذَا خِفْتَ ضَلاَلَتَهُ، فَإِنَّ الْكَفَّ عِنْدَ حَيْرَةِ الضَّلاَلِ خَيْرٌ مِنْ رُكُوبِ الأَهْوَالِ، وَأْمُرْ بِالْمَعْرُوفِ تَكُنْ مِنْ أَهْلِهِ، وَأَنْكِرِ الْمُنكَرَ بِيَدِكَ وَلِسَانِكَ، وَبَايِنْ مَنْ فَعَلَهُ بِجُهْدِكَ.

وَجَاهِدْ فِي اللهِ حَقَّ جِهَادِهِ، وَلاَ تَأْخُذْكَ فِي اللهِ لَوْمَةُ لاَئِمٍ، وَخُضِ الْغَمَرَاتِ إِلَى الحَقِّ حَيْثُ كَانَ، وَتَفَقَّهْ فِي الدِّينِ، وَعَوِّدْ نَفْسَكَ الصَّبْرَ عَلَى الْمَكْرُوهِ، وَنِعْمَ الْخُلُقُ التَّصَبُّرُ، وَأَلْجِىءْ نَفْسَكَ فِي الأُمُورِ كُلِّهَا إِلَى إِلهِكَ، فَإِنَّكَ تُلجِئُهَا إِلَى كَهْفٍ حَرِيزٍ، وَمَانِعٍ عَزِيزٍ،

وَأَخْلِصْ فِي الْمَسْأَلَةِ لِرَبِّكَ، فَإِنَّ بِيَدِهِ الْعَطَاءَ وَالْحِرْمَانَ، وَأَكْثِرِ الاسْتِخَارَةَ، وَتَفَهَّمْ وَصِيَّتِي، وَلاَ

biceribênî. Di vê rêkê da ewqas ji edebê dighê te ku me ew bi zehmet bi dest ve anîye. Her wiha ew heqîqetên ku ji me ra tarî bûn wê ji te ra ronahî bibin.

Korê min! Rastî ev e ku eger çi min qasî yên pêşîya xwe da ‘emr nekirîye, lê belê min li karên wan nêrî û ez li ser bûrîya wan da fikirîm û di nav şûnewarên wan da gerîyam, heçweku tu dibêjî ez wek yêk ji wan bi xwe lê hatime, belkî jî ji ber wê ya ji wan gehiştî min wisa lê hatîye ku tu dibêjî qey ez ji ewil heta axir digel wan jîyame û ez pê heshame kanê ew karê safî û bê şêlûtî kîjane û ewa şêlû û tarî kîjan e, kîjan kar û ‘emel bi feyde ye û kîjan zerer û zîyan têda heye, vêca min ji her tiştekî bijartî ya wê ji te ra bijart û sipehî ya wê ji te ra veqetand û ya nekifş û neme’lûm, min ji te, da paş. Her wiha wek çawa babek dilovan berê xwe didê karê zarokê xwe, min li karûbarê te nêrî û min ji te ra edeb danî serhev da tu bi’elmî û bi cî bînî, tu hêca li rojên despêka ciwanîyê dayî, hêca nefsa te pak e û ji qirêjê dûr e. Di vê rêkê da min qirar da ku ez pê ‘elimandina kitêba Xwedayê ‘ezîz û celîl û te’wîl û me’na wê des bavêjm hîn kirina te û te bi’elmînim şerî’eta Islamê û ehkamên wê û helal û heraman û xêncî wê ez derbazê tiştek dî nebim,

تَذْهَبَنَّ [عَنْكَ]صَفْحاً، فَـإِنَّ خَيْـرَ الْقَوْلِ مَا نَفَعَ. وَاعْلَمْ أَنَّهُ لاَ خَيْـرَ فِي عِلْم لاَ يَنْفَعُ، وَلاَ يُنْتَفَعُ بِعِلْـم لاَ يَحِقُّ تَعَلُّمُهُ.

أَيْ بُنَيَّ، إِنِّي لَمَّا رَأَيْتُنـي قَـدْ بَلَغْتُ سِنّاً، وَرَأَيْتُنِي أَزْدَادُ وَهْنـاً، بَادَرْتُ بِوَصِيَّتِي إِلَيْـكَ، وَأَوْرَدْتُ خِصَالاً مِنْهَا قَبْـلَ أَنْ يَعْجَـلَ بِـي أَجَلِي دُونَ أَنْ أُفْضِيَ إِلَيْـكَ بِمَـا فِي نَفْسِي، أَوْ أَنْ أَنْقُصَ فِي رَأْيِي كَمَـا نُقِصْـتُ فِـي جِسْـمِي، أَوْ يَسْـبِقَنِي إِلَيْـكَ بَعْـضُ غَلَبَـاتِ الْهَـوَى وَفِـتَنِ الـدُّنْيَا، فَتَكُـونَ كَالصَّـعْبِ النَّفُـورِ، وَإِنَّمَـا قَلْـبُ الْحَدَثِ كَالأَرْضِ الْخَالِيَةِ مَا أُلْقِـيَ فِيهَا مِـنْ شَـيء قَبِلَتْـهُ، فَبَادَرْتُـكَ بِـالأَدَبِ قَبْـلَ أَنْ يَقْسُـوَ قَلْبُـكَ، وَيَشْتَغِلَ لُبُّكَ، لِتَسْتَقْبِلَ بِجِدِّ رَأْيِكَ مِـنَ الأَمْـرِ مَـا قَـدْ كَفَـاكَ أَهْـلُ التَّجَارِبِ بُغْيَتَهُ وَتَجْرِبَتَهُ، فَتَكُونَ قَدْ كُفِيتَ مَؤُونَةَ الطَّلَبِ، وَعُوفِيتَ مِنْ عِلاَجِ التَّجْرِبَةِ، فَأَتَاكَ مِنْ ذلِكَ مَـا قَدْ كُنَّا نَأْتِيهِ، وَاسْتَبَانَ لَكَ مَا رُبَّمَـا

vêca paşê ez tirsîyam ku newebê ewa bûyî sebebê ixtilafa bîr û bawerê di nav xelkê da û kar li ber wan êxistî di şubhê da, şubhê ji te ra jî çêkê, ji ber vê yêkê her çend min nedixwesta ez te bi vî alîyî ve bikişênim, lê min nêrî eger ez te di wê da qayîm bikim baştir e ji wê çendê ku ez te teslîmê cereyanekî bikim ku di wê da tu ji telef bûnê êmin nabî û, ez hêvîdar bûm ku Xwedê evê şîretnamê bikê wesîla serketina te û te rênimûn bikê ji rêka te ya rast û durist ra. Vêca ji ber wê min ev wesîyeta he ji te ra nivîsî.

Korê min, bizane, baştirîn tişta ku tu ji vê şîretnamê digirî teqwatî ya Xwedê ye û pêk anîna wê ya Xwedê li ser te ferz kirî û pey ketina wê ya kalkên te yên pêşda derbaz bûyîn û qencên binemala te pêk anyîn û kirîn, çiko ewa, ileh li karên xwe dinêrîyan çawa ku lazim e tu jî li karên xwe binêrî; di karê xwe da fikir dikiran wek çawa ku gereke tu jî fikir bikî, heta gihan wê derê ku heçî tişta qenc û baş, pêk anîn û ji wî tişta ne berpirsyarîya wan, xwe paş ve dan. Lê eger tu nexwazî wê qebûl bikî neheta tu bi xwe hîn bibî wek çawa ew hîn bûyîn û ‘elimyîn, vêca hingê tu bixebite ku heçî ya tu dixwazî, bi fêhm kirin û zanîn bê, ne ku bi ketina di nav şubhan û zêdegavî ya li rikeberanî yê da.

أَظْلَمَ عَلَيْنَا مِنْهُ.

أَيْ بُنَيَّ، إِنِّي وَإِنْ لَمْ أَكُنْ عُمِّرْتُ عُمُرَ مَنْ كَانَ قَبْلِي، فَقَدْ نَظَرْتُ فِي أَعْمَالِهِمْ، وَفَكَّرْتُ فِي أَخْبَارِهِمْ، وَسِرْتُ فِي آثَارِهِمْ، حَتَّى عُدْتُ كَأَحَدِهِمْ، بَلْ كَأَنِّي بِمَا انْتَهَى إِلَيَّ مِنْ أُمُورِهِمْ قَدْ عُمِّرْتُ مَعَ أَوَّلِهِمْ إِلَى آخِرِهِمْ، فَعَرَفْتُ صَفْوَ ذلِكَ مِنْ كَدَرِهِ، وَنَفْعَهُ مِنْ ضَرَرِهِ، فَاسْتَخْلَصْتُ لَكَ مِنْ كُلِّ أَمْر نَخِيلَتَهُ، تَوَخَّيْتُ لَكَ جَمِيلَهُ، وَصَرَفْتُ عَنْكَ مَجْهُولَهُ، وَرَأَيْتُ حَيْثُ عَنَانِي مِنْ أَمْرِكَ مَا يَعْنِي الْوَالِدَ الشَّفِيقَ، وَأَجْمَعْتُ عَلَيْهِ مِنْ أَدَبِكَ أَنْ يَكُونَ ذلِكَ وَأَنْتَ مُقْبِلُ الْعُمُرِ مُقْتَبَلُ الدَّهْرِ، ذُونِيَّة سَلِيمَة، وَنَفْس صَافِيَة، وَأَنْ أَبْتَدِئَكَ بِتَعْلِيمِ كِتَابِ اللهِ عَزَّ وَجَلَّ وَتَأْوِيلِهِ، وَشَرَائِعِ الْإِسْلَامِ وَأَحْكَامِهِ، وَحَلَالِهِ وَحَرَامِهِ، لَا أُجَاوِزُ ذلِكَ بِكَ إِلَى غَيْرِهِ. ثُمَّ أَشْفَقْتُ أَنْ يَلْتَبِسَ عَلَيْكَ

Û pêşîya wî qasî da jî ku tu li vê rêçkê binêrî û gava xwe bavêjî, arîkarîyê ji Xweda yê xwe bixwaze û ji tewfîqa xwe ra berê xwe bide wî û xwe biparêze ji heçî tişta şubhê ji te ra çêkê û an bibê sebebê li rê winda bûna te.

Dema te yeqîn kir ku dilê te saf û "xaşi" bûye û fikra te ji bilav bûnê xilas bûye û hemî komê ser hev bûye û hemî xema te bûye yêk xem tinê, vêca hingê binêre vê ya min ji te ra gotî û şerh dayî, eger tu negihayî wê ya tu dixwazî û rihetî ya bîr û hizrê ji te ra çênebû, bizane tu wek wî yî ewê pêşîya pîyê xwe nabînê û li tarîtîyê da gava xwe davêjê. Kesê xeletîyan bikê û (heq û batil) tevhev bikê, ew ne li pey dîn e û ya baştir ew e ku ji çûnê bisekinê û xwe ragirê.

Vêca ey **korê min**, wesîyeta min baş bigire û xwe tê bigihîne û bizane ku bi rastî hema ewê mirin di destê wî da û ya wî, saxî û jîyan jî hema ya wî ye û di destê wî da ye; ewê dafirînê hema ew e yê dimrînê û ewê ji nav dibê hema ew e yê dîsa dizivirênê û ewê nexweşîyê didê hema ew e yê selametî û şifayê didê. Rastî ev e ku dinya xêncî li ser wî halê Xuda xwestî nehatîye deynan; ji ni'met û imtihan û cezayê roja qîyametê bigire heta bi wa tiştên Xwedê hez kirî û tu pê

مَا اخْتَلَفَ النَّاسُ فِيهِ مِنْ أَهْوَائِهِمْ وَآرَائِهِمْ مِثْلَ الَّذِي الْتَبَسَ عَلَيْهِمْ، فَكَانَ إِحْكَامُ ذلِكَ عَلَى مَا كَرِهْتُ مِنْ تَنْبِيهِكَ لَهُ أَحَبَّ إِلَيَّ مِنْ إِسْلاَمِكَ إِلَى أَمْرٍ لاَ آمَنُ عَلَيْكَ بِهِ الْهَلَكَةَ، وَرَجَوْتُ أَنْ يُوَفِّقَكَ اللهُ فِيهِ لِرُشْدِكَ، وَأَنْ يَهْدِيَكَ لِقَصْدِكَ، فَعَهِدْتُ إِلَيْكَ وَصِيَّتِي هذِهِ.

وَاعْلَمْ يَا بُنَيَّ، أَنَّ أَحَبَّ مَا أَنْتَ آخِذٌ بِهِ إِلَيَّ مِنْ وَصِيَّتِي تَقْوَى اللهِ، وَالاْقْتِصَارُ عَلَى مَا فَرَضَهُ اللهُ عَلَيْكَ، وَالأَخْذُ بِمَا مَضَى عَلَيْهِ الأَوَّلُونَ مِنْ آبَائِكَ، وَالصَّالِحُونَ مِنْ أَهْلِ بَيْتِكَ، فَإِنَّهُمْ لَمْ يَدَعُوا أَنْ نَظَرُوا لاِنْفُسِهِمْ كَمَا أَنْتَ نَاظِرٌ، وَفَكَّرُوا كَمَا أَنْتَ مُفَكِّرٌ، ثُمَّ رَدَّهُمْ آخِرُ ذلِكَ إِلَى الأَخْذِ بِمَا عَرَفُوا، وَالاْمْسَاكِ عَمَّا لَمْ يُكَلَّفُوا، فَإِنْ أَبَتْ نَفْسُكَ أَنْ تَقْبَلَ ذلِكَ دُونَ أَنْ تَعْلَمَ كَمَا عَلِمُوا فَلْيَكُنْ طَلَبُكَ ذلِكَ بِتَفَهُّمٍ وَتَعَلُّمٍ، لاَ بِتَوَرُّطِ الشُّبُهَاتِ، وَعُلَقِ الْخُصُومَاتِ.

وَابْدَأْ قَبْلَ نَظَرِكَ فِي ذلِكَ

wan dest xwe ve bênî; vêca dema ji te ra li hev hat û te forseta xîyanet kirina li ummetê dît, te hêrişek lez bir û tu ji cih rabûyî û wek wî gorîyê (didan tîj) ku bizina ji hevketî û birîndar û xûnî bûyî radikişênê, te ew malê ji jinebî û yetîma ra berhev bûyî, revand û bi dilek rihet te ew mal rakir û bir Hicazê, bê wê çendê ku tu ji ber vê yêkê xwe gonehkar jî hesab bikî; ey xêncî te bê bab (ey mal xirab)! Ew jî bi awayek wereng heçweku tu mîrata xwe ji bab û deyka xwe bilez û bez bibî ji ehlê mala xwe ra! Subhanellah! Ma, te bawerî bi roja qîyametê nîne û ma tu natirsî ji hesab dana roja hesabê.

Ey ewê tu li bal min ji ‘eqilmenda dihatay êjmartin û hesab kirin! Çawa vexwarin û xwarin li te xweş tê, halhale tu zanî ku bi rastî tu ya heram dixwî û ya heram vedixwî? Tê kenîjan bigirî û jinan bînî, ew jî ji malê wan yetîm û belengaz û mu’min û mucahidan, ku Xwedê ev mal ji wan ra danîye û memleketên Islamî pê wan paraztîye.

Ji Xuda bitirse û malê vî xelkî li wan bizivirîne. Vêca hema rastî, eger tu vê nekî û Xwedê, te, dest min bêxê (destê min bigîje te) ezê wê digel te bikim ku ez li bal Xwedê ‘ozrdar bim; û bê şubhe

إِنْ كُنْتَ فَعَلْتَهُ فَقَدْ أَسْخَطْتَ رَبَّكَ، وَعَصَيْتَ إِمَامَكَ، وَأَخْزَيْتَ أَمَانَتَكَ.

بَلَغَنِي أَنَّكَ جَرَّدْتَ الأَرْضَ فَأَخَذْتَ مَا تَحْتَ قَدَمَيْكَ، وَأَكَلْتَ مَا تَحْتَ يَدَيْكَ، فَارْفَعْ إِلَيَّ حِسَابَكَ، وَاعْلَمْ أَنَّ حِسَابَ اللهِ أَعْظَمُ مِنْ حِسَابِ النَّاسِ، وَالسَّلاَمُ.

[**41**]

إلى بعض عماله وهو عبدالله بن العباس

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنِّي كُنْتُ أَشْرَكْتُكَ فِي أَمَانَتِي، وَجَعَلْتُكَ شِعَارِي وَبِطَانَتِي، وَلَمْ يَكُنْ مِنْ أَهْلِي رَجُلٌ أَوْثَقَ مِنْكَ فِي نَفْسِي، لِمُوَاسَاتِي وَمُوَازَرَتِي وَأَدَاءِ الأَمَانَةِ إِلَيَّ.

فَلَمَّا رَأَيْتَ الزَّمَانَ عَلَى ابْنِ عَمِّكَ قَدْ كَلِبَ، وَالْعَدُوَّ قَدْ حَرِبَ، وَأَمَانَةَ النَّاسِ قَدْ خَزِيَتْ، وَهَذِهِ الأُمَّةَ قَدْ فَتَنَتْ وَشَغَرَتْ، قَلَبْتَ لابْنِ عَمِّكَ ظَهْرَ الْمِجَنِّ، فَفَارَقْتَهُ مَعَ الْمُفَارِقِينَ، وَخَذَلْتَهُ مَعَ الْخَاذِلِينَ، وَخُنْتَهُ مَعَ الْخَائِنِينَ، فَلاَ ابْنَ عَمِّكَ آسَيْتَ، وَلاَ الأَمَانَةَ

ezê pê vî şûrê xwe li te bidim, ew şûrê min pê wê li kî dayî, muheqeq ketîye di agirê cehnemê da.

Wellahî, eger Hesen û Huseyn ew karê te kirî, bikiran, wê ewa qet nermî û mudara ji min nedîtan û nikarîyan goherînê bêxin fikra min, ne heta min ew heq ji wan bistanda û ew neheqî ya ji ber zulma wan çêbûyî ji nav bibira.

Ez sond dixum bi wî Xwedayê rebbê alemê, eger ewa te bi heramî birî bi awayek helal jî bi dest minve bihata, min hez nedikir û li min xweş nedihata ku ez ewê ji bona yên paş xwe ra bikim mîrat û bihêlm. Hêdîka bimeşîne, heçweku eve tu gihayî xilasekê û hatîyî bin ax kirin û kiryarên te raberê te kirine û niha tu li cîyekî dayî ku zalim gazî dikin "ya hesretah" û ewê 'emrê xwe telef kirî xwezîya zivirîna li dinyayê dixwazê û ***"êdî hingê cihê revînê tinehin"***.

NIVÎSOKA 42

Ji 'Omerê korê Ebû seleme yê Mexzûmî ra nivîsîye, ew kar bi destê wî bû li Behreynê, vêca ew ji kar avêtîye û Numanê korê 'Eclanê Zureqî şûna wî da danîye.

... Eve min Numanê korê 'Eclan kir

أَدَّيْتَ.

وَكَأَنَّكَ لَمْ تَكُنِ اللهَ تُرِيدُ بِجِهَادِكَ، وَكَأَنَّكَ لَمْ تَكُنْ عَلَى بَيِّنَةٍ مِنْ رَبِّكَ، وَكَأَنَّكَ إِنَّمَا كُنْتَ تَكِيدُ هذِهِ الأُمَّةَ عَنْ دُنْيَاهُمْ، وَتَنْوِي غِرَّتَهُمْ عَنْ فَيْئِهِمْ! فَلَمَّا أَمْكَنَتْكَ الشِّدَّةُ فِي خِيَانَةِ الأُمَّةِ، أَسْرَعْتَ الْكَرَّةَ، وَعَاجَلْتَ الْوَثْبَةَ، وَاخْتَطَفْتَ مَا قَدَرْتَ عَلَيْهِ مِنْ أَمْوَالِهِمُ الْمَصُونَةِ لِأَرَامِلِهِمْ وَأَيْتَامِهِمْ، اخْتِطَافَ الذِّئْبِ الأَزَلِّ دَامِيَةَ الْمِعْزَى الْكَسِيرَةَ، فَحَمَلْتَهُ إِلَى الْحِجَازِ رَحِيبَ الصَّدْرِ بِحَمْلِهِ، غَيْرَ مُتَأَثِّمٍ مِنْ أَخْذِهِ، كَأَنَّكَ ـ لاَ أَبَا لِغَيْرِكَ ـ حَدَرْتَ إِلَى أَهْلِكَ تُرَاثَكَ مِنْ أَبِيكَ وَأُمِّكَ، فَسُبْحَانَ اللهِ! أَمَا تُؤْمِنُ بِالْمَعَادِ؟ أَوَ مَا تَخَافُ نِقَاشَ الْحِسَابِ!

أَيُّهَا الْمَعْدُودُ ـ كَانَ ـ عِنْدَنَا مِنْ ذَوِي الأَلْبَابِ، كَيْفَ تُسِيغُ شَرَاباً وَطَعَاماً، وَأَنْتَ تَعْلَمُ أَنَّكَ تَأْكُلُ حَرَاماً، وَتَشْرَبُ حَرَاماً، وَتَبْتَاعُ الإِمَاءَ وَ تَنْكِحُ النِّسَاءَ مِنْ مَالِ الْيَتَامَى

walî yê Behreynê; û min tu ji wêderê vegirtî, bê wê çendê ku lûmeyek li te bê kirin û nebaşîyek li ser te bê gotin. Te wezîfa xwe li hukumdarî yê da baş pêk anîye û te emanet eda kirîye, vêca ne gumana xirab derheq te da heye û ne lome li ser te heye û ne tuhmet li ser te heye û ne jî tu gonehkarî, bizivire were, çiko niyeta min ew e ez bi alîyê zalimên Şamêve hereket bikim û ez dixwazim tu digel min hazir bî, çiko bi hez kirina Xwedê tu ji wan kesayî ku li cihada digel dijmina da û li ragirtina sitûna dîn da ez jê arîkarî digirim.

۞ NIVÎSOKA 43 ۞

Ji walî yê xwe yê "Erdeşîr Xurre", Mesqeleyê korê Hubeyre yê Şeybanî ra nivîsîye:

Xeberek ji te gehiştîye min, eger te we kiribê, te Xwedayê xwe anîye xezebê û ne gohdarî ya Imamê xwe kirîye; te xenîmeta muslimana ku bi hêza rrim û hespên wan berhev bûyî û xûna wan li ser wê hatî rijandin, li komek ji qewmê xwe, ku tu ji xwe re bijartine (teqsîm kirine). Sond bi Wî yê tûv kelaştî û candar afirandîn, eger ev gotin rast bê, te qîmetê xwe li nik min kêm kirîye û te mîzan û terazû ya pê bawerî ya min bi xwe sivik kirîye. Vêca tu

وَالْمَسَاكِينِ وَالْمُؤْمِنِينَ وَ الْمُجَاهِدِينَ، الَّذِينَ أَفَاءَ اللهُ عَلَيْهِمْ هذِهِ الأَمْوَالَ، وَأَحْرَزَ بِهِمْ هذِهِ الْبِلاَدَ؟!

فَاتَّقِ اللهَ، وَارْدُدْ إِلَى هؤُلاَءِ الْقَوْمِ أَمْوَالَهُمْ، فَإِنَّكَ إِنْ لَمْ تَفْعَلْ ثُمَّ أَمْكَنَنِي اللهُ مِنْكَ لأُعْذِرَنَّ إِلَى اللهِ فِيكَ، وَلأَضْرِبَنَّكَ بِسَيْفِي الَّذِي مَا ضَرَبْتُ بِهِ أَحَداً إِلاَّ دَخَلَ النَّارَ!

وَ وَاللهِ لَوْ أَنَّ الْحَسَنَ وَالْحُسَيْنَ فَعَلاَ مِثْلَ الَّذِي فَعَلْتَ، مَا كَانَتْ لَهُمَا عِنْدِي هَوَادَةٌ، وَلاَ ظَفِرَا مِنِّي بِإِرَادَةٍ، حَتَّى آخُذَ الْحَقَّ مِنْهُمَا، وَأُزِيحَ الْبَاطِلَ عَنْ مَظْلَمَتِهِمَا.

وَأُقْسِمُ بِاللهِ رَبِّ الْعَالَمِينَ مَا يَسُرُّنِي أَنَّ مَا أَخَذْتَهُ مِنْ أَمْوَالِهِمْ حَلاَلٌ لِي، أَتْرُكُهُ مِيرَاثاً لِمَنْ بَعْدِي، فَضَحَّ رُوَيْداً، فَكَأَنَّكَ قَدْ بَلَغْتَ الْمَدَى، وَدُفِنْتَ تَحْتَ الثَّرَى، وَعُرِضَتْ عَلَيْكَ أَعْمَالُكَ بِالْمَحَلِّ الَّذِي يُنَادِي الظَّالِمُ فِيهِ بِالْحَسْرَةِ، وَيَتَمَنَّى الْمُضَيِّعُ الرَّجْعَةَ، (وَلاَتَ حِينَ مَنَاص! وَالسَّلاَمُ.

heqê Xwedayê xwe sivik û rihet negire û pê ji nav birina dînê xwe dinya xwe ava neke; da tu bibî ji wa kesan ku ji nezer kiryar û ‘emel ve xusirîyî.

Agah be, rastî ev e ku heqê ewa muslimanên li bal te û ewên li bal me di vê xenîmetê da berabere. Ji girtina heqê xwe re tên bal min û dema girtin, dizivirin.

۞ NIVÎSOKA 44 ۞

Ji Zîyad bin Ebîh [137] ra nivîsîye. Dema xeber gihayîyê ku Mu’awîye nîyete ewî bixapênê û di nesebê da girêdanê di navbeyna xwe û wî da çêkê.

Ez pê hesîyame ku Mu’awîye nameyek ji te ra şandîye û dixwazê eqlê dilê te bişimitênê û sistî yê bêxê biryara te, vêca hay jê hebe. Çiko bi rastî ew şeytane, ku ji rûbirûve û ji piştve û ji rast û çep bi alîyê mirov ve tê da li wextê bê xeberî û hay ji xwe nemana wî da forsetê peyda bikê û ewî bin dest bikê û hişê wî birevênê.

Belê, li wextê ‘Omer bin Xettab da qiseyek ne rêk û pêk û ji hewayê nefsê ji devê Ebû Sufyan pekîya, [138] ew ji weswesên şeytan bî; pê wê, ne nesebek sabit dibê û ne jî kesek dibê musteheqê mîratê. Kesê xwe bi vê gotinê bigirê wek wî devê ye ku ne ji koma devên wêderê bê û biçê nav wan, da ku ava

[42]

إلى عمر بن أبي سلمة المخزومي وكان عامله على البحرين، فعزله، واستعمل النعمان بن عجلان الزّرقي مكانه:

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنِّي قَدْ وَلَّيْتُ النُّعْمَانَ بْنَ عَجْلاَنَ الزُّرَقِيَّ عَلَى الْبَحْرَيْنِ، وَنَزَعْتُ يَدَكَ، بِلاَ ذَمٍّ لَكَ، وَلاَ تَثْرِيب عَلَيْكَ، فَلَقَدْ أَحْسَنْتَ الْوِلاَيَةَ، و أَدَّيْتَ الأَمَانَةَ، فَأَقْبِلْ غَيْرَ ظَنِين، وَلاَ مَلُوم، وَلاَ مُتَّهَم، وَلاَ مَأْثُوم، فَقَدْ أَرَدْتُ الْمَسِيرَ إِلَى ظَلَمَةِ أَهْلِ الشَّامِ، وَأَحْبَبْتُ أَنْ تَشْهَدَ مَعِي، فَإِنَّكَ مِمَّنْ أَسْتَظْهِرُ بِهِ عَلَى جِهَادِ الْعَدُوِّ، وَإِقَامَةِ عَمُودِ الدِّينِ، إِنْ شَاءَ اللهُ.

[43]

إلى مصقلة بن هُبَيرة الشيباني وهو عامله على أردشير خُرّة:

بَلَغَنِي عَنْكَ أَمْرٌ إِنْ كُنْتَ فَعَلْتَهُ فَقَدْ أَسْخَطْتَ إِلهَكَ، وَأَغْضَبْتَ إِمَامَكَ: أَنَّكَ تَقْسِمُ فَيْءَ الْمُسْلِمِينَ

wan vexwê ew jî ewî ji koma xwe dûr bikin û an wek wê meşikê ye ku bi kurtanê devêve girê didin ku diqeliqê û li cîyê xwe nasekinê.

Vêca dema Zîyad ev name xwend got: Sond bi Xwedayê Ke'bê ku ewî şehdeyî li ser vê yêkê da. Evahe her di melheza wî da diborîya, heta paşî ra Mu'awîye got ew birayê min e.

Seyidê Rezî *dibêjê "wağil" keseke ku hêrişê dibê nav koma avvexweran, da digel wan avê vexwê û ew jî ewî ji xwe dûr dikin. "e-nût-ul muzebzeb" jî ew pîyanûk an kasik an tiştek wek wê ye ku bi kurtanê devêve girê didin û dema deve bilez dikevê û rêve diçê ew hema her diqeliqê û li cîyê xwe da nasekinê.*

۞ NIVÎSOKA 45 ۞

Ji walî yê xwe yê Besrayê 'Osmanê korê Hûneyfê Ensarî ra nivîsîye. Dema gohlê bû ku yêk ji xelkê Besrayê ew ji xwarinê ra gazî kirî û ew jî çûyî mala wî.

Ema be'd: Ey korê Hûneyf, xeber gehiştîye min ku kesek ji dewlemendên Besrê tu ji zîyafetekî ra gazî kirîyî û tu jî bilez çûyî; ewî sifreyek reng reng ji te ra pehn kirîye û kaskên xarinê danîne ber te.

الَّذِي حَازَتْهُ رِمَاحُهُمْ وَخُيُولُهُمْ، وَأُرِيقَتْ عَلَيْهِ دِمَاؤُهُمْ، فِيمَنِ اعْتَامَكَ مِنْ أَعْرَابِ قَوْمِكَ، فَوَالَّذِي فَلَقَ الْحَبَّةَ، وَبَرَأَ النَّسَمَةَ، لَئِنْ كَانَ ذلِكَ حَقّاً لَتَجِدَنَّ بِكَ عَلَيَّ هَوَاناً، وَلَتَخِفَّنَّ عِنْدِي مِيزَاناً، فَلاَ تَسْتَهِنْ بِحَقِّ رَبِّكَ، وَلاَ تُصْلِحْ دُنْيَاكَ بِمَحْقِ دِينِكَ، فَتَكُونَ مِنَ الأَخْسَرِينَ أَعْمَالاً.

أَلاَ وَإِنَّ حَقَّ مَنْ قِبَلَكَ وَقِبَلَنَا مِنَ الْمُسْلِمِينَ فِي قِسْمَةِ هذَا الْفَيْءِ سَوَاءٌ، يَرِدُونَ عِنْدِي عَلَيْهِ،يَصْدُرُونَ عَنْهُ، والسَّلامُ.

[44]

إلى زياد بن أبيه

وقد بلغه أن معاوية كتب إليه يريد خديعته باستلحاقه

وَقَدْ عَرَفْتُ أَنَّ مُعَاوِيَةَ كَتَبَ إِلَيْكَ يَسْتَزِلُّ لُبَّكَ، وَيَسْتَفِلُّ غَرْبَكَ، فاحْذَرْهُ، فَإِنَّمَا هُوَ الشَّيْطَانُ يَأْتِي الْمَرْءَ مِنْ بَيْنِ يَدَيْهِ وَمِنْ خَلْفِهِ، وَعَنْ يَمِينِهِ وَعَنْ شِمَالِهِ، لِيَقْتَحِمَ

Êkcar min bawer nedikira ku tu gazî ya wa kesa qebûl bikî ku belengazên wan bên paşvedan û dewlemendên wan bên gazî kirin.

Vêca binêre xarina xwe ya tu dixwî, ewa tu (derheq helalî û heramî ya wê da) li şik û şubhê da bû ji devê xwe bavêje û ewa te yeqîn heyî ku ji rêkek durist ve hatîye dest, ji wê bi xwe.

Heyhê! Her kesekî pêşkarek heye ku dikevê pey û ji nûra zanîna wî ronahîyê digrê; heyhê bi rastî ev e Imam û pêşkarê hewe razî bûye û beskirîye di dinya xwe da pê dû cilkên peritîyî û ji xarinê jî pê dû tûtik (û dû qet) nan. Elbet, hûn nikarin evê yêkê bikin, lê belê pê teqwatî û xebat û pak dawî (û iffet) û duristkarî ya xwe arîkarîya min bikin.

Vêca wellahî, min ji dinya hewe axa zêrîn nedaye hev û berhev nekirîye û ji heyî ya wê min qe çi mal xezne nekirîye û şûna evî kirasê kevin û pertîyî min kirasek dî ji xwe ra hazir nekirîye û min ji ‘erdê wê bûstek ji xwe re negirt û, min ji wê xêncî xarinek kêm û ne çi, nexwest û nevîya. Bi rastî ew (dinya) li ber çavê min bê qîmettir û bê bihatir e ji libek mazûya tehl.

Belê, ji hemî wê ya li bin ‘esmana da, “Fedek”ek dest me da hebû ku

غَفْلَتَهُ، وَيَسْتَلِبَ غِرَّتَهُ.

وَقَدْ كَانَ مِنْ أَبِي سُفْيَانَ فِي زَمَنِ عُمَرَ بْنِ الْخَطَّابِ فَلْتَةٌ مِنْ حَدِيثِ النَّفْسِ، وَنَزْغَةٌ مِنْ نَزَغَاتِ الشَّيْطَانِ، لاَ يَثْبُتُ بِهَا نَسَبٌ، وَلاَ يُسْتَحَقُّ بِهَا إِرْثٌ، وَالْمُتَعَلِّقُ بِهَا كَالْوَاغِلِ الْمُدَفَّعِ، وَالنَّوْطِ الْمُذَبْذَبِ.

فلمّا قرأ زياد الكتاب قال: شهد بها وربّ الكعبة، ولم يزل في نفسه حتى ادّعاه معاويةُ.

قوله(عليه السلام): "كَالْوَاغِلِ الْمُدَفَّعِ" الواغلُ: هوالذي يهجم على الشّرْب ليشرب معهم وَليس منهم، فلا يزال مُدفّعاً محاجزاً. و"النّوْط المُذَبْذَب": هو ما يناط برحل الراكب من قعب أو قدح أو ما أشبه ذلك، فهو أبداً يتقلقل إذا حث ظهره واستعجل سيره.

[45]

إلى عثمان بن حنيف الانصاري

hineka dilê xwe birinê û bexîletî têda kirin û hinek dî jî, jê derbaz bûn û Xwedê baş hakim e. Ezê çi ji Fedek û xeyrê Fedekê bikim? Halhale sibehî gur zivirîngeha mirov e, wê şûnewarê wî di tarîtî ya wê da pûç bibin û wê behsa wî ji nav behsan rabê; çalikek ku çiqas fireh bikin an gor kûl ser firehîya wê ve zêde bikê, wê kevir û herî bedena mirov ser hevda bişidînin û wê ew axa zehfî zeraqên wê bigirin. Îro ez nefsa xwe pê teqwatî yê dişikînim (xwey dikim) da sibehî, di wê roja dehşeta mezin da êmin bê û li ser wî kendalê cihê şimitînê, xwe ragirê û neşimitê.

Eger ez bixwazim, ez dikarim bighêm hingivî yê safî û kaklê genim û cilên hevrîşim, lê belê pir dûre ku hewayê nefsê ser min bikevê û hirs a min, min bikişênê alîyê bijartina xarinê ve, halhale li hcazê, an li yemenê jar û belengazek hebê ku ne berhêvî ye nanekî dest xwe ve bênê û êkcar bi tama têrîyê nehshaye. An ez şev pê zikê tejî ji xarinê serê xwe deynim ser balgeh û li dûruberê min zikên birsî û cgerên têhnî hebin. Gelo ez wereng bim ku şair dibêjê:

Ev derd ji te ra bese ku şev tu pê zikê têr razêy û li dûruberê te jî ew mirovên birsî (birçî) hebin ku li hesreta çermê karkekî da ne.

وهو عامله على البصرة، وقد بلغه أنه دعي إلى وليمة قوم من أهلها، فمضى إليهم

أَمَّا بَعْدُ، يَابْنَ حُنَيْف، فَقَدْ بَلَغَنِي أَنَّ رَجُلاً مِنْ فِتْيَةِ أَهْلِ الْبَصْرَةِ دَعَاكَ إلى مَأْدُبَة، فَأَسْرَعْتَ إِلَيْهَا، تُسْتَطَابُ لَكَ الأَلْوَانُ، وَتُنْقَلُ إِلَيْكَ الْجِفَانُ، وَمَا ظَنَنْتُ أَنَّكَ تُجِيبُ إِلى طَعَامِ قَوْم، عَائِلُهُمْ مَجْفُوٌّ، وَغَنِيُّهُمْ مَدْعُوٌّ.

فَانْظُرْ إِلَى مَا تَقْضَمُهُ مِنْ هذَا الْمَقْضَمِ، فَمَا اشْتَبَهَ عَلَيْكَ عِلْمُهُ فَالْفِظْهُ، وَمَا أَيْقَنْتَ بِطِيبِ وُجُوهِهِ فَنَلْ مِنْهُ.

أَلاَ وَإِنَّ لِكُلِّ مَأْمُوم إِمَاماً، يَقْتَدِي بِهِ، وَيَسْتَضِيءُ بِنُورِ عِلْمِهِ.

أَلاَ وَإِنَّ إِمَامَكُمْ قَدِ اكْتَفَى مِنْ دُنْيَاهُ بِطِمْرَيْهِ، وَمِنْ طُعْمِهِ بِقُرْصَيْهِ.

أَلاَ وَإِنَّكُمْ لاَ تَقْدِرُونَ عَلَى ذلِكَ، وَلكِنْ أَعِينُوني بِوَرَع وَاجْتِهَاد، وَعِفَّة وَسَدَاد .

فَوَاللهِ مَا كَنَزْتُ مِنْ دُنْيَاكُمْ تِبْراً، وَلاَ ادَّخَرْتُ مِنْ غَنَائِمِهَا وَفْراً،

Gelo ez ji xwe ra bi evî qasî razî bim ku bêjin: Ev mîrê bawerdara ye û ez di zehmetî yên zeman da ne şirîkê xelkê bim? Û li wextê zehmetî yan da ne pêşkarê wan bim? Ez ne ji wî qasî ra hatime afirandin da ez bi xarina tiştên xweş ve mijûl bibim, wek wa dewarên girêdayî (an di gûvan da) ku hemî xema wa ka û gîyayê wa ye, an wek wa heywanên hatîn beredayî kirin ku xema wan çêrîn û xarin û tejî kirina zikê wa ye û ji ser nivîsa ku ji wan ra heye bê xeberin, ez nehatime afirandin ku beredayî bimînim an bêhûde bim, an serê werîsê ji rê derîyê bikêşim, an bikevim ser rêka nedurist û li heyrî bûn û şaşî yê da bimînim.

Heçweku ez dibînim yêk ji hewe dibêjê: Eger xarina korê Ebûtalib ev e, gereke sistî ewî ji kar bêxê li beraberê şerê digel himberên xwe da û li xebata li beraberê mêrbaşan da".

Heyhê! Ew dara li çûlê şîn dibê û mezin dibê qewî tir û dijwartir e ji wa dar û binkên kesk û nazik ku li ber avê şîn dibin; ewa tûşalek naziktir heye. Ew darên dêm û li çûlê şîn dibin, agirê wan xweştire û derengtir ditemrê. Ez û Pêğemberê Xwedê selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin nisbet bi hev wek wê ronahî ya di nav ronahî yê da ne û wek wî destî ne ku pê dêrsekê bi heve hatine danîn (nixwe ez

وَلاَ أَعْدَدْتُ لِبَالِي ثَوْبِي طِمْراً. وَ لاَ حُزْتُ مِنْ أَرْضِهَا شِبْراً وَ لاَ أَخَذْتُ مِنْهُ إِلاَّ كَقُوتِ أَتَانٍ دِبرَةٍ وَ لَهِيَ فِي عَيْنِي أَوْهَى وَ أَوْهَنُ مِنْ عَفْصَةٍ مَقِرَةٍ

بَلَى! كَانَتْ فِي أَيْدِينَا فَدَكٌ مِنْ كلِّ مَا أَظَلَّتْهُ السَّماءُ، فَشَحَّتْ عَلَيْهَا نُفُوسُ قَوْمٍ، وَسَخَتْ عَنْهَا نُفُوسُ آخَرِينَ، وَنِعْمَ الْحَكَمُ اللهُ. وَمَا أَصْنَعُ بِفَدَكٍ وَغَيْرِ فَدَكٍ، وَالنَّفْسُ مَظَانُّهَا فِي غَدٍ جَدَثٌ، تَنْقَطِعُ فِي ظُلْمَتِهِ آثَارُهَا، وَتَغِيبُ أَخْبَارُهَا، وَحُفْرَةٌ لَوْ زِيدَ فِي فُسْحَتِهَا، وَأَوْسَعَتْ يَدَا حَافِرِهَا، لأَضْغَطَهَا الْحَجَرُ وَالْمَدَرُ، وَسَدَّ فُرَجَهَا التُّرَابُ الْمُتَرَاكِمُ، وَإِنَّمَا هِيَ نَفْسِي أَرُوضُهَا بِالتَّقْوَى لِتَأْتِيَ آمِنَةً يَوْمَ الْخَوْفِ الأَكْبَرِ، وَتَثْبُتَ عَلَى جَوَانِبِ الْمَزْلَقِ.

وَلَوْ شِئْتُ لاَهْتَدَيْتُ الطَّرِيقَ، إِلَى مُصَفَّى هذَا الْعَسَلِ، وَلُبَابِ هذَا الْقَمْحِ، وَنَسَائِجِ هذَا الْقَزِّ، وَلكِنْ هَيْهَاتَ أَنْ يَغْلِبَنِي هَوَايَ، وَيَقُودَنِي جَشَعِي إِلَى تَخَيُّرِ الأَطْعِمَةِ ـ وَلَعَلَّ

desta ji rêçka Pêğember (s) nakêşim).

Sond bi Xwedê, eger ‘Ereb hemî pişta hev bigrin û bên şerê min, ez berê xwe jê nazivirînim û eger furset hebê ez bi xwe ezê ji şerê wan ra bilez bikevim. Ji nêzîkve ezê bixebitim ku ‘erdê ji vî şexsê bervajî û fikir xwehr pak bikim wek çawa kuçhûrik û ax ji nav lbên genimê dirûtî tên deranîn û avêtin.

... Di xilasekê da hatîye: Ji min dûr bikeve ey dinya; eve hefsarê te li ser stûê te ye (te bi kû ve bivê here)

Min bi xwe, xwe ji çengalên te (lepê te) xilas kir û ez ji dav û benkên te feltîm û min xwe ji kendal (û şimitîngehên) te dûr girt. Kanê li kûne ew pêşda derbaz bûyên ku te pê leystik û dil berî yên xwe ew xapandîn? Kanên ew ummetên te pê xemla xwe hîle li wan kirî û ji rê deranyîn? Belê, ea ewin ku esîrê qebra bûne û ketine di nav goran da.

Wellahî, eger tu şexsek bîyay ku bihatay dîtin û di qalbekî da bîyay ku ber desta biketay, minê hedê Xwedê li te bida û li ser te carî bikira, ji ber ku te pir bende pê arizûyan xapandine û te pir ummet di kendalan da avêtine û te pir padişah telef kirine û bela ser wan da anîne ku êdî nekarîne pêşda biçin û ne jî paşda bên.

Heyhat! Kesê pîyê xwe di şimitîngeha te da danî, ew şimitî û ket û ewê

بِالْحِجَازِ أَوِ بِالْـيَمَامَةِ مَنْ لاَطَمَعَ لَهُ فِي الْقُرْصِ، وَلاَ عَهْدَ لَهُ بِالشِّـبَعِ ـ أَوْ أَبِيـتَ مِبْطَانـاً وَحَـوْلِي بُطُـونٌ غَرْثَىوَأَكْبَادٌ حَرَّى، أَوْ أَكُونَ كَمَـا قَالَ الْقَائِلُ:

وَحَسْبُكَ دَاءً أَنْ تَبِيتَ بِبِطْنَة
وَحَوْلَكَ أَكْبَادٌ تَحِنُّ إِلَى الْقِدِّ

أَأَقْنَعُ مِنْ نَفْسِـي بِـأَنْ يُقَـالَ: أَمِيرُالْمُـؤْمِنِينَ، وَلاَ أُشَـارِكُهُمْ فِـي مَكَارِهِ الدَّهْرِ، أَوْ أَكُونَ أُسْوَةً لَهُمْ فِي جُشُوبَةِ الْعَيْشِ! فَمَـا خُلِقْـتُ لِيَشْغَلَنِي أَكْلُ الطَّيِّبَـاتِ، كَالْبَهِيمَـةِ الْمَرْبُوطَةِ هَمُّهَا عَلَفُهَا، أَوِ الْمُرْسَـلَةِ شُـغُلُهَا تَقَمُّمُهَـا، تَكْتَـرِشُ مِـنْ أَعْلاَفِهَا، وَتَلْهُو عَمَّا يُـرَادُ بِهَـا، أَوْ أُتْرَكَ سُـدىً، أَوْ أُهْمَـلَ عَابِثـاً، أَوْ أَجُرَّ حَبْـلَ الضَّـلاَلَةِ، أَوْ أَعْتَسِـفَ طَرِيقَ الْمَتَاهَةِ!

وَكَأَنِّي بِقَائِلِكُمْ يَقُولُ: إِذَا كَـانَ هذَا قُوتُ ابْنِ أَبِي طَالِب، فَقَدْ قَعَدَ بِـهِ الضَّـعْفُ عَـنْ قِتَـالِ الأَقْـرَانِ وَمُنَازَلَةِ الشُّجْعَانِ.

gemî li ser ger ava te ajût, ew nûqî bû û kesê xwe ji dav û tûra te veda ew serket û ewê ji ber te bi selamet mayî xema tengasî yê nakê û dinya jê re wek rojekî ye ku berew xilas bûne.

Xwe ji min dûr bike (ey dinya), vêca ez bi Xwedê sond dixum ku ez xwe ji te ra naçemînim da tu min zelîl bikî û ez ser pêşî yê nadim te da vêca tu çawa bixwazî pêşkarî yê bikî.

Ez bi sondek birra û bi vebir bi Xwedê sond dixum ku -elbet xwest û vîyana Xwedê jê der- ez nefsa xwe wisa terbuye bikim ku dema qetek nan peyda bikê keyfxweş bibê û şûna pêxarina da bi xwê razî bibê û qani' bê; û ezê pêşî yê li çavê xwe berdim ku wek kanî ya avê rûndika birêjê heta ava wê çik bibê û rûndik jî xilas bibin.

Gelo wek çawa pez diçêrê û zikê xwe tejî dikê û mexel tê û hêştir xarina xwe dixwê û bêhna Xwe vedidê, 'Elî jî zad û rizqê xwe bixwê, vêca bêhna Xwe vedê û xwe rihet bikê? Eger pişti va salên dirêj ew jî wek wa pez û hêştiran bê ku tên beredayî kirin û diçêrin, çavê wî ronahî!

Xwezka wî kesî, ewê ferz û wacibên Xwedayê xwe pêk anîyî û li ser belaya xwe sebir kirî û şev, xew ji çavê xwe revandî heta xewê xortî lê kirî, xwe ser 'erdê ra dirêj kirî û destê xwe ji xwe ra

أَلاَ وَإِنَّ الشَّجَرَةَ الْبَرِّيَّةَ أَصْلَبُ عُوداً، وَالرَّوَائِعَ الْخَضِرَةَ أَرَقُّ جُلُوداً، وَالنَّابِتَاتِ العِذْيَةَ أَقْوَى وَقُوداً، وَأَبْطَأُ خُمُوداً، وَأَنَا مِنْ رَسُولِ اللهِ (صلى الله عليه وآله) كَالصِّنْوِ مِنَ الصِّنْوِ، وَالذِّرَاعِ مِنَ الْعَضُدِ.

وَاللهِ لَوْ تَظَاهَرَتِ الْعَرَبُ عَلَى قِتَالِي لَمَا وَلَّيْتُ عَنْهَا، وَلَوْ أَمْكَنَتِ الْفُرَصُ مِنْ رِقَابِهَا لَسَارَعْتُ إِلَيْهَا، سَأَجْهَدُ فِي أَنْ أُطَهِّرَ الأَرضَ مِنْ هذَا الشَّخْصِ الْمَعْكُوسِ، وَالْجِسْمِ الْمَرْكُوسِ، حَتَّى تَخْرُجَ الْمَدَرَةُ مِنْ بَيْنِ حَبِّ الْحَصِيدِ.

إِلَيْكَ عَنِّي يَا دُنْيَا، فَحَبْلُكِ عَلَى غَارِبِكِ، قَدِ انْسَلَلْتُ مِنْ مَخَالِبِكِ، وَأَفْلَتُّ مِنْ حَبَائِلِكِ، وَاجْتَنَبْتُ الذَّهَابَ فِي مَدَاحِضِكِ.

أَيْنَ الْقُرُونُ الَّذِينَ غَرَرْتِهِمْ بِمَدَاعِبِكِ؟! أَيْنَ الأُمَمُ الَّذِينَ فَتَنْتِهِمْ بِزَخَارِفِكِ؟! هَا هُمْ رَهَائِنُ الْقُبُورِ، وَمَضَامِينُ اللُّحُودِ.

وَاللهِ لَوْ كُنْتِ شَخْصاً مَرْئِيّاً،

kirî balgî, ew jî di nav wan kesan da ewên ji tirsa qîyametê şev hişyar mayîn û li tenişta wan kesan da ewên ji tirsa qîyametê şev hişyar mayîn û tenişta wan ji cihnvêna dûr mayîn û lêvên wan ji ber zikrê Xwedayê wan li hev ketîn û pist pist kirîn û ji ber îstîxfara zehfî gonehên wan ji wan hatîn birin û helhayîn. "***Ew hizba Xwedê ne; heyhê! Bi rastî yên serketî hizba Xwedê ne***" [139]

Vêca ey korê Hûneyf! Ji Xwedê bitirse û pê çend tûtik nanê xwe bes bike û razî be, da tu ji agir xilas bibî.

۞ NIVÎSOKA 46 ۞

Ji "kar bi dest"ek yê xwe ra nivîsî ye (gotine Malikê Eşter bûye. 38 h.)

... Tu ji wan kesanî ku ji ragirtina dîn ra ez piştîvanî yê ji wan digirim û pê wan ez serkêşî ya gonehkaran têk didim û hed û sînorên tirs têda heyîn ez pê wan qayîm dikim. Vêca çi karê tu dixwazî bikî di wê da arîkarîyê ji Xwedê bixwaze û dijwarîyê tevlî hinek ji nermîyê bike û digel wî yê bûrandin digel wî baştir, biborîne wextê xêncî dijwarîyê te çare nemînê dijwarîyê bike û xwe ji xelkê ra bişkîne û rû vekirî û exlaq nerm be ji wan ra. Di berdan (berê xwe dan) û nêrîn û

وَقَالَباً حِسِّيّاً، لاَقَمْتُ عَلَيْكِ حُدُودَ اللهِ فِـي عِبَـادِ غَـرَرْتِهِمْ بِالأَمَـانِي، وَأُمَم أَلْقَيْتِهِمْ فِي الْمَهَاوِي، وَمُلُوك أَسْلَمْتِهِمْ إِلَى التَّلَـفِ، وَأَوْرَدْتِهِـمْ مَوَارِدَ الْبَلاَءِ، إِذْ لاَ وِرْدَ وَلاَ صَدَرَ!

هَيْهَاتَ! مَنْ وَطِىءَ دَحْضَكِ زَلِـقَ، وَمَنْ رَكِبَ لُجَجَـكِ غَـرِقَ، وَمَـنِ ازْوَرَّ عَنْ حَبَائِلِكِ وُفِّـقَ، وَالسَّـالِمُ مِنْكِ لاَيُبَالِي إِنْ ضَاقَ بِـهِ مُنَاخُـهُ، وَالدُّنْيَا عِنْدَهُ كَيَوْم حَانَ انْسِلاَخُهُ.

اعْزُبِي عَنِّي! فَوَاللهِ لاَ أَذِلُّ لَـكِ فَتَسْـتَذِلِّينِي، وَلاَ أَسْـلَسُ لَـكِ فَتَقُودِينِي.

وَايْـمُ اللهِ يَمِينـاً أَسْـتَثْنِي فِيهَـا بِمَشِـيئَةِ اللهِ عَزَّوَجَـلّ ـ لأَرُوضَـنَّ نَفْسِي رِيَاضَـةً تَهِـشُّ مَعَهـا إِلَـى الْقُرْصِ إِذَا قَدَرتْ عَلَيْـهِ مَطْعُومـاً، وَتَقْنَعُ بِـالْمِلْحِ مَأْدُومـاً; وَلأَدَعَـنَّ مُقْلَتِي كَعَـيْنِ مَـاء نَضَـبَ مَعِينُهَـا مُسْتَفْرِغَةً دُمُوعَهَا.

أَتَمْتَلِىءُ السَّـائِمَةُ مِـنْ رِعْيِهَـا فَتَبْرُكَ؟ وَتَشْبَعُ الرَّبِيضَةُ مِنْ عُشْبِهَا

işare û selam danê da ji hemîyan ra wek hev be, da ku mezin li zulm kirinê da ji te hêvîdar nebin û yên ze'êf jî ji 'edaleta te bê hêvî nebin. Êdî xweşîya te.

۞ WESÎYET 47 ۞

Dema ibn Mulcemê ji Xwedê dûr derb lê dayî, şîret li Hesen û Huseyn (s) kirîye:

Ez şîreta teqwatî ya Xwedê li hewe herdûka dikim, evê jî ku hûn dinyaxwaz nebin herçend dinya bi destê hewe ve bê û hewe bixwazê; heçî kar û tiştek ya dinyayê ku ji destê hewe biçê, xema wê nekin; bi heqî xeber bidin û biaxivin û ji xêrê ra kar bikin û dijminê zaliman û arîkarê mezlûma bin.

Ez wesîyet dikim li hewe herdûka û hemî zarûk û ehlê mala xwe û heçî kesê nivîsoka min bighêtê, ku teqwatî ya Xwedê bi cî bînin û karên xwe rêk û pêk bikin û li hev hatinê di nav xwe da çêkin.

Çiko bi rastî min ji kalkê hewe resûlê Xwedê selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin gohlê bû ku kerem kir: li hev hatin û li hev anîn ji salek nimêj û rojîyê seratir e.

Derheq yetîman da, Xwedê ji bîr nekin, Xwedê! Newebê ku hûn carna ewa têr bikin û carnan birsî bimînin; bila ew li bal hewe zay nebin û telef nebin.

Derheq cîranê xwe da, Xwedê ji bîr nekin, Xwedê! Çiko bi rastî wesîyeta

فَتَرْبِضَ؟ وَيَأْكُلُ عَلِيٌّ مِنْ زَادِهِ فَيَهْجَعَ؟ قَرَّتْ إِذاً عَيْنُهُ إِذَا اقْتَدَى بَعْدَ السِّنِينَ الْمُتَطَاوِلَةِ بِالْبَهِيمَةِ الْهَامِلَةِ، وَالسَّائِمَةِ الْمَرْعِيَّةِ!

طُوبَى لِنَفْسٍ أَدَّتْ إِلَى رَبِّهَا فَرْضَهَا، وَعَرَكَتْ بِجَنْبِهَا بُؤْسَهَا، وَهَجَرَتْ فِي اللَّيْلِ غُمْضَهَا، حَتَّى إِذَا غَلَبَ الْكَرَى عَلَيْهَا افْتَرَشَتْ أَرْضَهَا، وَتَوَسَّدَتْ كَفَّهَا، فِي مَعْشَرٍ أَسْهَرَ عُيُونَهُمْ خَوْفُ مَعَادِهِمْ، تَجَافَتْ عَنْ مَضَاجِعِهِمْ جُنُوبُهُمْ، وَهَمْهَمَتْ بِذِكْرِ رَبِّهِمْ شِفَاهُهُمْ، وَتَقَشَّعَتْ بِطُولِ اسْتِغْفَارِهِمْ ذُنُوبُهُمْ [(أُولئِكَ حِزْبُ اللهِ، أَلاَ إِنَّ حِزْبَ اللهِ هُمُ الْمُفْلِحُونَ)

فَاتَّقِ اللهَ يَابْنَ حُنَيْفٍ، وَلْتَكْفُفْ أَقْرَاصُكَ، لِيَكُونَ مِنَ النَّارِ خَلاَصُكَ].

[46]

إلى بعض عمّاله

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنَّكَ مِمَّنْ أَسْتَظْهِرُ بِهِ عَلَى إِقَامَةِ الدِّينِ، وَأَقْمَعُ بِهِ نَخْوَةَ الأَثِيمِ، وَأَسُدُّ بِهِ لَهَاةَ الثَّغْرِ

Pêğemberê hewe derheq wan da heye; ewî (s) ileh derheq wan da şîret dikiran, heta me guman kir ku wê ji wan ra mîratê deynê (ewa bikê mîratber).

Derheq Qur'anê da Xwedê ji bîr nekin, Xwedê! Bila yên dî li 'emel kirina wê da, pêşîyê ji hewe nestînin.

Derheq nimêjê da Xwedê ji bîr nekin, Çiko ew sitûna dînê hewe ye.

Derheq mala Xudayê xwe da, Xwedê ji bîr nekin, Xwedê! Heta hûn hene ewê vale nehêlin, bi rastî eger hûn terka wê bikin muhlet ji hewe re nayê dayîn (wê kerameta hewe ji dest biçê).

Ji cihada bi mal û can û ziman, di rêka Xwedê da, Xwedê ji bîr nekin. Bila hevgirtin di nav hewe da hebê û hûn digel hev danê bikin û newebê hûn pişt bidin hev û ji hev vebin.

Emrê bi me'rûf û nehya ji munker terk nedin ku pîsekên hewe bibin hukumdar li ser hewe, ku paşê jî vêca hûn di'a bikin û di'a hewe qebûl nebê.

Paşê vêca wiha got: Ey zarokên 'Ebdulmutellib, newebê paş min hûn gazî bikin û bêjin: "mîrê bawerdaran hat kuştin" û hûn xûna muslimana birêjin. Heyhê, bizanin! Muheqeq ji ber min ve, xêncî qatilê min neyê kuştin.

Bisekinin û bimînin hêvîyê, eger ez ji ber vê derba wî bêm kuştin, hûn jî yêk derbê li wî bidin; qet û endamên

الْـمَخُوفِ.

فَاسْتَعِنْ بِاللهِ عَلَـى مَـا أَهَمَّـكَ، وَاخْلِطِ الشِّدَّةَ بِضِـغْث مِـنَ اللِّـينِ، وَارْفُقْ مَا كَانَ الرِّفْقُ أَرْفَقَ، وَاعْتَـزِمْ بِالشِّـدَّةِ حِـينَ لاَ تُغْنِـي عَنْـكَ إِلاَّ الشِّدَّةُ،

وَاخْفِـضْ لِلرَّعِيَّـةِ جَنَاحَـكَ، وَابْسِـطْ لَهُـمْ وَجْهَـكَ وَأَلِـنْ لَهُـمْ جَانِبَكَ، وَآسِ بَيْـنَهُمْ فِـي اللَّحْظَـةِ وَالنَّظْرَةِ، وَالإِشَارَةِ وَالتَّحِيَّةِ، حَتَّـى لاَ يَطْمَعَ الْعُظَمَاءُ فِي حَيْفِكَ، وَلاَ يَيْأَسَ الضُّعَفَاءُ مِنْ عَدْلِكَ، وَالسَّلاَمُ.

[**47**]

ومن وصية له للحسن والحسين(ع) لما ضربه ابن ملجم لعنه الله

أُوصِـيكُمَا بِتَقْـوَى اللهِ، وَأَنْ لاَ تَبْغِيَا الدُّنْيَا وَإِنْ بَغَتْكُمَا، وَلاَ تَأْسَـفَا عَلَى شَيْءٍ مِنْهَا زُوِيَ عَنْكُمَا، وَقُولاَ بِـالْحَقِّ، وَاعْمَـلاَ لِلأَجْـرِ، وَكُونَـا لِلظَّالِمِ خَصْماً، وَلِلْمَظْلُومِ عَوْناً.

أُوصِـيكُمَا، وَجَمِيـعَ وَلَـدِي وَأَهْلِي وَمَنْ بَلَغَهُ كِتَابِي، بِتَقْـوَى اللهِ، وَنَظْمِ أَمْرِكُمْ، وَصَلاَحِ ذَاتِ

bedena wî nebirin, çiko min ji Pêğember selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin seh kir digota: Newebê hûn qet û endaman bibirin û jê vekin, heta eger seyê har bê.

بَيْنكُمْ، فَـإِنِّي سَـمِعْتُ جَـدَّكُمَا صَلَّى اللهُ عَلَيْهِ وَآلِهِ وَسَلَّمَ يَقُولُ: "صَلاَحُ ذَاتِ الْبَيْنِ أَفْضَـلُ مِـنْ عَامَّةِ الصَّلاَةِ الصِّيَامِ".

NIVÎSOKA 48

Ji Mu'awîye ra: Rastî, zulm û derew, dîn û dinya mirov pûç dikin û kêmasî yên wî li bal 'eyb çêkeran eşkere dikin, te baş zanîye ku tu nagîjî wê ya ji dest çûyî, hineka qesta karek nedurist kirin û hukmê Xwedê te'wîl kirin û Xwedê ew bi derew êxistin,

Vêca bitirse ji wê rojê ku ewê dûmahîka karê wî qenc û cihê pesn danê, keyfxweşe û heçî hefsarê xwe dayî destê şeytan û ji xilasî ya xwe ra berberekanî ya wî nekirî pûşman e.

Te em bi alîyê hukmê Qur'anêve gazî kirin, halhale tu ne ehlê wê yî. Me jî cewaba te neda, lê belê em ketin pey hukmê Qur'anê. Êdî temam.

اللهَ اللهَ فِي الأَيْتَامِ، فَلاَ تُغِبُّـوا أَفْـــوَاهَهُمْ، وَلاَ يَضِـــيعُوا بِحَضْرَتِكُمْ.

وَاللهَ اللهَ فِي جِيرَانِكُمْ، فَإِنَّهُمْ وَصِيَّةُ نَبِيِّكُمْ، مَا زَالَ يُوصِي بِهِمْ حَتَّى ظَنَنَّا أَنَّهُ سَيُوَرِّثُهُمْ.

وَاللهَ اللهَ فِـــي الْقُـــرْآنِ، لاَ يَسْبِقُكُمْ بِالْعَمَلِ بِهِ غَيْرُكُمْ.

وَاللهَ اللهَ فِـي الصَّـلاَةِ، فَإِنَّهَـا عَمُودُ دِينِكُمْ.

وَاللهَ اللهَ فِـي بَيْـتِ رَبِّكُـمْ، لاَ تُخْلُوهُ مَا بَقِيتُمْ، فَإِنَّهُ إِنْ تُرِكَ لَـمْ تُنَاظَرُوا.

وَاللهَ اللهَ فِي الْجِهَـادِ بِـأَمْوَالِكُمْ وَأَنْفُسِكُمْ وَأَلْسِنَتِكُمْ فِي سَـبِيلِ اللهِ. وَعَلَـــيْكُمْ بِالتَّوَاصُـــلِ وَالتَّبَـــاذُلِ، وَإِيَّاكُمْ وَالتَّدَابُرَ وَالتَّقَاطُعَ.

لاَ تَتْرُكُـوا الأَمْـرَ بِـالْمَعْرُوفِ

NIVÎSOKA 49

Ji Mu'awîye re nivîsîye: ... Dinya wereng mirova bi xwe ve mijûl dikê ku ji tiştên dî bê xeber dimînê. Dinyaxwaz ji dinyayê feydeyekî nabînê, xêncî ku ser hirs û kulbûtî ya wîve zêde dibê û ewa ji wê bi dest wîve hatî, ewî bê ihtîyac nakê ji wê ya dest wîve nehatî. Di pey ra vêca cida dibê ji wê ya kom

kirî û xirab dikê ewa ji xwe ra qayîm kirî. Eger tu ji wê ya derbaz bûyî ‘ibretê bigirî, tê bikarî ewa mayî ji xwe ra biparêzî û xwey bikî. Êdî temam.

NIVÎSOKA 50

Ji serok ‘eskeran ra: Ji ebdê Xwedê ‘Elî yê korê Ebûtalb, mîrê bawerdarin, ji bo parêzerên sînoran. ...

Heq e ku eger malek ket destê walî da, an ni’metek jê re hat dayîn, digel xelkê wek xwe bimînê û goherîn nekevê halê wî, lazime ku ew ni’meta Xwedê dayîyê bibê sebeb ku pitir nêzîkê bendeyên Xwedê bibê û digel biraderên xwe dilovantir bibê.

Heyhê! Heqê hewe li ser min heyî ev e ku xêncî xef ên şer, ez ji hewe neveşêrim û xêncî pêk anîna hukmê Xwedê, ez bêy meşwereta digel hewe nekim û ez heqê hewe ji cîyê wê paşve nedim û heta ez ewê cî nekim ez nerûnêm û nesekinim, yêk jî ev ku di heq da hûn li bal min beraber bin.

Vêca eger min we kir hingê ni’meta Xwedê li ser hewe hatîye deynan û lazime ku hûn jî gohdarê min bin û eger min gazî hewe kir, hûn xwe paşda nedin û di karê durist û ava kirinê da hûn qsûrîyê nekin û hûn di rêka heqîyê da xwe bidin zehmetê.

وَالنَّهْيَ عَنِ الْمُنْكَرِ فَيُـوَلَّى عَلَـيْكُمْ أَشْرَارُكُمْ، ثُمَّ تَدْعُونَ فَلاَ يُسْتَجَابُ لَكُمْ.

ثمّ قال: يَا بَنِي عَبْدِ الْمُطَّلِبِ، لاَ أُلْفِيَنَّكُمْ تَخُوضُونَ دِمَاءَ الْمُسْـلِمِينَ خَوْضاً، تَقُولُونَ: قُتِلَ أَمِيرُالْمُؤْمِنِينَ. أَلاَ لاَ تَقْتُلُنَّ بِي إِلاَّ قَاتِلِي.

انْظُرُوا إِذَا أَنَا مِتُّ مِنْ ضَـرْبَتِهِ هذِهِ، فَاضْرِبُوهُ ضَـرْبَةً بِضَـرْبَة، وَلاَ يُمَثَّلُ بِالرَّجُلِ، فَإِنِّي سَمِعْتُ رَسُولَ الله صلى الله عليه وآله يَقُـولُ: "إِيَّـاكُمْ وَالْمُثْلَةَ وَلَوْ بَالْكَلْبِ الْعَقُورِ".

[48]

إلى معاوية

وَإِنَّ الْبَغْيَ وَالزُّورَ يُوتِغَانِ الْمَرْء فِي دِينِهِ وَدُنْيَاهُ، وَيُبْدِيَانِ خَلَلَهُ عِنْدَ مَنْ يَعِيبُهُ، وَقَدْ عَلِمْتُ أَنَّكَ غَيْرُ مُدْرِك مَا قُضِيَ فَوَاتُهُ، وَقَدْ رَامَ أَقْوَامٌ أَمْراً بِغَيْرِ الْحَقِّ، فَتَأَوَّلوا عَلَى الله فَأَكْذَبَهُمْ.

فَاحْذَرْ يَوْماً يُغْتَبطُ فِيهِ مَنْ أَحْمَدَ عَاقِبَةَ عَمَلِهِ، وَيَنْدَمُ مَنْ أَمْكَنَ الشَّيْطَانَ مِنْ قِيَادِهِ فَلَمْ يُجَاذِبْهُ.

وَقَدْ دَعَوْتَنَا إِلَى حُكْمِ الْقُرْآنِ وَلَسْتَ مِنْ أَهْلِهِ، وَلَسْنَا إِيَّاكَ أَجَبْنَا،

Vêca eger li vê yêkê da hûn digel min neserast bin û xwe ranegirin, kes ji hewe li bal min kêmtir û bê qîmet tir nîne ji wî kesê ku xwehr bibê.

Di peyda jî ezê cezayek mezin bidimê û ji ber wê yêkê çi rêka xilasî û lê bûrînê li bal min nîne. Vêca evê ji mezinên xwe bigrin û di wê tiştê da ewa Xwedê pê wê karê hewe li hev tênê, gohdarê wan bin. Êdî di nav xweşîyê da bin.

NIVÎSOKA 51

Ji kar bi dest ên xwe ra, ewên beytulmal kom dikiran.

Ji ‘evdê Xwedê, ‘Elî, mîrê bawerdaran, ji bona “kar bi dest”ên xeracê...

Kesê ji wê ya bi wî alîyîve diçê (qîyamet) netirsê ewa ku ewê biparêzê (karê qenc) pêşîya xwe da narêkê, bizanin ewa ji pêk anîna wê ra teklîf li hewe hatî kirin, kême, lê, xêra wê zehfe. Eger li ser wê ya Xwedê nehya hewe jê kirî, wek zulm û zêdegavîyê, cezadanek ku mirov jê bitirsin tinebîya jî, di Xwe vedana ji wan da ewqas xêr heye ku ji terka wan ra çi bihane nemînin.

Vêca nixwe bi insaf, digel xelkê rabin rûnên û li pêk anîna ihtîyacî yên wan da sebirdar bin, çiko bi rastî hûn xeznedarên xelkê û wekîlên ummetê û hinartî yên imama ne.

Kesî ji ber pêk anîna ihtîyacî ya wî

وَلَكِنَّا أَجَبْنَا الْقُرْآنَ إلى حُكْمِهِ، وَالسَّلاَمُ.

[49]

ومن كتاب له عليه السلام إليه

أَمَّا بَعْدُ، فَإِنَّ الدُّنْيَا مَشْغَلَةٌ عَنْ غَيْرِهَا، وَلَمْ يُصِبْ صَاحِبُهَا مِنْهَا شَيْئاً إِلاَّ فَتَحَتْ لَهُ حِرْصاً عَلَيْهَا، وَلَهَجاً بِهَا، وَلَنْ يَسْتَغْنِيَ صَاحِبُهَا بِمَا نَالَ فِيهَا عَمَّا لَمْ يَبْلُغْهُ مِنْهَا، وَمِنْ وَرَاء ذلِكَ فِرَاقُ مَا جَمَعَ، وَنَقْضُ مَا أَبْرَمَ لَوِ اعْتَبَرْتَ بِمَا مَضَى حَفِظْتَ مَا بَقِيَ، وَالسَّلاَمُ.

[50]

إلى أمرائه على الجيوش

مِنْ عَبْدِالله عَلِيٍّ أَمِيرِالْمُؤْمِنِينَ إِلَى أَصْحَابِ الْمَسَالِحِ: أَمَّا بَعْدُ.

فَإِنَّ حَقّاً عَلَى الْوَالِي أَلاَّ يُغَيِّرَهُ عَلَى رَعِيَّتِهِ فَضْلٌ نَالَهُ، وَلاَ طَوْلٌ خُصَّ بِهِ وَأَنْ يَزِيدَهُ مَا قَسَمَ اللهُ لَهُ مِنْ نِعَمِهِ دُنُوّاً مِنْ عِبَادِهِ، وَعَطْفاً عَلَى إِخْوَانِهِ.

أَلاَ وَإِنَّ لَكُمْ عِنْدِي أَلاَّ أَحْتَجِزَ دُونَكُمْ سِرّاً إِلاَّ فِي حَرْبٍ، وَلاَ

neynin xezebê û ewî ji xwesta wî paşda nedin, ji girtina xeracê ra cilkên havînî û zivistanî yên xelkê û dewarên ku pê wan kar dikin û bendên wan, nefirûşin.

Û ji ber hinek pare (diraf) ve pê şiva, li kesî nedin û dest neavêjin malê kesî ji xelkê, çi nimêjker bê (muslman bê) û çi jî "Ehlê zmmetê" bê. Xêncî wî hespî an çekî ku hûn li bal wan peyda dikîn ku pê wan zêdegavîyan bikin di heqê muslimanan da, çiko neheqî ye ku musliman eva tişta di destê dijminê Islamê da bihêlê da bibê sebebê bi hêz ketina wan li dijê Islamê da.

Xwe ji şîret kirin û xêrxwazî ya xelkê û qencî kirina digel leşker û arîkarî ya xelkê paşda nedin û li qewî kirina dînê Xuda da sistîyê nekin; ewa li ser hewe wacib bûyî ji bona Xwedê bi cî bînin. Çiko Xwedayê subhan ji me û hewe xwestî ye ku çiqa ji me bê em şukrê wî bikîn û qas quwet û karîna xwe em ji (dînê) Wî ra arîkarîyê bikîn; û hemî qudret û karîn, ji Xwedayê bilind û mezine.

۞ NIVÎSOKA 52 ۞

Derheq wextên nimêjê da ji mezinên welata ra nivîsîye:

... Nimêja nîvrû digel xelkê bikin heta ku sîbera rojê qas mexel hatina bizinê lê bê.

أَطْوِيَ دُونَكُمْ أَمْراً إِلاَّ فِي حُكْـم، وَلاَ أُؤَخِّرَ لَكُمْ حَقّـاً عَـنْ مَحَلِّـهِ، وَلاَ أَقِـفَ بِـهِ دُونَ مَقْطَعِـهِ، وَأَنْ تُكُونُوا عِندِي فِي الْحَقِّ سَوَاءً،

فَإِذَا فَعَلْتُ ذٰلِـكَ وَجَبَـتْ لله عَلَـيْكُمُ النِّعْمَـةُ، وَلِـي عَلَـيْكُمُ الطَّاعَةُ، وَأَلاَّ تَنْكُصُوا عَنْ دَعْـوَة، وَلاَ تُفَرِّطُـوا فِـي صَـلاَح، وَأَنْ تَخُوضوا الْغَمَرَاتِ إِلَى الْحَقِّ.

فَإِنْ أَنْتُمْ لَـمْ تَسْـتَقِيمُوا لِـي عَلَى ذٰلِكَ لَمْ يَكُـنْ أَحَـدٌ أَهْـوَنَ عَلَيَّ مِمَّنْ اعْوَجَّ مِنْكُمْ.

ثُمَّ أُعْظِـمُ لَـهُ الْعُقُوبَـةَ، وَلاَ يَجِدُ عِنْدِي فِيها رُخْصَةً، فَخُـذُوا هذَا مِنْ أُمَرَائِكُمْ، وَأَعْطُـوهُمْ مِـنْ أَنْفُسِكُمْ مَا يُصْلِحُ اللهُ بِهِ أَمْرَكُمْ.

[51]

إلى عماله على الخراج

مِنْ عَبْدِ الله عَلِيّ أَمِيرِالْمُـؤْمِنِينَ إِلَى أَصْحَابِ الْخَرَاجِ: أَمَّا بَعْدُ.

فَإِنَّ مَنْ لَمْ يَحْذَرْ مَا هُوَ صَائِرٌ إِلَيْهِ لَمْ يُقَدِّمْ لِنَفْسِهِ مَـا يُحْرِزُهَـا.

Û ya ‘esrê (êvarê) digel wan hingê bikin hêca roj ronahî û geş ku pêşîya çûn xara wê da mirov bikarê qas dû fersexan bi rê biçê.

Nimêja mexrebê jî hingê bikin ku yê birojî fitara xwe vekê û hecî (ji ‘erefê derdikevin û) bi alîyê minayêve bikevin rê.

Û nimêja ‘eşayê jî digel wan hingê bikin ku şefeq xef bibê û sê yêkek ji şevê derbaz bibê.

Nimêja sibehî jî digel wan hingê bikin ku mirov rûyê hevalê xwe nas bikê.

Digel wan wereng nimêj bikin ku munasibê halê ze’îftirînê wan bê û nebin ji fitneçêkeran.

NIVÎSOKA 53

Ji Malikê Eşter ra nivîsîye dema ew kirî walî yê Misrê û dûr û berê wê; hingê ku karûbarê walî yê wê, Muhemmedê korê Ebûbekir têkel û tevhev bûyî. Ev nivîsok ji dirêjtirîn nivîsok û fermanên wî ne û gelek gotinên xweş û spehî têda berhev bûne.

Bismillahî-r Rehman-îr Rehîm. Ev fermaneke ji bende yê Xuda ‘Elî; mîrê bawerdaran, ji bona Malikê korê Harisê Eşter, dema ew kirî walî yê Misrê ev ferman dayîyê, da ku xeraca wê kom bikê û digel dijminê wê bikevê şer û karûbarê xelkê wê serheve bênê û durist

وَاعْلَمُوا أَنَّ مَا كُلِّفْتُمْ يَسِيرٌ، وَأَنَّ ثَوَابَهُ كَثِيرٌ، وَلَوْ لَمْ يَكُنْ فِيمَا نَهَى اللهُ عَنْهُ مِنَ الْبَغْيِ وَالْعُدْوَانِ عِقَابٌ يُخَافُ لَكَانَ فِي ثَوَابِ اجْتِنَابِهِ مَا لاَ عُذْرَ فِي تَرْكِ طَلَبِهِ.

فَأَنْصِفُوا النَّاسَ مِنْ أَنْفُسِكُمْ، وَ اصْبِرُوا لِحَوَائِجِهِمْ، فَإِنَّكُمْ خُزَّانُ الرَّعِيَّةِ وَوُكَلاَءُ الأُمَّةِ وَسُفَرَاءُ الأَئِمَّةِ.

وَلا تَحْسِمُوا أَحَداً عَنْ حَاجَتِهِ ولاتَحْبِسُوهُ عَنْ طَلِبَتِه وَلاَ تَبِيعُنَّ لِلنَّاسِ فِي الْخَرَاجِ كِسْوَةَ شِتَاء وَلاَ صَيْف ولاَ دَابَّةً يَعْتَمِلُونَ عَلَيْهَا ولا عَبداً.

وَلاَ تَضْرِبُنَّ أَحَداً سَوْطاً لِمَكَانِ دِرْهَم، وَلاَ تَمَسُّنَّ مَالَ أَحَد مِنَ النَّاسِ، مُصَلٍّ وَلاَ مُعَاهَد، إِلاَّ أَنْ تَجِدُوا فرَساً أَوْ سِلاَحاً يُعْدى بِهِ عَلَى أَهْلِ الأِسْلاَمِ، فَإِنَّهُ لاَ يَنْبَغِي لِلْمُسْلِمِ أَنْ يَدَعَ ذلِكَ فِي أَيْدِي أَعْدَاء الأِسْلاَمِ، فَيَكُونَ شَوْكَةً عَلَيْهِ.

وَلاَ تَدَّخِرُوا أَنْفُسَكُمْ نَصِيحَةً، وَلاَ الْجُنْدَ حُسْنَ سِيرَة، وَلاَ الرَّعِيَّةَ مَعُونَةً، وَلاَ دِينَ اللهِ قُوَّةً، وَأَبْلُوا

bikê û gond û bajarên wê ava bikê.

Emrê wî dikê bi teqwatîya ilahî û evê ku gohdan û ta'etê wî ser hemî tiştî ra bigirê û bikevê pey wê ya di kitêba Wî (Qur'anê) da destûr pê hatî dayîn, ji ferz û sunnetên ku xêncî bi 'emel kirina bi wan kes nagihê bextewerîyê û bextreşî çênabê xêncî bi inkar kirin û ji nav birina wan.

Û (emrê wî dikê ku) arîkarî ya Xwedê bikê bi dil û dest û zimanê xwe, çiko bi rastî Xweda yê Celîl arîkarî ya wî yê arîkarî ya wî bikê û bi hêz êxistina wî yê ewî bi hêz bêxê, li xwe girtîye.

Her wiha emrê wî dikê (fermanê didîyê) ku li bal şehwetan nefsa xwe bşikênê û di wextê hêç bûnê da pêşîya wê bigirê, çiko bi rastî nefs ileh emrê bi xirabîyê dikê, xêncî ku Xuda rehm bikê.

Dipey ra jî, evê bizanbe, ey Malik, rastî ev e ku min tu bi alîyê welatekî ve rêkirî ku pêşîya te da dewlet û hukmetên bi 'edalet û zalimane, dîtine, xelk jî bi wî çavî berê xwe didin karê te, ku tu berê xwe didî karên walî yên pêşîya xwe da; derheq te da wê ewê bêjin, ewa tu derheq wan da dibêjî. Qenc kar jî bi wê çendê tên nas kirin (mirov ji nas kirina wan ra rênimûn dibê) ewa Xwedê derheq wan da tênê ser zimanê bendeyên xwe.

فِي سَبِيلِ اللهِ مَا اسْتَوْجَبَ عَلَيْكُمْ، فَإِنَّ اللهَ سُبْحَانَهُ قَدِ اصْطَنَعَ عِنْدَنَا وَعِنْدَكُمْ أَنْ نَشْكُرَهُ بِجُهْدِنَا، وَأَنْ نَنْصُرَهُ بِمَا بَلَغَتْ قُوَّتُنَا، وَلاَ قُوَّةَ إِلاَّ بِاللهِ.

[52]

إلى أمراء البلاد في معنى الصلاة

أَمَّا بَعْدُ، فَصَلُّوا بَالنَّاسِ الظُّهْرَ حَتَّى تَفِيءَ الشَّمْسُ مِنْ مَرْبِضِ الْعَنْزِ.

وَصَلُّوا بِهِمُ الْعَصْرَ وَالشَّمْسُ بَيْضَاءُ حَيَّةٌ فِي عُضْوٍ مِنَ النَّهَارِ حِينَ يُسَارُ فِيهَا فَرْسَخَانِ.

وَصَلُّوا بِهِمُ الْمَغْرِبَ حِينَ يُفْطِرُ الصَّائِمُ، وَيَدْفَعُ الْحَاجُّ.

وَصَلُّوا بِهِمُ الْعِشَاءَ حِينَ يَتَوَارَى الشَّفَقُ إِلَى ثُلُثِ اللَّيْلِ.

وَصَلُّوا بِهِمُ الْغَدَاةَ والرَّجُلُ يَعْرِفُ وَجْهَ صَاحِبِهِ.

وَصَلُّوا بِهِمْ صَلاَةَ أَضْعَفِهِمْ، وَلاَ تَكُونُوا فَتَّانِينَ.

[53]

ومن عهد له عليه السلام كتبه

nixwe bila şîrîntirîn berhev kirin (û zexîre kirin) li bal te berhev kirina karê qenc bê, vêca hewayê nefsa xwe bi dest xwe bigire û ji nefsa xwe re di wê ya jê re nehelal ra bexîl be (xwesta wê nedîyê) çiko bi rastî bexîletî ya digel nefsê di wê da ewa jê hez dikê û jê dikirhênê, rêka insafê ye.

Dilovanîya ji xelkê ra û hez kirina ji wan û lutf kirina digel wan bêxe dilê xwe,j wan ra newek wî heywanê dirinde be ku tu xarina wan ji xwe ra xenîmet û furset bizanî, çiko ew dû destene: An di dîn da birayê tene, an jî di afirandinê da wek tene (insan in), wê xeletî ji wan çêbin û nexweşî ser wan da bên û bi qest an bi nezanîn wê şimitîn jî ji wan peyda bibin, vêca tu ji ‘efû kirin û lêbûrîna xwe bide wan, wek çawa ku tu hez dikî û dixwazî Xwedê jî ji ‘efû kirin û lêbûrîna xwe bidê te. Çiko tu ser wan ra yî û serokê te jî ser te ra ye û Xuda jî ser wî ra ye ewê tu kirî serok; rêk xistina karûbarê wan ji te xwestîye û tu pê wan imtihan kirîyî.

Xwe li ber şerê digel Xwedê venede, çiko bi rastî te li beraberê xezeba wî da çi karîn (destê berevanîyê) nîne û tu ji ‘efû kirin û rehmeta wî bê ihtîyac nînî. Û ji ber ‘efû kirinekî, qet pûşman nebe ji ber ceza danekî jî qet şahî nebe, qet bi alîyê wê xezebêve bilez nekeve ewa ku te çara xilasî ya ji wê heyî, qet nebêje: Ez ser

للاشتر النَّخَعي رحمه الله **لمّا ولاه على مصر وأعمالها حين اضطرب أمر محمّد بن أبي بكر** رحمه الله. **وهو أطول عهد كتبه وأجمعه للمحاسن:**

بسمِ اللهِ الرَّحمنِ الرَّحيم

هذَا مَا أَمَرَ بِهِ عَبْـدُ اللهِ عَلِـيٌّ أَميرُ الْمُؤْمِنينَ، مَالِكَ بْنَ الْحَارِثِ الأَشْتَرَ فِي عَهْدِهِ إِلَيْهِ، حِـينَ وَلاَّهُ مِصْـرَ: جِبْـوةَ خَرَاجِهَـا، وَجِهَـادَ عَـدُوِّهَا، وَاسْتِصْـلاَحَ أَهْلِهَـا، وَعِمَارَةَ بِلاَدِهَا.

أَمَرَهُ بِتَقْوَى اللهِ، وَإِيثَارِ طَاعَتِهِ، وَاتِّبَاعِ مَا أَمَرَ بِهِ فِـي كِتَابِـهِ: مِـنْ فَرَائِضِهِ وَسُـنَنِهِ، الَّتِـي لاَ يَسْـعَدُ أَحَدٌ إِلاَّ بِاتِّبَاعِهَـا، وَلاَ يَشْـقَى إِلاَّ مَعَ جُحُودِهَا وَإِضَاعَتِهَا.

وَأَنْ يَنْصُرَ اللهَ سُـبْحَانَهُ بِيَـدِهِ وَقَلْبِهِ وَلِسَانِهِ، فَإِنَّهُ، جَـلَّ اسْـمُهُ، قَدْ تَكَفَّلَ بِنَصْرِ مَنْ نَصَرَهُ، وَإِعْزَازِ مَنْ أَعَزَّهُ.

وَأَمَرَهُ أَنْ يَكْسِـرَ نَفْسَـهُ عِنْـدَ الشَّـهَوَاتِ، وَيَزَعَهَـا عِنْـدَ الْجَمَحَـاتِ، فَـإِنَّ الـنَّفْسَ أَمَّـارَةٌ بِالسُّوءِ، إِلاَّ مَا رَحِمَ اللهُ.

hewe ra hatime danîn, vêca ezê destûrê bidim û gereke gohdarî ya min bê kirin, çiko bi rastî ew xirabîyê di dil da çêdikê û sistîyê têxê di dîn da û ji goherandina ra (ji nav birina ni'meta ra) nêzîkatîyê çêdikê.

Dema ew qudret û mezinahî ya tu têda di te da tekebûr û ji xwe razî bûn çêkir, hingê berê xwe bide wê ĥukum û qudreta Xuda ya ser te ra û ewê karîna wî derheq xwe da ku te bi xwe ew karîn û quwet nîne, vêca ev nêrîn wê serkêşî ya te rawestênê û te ji lezî û dijwarî ya te paşda bidê û ew 'eqlê ji serê te derketî wê li te bizivirênê.

Newebê tu di mezinahî ya Xwedê da xwe digel wî beraber bikî û di ceberûta wî da xwe wek wî lê bikî, çiko bi rastî Xuda, hemî zûrguwan zelîl dikê û hemî mutekebbiran kêm û bê qîmet dikê.

Derheq Xuda û xelkê û nêzîkên xwe û ew kesên tu hej wan dikî bi insaf be (heqê wan eda bike) çiko bi rastî eger tu we nekî te zulm kirîye û heçî kesê zulmê li bendeyên Xwedê bikê, xêncî bendeyên wî Xwedê jî dijminê wî ye û kesê Xwedê dijminîyê digel wî bikê wê delîla wî pûç bikê û ileh wê di şerê wî da bê heta desta (ji zulmê) bikêşê an jî tewbe bikê.

Tiştek wek zulmê, goherînê naêxê ni'meta Xwedê û xezeb û 'ezabê wî

ثُمَّ اعْلَمْ يَا مَالِكُ، أَنِّي قَدْ وَجَّهْتُكَ إِلَى بِلاَد قَدْ جَرَتْ عَلَيْهَا دُوَلٌ قَبْلَكَ، مِنْ عَدْل وَجَوْر، وَأَنَّ النَّاسَ يَنْظُرُونَ مِنْ أُمُورِكَ فِي مِثْلِ مَا كُنْتَ تَنْظُرُ فِيهِ مِنْ أُمُورِ الْوُلاَةِ قَبْلَكَ، وَيَقُولُونَ فِيكَ مَا كُنْتَ تَقُولُ فِيهِمْ، إِنَّمَا يُسْتَدَلُّ عَلَى الصَّالِحِينَ بِمَا يُجْرِي اللهُ لَهُمْ عَلَى أَلْسُنِ عِبَادِهِ.

فَلْيَكُنْ أَحَبَّ الذَّخَائِرِ إِلَيْكَ ذَخِيرَةُ الْعَمَلِ الصَّالِحِ، فَامْلِكْ هَوَاكَ، وَشُحَّ بِنَفْسِكَ عَمَّا لاَ يَحِلُّ لَكَ، فَإِنَّ الشُّحَّ بِالنَّفْسِ الإِنْصَافُ مِنْهَا فِيمَا أَحْبَبْتَ وَكَرِهْتَ.

وَأَشْعِرْ قَلْبَكَ الرَّحْمَةَ لِلرَّعِيَّةِ، وَالْمَحَبَّةَ لَهُمْ، وَاللُّطْفَ بِهِمْ، وَلاَ تَكُونَنَّ عَلَيْهِمْ سَبُعاً ضَارِياً تَغْتَنِمُ أَكْلَهُمْ، فَإِنَّهُمْ صِنْفَانِ: إِمَّا أَخٌ لَكَ فِي الدِّينِ، وَإِمَّا نَظِيرٌ لَكَ فِي الْخَلْقِ، يَفْرُطُ مِنْهُمُ الزَّلَلُ، وَتَعْرِضُ لَهُمُ الْعِلَلُ،يُؤْتَى عَلَى أَيْدِيهِمْ فِي الْعَمْدِ وَالْخَطَاَ، فَأَعْطِهِمْ مِنْ عَفْوِكَ وَصَفْحِكَ مِثْلِ الَّذِي تُحِبُّ أَنْ

bilez naêxê, çiko bi rastî Xuda gohlêderê di'a û gazî ya mezlûma ye û ew e di kemîna zaliman da.

Bila rêka navincî di heqîyê da û rêk ketî tir digel 'edaletê û ewa pitir xelk pê razî, mehbûbtirîn kar bin li bal te, çiko bi rastî nerazî bûna gştî ya xelkê, razî bûna mirovên xas û taybet bê eser dikê û diperçiqênê û nerazî bûna mirovên taybet jî pê razî bûna gştê, tê 'efû kirin.

Di wextê rihetîyê da jî bargiranî ya çi yêk ji xelkê ji hukumdar ra neqasî bargiranî ya mirovên xas û taybete, çiko tebeqa xasan (taybet) di gîr û giriftan da kêmtir arîkarîya hukumdar dikin û ji insafê nexweşin û xwest û hêvyên pitir hene. Eger tiştek ji wan ra bê dayîn şukirdarî ya wan kêmtir e û eger bên paşda dan, derengtir 'ozr qebûl dikin û di beraberê pêşhatên nexweşên zeman da, bê sebirtirin, di heqîqet da sitûna dîn û camh û komela muslimana û hîza her û her hazira di beraberê dijmin da, hema ew xelkê gştî yê ummetê ne, vêça bila nêrîna te li wan pitir û meyla te bi alîyê wanve zehftir bê.

Sirrvanî: Gereke dûrtirîn xelk ji te ra û dijmintirîn kes li bal te, kesek bê ku ji hemîyan pitir kêmasî û 'eyban ji xelkê ra çêdikê, çiko xelkê 'eyb û kêmasî hene û hukumdar ji her kesî musteheqtir e ku ewa kêmasîyan bistirînê uveşêrê;

يُعْطِيَكَ اللهُ مِـنْ عَفْـوِهِ وَصَـفْحِهِ، فَإِنَّكَ فَوْقَهُمْ، وَ وَالِي الأَمْرِ عَلَيْـكَ فَوْقَكَ، وَاللهُ فَوْقَ مَنْ وَلاَّكَ! وَقَـدِ اسْتَكْفَاكَ أَمْرَهُمْ، وَابْتَلاَكَ بِهِمْ.

وَلاَ تَنْصِبَنَّ نَفْسَكَ لِحَرْبِ اللهِ، فَإِنَّهُ لاَيَدَيْ لَكَ بِنِقْمَتِهِ، وَلاَ غِنَـى بِـكَ عَـنْ عَفْـوِهِ وَرَحْمَتِـهِ. وَلاَ تَنْدَمَنَّ عَلَـى عَفْـوٍ، وَلاَ تَـبْجَحَنَّ بِعُقُوبَةٍ، وَلاَ تُسْـرِعَنَّ إِلَـى بَـادِرَةٍ وَجَدْتَ مِنْهَا مَنْدُوحَةً، وَلاَ تَقُولَنَّ: إِنِّي مُؤَمَّرٌ آمُرُ فَأُطَاعُ، فَـإِنَّ ذلِـكَ إِدْغَالٌ فِي الْقَلْبِ، وَمَنْهَكَةٌ لِلدِّينِ، وَتَقَرُّبٌ مِنَ الْغِيَرِ.

وَإِذَا أَحْدَثَ لَكَ مَا أَنْـتَ فِيـهِ مِنْ سُلْطَانِكَ أُبَّهَةً أَوْ مَخِيلَةً، فَانْظُرْ إِلَى عِظَمِ مُلْكِ اللهِ فَوْقَكَ، وَقُدْرَتِهِ مِنْكَ عَلَى مَا لاَ تَقْـدِرُ عَلَيْـهِ مِـنْ نَفْسِكَ، فَإِنَّ ذلِكَ يُطَامِنُ إِلَيْكَ مِنْ طِمَاحِـكَ، وَيَكُـفُّ عَنْـكَ مِـنْ غَرْبِكَ،يَفِيءُ إِلَيْكَ بِمَا عَزَبَ عَنْـكَ مِنْ عَقْلِكَ!

إِيَّاكَ وَمُسَامَاةَ اللهِ فِي عَظَمَتِهِ، وَالتَّشَبُّهَ بِهِ فِي جَبَرُوتِـهِ، فَـإِنَّ اللهَ يُـذِلُّ كُـلَّ جَبَّـارٍ، وَيُهِـينُ كُـلَّ

Vêca ‘eyb û kêmasî yên xelkê ku ji te xefin eşkere neke, çiko berpirsyarî ya te ew e ku tu ewa ji te ra eşkere paqij bikî û Xwedê ku derheq wê ya ji te xef da Ĥukum dikê; heta tu bikarî ‘eyb û kêmasî yên xelkê xef bike, da Xwedê jî ‘eyb û kêmasî yên te ku tu dixwazî ji xelkê xef bimînin, veşêrê.

Hemî girê yên kîn û rikan ji xelkê veke û ji dil derîne û kabikên hemî dijminîyan ji xwe bibire û xwe ji wê ya ji te veşartîn bê xeber bike û xwe li bê xeberîyê deyne û gotina xebergêran tesdîq neke, çiko bi rastî xebergêr xayîne, herçend xwe wek xêrxwazan bidê nîşan dan.

Meşwereta durist: Qet mirovê bexîl neke di nav meşwereta xwe ra, ku te ji dan û qencî kirinê bidê paş û ji feqîretîyê bitirsênê, her wiha mirovê tirsûnek ku te ji karan sist bikê û ne jî mirovê kulbû û herîs, ku kulbûtî û timahîyê bi awayek zalimane ji te ra bixemilênê, rastî jî ev e ku bexîletî û tirsûnekî û kulbûtî ew xesletên muxtelifn ku gumana xirab ji Xwedê ewa berhevê ser hev dikê.

Bi rastî pîstirîn wezîrê te ew e yê ji pîsekên pêşîya te ra wezîretî kirî û di gonehê wan da şirîkatî kirî, vêca newebê ku ew bibê sirrvanê (sirrdarê) te, çiko bi rastî ew arîkarên gonehkaran û birayên

مُخْتَال.

أَنْصِفِ اللهَ وَأَنْصِفِ النَّاسَ مِنْ نَفْسِكَ، وَمِنْ خَاصَّةِ أَهْلِكَ، وَمَنْ لَكَ فِيهِ هَوىً مِنْ رَعِيَّتِكَ، فَإِنَّكَ إِلاَّ تَفْعَلْ تَظْلِمْ، وَمَنْ ظَلَمَ عِبَادَ اللهِ كَانَ اللهُ خَصْمَهُ دُونَ عِبَادِهِ، وَمَنْ خَاصَمَهُ اللهُ أَدْحَضَ حُجَّتَهُ، وَكَانَ للهِ حَرْباً حَتَّى يَنْزِعَ وَيَتُوبَ.

وَلَيْسَ شَيْءٌ أَدْعَى إِلَى تَغْيِيرِ نِعْمَةِ اللهِ وَتَعْجِيلِ نِقْمَتِهِ مِنْ إِقَامَةِ عَلَى ظُلْمٍ، فَإِنَّ اللهَ سَمِيعٌ دَعْوَةَ الْمَظْلُومِينَ، وَهُوَ لِلظَّالِمِينَ بِالْمِرْصَادِ.

وَلْيَكُنْ أَحَبَّ الأُمُورِ إِلَيْكَ أَوْسَطُهَا فِي الْحَقِّ، وَأَعَمُّهَا فِي الْعَدْلِ، وَأَجْمَعُهَا لِرِضَى الرَّعِيَّةِ، فَإِنَّ سُخْطَ الْعَامَّةِ يُجْحِفُ بِرِضَى الْخَاصَّةِ، وَإِنَّ سُخْطَ الْخَاصَّةِ يُغْتَفَرُ مَعَ رِضَى الْعَامَّةِ.

وَلَيْسَ أَحَدٌ مِنَ الرَّعِيَّةِ، أَثْقَلَ عَلَى الْوَالِي مَؤُونَةً فِي الرَّخَاءِ، وَأَقَلَّ مَعُونَةً لَهُ فِي الْبَلاَءِ، وَأَكْرَهَ لِلاْنْصَافِ، وَأَسْأَلَ بِالاْلْحَافِ، وَأَقَلَّ شُكْراً عِنْدَ الاْعْطَاءِ، وَأَبْطَأَ

zaliman bûne, evahe di halekî da ye ku tu dikarî ji wan ra baştirîn cîgiran peyda bikî, ji wan kesên ku di bîr û hizir û kar zanîyê da wek wan, lê belê pîsatî û xirabî û barê gonehan wek wan li ser pişta wan neyî, ji wa kesên li ser zulma zaliman û gonehê gonehkaran digel wan arîkarî nekirîn; zehmetê van ji te ra siviktir e û arîkarî ya wan ji te ra baştir e û dilovanî û meyla wan ji te ra pitir e û girhana wan bi xêncî te ve kêmtir e. Vêca ewa ji xwe ra bike mirovên taybet ji tinêtî ya xwe û civatên xwe ra.

Piştî vê jî, bila seratirînê wan li bal te ew bin yên ji her kesî pitir rasterast heqîyê ji te ra bêjin (çiqa heqî tehl bê jî) û di wan karan da ku Xwedê ji dostên xwe ra naxwazê kêmtir arîkarîya te bikin, herçend ev kar û axiftin li te nexweş bên.

Û xwe bide gel ehlê teqwatî û rastî û duristîyê, paşê jî ewa wereng terbîye û hîn bike ku zêde pesnê te nedin û ji ber karê pûçê ku te nekirî, te şahî nekin, çiko bi rastî pesn ê zêdeyê ji qeydê dibê sebebê ji xwe razî bûnê û mirov nêzîkê tekebûr û ser xwe çûnê dikê.

Wek yêk nebûna qenc û xiraban: Newebê ku qenckar û xirab, li bal te di yêk mertebê da bin, çiko bi rastî evahe dibê sebeb ku ehlê qencî yê xwe ji

عُذْراً عِنْدَ الْمَنْعِ، وَأَضْعَفَ صَبْراً عِنْدَ مُلِمَّاتِ الدَّهْرِ مِنْ أَهْلِ الْخَاصَّةِ، وَإِنَّمَا عَمُودُ الدِّينِ، وَجِمَاعُ الْمُسْلِمِينَ، وَالْعُدَّةُ لِلأَعْدَاءِ، الْعَامَّةُ مِنَ الأُمَّةِ، فَلْيَكُنْ صِغْوُكَ لَهُمْ، وَمَيْلُكَ مَعَهُمْ.

وَلْيَكُنْ أَبْعَدَ رَعِيَّتِكَ مِنْكَ وَأَشْنَأَهُمْ عِنْدَكَ، أَطْلَبُهُمْ لِمَعَائِبِ النَّاسِ، فَإِنَّ فِي النَّاسِ عُيُوباً، الْوَالِي أَحَقُّ مَنْ سَتَرَهَا، فَلاَ تَكْشِفَنَّ عَمَّا غَابَ عَنْكَ مِنْهَا، فَإِنَّمَا عَلَيْكَ تَطْهِيرُ مَا ظَهَرَ لَكَ، وَاللهُ يَحْكُمُ عَلَى مَا غَابَ عَنْكَ، فَاسْتُرِ الْعَوْرَةَ مَا اسْتَطَعْتَ يَسْتُرِ اللهُ مِنْكَ مَا تُحِبُّ سَتْرَهُ مِنْ رَعِيَّتِكَ.

أَطْلِقْ عَنِ النَّاسِ عُقْدَةَ كُلِّ حِقْد، وَاقْطَعْ عَنْكَ سَبَبَ كُلِّ وِتْر، وَتَغَابَ عَنْ كلِّ مَا لاَ يَضِحُ لَكَ، وَلاَ تَعْجَلَنَّ إِلَى تَصْدِيقِ سَاع، فَإِنَّ السَّاعِيَ غَاشٌ، وَإِنْ تَشَبَّهَ بِالنَّاصِحِينَ.

وَلاَ تُدْخِلَنَّ فِي مَشُورَتِكَ

qencîyê vedin (û ji wî ra bê meyl û bê rexbet bibin) û ehlê xirabî yê di xirabî ya xwe da teşîwîq bibin. Digel her keskî ewê bike ya ewî xwe pêve girê dayî.

